**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ**
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR**
**MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ**

**Teza Lîsansa Bilind**

# DÎWANA HEZÎN
# (METN, LÊKOLÎN Û FERHENG)

**Yakup AYKAÇ**
**121302119**

**Şêwirmendê Tezê**
**Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ**

**ÇEWLÎG - 2015**

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

# HEZÎN DİVANI
# (METİN, İNCELEME VE SÖZLÜK)

Yakup AYKAÇ
121302119

Tez Danışmanı
Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ

BİNGÖL – 2015

**JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ**

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

Serok : Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ

Endam : Doç. Dr. Mustafa KIRKIZ

Endam : Alk. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Pesendkirin
Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

Rêvebirê Enstîtûyê

# NAVEROK

NAVEROK ........ II
KURTE ........ VI
ÖZET ........ VII
ABSTRACT ........ VIII
PÊŞGOTIN ........ IX
LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN ........ XI
KURTEBÊJE ........ XII
DESTPÊK ........ 1
BEŞA YEKEMÎN ........ 8
JIYAN Û BERHEMÊN HEZÎN ........ 8
1. JIYANA HEZÎN ........ 8
1.1. Nav û Mexlesa Wî ........ 8
1.2. Malbata Hezîn ........ 10
1.3. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Hezîn ........ 10
1.4. Rêwîtiya bo Xwendinê û Xewna Wî ........ 11
1.4.1. Şîroveya Xewnê ........ 11
1.5. Perwerdehiya Hezîn ........ 12
1.5.1. Gundê Sîsê û Medreseya Qewmanê ........ 12
1.5.2. Gundê Muxbêdê û Medreseya Hecî Mesûd ........ 12
1.5.3. Medreseya Norşînê ........ 12
1.5.4. Gundê Balekan ........ 13
1.5.5. Gundê Tilme'rûf û Medreseya Şêx Ehmedê Xezna/Xeznewî ........ 13
1.6. Gundê Tûmikê û Leşkeriya Wî ........ 14
1.7. Serdema Melatiya Hezîn ........ 14
1.7.1. Li Gundê Kamrûda Jor (1966-1987) ........ 14
1.7.2. Medreseya Hezîn û Feqiyên Wî ........ 15
1.7.3. Derbeya Leşkerî ya 1980'yan û Girtina Medreseyên Kurdan ........ 15
1.7.3.1. Sedema Çûyîna Stenbolê ........ 16
1.7.4. Jiyana Stenbolê û Li Stenbolê Medreseyeke Kurdistanî ........ 16
1.8. Jiyana Hezîn ya Edebî ........ 16
1.8.1. Kengê Dest bi Nivîsînê Kir? ........ 16
1.8.2. Jibera Hezîn û Evîna Helbestan di Dilê Wî de ........ 17
1.9. Rêya Tesewif û Terîqetê ........ 17
1.9.1. Seyr û Sulûka Wî ........ 17
1.9.2. Xelîfetiya Neqşîbendîtiyê ........ 18
1.10. Seyahetên Wî ........ 18
2. BERHEMÊN HEZÎN ........ 19
2.1. Berhemên Wî yên Erebî ........ 19

2.1.1. Mewahibu‘r-Rehman Fî Tefsîri Sûret El-Insan ........ 19
2.1.2. El-Mewahib ........ 20
2.1.3. Miratu‘l-Heqa‘îq We‘l-Esrar ........ 20
2.2. Berhemên Wî yên Tirkî ........ 21
2.2.1. Hanımlara Rehber ........ 21
2.2.2. Külliyat-ı Suğra ........ 21
2.2.3. Külliyat-ı Vusta ........ 22
2.2.4. Külliyat-ı Kübra ........ 22
2.3. Berhemên Wî yên Kurdî ........ 23
2.3.1. Kûlxaniya Veşartî ........ 23
2.3.2. Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edebê ........ 23
2.3.3. Reng û Rûyê Peyxember ........ 23
2.3.4. Fiqha Şafi‘î ........ 24
2.3.5. Guldan ........ 24
2.3.6. Bîranînên Seydayê Mela Husnî ........ 25
2.3.7. Dîwana Hezîn ........ 25
BEŞA DUYEMÎN ........ 27
VÊKOLÎNA DÎWANÊ JI ALIYÊ TEŞE Û RUXSARÎ VE ........ 27
1. TAYBETIYÊN TEŞEYÎ ........ 27
1. 1. Şiklê Tertîbê ........ 27
1. 1. 1. Rêz û Hejmara Helbestan ........ 27
1.2. Teşeyên Nezmê ........ 29
1.2.1. Qesîde ........ 29
1.2.2. Xezel ........ 31
1.2.3. Murebbe‘ ........ 32
2. TAYBETIYÊN RUXSARÎ ........ 34
2.1. Wezn ........ 34
2.1.1. Îmale ........ 35
2.1.2. Med ........ 36
2.1.3. Zihaf ........ 36
2.1.3.1. Zihafên ku Nirx û Payeya Helbestê Dadixin ........ 37
2.1.3.2. Zihafên ku Nirx û Payeya Helbestê Danaxin ........ 38
2.1.4. Wesl ........ 39
2.2. Serwa ........ 40
2.2.1. Li Gorî Dengê Serwayê ........ 40
2.2.1.1. Serwaya Lawaz ........ 40
2.2.1.2. Serwaya Asayî ........ 41
2.2.1.3. Serwaya Zêdebar ........ 41
2.2.1.4. Serwaya bi Cînas ........ 42

2.2.2. Serwayên li Gorî Cih ... 42
2.2.2.1. Serwaya Kutayî ... 42
2.2.2.2. Serwaya Navekî ... 42
2.2.2.3. Serwaya Pêşî ... 43
2.3. Paşserwa ... 43
2.3.1. Paşserwayên ku di Halê Qertafan de ne ... 43
2.3.2. Paşserwayên ku di Halê Qertaf û Bêjeyan de ne ... 44
2.3.3. Paşserwayên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne ... 44
BEŞA SÊYEM ... 47
KESAYETIYA HEZÎN A EDEBÎ ... 47
1. ZIMAN Û ŞÊWAZ ... 47
1.1. Ziman ... 47
1.1.1. Devoka Serhedê ... 48
1.1.1.1. Devoka Gêxî ... 50
1.1.2. Devoka Botan û Behdînan/Badînan ... 51
1.1.3. Devoka Rojavayê ... 52
1.1.4. Peyv û Ravekên Kurdî yên Resen ... 53
1.1.5. Peyvên Nûjen ... 53
1.1.6. Gotinên Pêşiyan ... 54
1.1.7. Biwêj ... 56
1.8. Hêmanên Erebî, Farisî û Tirkî ... 63
1.8.1. Hêmanên Erebî ... 63
1.8.1.1. Ayet ... 64
1.8.1.2. Hedîs ... 65
1.8.2. Hêmanên Farisî ... 65
1.8.3. Hêmanên Tirkî ... 66
1.9. Cotepeyv û Dubarekirina Dengan ... 68
1.2. Şêwaz (Uslûb) ... 69
2. WÊJEVANÊN KU BANDOR LI SER HEZÎN KIRINE ... 76
2.1. Şêx Hadiyê Qewmanî ... 81
2.2. Şêx Elauddînê Xeznayê ... 82
2.3. Melayê Cizîrî ... 76
2.4. Ehmedê Xanî ... 79
2.5. Melayê Bateyî ... 81
3. NAVEROKA HELBESTÊN HEZÎN ... 84
3.1. Helbestên Lîrîk ... 84
3.2. Helbestên Dîdaktîk ... 86
3.3. Helbestên Rexneyî ... 89
3.4. Helbestên Hîkemî û Tesewifî ... 91

3.5. Hin Mijarên Din ên Girîng ........ 96
ENCAM ........ 100
BEŞA ÇAREMÎN ........ 103
METN Û FERHENGA DÎWANÊ ........ 103
ÇAVKANÎ ........ 584

# KURTE

Edebiyata Kurdî ya Klasîk ji sedsala 16. û vir ve bi gelek helbestvan û berhemên wan ên hêja ve derketiye asteke bilind, kemiliye û dewlemend bûye. Di vî warî de dîwanên ku hatine nivîsandin, naveroka dîwanan û kalîteya şi'rên wan cihekî taybet digire.

Mela Husnî Hezîn, yek ji wan helbestvanên edebiyata kurdî ya klasîk e ku di serdema modernîzmê de bi dîwana xwe ya klasîk ve bal kişandiye ser xwe. Hezîn bi vê dîwana xwe ya tam û têkûz di sêrî de bi me dide ispatkirin ku edebiyata kurdî ya klasîk hê jî bi awayekî serkeftî didome.

Me jî di vê xebata xwe de li ser dîwana Mela Husnî Hezîn lêkolîn kir, digel metn û ferhenga dîwanê ew nirxand. Me şi'rên dîwanê, uslûb û zimanê nivîskar rave kirin û me dîsa di xebata xwe de cî da jiyan û berhemên din ên nivîskêr. Em hêvî dikin ku ev xebat dê berhemeke hêja ya din a Edebiyata Kurdî ya Klasîk derîne û qîmeta edebiyata me isbat bike.

**Peyvên Sereke**: Dîwan, Dîwana Hezîn, Mele Husnî Hezîn, Edebiyata Kurdî ya Klasîk.

# ÖZET

Klasik Kürt Edebiyatı 16. yy.dan itibaren bir çok şair ve onların mükemmel eserleri sayesinde olgunlaşmış, üst bir seviyeye çıkmış ve zenginlik kazanmıştır. Bu alanda yazılmış olan divanlar, divanların içeriği ve şiirlerin kalitesi önemli bir yer tutmaktadır.

Molla Hüsnü Hezin bu Klasik Kürt Edebiyatı şairlerinden birisidir ki modern çağda divanıyla dikkatleri üzerine çekmiştir. Hezin bu eksiksiz olan divanıyla bize şunu ispatlıyor ki Klasik Kürt Edebiyatı hala başarılı bir şekilde sürmektedir.

Biz de bu çalışmamızda divan metni ve sözlük değerlendirmesinin yanında Molla Hüsnü Hezin'in divanını inceledik. Divanın şiirlerini, şairin dili ve üslubunu açıkladık ve bunun yanında şairin hayatına ve diğer eserlerine yer verdik. Umuyoruz ki bu çalışmamız diğer bir Klasik Kürt Edebiyatı örneği olan bu değerli eseri gün yüzüne çıkaracak ve edebiyatımızın kalitesini bir kez daha ispat edecektir.

**Anahtar Kelimeler**: Divan, Hezin Divanı, Kürtçe Divanlar, Molla Hüsnü Hezin, Klasik Kürt Edebiyatı

## ABSTRACT

Classical kurdish literature has been developed, upgraded and enriched by the poets and his immortal works from the sixteenth century. Diwans written in kurdish literature and have an important place in classical literature in terms of their contents and quality of poets

Mullah Husni Hezin is one of the classical kurdish literature poets who took attention in modern diwan literature. Hezin, with his complete divan, has proved that classical kurdish literature is still going on with success.

In this study, we examined both diwan texts, dictionary evaluation and Mullah Husni Hezin's divan. We also explained this diwan's poems and poet's language and genre. In addition to, we mention about the life of the poet and his other important works. We hope that this study will unearth another example of classical kurdish literature and prove the quality of this literature.

**Keywords**: Diwan, Hezin's Diwan, Kurdish Diwans, Mullah Husni Hezin, Classical Kurdish Literature.

# PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî ya Klasîk xwedî dîrokeke dûr û direj e û li gorî dewra xwe têr û tijî ye. Wekî hemû neteweyan xwediyê gelek nivîskar û berhemên giranbiha ye ku di sedsala 16'an de bi Melayê Cizîrî re gihîştiye lûtkeya herî bilind û digel medreseyan hebûna xwe heta vê rojê domandiye. Mela Husnî Hezîn, yek ji wan helbestvanên edebiyata kurdî ya klasîk e ku di serdema modernîzmê de bi dîwana xwe ya klasîk ve di vê ekola klasîk de cî girtiye.

Mixabin piştî hilweşandina mirektiyên kurdan, ango di van dused salên dawî de nemaze piştî avabûna Komara Tirkiyê, rewşa kurdan di babelîskeke neînsanî re geh li vî alî û geh li wî alî ve kaş dibû û dihat xwestin ku di bin siyaseta qedexe û tunebûnkirinê de hebûna xwe îdame bike. Nivîsandina vê berhemê jî rastî salên navbera 1966 û 1987'an tê ku Seydayê Mela Husnî jî di wê pêvajoya xirab re derbas dibe. Gava mirov rewşa wê demê, qedexebûna zimanê kurdî, xasma zext û zorên ku li bajarên Kurdistanê dihate kirin, derbeya leşkerî ya 1980'yî, girtina medreseyên kurdan, şerê di nav PKK û dewleta Tirkiyê dide ber çavên xwe hingê baştir tê dîtin ku ev dîwan berhemeke giranbiha ye û di gelek merhaleyan re derbas bûye.

Ji bo ku qedr û qîmeta Edebiyata Kurdî derkeve holê pêwîst e ku berhemên klasîk çi ji vê serdemê be, çi jî ji serdemên din be zêdetir bên lêkolandin. Ji ber vê yekê me jî xwest ku ev berhema giranbiha derkeve qada edebiyatê û qîmeta wê were zanîn û di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de ciyê xwe bigire.

Di amadekirina vê tezê de gelek kesan zehmetiya min kişandin. Di serî de spasiyên xwe ji malbata xwe re dikim. Li Wanê muderîsên Medreseya Şêx Ehmedê Hespistanî, Seydayê Mele Evdilhemîd û Mela Aydînê Hespistanî re gelek spasdar im ku di şîrovekirina dîwanê de gelek alîkariya min kirin. Mamoste Naim Çapraz, Ahmet Kırkan, Ziya Yıldırımçakar, Ferda Mengüç û heçî yên ku alîkariya min kirin e, spasdarê wan im. Mamoste Farouk Ismail di werger û çavkaniyên erebî de her dem li bal min bû; Mamoste Perwîz Cîhanî bi dersên edebiya klasîk ve pêşiya min ronî kir; Mamoste Abdurrahman Adak û Hayrullah Acar her tim bi alikarî û pêşniyazên xwe ve li cem min bûn, spasdarê wan im jî. Mamoste Kamal Soleimani bi fikr û nêrînên xwe yên cuda û qîmetdar her tim rê nîşanî min da, spas dikim.

Hem kek û hem jî mamosteyê min ên hêja Seyfeddin Aykaç, Zafer Açar û M. Zahir Ertekin re spasdar im ku her tim bi pêşniyaz û alikariyên xwe ve li cem min bûn, mala wan ava.

Spasiyên xwe ji şêwirmendê xwe Doç. Dr. Mustafa Kırkız re dikim ku ji bo ku ev dîwan wenda nebe gelek hewl daye û ji nû ve bi destxetên xwe ve cardin nivîsiye û herwiha di derbarê Hezîn de gelek agahî dan min.

Û herî dawî spasiyên xwe ji helbestvanê vê dîwanê Seydayê Mela Husnî re dikim ku wî li Stenbolê em di mala xwe de ezimandin, ji bo hevpeyvînê dema xwe ya qîmetdar ji bo me veqetand û di derbarê dîwan û jiyana xwe de gelek agahî dane me.

**Yakup AYKAÇ**

**Mêrdîn - 2015**

# LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN


| TABLO | RÛPEL |
| --- | --- |
| **Tablo 1**: Rêz û Hejmara Helbestan | 27 |
| **Tablo 2**: Tabloya Qesîdeyên Dîwanê | 30 |
| **Tablo 3**: Tabloya Xezelên Dîwanê | 32 |
| **Tablo 4**: Tabloya Murebbe‘ên Dîwanê | 33 |
| **Tablo 5**: Tabloya Behr û Weznên Helbestan | 34 |
| **Tablo 6**: Rêjeya Bikaranîna Behran | 35 |

| PÊVEK | |
| --- | --- |
| **Pêvek 1**: Destxetên Mela Mustefa Agahî | 595 |
| **Pêvek 2**: Destxetên Seydayê Mela Husnî (Hezîn) | 596 |

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| amd. | : amadekar |
| as. | : aleyhî selam |
| bnr. | : binêrin |
| b.n. | : berhema navborî |
| b.z. | : bêriya zayînê |
| DİA | : Diyanet İslam Ansiklopedisi [Ansîklopediya Îslamê ya Diyanetê] |
| g.ç. | : gotara çapnebûyî |
| H. | : Hezîn, Seydayê Mela Husnî |
| Hz. | : hezretî |
| h. | : hîcrî |
| hwd. | : her wekî din |
| j. | : jimare |
| k.d. | : koça dawî |
| m. | : mîladî |
| n.d. | : nivîskarên din |
| p.ç. | : pirtûka çapnebûyî |
| qs. | : qudduse sirrihû |
| r. | : rûpel |
| s. | : sal |
| saw. | : sellellahû aleyhî wesellem |
| vgz. | : veguhêzer |
| wer. | : wergêr |
| weş. | : weşan, weşanxane |

# DESTPÊK

Di edebiyata klasîk de dîwan yek ji berhemên herî girîng e ku ast û kalîteya helbestvan nîşan dide herwiha pêşçûn û dewlemendiya edebiyatê ya aîdî zimanê ku pê hatiye nivîsandin diyar dike. Dîsa dîwan hem ji aliyê cure û teşeyên helbestan hem jî ji aliyê mijar û uslûba helbestan ve berhemên hêja ne. Li aliyekî din dîwan, di dîroka edebiyata klasîk a gelekî de şahidê heyamekê ye.

Heta niha gelek dîwan ji edebiyata kurdî ya klasîk derketine ku hinek ji wan hatine çapkirin, hinek wekî tez li ser xebat hatine kirin. Ev xebat jî wekî tez li ser dîwanekê disekine.

## Girîngî û Armanca Mijarê

Edebiyata Kurdî ya Klasîk ji aliyê dîwanan ve dewlemend e. Çi ji serdema klasîk çi ji serdema modern bin dîwanên kurdî nîşaneya xurtbûna helbesta klasîk in û temsîla Edebiyata Kurdî ya Klasîk dikin.

Di edebiyata kurdî ya soranî de dîwana herî mezin a Mehwî ye û di ya kurmancî de jî ya Hezîn e. Ango, di edebiyata kurdî de mezintirîn dîwana kurdî Dîwana Hezîn e û dîwaneke muretteb e. Ji ber vê yekê ev dîwan ji bo edebiyata kurdî pir girîng e.

Ev dîwana ku em li ser xebitîn jî yek ji wan dîwanan e ku hem ji aliyê şêwe û uslûba xwe ve hem ji aliyê mijarên helbestên xwe ve berhemeke hêja ye. Lewma me xwest vê berhemê ji xezîneya edebiyata kurdî ya klasîk derînin, bidin hev û rave bikin da ku gelê me jê agahdar be û lêkolîner û hezkiriyên edebiyatê jê îstifade bikin.

## Naverok û Rêbaza Tezê

Ev xebata bi navê *Dîwana Hezîn; Metn, Lêkolîn û Ferheng* ji destpêk, çar beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de armanc û çarçoveya tezê tê ravekirin; çavkanî tên nirxandin û li ser rêbaza tezê hinek agahî tên dayîn.

Di beşa yekemîn de em li ser *Jiyana Hezîn û Hemû Berhemên Wî* sekinîn. Li vir, Hezîn, di perwerdehiya xwe de li kîjan medresê, kîjan gundî, li ber destê kîjan seydayan xwendiye me tespît kirin. Ligel van me behsa melatiya wî, feqiyên wî kirin. Di dewama vê beşê de jî me hemû berhemên Hezîn hem ji aliyê teknîkê û hem jî ji aliyê naverokê ve nirxandin.

Me di beşa duyemîn de Dîwana Hezîn ji aliyê *teşe û ruxsarî* ve kola. Helbestên dîwanê ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin. Li vir hejmara helbestan, nimroya wan, ji çend malikan pêk

tên, teşeyên nezmê yên helbestên dîwanê wek; qesîde, xezel û hwd. û nimûneyên wan di dîwanê de hatin tespîtkirin. Ligel van, dîwan ji aliyê ruxsarî ve jî hat nirxandin. Li vir jî weznên helbestan yek bi yek hatin tespîtkirin; kêmasiyên helbestan wek îmale, med, zihaf û cureyên wan bi mînakan ve hatin ravekirin û ji aliyê serwa û paşserwayê ve hatin lêkolandin.

Hezîn, helbestvanekî klasîk û mutesewif e; di pergala medreseyan re derbas bûye, li wir perwerde bûye, li cem alimên mezin ders wergirtine û di rêka Neqşîbendîtiyê de çûye. Ev hemû tiştên ku di jiyana Hezîn de bûne, xwe di helbestên wî de aşkere nîşan kirine û bandorek li ser kesayetiya wî ya edebî kirine. Me hewl da ku di beşa sêyem de *kesayetiya edebî* ya Hezîn bi awayekî berfireh lêbikolin û binirxînin. Dîsa di vê beşê de me ziman û şêwaza wî bi hûrgilî di ber çavan re derbas kir û naverokên helbestên dîwanê li gorî mijaran senifandin.

Herwiha di beşa çaremîn de jî helbestên Hezîn cardin li gorî elîfbêya erebî hatin rêzkirin. Piştî vê, helbestên dîwanê bi tîpên transkirîpsiyonê yên navneteweyî ve hatin veguhestin û di bin rûpelan de wekî jêrenot ferheng hat danîn. Di ferhengê de peyvên erebî, farisî, tirkî û kurdî hatin ravekirin. Herwiha wateya rêz an jî malikên erebî û farisî jî hatin dayîn.

**Çavkaniya Tezê**

Çavkaniya xebata me ya Dîwana Hezîn ji du beşan pêk tê. Beşa yekem ji aliyê helbestvan ve wekî pirtûkekê hatiye çapkirin (s. 1995) ku naverok jî tê de bi tevahî 401 rûpel e. Cihê çapê, weşanxane û sala çapbûnê nehatiye nivîsîn. Herwiha dîwan heta rûpela 371'an dîwaneke bi tertîb e. Piştî vê rûpelê 10 helbestên din jî hatine lêzêdekirin lê ne li gorî tertîbê ne. Ev beşa yekem bi computerê bi tîpên erebî hatiye nivîsîn lê mixabin li gorî weznê nehatiye kontrolkirin û bi sedan kêmasî û xeletiyên wê hene. Beşa duyem ji 47 rûpelên destxetî pêk tê ku ew jî bi tertîbî nehatine rêzkirin. Ji ber vê yekê, me hemû helbestên herdu beşên dîwanê, li gorî rêza tîpên elîfbêya erebî rêz kirin.

Hemû helbestên Dîwana Hezîn ji aliyê Mele Mustefa Agahî ve hatiye nivîsîn ku çavkaniya xebata me ya eslî li ser wê destxetê ye.

Me tenê 15 helbestên ku bi destxetên Seydayê Mela Husnî hatibû nivîsîn, bi dest xistin. Gava me Seydayê Mela Husnî li mala wî ziyaret kir (02.02.2014, Stenbol) li cem wî jî destxetên wî yên resen tunebûn. Ji ber ku Seydayê Mela Husnî destxetên xwe yên resen piştî ku dîwan bi rêk û pêk hatibû nivîsîn şewitandibûn.

Ji bilî van me 14 berhemên Hezîn tespît kirin. Me di beşa yekemîn de di derbarê wan pirtûkan de agahiyên hûrgilî dan ku ji bo teza me çavkaniyên girîng bûn. Herwiha danîna bingeha vê tezê de gotara M. Zahir Ertekin ji bo me gelek girîng bû ku di hejmara 9. a kovara

Nûpeldayê de bi serenavê “Seydayê Mela Husnî Hezîn û Berhemên Wî” hatibû weşandin. Dîsa di hejmara 14. a kovara Nûpeldayê de Emin Agahdar helbesteke Hezîn latînîze kiribû û bi serpêhatiya çîrokê ve di bin serenavê “Çîroka Helbesta Payîza Paşîn a Melayê Hezîn” nivîsîbû.

Dîsa di amadekirina vê tezê de me du hevpeyvînên girîng kirin. Ji wan hevpeyvînan a yekem bi helbestvanê vê dîwanê Seydayê Mela Husnî Hezîn re di 2’yê Sibat a 2014’an de li Stenbolê li mala wî hat kirin. Me di vê hevpeyvînê de digel suhbeteke dûr û dirêj çend pirs ji Hezîn kirin ku di derbarê dîwana wî, hizrên wî yên di derbarê helbest û edebiyatê, hin bîranîn û serpêhatiyên wî de bûn. Me hevpeyvîna duyem jî bi Mela Mustefa Agahî re 28’ê Adar a 2014’an de li Çewlîgê kir. Mela Mustefa Agahî hem li cem Hezîn xwendiye hem demeke dirêj li medreseya wî muderîstî kiriye û herwiha zavê Seydayê Mela Husnî ye jî. Me gelek ji Mela Mustefa sûd wergirt û wî gelek pirsên me yên ku derbarê Hezîn û dîwana wî de safî kirin.

**Rêbaza Amadekirina Metnê Dîwanê û Ferhengê**

Di amadekirina metnê de ev rêbaz hat şopandin.

1. Me di tipveguhestina vê dîwanê de destxeta Mela Mustefa Agahî esas girt û alfabeya transkirîpsiyona navneteweyî hilbijart.

Alfabeya Transkiripsîyonê

| | |
|---|---|
| ث | s̱ |
| ح | ḥ |
| ذ | ẕ |
| ص | ṣ |
| ض | ḍ, ż |
| ط | ṭ |
| ظ | ẓ |
| ع | ʿ |
| غ | ġ |
| ء | ʾ |
| Apastrops | ` |

2. Me ji bo her helbestê jimareyek danî. Herwiha ji bo ku dîtina malikan hêsan bibe û xebateke akademîk derkeve holê di her helbestê de jî li serê her malikan jimare hat danîn. Di amadekirina ferhengê de ev jimare hatin bikaranîn.

3. Di analîza dîwanê de me li ber mînakan di nav kevanekê de jimareya nimûneyên xwe dane ku ya yekem jimareya helbestê, ya duyem jî jimareya malikê nîşan dide. Bo nimûne, jimareya li ber vê malikê tê wê wateyê ku ev malik di helbesta 25'an de malika 6. e.

Kêla xuya ket ew delal, dil ra demek bibe heval
Bi cah û mulk mal û melal, dilê delal dîtî çi ket (25/6)

4. Hinek peyv ji bo ku kêşe li hev bên bi du herfên bêdeng hatine nivîsîn. Bo nimûne: şekker, hetta, durr, sirr û hwd. Dîsa di hinek peyvan de ji bo ku kêşeya helbestê xera nebe dengdêrek lê hatiye zêdekirin. Me ew tîp di nav kevanekê de nîşan daye. Wek mînak: kar(i)wan, dest(i)keş, derd(i)mend, bus(i)tan, ras(i)tî, bar(i)keş.

5. Di hinek peyvan de ji bo ku kêşeya helbestê xera nebe dengek hatiye qutkirin ku me ew bi apastropsê nîşan da. Bo nimûne: Xuya be`l ʿaşiqê xu ne`b derengî (13/4)

6. Ayet û hedîsên helbestê di nav *nîşaneka dunikê* (" ") de hatine nivîsîn. Herwiha me di jêrenotan de cî dane werger û çavkaniya wan jî. Ji bilî wan rêz û malikên erebî û farisî bi nîşaneka dunikê nehatine nivîsîn lê li jêrenotan de wergera wan a kurdî hatine dayîn.

7. Di tîpveguhestina dîwanê de kêşeya dîwanê li ber çavan hat girtin. Ji ber vê yekê, zihafên di helbestan de cî digirin bi şêweya *îtalîk* hat nivîsîn.

8. Di binê her rûpelê de ferheng hat danîn. Di amadekirina rêbazê de rêya ku me şopand ev bû: Peyvên erebî, farisî, tirkî hatin ravekirin. Ji bilî van, peyvên kurdî yên herêmî, yên ku di ferhengên kurdî de nayên dîtin (wek; oxat, bîtkel, xuxûd, atûn û hwd.) hatin ravekirin. Kêm caran be jî hin ciyên ku têgihîştina wê dijwar bû, me şîrove yan jî wergera malikê ya pexşankî nivîsî. Di wan şîrove û ravekirinan de yên ku aîdê Seydayê Mela Husnî bû, me di nav kevanekê de wek (H.) nîşan da. Pirsgirêka herî mezin ev bû ku peyvên ferhengê gelek caran xwe di heman helbestê û helbestên din de jî nîşan didan. Ji ber vê yekê, peyveke biyanî di helbestên kurt de carek tenê; yan jî, di helbestên dirêj de du yan jî sê rûpel şûn de cardin derketibe hat ravekirin.

**Rewşa Siyasî Ya Serdema Nivîsandina Dîwana Hezîn**

Mela Husnî Hezîn, di sala 1943'an de li gundê Tûmika Gêxiyê tê dinê. Di heft saliya xwe de dest bi medreseyê dike. Piştî ku medreseyên nêzîkî gundê xwe xilas dike derbasî medreseya Norşînê û dûre jî Medreseya Xeznayê dibe. Di sêrî de em vê yekê bibêjin ku Dîwana Hezîn dîwaneke evînî, tesewifî, ilmî û şîretî ye. Her çiqas tê de ji aliyê welat û welatparêziyê de rasterast helbest nebin jî, me xwest ku di serdema nivîsandina Dîwan Hezîn

de rewşa Tirkiyê û bajarên bakûrê Kurdistanê ji aliyê ziman û siyasetê ve çawa bû, em hinek rave bikin.

**Komara Tirkiyê (1923-1943)**

Di dewletên modern de *avakirina nasname*yê yek ji polîtîkayên sereke ye. Dewleta Tirkiye jî gava ku ava bû xwe wek dewleteke modern dît û li seranserî welêt ji bo avakirina netewê pêvajoyeke nû dest pê kir û xwest ku di wê erdnîgariyê de li ser hemû nasnameyan, nasnameyeke nû ava bike û nasnameyên din jî di nav xwe de bihewîne.[1]

Beriya ku Hezîn were dinê Komara Tirkiyê 20 salî bû bû. Bi vî awayî li Tirkiyê jî polîtîkaya avakirina neteweya nû ji perwerdehiyê heta siyasetê; ji çandê heta dîrokê; ji aboriyê heta huqûqê li her qada jiyanê bi avayekî xurt dimeşiya. Herwiha dewleta Tirkiyê piştî hilweşandina Dewleta Osmanî, hêj nû ava bûbû ku xîmên xwe li ser sekulerîzm û netewe-dewletê danîbû û berê xwe jî dabû rojavayê (Ewropa). Li vir ji bo Kemalistan du pirsgirêkên sereke hebû ku ya yekem sekulerîzm, ya duyem jî nasname/netewe bû. Lewra rejîma kemalîst piştî hilweşandina dewleta Osmanî hewl da ku ew nasnameya dînî û pirneteweyî ya Osmanî ji holê rake û li şûna wê nasnameya sekuler û Tirk ava bike.[2]

Di vê politîkaya pêvajoya netewebûnê de ziman ciyekî girîng digirt. Lewra di avabûna nasnameyê de rola herî xurt dikete ser milên zimên. Dewleta Tirkiyê jî wisa kir û siyaseta netewe-dewletê li qada zimên jî bi awayekî xurt û bi destê dewletê ve meşand. Di siyaseta xwe de wisa dikir ku; dixwest hem zimanê tirkî bibe zimanê serdest û hem jî yên din ji holê rabin. Ligel vê siyasetê ji alikî ve di makeqanûnê de li gorî xwe guherîn çêdikirin, ji alikî ve jî li bajarên Kurdistanê [Vilayat-ı Şarkiyye] ji bo ku zimanê tirkî serdest be, belav bibe û gel fêrî vî zimanî be komeleyên cuda [Türk Ocakları (1912-1931), Halk Evleri (1932-1951), Umumi Müfettişlikler (1927-1952)] vedikirin.[3] Herwiha di sala 1934'an de qanûna paşnavê [Soyadı Kanunu] derket ku êdî xêncî tirkî navdanîn qedexe bû, dûre jî navên ciyan (gund, navçe û hwd.) hat guhertin û bûne tirkî. Ji bilî van qanûna îskanê derket ku gelek kes ji welatên xwe hatin derxistin û ji bo ku asîmîle bibin û ji eslê xwe dûr kevin li rojavayê Tirkiyê hatin bicîkirin. Herwiha di 24'ê Adara 1924'an de qanûna Tevhid-i Tedrisat [yekîtiya perwerdehiyê] derket ku hemû cih, komele û dibistanên perwerdehiyê bi wezareta perwerdehiyê ve hat girêdan û herwiha medrese jî hatin girtin. Medreseyên kurdan jî ji vê qanûnê para xwe girtin. Bi girtina medreseyan ve êdî ji bo zimanê kurdî pêvajoyeke dijwar

[1] Serdar Kaya, *Endoktrinasyon ve Türkiyede Toplum Mühendisliği*, weş. Nirengi, Ankara 2010, r. 130.
[2] Ercan Çağlayan, *Cumhuriyet'in Diyarbakır'da Kimlik İnşası (1923-1950),* weş İletişim, İstanbul 2014. r. 13-28.
[3] Ercan Çağlayan, "Cumhuriyet Dönemi Dil Politikaları ve Kürtçe [1923-1950]", *g.ç.*

dest pê kir. Lewra di medreseyan de perwerde bi zimanê kurdî bû û medrese ji bo pêşveçûyîna zimên wek hêlîna kurdî bû. Piştî Serhildana Şêx Seîd (1925) jî dewleta tirk ji bo qirkirina kurdî û kurdan wekî seferberiyê tevgeriya. Di 24'ê Îlona 1925'an de qanûna *Şark Islahat Planı* [Rênexşeya Îslehkirin a Bajarên Kurdan] derket ku ji bo tesfiyekirina zimanê kurdî ciyê wê cuda ye. Lewra bi vê qanûnê re axaftina zimanê kurdî li sûk, bazar, dibistan, ciyên fermî û hwd. hat qedexekirin. Herwiha yên kurdî diaxivîn jî nedikarîbûn bibin karmendê dewletê û li ser vê jî diketine girtîgehan.[4]

Bi vî awayî li çarawirê Tirkiyê siyaseteke qirêj li dor kurdan dimeşiya ku armanca yekem asîmîlasyona kurdan û yan din jî zimankujiya [linguicide] kurdî bû.[5]

**Derbeya Leşkerî ya 1980'yî û Medreseyên Kurdistanê**

Li Tirkiyê di sala 1980'an de derbeya leşkerî çêbû ku hingê dîsa li ser kurdan zulmeke mezin hat kirin. Li cem kê di derbarê kurd, kurdî û Kurdistanê de çi kitêb û çi nivîs bihata dîtin, ew kes rastî cezayeke mezin dihat, bi salan di girtigehan de dima. Herwiha hingê medreseyên gundan yên biçûk jî tên girtin. Ji ber ku di wan medreseyan de perwerdehî bi kurdî bû.

Mela Husnî Hezîn jî di bîranînên xwe de di derbarê siyaseta ku dewletê wê demê li Kurdistanê dimeşand de hizrên xwe wiha dibêje:

> *[...]Tevahiya Kurdistanê wekî zanîngeheke îslamî bû. Di pirê gund û bajarên wê de medrese hebûn. Bi hûrî û kûrî zaf ulumê îslamî tê de dihatin xwendin. Herê, pirtûkên erebî, farisî û kurdî dihatin xwendin, lê zîmanê medreseyên wê sade kurdî bû... Hikûmetan giraniyek zêde dan ser mele û medreseyan. Pir mele kuştin, pir mele ji welat derxistin. Pir meleyên weke Seydayê Mele Seîdê Kurdî avêtin zindanan, rizandin, dîn kirin bê kêr û bê havil kirin. Hedefên wan rakirina xûyên Quranê, vemirandina çira Îslamê, jêkirina zimanê kurdî bû û ji rîçikan ve rakirina dara gelê kurd bû[...]* [6]

Dîsa li cihekî din jî di derbarê derbeya leşkerî û girtina medreseyan de wiha dibêje:

> *Di înqîlaba sala 1980'î de zilmeke zedê li ser gelê kurd çêbû û kudand. Zilm û lêxistin ji tixûb barî. Tenê di Bîngolê de 25 medrese hatin girtin. Pêncî mele rakirin çiyê, dûre bê xêr irza wan şikandin. Feqî belav kirin. Hucre bi neyarê ilm û dîn û exlaqê tijî kirin. Hin ji muderîsan avêtin zîndanan. Tê de hişê xwe wenda kirin. Pirtûkên tefsîr, hedîs û fiqhê jî avêtin bernigan, pê lê kirin. Gel pez û dewarên xwe li çiyayan û çolan, punik û pergalên xwe di gundan de li cih hiştin. Bi dilên kul bi çavên şil bi destên zarokên xwe girtin û terka welat û*

---

[4] Mehmet Bayrak, *Kürtlere Vurulan Kelepçe: Şark Islahat Planı*, Özge Yayınları, Ankara 2009, r. 129-130.
[5] Amir Hasanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil [1918-1985],* wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, weş. Avesta, İstanbul 2005, r. 229-230.
[6] Mela Husnî Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, p.ç. r. 43.

*mesken û mezelên dê û bavên xwe kirin û çûn*.[7]

Di wan şert û mercên dijwar de Mela Husnî gava ku di gundê Kamrûdê melatî dike dîwana xwe dinivîse. Lê gava helbestên xwe dinivîsî di arîka banê mizgeftê de vedişart ku bila kes nebîne û nexwîne. Ji ber ku eger nivîs û helbestên Mela Husnî bihata girtin hem dê medreseya wî bigirtana û hem jî feqiyên wî belav bikirana. Lê dîsa jî hingê Mela Husnî Hezîn gelek caran tê şikayetkirin û tam 103 caran mala wî ji aliyê leşkeran ve tê kontrolkirin.[8] Herwiha piştî derbeya leşkeriya 1980'yî jî medresa wî tê girtin û Mela Husnî jî koçî Stenbolê dike.

[7] Hezîn, *b.n.,* r. 98.

[8] Ev agahiyan ji *Mela Mustefa Agahî* hatine girtin. Mela Mustefa Agahî li cem Mela Husnî xwendiye, li Kamrudê di medreseya wî de feqîtî û muderîsî kiriye. Rastî wan şikayet û demên dijwar hatiye û şahidî kiriye. Yakup Aykaç: "Hevpeyvîn: Mela Mustefa Agahî", 28.03. 2014, Çewlîg.

# BEŞA YEKEMÎN

## JIYAN Û BERHEMÊN HEZÎN

Jiyana Mela Husnî Hezîn a bi ilmê û berhemên wî yên qîmetdar ve têr û tijî hêja ye ku bê zanîn û jê bê îstifadekirin. Me di vê xebata xwe de, di beşa yekem de jiyan û berhemên Hezîn, di bin du binbeşan de vekola. Binbeşa yekem bi giştî di derbarê jiyana Hezîn de ye. Em li vir digel jiyana wî ya giştî, li ser jiyana wî ya medresê û ya ilmî jî rawestiyan. Di perwerdehiya xwe de li kîjan medresê, kîjan gundî, li ber destê kîjan seydayan xwendiye me tespît kirin. Ligel van me behsa melatiya wî û feqiyên wî kirin. Herî dawî me behsa jiyana wî ya tesewifî kir. Me di nivîsîna vê beşê de ji muswedeyên *Bîranînên Seydayê Mela Husnî* û hevpeyvîna ku me bi Hezîn re kiriye, sûd wergirt û çavkaniyên me ev in.[9]

Di binbeşa duyem de jî me hemû berhemên Hezîn dan nasîn. Me li vir çardeh pirtûkên Hezîn yek bi yek hem ji aliyê teknîkê û hem jî ji aliyê naverokê ve nirxandin.

### 1. JIYANA HEZÎN

#### 1.1. Nav û Mexlesa Wî

Di rûpela pêşîn a *Dîwana Hezîn* de bi tîpên erebî wiha dinivîse:

*Dîwana Seydayê Mela Husnî*

*Meşhurê bi leqeba Hezîn*[10]

Wek tê dîtin navê helbestvan *Husnî* ye. Ji ber karê xwe yê melatiyê wek *Mela Husnî* tê nasîn. Ji ber ku gelek suxte û feqî li ber destê wî derbas bûne û bûne mela, navlêka *Seyda* jî lê hatiye zêdekirin.

Seydayê Mela Husnî di helbestên xwe de piranî mexlesa *Hezîn*, kêm caran jî *Husnî* bi kar aniye. Li jêrê em ê ji bo mexlesa yekem bi her sê zimanan mînakek bidin:

Rabe **Ḥezîn** wek bulbulan boy sunbulan zarîn mekey
Rojek digêjî ṣorgulan ger tu bibî her wekî ba (5/12)

[9] Seydayê Mela Husnî muswedeyên ku jiyan, bîranîn û derbarê medreseyên Kurdistanê de nivîsîbû radestî min kir (02.02. 2014, Stenbol). Muswede bi giştî ji 286 rûpelên A4 pêk tê û hêj çap nebûye Di vê muswedeyê de girbûna tîpên nivîsan ji hev cuda ne û di navbera 10 û 16 puntoyan de diguherin. Di nivîsê de gelek xeletî hene. Dû re (11.02.2015) Süleyman Çevik ku li ber destê wî jî heye, ev muswede ji min re bi wordê şand. Min ev rûpela wordê bi tîpên "Times New Roman, 12 punto" guherand. Hingê bîranînên Hezîn bû 160 rûpel. Di jêrenotan de jimareya rûpelan li gorî rûpela word a wê muswedeyê ye. Ji ber ku navê pirtûkê hêj nehatiye danîn, min di jêrenot û çavkaniyên xwe de wek "*Mela Husnî Hezîn, Bîranînên Seydayê Mela Husnî, Pirtûka Çapnebûyî*" nîşan da. Ji bo vê bernameya wordê ji Süleyman Çevik û Huseyn Şemrexî re spasdar im.

[10] Seydayê Mela Husnî, *Dîwana Hezîn*, cih û weşanxane nenivîsiye, r. 2.

Der în deryayê bî payan şudem nîstî xeber ez men
**Ḥezîn** jar e xerabḥal e mededxaz e ji te îro (119/19)

**Ḥezîn**ûn fî feya fî`l yeʾsi meʾyûsûn mine`l-xelqî
Femînke ḍariʿun dewmen îʾleyke lacîûn ya Reb (17/30)

Helbestvan, carnan jî mexlasa *Husnî* bi kar aniye. Bo nimûne:

Bîzarî ket dilber ji te qayîlbûna ġeyran çi ket
Qayîl bibit ẕatê eḥed **Ḥusnî** bi dildaran çi ket (23/16)

Reḥmê key xanim li bengî neynika dil da xuyab
Pur zeman e **Ḥusnî** nêva dozexa hecra te bû (115/26)

Herwiha herdu mexlesa xwe jî hin caran digel hev der biriye:

Wê tirsê leqeb danîye ser **Ḥusnî**, **Ḥezîn**
Der ʿehdê şebabê bûye meḥsûbê ji kalan (91/12)

ʿAlema jîna **Ḥezîn** têk ar û pêtîy û ẓulam
Reḥmê key cana li **Ḥusnî** ev ji yaranê te bû (115/33)

Hin caran jî helbestvan di helbestên xwe de bangî xwe dike, mexlesa xwe bi vî awayî dibêje:

Got, teḥemmul key **Ḥezîno** hey qiyaman ra nişiv
Nik bide ber xu zemankî hey cefayan ra ṣefa (4/11)

Yekbûn dixuyê`j belgê çiqulkan di rezan da
Kun muntebihen ya **Ḥezînu**! qet mebe ġafil (79/9)

### 1.2. Malbata Hezîn

Navê bavê Husnî, Zeynel navê diya wî Hewa ye. Zeynel kurê Sofî Bekir e û di sala 1886'an de li gundê Tûmikê[11] di malbateke dîndar de tê dinê. Zeynel, li gundê Qewmanê di medreseya Şêx Mustefayê Sîsî[12] de heya ku kitêba Muxteserê[13] jî diqedîne, dixwîne.[14]

Hezîn di bîranînên xwe de behsa îcazewergirtina bavê xwe nake. Diyar e ku Zeynel piştî kitêba Muxteserê nexwendiye. Lewma wekî zêdenav "feqî" lê hatiye danîn. Ji ber vê bavê Hezîn, bi navê Feqî Zeynel hatiye nasîn. Hezîn wiha behsa bavê xwe dike:

> *Cenga Cîhanê ya pêşîn û serhildana şêxan ku neçû serî, welat xopan û medrese vala hiştin. Mela qelandin û feqî belav kirin… Feqî Zeynelê Tûmikî… di gundê xwe de hem dixebitî û hem jî li pêşiya gundiyan nimêj dikir. Ji wan re xizmeta dîn û dinyayê pêk dianî.*[15]

Li vir mirov têdigihîje ku Zeynel li gundê xwe melatî kiriye, dersa zarokan daye û xizmeta gundê xwe kiriye. Feqî Zeynelê Tûmikî beriya wefata xwe (k.d. 1949) ji xanima xwe re hosî dike ku Husnî bişîne mala Şêx Hadiyê Qewmanî.[16]

### 1.3. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna Hezîn

Hezîn di sala 1943'yan de li gundê Tûmikê ku nêzîkî Gêxî[17] ya Çewlîgê[18] ye, tê dinê. Di biçûktiya xwe de li cem bavê xwe, Feqî Zeynelê Tûmikî, Quran û Mewlûdê dixwîne. Li gundê xwe diçe ber berxên mala xwe, berxvanî dike û heta şeş saliya xwe li gundê xwe dimîne. Piştî wefata bavê xwe, bi hosiya bavê xwe dike û diçe medreseya Şêx Muhemmed Hadiyê[19] Qewmanî.[20]

---

[11] **Tûmik**: Gundekî girêdayî navçeya Azarpêrta (Adaklı) Çewlîgê ye lê nêzîkî navçeya Gêxî ye. Navê gund bi tirkî Kamışgölü ye. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Tûmik

[12] **Şêx Mustefayê Sîsî**: Di sala 1847'an de li gundê Sîsê yê Lîcê hatiye dinê. Navê wî Mustefa Fewzî ye. Binemala wan ji Hewlêrê hatine Amedê. Perwerdehiya xwe li cem xelîfê Xewsê Hîzanê, Şêx Xalidê Orekî û Şêx Evdirrehmanê Taxî dîtiye. Piştre îcazeya xwe ji Seydayê Muhemmed Hadî (Seydayê Lîcê) wergirtiye. Dûre întîsabê Şêx Evdilqadirê Hîzanî kiriye û bûye xelîfê wî. Di sala 1914'an de li Qewmanê çûye rihma Xwedê û li wir hatiye binaxkirin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî, *Dîwan*, amd. Muhammed Seydaoğlu, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 7-10.

[13] **Kitêba Muxteser**: Muxteserul Me'anî. Yek ji wan pirtûkên dawiyê ye ku di medreseyan de tê xwendin. Piştî vê du pirtûkên din jî hene ku piştî wan êdî xwendina medreseyê xilas dibe.

[14] Mela Husnî Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, p.ç., r. 1.

[15] Hezîn, *b.n.,* r. 5.

[16] Hezîn, *b.n.,* r. 13.

[17] **Gêxî**: Yek ji navçeyên Çewlîgê ye. Bi tirkî nave wê Kiğı ye.
Ji bo agahiyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Gêxî

[18] **Çewlîg**: Yek ji bajarên Bakûrê Kurdistanê ye. Bi tirkî navê wî Bingöl e.
Ji bo agahîyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Çewlîg

[19] **Şêx Muhemmed Hadî**: Di sala 1884'an de li gundê Sîsê yê Lîcê hatiye dinê. Kurê Şêx Mustefayê Sîsî ye. Di pênc-şeş saliya xwe de çavên wî kor dibin û êdî nabîne. Ji ber vê yekê di perwerdehiya medresê de çi kitêb hebe hemû jiber dike. Şêxê Norşînê Şêx Mesûm derbarê wî de "min di jiyana xwe de gelek hafizê Quranê dîtine lêbelê heta niha min hafizê ilmê ji bilî Şêx Muhemmed Hadî ne dîtiye ne jî bihîstiye." gotiye. Ji bilî wî edîbekî mezin bû. Gelek xezel û qesîdeyên wî hene. Bi navê Şêxê Qewmanê namdar bûye. Di sala 1956'an de çûye

### 1.4. Rêwîtiya bo Xwendinê û Xewna Wî

Dayîka Hezîn piştî wefata mêrê xwe Feqî Zeynel, hosiya wî dike. Kurê xwe teslîmî kurapekî wî dike û dişîne medresa Qewmanê. Roja çaran Hezîn û kurapê wî digîjin gundê Qewmanê. Di vê rêwîtiyê de şevekê dibin mêvanê Mele Huseynê Koçetî. Wê şevê Hezîn xewnekê dibîne. Di xewna xwe de li gundê Tûmikê bavê wî Feqî Zeynelê Tûmikî di nav qatek nivînê pir bedew û pak de ye û nexweş e. Dengê lêxistina dêrî tê. Hezîn radibe diçe ber dêrî, dipirse: “Tu kê yî?” Yê li ber dêrî bersiv didê: “Ez Melayê Cizîrî me.” Hezîn dibêje: “Heta ku tu dersekê nedî min, ez dêrî li te venakim.” Melayê Cizîrî dibêje: “Veke, dersekê bidim te.” Hezîn dibêje: “Min derî vekir. Min dît ku Mela mirovekî dirêj e, nûranî ye. Cilên ser wî rengsor in. Kumê wî jî sor e. Li dora wî kefiyeke zer pêçandiye.” Hezîn, di bîranînên xwe de dibêje “Mela û Keko (şikra bavê xwe dike) çi axivîn nayê bîra min, lê ji sureyê Tewbe wekî ders ev du ayet dan min.”[21] Ew herdu ayet ev in:

الَّذِينَ آمَنُواْ وَهَاجَرُواْ وَجَاهَدُواْ فِي سَبِيلِ اللّهِ بِأَمْوَالِهِمْ وَأَنفُسِهِمْ أَعْظَمُ دَرَجَةً عِندَ اللّهِ وَأُوْلَئِكَ هُمُ الْفَائِزُونَ

يُبَشِّرُهُمْ رَبُّهُم بِرَحْمَةٍ مِّنْهُ وَرِضْوَانٍ وَجَنَّاتٍ لَّهُمْ فِيهَا نَعِيمٌ مُّقِيمٌ[22]

#### 1.4.1. Şîroveya Xewnê

Hezîn piştî ku digîje Qewmanê, ji Şêx Muhammed Hadî re behsa xewna xwe dike. Şêx jî wiha şîrove dike: “Înşellah piçek ji eşqa Xwedê ji te re jî bibe nesîb!”[23] Dûre Seydayê Hezîn di bîranînên xwe de ji bo vê xewna xwe wiha dibêje:

> *[...]hem jî dîtina Mela nîşan e, ji qabiliyeta şi’rê re, lewra Mela şa’ir bû. Cilsorî nîşana Neqşebendiyê bû, lewra nîşana nîsbeta terîqa Neqşebendî rengê sor e. Dirêjiya Melê nîşana meziniyê bû. Dersdana ji Quranê nîşana mehareta di Quranê de bû. Ji sureya Beraet/Tewbê nîşana tewbe û vegera bi bal Xwedê ve bû. Piştî borîna zemanan hate zanîn ku Husnî angora xewnê bi rê ve çû û kemala xwe dît.*[24]

---

rihma Xwedê. Tirba wî niha li gundê Qewmanê, li cem bavê xwe ye. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî, *Dîwan*, amd. Muhammed Seydaoğlu, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 23-26.

[20] Mela Husnî Hezîn, *Guldan*, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 4.

[21] Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r. 13-14. û Yakup Aykaç, “Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn”, mp3., 02.02. 2014, Stenbol.

[22] Ew ên ku wan bawerî anî, hîcret kir û di riya Xwedê de bi malên xwe û canên xwe cîhad kirin, li cem Xwedê mertebeya wan mezintir e, ha ew, ên rizgarbûyî bi xwe ne. Xwedayê wan, bi dilovaniyeke ji cem xwe, bi razîbûnekê û bi bihiştên ku di wan de ji wan re ni’metên seraqetî hene, mîzgîniyê dide wan. Sûreyê Tewbe, 20-21. *bnr.* M. Huseyn Êsî û yên din, *Wergera Qurana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2008, r. 190-191

[23] Hezîn, *b.n.,* r. 14.

[24] Hezîn, *b.n.,* r. 15.

### 1.5. Perwerdehiya Hezîn

#### 1.5.1. Gundê Sîsê û Medreseya Qewmanê

Hezîn perwerdehiya xwe ya yekem di sala 1950'yan de li gundê Sîsê[25] cem Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî dibîne. Li zivistanê dest bi xwendinê dike û heta meha gulanê dewam dike. Piştre cardin vedigere tê gundê xwe.[26]

Em dibînin ku Hezîn piştî perwerdehiya cem bavê xwe, perwerdehiya xwe ya yekem li Medresa Qewmanê digire. Hezîn di bîranînên xwe de gelek caran behsa şa'irtiya Şêx Hadî dike, pesnê wî yê edebî dide. Şêx Hadî yekem kes e ku bandor li helbestvaniya Hezîn kiriye. Me bandora Şêx Hadî û nimûneyên wê di binbeşa sêyem a *Wêjevanên ku Bandor li ser Hezîn Kirine* de nirxandiye.

#### 1.5.2. Gundê Muxbêdê û Medreseya Hecî Mesûd

Hezîn piştî Medreseya Qewmanê diçe gundê Muxbêdê[27] û li wir di medreseya Hecî Mesûd[28] de dixwîne. Hezîn di bîranînên xwe de wiha behsa xwendina xwe ya gundê Muxbêdê dike:

> *Ez qederê du salan di medreseya Muxbêdê de mam. Min li wê derê metnê Xayetu'l-Îxtîsar digel şerha wê Ibnu'l Qasim û qismek ji Muherrerê di fiqhê de; Deqaîqu'l-Exbar Durretu'n-nasihîn, Erbe'îna Îbnî Usfûr di we'zê de; Tefsîra Hemamî di tefsîrê de; Meqsûd, Emsîle, Bîna di serfê de, Bostan'ul-Ezhan di hikmetê de bi dîqetek kûr, bi nêrîneke dûr û bi sekinîneke hûr xwendin.*[29]

Piştî du salan Hezîn dixwaze biçe cihekî baştir bixwîne û xwe pêştir bixe. Lewra Hezîn û hevalekî wî biryara çûyîna Medreseya Norşînê didin û bi hev re diçin Norşînê.

#### 1.5.3. Medreseya Norşînê

Rêwitiya Hezîn û hevalê wî tam deh rojan didome. Piştî deh rojan digihîjin gundê Norşînê. Hezîn di Medreseya Norşînê de du salan dimîne û di van du salan de li cem Şêx Mesûm, Şêx Muhyedîn, Şêx Meşuq, Şêx Cuneydê Zubeydê, Mela Elî û Mela Xelîlê Qizilpare

---

[25] **Gundê Sîsê**: Gundekî navçeya Lîcê ya Amedê ye. Bi tirkî navê wî *Yolçatı* ye. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r.14. û http://ku.wikipedia.org/wiki/Sîsê

[26] Hezîn, *b.n.,* r. 23.

[27] **Gundê Muxbêdê**: Muxbêd li raserî hop/benda çemê Gêxiyê ye. Girêdayî Dep (Karakoçan) a Elezîzê ye. Gelê wê derê ji eşîra Zimtêgî ne. Ji eşîretên Dêrsîmê ne. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r. 23.

[28] **Hecî Mesûd**: Hecî Mesûd kurê Şêx Mustefayê Sîsî ye. Di sala 1884'an de li gundê Sîsê tê dinê û di sala 1959'an de li gundê Depê diçe rihma Xwedê û li wir tê veşartin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r. 23.

[29] Hezîn, *b.n.,* r. 24.

dersê dibîne.[30] Tê dîtin ku Hezîn li cem alim û seydayên mezin ders xwendiye, xwe di riya ilmê de gelek êşandiye.

Piştî du salan Hezîn ji Norşînê ji ber sedemên derveyî vediqete û diçe gundê Balekanê. Hezîn veqetîna xwe ya ji Norşînê di bîranînên xwe de wiha tîne zimên:

> *Hikûmetê giraniyeke pir da ser feqiyan û mala Seyda. Armanc nexwînin, cahil bimînin, çav li hev bin, dinyayê nebînin. Xûy û xwendina Îslamî ji bin ve rabe û sernermî tenê rejîma vala û betal re çêbibe. Sibehekê Şêx Mesum hat û derê hucreyê vekir. Bi edayeke tevkeser û axîn got: "Feqîno, hêviyeke min ji we heye, lê ne bi hemdê min, belkî bi zor û giraniya hikûmetê ye. Feqî di mala Seyda de pir bûne. Li ber çavan gir bûne. Eger piçekî sivik nebin dibe ku hucre ji bin ve were girtin. Ez ji feqiyekî re nabêjim tu biçe, lê hin ji we biçin û dema ku dinya xweş bû, dîsa werin. Kar e ji we re jî, ji mala Seyda re jî. Xwedê xebata we bigerîne ji bo xwe." Bi qisawet qetiya û çû. Feqiyên ku wan ji mala Seyda û mala Seyda ji wan hez dikir, ji bo ku ziyan negihîje medrese û mala Seyda, terka Norşînê kirin û belav bûn çûn cem meleyan. Em jî çend hevalên bi havil çûn Balekanê [...]*[31]

Mirov dibîne ku li ser medreseyên kurdan gelek zor hatine kirin. Gelek medrese hatine girtin wek Medreseya Axtepî, yan jî nehîştine ku bila mezin be û pêş bikeve wek Medreseya Norşîn û Miksê.

### 1.5.4. Gundê Balekan

Hezîn, piştî Norşînê diçe Balekanê. Li wir cem Mele Cefer salekî perwerdehiya xwe didomîne û piştre derbasî binxetê dibe.

### 1.5.5. Gundê Tilme'rûf û Medreseya Şêx Ehmedê Xezna/Xeznewî

Hezîn, piştî medreseyên Bakûrê Kurdistanê, derbasî binxet/Rojavayê Kurdistanê dibe û li gundê Tilme'rûfê dibe xwendekarê Medreseya Şêx Ehmedê Xezna. Di medreseya Xezna de dixwîne û ji Şêx Muhemmed Mesûm, Şêx Elauddîn, Şêx Îzeddîn û Şêx Muhemmedê Erebkendî dersan digire. Xwendina xwe ya ilmî li wir, di hivde saliya xwe de diqedîne. Di nozde saliya xwe de, Şêx Elauddîn îcazeya Hezîn dinivîse û didê. Hezîn piştî qedandina

[30] Hezîn, *b.n.,* r. 38 û Hezîn, *Guldan*, r. 4.

[31] **Gundê Balekan**: Gundekî girêdayî navçeya Norşînê ye. Bi tirkî navê wî *Yemişveren* e. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Balekan,_Norşîn û bnr. Hezîn, *b.n.,* r. 43.

xwendina xwe dest bi dersdayînê dike û çar sal tenê dersên feqiyên ku li ser kitêba Camî[32] dixwînin, dide.[33]

Li vir em dibînin ku Hezîn digel ku nû medrese qedandiye jî, dersa feqiyên ku asta wan bilind e dide. Ev jî nîşan dike ku Hezîn di qada xwe de yekî jîr û jêhatî bûye.

Hezîn gava ku li binxetê dixwîne, bênavber heft salan hîç naçe welatê xwe. Piştî heft salan dayika wî reşbelekek jê re dişîne û di vê reşbelekê de hesreta dilê xwe tîne zimên û qet nebe carekî bi saxî dîtina kurê xwe dixwaze. Hezîn jî piştî vê reşbelekê, ji seydayê xwe Şêx Elauddîn destûr dixwaze û di sala 1961'an de vedigere gundê xwe, ango gundê Tûmikê.[34]

### 1.6. Gundê Tûmikê û Leşkeriya Wî

Hezîn, piştî vegerîna xwe ya welêt, li gundê xwe dimîne û dest bi dersdayîna feqiyan dike. Li gundê Tûmikê bi feqiyan re du salan dersên xwe didomîne û dû re ji bo leşkeriya xwe di sala 1963'an de diçe Stenbolê.

Hezîn di bîranînên xwe de dibêje ku "gava min leşkeriya xwe dikir (1963-1965) min tirkî pir kêm dizanîbû, heta min nedikarî çend hevokên tirkî saz bikira. Lê di fêmkirina xeberdana tirkî û xwendin-nivîsandinê de baş bûm. Min di leşkeriya xwe de rojnameyên tirkî pir dixwendin."[35]

Dûre em dibînin ku Hezîn bi vê tirkiya xwe çar pirtûk dinivîse. Hezîn di bîranînên xwe de behsa kurdên Stenbolê yên wê demê dike û rewşa wan a xirab tîne zimên. Sedema vê rewşê bi du tiştan dinirxîne; ya yekem bêdewletiya kurdan ya duyem jî nexwendina gelê kurd. Wek çare jî xwendinê pêşniyar dike.[36]

### 1.7. Serdema Melatiya Hezîn

#### 1.7.1. Li Gundê Kamrûda Jor (1966-1987)

[32] **Camî**: Molla Camî. Di perwerdehiya medreseyê de yek ji wan pirtûkên dawiyê ye. Pirtûkeke gelek girîng û giran e. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. M. Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencâmı*, weş. Beyan, İstanbul 2009, r. 46-70.
[33] Hezîn, *b.n.,* r. 49.
[34] Hezîn, *b.n.,* r. 68- 69.
[35] Hezîn, *b.n.,* r. 81.
[36] Hezîn, *b.n.,* r. 83-84.

Hezîn, piştî vegera xwe ya leşkerî tê welatê xwe û dûre diçe gundê Kamrûdê.[37] Li wir dest bi melatiyê dike. Hezîn li Kamrûdê ji aliyekî ve melatî dike û we'za dide, ji aliyekî ve dersa feqiyan dide û aliyekî din jî bi nivîsîna pirtûkên xwe ve mijûl dibe. Pirtûkên xwe yên *Mîratu'l-Heqaîq we'l-Esrar*, *Dîwana Hezîn* û *Guldan* hingê dinivîse.

Hezîn, li Kamrûdê du komele dadimezirîne. Bi komeleya yekem; rê, kanî, mizgeft, binkeya tenduristiyê, dibistina destpêkî ya zarokan û dersxaneya dirûn û çînkirinê ava dikin. Bi komeleya duyem jî dibistana navîn ava dikin. Bi saya wan xebatên komeleyê, zarokên Kamrûda jêr û jor û gundên derdorê dest bi xwendinê dikin. Seydayê Hezîn wiha behsa vê rewşê dike:

> *Di gund de li hêlekê feqî û mizgeft û li hêlekê dersxane û telebe çêbûn. Bi awayekî ku gund bû ciyê xwendinê, şarezatî û zanînê. Bû şana xêr, bêr û hereket û bereketê. Li hêlekê dîn û exlaq, li hêlekê xwendin û zanîn çêbû. Li hêlekê zikr, fikir û îbadet, li hêlekê çavnasî, hevgirtin, hevalîkirin û xebat çêbû. Zarok li xerîbiyê fere bûn, pere bi dest wan ketin. Direktor, mînîbus, otobus girtin û xistin rêyên dirêj û kurt. Pêş de çûn û bûn nimûneya qenciyê ji derdora xwe re.*[38]

### 1.7.2. Medreseya Hezîn û Feqiyên Wî

Di sala 1966'an de Komara Tirkiyê zagonek derdixe û ji bo melayan kadro dide. Hingê ji Hezîn re jî pêşniyar dikin lê ew kadroya melatî ya fermî qebûl nake. Lewra wisa difikire ku girêdana bi wezîfeyan sedema sistahiya îrşad û belavkirina ilm û dersdana feqiyan e.[39]

Hezîn li gundê Kamrûdê li ber melatiya xwe, di medreseya xwe de ders jî dide. Gelek feqî li ber destê wî dixwînin û dibin mela. Hezîn navê wan wiha nivîsîye: Mele Îbrahîmê Mûşiyê Muderîs, Mele Îbrahîmê Xelaniyê Waîz, Mele Ebdurehîmê Terbesanî, Mele Şîrîn, Mele Xalidê Perxengukî, Mele Qasimê Vasenî, Mele Muhemmed Zahid, Mele Muhemmed, Mele Muhemmed Rayîf, Mele Mustefayê Perxengukî, Şehabeddînê Çanî, Mele Elî, Mele Îsmet û Hecî Kemalê Hoçî.[40]

### 1.7.3. Derbeya Leşkerî ya 1980'yan û Girtina Medreseyên Kurdan

[37] **Kamrûd**: Kamrûd yan jî Karmuruna Jor. Gundekî girêdayî navçeya Azarpêrta bi ser Çewlîgê ye. Bi tirkî Hasbağlar Köyü. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Karmuruna_Jor

[38] Hezîn, *b.n.,* r. 94.

[39] Hezîn, *b.n.,* r. 88.

[40] Hezîn, *b.n.,* r. 87.

Di derbeya leşkerî ya 1980'yan de zor û zexta li ser medrese û gelê kurd her diçe zêde dibe. Seydayê Hezîn du salan pirtûkên xwe di axûr û afirên heywanan de vedişêre. Medrese tê girtin û feqî jî belav dibin. Li ber destê wî xêncî Quranê tu kitêb namîne. Tade û zora wê demê di bîranînên xwe de wiha dinivîse:

> *Di înqilaba sala 1980'yî de zilmeke zedê li ser gelê kurd çêbû û kudand. Tenê di Bîngolê de 25 medrese hatin girtin. 50 mele rakirin çiyê, dûre bê xêr riza wan şikandin. Feqî belav kirin... Lewra pirtûkên bi xetên erebî wekî afyon û esrarê bûn... Hucre bi neyarê ilm û dîn û exlaqê tijî kirin. Hin ji muderîsan avêtin zîndanan. Tê de hişê xwe wenda kirin. Pirtûkên tefsîr, hedîs û fiqhê jî avêtin ber nigan, pê lê kirin.*[41]

#### 1.7.3.1. Sedema Çûyîna Stenbolê

Hezîn di wê rewşa aloz de êdî nikare xizmeta dersdayîn û melatiyê bike. Zor û zextên li medrese û kurdan her diçe girantir dibe. Ji ber van sedeman bi pêşniyara Şêx Îzedînê Xezna di sala 1987'an de diçe Stenbolê bicih dibe.[42]

### 1.7.4. Jiyana Stenbolê û Li Stenbolê Medreseyeke Kurdistanî

Hezîn li Stenbolê navçeya Ümraniyê, di mizgefta Îmamê Şafi'î de dest bi karê xwe yê fermî dike. Hezîn li vir jî feqiyên xwe belav nake û bi rê û rêbaza perwerdehiya medreseyên Kurdistanê dersên xwe didomîne.[43] Di sala 2000'an de li Stenbolê teqawid dibe.

Hezîn he jî li Stenbolê dijî. Digel temenê xwe yê mezin li mizgeftan suhbet dike û we'zan dide. Li malê pirtûkan dinivîse.[44] A niha li mala xwe dersên akademîsyenên zaningehan dide, pirtûk û helbestan dinivîse.

## 1.8. Jiyana Hezîn ya Edebî

### 1.8.1. Kengê Dest bi Nivîsînê Kir?

Hezîn, di bîranînên xwe de dibêje ku gava 17 salî bûye dest bi nivîsînê kiriye. Hingê du pirtûk dinivîse. Ya yekem di ilmê erûza helbestan de *Er-rîsaletu'l-Erûdîyye*[45] û ya duyem jî

---

[41] Hezîn, *b.n,* r. 99.
[42] Hezîn, *b.n.,* r. 104.
[43] Hezîn, *b.n.,* r. 106.
[44] Hezîn, *b.n.,* r. 146.
[45] **Er-rîsaletu'l-Erûdîyye**: Yek ji pirtûka Hezîn e ku li ser behr û weznên helbestan, bi erebî hatiye nivîsandin. Nêzî 20 rûpel bûye. Dûre wenda bûye. Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02.2014, Stenbol.

di ilmê Mustelehu'l-Hedîsê de *El-Baqetu'r-Raqîe*[46] ye. Dûre herdu pirtûk wenda dibin.[47]

Li vir em dibînin ku Hezîn yekî jêhatî ye û meyla wî li ser xwendin û nivîsandinê heye. Hêj di hivde saliya xwe de du pirtûkên erebî nivîsîne. Ya balkêş ev e ku, yek ji wan pirtûkan ser helbestê ye. Mirov têdigihîje ku Hezîn hêj di dema ciwaniya xwe de li ser helbestên klasîk xebitiye.

#### 1.8.2. Jibera Hezîn û Evîna Helbestan di Dilê Wî de

Hezîn di bîranînên xwe de behsa jiberên xwe jî dike. Çi kitêb çi helbest be, hemûyan wiha dinivîsîne:

> *'Izzî, 'Ewamil, Zurûf, Terkîb, Munî digel şî'rên Şerhu'l-Muxnî, Qewa'îd digel şî'rên Hellê, Elfî digel 957 şî'rê Siyutî, Rîsaleya Xaqanîye, Banet Suadû, Qesîdeyên Kurdî, Luccetu'l-Esrar, gelek ji dîbaceya qamusa Fêrûz Abadî, gelek ji Meqamata Herîrî, Şafiya Serfê, 'Îsaxûcîya Mele Xelîl, Ebû Bekreyn, pirê şî'rên Dîwana Melayê Cizîrî, pirê şî'rên Dîwana Hafiz, pirê şî'rên Muelleqat û Dîwana Îbnu'l Faridî, Menhec ji Babê Bey'an, Feraîda Şêx Elauddîn û gelek ji Qur'ana Kerîm.*[48]

Wek tê dîtin, Hezîn di perwerdehiya xwe de feqiyekî gelek jîr û jêhatî bûye. Jixwe ji jiberên wî jî bi zelalî dixuye ku Hezîn ji helbestan gelek hez dike. Herwiha di bîranînên xwe de gelek caran behsa serpêhatiyên xwe yên xwendina helbestan, pêşbaziyên helbestan dike.

### 1.9. Rêya Tesewif û Terîqetê

#### 1.9.1. Seyr û Sulûka Wî

Hezîn, cara yekem li cem Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî dikeve rêya terîqetê û ew ji xwe re şêx qebûl dike. Piştre ji bo xwendinê tê Tilme'rûfê û li wir întîsabê Şêx Muhemmed Mesûmê Xezna dike. Piştî wefata Şêx Muhemmed Mesûm (k.d. 1958) întîsabê birayê wî Şêx Elauddîn dike. Li cem Şêx Elauddîn perwerdehiya terîqa Neqşîbendiyê digire. Hezîn di bîranînên xwe de wiha behsa Şêx Elauddîn dike:

> *Me çawa ji Şêx Elauddîn (qs.) pirê ilmê xwe yê zahirî girt, wisa me pê re merîfet û zanîna xwe ya batinî jî girt. Wî zemanî salên me di nav nozde û bîstan de bûn. Hemd ji Xwedê re be*

---

[46] **El-Baqetu'r-Raqîe**: Pirtûkeke li ser tesnîfkirina hedîsan bûye. Hezîn di wir de hedîsan wek meqbûl, merdûd, mutewatir, ehed û hwd. senifandine. Kêm zêde 20 rûpel bûye. Wekî Er-Rîsaletu'l-Erûdiye bi erebî hatiye nivîsîn lê wenda bûye. Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02.2014, Stenbol.

[47] Hezîn, *b.n.,* r. 146.

[48] Hezîn, *b.n.,* r. 42. Ji bo agahiyên berfireh (naveroka van pirtûkan, rêbaza xwendina van, rêza pirtûkan û nivîskarê van) bnr. Mela Birhanê Tarînî, *Medrese Ji Her Aliyî ve Medreseyên Me*, weş. Şîn, Ankara 2011, r. 97-107. û Çiçek, *b.n.*, r. 46-70.

*ku di çaxa xwendinê de ajnêkirina di avşîna ilmê de û gera di gulzara terîqê de her du jî di biçûkiyê de bi dest me ve hatin ku ev ji kêm mirovan re muyesser bûye.*[49]

Dîsa di perwerdehiya terîqî de behsa xwendina kitêbên ku di seyr û sulûka xwe de xwendiye, dike:

> *Min ji xwe re Mînhaca Îmamê Newewî (ra.) bijart. Dûre wî [Şêx Elauddîn] bi destên xwe yê pîroz kitêba Hedaîqê da min û got: "Bi dîqet bixwîne!" Min Hedaîq xwend û bi menaqibê –hal û tevgerên- sadat û weliyan gelek çêbûm. Hela menaqibê Ebû Yezîdê Bestamî, Cuneydê Bexdadî, Ceferê Sadiq, Şahê Neqşîbend, Îmamê Rebbanî û Mewlana Xalid tesîreke pir li min kirin. Dûre bi xwendina Şemaîla Tirmizî emr kir û got: "Hûr û kûr bixwîne. Di her hal û karên xwe de Resulê Ekrem (asw.) ji xwe re peyrew bigerîne, bi awaniyek ku bêhna pêxember ji te û tevgerê te were*.[50]

Li vir em dibînin ku Hezîn herî zêde di bin bandora Şêx Elauddînê Xezna de dimîne û her tim vê yekê diyar dike. Hezîn, piştî wefata Şêx Elauddîn, vê carê jî întîsabê Şêx Îzedînê Xezna dike.

### 1.9.2. Xelîfetiya Neqşîbendîtiyê

Şêx Îzedîn beriya wefata xwe hosiya xwe dinivîse û radestî muderrîsê medresê Mele Evdila dike û piştî mirina xwe, vekirina wê hosiyê emir dike.

Di sala 1992'an de piştî wefata Şêx Îzedîn, ev hosî tê vekirin. Tê de navên ew kesên ku ji xwe re wek xelîfe qebûl kirine dinivîse. Di wê hosiyê de digel navê *Mele Husnî Bîngolî* navên Şêx Muhemmed Xeznewî, Mele Xalib Estilî, Mele Ubeydullah Elazixî û Mele Ehmed Miftiyê Şefaetlî jî derbas dibin. Di bîranînên xwe de jî vê yekê wiha der dibe:

> *Çendan em ne babet in, lê hediya mezinan, hela piştî mirina bi hosiyê, tu carî nayê zivirandin. Xwedayê mezin bike ku em vî barî hilgirin. Lewra emrê terîqetê li ser îstîqameta şerîetê hatiye çêkirin. Ew jî –hela di vî zemanî de– bi destê tazî ji rêşkirina çiqulkên şîlanê zehmetir e.*[51]

Hezîn, ji sala 1992'an heta roja îro xizmeta xelîfetiya xwe li Stenbolê didomîne.

### 1.10. Seyahetên Wî

Gava ku em li jiyana Hezîn dinêrin, ew li gelek cihan jiyaye û li wan deran di medreseyan de xwendiye. Bi giştî em dikarin bibêjin ku Hezîn di dema feqîtiya xwe de hemû Bakûr û Rojavayê Kurdistanê dîtiye. Dîsa em di bîranînên wî de dibînin ku di dema xwendina

[49] Hezîn, *b.n.,* r. 61.
[50] Hezîn, *b.n.,* r. 65.
[51] Hezîn, *b.n.,* r. 125.

xwe ya Tilme’rûfê de bi Şêx Elauddîn re diçe deşta Şengalê ango herêma Badînanê li Başûrê Kurdistanê.

Piştî dest bi melatiya xwe dike di bîranînên xwe de jî behs dike ku diçe umrê û hecê jî. Herwiha piştî ku li Stenbolê bicih dibe, fersenda çûyina Qazakîstan, Ozbekîstan (Semerqend û Buxara), Sûdan, Rojhilatê Kurdistanê (Xoy, Mehebad, Urmiye, Senendec, Merîwan, Hemedan), Swêd, Denîmarka, Elmanya û Holandayê dibîne.[52]

Jixwe gava ku mirov berhemên Hezîn yên kurdî dixwîne hingê dibîne ku ji her herêmên Kurdistanê peyv û gotin hene ku wan, dewlemendiyek mezin dane berhemên wî. Digel van, Hezîn ji bo ku cih û warê mezinên tesewifê bibîne, dewletên Asyayê ziyaret kiriye. Herwiha ji bo îrşad û dîtina misilmanan çûye dewletên Ewropayê jî.

## 2. BERHEMÊN HEZÎN

Hezîn bi sê zimanan berhemên cuda nivîsîne. Ji bo ku danasîna van berheman bi rêkûpêk be, êm ê van berheman li gorî zimanên wan di bin sê serenavan de binirxînin.

### 2.1. Berhemên Wî yên Erebî

#### 2.1.1. Mewahibu‘r-Rehman Fî Tefsîri Sûret El-Insan[53]

Ev berhem di sala 1998‘an de ji weşanên Erkam derketiye û li Stenbolê çap bûye. Berhem bi tevahî 128 rûpel e. Hedîsên di vê pirtûkê de cih digirin ji aliye Nusrettin Bolelli ve hatiye derkirin.

Hezîn, di destpêka pirtûka xwe de nîşan dike ku di çaxê xortaniya xwe de sûreyê Însan bala wî kişandiye û bi têgihiştina wê, şirovekirina bêje, wate û mebestên wê ve mijûl bûye. Dûre sê pêşgotinan berçav dike:

1- Nerînên cûrbicûr ên sedema hinartina sûreyê, yê ku ji bo wî daket û cihê daketinê.
2- Qedir û qîmetdayîna Xweda ji mirov re; ji aliyê kêsim û mejiyê wî, û sergirtina wî di ser hemû jîndaran re.
3- Giringiya gotina “E‘uzû billahî teala”, hukmên wê û rola wê di xwesipartina Xwedê de; jê xwestina alîkariyê û baweriya bi şiyana wî.

Dûre ayetên sûreyê Însan ku bi giştî 30 ayet e, bi berfirehî şirove dike, hizr û boçûna wan, armancên wan rave dike û wan ji aliyê rêziman û rewanbêjiyê ve analîz dike. Arastekirin

[52] Ji bo van bajar û dewletan bnr. Mela Husnî Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, p.ç.
[53] Em dikarin navê vê berhemê wek “Behreyê Yezdanê dilovan di şirovekirina sûreyê Însan de” wergerînin.

û hukmên olî û rewayî bi firehî ji hev derdixe, ew jî bi van mijaran ve girêdayî ye; afirandina mirov, roja qiyametê, xelatkirin û sezakirin, rewakirina zekatê, nandana jaran, sezaya qencan, û sebr û aramiya di tengasiyan de û hwd. Hezîn xwe dispêre rêbazeke hişmend û şahidan ji Quranê tîne û carna jî helbestên sûdmend nivîsine. Şirovekirina wî yên ayetan xurtbûna analîza hûrbîna wî derdixe pêş û wateyên veşartî jî derdixe holê.

### 2.1.2. El-Mewahib[54]

Ev pirtûk di sala 2000'an de li Stenbolê hatiye çapkirin û bi tevahî 130 rûpel e. Di pêşgotina xwe de nîşan dike ku Hezîn di sala 1992'an de li gundê Tilm'erûfê, bi amajeyekê ji şêxê xwe Şêx Izeddînê Xeznewî dest bi nivîsandina pirtûka xwe kiriye, dûre rawestiyaye. Piştre dîsa di sala 1996'an berdewam kiriye û di sala 2000'an de bidawî kiriye.

Di pirtûkê de 35 mijarên bawermendiyê bi gotarên kurt berçav dike û wan dinirxîne. Ew mijar jî ev in: bawerî, çavdêrî, zanist, awa, sinc, lava, rêje û zêdebûn, delîvedîtin, arastekirin, spasî, perestî, dexse, xiyanet, emanet, hezkirin, xwespartin, karîn/şiyan, çarenûs/qeder, mejî, pêwîstiya zanîn, pendiya pîrbûnê, yê bextiyar û yê xemgîn, danûstendin û guftûgo, hevbendî, bîranîn, ronahî, nêt, şopandina sinnetan, xweşikbûn/spehîbûn, parastina giyan, azadî, nêzîkbûn, koletî.

Nivîskar di analîz û derkirina ramanên xwe de pir jêhatî ye, bi hûrbînî di zanistê mentiq û prensîbên tesewifê de têgihiştî ye. Van tiştan bi zanebûn di şirovekirina ayet û hedîsan de bikar tîne. Şêweyê derbirînê li ba nivîskar xurt e. Nijandina ramanên xwe bi zanebûn pêk tîne û bi hesanî digihîne xwendevanan. Gelek malik helbest wek piştgiriyekê ji nerînên xwe re anîne.

### 2.1.3. Miratu'l-Heqa'îq We'l-Esrar[55]

Ev berhem ji 424 rûpelan pêk tê. Cih û dîroka çapê nediyar e lê Hezîn 1993'an de nivîsandina vê pirtûkê temam kiriye. Amadekariya pirtûkê Selaheddîn Şemsanî kiriye û di destpêkê de jî kurtejiyana Hezîn nivîsiye.

Nivîskar di berhema xwe de li ser mijarên cûrbicûr dipeyive, ayetan şirove dike, mijarên felsefî numayiş dike. Felsefeya Marksîzmê û Îslamê dide berhev û ji wan re delîlên eqlî tîne. Ji bilî van, hin mijarên bi sûd di jiyana rojane de digihîne bawermendan, weha jî di

[54] Mewahib peyveke erebî ye û bi wateya "dayînên Xwedê, ew tiştê ku Xwedê ji mirov re dayê. Wateya din jî hobî, tiştên ku mirov gava wî karî dike kêfa wî/ê tê û hercar wî tiştî dike. Bi soranî behr dibêjin."

[55] Neynika Rastî û Razan

mijarên tesewifê de diaxive. Hemî kurtegotarên nerînên nivîskar di mijarên jiyana rojane de ne û hin teorî jî hatine diyarkirin.

Nivîskar di honandina vê de rêbazeke zanistî bikar aniye. Berê şahid û mînakên xwe radixîne piştre encamdan û ibretan jê werdigire. Bi riya wan gotaran, nîqaşa zanyarên misilman û ne misilman dike. Ramanên xwe bi erebiyeke fesîh, rewa û spehî tîne zimên.

### 2.2. Berhemên Wî yên Tirkî

#### 2.2.1. Hanımlara Rehber[56]

Pirtûk 180 rûpel e û navê weşanxaneyê nehatiye nivîsandin. Pirtûk ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de mijarên sereke ev in: Cihê jinan di dînê Îslamê de çi ye, pîroziya jinan, cihê jinan di civakê de, xwe nixumandina jinê û hwd. Di beşa duyem de jî mafên jinê ên li ser mêrê wê, sifetên jinên baş çi ne, li gorî sûreya Ehzebê divê jin çawa bibin û hwd. hatine ravekirin. Digel van di pirtûkê de behsa zîna, zerara wê û xesara wê ya ku dide malbat û civakê bi awayekî berfireh hatiye şîrovekirin. Dûre behsa nexweşiyên ku ji zînayê çêdibe û belav dibe, dike. Ji dewletên Ewropa û Emerîkayê mînakan tîne û bi îstatîstîkan angaşta xwe teyîd dike.

Nivîskar, bersiva mijarên xwe spartiye ayet û hedîsan. Ji bilî vê, gelek caran ji heyata sehebiyan mînakan dide û mijara xwe bi vegotineke fesîh der dibe. Her wiha zimanê pirtûkê gelek caran bi awayekî şîretî dest pê dike. Bo nimûne, dibêje: Ey xwişka min (r. 35), ey xwişka min a misilman (r. 67) û hwd. Digel van, di pirtûkê de şibandinên gelek cuda û resen hene ku mirov bandora helbestvaniya Hezîn li vir dibîne.

#### 2.2.2. Külliyat-ı Suğra[57]

Külliyat-ı Suğra ji 299 rûpelan pêk tê û di 2012'an de li Stenbolê di weşanxaneya Asitan de çap bûye. Edîtorê wê Ahmed Nabi Güzel e. Pirtûk ji pênc beşan pêk tê. Beşa yekem eqaîd e ku derbarê îlahiyat û pêxembertî de agahiyên giştî hene. Beşa duyem mewahib e ku di vê beşê de mijara îman, ilim, terîqet, exlaq, irşad, muhebbet, teslîm, rabita, zikir û hwd. hene ku di mijarên tesewifê de jî sir û heqîqetên terîqetê yek bi yek hatine ravekirin. Beşa sêyem tesewif e. Beşa çaremîn di derbarê jiyana Şêx Îzeddînê Xeznewî de ye. Beşa pêncem jî dîsa gotin û suhbetên Şêx Îzeddînê Xeznewî ne.

[56] Rêber bo Jinan
[57] Kuliyata Biçûk

Di vê pirtûkê de beşa duyem wergera pirtûka Mewahîb a Hezîn e. Hezîn ev pirtûka xwe bi zimanê erebî nivîsiye, wergera vê jî bi xwe kiriye. Hezîn, ev beşa bi hosiya şêxê xwe, Şêx Îzeddînê Xeznewî nivîsiye.[58] Beşa tesewifê jî ji aliyê Hezîn ve rasterast bi tirkî hatiye nivîsandin.

Hezîn di vê pirtûkê de piranî li ser tesewifê sekiniye. Mijar û xalên tesewifê bi hûrgilî rave kirine. Dîsa wek terza xwe mijarên xwe spartiye ayet û hedîsan û ew rave kirine û carnan jî bi helbestên biçûk ve mijar dawî kirine.

### 2.2.3. Külliyat-ı Vusta[59]

Külliyat-ı Vusta yek ji wan pirtûkên Hezîn yên tirkî ye ku 303 rûpel e û di sala 2010'an de li Stenbolê hatiye çapkirin. Di vê pirtûkê de sê mijarên sereke merîfet, heqîqet û hikmet in. Herwiha ji jiyana Hz. Luqman û kurê wî, Hz. Mûsa û Hz. Xidir, ji bo xaniman ji Hz. Meryem mînakan dide. Mirîdek çawa ji murşîdê xwe sûd werdigire, divê çawa bike, çawa tevbigere û hwd. behsa mijarên tesewifî dike, û ji hal û tevgerên murşîdê xwe ango Şêx Îzeddînê Xeznewî (qs.) mînakan dide. Dîsa bi mijarên cûrbicûr ve ji her çar xelîfeyan mînakan tîne û rave dike. Herwiha mînak û mijarên xwe bi ayet û hedîsan ve xurtir dike.

Dîsa mirov dikare bibêje ku zimanê pirtûkê gelek sivik û rewan e. Uslûba Hezîn ya tesewifî xwe eşkere dike. Hezîn, gelek caran mijara xwe bi helbestekî ve xilas kiriye. Dîsa helbestên wî, ji aliyê şiklî ve wekî helbestên klasîk in û bi zimanekî sade hatiye nivîsîn. Li jêrê em ê mînakek ji helbestên wî yên tirkî bidin:

*Uzun yolda yürüyen hiç murad menziline varmaz*
*Yavaş yavaş giden yolcu yürümekten geri kalmaz*
*Murad önünde sahrayı geçebilmek için yolcu*
*Ne tez yürü ne çok yavaş, kural budur diğer olmaz*.[60]

### 2.2.4. Külliyat-ı Kübra[61]

Di nav kuliyatê de pirtûka herî mezin e û ji kuliyatê ya dawî ye. Ev berhema li ber çapê ye û nimûneyên wê li ber destê me tuneye. Mijarên vê berhemê jî di derbarê dîn û tesewifê de ne.[62]

---

58 El-Hazîn Hüsnü Geçer, *Külliyat-ı Suğra*, weş. Asitane Kitabevi, İstanbul 2012, r. 5 û 182.
59 Kuliyata Navîn
60 El-Hazîn Hüsnü Geçer, *Külliyat-ı Vusta*, weşanxane nîne, İstanbul 2010, r. 172.
61 Kuliyata Mezîn
62 Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.

### 2.3. Berhemên Wî yên Kurdî

#### 2.3.1. Kûlxaniya Veşartî[63]

Ev pirtûk di sala 2007'an de di nav weşanên Nûbiharê de bi tîpên erebî derçûye. Amedakariya çapê û editoriya wê Ebdusselam Bêcirmanî kiriye ku pirtûk bi tevahî 85 rûpel e.

Di vê pirtûkê de Hezîn, hinek behsa jiyana Şêx Mustefayê Sîsî û Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî kiriye. Dîsa di derbarê wan de çend bîranînên xwe nivîsine. Herwiha 10 qesîdeyên Hezîn û qesîdeyên cûrbicûr yên ku sofî û murîdên Şêx Mustefayê Sîsî û Şêx Muhemmed Hadî de gotine, nivîsîne.

Pirtûk bi kurdîyeke gelek sade û rewan hatiye nivîsandin. Wekî di pêşgotina vê de jî hatiye gotin ku pirtûk mîna guldesteyeke qesîdeyên kurdî ye.[64]

#### 2.3.2. Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edebê

Ev pirtûk jî di sala 2007'an de ji weşanên Nûbiharê bi tîpên erebî derketiye. Pirtûk bi giştî 276 rûpel e, pexşan e û ji bo çapê Ebdusselam Bêcirmanî amedekariya wê kiriye.

Pirtûk ji çar beşan pêk tê. Beşa yekem eqîdeya îmanê ye. Beşa duyem di derbarê navên Xwedê de ye ku Esmau'l-Husna, ango navên Xwedê yek bi yek hatine ravekirin. Beşa sêyem edeb û xwastina fitretê ye. Di vê beşê de têkiliya mêr û jinan, terbiyeya zarokan, têkiliya seyda û feqiyan û hwd. mijara vê beşê pêk aniye. Herwiha beşa çarem di derbarê we'zê de ye. Di vê beşê de jî mijarên cûrbicûr yên di derbarê exlaq, edeb û tesewifê de cî digirin.

Hezîn, dîsa bi şêweya xwe ya xweser ev pirtûk nivîsiye ku gelek caran bi helbestên xwe ve mijara xwe xemilandiye.

#### 2.3.3. Reng û Rûyê Peyxember

Ev berhem di sala 2009'an de ji weşanên Nûbiharê derketiye. Amadekariya pirtûkê dîsa Ebdusselam Bêcirmanî kiriye. Berhem bi tevahî 269 rûpel e û bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Pirtûk behsa dirûva Hz. Pêxember (asw.) dike. Bi giştî mijarên pirtûkê ev in: reng û rûyê pêxember, mohra pêxember, xweşiya bêhna wî, kena wî, axaftina wî, xwarin û vexwarina wî, kincên wî, destmêjgirtina wî, nimêj û sinnetên wî û hwd.

---

[63] Gencîneya Veşartî

[64] Mela Husnî Hezîn, *Kûlxaniya Veşartî*, weş. Nûbihar 2007, r. 5-6

Hezîn ji ayetan gelek sûd wergirtiye û pirtûka xwe bi gotin û riwayetên sehabiyan xurtir kiriye. Ev berhema xwe jî bi heman şêweyî nivîsiye, ango gelek caran bi helbestên biçûk ve mijara xwe qedandiye. Di dawiya vê berhemê de jî Hezîn wekî şîretname ji bo xortan helbestek nivîsiye û derbarê şaşbûna veqetîna ji rêya pêxember de ew şîret kirine. Ev helbest di dîwana Hezîn de cî nagirin.

### 2.3.4. Fiqha Şafi'î

Ev berhem bi tevahî 378 rûpel e û bi tîpên erebî hatiye nivîsîn. Sala çapê û weşanxane ne diyar in. Lê Hezîn, di dawiya berhemê de, di derbarê xilaskirina vê pirtûkê de wiha nivîsiye: "… me dawî li vê nivîsandinê anî di tarîxa 10/09/2005'an a miladî, li qezaya Umraniye ji Stenbola binav…"[65]

Mijarên berhemê fiqha şafi'î ye. Di binbeşên pirtûkê de jî mijarên wek paqijî, gemarî, îctîhat, destmêj, şertên destmêjê, adabên mizgeftê, xusl, teyemim, ferzbûna nimêjê li ser çi kesan, bangdan/azan, nimêj, şertên nimêje, ferz ê sinnetên wê, nimêja înê, kefenkirina miriyan, defna miriyan, zekat, şertên zekatê, rojî, ferzbûna rojî, hec û umre, ferz û wacîbên hecê û hwd. hene. Di vê pirtûkê de qet helbest tuneye û tenê pexşankî hatiye nivîsandin.

### 2.3.5. Guldan

Ev pirtûk di sala 2007'an de ji weşanên Nûbiharê derketiye. Herwiha di sala 2011'an de jî dîsa ji weşanên Nûbiharê çapa duyem derketiye. Edîtorê wê Süleyman Çevik e û bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Berhem bi tevahî 216 rûpel e. Hezîn ev pirtûka xwe li gundê Kamrûda Jorîn ku li wê derê melatî kiriye, di sala 1979'an de nivîsiye û xilas kiriye.[66] Di helbesteke xwe de vê yekê wiha der dibe:

*Hezar û çarsedê hicrî da ev pirtûka nûranî*
*Me çêkir bo bibe karek hêja bo navê insanî*

Di pêşgotinê de jî wiha dinivîse: "… ev çend pelên ku hatine nivîsandin bi zimanê kurdî ji bo ronîbûna dilan, hedana ruhan, tûjbûna hişan, dîtina rêya rast, rindiya xûyan û paqijiya der û hundiran… çandin ji me yê belengazê nexweş, çinandin ji gelê kurd ê pak û çak

[65] Husnî Geçer El Hezîn, *Fiqha Şafi'î*, weşanxane û cih nîne.
[66] Mela Husnî Hezîn, *Guldan*, weş. Nûbihar, Stenbol 2007, r. 210.

e.”[67] Li vir mirov têdigihîje ku nivîskar bi zanebûn bi zimanê kurdî nivîsiye û ev yek diyar kiriye.

Guldan, ji çîrok û qewlikên kurt pêk tên. Çîrokên berhemê watedar in û ji bo ku mirov jê dersek bigire hatine vegotin. Herwiha Hezîn çîrokên xwe bi gotinên pêşiyan, biwêj û helbestên xwe ve xemilandine. Mirov dikare bibêje ku Guldan bi kurdiyeke herikbar hatiye nivîsandin, berhemeke dîdaktîk e û nivîskar herdem dixwaze şîretê li xwendevanên xwe bike.

### 2.3.6. Bîranînên Seydayê Mela Husnî

Ev pirtûk li ber destê me wekî muswedde heye. Bi programa wordê di forma A4ê de 160 rûpel e û bi tîpên latînî hatiye nivîsandin û hê çap nebûye. Hezîn di dawiya berhemê de wiha nivîsiye: “… şikur ji Xwedê re temamkirina pirtûkê di 25.12.2010’an de li Stenbolê temam bû.”[68]

Di vê berhemê de mijara sereke jiyana Mela Husnî ye. Hezîn, di vê pirtûkê de yek bi yek jiyana xwe vegotiye. Malbata wî çawa ye, kî ne, li ku derê xwendiye, medrese û gundên ku lê maye, leşkeriya xwe û hwd. Pirtûk ji bilî van, wekî çavdêrvanekî dewra xwe behsa gelek tiştan dike. Wek mînak, di salên 1960’an de rewşa Kurdistana Bakur, gelê wê derê, medreseyên kurdî, medreseya Norşînê û Xeznayê, alimên mezin ên wî zemanî, di salên 1960’an de rewşa kurdên li Stenbolê tîne zimên û hwd.

Hezîn ev pirtûk jî carnan bi pexşankî carnan jî bi helbestkî nivîsiye. Ev helbest di Dîwana Hezîn de cî nagirin. Gelek caran mijarên ku mirov jê dersek bigire jî xistiye nav bîranên xwe û bi kurdiyeke zelal ew nivîsîne.

### 2.3.7. Dîwana Hezîn

Dîwana Hezîn, ji aliyê çapbûyînê ve ji du beşan pêk tê. Beşa yekem 401 rûpel e û bi tîpên erebî hatiye çapkirin. Cih, sal û weşanxane nenivîsiye. Hezîn pirî helbestên dîwana xwe li gundê Kamrûdê ku li wê derê melatî dikir nivîsiye. Dûre çend helbestên din jî li Stenbolê nivîsîne û lê zêde kirine, wek mînak, li ser wefata Şêx Îzeddîn (k.d. 1992) mersiye hatiye nivîsîn. Di sala 1995’an de jî li Stenbolê hatiye çapkirin.[69]

---

[67] Hezîn, *b.n.*, r. 5.
[68] Mela Husnî Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, p.ç., r. 160.
[69] Yakup Aykaç, “Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn”, mp3., 02.02. 2014, Stenbol.

Beşa duyem jî 47 rûpel e û bi tîpên erebî hatiye nivîsîn. Destxetê vê beşê Mustafa Kırkız nivîsiye. Ev beş çap nebûye.[70] Di vê tezê de em li ser dîwana Hezîn rawestiyan. Ji ber vê yekê di derbarê Dîwana Hezîn de agahiyên zêdetir di her çar beşên vê tezê de hene.

Wek encam ji van berhemên cihêzimanî jî diyar dibe ku Hezîn alimekî pirzimanî ye. Lê herçiqas bi farisî berhem nenivîsibe jî mirov di dîwanên wî de dibîne ku malikên farisî hatine sazkirin gelek in û ev jî nîşana zanîna zimanê farisiyê ye. Hezîn sedema nenivîsandina berhemên bi farisî, farisînezanîn a feqî û xwendekaran ve girêdide.[71]

Digel van berheman, em dibînin ku Hezîn heft berhemên giranbiha diyariyê zimanê kurdî kirine. Nemaze dîwana xwe, bi gotina wî "li ber dilê min şîrîntirîn kitêba min", bi kurdî nivîsiye ku ev jî nîşan dide ku Hezîn zêdetir girîngî daye zimanê xwe. Ji bilî vê, Hezîn ji alimên medreseyên kurd û Kurdistaniyan cudatir berhemeke hêja nivîsiye ku ev jî bîranînên wî bi xwe ne. Lewra di vê pirtûkê de di derbarê medrese, perwerdehiya medreseyan de gelek agahî hene, lêbelê, digel van Hezîn bi çavekî civaknas û zanayekî kurdewar nêrînên xwe yên di derheqê kurdan, civaka kurdan û misilmanan de nivîsîne. Dîsa bi çavekî helbestvanî û şagirtî fersenda naskirina seydayên mezin ên wekî Şêx Mustefayê Sîsî, Şêx Muhemmed Hadî, Şêx Mesûmê Norşînê, Şêx Elauddînê Xezna, Şêx Îzeddînê Xezna û hwd. dide me.

[70] Seydayê Mela Husnî fotokopiyên muswedeyên beşa duyem ji me re di 08.04.2014'an de ji Stenbolê bi kargoyê şand.
[71] Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.

# BEŞA DUYEMÎN

## VÊKOLÎNA DÎWANÊ JI ALIYÊ TEŞE Û RUXSARÎ VE

Me di beşa duyemîn de *Dîwana Hezîn* ji aliyê teşe û ruxsarî ve di bin du beşan de vekola. Di binbeşa yekem de helbestên dîwanê ji aliyê teşeyî ve hatin nirxandin. Li vir hejmara helbestan, nimroya wan, ji çend malikan pêk tên, teşeyên nezmê yên helbestên dîwanê wek; qesîde, xezel û hwd. û nimûneyên wan di dîwanê de hatin tespîtkirin. Herwiha di binbeşa duyemîn de jî, em ji aliyê ruxsarî ve li ser dîwanê hûr bûn. Di vê binbeşê de weznên helbestan yek bi yek hatin tespîtkirin. Ji bilî van, di helbestên Hezîn de hin kêmasiyên helbestan wek îmale, med, zihaf û cureyên wan bi mînakan ve hatin ravekirin. Ligel wan, helbestên Hezîn ji aliyê serwa û paşserwayê ve hatin lêkolandin.

Di dawiya van analîzan de hatê dîtin ku herçiqas helbestên Hezîn bi giştî di nav çarçoveya helbestên klasîk de bin jî hin cudahiyên berçav hene. Hezîn di helbestên xwe de çiqas xwestibe girêdayî helbestên klasîk ên rojhilatê bimîne jî, carnan gavên nû avêtine. Di bin serenavên serwa û paşserwa de ev tişt bi hûrgilî hatine nirxandin.

### 1. TAYBETIYÊN TEŞEYÎ

#### 1. 1. Şiklê Tertîbê

Dîwana Hezîn ji 448 rûpelan pêk tê. Di dîwanê de bi tevahî 149 helbest û 4167 malik hene. Hemû helbestên dîwanê, li gorî rêza tîpên elîfbêya erebî hatiye rêzkirin. Li jêrê helbestên ku di dîwanê de hatine nivîsîn, hejmara helbestên ku bi heman serwayê hatine nivîsîn û rêza helbestan, bi tîpên erebî û latînî hatine senifandin. Hezîn, ji xêncî tîpên ذ (ẕ), ظ (ẓ) û ع (ʿ)’ê, bi hemû tîpên erebî helbest nivîsîne. Bi tîpên kurdî yên ku di elifbêya erebî de nînin ve tenê 3 helbest nivîsine ku 2 heb ji wan bi tîpa ژ (j) û ya din jî bi tîpa ڤ (v)’yê ne. Bi tîpên kurdî yên پ (p), چ (ç) û گ (g)’yê hîç helbest nenivîsîne.

##### 1. 1. 1. Rêz û Hejmara Helbestan

| Tîpa Erebî / Latînî | | Hejmara Helbestan | Rêza Helbestan a Di Dîwanê De |
|---|---|---|---|
| ا | a | 13 | 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13 |
| ب | b | 4 | 14, 15, 16, 17 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| ت | t | 8 | 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25 |
| ث | s̱ | 1 | 26 |
| ج | c | 1 | 27 |
| ح | ḥ | 1 | 28 |
| خ | x | 4 | 29, 30, 31, 32 |
| د | d | 5 | 33, 34, 35, 36, 37 |
| ذ | ẕ | 0 | --- |
| ر | r | 7 | 38, 39, 40, 41, 42, 43, 44 |
| ز | z | 4 | 45, 46, 47, 48 |
| ژ | j | 2 | 49, 50 |
| س | s | 5 | 51, 52, 53, 54, 55 |
| ش | ş | 5 | 56, 57, 58, 59, 60 |
| ص | ṣ | 2 | 61, 62 |
| ض | ḍ, ż | 2 | 63, 64 |
| ط | ṭ | 2 | 65, 66 |
| ظ | ẓ | 0 | --- |
| ع | ʿ | 0 | --- |
| غ | ġ | 2 | 67, 68 |
| ف | f | 3 | 69, 70, 71 |
| ڤ | v | 1 | 72 |
| ق | q | 2 | 73, 74 |
| ك | k | 3 | 75, 76, 77 |
| ل | l | 4 | 78, 79, 80, 81 |
| م | m | 8 | 82, 83, 84, 85, 86, 87, 88, 89 |
| ن | n | 10 | 90, 91, 92, 93, 94, 95, 96, 97, 98, 99 |
| ه | h | 13 | 100, 101, 102, 103, 104, 105, 106, 107, 108, 109, 110, 111, 112 |
| و | w | 19 | 113, 114, 115, 116, 117, 118, 119, 120, 121, 122, 123, 124, 125, 126, 127, 128, 129, 130, 131 |
| لا | la | 3 | 132, 133, 134 |
| ی | y | 15 | 135, 136, 137, 138, 139, 140, 141, 142, 143,144, 145, 146, 147, 148,149 |

Wekî li jor jî diyar dibe ku Hezîn 19 helbestên xwe bi tîpa و (w)'ê nivîsîne ku herî zêde bi vê tîpê helbest nivîsîne. Piştre, 15 helbest bi tîpa ى (y)'yê, 13 helbest bi tîpên ا (a) û ه (h)'yê nivîsîne. Bi van tîpên ث (ṣ), ج (c), ح (ḥ) û ڤ (v)'yê jî, her yek ji wan yek helbest nivîsîne.

### 1.2. Teşeyên Nezmê

Di vê beşê de em li ser teşeyên nezmê sekinîn. Ji ber ku helbestên dîwanê li gorî elîfbêya erebî hate rêzkirin, ji aliyê teşeyên nezmê ve ne bi rêkûpêk in. Di dîwana Hezîn de teşeyên nezmê û hejmara wan wiha ne: 94 qesîde, 45 xezel û 10 murebbeʿ. Herwiha em dibînin ku, helbestvan tenê bi sê cureyên nezmê helbest nivîsîne. Em ê niha yek bi yek li ser van teşeyan rawestin.

#### 1.2.1. Qesîde

Qesîde teşeyeke nezmê ye ku herdu risteyên malika yekem di nava xwe de hemserwa ne; lê di beytên din de ji aliyê serwayê ve risteya yekem serbest e, risteya duyem jî bi malika yekem re hevbeş e.[72]

Di dîwanê de bi tevahî 94 qesîde hene. Di dîwanê de teşeya nezmê ya ku zêdetirîn hatiye bikaranîn qesîde ye. Li jêrê yek bi yek hejmara rêza qesîdeyan û hejmara malikên wan hatine nîşandin.

Ji bo hejmara malikên qesîde û xezelan rêzikeke ku hemû helbestvan pê ve hatibin girêdan tune ye. Di edebiyata kurdî de hinek qesîdeyên ji 30 malikan dirêjtir jî tên dîtin.[73] Wek mînak qesîdeya *Ellah Sehergaha Ezel* a Melayê Cizîrî ji 284 malikan pêk hatiye.[74] Gava ku em li qesîdeyên Hezîn dinêrin, em dibînin ku qesîdeya herî kurt bi 6 malikan, ya herî dirêj jî bi 276 malikan hatiye nivîsîn. Herwiha çend qesîdeyên dirêj jî hene ku ji 244, 191, 162, 124 û 119 malikan pêk hatine. Herçiqas ev şeş helbestên dirêj ji aliyê teşeyê ve "qesîde" bin jî, ji ber ku di qewareya menzûmeyeke serbixwe de ne, em wan ne wekî qesîdeyekê lê wekî menzûmeyeke serbixwe dikarin bihesibînin.[75]

---

[72] Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 367.
[73] Adak, *b.n.,* r. 367.
[74] Melayê Cizîrî, *Dîwan*, amd. Emîn Narozî, weş. Avesta, Stenbol 2012, r. 308.
[75] Ji bo "menzûme" û menzûmeya "Ellah Sehergaha Ezel" bnr. Adak, *b.n.,* r. 199.

| Rêza Qesîdê | Hejmara Malikan |
|---|---|
| 1 | 15 |
| 2 | 24 |
| 6 | 18 |
| 8 | 24 |
| 9 | 29 |
| 10 | 20 |
| 11 | 40 |
| 12 | 28 |
| 14 | 48 |
| 15 | 18 |
| 16 | 10 |
| 17 | 32 |
| 19 | 24 |
| 21 | 15 |
| 22 | 7 |
| 23 | 17 |
| 24 | 38 |
| 25 | 36 |
| 28 | 22 |
| 29 | 12 |
| 36 | 19 |
| 42 | 17 |
| 47 | 14 |
| 48 | 17 |
| 49 | 62 |
| 51 | 6 |
| 53 | 12 |
| 54 | 8 |
| 55 | 11 |
| 56 | 10 |
| 58 | 11 |
| 61 | 8 |
| 62 | 12 |
| 63 | 27 |
| 64 | 28 |
| 65 | 33 |
| 66 | 30 |
| 69 | 33 |
| 71 | 12 |
| 72 | 32 |
| 73 | 52 |
| 74 | 7 |
| 75 | 29 |
| 76 | 24 |
| 77 | 191 |
| 78 | 11 |
| 79 | 10 |
| 83 | 30 |
| 86 | 8 |
| 87 | 14 |
| 88 | 16 |
| 89 | 26 |
| 90 | 13 |
| 91 | 12 |
| 95 | 37 |
| 96 | 30 |
| 97 | 162 |
| 98 | 19 |
| 100 | 13 |
| 102 | 28 |
| 103 | 26 |
| 104 | 12 |
| 105 | 10 |
| 106 | 57 |
| 107 | 25 |
| 108 | 34 |
| 109 | 21 |
| 110 | 17 |
| 111 | 21 |
| 112 | 8 |
| 113 | 18 |
| 114 | 23 |
| 116 | 20 |
| 118 | 23 |
| 119 | 19 |
| 124 | 61 |
| 125 | 65 |
| 126 | 276 |
| 127 | 99 |
| 128 | 244 |
| 129 | 33 |
| 130 | 124 |
| 131 | 18 |
| 132 | 47 |
| 134 | 41 |
| 136 | 28 |
| 137 | 20 |
| 138 | 27 |
| 139 | 119 |
| 140 | 83 |
| 141 | 87 |
| 142 | 43 |
| 147 | 8 |
| 148 | 7 |

### 1.2.2. Xezel

Xezel, wek têgeheke wêjeyî şikleke nezmê ye ku malika pêşîn di nav xwe de, rêza duyem a malikên din jî bi malika pêşîn re hemserwa ne.[76] Mijara xezelê ya sereke eşq e. Lê digel vê jî xezelên ku bi mijarên cuda jî hatine nivîsîn hene.[77]

Di dîwanê de bi tevahî 45 xezel hene. Di dîwanê de piştî qesîdeyê teşeya nezmê ya ku zêdetirîn hatiye bikaranîn, xezel e. Li jêrê yek bi yek hejmara rêza xezelan û hejmara malikên wan hatine navnîşandin.

Di navnîşa li jêr de jî zelal e ku xezela herî kurt helbesta 85'an e ku bi 4 malikan hatiye nivîsîn. Herwiha xezela herî dirêj jî helbesta 115'an e ku ji 33 malikan pêk tê. Di edebiyata kurdî de xezel bi giştî ji 5-7 malikan çêdibin û jimara wan ji 30 malikan dikarin biborin.[78] Em dikarin bibêjin ku bi piranî xezelên dîwanê li gorî vê rêzikê ne.

[76] M. A. Yekta Saraç, *Klâsik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş. Gökkubbe, İstanbul 2014, r. 47.
[77] Adak, *b.n.,* r. 371.
[78] Adak, *b.n.,* r.371.

| **Rêza Xezelê** | **Hejmara Malikan** | **Rêza Xezelê** | **Hejmara Malikan** |
|---|---|---|---|
| 3 | 25 | 50 | 8 |
| 4 | 11 | 52 | 10 |
| 5 | 12 | 57 | 7 |
| 7 | 13 | 59 | 6 |
| 18 | 18 | 60 | 9 |
| 20 | 14 | 67 | 9 |
| 26 | 22 | 68 | 20 |
| 27 | 8 | 70 | 15 |
| 30 | 6 | 80 | 16 |
| 31 | 5 | 81 | 24 |
| 32 | 8 | 82 | 30 |
| 33 | 11 | 84 | 5 |
| 34 | 12 | 85 | 4 |
| 35 | 7 | 92 | 16 |
| 37 | 17 | 93 | 21 |
| 38 | 8 | 94 | 14 |
| 39 | 13 | 101 | 14 |
| 40 | 10 | 115 | 33 |
| 41 | 6 | 117 | 14 |
| 43 | 14 | 120 | 11 |
| 44 | 12 | 121 | 12 |
| 45 | 19 | 133 | 6 |
| 46 | 10 | | |

### 1.2.3. Murebbe‘

Murebbe‘ wek têgeheke wêjeyî, teşeyeke nezmê ye ku ji çar rêzên bi heman weznê hatine nivîsîn, pêk tê. Eger rêza dawiyê hercar xwe dubare bike, hingê navê wan dibe murebbe‘ê mutekerrîr.[79] Di dîwanê de bi giştî 10 murebbe‘ hene ku ji xêncî helbesta 149’an, yên din hemû murebbe‘ê mutekerrîr in. Hema hemû murebbe‘ên dîwanê ji ber ku sadeziman û

[79] Saraç, *b.n.,* r. 111.

herîkbar in, bi qalibên ku ji du tef'ileyan çêbûne, hatine nivîsîn. Li jêre jî navnîşa hemû murebbe'yên dîwanê û hejmara malikên wan hene.

| Rêza Murebbe'ê | Hejmara Çarîneyan | Rêza Murebbe'ê | Hejmara Çarîneyan |
|---|---|---|---|
| 13 | 14 | 143 | 23 |
| 99 | 31 | 144 | 12 |
| 122 | 24 | 145 | 16 |
| 123 | 15 | 146 | 17 |
| 135 | 40 | 149 | 13 |

Di murebbe'ê de serwa bi vî şiklî ye: aaaa- bbba- ccca... Gava murebbe'ê mutekerrîr be, hingê serwa bi vî şiklî ye: aaaa- bbba- ccca…[80] Di murebbe'ên 143, 144, 145, 146'an de ev şiklê serwayê hene. Hezîn li derveyî rêzikên murebbe'ê, rêzikên xwe çêkirine. Di pênc murebbe'ên Hezîn (13, 99, 122, 123 û 135) de serwa bi vî awayî ne: aaak- bbbk- ccck…[81] Bo nimûne;

Qesem bi`llah îro ʿizza zemîn î
Seraser ḥikmet û ʿilm û yeqîn î
Muʿînê sunnet û şerʿa mubîn î
Bi qurbana te me şehbazê Xezna (13/1)

Murebbe'a 149'an jî ji aliyê serwayê ve bi heman şiklî ye lê ne mutekerrîr e. Mirov dikare bibêje ku ev şêweya nû, bandoreke erênî li murebbe'ên Hezîn kiriye. Di wan murebbe'an de hevgirtina wateyî zêdetir derketiye pêş.

Wek encameke kurt; Dîwana Hezîn ji aliyê teşeyên nezmê ve ji qesîde, xezel û murebbe'yan pêk hatiye. Ji ber ku dîwana Hezîn xîmên xwe li ser tesewif, ilm, şîret û evînê daniye; ji aliyê teşeyên nezmê ve qesîde derketiye pêş. Dûre em dibînin ku xezel û pişt re jî murebbe' tê.

[80] İpekten, *b.n.,* r. 85.
[81] Mînakên murebbe'ên bi vî şiklî di edebiyata tirkî ya klasîk de piştî serdema Tenzîmatê çêbûne. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. İpekten, *b.n.,* r. 85- 86.

## 2. TAYBETIYÊN RUXSARÎ

### 2.1. Wezn

Di Dîwana Hezîn de bi tevahî 149 helbest hene ku hemû jî bi behrên erûzê hatine nivîsîn. Li jêrê em dikarin van weznan bi behr û hejmara bikaranîna wan ve rêz bikin.

| **Behrên Helbestan** | **Hejmara Helbestan** |
|---|---|
| 1. Behra Hezec | |
| a. mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun | 29 |
| b. mefaʿîlun / mefaʿîlun / feʿûlun | 4 |
| c. mefaʿîlun / mefaʿîlun | 12 |
| d. mefʿûlu / mefaʿîlu / mefaʿîlu / feʿûlun | 5 |
| 2. Behra Remel | |
| a. faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun | 29 |
| b. faʿilatun / faʿilatun / faʿilun | 16 |
| c. faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun | 1 |
| d. faʿilatun / faʿilatun | 1 |
| e. feʿilatun / feʿilatun / feʿilun | 1 |
| 3. Behra Recez | |
| a. mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun | 34 |
| b. mustefʿilun / mustefʿilun | 6 |
| c. mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun | 1 |
| 4. Behra Munserih | |
| a. mustefʿilun / feʿûlun / mustefʿilun / feʿûlun | 3 |
| 5. Behra Mutedarik | |
| a. faʿilun/ faʿilun/ faʿilun/ faʿilun | 1 |
| 6. Behra Muteqarib | |
| a. feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl | 6 |

Li jorê jî bi eşkere tê dîtin ku di dîwanê de 6 cure behr hatine bikaranîn. Herwiha hemû helbestên dîwanê bi 15 qalibên erûzê hatine nivîsîn. Ji bo hemû helbestên dîwanê rêjeya bikaranîna behran wiha ye:

| Behr | Hejmara Helbestan | Rêjeya Bikaranînê ( % ) |
|---|---|---|
| Hezec | 50 | %33.5 |
| Remel | 48 | %32.2 |
| Recez | 41 | %27.5 |
| Muteqarib | 6 | %4 |
| Munserih | 3 | %2 |
| Mutedarik | 1 | %0.06 |
| **Yekûn:** | **149 Helbest** | **% 100** |

Wekî di tabloya rêjeya bikaranîna behran de jî tê dîtin, behra ku zêdetirîn hatiye bikaranîn behra hezec e ku rêjeya wê %33.5 e, piştre behra remel e ku rêjeya wê %32.2 ye. Wek qalibek, ya zêdetirîn hatiye bikaranîn qaliba *mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun* a behra recez e ku 34 helbest bi wê hatine nivîsîn; piştre bi 29 helbestan ve *mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun* a behra Hezec û *faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun* a behra remel tên.

Kadri Yıldırım di analîza *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî de dibêje ku ji bo helbestên kurdî behrên herî guncaw recez, hezec û remel in.[82] Li jor jî tê dîtin ku Hezîn jî piraniya helbestên xwe, bi van behran nivîsîne.[83] Rêjeyên dîwana Hezîn û analîza Kadri Yıldırım, hevdu piştrast dikin. Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin ku Dîwana Hezîn ji aliyê behr û qaliban ve pirçeşîd û dewlemend e.

Hezîn, hemû helbestên xwe bi erûzê nivîsîne. Di helbestên wî de kêm caran qusûrên erûzê tên dîtin; ji ber vê yekê em dikarin bibêjin Hezîn di bikaranîna erûzê de gelek serkeftî ye. Lêbelê, di helbestên wî de jî wek her helbestvanên klasîk kêmasiyên erûzê hene ku em ê wan di bin serenavên îmale, med, zîhaf û weslan de bi mînakên xwe ve rave bikin.

### 2.1.1. Îmale

[82] Ehmedê Xanî, *Nûbehara Biçûkan*, analîz ve şerh Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2008, r. 125.
[83] Ji bo rêje û îstatîstîkên behran bnr. Haluk İpekten, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, weş. Dergah, İstanbul 2013, r. 366- 368.

Eger kîteyeke kurt a malikekê bi mebesta ku li weznê bê, dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê. Bi gotineke din îmale, dirêjxwendina kîteyeke kurt e. Hebûna îmaleyê ji bo helbestan wek qusûr tê qebûlkirin.[84] Wek mînak:

Be**s e** cana demek nêz **be** bi dûrîyê te em kuştin
Nîşan de ṣûretê sêvîn ji dilṣojê evînê ra (8/3)

Hewar û ṣed hewar ṣerraf û zanayê şewata dil
Li vê çûka reben carek bona **Xu**dê bikin reḥmet (18/4)

Henberê ṭîna evînê bû dilê Mûsa pureng
Lew li qadê ket wekî goyînê wî **ye** qîj û qîj (50/7)

### 2.1.2. Med

Wateya medê dirêjkirin an jî kişandin e. Lê, di erûzê de hinekî zêdetir dirêjxwendina kîteyên hevedudanî ye. Kîteyên hevedudanî ew kîte ne ku dawiya wan ji du dengên dengdar pêk tên wekî *mest, jeng, eşq, fikr, zikr*; an jî piştî dengdêreke dirêj, hatina yek an jî du dengên dengdar e wekî *yar, mûr, nûr, dost*.[85] Îmale di gelek cihan de wek kêmasiyek tê dîtin, lê med wekî hunera dengan tê pejirandin.[86] Wek mînak:

Pursê bikey carek de**lal** li vî rebenê paye**mal**
Wî ra nîne **yar** û he**val** ḥubbê ziravê me **qetand** (37/9)

Ya Reb ma ev êş û elem ya Reb ma ev hic**ran** û ġem
Tev da me ra bûne neṣîb kan şahîy û kêf û be**har** (40/2)

Dema ku **raz** wek tavîyan pê hev bibarin tim û tim
Muşkil yekayek ḥel bibin zanim ku ew roj **Ṭûr** e dil (80/30)

### 2.1.3. Zihaf

[84] Adak, *b.n,* r. 346.
[85] Saraç, *b.n.,* r. 211.
[86] Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara 2009, r. 14.

Eger kiteyeke dirêj a malikekê, bi mebesta ku li kêşeyê bê, kurt bê xwendin hingê zihaf pêk tê. Bi gotineke din zihaf, kurtxwendina dengdêreke dirêj e.[87] Em dikarin mînakên zihafê di bin du binbeşan de binirxînin.

#### 2.1.3.1. Zihafên ku Nirx û Payeya Helbestê Dadixin

Li vir dengdêrên dirêj wekî kurt, ango kîteyên girtî wekî yên vekirî tên xwendin.[88] Ji bo her sê tîpên dirêj (ê, î, û) em ê mînakên cuda bidin.

**"ê"**

Pur zeman e hêstirê çavan dirijim weku xûn
Can seraser peritî çû di**lê** jar bûye du ker (39/3)

Jîna me têk derd û ġem e jana me her bê merhem e
Li hêvîya luṭfa te me ey nazika luqma**nê** dil (81/11)

Tenê mame di şeḥrayê
Weka Mecnû**nê** Leylayê
Şev û rojan me xew nayê
Gelî dost û gelî yaran! (99/4)

**"î"**

Ma gelo rojek dibit can ra hużûr dil ra tebat
A**hî**nê derd û qetanê li me ker kirye ciger (39/4)

Pêşyê li me xweş hat evîn dû ra li me şêlû bû jîn
Karê me bû şîn û **gî**rîn dil da vebû ṣed êş û daġ (68/10)

Bo dûrîya bejna **şî**rîn bo dûrîya dêmê sêvîn
Karê me ye her dem **gî**rîn wekî **dî**za ber ar e dil (81/9)

**"û"**

Kesî bi germîya ʿişqê neḥellit nabe ronîdil

[87] Adak, *b.n.,* r. 346.
[88] Saraç, *b.n.,* r. 215.

Ji bo ṣade**bû**nê her lazim e evîn hebe dil ra (9/8)

Selamet nabitin mumkin dilan ra bê keremkarek
Meger hilbe li ṭûrê dil ji nasîyê **nû**rek ya Reb (16/4)

Dilber bes e êdî were, ji perdehan derkev der e
Te bi **dû**rî dil kir ker e, êdî bibir hicran û daġ (68/6)

#### 2.1.3.2. Zihafên ku Nirx û Payeya Helbestê Danaxin

Em ê vê serenavê jî bi du xalan rave bikin û mînakan bidin.

**a**. Ew cihên ku divê bi medê bê xwendin, mirov wan cihan bê med bixwîne hingê ev cure zîhaf çêdibe.[89]

Îman nûr e ji qelban ra wekî roj e wekî luks e
Ġerîb rê da şeva tarî dibit bê **nûr** çûyîn marek (77/13)

Seha pîran e pişta nefsê ra **hûr**ker elemkêşo
Şikestina beran ra lazim e her bêt te vayrozek (77-102)

Meqamekî bilind e ew **dûr** û bi nûr û rind e ew
Zanîn û nasîya Xudê piştî çûna wî cahî tê (139/56)

**b**. Di şûna kîteyên vekirî de bikaranîna kîteyên girtî ne.

Di dunê da ma gelo kesek heye bê derd û kul
Kêf eger ṣade nebit ġem**gîn** bi kêfê dê çi ket (22/3)

Yara **dil** yarek dilber e, her wekî qend û şekker e
Melekxû ye rûfenner e, ew bes e dil êdî çi ket (25/5)

Qetana rûreşa ʿekrût **ḥet**ta kengê dimînit ma
Ji derdê weṣla hîvrûyan wekî bulbul bi êşan im (82/2)

[89] Saraç, *b.n.,* r. 216.

### 2.1.4. Wesl

Wesl, tîpa dengdar a di dawiya bêjeyekê de bi tîpa dengdêr a serê bêjeya dû xwe, bi hev re xwendin e. Wesl ne di kategoriya qusûrê de ye.[90] Di mînakên jêrê de, me wesl bi îşareta "_" nîşan daye. Wek mînak:

Ev ‘alemek wêrane ye, wê da nîn e ‘ey**ş_û** tereb
Ev war e ne xanyê me ye, pey dilgirêdan pur ‘eceb (15/1)

Çûm nêv civata bulbulan purs kir ji weṣla ṣorgulan
Goti**n_e**vîn ji dil nebit dilber bi dîdarê çi ket (23/9)

Yê ku boy durra yetîm ket behra bêbin bê kelek
Yê ku maye bê hewar nêv pencê pêlan da e**z_im** (83/2)

Hezîn gelek caran ji bo ku wesl çêbibe di navbera du peyvan de tîpa "y"yê lê zêde kiriye.

Tarî**y_û** sermê dibînit, ê divêt ava ḥeyat
Germ û tîbûnê dibînit, ê diçit keʾba murada (4/4)

Êş û elem, derd û keder, dûrîtî**y_û** ah û keser
Tev ahîn û nalînê kûr, dûrbûn ji qelbê pur weza (5/7)

Zarok û mal û zozan nabin hevalê gorê
Pîsîtî**y_û** rindî min dibin heval ji min ra (6/4)

Di hin peyvan de ji bo ku kêşe li hev bê, carinan dengek hatiye dubarekirin ango bi şeddê hatiye nivîsîn. Ev jî mahareta helbestvan nîşanî me dide ku di vê mijarê de yekî şareza ye. Wek mînak:

Dûr bûm ji wê lêvşe**kk**erê wê kewmeşa rûfe**nn**erê
Wê rûgeşa xalʿenberê lewra her roj bi zar e dil (81/2)

Dilê qi**mm**ek ji yenbûʿa evînê girt dibit bêḥal
Ji her derdê ra hey derman ji bê dil ra dewa kanê (92/13)

---

[90] Adak, *b.n.*, r. 347.

Kêfxweş be dilo beskey şînê îro behar e
Çe**kk**ê keseran derxe ji xu bavêje xar e (105/1)

Carna ji bo ku kêşa helbestê li hev bê, tîpek lê hatiye zêdekirin. Wek mînak:

Ras(**i**)tî çûye xarî ma
Dos(**i**)tî çû neyarî ma
Fisq û fucûr tev bûn xuya
Ya Reb li me reḥmê bikey (135/18)

Yan jî carna tîpa dawiya peyvan jê hatiye avêtin ji bo ku kêşa helbestê li hev bê. Bo nimûne, di vê malikê de tîpa "n" hatiye avêtin.

**Mi** ne war e ne dîyar e, **mi** ne mal e ne pergal e
**Mi** ne dost e ne heval e, ji bil yarê xerabḥal im (82/13)

### 2.2. Serwa

Serwa, bi kêmanî wekheviya dengên dawiya du risteyan e. Nivisandina wan mîna hev in lê wateya wan ne yek in.[91] Peywireke din a serwayê jî ew e ku di helbestê de ahengê saz dike.[92]

Dil ji dest me çû del**al**ê were lez
Hatme ser kendê new**al**ê were lez (48/1)

Çiqas xweşbêhn û xweşreng in gulên bust**an**ê Tilmeʿrûf
Li zozanê jorîn nîne mîna reyḥ**an**ê Tilmeʿrûf (71/1)

Em ê serwayên dîwanê li gorî dengê wan û li gorî cihê wan binirxînin.

#### 2.2.1. Li Gorî Dengê Serwayê

Me serwaya li gorî dengan di bin sê binbeşan de vekola.

##### 2.2.1.1. Serwaya Lawaz

Di serwayê de wekheviya dengekî bi tenê ye.[93] Wek mînak:

---

[91] İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, weş. Kapı Yayınları, İstanbul 2008, r. 28.
[92] Saraç, *b.n.,* r. 257.

Dilê min pare bû çawa ji ʿişqa dilbera yekt**a**
Seraser bûm kebab derda ji hecra yara napeyd**a** (10/1)

Di dunê da mirin û pîrî heye xort**î** çi ket
Di dunê da derd û jan û ġem hene şah**î** çi ket (22/1)

Hey dilberê rûfennerê biskê herîr rakey ji dê**m**
Wek sîperê`l dora nûrê bêt û biçim bêt û biçi**m** (84/1)

### 2.2.1.2. Serwaya Asayî

Di serwayê de wekheviya du dengan e.[94] Wek mînak:

Di bustanê cihanê da divê dil dilb**er**ek ya Reb
Di çîmena ḥeyatê da divêt hey rehb**er**ek ya Reb (17/1)

Ew dilbera zêrînkemer îro ji burcê hate d**er**
Ġebġebkewa rûgulgulî zivînqirika nûr li s**er** (38/1)

Çû şeva derdan dilo hilbû di meşrîq da şef**eq**
Tê ṭûrê qelban li pey hev nûr ji hêla luṭfê ḥ**eq** (74/1)

### 2.2.1.3. Serwaya Zêdebar

Di serwayê de wekheviya ji du dengan zêdetir e.[95] Wek mînak:

Ṭavîyê ʿewrê beharê şîn kirin sosin û w**erd**
Xemmilîn mêrg û çimengeh rengê bulbul bûye z**erd** (33/1)

Dolaba ʿişqê dilê bengî dij**end**
Nedihat xar lê ji ʿezma xu`y bul**end** (35/1)

---

[93] Dilçin, *b.n.,* r. 86.
[94] Dilçin, *b.n.,* r. 87.
[95] Dilçin, *b.n.,* r. 89.

Birîndar im bi ḍerba xencera hecrê ḥ**ebîb** kanê
Perîşan im elemkêş im cigerxûn im ṭ**ebîb** kanê (94/1)

#### 2.2.1.4. Serwaya bi Cînas

Serwaya bi cînas, ew peyv in ku deng, nivîs û bilêvkirina wan wekî hev in, lêbelê wateya wan ji hev cuda ne.[96] Cînas, di heman demê de yek ji hunerên wêjeyî ye. Di mînaka jêrê de *ax*a yekem bi wateya dengê êş û keser kişandinê ye; ya duyem jî bi wateya xak û xweliyê ye. Di mînaka duyem de jî herwiha *daġ*a yekem bi wateya şîş, amûrê îşkencê ye; ya duyem jî birîna şewîtî, birîna ku bi hesînê sorkirî ve hatiye sotin e.

Herdu çav hey xûn dirijin ax û **ax**
Jana ʿişqê em kirin xalî û **ax** (31/1)

Dilberê dil da danîye bi dûrîyê ṣed şîş û **daġ**
Biskeynê kesk vewşandîye dil kiriye fena û **daġ** (68/1)

### 2.2.2. Serwayên li Gorî Cih

Me, serwayên li gorî cih di bin sê binbeşan de vekola.[97]

#### 2.2.2.1. Serwaya Kutayî

Ew serwa ye ku di dawiya rêzên malikê de cih digirin.[98]

Dilber serapa bû xuya tarîtî û ḥeyret nem**a**
ʿAlem seraser ronî bû sirrê veşartî bûn xuy**a** (5-1)

Ref ref bi ney û nay û bilûr hatine ṣorg**ul**
Lewra bi hezar rengî fixanan dike bulb**ul** (79/1)

#### 2.2.2.2. Serwaya Navekî

[96] Dilçin, *b.n.,* r. 90.
[97] Serdar Yılmaz, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013, r. 76.
[98] Pala, *b.n.,* r. 29.

Di xezelên musemmet de malikên xezelê di nava xwe de bi serwa ne. Serwaya ku nêv wan risteyan de cih digirin re serwaya navekî tê gotin.[99] Di vê dîwanê de jî ji bo xezel û qesîdeyên musemmetê gelek mînak hene.

Kêla xuya ket ew del**al**, dil ra demek bibe heval
Bi cah û mulk mal û mel**al**, dilê delal dîtî çi ket (25/6)

Bi ahîn û bi kov**an** in, wekî bulbul delovan in
Şev û rojan bi efğ**an** in, li yaran ev neyarî bes (52/6)

**2.2.2.3. Serwaya Pêşî**

Ew serwa ye ku di despêka risteyan de cih digire.[100]

**D**i şubha ceşna qurbanan, me dî dilber di ġafil da
**D**erî da hat wekî şahan, bûmê derdan ji dil firda (7/1)

**B**inêre qenc li zozan û li mêrgan çawa xemlîne
**B**i daran û bi gihan û kulîlkan renga rengî ne (112/1)

**2.3. Paşserwa**

Ew deng an jî bêjeyên di dawiya risteyê de cih digirin, hem ji aliyê nivîsîn hem jî ji aliyê wateyî ve wekî hev bin, ji wan re paşserwa (redîf) tê gotin.[101] Di mînaka jêrê de *e bê ġeleṭ* paşserwa ne.

Şeraba fîncana dilan xweş û ze**lal** e bê ġeleṭ
Gulekî şîn bûye di dil bêḥed de**lal** e bê ġeleṭ (66/1)

Li jêrê hemû paşserwayên dîwanê hatine navnîşandin.

**2.3.1. Paşserwayên ku di Halê Qertafan de ne**

[99] İpekten, *b.n.,* r. 20.
[100] Di derbarê serwaya pêşî de ji bo agahiyên zêdetir, bnr. Yaşar Aydemir – Halil Çeltik, *Kafiyenin Şiiri Şiirin Kafiyesi –Divan Şiirinde Kafiye Hünerleri-* weş. Kurgan Edebiyat, Ankara 2012, r. 11- 15.
[101] Pala, *b.n.,* r. 29.

ra: 8
-im:82
-ye: 103
-e: 104, 105

### 2.3.2. Paşserwayên ku di Halê Qertaf û Bêjeyan de ne

-ê Xezna: 11
-ê çerx: 29
-î bes: 52
-ê Tilmeʿrûf: 71
-ê firaq: 73
e dil: 81
-î tu: 114
-a te bû:115

### 2.3.3. Paşserwayên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne

ji bo min ra: 1

ji min ra: 6

dil ra: 9

ya Reb: 17

çi ket: 19, 22

heywax li min dîn çû ji dest: 24

dê çi ket: 25

ʿebeş̱: 26

ruḥ: 28

şahê Xeznayê meded: 36

dilber: 45

were lez: 48

şev û roj: 49

el-xelaṣ: 61

xelaṣ: 62

ġereḍ: 63, 64

ġeleṭ: 65

bê ġeleṭ: 66

daġ: 68

xilaf: 69

bi roj û şev: 72

dil: 80

ez im: 83

kanê:92, 94

mame tenê: 93

biray min: 95

insan: 96

hene: 100

tenê mame: 101

gelo: 116

îro: 117, 119, 121

dilo: 118

dosto: 124

xorto: 126

berxo: 129

lawo: 131

mela: 132

dila: 134

Xeznewî: 136

dibî: 140

tu yî: 141

nekî: 147

Me di binbeşa serwa û paşserwayê de Dîwana Hezîn bi mînakan ve veçirî. Lê me dît ku Hezîn, di mijara serwa û paşserwayê de terzeke cuda saz kiriye. Hin helbestên Hezîn bi serwa ne, lê paşserwa nînin; hin helbestên wî bi paşserwa ne, lê serwa nînin; hin helbestên wî jî ne bi serwa ne jî bi paşserwayê ve hatine nivîsîn. Lê hemû helbestên wî dîsa di çarçoveya erûz û kêşeyê de ne. Ev mijar hê jî gelek têkil û aloz e. Ji ber ku li ser Edebiyata Kurdî ya Klasîk têra xwe lêkolîn û îstatîstîk nehatine kirin, em nizanin ka gelo standartên Edebiyata Kurdî ya Klasîk çi ne?[102] Li gor hin lêkolîneran edebiyata klasîk bê serwa hîç nabe.[103] Li gor hin lêkolîneran helbestên klasîk yên bê serwa, lêbelê bi paşserwa hene.[104] Bi vî awayî, mînakên cuda di Edebiyata Tirkî ya Klasîk de jî hene.[105] Di vê mijarê de Hezîn dibêje ku ya girîng erûz e. Eger serwa hebe baş e, lê tune be jî ne pirsgirêk e, herdu jî dibin.[106]

Me helbestên dîwanê ji aliyê bi/bê serwabûnê û bi/bê paşserwabûnê ve di bin sê serenavan de nirxandin.

### a. Helbestên bê Serwa lê bi Paşserwa

Ketime tennûra ʿişqê şahê Xeznayê meded
Perritîm tê da seraser şahê Xeznayê meded (36/1)

Min dî cehana fanî da ber tewşîyê bêḥed xilaf
Hinek di dest da ne murad, yê dî bi wan ra kin xilaf (69/1)

Dilo rabe dilo rabe bibîne bo xu dermanek
Xerabḥal î xerabḥal î perîşan î bi yek carek (75/1)

### b. Helbestên bi Serwa lê bê Paşserwa

---

[102] Bo nimûnê, di edebiyata tirkî ya klasîk de xezel di navbera 4-15 malikan de pêk tên. (İpekten, *b.n.,* r. 19.) Lê di edebiyata kurdî ya klasîk de qasî ku tê dîtin hejmara malikên xezel û qesîdeyan nêzî hev in. Ango ji 20- 30 malikan pêk tên. (Adak, *b.n.,* r. 371.) Mebesta gotina me ev e ku herçiqas bingeha edebiyata klasîk yek be jî, standardên farisî, erebî, tirkî û standartên kurdî ji hev cuda ne, û em nikarin rasterast standardên wan ji bo edebiyata kurdî ya klasîk jî bikin standard.

[103] Ji bo girîngiya serwa û paşserwayê bnr. Pala, *b.n.,* r. 28-29.

[104] Yaşar Aydemir – Halil Çeltik, *b.n.,* r. 17.

[105] Ev mînak ji bo helbestên bê serwa û bi paşserwa ye. Li vir herdu *–keştir* paşserwa ne, lê beriya wan serwa nîne.

*Gönül her dilberin meftûnu olmaz hayli serkeştir*
*Velî ol gamzesi fettânı bilmezsin ne dilkeştir* (*Âkif Paşa)*

(vgz., Dilçin, *b.n.,* r. 59.)

[106] Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", 02.02. 2014, Stenbol.

Mînakên vê binbêşê, ji ber ku mînakên asayî ne û li jor me gelek mînak dane, li vir em ê mînakekê tenê bidin.

Ma gelo ev agirê Mûsa ye hilbûye li Ṭûr̠
Yan ku ba bû rakirî pêçek ji roja rûyê yar̠ (44/1)

**c. Helbestên bê Serwa û bê Paşserwa**

Pêçek ji dêman rakirî biskê di reş lê bakirî
Qelbê birîndar şad kirî wê dilbira pur şeng û şox (32/1)

Gelek jar û belengaz im tu sulṭan û mîr î îro
Xerabḥal im û dilxaz im bi ḥewce bal te ve hatim (88/1)

Hey dilberê rû fennerê, carek xuya be`d pencerê
Wek sîperê`l dora nûrê, bêt û biçim bêt û biçim (89/1)

Lê, gava mirov helbestên bê serwa û bê paşserwa dinêre hingê dibîne bi piranî şêweya wan dişibe xezelên musemmet. Ji ber vê yekê, di wan helbestan de herçiqas serwa û paşserwa tune bin jî, ji aliyê ahenga dengî ve gelek bihêz in. Ango em dikarin vê yekê bibêjin ku bêserwabûna çend helbestên Hezîn, di nav herîkbarî û sadezimanbûn û ahenga dengî de wenda bûne. Eger bêserwabûn ji bo helbestên klasîk kêmasiyek be jî, ev kêmasî di helbestên Hezîn de nayê hiskirin.

# BEŞA SÊYEM

## KESAYETIYA HEZÎN A EDEBÎ

Hezîn helbestvanekî klasîk û mutesewif e ku di dîroka edebiyata kurdî de, nivîsandina dîwana wî rastî serdema modern tê. Hezîn wekî helbestvanên kurd ên klasîk, di pergala medreseyan re derbas bûye, li wir perwerde bûye, li cem alimên mezin ders wergirtine û di rêka Neqşîbendîtiyê de çûye. Ev hemû tiştên ku di jiyana Hezîn de bûne, xwe di helbestên wî de aşkere nîşan kirine û bandorek li ser kesayetiya wî ya edebî kirine. Me hewl da ku di vê beşê de kesayetiya edebî ya Hezîn bi awayekî berfireh lêbikolin û binirxînin.

Me beşa sêyem di bin sê binbeşan de nirxandin. Binbeşa yekem, *ziman û şêwaz*, li dor zimên ava bû ku li wir me devokên cuda yên di helbestên Hezîn de tespît kirin. Digel vê, me peyv û ravekên kurdî, peyvên nûjen, nimûneyên gotinên pêşiyan û biwêjên kurdî nivîsîn. Herwiha me bandora zimanên biyanî yên wekî erebî, farisî û tirkî di helbestên Hezîn de vekola û mînakên wan yek bi yek nîşan kirin. Di bin vê beşê de pişka din jî li ser şêwaza helbestvan e ku di wir de cudahiyên şêwaza Hezîn bi mînakan ve hatin nirxandin, taybetiyên şêwaza Hezîn hatin tespît kirin.

Binbeşa duyem di derbarê *wêjevanên ku bandor li ser Hezîn kirine* de ye. Li vir me xwest ku wêjevan û helbestvanên mezin ên ku di teşegirtina helbestên Hezîn de bandoreke mezin kirine bi nimûneyên helbestên wan ve diyar bikin. Herwiha me li vir ji mînakên Şêx Hadiyê Qewmanî û Şêx Elauddînê Xeznayê mînak dan û bandora Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û yên din jî diyar kirin.

Di binbeşa sêyem de jî me hewl da ku *naveroka helbestên Hezîn* aşkere bikin. Di wir de me çar mijarên sereke; helbestên lîrîk, dîdaktîk-şîretî, hîkemî-tesewifî û rexneyî tespît kirin ku ew mijar di bin çar serenavan de hatin rave kirin. Digel wan, mijarên cûrbicûr jî hebûn ku me ew jî di bin serenaveke cuda de nirxandin.

### 1. ZIMAN Û ŞÊWAZ

#### 1.1. Ziman

Hezîn di helbestên xwe de zimanekî hêsan û herîkbar bi kar aniye. Hemû helbestên Hezîn herçiqas bi kêşeyê ve hatibe nivîsîn jî zimanê helbestên wî gelek caran wekî axaftina

rojane ye. Zimanê wî li gorî dîwanên klasîk yên kevn ji aliyê têgihîştinê ve siviktir e.[107] Em dikarin bibêjin ku terza Hezîn a yekem sivikbûna zimanê wî ye. Wek mînak:

Ya Reb çi nûrekî zelal heye li ser bejna delal
Kezeb li bengî xilxilî jîna wî bû derd û keder (38/2)

Hezîn di dîwana xwe de digel kurdiyeke dewlemend peyvên erebî, farisî û tirkî jî bi kar anîne. Di beşa *Jiyan û Berhemên Hezîn* de me dît ku Hezîn li gelek deveran maye û feqîtî kiriye. Ev mayîn, xwendin û gera Hezîn ya seranserê Kurdistanê jê re fersenda nasîn û fêrbûna zarava û devokên Kurdî daye. Ji ber vê yekê dewlemendiya peyvên deverên curbicur di dîwanê de tê dîtin. Hezîn di vê mijarê de dewlemendiya peyvên xwe ji me re wiha rave dike: "Peyvên min ne tenê Serhedî, ne tenê Botî ne, peyv û gotinên min hemû Kurdistanî ne!"[108] Li vir em têdigihîjin ku Hezîn sînorê zimanê xwe tenê bi devoka Serhedê xêz nekiriye, beravajiyê vê yekê, ji gelek devokên kurdî sud wergirtine, sînorê zimanê xwe berfirehtir kiriye. Vê jî dewlemendiyek mezin daye zimanê helbestên Hezîn.

Em li jêrê zimanê dîwanê li gor devokên kurdî binirxînin û ji helbestên Hezîn mînakan bidin.[109]

### 1.1.1. Devoka Serhedê

Serhed navê wê herêmê ye ku tê de bajarên Çewlîg, Erzirom, Mûş, Agirî, Qers û Wan hene.[110] Digel wan, kurdên di nav Ermenistan û Nahcîwanê jî em dikarin wekî Serhedî bihesibînin. Bi giştî em dikarin bibêjin ku Serhed ji bakurê Kurdistanê herêmeke mezin e û ji bilî hin cudahiyên biçûk ên deverî devokeke kurmancî ya berbelav dihewîne.

Taybetiyeke sereke ya devoka Serhedê ev e ku dengê "w" ji hin bêjeyan dikeve. Bo nimûne piranî van peyvan wiha dibêjin: usa (wisa), alat (welat), ça (çawa) û hwd.[111] Herwiha pevdeng (xw) jî gelek caran tenê bi dengê "x" derdikeve. Wek mînak: xarin (xwarin), vexarin (vexwarin), serxoş (serxweş), xalî (xwelî), xoy (xwê), xûn (xwîn), istûxar (stûxwar) û hwd.

[107] Hezîn derbarê sivikbûna zimanê dîwana xwe de wiha difikire: "*Zimanê dîwana Melayê Cizîrî jî ya Feqiyê Teyran jî zelal û sivik in. Lê li gorî dewra xwe, bi zimanê dewra xwe nivîsîne. Lewra ziman jî her diguhere. Zimanê dewra Melayê Cizîrî ew bû û wî jî wisa nivîsî, zimanê dewra me wiha ye lewra ez jî bi zimanê îro dinivîsim. Ji ber ku zimanê îro ye, herkes têdigihîje*." (Yakup Aykaç, "*Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn*", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.)

[108] Yakup Aykaç, "*Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn*", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.

[109] Ji bo cudahiyên devokên kurmancî bnr. Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, "Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects", *Kurdish Studies*, j. 2, no: 2, Cotmeh 2014, r. 177-200.

[110] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler Kişiler-Kavramlar-Kurumlar*, weş. Nûbihar, İstanbul 2013, r. 400.

[111] Önder Beyter, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013, r. 34.

Şemme yek bêhna ʿebîra te bidil ʿaşiq giha
**Serxoş** û nalan û mest kir hîşte ḥeyran der sucûd (34/5)

Ah firaqa te li min cerg û mîlak kirye kebab
Herişandîye dil û can serda **xoy** danîye ser (39/2)

Bi lorîn û bi gîrîn in, ji janê hey dibarînin
Ji çavan hêstirê **xûn** in, li dildağan kibarî bes (52/7)

Taybetîyeke din a devoka Serhedê ev e ku di dawiya bêjeyan de dengdara pirjimariyê dikeve. Ango tîpa "n" tê qutkirin.

Eḥreqe`l-wecdû wecûdî wel ḥebîbû fî`l-hewa
Deng û ahê min hemî **pîrê**[n] ketî anîn sema (4/1)

Herwiha pêşdaçek (ji, di) gelek caran di devoka Serhedê de nayê gotin.

Ji bo Wî bulbulê jar hey bi nalîn û bi wîllîn e
Pepûka derbeder nîne hedan [**ji**] wê ra di çolê da (3/18)

[**di**] Bilindîyê da wek roj e di merdîyê [**da**] mîna derya
[**di**] Bereketê da wek qad e kulîlk e bulbulê dil ra (8/17)

Digel wan di devoka Serhedê de lêkera "viyan" nayê dîtin. Li şûna raweya divêtiyê pirî caran "gere(k)" tê bikaranîn.

Di qanûna qedîmî da
**Gerek** weha neba ya Reb (14/21)

Bi vî awayî em dikarin çend peyvên sereke ku mirov dizane ku teqez ji herêma Serhedê ne bidin: kofî kel kir (3/11), pez çûye danan (7/7), gerek (14/21), herê [erê, belê] (18/15), kem [kevn] (20/7), çarsû [sûk] (24/7), lazim e (24/35), serxoş (24/7), ha kin [wiha bikin] (26/18), istûxar [stûxwar] (28/19), xalî [xwelî, ax, xak] (31/1), ciger (39/4), tifl [zarokê biçûk] (39/11), xûn [xwîn] (42/10), şevxan [şevxwan] (69/33), çer [çawa] (83/8), bira [bila] (97/9), loma [lewma] (107/12) û hwd.

#### 1.1.1.1. Devoka Gêxî

Hezîn ji gundê Tûmikê, nêzikî navçeya Gêxî ye. Ango dikeve devera Gêxiyê. Devera ku gundê Tûmik û derdora wî dihundirîne bi kurdiya *kurmancî* dipeyîvin. Helbet ev dever jî dikeve herêma Serhedê lê dîsa jî di nav xwe de çend taybetmendiyên cuda dihewîne. Ji ber vê yekê me devoka Gêxiyê di bin devoka Serhedê de nirxand. Li jêrê em ê çend mînakan ji devoka Gêxiyê bidin.[112]

Bo nimûne di devoka Gêxiyê de gelek caran dengê "h" dikeve. Nabyî [nabihîzî, nabihê], bata [bihata], nate [nehat, nehate] û hwd.

Lê îro roj lê çûye avan seraser tarî ye
ʿAlema wî lew tu **nabyî** bil ji ahînê ji ruḥ (28/12)

Herwiha di dîwanê de lêker û peyvên cuda jî gelek in. Bo nimûne; vanat [derket, çû, derê], xançeh [sifrê nan xwarinê yên girover], terin [herin, biçin], merov [mirov], hêlî [neynik], dûlker [necar, dartraş] û hwd.

Rûyê textan ger neyêt girtin bi rinda **dûlker**an
Çer dibit şayîk û dilkeş ban diket **hêlî** ez im (83/20)

Jixu masî bi dest **vanat**
Xu ra bir tor û tarp ya Reb (14/40)

Laxê madê li ku dîn li ser datînin
**Xançeh**a meʿnê dîn, ji hema dûr **terin** (98/18)

Herwiha gelek mînakên cuda hene ku hem cîguherîna dengan hem jî guherîna dengan di peyvan de çêbûne. Wek mînak; bira-bila [r-l], pirzik-pizrik [z-r], belg-pel [b-p], duşmen-dijmin [ş-j], dişwar-dijwar [ş-j], dozeh-dojeh-dozex [z-j; h-x], lîstik-lîztik [s-z], zav-zaf-zehf [v-f; a-eh], jar-jehr [a-eh] û hwd.[113]

Li jêrê, qasî ku me tespît kirine, peyvên ji herêma Çewlîgê hene. Wateya van peyvan di beşa çaremîn de hatine ravekirin, lewma li vir me tenê cih û jimareyên van malikan nivîsîn. Wek mînak; dilbêş (2/7), sîperrik (2/5), çar awir (3/16), hêlî (3/17), navnig (3/18), ʿekrût

---

[112] Hêj li ser devokên Çewlîgê an jî Gêxiyê xebatên akademîk nehatine kirin. Ji ber vê yekê tiştên ku me li ser devoka Gêxiyê yan jî kurmanciya Çewlîgê gotine, agahiyên gelemperî ne û ji aliyê mamosteyên kurdî ve tên zanîn û qebûlkirin.

[113] Ji bo guherînên dengan bnr. M. Malmîsanij, *Kürtçede Ses Değişimi*, weş. Vate, İstanbul 2013.

(3/18), gaz (25/3), kûz (6/2), kel (6/2), kêvjing (7/4), goyîn (8/2), bîtkel (9/1), reha kirin (10/5), şîrp (10/10), qemitî (11/26), xarvebûn (12/19), qozî (12/27), şixat (13/7), mariqî (14/7), baġir (14/17), wegerne (14/48), vanat (14/40), xaçreh (15/14), nig (16/5), hûrzan (16/6), der û mador (17/7), jar (17/8), qemitîn (17/13), ġudûd (17/26), kara (17/27), fereh (19/10), perhîz (21/7), li req ma (21/13), hol û harzil (22/7), ro (23/15), nişivîn (27/7), pirmilî (28/9), nabyî (28/12), xax (31/3), zox (32/6), gastin (33/7), ar (34/7), band (35/7), payemal (37/9), nepelî (38/7), biġar (40/4), pureng (40/10), çer (42/2), zav (42/2), mîlak (42/6), zulal (44/7), tosin (45/1), gonc û xaşak (46/7), lat (48/5), lîf dayîn (49/13), saw (49/38), nagihan (49/48), delovan (52/6), dara as (53/3), qerqel (53/9), bars (54/5), desttal (54/8), tetûr (56/6), çulo (56/6), bata (59/3), rend (60/2), diskine (63/18), paymal (64/27), nate (65/11), tof (66/22), çilk (68/2), pûm (69/8), girnûg (69/10), pûk (69/22), kîp kirin (69/27), fûlaz (70/10), mal û melal (70/12), xîs (74/4), biçûleskî (75/11), qilbûn (76/5), laxur (76/12), torê semek (76/16), dela (76/17), salar (77/3), şevşevok (77/12), ġar (77/53), mezindêran (77/167), havlêk (77/174), saqo (77/174), noroz (77/183), tewişîn (80/29), goyîn (80/22), tirzilîn (83/2), ban diket (83/20), tirm (87/10), pûnik (89/12), pergal (89/12), havil (89/17), best (91/4), xiştê (92/7), gujgujîn (92/13), ġar û doj (93/12), nişîve (95/2), gêl (95/2), azatî (96/17), xêv (97/78), sermîyan (97/98), dernoj (97/100), pev meçe (97/102), lewmker (97/103), weza kir (97/109), hilo (98/8), lax (98/18), xançeh (98/18), terin (98/18), fesal (102/14), kûrayî (103/22), gijgêlek (104/10), şar (105/7), hewalcêwrî (106/9), vês (106/40), tenikdest (106/47), gavar (107/8), dikûdîne (107/9), timtêl (107/14), xwazîn (107/21), rê pêçan (108/1), setem (108/1), kevzer (108/7), zermasî (108/7), bizdandin (108/11), cunbuz (113/10), serbiloq (118/19), leyet (121/3), çirpoz (124/2), serridîn (124/6), xesîr (124/12), êr (124/16), kêran (125/14), xaxûd (126/248), tefandin (127/83), taway (128/55), dapîtin (130/11), hûker (130/39), kûz bûyî (131/2), dernojî (135/23), dilik (139/58), şîrome (139/58), beref dike (140/32), herzeng (146/4), qarî (148/2) û hwd.

### 1.1.2. Devoka Botan û Behdînan/Badînan

Behdînan navê wê herêmê ye ku bi giştî ji bakûrê Musilê dest pê dike hetanî Hekariyê diçe ku tê de cihên wek Duhok, Zaxo, Amêdî û Şeyxan hene. Ji devoka vê heremê re jî Behdînanî tê gotin.[114] Herwiha Botan jî ji Hekariyê dest pê dike û hetanî Şirnexê dirêj dibe. Navenda herêma Botanê Cizîr e. Devoka vê herêmê re jî Botî tê gotin.[115] Di berhemên klasîk

[114] Işık, *b.n.,* r. 96.
[115] Işık, *b.n.,* r. 109.

de devokên Botî û Badinî gelek caran tên dîtin, heta mirov dikare bibêje ev herdu devok ji bo edebiyata klasîk bûne zimanê standart.[116] Em vê yekê di Mem û Zînê de jî dibînin ku Xanî wiha behsa devokên kurdî (kurmancî) kirine û tê de devoka Botî jî derbas dibe:

Bohtî û Mehemedî û Silîvî
Hin le'il û hinek ji zêr û zîvî[117]

Hezîn herçiqas Serhedî be jî di dîwana xwe de gelek caran peyv û gotinên ji devoka Botî û Badinî bikar anine. Peyvên wekî pergende (1/2), ʿeynik (5/9), divêt (9/1), vewşandin (14/39), liha (66/30), xwîn (143/6) û herwiha lêkerên wekî; tête (12/26), neyêt (21/9), digêjit (42/3), dibêjit (42/3), dê (61/4), çi bit (61/4), bête (77/72) û hwd.

Gulek taze nûrek ṣade pîrek bîtkel divêt dil ra
Ji çûna bal meqaman ve **divêt** destegîrek dil ra (9/1)

Gelo agirê dil rojek bi ava weṣlê xar **vebit**
Weya her dem **dimînit** dil di agirê firaqê da (12/19)

Şev û rojan bi lorîn in
Mîna baran dibarînin
Ji çavan hêstirê **xwîn** in
Te riḥlet kir ji dunyayê (143/6)

Taybetiyeke din a devoka Botan û Behdînanê jî ev e ku dawiya çend lêkerên sereke bi dengê "y"yê diqede. Wek mînak; mekey, bikey, çêkey û hdw.

Ev şeva tarî diçit axir bi ṣubḥê ġem **mekey**!
Tim li ser rengekî namînit dil û bazarê çerx (29/11)

Ya Reb ji wî me dûr **nekey**, ya Reb bo wî me kor **nekey**
Bo weṣla wî dil şa **bikey**, qetanê pişta me şikand (37/6)

### 1.1.3. Devoka Rojavayê (Binxetê)

[116] Beyter, *b.n.,* 36.
[117] Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Lêkolîn û Şirove Perwîz Cîhanî, weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r. 997.

Hezîn bênavber heft sal li Medreseya Şêxê Xezna dixwîne û li wan deran dimîne. Di helbestên Hezîn de wer dixuye ku mayîna li wan deran ji aliyê zimên ve bandorek li wî kiriye ku em mînakên wê di dîwanê de dibînin. Bo nimûne; ‘estî [hestî], nezer nedêre [nezer neke], guh dêre [guh bidê], pak bidêr [paqij bike], deveh [dewe, hêştir], fikih [fêkî, mêwe], serwan [serşivanê hêştiran] û hwd.

Bûne **serwan**ekî **deveh**an bi te
Serek û wan ra muʿellim her tu yî (141/47)

Ger ew li ser merovek carek **neẓer nedêre**
Çare tu nîne wî ra ger Rustem kurê Ẓal bit (20/10)

### 1.1.4. Peyv û Ravekên Kurdî yên Resen

Di dîwanê de gelek peyv û ravekên kurdî hene. Ev taybetî di hemû helbestvanên mezin de heye ku hêza vegotinê zêdetir dike. Di helbestên Hezîn de jî nimûneyên wan gelek in: feryadires (2/12), kula merxur (3/22), ardil (7/9), atûna qetanê (7/10), sûretê sêvîn (8/3), sîwan (8/16), ronîdil (9/8), zinnartebî‘et (9/10), yara dilreva (9/13), dozexa qetanê (10/3), rêwenda (10/4), sûber (10/10), atûna evînê (12/16), xulda berîn (13/5), gerra (17/20), dirrîyê qetanê (18/1), çavnêr (21/11), firoker (23/5), gurînşîmet (24/8), Hezargol (25/9), dajo (25/10), dilfikar (26/18), cihanhevîn (25/23), arê qetanê (26/8), xoyxunav (28/17), dilbir (32/1), yabana qetanê (36/7), dilbêş (39/5), êşa zirav (39/12), dêmê sêvîn (45/14), penctûncîn (47/12), dilesar (48/2), çar awir (49/21), ‘isasifet (51/6), qerqel (53/9), çekqumaş (59/4), rinda derdan (60/2), şendil (63/22), çêker (64/23), dozera ‘işqê (66/16), pefçûn (69/17), baġirê şînan (69/33), ‘îsadem (70/2), yabana firaq (72/3), dilpola (73/24), merovê kordil (73/38), dilkeş (77/25), bidilzan (77/58), parzûna evînê (77/77), nimêjhal (77/106), dûlker (77/147), ġebġeb kewê (81/3), ṣarûx (82/6), dêmzerî (83/11), rimbaz (83/28), tirm (87/10), dillibal (89/15), êrîşkir (92/6), al (97/5), heşvan (97/77), dernoj (97/100), lewmker (97/103), ġudud (103/9), masiyê birrek (103/19), bilindfir (105/5), hevalcêwrî (106/9), heştûj (106/22), tenikdest (106/47), hunavnema (114/13), nefes’isa (116/7), xudbîn (118/20), dilê xûnbarîn (120/9), xudanînî (125/26), barbir (128/15), hûker (130/39), serkar (135/6), zimanşûr (139/41), şûrîn‘eql (142/41), nûrîndil (142/41) û hwd.

### 1.1.5. Peyvên Nûjen

Hezîn di dîwana xwe de gelek peyvên ku bi teknolojiyê re hatine dîtin, bi çanda modern yan jî sedsala dawî hatine zanîn, bikar anîne. Lêbelê Hezîn ev peyv piranî ji bo

diyarkirina mezinahiya evîna xwe, ji bo ravekirina tesewifê wek amraz bikar anîne. Wek mînak;

Ma zinarê dil bi ṣed **dozerê Japon** radibit?
Lêbelê bû wek kereng rabû hewa ber bayê çerx (29/10)

Weke **Amazon** fireh û wek **Misîsîpî** dirêj
Qiṣṣeya jana dil û wan herdu çavê xûndirêj (50/1)

Bi **keşfa Edîson** ronî bûye der
Dilan ronî dike keşşafê Xezna (11/20)

Bi vî awayî gelek peyvên din jî hene: pîl (6/14), rotken (11/14), benzîn (19/16), tirûnpêl (19/16), firoker (23/5), park (24/7), pilaj (24/7), dozer (66/16), mikrob (56/4), mikruskob (77/32), astronot (64/23), oksîcîn (72/4), radyo (77/141), atom (95/4), bonba (96/7), telfîzyon (114/4), vînç (121/7), motor (121/7) û hwd.

### 1.1.6. Gotinên Pêşiyan

Gotinên pêşiyan ew qalibên gotinê ne ku ji nêrîn û ceribandinên dûr û dirêj derketine holê, hizr û boçûnên zanyarî û şîretî di wan de hene û ji aliyê gel ve jî tên zanîn.[118] Herwiha gotinên pêşiyan vegotin û derbirina fikr û ramanan hêsantir û xweştir, asta helbestan jî ji aliyê edebî ve bilintir dike. Li jêrê qasî ku me tespît kirine hemû gotinên pêşiyan ên di dîwanê de cî digirin, ev in:

**Ḥezîn** hîṣar be her dem ṣebr û teḥemmulê key
*Sebir eger çi teʿl e, xweş ber heye ji wê ra* (6/18)

*Kera ku baran nakêşit derve dihêlin bo guran*
Dilê neket koletîyê di wê leʿîn ra ye ġereḍ (63/5)

*Gahê ku pê nay cot kirin ser jê dikin* yan jî didin
Nefsa ku nabit bar(i)keş bil ṭerdê nabit jê ġereḍ (63/6)

Eger xewda nebit guhdar jê ra evqas pir e lewra

[118] Ali Püsküllüoğlu, *Türkçe Sözlük*, weş. Can, İstanbul 2007, r. 178.

*Hîşaran ra dibit vingîna mêşê her wekê sazek* (75/29)

Welew ku *kew li ço ket*, tête gotin carînan lêkin
Lehî tim nayînit goncan, tifaqê ra nîne ḥukmek (77/83)

*Bi gor karê ku pêk têtin merovan ra dibit qîmet*
Cihê havlêkê dîwan e, cihê saqo li reş gomek (77/174)

Zanayên zemîn gotine "*dunya me ra pir xain e*
*Her roj dostan dighêzîne*" jîna di wê jan û elem (89/18)

*Kesî tev kijikê rabe rûnê nikil di gû da ye*
Wuṣay dûr birreve ḥetta dikarî ji şerrê insan (96/28)

*Jina rind û zevîya ber gund da xêr*
*Tu nîne* weha gotîye baqilan (97/21)

Bes bibêje ḥikmetê *ma dê çiket*
*Çira bi koran û şîret bi dînan* (97/132)

Ez dizanim *dîkê bang de bê zeman*
*Serê wî tê jê kirin* dest da heman (97/137)

Dibêjin, *kî çi bike wî dibîne*
Dibêjin, *kî çi bajo wî hiltîne* (109/13)

*Cihê kilkirina birhan*
*Bi kilçêv çav rijand* xorto (126/94)

û yên din jî em dikarin li pey hev binivîsînin: pîrê bernig ra mirin zêrê zer e (97/124), ê qencîyê ket qencî tê pêşîya wî (102/24), ê pîsîyê ket pîsî tê pêşîya wî (102/25), ji axa paqişa ṣade dizêt ava zelal (130/62), heta genim nekev qadê hêşîn nabit bilind nabit (126/169-170), ji sergoyê rêxê derdikeve bêhn û qirêj (130/63), dibêjin xûyê bi şîrî naçe bi pîrîyê (130/113), zana zêr e çiqas pîr be (131/18), sebir çiqas ṭal e welê şahî û xaşî dû ve tê (139/12).

### 1.1.7. Biwêj

Em dibînin ku Dîwana Hezîn ji aliyê biwêjan ve gelek dewlemend e û kêm zêde di her helbestên wî de biwêj hene. Vê jî asta zimanê dîwanê ji aliyê edebî ve bilintir kiriye û çêjeke kurdewarî daye helbestan. Wek mînak di kurdî de li ser "Beko" gelek biwêj hene ku mirov dikare bibêje ku bi temamî derbarê derew, xapandin, fêl û fêlbaziyê de ne. Di helbestên Hezîn de em rastî vê yekê tên:

*Wek Bekoyan karê wê şeyṭanî ye*
Yar ji yaran dûr dixîne şev û roj (49/60)

Di vê malikê de jî helbestvan biwêjeke çandî, *biskê jinên Heyderî,* bi kar aniye. Wek tê zanîn, Heyderî eşîreke herêma Serhedê ye û bi jinên xwe yên rind û bedew ve navdar e.[119]

Ne bi baġan û kulîlkan ne bi serxêlîyê bûkan
Ne bi *biskê Ḥeyderî* xweşyê dibînit mestî ruḥ (28/18)

Bibe delalê tim weha şînan bide ber av û ba
*Pişta me* derdan *kir du ta* porê me yekser bû pulox (32/7)

Wê dilbera lêvşekkerîn bi ʿişweyan *can perritand*
Şîşên hesin xar kir di dil *ker kir ciger xoy lê reşand* (37/1)

Me li jêr lîsteya biwêjên ku di dîwanê de derbaz dibin, daye. Hem ji ber zêdebûna hejmara helbestan hem jî ji ber dirêjahiya helbestan gelek biwêj hebû ku xwe dubare dikirin. Ji ber vê yekê me biwêjên dubarekirî carekî tenê nivisîne.

[119] Yakup Aykaç, "Hêmanên Edebiyata Kurdî ya Klasîk Di Dîwana Hezîn De", *Nûpelda*, j. 16, Wan 2014, r. 11-15.

| | |
|---|---|
| nakêşem ġemê | (1/4) |
| serûbin bit | (1/9) |
| dibin sosin ji bo | (1/10) |
| dil pergende | (2/1) |
| wêrane kir | (2/2) |
| ji bin talan kirin | (2/6) |
| xûn ji dağan û birînan tê bi cûh | (2/10) |
| ketime nêv pencê şahînê | (2/14) |
| şîn û nalîn mekey | (2/24) |
| dibin qurban | (3/8) |
| vekey çavan binêre kûr | (3/16) |
| serbijorê pozbilendê | (3/19) |
| navnigê ʿekrût | (3/19) |
| bê hedan û bê xew û raḥet | (3/20) |
| nayêt hedana me | (3/24) |
| hemî pîrê ketî | (4/1) |
| tarîy û sermê dibînit | (4/4) |
| hey qiyaman ra nişiv | (4/11) |
| hey cefayan ra şefa | (4/11) |
| zarîn mekey | (5/12) |
| tarûmar ket | (6/17) |
| herdem şebr û teḥemmulê key | (6/18) |
| bûmê derdan firda | (7/1) |
| şeva tarî dûr ket | (7/3) |
| wekî sîperrikan kirin gerran | (7/11) |
| ġemgîn mebe êdî | (7/13) |
| mîna goyînê bi nalîn in | (8/2) |
| hedan hate birîn | (8/2) |
| te em kuştin | (8/3) |
| bikey reḥmê | (8/4) |
| fena bav û bira nin | (8/16) |
| di merdîyê mîna derya ye | (8/17) |
| feda bin can û cesed | (8/21) |
| wekî sêwyan sitûxar e | (8/24) |
| di zorê da Sikender bî | (9/5) |
| ʿeqil ko ye | (9/23) |
| ziman lal e | (9/23) |
| çav tijî xûn im | (9/29) |
| seraser bûm kebab | (10/1) |
| şewitî dil peritî dil | (10/3) |
| kundê korê derdan fir da | (10/15) |
| me bîne ser reha rast | (11/4) |
| şîr û şekker î | (11/32) |
| çi agir hilbûye | (12/6) |
| bû kebab | (12/17) |
| kulan ra merhem î | (12/24) |
| bi qurbana te me | (13/1) |
| neẓerkî berde ca ser min | (13/2) |
| penahê me xerabḥalan | (13/14) |
| dilê jar pare bû | (14/1) |
| qîrîn pey ket | (14/4) |
| fena masîyê ma req da | (14/6) |
| tebat pey nakevit | (14/6) |
| mîna zarokê nîvgoştî | (14/7) |
| çîkîn jê çû felek | (14/8) |
| nedî ser duşminan | (14/9) |
| dilê jar bû kebab | (14/11) |
| ji keyfan qeṭ li qadê nediket | (14/30) |
| çavnêr û guhdar be | (15/1) |
| demekî ġafil mebe bextê te | (15/2) |
| wek gurê har e neyarê te | (15/9) |
| rabe rûnê ġafil mebe | (15/18) |
| nişkiv belakê ser da tê | (16/2) |
| tête ser êşek ġedar | (16/3) |
| dunya ne ya dildanê ye | (16/4) |
| ʿam bû ji hemyan ra mirin | (16/9) |
| ji dergûşê ḥeta gorê rêwî ne | (17/2) |
| Xudêyo dil bikey zana | (17/10) |

mîna hingiv diqemite (17/13)
şev û rojan bi gîrîn e (17/24)
jîna wî tev ġem û şîn e (17/24)
ketye nêv tennûra hilbûyî (18/3)
nîne per fir bide (18/3)
ji her tiştî me şûştî dest (18/5)
wekî masî ji dest derket (18/8)
şewat pê xist (18/17)
roj bi koran dê çi ket (19/2)
mûriya jar bi nigê xu`y leng çi ket (19/5)
canêm bi wê ra rabit (20/1)
bi zarê xweş (21/7)
bîzarî ket dilber (23/16)
vekey dilan bigre devan (23/17)
heywax li min (24/1)
heywax li min dîn çû ji dest (24/1)
maye li erḍê bêxudî (24/2)
rabû ji bin şerm û fedî (24/2)
ʿedalet û qencî nema (24/5)
me girtîye dunya bi can (24/16)
zor dan çekan (24/17)
zor dan zikan (24/17)
berê tu şêr bûy bûy rovî (24/21)
berê kedî bûy bûy kovî (24/21)
rastî çûye maye derew (24/31)
çav kor e dil girtî qirêj (24/38)
dil bû pureng (25/1)
çira bi koran dê çi ket (25/21)
şîret bi dînan dê çi ket (25/21)
mîna hîva çardeşevîn (26/2)
wekî koran ji dest berda (26/2)
canê me hatîye ser lêvan (26/13)
me reha kin bo Xudê (26/14)
emana me birî (26/15)
ma hey zivistan bê behar (26/22)
şêmûka wê balgeh e (27/3)
bi ah û zar e (28/2)
wek kewan qebqeb dikir (28/5)
hey hewar (29/2)
tîrê jeʿrî li pey hev tên (29/2)
gujgujîn ser berxê dil (29/4)
kir xalî (29/8)
wek kereng rabû hewa (29/10)
têt piştî şînê şahîtî (29/12)
wek me ḥalpergende (30/1)
dest da dibû pîr (30/3)
em kirin xalî û ax (31/1)
por li me kirye pelax (31/2)
qelbê ḥesûdan hellisa (32/2)
kuştin qetanê em bi dox (32/5)
pişta me kir du ta (32/7)
porê me yekser bû pulox (32/7)
çû der ji ḥed (33/3)
bê ḥisab der bûn (33/5)
ser dinale wek ney û ṭenbûr (34/4)
perritîm tê da seraser (36/1)
ṣebr û aram min nema (36/2)
dil û can bûye pureng (36/2)
ketme nêv atûna ʿişq (36/3)
em tenê meḥrûm ji behr in (36/18)
can perritand (37/1)
şîşên hesin xar kir di dil (37/1)
ker kir ciger xoy lê reşand (37/1)
dilê reben ma ḥeyyirî (37/3)
bi cilweyan heş jê pekand (37/3)
ṣebr û hedana me birand (37/4)
hunavê me pijand (37/8)
rebenê payemal (37/9)

| | |
|---|---|
| ziravê me qetand | (37/9) |
| dil ḥerrişand | (37/10) |
| welat nema dil lê gerand | (37/11) |
| dil şewitand | (37/12) |
| hedana me qeland | (37/13) |
| şebr û hedan hate birîn | (37/14) |
| can û ciger tev bû birîn | (37/14) |
| kezeb dirand | (37/14) |
| dîza dil keland | (37/15) |
| can perritî sertasere | (37/16) |
| qaqircîga wê bû du ker | (38/3) |
| dinalim şev û rojan | (39/1) |
| cerg û mîlak kirye kebab | (39/2) |
| dilê jar bûye du ker | (39/3) |
| li me ker kirye ciger | (39/4) |
| reben mame li der | (39/5) |
| cerg û hunav têk bûne ar | (40/1) |
| şebr û teḥemmul me nema | (40/7) |
| şev û roj qîrîn û zarînê dike | (40/9) |
| mekey ah û fiġan | (42/16) |
| şewat pê xist | (45/6) |
| sekn û şebat nîne | (45/7) |
| wekî volkan ji dil tê agir û dûman | (45/9) |
| me rê kir bandê û axret | (45/14) |
| bûme ax û xalî | (45/18) |
| hucûmek zor li ser dil dan | (46/2) |
| li ser me ṭeng bûye dunya | (46/8) |
| feda ke can û mal û mulk | (47/2) |
| ji dest me çû | (48/1) |
| wey bav | (48/16) |
| can şewitî bû xalî | (48/16) |
| dinale şev û roj | (49/1) |
| bi ah û wah û jar e | (49/2) |
| dixebite boy zikê | (49/17) |
| destê wan ket paşilê | (49/25) |
| em dijendin wekî penbo | (49/34) |
| daġ dikir canê perîşan | (49/36) |
| ji Xuda hêvî me ew bû | (49/48) |
| wek jina qehpe nîne jê ra qerar | (49/55) |
| wek Bekoyan karê wê şeyṭanî ye | (49/60) |
| nefsa teres | (51/1) |
| ji ġefletê hîşar be | (51/1) |
| bibe li dor wan wek mekes | (51/5) |
| bikey carek li me reḥmê | (52/3) |
| sitemkarî û yarî bes | (52/3) |
| wekî bulbul delovan | (52/6) |
| qelbê wek mermer û as | (53/3) |
| wek Beko dûr xistîye | (53/6) |
| sêwîyê ber arê (te) me | (54/7) |
| destṭal | (54/8) |
| dil çû as | (54/8) |
| meġelê nêrîyê mêran e | (55/4) |
| xame bi navê me bi keş | (56/9) |
| ser danîye ser şêmûkê | (57/7) |
| qîrîn û zarîn wekî şeqşeqa aş | (59/2) |
| mane şaş | (59/6) |
| tê pey hev tîrê derdan | (60/1) |
| wekî gûzan daye ber xu dike rêş | (60/2) |
| lîf dida her wekî mar | (60/5) |
| terk key şeş û bêş | (60/9) |
| me xu avêtîye hêşa konê we | (61/7) |
| xu berda ser wek zurba guran | (62/11) |
| diket zarîn û şîn | (63/27) |
| nav û dengê te nebit paymal | (64/27) |
| ax û xalî li serê min be | (65/15) |
| mat bûne mane | (65/32) |
| wan mirî dilê dewar | (66/25) |
| dil bûye daġ | (67/1) |

| | |
|---|---|
| dil kiriye fena û daġ | (68/1) |
| danîye dil da heftê daġ | (68/2) |
| dil ker kir | (68/6) |
| dil şewitî | (68/7) |
| qijîn bi mîlaka me xist | (68/12) |
| agir bi kîllera me xist | (68/12) |
| nehîşt me da tu ḥal | (68/14) |
| ġem mekin | (68/15) |
| ġeman mekey | (68/17) |
| ket ḥerrîya rûreşîyê | (69/11) |
| poz rakirî | (69/13) |
| lê xiste bay qurretîyê | (69/13) |
| nexo hevalan wek guran | (69/17) |
| pevçûn nekey wekî keran | (69/17) |
| bermede rah û rîçê wan | (69/29) |
| bû li henber ker û lal | (70/3) |
| ah û keser hatin birîn | (70/5) |
| zarîn dikin wek nay û def | (70/15) |
| menzilan ṭey kin | (71/11) |
| mame aware | (71/11) |
| wekî bayê ketî tayê | (72/12) |
| hêstirê xûnê dibarîne | (72/30) |
| ev sewda ku da dajo wî | (72/31) |
| emana me birî | (73/5) |
| Xuda çawa bikem | (73/6) |
| sed keser | (73/11) |
| reş girêda | (73/14) |
| çendan xu dixo | (73/19) |
| me zarîn e mudam | (73/21) |
| nayê xîsa te dilo | (74/4) |
| mekey ji dest | (74/7) |
| umûr nakey | (75/2) |
| hey felek ẓalim felek | (76/1) |
| çer te qîm kir | (76/2) |
| du ker lê qelb û cerg | (76/4) |
| ji fiġan û dengê wê qil bûn | (76/5) |
| ber bayê te bûye wek kepek | (76/11) |
| dil bû pureng | (76/22) |
| wek kerê Mişrê cesûr | (77/17) |
| wekî toza li ber bayek | (77/41) |
| wek şima zer bûn | (77/50) |
| ji kêfan fir bidin | (77/52) |
| me vê rê da bi rêkir mal | (77/60) |
| bi hezar rengî fixanan dike | (79/1) |
| dil girêdaye | (80/10) |
| min can di ʿişqê da firot | (80/11) |
| ḥelyam ji ber jana di dil | (80/12) |
| dinalim wek goyîn | (80/22) |
| hindûr seraser bûye xûn | (80/24) |
| heş tewişîn | (80/29) |
| ġebġeb kewê | (81/3) |
| kewmeşê | (81/2) |
| xalʿenberê | (81/2) |
| rûhîva di çardehî | (81/3) |
| nalîn ji me çûne felek | (81/4) |
| wekî dîza ber ar | (81/9) |
| şev û rojan bi efġan im | (82/1) |
| wekî goyîn bi ah û wah û nalîn im | (82/11) |
| mi ne mal e ne pergal e | (82/13) |
| mi ne dost e ne heval e | (82/13) |
| dinalim şubhê goyînê | (82/15) |
| dil û cerg û hunav ker kir | (82/19) |
| ser da xoy jî pê wer kir | (82/19) |
| reha pêçûnê | (83/3) |
| hezkirin çû der ji ḥed | (83/12) |
| şîretê pîran xu ra key wek guhar | (83/16) |
| canê tev bû birîn | (85/4) |
| luqmanê dilan e | (89/6) |

| | |
|---|---|
| melhema kulan e | (89/6) |
| bikey qurban | (90/3) |
| şefa tête çinîn tev li cefayê | (91/2) |
| ji sertapa bûme agir | (92/1) |
| seraser şuhtim û borîm | (92/2) |
| ji mêj da dilkul û dîn im | (92/4) |
| cuda kir dil ji canê | (92/6) |
| ji sertapa perritî can | (92/9) |
| firandin heş | (92/12) |
| pijandin leş | (92/12) |
| ʿeqil firda ji ber ʿeşqê | (92/15) |
| çûn wek birûsk | (93/3) |
| qijîn pê ket | (94/4) |
| hewar û şed hewar | (94/4) |
| dilê jar pare bû | (94/12) |
| zanîn te ra bivr û das e | (95/1) |
| tenê ax e bi can insan | (96/4) |
| mal û can rê kirin | (97/6) |
| pişta wek kevan | (97/28) |
| mêrê beran | (97/40) |
| xoy nebit xarin kelî tê | (97/55) |
| paç bixe guhkê xu | (97/98) |
| wekî jarê dikuje | (97/140) |
| guhkê me ker kirin | (98/13) |
| ḥetta ku nekeve qirika wî xirin | (98/19) |
| dil û kezeb li min ker kir | (99/2) |
| dibarin hêstir wek baran | (99/6) |
| dunê ne dostekî rast e | (99/10) |
| me ne mam e ne kurmam e | (99/15) |
| îro xort î şibê kal î | (99/16) |
| mîna kerengê ber bayê | (99/22) |
| dilê min pare bû | (101/12) |
| wey bav | (102/5) |
| şed ah û keser | (102/12) |
| hêstirê xûnê bibarîne | (102/12) |
| hêvî hatîye birrîn ji binî ve | (102/17) |
| daye ser mil | (103/4) |
| wek kereng ber bayê da ye | (103/5) |
| ar bi mala wî dixînit | (103/6) |
| ji (dunê) destan dişo | (103/9) |
| ew mîna ga ye | (103/20) |
| hela hela | (104/4) |
| mat mane li şûn | (104/9) |
| bextê te da me | (105/4) |
| mîna marê şîn | (106/16) |
| pêçana rê | (108/1) |
| dil bû kebab | (108/30) |
| xarî mar e | (110/5) |
| xûna xu bi destê xu dirijîne | (110/7) |
| êşek giran e dilo | (113/3) |
| hetta çi çaġ weha diçî | (113/16) |
| nay tebata can | (115/19) |
| dil perritand | (116/6) |
| bo Xuda | (117/6) |
| wek tayê li ber bayê | (117/7) |
| çîkinî çû felek | (117/12) |
| ji dest min çû | (118/2) |
| day nav nigan | (118/3) |
| cerg û mîlak perritîn | (118/22) |
| dilê min pare bû | (119/1) |
| ji ferqê ser ḥetta pê da | (119/1) |
| nema me şebr û aramek | (119/2) |
| wekî goyînê ser zinaran me nalîn e | (119/3) |
| wey bav | (119/4) |
| hunav û cergê me ker kir | (119/9) |
| hêstirê xûn in dibarîne ji çavan | (120/8) |
| bi vî ḥalê me tê gîrihê duşmenan | (121/2) |
| dibarînin mîna xûnê hêstiran | (121/3) |

tenê sêva te ma li dar (122/8)
cerg û hunav têk perritîn (122/10)
mirî di goran lebiţîn (122/10)
xalyê li serê xu bikey (122/11)
me ra tenê ma nan û dew (122/18)
mêrê pozberan (123/11)
ji kêf û şahiyan nigê me erd negirt (124/5)
qayîl nabe bi ţawakî (128/156)
her kokek mîna xwe radibe (130/54)
di karê xu mîna şêr bû (130/108)
gotina wî mîna şêr bû (130/109)
masîyê ji dest çû tim diçe (131/9)
birije ava tasê nay civandin carî dî (131/10)
zivistanê gul û sosin heşîn nabin (131/14)
di wê rojê pere nake (138/13)
can giranî neke (138/14)
em perritîn (139/8)
welat nema lê gerihan (139/10)
pişta (qetanê) bû du ker (139/11)
li piştê dayne bar (139/19)
bila (mirin) li wê bimîn (139/26)
her şev avis in bi şubḩa ronî (139/116)
wek kundê kor bêyom dibî (140/6)
gelek dîn bûn ketin çolê (143/19)
li me can û cesed zer kir (144/6)
rebenê jarê tev birîn (145/5)
bûne dilġirç (146/12)

### 1.8. Hêmanên Erebî, Farisî û Tirkî

Serdema ku Hezîn tê de jiyaye herçiqas ji bo edebiyatê serdemeke modern be jî, wî di helbestên xwe de taybetiyên kevneşopiya helbestên rojhilatî parastine, ango rê û rêbazên klasîk ên şiklî neguhertine. Ji ber vê yekê carna zimanên rojhilatî wekî erebî, farisî û tirkî bi kar aniye. Hezîn di helbestên xwe de ew ziman bi awayekî serkeftî bikar anîne û hevoksaziya kurdî ya xwe jî xera nekiriye.

Herwiha tê zanîn ku ev kevneşopiya pirzimanî di edebiyata klasîk de gelek berbelav e. Ji ber ku ziman û wêjeya erebî û farisî bandoreke mezin li gelên rojhilatê kirine. Ev karîgerî bêşik li ser edebiyata kurdan jî roleke girîng girtiye.[120] Em vê karîgeriyê di Mem û Zînê de jî dibînin ku Ehmedê Xanî vê yekê wiha tîne zimên:

Kurdî, ‘Erebî, Derzî û Tazî
Terkîb kirin bi hezl û bazî[121]

#### 1.8.1. Hêmanên Erebî

Di dîwanê de di nav van hersê zimanan (erebî, farisî û tirkî) de yê herî zêde hatiye bikaranîn zimanê erebî ye. Di dîwanê de gelek peyvên erebî hene ku bi tesewifê re têkildar in. Ji ber vê yekê di kurdî de jî heman peyv û wateyê de ne û giraniyek nedane zimanê dîwanê û herikbariya wê kêm nekirine. Herwiha carna tenê nîvmalikek bi erebî hatiye nivîsîn. Wek mînak:

Ehlen we sehlen merḥeban xêr hatî ser çav û seran
Ey dilbera meqṣûd liqa ey merhema jana di dil (80/4)

Ḥebîbî leyse muḥtacen îla mîrati ʿettar in
Kemal û rindîya yarê xuyaye`d kevirê reş da (3/15)

Di dîwana Hezîn de helbestên xwerû bi zimanê erebî nebin jî, hin malikên wî bes bi erebî hatine nivîsîn. Hezîn carna di hin helbestên xwe de peyhev çar-pênc malik bi erebî nivîsine. Wek mînak:

120 Yakup Aykaç, “Kurtenêrînek li dor Dîwaneke Bêhempa: Dîwana Hezîn”, *Nûpelda*, j. 15, Wan 2014, r. 51.

121 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Lêkolîn û Şirove Perwîz Cîhanî, weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r. 996. Ji bo bikaranîna van zimanan û agahiyên zêdetir bnr. İzeddin Mustafa Resûl, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf Olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, wer. Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2007, r. 186.

Tereqqe fî selali mi`l-huda neḥwe`l-ʿula dewmen
Kemalu`l-mecdi bi`l-weṣli dewamu`l-weṣli bi`l-wicdan

Îẕa şahedte în ʿame`l-ḥebîbî kûn lehû ʿebda
Îza eṣbeḥte ʿebden yemlu`l-qelbu mine`l-ʿirfan

Febi`liʿirfani yelqe`l-mer û eʾla ẕirweti`l-wecdî
We bi`l-wecdî yere`l-qelbu ḥudûren muʿdime`l-eḥzan

Leqed cabe`l-**Ḥezîn**û min zuhûri`l-wecdi baqatin
ʿEla texti`l-huḍûri ṣareke`l-ebdali we`s-sulṭan (90/10-11-12-13)

#### 1.8.1.1. Ayet

Helbestvanên klasîk her dem di helbestên xwe de cih dane ayet û hedîsan, nemaze di helbestên dînî-tesewifî de ji hin ayet û hedîsan jî îqtibas kirine. Dîwana Hezîn jî ji aliyê ayetan ve gelek dewlemend e.[122] Bo nimûne em ê li vir ayetên zêdetirîn hatine îqtibas kirin, bidin.

1) يَٓا اَيُّهَا الَّذٖينَ اٰمَنُوا اتَّقُوا اللّٰهَ وَكُونُوا مَعَ الصَّادِقٖينَ

Hey gelî yên ku bawerî anîne! Xwe ji (ezabê) Xweda Teala biparêzin û bibin digel rast û duristan. (Tewbe: 9/119)

2) كُلَّ يَوْمٍ هُوَ فٖي شَأْنٍ

Ew, her gav di karekî ji hev cuda de ye. (Rehman: 55/29)

Ji bilî van, di gelek helbestan de jî Hezîn rasterast ji wan îqtibas nekiribe jî îşareta ayetê dike. Bi vî rengî jî gelek nimûneyên ayetan di helbestan de hene. Bo nimûne di vê malikê de behsa mucîzeya Hz. Salih (as.) dike ku Xwedê Teala ji çiyayê bi mucîzeya xwe hêştirek diafirîne û dîsa Hz. Mûsa jî bi mucîzeya Xwedê ji keviran ava zelal derdixe:

Ji bağiran deve dibit, ji keviran zelal dizêt
Ji agiran nûr çêdibit ji şerrê xêr dibilqê tê (139/87)

Ji bo mucîzeya Hz. Salih telmîha vê ayetê dike:
وَاِلٰى ثَمُودَ اَخَاهُمْ صَالِحاًۢ قَالَ يَا قَوْمِ اعْبُدُوا اللّٰهَ مَا لَكُمْ مِنْ اِلٰهٍ غَيْرُهُۜ قَدْ جَٓاءَتْكُمْ بَيِّنَةٌ مِنْ رَبِّكُمْۜ هٰذِهٖ نَاقَةُ اللّٰهِ لَكُمْ اٰيَةً فَذَرُوهَا تَأْكُلْ فٖي اَرْضِ اللّٰهِ وَلَا تَمَسُّوهَا بِسُٓوءٍ فَيَأْخُذَكُمْ عَذَابٌ اَلٖيمٌ: Me ji (qewmê) Semûd re, ji malbata wan –bi

[122] Di ferhenga tîpveguhestina dîwanê de ev ayet ji kîjan sûreyê ne û wateya wan yek bi yek hatine nivîsîn, ji ber vê yekê me li vir ji bo ayet û hedîsan tenê çend mînak dan.

pêxemberî- Salih (şand). Salih got: Ey gelê min! Ellah Teala bihebînin, jê re îbadetê bikin. Ji Xwedê Teala pêştir tu Xweda ji bo we nînin. Ji cem Xwedayê we, ji we re nîşaneke (mucîzeyeke) aşkere hatiye ku ev deveya Xwedê ye, ji we re mucîzeyeke mezin e, dev jê berdin bila ji (çêra) erda Xwedê bixwe (û vexwe), zinhar azarê nedinê! Nexwe dê ezabekî bijan we bigire. (A‘raf: 7/73)

Ji bo mucîzeya Hz. Mûsa jî telmîha vê ayetê dike:

وَاِذِ اسْتَسْقٰى مُوسٰى لِقَوْمِهٖ فَقُلْنَا اضْرِبْ بِعَصَاكَ الْحَجَرَؕ فَانْفَجَرَتْ مِنْهُ اثْنَتَا عَشْرَةَ عَيْناًؕ: Bîne bîra wan; wê dema Mûsa ji bo gelê xwe av xwest. Me jî jê re got: "Gopalê xwe li kevir bide!" (Piştî Mûsa gopalê xwe li kevir da) Di cih de ji wî kevirî dozdeh çaviyên avê derbûn. Her nifşî cihê avvexwarina (kaniya) xwe nas kir. (Me ji wan re got): "Ji rizqê ku Xwedê Teala (daye we) bixwin, vexwin û li erdê fesadiyê mekin." (Beqere: 2/60)

Wekî vê, di dîwanê de gelek nimûneyên telmîha ayetan hene ku me di beşa ferhengê de ew nivîsîne.

#### 1.8.1.2. Hedîs

Di dîwanan de her wekî ayetan gelek hedîs jî hene ku ev, yek ji taybetiyên berhemên klasîk in. Herwiha di helbestên Hezîn de jî ev taybetî gelek xurt e û gelek mînakên wê hene. Ji ber ku me di bin ferhengê de yek bi yek hedîs rave kirine, em ê li vir çend mînakan bidin.

**لولاك لولاك لما خلقت الافلاك**:Eger tu nebûyayî, eger tu nebûyayî min gerdûn çênedikirin.[123]

**كنت كنزا مخفيا فأحببت أن أعرف فخلقت الخلق وتجليت عليهم فعرفوني**: Ez gencîneyek veşartî bûm. Min xwest ku ez werim nas kirin. Ji bo werim naskirin min mexlûqat afirand.[124]

**لا تفكروا في الله , و تفكروا في خلق الله**: Ne zatê Xwedê, mexlûqata Wî bifikirin.[125]

### 1.8.2. Hêmanên Farisî

Di dîwanê de zimanê farisî qasî zimanê erebî zêde nehatiye bikaranîn. Lêbelê, dîsa jî gelek nimûneyên peyvên farisî hene: der (6/8) [di…de], yaban (10/5) [çol], ferda (10/16) [sibe], rah (17/12) [rê], ağû (18/2) [jehr, jar], teyh (19/18) [çol], rencîde (40/3) [dilşkestî],

[123] Aclûnî, Keşfu'l Xefa, II: 164; Hakîm, el-Mustedrek, II, 615.

[124] Ev herdu hedîsên qudsî di lîteratura tesewifê de gelek navdar in lê di kitêbên hedîsan de cih nagirin, ango çavkaniya van nîne. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Ahmet Yıldırım, *Tasavvufun Temel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları*, weş. Türkiye Diyanet Vakfı, Ankara 2013, r. 109 û 132.

[125] Rawiyên vê hedîsê: Taberanî, el-Awsat, 6456; el-Lalakaî, es-Sunne, 1/119/1-2; Beyhakî, Şuabu'l-Îman, 1/75 Ebu Nuaym, el-Hilye, 6/66-67; el-Elbânî, es-Silsiletu's-Sahîha, 4/395.

feryadires (51/6) [alîkar, destegîr], merd (66/29) [mêr, mirov], suxen (68/3) [gotin, peyv], nemek (76/18) [xwê], çeşme (77/39) [kanî], mirat (78/1) [neynik] û hwd. Ji bilî van peyvan hin nîvmalik û malikên tenê bi farisî hatine nivîsîn jî hene. Wek mînak:

Lebaleb beḥra ʿirfanem xiredmendem suxendanem
Der în kişwer çû xaqanem kî men ʿerrafî yek yarek

Der în baġê gulan cuz sosina reʿna nemînasem
Di nêva şehrê dil ġeyrê delalê ra nîne şûnek (77/29-30)

Der în deryayê bî payan şudem nîstî xeber ez men
Ḥezîn jar e xerabḥal e mededxaz e ji te îro (119/19)

### 1.8.3. Hêmanên Tirkî

Wekî peyvên erebî û farisî, peyvên tirkî jî di dîwanê de hene lê li gorî wan hindik in. Di berhemên kurdî yên klasîk de em rastî vê yekê tên. Di *Dîwana Melayê Cizîrî* de jî peyvên tirkî kêm caran be jî rastî mirov tên. Wek mînak:[126]

Ku dilber hate vê **yol**ê ji ber pir hin ketin çolê
Ji qencan ku revand holê ji mehbûban birin nerdê[127]

Kadri Yıldırım di pirtûka xwe ya *Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili* de derbarê peyvên bîyanî yên di Mem û Zînê de derbas dibin, îstatîstîkek wiha dide: kurdî 19601, erebî 6015, farisî 918 û tirkî 26 peyv.[128] Mela Mehmûdê Bayezîdî jî wiha dibêje: “Di nav ekradan da mektûb û kaxezêd wan bi zimanê farisî dibin. Xwendina tirkî û zimanê tirkî kêm dizanin. Kitêbêd zimanê tirkî li nik wan mû’teber nînin.”[129] Li gorî van herdu çavkaniyan û Dîwana Hezîn, rêjeya tirkî a di dîwan û kitêbên kurdî de tên bikaranîn bi awayekî zelal dixuye ku kêm e.

Di Dîwana Hezîn de ji bilî peyvên tirkî, qertafên tirkî jî hene ku hin caran bi wan qertafan ve peyv hatine çêkirin wek: *–ler, –çî, –lî*. Me di beşa *Devoka Serhedê* de behsa vê

---

[126] Me di nivîsîna vê beşê de ji malpera *Nişanyan Etimolojik Sözlük*ê (m.nisanyansozluk.com) sûd wergirt. (21.01.2015)
[127] Mele Mehmûdê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Şêxê Cizîrî*, amd. û wer. Emîn Narozî, weş. Avesta, Stenbol 2013, c. 2., r. 60.
[128] Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, çeviri ve tahlil Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2010, r. 64.
[129] Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, amd. Jan Dost, weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r. 92.

mijarê kiribû. Herçiqas di dîwanê de bi zimanê erebî û farisî malik yan jî riste hatibe nivîsîn jî, bi tirkî em vê yekê nabînin. Li jêrê peyvên tirkî yên ku me tespît kirine, ev in: begler (11/10), gerek (14/21), qanser (14/6), seray (15/8), qertal (15/13), ʻeqreb (17/7), kabûs (18/11), camî û kilîse (24/7), derewçî (24/31), çox (32/4), çam (48/4), daha (69/2), gemî (73/20), çamûr (73/38), mermî (77/85), nefes (51/6), an (77/1), edeblî (77/110), elken (77/131), çizgî (96/17), çewre (96/26), hîle (97/84), qurşûn (105/5), demir (116/16), yağmeker (117/10), esîr (117/11), qertal (117/11), doġrî (130/57), çirûg (132/22).

Ji bilî van me, peyvên biyanî wek ji zimanê suryanî, fransizî, îngîlîzî derbasî tirkî bûne jî di vê beşê de nivîsîn. Wek; temmûz (18/13), hezîran (97/145), balîne (108/7), park û pilaj (24/7). Divê em vê tiştê diyar bikin ku Hezîn, peyvên tirkî dîsa di çarçoweya kêşa helbestê de bikar anîne û di risteyên kurdî de bi hosteyî ew bicih kirine. Ev jî nîşan dide ku di qada helbestê de Hezîn yekî şareza û pispor e.

ʿEreb, kurd û ʿecem, koçer û **begler**
Hemî ġerq bûn di beḥra feyża Xezna (11/10)

Di qanûna qedîmî da
**Gerek** weha neba ya Reb (14/21)

Çîkekê agir **seray** wêran diket
Yek xeyalek pîs serûbin dike qelb (15/8)

**Park** û **pilaj** û medrese, **camî** û çarşû`w **kilîse**
Tijî jê dêlê tazî ye, heywax li min dîn çû ji dest (24/7)

Rastî çûye maye derew, hîşarî çûye maye xew
**Derewçî** nin îro qelew, heywax li min dîn çû ji dest (24/31)

Şingîna xişrê zîv û zêr kerwanê ʿişqê radikir
Bal menzilan ve rê dikir bi şahiy û leẕẕetê **çox** (32/4)

Bil merovê kordil e nîne tu kes
Bi gunehan ketye **çamûr**a firaq (73/38)

Dibit ṭav û qûm û germ û ġubar û ʿillet û zeḥmet

Sih û sosin xweşî û raḥetîy û **elkenê** hûnik (77/131)

Heval û hogir û **çewre** xirabxûy û qirêjîn bin
Heçî meʿna ji wanan tê qirêj û pîs e ey insan (96/26)

Dil bide rotkena pîran tê da nehêl **çirûgîyê**
Bikevî xarê ʿalemek bi te dibe helak mela! (132/22)

Wekî me di beşa *Jiyan û Berhemên Hezîn* de jî behs kir, Hezîn bi tirkî jî pirtûk nivîsîne û ev yek jî nîşan dide ku ew şarezayê vî zimanî ye. Dîsa di wan pirtûkên xwe yên tirkî de gelek caran bi tirkî helbest nivîsîne. Herçiqas pirtûkên wî yên tirkî hebin û ew di zimanê tirkî de şareza be jî, di dîwana xwe de cih nedaye helbestên xwe yên tirkî.

### 1.9. Cotepeyv û Dubarekirina Dengan

Di zimanan de hin bêje hene ku ji bo ku vegotinê bihêztir bikin û wateya îfadeyê xurt bikin bi bêjeyên wekî xwe, nêzî xwe yan jî dijberî xwe re tên bikaranîn.[130] Hingê vegotina mirov bêtir bihêz û bandorker dibe. Em dibînin ku di *Dîwana Hezîn* de jî gelek cotepeyv û dûbarekirina dengan hene: fedî û şerm, derd û ġem, nas û dost, ġar û doj, mest û serxoş, aram û hedan, reng û rû, kok û rîç, mal û melal, mar û mûr, kar û bar, cerg û mîlak, zûlal û berf, xîp û xalî, ax û xalî, dor û mador, med û cezîr, dar û ber, şeş û bêş, şeng û şox, qal û şer, heyl û meded, xar û xes, qirş û qal, deng û beng û hwd.

ʿIşqa cemala sermedî weqta ku ruḥ di dil danî
Me ra nema **şerm û fedî** lew aşikar nalîne dil (81/5)

Pêçek ji dêman rakirî biskê di reş lê bakirî
Qelbê birîndar şad kirî wê dilbira pur **şeng û şox** (32/1)

Ji bilî cotepeyvan, di helbestên Hezîn de gelek caran dubarekirina dengan derdikeve pêşberî me. Lê gelek caran dengên bi vî awayî dengên sirûştî ne û gava ku Hezîn behsa bûyerên sirûştê yan jî dengê ajalan kirine ev peyv bi kar anîne. Wek mînak: gummîn û

[130] Ji bo cotepeyv û cûreyên wan, bnr. M. Zahir Ertekin, Zafer Açar, "Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi,* c.1, j.1, Ocak 2015, r. 82-92.

zimmîn, hay û hûy, xişr û xuş, ûffîn û kuffîn, qîj û qîj, wiş û wiş, ax û ox, tar û mar, wîlwîl, ġulġul, xuşxuş, ḥukḥuk û hwd.

Ev çi **gummîn û zimmîn** e **dar û ber hey hey** dikin
**Wîlwîl**ê ṭeyran e derya tê li pey hev **cezr û med** (33/10)

Me go dilber, bes e evqas **êş û derd**an nede me
Gote çer wer tu dibêjî, ev çi ḥal e **wiş û wiş** (60/7)

**1.2. Şêwaz**

Gava ku helbestên Hezîn tên nirxandin, bêşik kurdî/kurmanciyeke sade û zelal bala mirov dikişîne. Hezîn hemû helbestên xwe bi erûzê nivîsîne. Vê rewşê bandoreke neyînî li helbestên wî nekirine. Li berevajiyê vê qet serwa, paşserwa û kêşa helbestan xera nebûne.

Ew têgeh û mezmûnên farisî û erebî gelek caran di helbestên Hezîn de xwe bi zimanê kurdî nîşan dide. Bo nimûne, li malika jêrê helbestvan bedewiya evîna xwe bi kurdiyeke zelal dişayesîne:

Dûr bûm ji wê lêvşekkerê wê kewmeşa rûfennerê
Wê rûgeşa xalʿenberê lewra her roj bi zar e dil (81/2)

Hezîn di helbestên xwe de gelek caran ji çanda kurdan mînak hildane û helbestên xwe bi wan ve xemilandine. Helbestvan li malika jêrê evîna xwe ya îlahî bi rindahiyên dinê ve dide berhev, lê ev rindahî diyar e ku ji çand û civaka kurdan e. Lewra eşîra Heyderiyan di nav kurdan de bi kezî û biskê jinên xwe yên bedew û xweşkok ve navdar in. Herwiha rakirina xêliyê ji serê bûka nû jî di jiyan û çanda kurdan de cihekî gelek girîng digire. Hezîn, ev herdu nimûne di helbesta xwe de wiha honandiye:

Ne bi baġan û kulîlkan ne bi serxêlîyê bûkan
Ne bi biskê Ḥeyderî xweşyê dibînit mestî ruḥ (28/18)

Şêwaza çîrokî yên ku di helbestên Hezîn de cih digirin, gelek caran xwe di qesîdeyan de aşkere dikin. Hezîn gava ku di helbestên xwe de behsa bûyereke tesewifî yan jî dînî dike hingê, zimanekî rojane bi kar tîne û serî li vê rêbazê dide. Ji ber ku yek bi yek vegotina xelekên bûyeran bi vî awayî hêsantir e. Di helbesta 124’an de serdana Îmamê Xezalî ya ji bo

zatekî mezin, bûye çîroka helbestê.[131] Mijara çîrokê tîne ser hedîsa Hz. Pêxember (asw.) ku dibêje: "Bê navê Xwedê, destpêkirina her karekî nîvco û nivîşkan e."[132] Bêyî besmele çêbûna genim, piştî xwarinê di însan de dibe sedema xefletê dibêje:

Ġezalî rojekê dosto
Çû cem zatekî ey dosto

Nêrî xelq cot dike lê ew
Zevîyê tov dikey dosto
…
Ġezalî ra bikey ṣuḥbet
Ji bo te hatîye dosto

Tu here cem, dêla te ez
Zevîyê tov dikem dosto
…
Bi qurretîyê pozê xu
Bilind nedikirin dosto

Ji ṭofanê semawî ra
Hedef nedibûna dosto (124/32-33, 40-41, 60-61)

Wekî vê, di helbesta 126'an de şeş çîrokên cuda; di 130, 132 û 140'an de jî çîrokek hene. Em dikarin bibêjin ku bi vî awayî di menzûmeyan de vegotina çîrokan şêwazeke cuda daye Hezîn.

Hezîn carna wek şêweya vegotina çîrokên helbestkî, xwe di guftûgoyan de jî aşkere dike. Guftûgoyên wekî "*min got, wî got*" mînanî axaftineke rojane di helbestan de cih girtine. Di vê mînakê de jî helbestvan bi dilberê re diaxive:

Min go dilber, tim weha be ʿişk û mişkan şîn bikey
Got qebûl e, ger tu bavêjî ji xu koka futûr

Min go narîn, meṣderê her derd û dermanan tu yî

[131] Di vê çîrokê de navê Îmamê Xezalî derbas dibe lê navê wî zatî derbas nabe. Gava me ji Seydayê Mela Husnî ew zat pirsî, hingê ji me re got: "qasî ku tê bîra min ew zat 'Eliyê Ramitenî ye, lê dîsa jî baş nayê bîra min." (Yakup Aykaç, 03.01.2015)
[132] Îbn Hanbel, II, 360. (*Hadislerle İslam 1*, weş. Diyanet İşleri Başkanlığı, c.1., Ankara 2014, r. 173)

Ji gihanê dûr mekey dil, ger tu xinc key can bi şûr

Got, bi yaran ra heval be neynika dil pak bidêr
Da temamen roj di mirata dilê te ket ṭuhûr (41/4-5-6)

Hezîn di helbestên xwe de hin ravekan tim û tim bi kar tîne. Em dikarin bibêjin ku ev ravek ligel kesayetiya helbestvan nêrîna wî ya jiyanê û şêwaza wî dide der. Ravek û gotinên wekî *atûna qetanê, dozexa evînê, dirrîyê qetanê, rinda derdan, baxirê şînan, yabana firaq, arê qetanê, atûna evînê, yabana qetanê* û hwd. di helbestên Hezîn de gelek caran xwe dubare dikin ku helbestvan wateyek taybet li van bar kirine. Li gorî Hezîn, dinya cihê veqetînê ye. Lewra beriya ku însan were dinê, ruhê mirov li cem yara mezin (Xwedê) e. Piştî ku însan tê dinê, ji yara xwe diqete û lewma her dixwaze ku vegere cem yara xwe. Ji ber vê yekê, ji evîndar re dinya cihê cudabûn, çola êş û xeman e. Lewra evîndar ji hatina dinê û heta mirinê her tim bi ah û gîrîn e, gihîştin (wesl) bes bi mirinê hasil dibe. Di vê helbestê de jî em vê yekê dibînin:

Dûritî yabana derd û êş û ahînê kûr e
Lew ji dergûşê ḥeta gorê bi ah û zar e ruḥ (28/2)

Ji ber vê yekê, helbestvan di vê dinê de xwe yekî xemgîn, bi êş û keser dibîne, lewra dûrî yara xwe ye. Lewma em dikarin bêjin; ji ber van sedeman helbestvan xwe wek mirovekî *hezîn* (xemgîn) dide nasîn û vê mexlesê bi kar tîne:

Pur bi êş û dilkul û mest û xerabê firqet im
Fir didit ḥuzna **Ḥezîn** rojek dibit şahî gelo? (116/20)

Lêbelê, Hezîn di helbestên xwe de ji ber qetanê xemgîniya xwe bîne zimên jî tu car bêhêvî nîne. Pirî caran bihêvî ye ku dê rojek bi yarê re wesl/gihîştin pêk were. Helbestvan li vir û di gelek cihan de îşareta ayetên ku dibêje "*bêhêvî nebin*"[133] dike û xwe wisa teselî dike:

Nebe bê hêvî Ḥezîn ma hey zivistan bê behar
Gul dîsa dê şîn bibin firqet dîsa dibit ʿebeṣ (26/22)

Ḥezînê jar û aware, wekî sêwyan sitûxar e
Bi luṭfa te umîdwar e, bûye qurban ji ʿişqê ra (8/24)

[133] Di Quranê de gelek cihan di derbarê *bihêvîbûn*ê de ayet hene. Bnr. Yûsuf: 12/87, Zumer: 39/53, Rûm: 30/36.

Hezîn, di helbestên xwe de hin caran tercîha peyvên kurdî yên resen kirine. Ango, peyvên ku di kurdî de tên bikaranîn lê ne kurdî ne, tercîh nekirine. Bo nimûne; tirm (term, cenaze), qemitîn (zeliqîn), hûrzan (alim, zana), hûker (mi‘elim), çar awir (çar teref), xudbîn (egoîst), xudanînî (dilnizmî), perhîz (teqwa, xwe ji gunehan parastin) û hwd. Ev jî nîşan dide ku Hezîn di zimanê kurdî de gelek kûr bûye.

Çemengah û gulistan û çiyayê tev gul û reyḥan
Mîna hingiv **diqemite** bi wan ve mêşa dil ya Reb (17/13)

**Çar awirê** dil dîwar e, jêr û jorê wî ye ar
Dişewite wekî dar e, hey hewar ey dest(i)keş (60/4)

Berê tu zarokê xu ra
Ḥeqîqî **hûker** î bavo (130/39)

Dîsa em dibînin ku Hezîn carna bixwe jî hin peyv çêkirine. Di Dîwana Hezîn de çar caran peyva Hezargolê derbas dibe ku di dewsa Bîngolê de bi kar aniye. Hezîn li şûna “bîn” a tirkî “hezar”a kurdî xistiyê. Lê ya balkêş ev e ku Hezîn rasterast navê Bîngolê ya bi kurmancî (Çewlîg an jî Çepeqçûr) an jî kurmanckî (Çolig) bi kar neaniye. Herwiha peyvên wek dajo (şofêr, ajovan, ajoker), firoker (balefir), Xudêçû (Xudêrewan) û hwd. jî ji ber xwe çêkirine. Jixwe ev jî taybetiyeke helbestvanan e ku bi peyvan re dilîzin û kirasekî nû li wan dikin.

Diyarbekr û **Hezargol** û Mûşa dilber û Kurdistan
Hemî milkê te bin dîsa tu têr nabî tu nankor î (148/4)

Gelo **firoker** bê şofêr çawa bi jor ve fir didit
Ya geştîyê qebtan nebit ma ew li deryayê çi ket (23/5)

Di dîwana Hezîn de bi tevahî 149 helbest hene ku hemû jî bi kêşe hatine nivîsîn. Serwa û paşserwa di edebiyata klasîk de qasî kêşeyê girîng in. Ji ber vê yekê di edebiyata klasîk de tiştê ku gelek caran derdikeve pêşiya me ev e ku gelek helbestvan ji helbestên beriya xwe hatine nivîsîn, îqtibas û nezîre kirine.[134] Ev taybetî di edebiyata klasîk de tiştekî asayî ye

[134] Di edebiyata kurdî de mînakên vê gelek in. Bo nimûne; di helbesta *Wê Ji Nû Cezba Evînê* ya Pertew Begê Hekkarî ji *Şox û Şengê* ya Melayê Cizîrî, malika *dil ji min bir dil ji min* îqtibas kiriye û li ser vê helbestê nezîre nivîsiye. Ji bo helbestên *Wê Ji Nû Cezba Evînê* û *Şox û Şengê* bnr. Perto Begê Hekkarî, *Dîwan*, amd.

û me nimûneyên wê di helbestên Hezîn de nîşan dan.[135] Ji xeynî wan, di dîwanê de gelek helbest hene ku bi serwa an jî paşserwayeke nû hatine nivîsîn, ango, Hezîn ji helbestvanên beriya xwe îqtibas an jî nezîre nekirine. Di sêrî de paşserwayên daçekî bala mirovan dikişîne ku Hezîn daçekên "ra, da" wek paşserwa bikar anîne. Herwiha wekî serwa û paşserwayên xweser wekî: ya Reb, Xezna, çû ji dest, yar, dilber, el-xelas, insan, hene, -a te bû, dilo, bavo, lawo, xorto û hwd. hene.

Gujgujî ser berxê dil şahînê ʿişqê el-xelaṣ
Daye nêv pencê qetanê yara dilbêş el-xelaṣ (61/1)

Ronîya qad û semayê ṭîrêjek nûra te bû
Hatina her ʿalemê têk da bi fermana te bû (115/1)

Yek ji taybetiyên şêwaza Hezîn ev e ku di helbestên xwe de gelek cih daye *tekrîr*an, ango rêzeke dawiya malikek an jî çarînek di hemû helbestê de hatiye dûbarekirin. Di helbestên Hezîn de jî bi vî rengî gelek nimûne hene, wek: "heywax li min dîn çû ji dest", "ya Reb li me rehmê bikey", "Şahê Xeznayê meded", "rabe ji xew rabe dilo", "gelî dost û gelî yaran", "te rihlet kir ji dunyayê" û hwd.

Payîza paşîn e îro
Dilê min ġemgîn e îro
Li min ḥuzn û şîn e îro
Gelî dost û gelî yaran!
...
Ḥezîn im çav tijî xûn im
Bi axîn û bi gîrîn im
Hewarê bal we ve tînim
Gelî dost û gelî yaran! (99/1-31)

Carna ev tekrîr di rêzekî de jî dixuye.

Mekey cana were êdî kula bengî bikey hêdî
Şewitîn em şewitîn em şewitîn em bes e dilber

---

Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 235.; Melayê Cizîrî, *Dîwan*, amd. Emîn Narozî, weş. Avesta, Stenbol 2012, r. 185.

135 Bnr. Beşa 3. Helbestvanên ku Bandor li ser Hezîn Kirine.

Bi çavê şefqetê carek binêre bo Xudê xanim
Birîndar im birîndar im birîndar im hewar dilber (45/10-11)

Di edebiyata klasîk de taybetiyeke cuda jî heye ku hin helbestvan gava ku helbestê xwe dinivîsînin, di helbestê de sal an jî temenê xwe jî diyar dikin. Ev taybetî di Edebiyata Klasîk a Kurdî de piranî di helbestên Feqiyê Teyran de xwe nîşan dide. Wekî vê, di Hezîn de jî carna ev taybetî berçav e. Bo nimûne Hezîn, vê helbesta xwe di şevekî payiza sala hîcrî ya 1402'an (m. 1982) de nivîsiye.

Lewra *şevek ji şevê payîza* kurt
Dema çêkir gerdena van cewheran

*Di sala hezar û çar ṣed û dudyê*
Hicrê da me tercume kirye bizan (97/154-155)

Hezîn hin arîşeyên edebî wek "*helbest çi ye, sînorên wê çi ne, helbest ji bo kê ye*" li gor xwe dibersivîne, li cihekî hizr û boçûnên xwe yên di derbarê helbestê de der dibe.[136] Li gorî Hezîn, divê helbest ji bo malê dinê û pesnê dinê nebe. Ango helbest ji bo rindahî û bedewiya dinê, jinê û tiştên fanî nîne. Divê mijar û zimanê helbestê her û her Xwedê û îlahî be. Dîsa axaftin û helbestên bê dilber (Heq, Xwedê) dişibîne xwarina bêxwê û mîna tiştekî kelî dibîne. Ji ber vê yekê mijarên helbestên xwe jî diyar dike ku derbarê tiştên fanî û karê dinyayê de nîne.

Gora qanûna zimanan tu bipeyv
Tevlihev diket bê qanûn gotinan

Her bi qanûnê qezîdan dilber e
Xoy nebit xarin kelî tê ser ziman (97/54 û 55)

Helbestvan gava ji yekî din re pêşniyaza nivîsîna helbestê dike hingê dîsa bi terza xwe ya şîretwarî, di rêya xwe de çûyînê pêşniyaz dike. Lewra li gorî Hezîn helbest bi pesnê Heq, bi tiştên baqî ve dikemile û digihîje asteke bilind. Lê ne, eger behsa tiştên dinyewî bike hingê helbest di vê dinê de dikeve ber piyan, li erdê dimîne û dihetike. Bi nêrîna helbestvan, ji bo helbestê asta herî nizm bi tiştên fanî ve mijûlbûn e.

---

136 Ji bo arîşeya "helbest çi ye, helbestvan kê ye" bnr. Mahmud Erol Kılıç, *Sûfî ve Şiir, Osmanlı Tasavvuf Şiirinin Poetikası*, weş. İnsan Yayınları, İstanbul 2014, r. 103-117.

Şiʿrê çêkey, lê reha min da here
Karê dunyayê nede qeṭ ber çavan

Pê bixaze pesnê ḥeq berdana ḥeq
Ber bide qencîyê ne pesnê jinan

Şiʿr nîşan e ji kemal û feżlê ra
Pur hêja ye dema nekev ber nigan

Bernigîya şîʿrê wek were gotin
Bona pê malê dunê were civan (97/56-59)

Hezîn piştî pênaseya şi'rê di çend cihan de pesnê helbestên xwe dike, helbestên xwe bi nêrînên xwe dinasîne. Jixwe di destpêka dîwanê de jî diyar kiriye ku Hezîn helbestên xwe tenê wekî helbest nabîne; her wiha wekî çemeke xweş, kaniya ilm û hikmetê, ji nexweşiyan re mîna derman dibîne û gazî gel dike ku ji bo werin, bixwînin û jê sûd werbigirin.

Ne şiʿre welê ev çemenek xweş e
Li der û li dorê wê av bilqîne

Heşan ra hesan e dilan ra nûr e
Kulan ra şifa ye ji can ra jîn e

Werin lê binêrin û lê bigerin
Çemenekî pur xweş û ġemrevîn e (111/16-17-18)

Hezîn di helbestên xwe de gelek caran xwe di rewşeke xirab de dibîne, halê xwe yê perîşan vedibêje û lavayê Xwedê dike. Hezîn carna jî dibîne ku êdî tu kes guhdariya wî nake û şîretên wî nagire, hingê dîsa ji Xwedê alîkarî dixwaze û ji bo ku ew werin rêya rast dua dike.

Xudêyo iḥsan bikey, inʿam bikey
Belkî ev şîreta, şîn be`l hindikan (97/139)

Ya Reb tu ḥeq navê xu key, dînê mubîn wenda nekey
Me nailê luṭfa xu key, heywax li min dîn çû ji dest (24/37)

Bi umîda gîştina yarê **Ḥezîn** jînê dike
Ya Îlahî! La texeyyîbuhû iẕa me`l-leylu dac (27/8)

Me di vê binbeşê de ji bo nirxandina şêwaza Hezîn hewl da û cudahiyên wî derxistin holê. Wek tê dîtin, di şêwaza Hezîn de gelek taybetiyên cuda hene ku wî ji helbestvanên din cuda dike. Ji ber vê yekê em dikarin bigihîjin vê encamê ku şêwaza Hezîn xurt û dewlemend e. Herwiha di helbestên Hezîn de taybetiya herî berçav şêwaza wî ya şîretî û tesewifî ye ku li seranserî dîwanê de ev yek tê hîskirin. Em ê di bin serenava *Naveroka Helbestên Hezîn* de li ser van mijaran yek bi yek rawestin.

## 2. WÊJEVANÊN KU BANDOR LI SER HEZÎN KIRINE

Hezîn jî wek gelek helbestvanan, di bin bandora helbestvanên mezin ên kevn de maye û ji wan sûd wergirtiye. Hezîn wan helbestvanan wiha rêz dike: "…bêşik gelek şa'ir û kitêb te'sîr li min kirin. Bo nîmûne di kurdî de Dîwana Cizîrî, Mem û Zîna Xanî û Rewdu'n-Ne'îma Şêx Evdirrehmanê Aqtepî; di farisî de Mela Camî, Hafizê Şîrazî, Mesnewî, kulliyata Sadî Şîrazî û Îbnû'l Xeyam; di erebî de jî Îbnû'l Farid, Hesan bin Usabîd, Meqamata Herîrî, Lamîyetû Îbnî Werdî, Nûniyetû Sibtî, Muellaqatî Seba, qesideya Burdiyye û hwd."[137] Digel van Hezîn gelek dîwan, qesîde û helbestên kurdî jî jiber kirine.[138] Li vir em dibînin ku Hezîn, li qada şi'rê de gelek jîrek û şareza ye. Ji ber vê yekê em nikarin rasterast bibêjin ku bandora vî helbestvanî gelek e yan jî kêm e. Em ê li vir bi tenê çend mînakên helbestvanên kurdînivîs li gorî bandora wan, nîşan bidin.

### 2.1. Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî, di edebiyata kurdî de ekola tesewifê temsîl dike. Di dîroka edebiyata kurdî de di asta dîwana wî de dîwan nehatine nivîsîn. Cizîrî bi helbestên xwe, bandorek gelek mezin li ser helbestvanên piştî xwe hatine, kiriye.[139] Yek ji wan helbestvanan jî Hezîn e. Jixwe Hezîn di bîranînên xwe de diyar dike ku wî pirî helbestên dîwana Melê jiber kirine.[140] Li jêrê, em ê bo vê yekê mînakan bidin.

1. Nezîreya "ġeleṭ" e ku paşserwa û kêşa herduyan yek e:

**Melayê Cizîrî**:

[137] Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.
[138] Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî,* r. 42.
[139] Adak, *b.n.,* r. 210-211.
[140] Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r. 42.

Mey nenoşî Şeyxê Sen‘anî ġeleṭ

Ew neçû nêv Ermenistanê ġeleṭ[141]

**Hezîn**:

Dil di rahê ʿişqê da nîne ġeleṭ

Ruḥ di cez̲b û coşê da nîne ġeleṭ (65/1)

2. Nezîreya "ʿebes̲" e ku bi tenê paşserwaya van yek e:

**Melayê Cizîrî**:

'Umrê zayî' bû me bê dilber ʿebes̲

Wey tevê 'umrê me borî ber ʿebes̲[142]

**Hezîn**:

ʿUmrê bê dilber heba ye cehda bê ʿişqê ʿebes̲

Jîna bê rehber bela ye qelbê bê nûr e ʿebes̲ (26/1)

3. Nezîreya "çerx" e ku paşserwa û kêşa herduyan yek e:

**Melayê Cizîrî**:

Heyheya reqs û semaya te çi xweş bestiye çerx

Ku di bircê bi sema têt li ser destê xwe berx[143]

**Hezîn**:

Wek me yê rojreş nîne kes dikşîne azarê çerx

Êş û derdan hey dibarîne me ra ġeddarê çerx (29/1)

4. Nezîreya "-er" e ku bi tenê serwa û kêşa van yek e:

**Melayê Cizîrî**:

Xelqno li min kin şîretê ew dilbera zerrînkemer

Min dî di halê xefletê hat der ji bircê wek qemer[144]

**Hezîn**:

Dilber ji burcê hate der ya Reb çi ḥusnek bû li ser

ʿAlem hemî têk nûrî bû hilbû ji afaqan qemer (43/1)

5. Nezîreya "bes" e ku paşserwaya herdu yek e:

---

[141] Melayê Cizîrî, *Dîwan*, transkrîpsiyon Arîf Zêrevan, weş. Nefel, Stockholm 2004, r. 122.
[142] Cizîrî, *b.n.,* r. 66.
[143] Cizîrî, *b.n.,* r. 88.
[144] Cizîrî, *b.n.,* r. 97.

**Melayê Cizîrî**:

Dil yek e dê ʻişqi yek bit ʻaşiqan yek yarî bes
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildarî bes[145]

**Hezîn**:

Vekey dilber ji dêman perde û bendan delalî bes
Nîşan de ṣûretê sêvîn ji dildaran veşarî bes (52/1)

6. Nezîreya "mela" ye ku paşserwa û kêşa herduyan yek e:

**Melayê Cizîrî**:

Îro ji derba xencerê lazim biêşan î Mela
Teşbîhê zulfa dilberê zanim perîşan î Mela[146]

**Hezîn**:

Pur pur bizane qedrê xu tu ruḥê ʿalem î mela
Cihan ḥeyatê nakey qeṭ bê te bi yek demê mela (132/1)

7. Nezîreya "ġereḍ" e ku paşserwa û kêşa herduyan yek e:

**Melayê Cizîrî**:

Me ji bil husn û cemalê çi ġereḍ
Bê cemalê ji peyalê çi ġereḍ[147]

**Hezîn**:

Dil ji bil yara berîn nîne ġereḍ
Gîştina wê yar*ê* ye dil ra ġereḍ (64/1)

Herwiha Hezîn di dîwana xwe de sê caran behsa Melayê Cizîrî dike ku di wan de pesnê wî hem di qada ilmê de û hem jî di qada evîn û helbestê de dide:

*Melayê* me`y *Cezîrî* her bi ʿilmê
Dunê da nam û şan daye biray min (95/17)

Nuqṭekî ṭûmara ʻişqê tête qas Şerḥa ʿUbab
Çilkekî barana ʿişqê tête wek deryaya gêj

[145] Cizîrî, *b.n.,* r. 110.
[146] Cizîrî, *b.n.,* r. 212.
[147] Cizîrî, *b.n.,* r. 118.

Pur wekî *Cezrî* û Miksî dane dersa metnê ʿişq
Jîna wan gîşte nihayet pur dîbace mabû hêj (50/2-3)

Wek ji van mînakan tên dîtin ku Hezîn gelek di bin bandora Melayê Cizîrî de maye. Di gelek helbestên xwe de nezîre kirine û bi heman şêweyî helbest nivîsîne.

### 2.2. Ehmedê Xanî

Hezîn wekî li jorê jî me diyar kiriye, gava behsa kitêbên ku bandor li ser wî kirine dike, nemaze navê Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî dibêje û piştre gelek caran behsa xwendina vê dike. Û herweha qala çend helbestên Xanî jî dike.[148] Diyar e ku Hezîn wekî Melayê Cizîrî, ji Xanî jî gelek sûd wergirtiye. Bo nimûne li jêrê em ê bi çend mînakan ve van binimînin.

1. Nezîreya "çi (bi)ket" e ku paşserwa van yek e:

**Ehmedê Xanî**:

Mîrê meclîs nekenit, mûtrîbê goya çi biket
Xunçe xendan nebitin, bulbulê şeyda çi biket[149]

**Hezîn**:

Dil bû pureng ji meḥbetê, bê yara hîvrû dê çi ket
Yarê divêt qelbê murîd, cennet û ḥoran dê çi ket (25/1)

2. Nezîreya "-im ez" e ku paşserwa wan yek e:

**Ehmedê Xanî**:

Seydê pencahê serê zulfa şeha şehbaz im ez
Mestê cama îşweya şehnazê nazik naz im ez[150]

**Hezîn**:

Furatên ġem li min wer bûn li kohê dil birîn der bûn
Jêr û jor da hîskek hilbûn gelî yaran ġerîq im ez (46/1)

3. Nezîreya "-ef" e ku serwa û kêşa herduyan yek e:

**Ehmedê Xanî**:

---

[148] Yakup Aykaç, "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.
[149] Evdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, weş. Keskesor, Stenbol 2002, r. 115.
[150] Durre, *b.n.,* r. 224.

Ez çûme baxê sorgulan wextê sehergahê bi xef
Min dî sedaya bulbulan dagirtibûn her çar teref[151]

**Hezîn**:

Şukur îro şahê şeref hat baġê dil bi nay û def
Mizgîn ji ruḥ ra be ku şah serdana wî kirye hedef (70/1)

Herwiha gelek malikên wekî hev jî hene:

**Ehmedê Xanî**:

Me dî neqşek ji neqşê Neqşebendan
Vebû qeydê di min yek yek ji zendan[152]

**Hezîn**:

Neqşekî neqşî dixazî dil girêde`b Xeznewî
Nisbeta rengîn dixazî hey li mala Xeznewî (136/1)

Ji xeynî van, Hezîn di dîwana xwe de gelek caran navê Mem û Zîn der dibe, evîna wan tîne zimên:

Nayête şerḥ û qelemê, hezkirina **Zîn** û **Mem**ê
Ne vê demê ne wê demê, rake ji rûpelan qelem (89/3)

Wekî bayê ṣeba qeṭ nîne aram û hedana me
**Mem** im îro di zindanê gelo **Zîn**a şîrîn kanê (94/8)

Herwekî van, navê Beko jî di helbestên Hezîn de cihê xwe digire:

Wek **Beko**yan karê wê şeyṭanî ye
Yar ji yaran dûr dixîne şev û roj (49/60)

Herwiha navê Ehmedê Xanî jî di helbestên Hezîn de diborin:

Bi ʿilmê **Eḥmedê Xanî** wekî roj
Bûye meşhûrê afaqan biray min (95/18)

Bixûne tim bixûne tim bixûne tim bixûne tim
Bibe zana bibe zana bibe zana mîna **Xanî** (142/35)

---

[151] Durre, *b.n.,* r. 244.
[152] Durre, *b.n.,* r. 276.

### 2.3. Şêx Hadiyê Qewmanî

Me di *Jiyana Hezîn* de jî behs kir ku Hezîn cara yekem di medreseya Şêx Hadî de xwendiye. Hezîn di pirtûka xwe ya *Kûlxaniya Veşartî* de behsa jiyana Şêx Hadî kiriye û ji qesîdeyên wî çend mînak dane. Herwiha di bîranînên xwe de jî wiha behsa wî dike: "...di hona edebiyatê de jî xwediyê baskekî dirêj bû. Xwediyê îbareyeke areste bû. Di zimanê erebî û kurdî de xwediyê fesahet û belaxeteke mezin bû..."[153] Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin Şêx Hadî yekemîn mamosteyê Hezîn e û bandora wî li ser Hezîn çêbûye. Hezîn gelek caran di pirtûkên xwe de behsa Şêx Hadî kiriye. Em ê li vir çend mînakan ji helbestên Şêx Hadî û Hezîn bidin ku vê yekê baştir bibînin.

**Şêx Hadî**:

Hey ho hewar hey ho hewar, hey wax li min dînê mubîn
Heywax û feryad û sitar, hey wax li min dînê mubîn[154]

**Hezîn**:

Heywax li min heywax li min, heywax li min dîn çû ji dest
Şikestî peymana elest, heywax li min dîn çû ji dest (24/1)

Di gelek murebbe'ên Hezîn û Şêx Hadî bi heman teşeyî ve hatine honandin. Wek mînak:

**Şêx Hadî**:

Ez bêkes û feqîr im
Îmdad û gazî Seyda
Xweş bende û esîr im
Îmdad û gazî Seyda[155]

**Hezîn**:

ʿIzzuddînê şîrîn kanê
Delala ġemrevîn kanê
Hedana dilḥezîn kanê
Hewar e bazê Xeznayê (144/1)

[153] Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r.14.
[154] Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî, *Dîwan*, amd. Muhammed Seydaoğlu, Nûbihar, Stenbol 2011, r. 37.
[155] Qewmanî, *b.n.,* r. 61.

Di dîwana Şêx Hadî de tenê 14 helbest hene ku bes bi 2 hebê ji wan bi şiklê malikan û yên din jî bi şiklê murebbe‘ê hatine nivîsandin. Ji ber vê yekê em nikarin zêdetir minakên mînanî hev bidin. Lêbelê gava ku mirov murebe‘ên Şêx Hadî û Hezîn dinêre hemû helbestên wan hem ji aliyê şiklî û zimênî û hem jî ji aliyê naverokî ve nêzî hev in. Ev yek jî nîşan dide ku bandora Şêx Hadî bi awayekî aşkere li ser Hezîn çêbûye.

### 2.4. Şêx Elauddînê Xeznayê

Hezîn gava ku li medreseya Şêx Ehmedê Xeznayê dimîne, li cem Şêx Elauddîn dixwîne, jê sûd werdigire.[156] Di navbera Hezîn û Şêx Elauddîn de hem têkiliyeke feqî-seyda, hem mirîd-murşîd û hem jî xwendekar-helbestvan çêdibe. Lewra Hezîn, “di helbestê de herî zêde te’sîr li min kir şi‘rên Şêx Elauddîn e” dibêje.[157] Dîwana Şêx Elauddîn nîne lê du helbestên wî di pirtûka *Dîwana Cami‘* de me tespît kirin ku em li ser van helbestan hûrbûn.

**Şêx Elauddîn**:

Em zelîl in em feqîr in ya Resûlûllah meded
Em esîr in em heqîr in ya Hebîbûllah meded[158]

**Hezîn**:

Ketime tennûra ‘işqê şahê Xeznayê meded
Perritîm tê da seraser şahê Xeznayê meded (36/1)

Wekî vê, di vê helbestê de jî heman terz bala mirov dikişîne.

**Şêx Elauddîn**:

Hewar sed hewardar im
Ji ber nefsê xerabhal im
Ji wî Şahî recakar im
Meded ya Şahê Xeznayê[159]

**Hezîn**:

Hewar û ṣed hewar îro
Keremkar û medar îro
Ji nîv me çû biġar îro
Hewar e bazê Xeznayê (144/12)

---

[156] Hezîn, *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, r. 65.
[157] Yakup Aykaç, “Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn”, mp3., 02.02. 2014, Stenbol.
[158] Mela Ehmedê Qoxî, *Dîwana Cami‘*, weş. İhsan, Diyarbekir 2004, r. 414.
[159] Qoxî, *b.n.,* r. 418.

Wek tê dîtin pêwendiya ku di navbera helbestên Şêx Elauddîn û Hezîn de heye, berçav e. Ji ber kêmasiyên nimûneyên helbestan lêkolînên me bi têra xwe kûr nebe jî mirov ji van herdu helbestan dibîne ku navbeyna şêweya herdu helbestvanan manendinek heye ku ev jî bandora Şêx Elauddîn nîşan dide.

Herwiha di dîwanê de em dibînin ku Hezîn navê Şêx Elauddîn gelek caran der birine û li ser wefata wî jî mersiyeyek nivîsiye:

Ji hecra Şah ʿElauddîn dilê min pare bû îro
Ji ferqê ser ḥetta pê da beden têk bû kebab îro

Nema me ṣebr û aramek ji ber jana tîra hecrê
Birîn kûr e elem dişwar û mame bê ṭebîb îro (119/1 û 2)

### 2.5. Melayê Bateyî

Mela Huseynê Bateyî yek ji helbestvanên kurdan ê klasîk e. Ji helbestên wî diyar dibe ku di edebiyata kurdî de mahir bûye.[160] Di edebiyata kurdî de mewlûdnivîsê yekemîn e ku bi Mewlûda xwe ve tê nasîn. Herwiha piştî Bateyî di edebiyata kurdî de çi mewlûd hatine nivîsîn, di bin bandora wî de mane.[161] Em di helbesta 97'an de vê bandorê bi zelalî dibînin. Ji aliyê ruxsarî ve kêşa wan wekî hev in, ji 162 malikan pêk tê. Lê em vê yekê jî diyar bikin ku ev helbest wek şerha *Qesîdeya Lamiyye* ya Îbnî Werdî hatiye nivîsîn lê Hezîn tiştên din jî li ber xwe zêde kirine û bi şeweya xwe ev helbest nivîsiye.

**Melayê Bateyî**:

Hemdê bê hed bo Xwudayê ʻalemîn
Ew Xwedayê daye me dînê mûbîn

Em kirine ummeta xeyr-ul beşer
Tabiʻê wî muqtedayê namiwer[162]

**Hezîn**:

Pesnê bê dawî Xudê ra bin ku Wî
Daye me Îslam û Quran û îman

[160] Mela Huseynê Bateyî, *Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, amd. M. Xalid Sadinî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r.30.

[161] Ziver İlhan, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013, r. 3

[162] Melayê Bateyî, *Mewlûd*, amd. Huseyn Şemrexî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 9.

Em kirine pêçûyê peyġemberê
Ûmmeta wî çêtirînê ûmmetan (97/1-2)

## 2. NAVEROKA HELBESTÊN HEZÎN

Di helbestên Hezîn de gelek mijarên cuda hene ku vê jî ji aliyê naverokê ve dewlemendiyek daye *Dîwana Hezîn*. Hin helbestên Hezîn serdanpê bi tenê li dor yek mijarê hatibe honandin jî hin helbestên wî jî mijarên cuda dihundirîne. Herwiha ji aliyê naverokê ve helbestên lîrîk, dîdaktîk, tesewifî û rexneyî sereke bin jî mijarên wek fanîbûna dinê û xapandina wê, ibadet, nefs û daxwazên wê, xûyê qenc, mirin, borîna zeman, zanîna qedr û qîmeta xortaniya mirov, şikayeta zeman, bêrîkirina welêt, bedewiya sirûştê hwd. hene.

### 1.2. Helbestên Lîrîk

Di helbestên lîrîk ên dîwanê de işq û halê wecdê tên dîtin. Helbestvan coş û xiroşa xwe di van helbestan de der birine û bi awayekî aşkere van hestên xwe ragihandine xwendevanan. Hezîn di qada işqê de xwe zana û pispor dibîne. Mezinahiya işqê, derdê dil, halê dilan baş dizane û xwe di vê qadê de dide ber helbestvanên mezin ên wek Melayê Cizîrî û Siyahpoş. Dibêje ku di rêya işqê de hinek hal jî hene bes ez tenê dizanim, hêj agahiya Mela û Siyahpoş nîne.

Tenê dizanim ez çiqas giran e derdê dilê jar
Nakeve ṣed Şerḥa ʿUbab nanivîsîne ṣed mela

Hinek newal û rê hene li ʿalema ḥalê dilan
Li qadê wê neketîye çavê Siyahpoş û Mela (133/3-4)

Gava em li helbestên Hezîn yên lîrîk dinêrin hingê dibînin ku helbestvan di şopa helbestvanên klasîk de çûye. Şayesandina wî ya işqê, pêwendiya dilber û bengî, renckeşiya di rêya işqê de, nêrîna işqê û hwd. wekî helbestên klasîk ên beriya wî ne. Digel vê yekê, tê dîtin ku Hezîn şêwaza xwe jî parastiye û bi hevoksazî û kurdîyeke sade hestên xwe der birine. Helbestvan di helbestên lîrîk de xwe wekî bengî dibîne û gelek caran dûrî ji yara xwe ye û her tim bi işqa wê ve dikele.

Roj bûne meh, meh bûne ṣal gelo xuya naket delal
Demek me ra nabe heval, evînê dîza dil keland (37/15)

Dilberê dil da danîye bi dûrîyê ṣed şîş û daġ
Biskeynê kesk vewşandîye dil kiriye fena û daġ (68/1)

Ji ber dûrîtiyê Hezîn her dem di nav êş û elemê de ye. Tim û tim derd û kulên xwe bi saya helbestên xwe, tîne zimên. Di helbestên xwe de geh dinale geh dikale, ji ber vê yekê xwe dişibine teyr û tuyên di spêdeyan de dixwînin, kundê li ser kavilan, sêwiyên li ber dîwaran û bilbilên baxan û hwd.

Ez dinalim şev û rojan weku ṭeyrê di seḥer
Lew dilê jar da hene ṣed kul û ṣed derd û keser (39/1)

Dûr bûm ji wê lêvşekkerê wê kewmeşa rûfennerê
Wê rûgeşa xalʿenberê lewra her roj bi zar e dil (81/2)

Helbestvan dizane ku rêya işqê rêyeke zor û zehmet e. Dîsa dizane ku beriya wî gelek bengî û dilber hatine û çûne; wekî wî renc û azara işqê kişandine. Lê gava ku derdkêşiya evîndarên wek Mem û Zîn, Şîrîn û Ferhad, Leyla û Mecnûn dide ber renckêşiya xwe, hingê ya wan li ber ya xwe wekî çêlika çûçikan dixuye.

Mem û Zînê, Şîrîn û Ferhad dibin
Cem dilê ġem dîdeyê me wekî ferx (30/4)

Helbestvan bengî ye û yara xwe digere. Dizane ku tenê wesl/gihîştina yarê ji derd û kulên wî re derman in. Dîdar/nêrîna yarê ji agirê dilê bengî re av e. Ji ber vê bengî çendî bêhal û perîşan be jî dixwaze xwe bigihîne yarê. Lê dizane ku gihîştina yarê ewqas ne hêsan e. Lewra xwe bi van gotinan ve teselî dike; kê ku tiştek bixwaze divê zehmetiya wê jî bikişîne.

Tarîy û sermê dibînit, ê divêt ava ḥeyat
Germ û tîbûnê dibînit, ê diçit keʿba murada (4/4)

Herwiha helbestvan dizane ku evîna dilê bengî ne bidil be, gihîştin pêk nayê.

Çûm nêv civata bulbulan purs kir ji weṣla ṣorgulan
Gotin, evîn ji dil nebit dilber bi dîdarê çi ket (23/9)

Dixwaze nîşan bide ku di dilê wî de evîneke heqîqî heye. Ji ber vê dijwariya gihîştina yarê nayê ber çavê wî. Yara xwe di behreke bêbin de wek durra tekane dibîne û xwe jî ligel wan talûkeyan, gerrînkerê wê dibîne.

Yê ku boy durra yetîm ket beḥra bêbin bê kelek
Yê ku maye bê hewar nêv pencê pêlan da ez im (83/2)

Helbestvan piştî demekê êdî dixwaze ku ev zehmetkêşiya wî bila biqede û lewra xwe şewitiyê di dojeha işqê de dibîne û nikare êdî ber xwe bide.

Êdî bes e dilber were, can perritî sertasere
ʿIşq e ji karînê der e, êşê emana me birand (37/17)

Bi ahîn û bi kovan in, wekî bulbul delovan in
Şev û rojan bi efġan in, li yaran ev neyarî bes (52/6)

Herçiqas dilber ji bo bengiyê ji bo ku ispatkirina evîna xwe renc û cefayê jî bide kişandin jî bengî, dilbera xwe li ser her tiştî dibîne. Wekî malika li jêrê dibêje, pêlava yarê tacê padişahê dinê ye.

Şêmûka wê balgeh e birûyê têk şan û nîşan
Pêlava yarê ji şahanê cihanê ra ye tac (27/3)

### 3.2. Helbestên Dîdaktîk

Hezîn di helbestên xwe yên dîdaktîkî de şêwazeke şîretamîz bikar aniye. Ev şêwaza şîretamîz di gelek helbestên Hezîn de dixuye û em dikarin bibêjin ku yek ji wan şêwazên sereke di helbestên Hezîn de ev e. Herwiha helbestvan di helbestên xwe de carna ji xwe re, carna jî ji yekî din re şîretan dike. Di dîwanê de bi tena serê xwe ve helbestên wek pendname hatine nivîsîn hene. Wek mînak, bi 47 malikan ve di helbesta 132’an de Hezîn hemû aliman bi şêwazeke şîretamîz hîşyar dike û nesîhetan li wan dike:

Pur pur bizane qedrê xu tu ruḥê ʿalem î mela!
Cihan ḥeyatê nakey qeṭ bê te bi yek demê mela! (132/1)

Wekî vê helbesta Hezîn, heft helbest hene ku serwaya wan xorto, dosto, apo, bavo, lawo, cano û qelbo ne û bi şêwazeke şîretamîz hatine vegotin. Di wan helbestan de Hezîn carinan çîrokek yan jî qisseyek vegotiye û dû re jî li ser van bûyeran şîret daye û dersek jê

derxistiye. Bo nimûne di vê helbestê de di derbarê xwarina helal û heramiyê de li ser navê xortekî li herkesî şîret dike:

Ruḥê insan ji xûna qenc
Dibit paqiş hilo xorto

Xûna insan bi xarinê
Dibit paqiş û qenc xorto

Eger xarin bi ġeflet yan
Bi ḥeramî çêbit xorto

Diḥerrimit xûn û tarî
Dibit ruḥê te ey xorto (126/73-76)

Hezîn diyar e ku li ser şîretê zehf zêde disekine. Lewra aliyekî wî yê tesewifî jî heye ku di terîqetê de şîret pir girîng e. Hezîn rewşa mirovên ku guh nadin şîretan dişibîne mirovên kor ku roj hilbe jî ava be jî ji bo wan ferq nake:

Nuṣḥê bê guhdana şagirdê çi ket
Dengê şîrîn bi ker û kerran çi ket

Ronîya şîretê pîr ronî diket
Dil û can, lê roj bi koran dê çi ket (19/1-2)

Hezîn ji bilî van di gelek mijaran de şîret dide ku yek ji wan fêrbûna ilm û zanînê ye. Di gelek cihan de li ser xwendin, fêrbûn û zanînê radiweste û li ser girîngiya wê disekine. Herwiha ji mirovên alim û zanayên kurd wek Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Şerafedînê Bilîsî, Şêx Evdirehmanê Axtepî, Melayê Sêrtî, Şêx Elaudînê Oxînî û hwd. mînakan dide:

Xandin te ra xweş esas e biray min
Zanîn te ra bivr û das e biray min
...
Bi zanînê dibî meşhûr û meʿrûf
Bi zanînê dibî bîtkel biray min
...

Şerefuddînê Beṭlîsî bi ʿilmê
Bela bû nav û dengê wî biray min

ʿEliyyê me`y Ḥerîrî lo hevalo
Bi ʿilmê ketye tarîxan biray min (95/1-8-19-20)

Hezîn di gelek mijarên olî de jî şîretan li mirovan dike wek mijarên ibadet, nimêj kirin, xwendina Quranê, girîdana pîrekî, perhîziya ji gunehan, emelkirin û hwd. Wek mînak:

Bixûne Qurana bi nûr, bizane wan meʿnayê kûr
Dirêj dibin tîrêj ji dûr, bi wan dibin dil germ û nerm (89/10)

Da xweş bizanit ehlê dil, dunya ne ya dildanê ye
Da ew ʿibadet kin ji dil, vê nuktê da nîne tu reyb (16/4)

Bi bendê wan ve xu bigir bendê dî bavêjê meqes
Şîretê wan bigre bi can bibe li dor wan wek mekes (52/5)

Em şîretkirinê di pirtûka *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî de jî dibînin ku Xanî serê her beşê bi şîretkirinê daye destpêkirin. Xanî di vê berhema xwe de ji ser navê zarokan herkesî şîret dike.

Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf
Di dunyayê tu nabî ne meşhûr û ne me'rûf[163]

Hezîn jî bi heman şêweyî piranî li ser xort û ciwanan şîretan dike lê wekî Xanî şîretên wî ji bo herkesî ne.

Bi zanînê dibî meşhûr û meʿrûf
Bi zanînê dibî bîtkel biray min (95/8)

Wek encam ji piraniya helbest û malikên şîretamîz mirov têdigihîje ku Hezîn şîretkirinê hez dike. Helbestvan bi vî awayî tevgerên dîdaktîk û şîretamîz carna ji xwe re, carna jî ji yekî din re nîşan dide. Dixwaze ku mirovan her tim gazî rêya rast bike. Di şîretên xwe de jî her tim ji kesên alim û zana mînakan dide.

[163] Ji bo şîretên Nûbihara Biçûk bnr. Dilazad A.R.T., "Di Nûbihara Biçûkan de Şîret", Nûbihar, j. 124, Stenbol 2013, r. 26-30.

Hezin di gelek helbestên xwe de mirovan di mijara bêhêvîbûnê de hişyar û şîret dike. Di helbestên xwe de îşareta ayetên Quranê dike ku di gelek ciyan de ji bo misilmanan derbarê bihêvîbûnê de şîret û hişyarî hene.[164]

Qeṭ mebe dilṭeng **Ḥezîn** têt piştî şînê şahîtî
Fir didit rojek ji ser dil derd û azarîya çerx (29/12)

### 3.3. Helbestên Rexneyî

Hezîn digel helbestên dîdaktîkî û şîretî, rexneyên xwe jî di helbestên xwe de kêm nekirine. Carna xwe carna kesekî din, carna jî civata ku tê de dijî rexne dike. Di dîwanê de helbestek seranser tenê li ser rexneyê nebe jî, rexne jî ligel şîretê cih digirin. Hezîn di van helbestên rexneyî de ber wan jî dikeve û heyfa wî ji wan tê. Bo nimûne di van çarîneyên li jêrê de rexneya guherîna dem û civatê dike û ligel vê yekê ber xwe dikeve. Di hundirê wî de metirsiyek jî heye ku di tekrara çarîneyan de dilovaniya Xwedê dixwaze.

Pîqrûtê jinan pir bûne
Serqot û sîng tazî çûne
Kes nabêje ma hûn kî ne
Ya Reb li me reḥmê bikey

Tê tazî jin çente di dest
Digre bi pîlê xortê mest
Mêr nabêje çi ye te qeṣt
Ya Reb li me reḥmê bikey (135/15-16)

Hezîn civata misilman rexne dike. Di vî zemanî tevgera misilmanan wekî ya kafiran dibîne, terikandina nimêj û taʻeta wan tîne zimên. Herwiha di serdema kapîtalîzmê de mirovan ji aliyê malê dinyayê ve, ketina pey pere û tiştên din ve rexne dike. Ji ber van sedeman xerabûna têkiliyên malbatî, hovbûna mirovan bi zimanekî edebî der dibe:

Ax muslumanê navgiran, tevgerra wan wek kafiran
Dîn dan bi zêran û peran, heywax li min dîn çû ji dest

Bûne neyar bav û biran, dilʿişk bûne wek keviran
Hev didirin mîna guran, heywax li min dîn çû ji dest (24/11-12)

---

[2] Ji bo ayetên derbarê bihêvîbûnê de bnr. Zumer 39/53, Sebe 34/17, Taha 20/48, Aʻraf 7/156 û yên din.

Helbestvan di helbestên xwe de carna dozaja rexneyê tûj dike. Li vir kesên ku bawer nakin, baweriya xwe ji Xwedê re nayînin rexne dike. Lewra wisa dibêje ku; wan mirovan ji kesên ku beriya wan hatine wek Fîrewn, Qarûn û hwd. ders negirtine, eqlek ji wan negirtine û wî ew şibandine *kerê Misrê*. Ev jî biwêjeke kurdî ye ku di wateya xêv û aqilsivikiyê de tê bikaranîn.

Kerê kufrê tu dîn î ẓen dikem ya cahil î lewra
Cesûr î wek kerê Miṣrê didî avê ḥeta navêk (77/17)

Li cihekî din jî helbestvan mirovên hezkerê malê dinê dişibîne *mêşan* û dinyayê jî wek *sillopa rêxê* dibîne û dûre rexneyên xwe li wan dike. Dibêje ku mêş silopa rêxê wek mêrg û çîmengehek û xwe jî wek bilbilê vê baxê dibîne. Lewra dinya û malê dinê nerast e dibêje û kesên ku baweriya xwe vê dinê re anîne û axiretê ji bîr kirine, rexne dike.

Mêş dibêjit bulbul im sillopa rêxê çîmen e
Lew li ser wê fir didit tê û diçit dorê ra xweş
...
Bi dunê kêfxweş dibin ʿekrût û kêmê wekî mêş
Lewra her tiştek bi cinsê xu diket rabûn û roş

Gerçî rengkesk e silopa rêxê çimen ẓen mekey
Ger xeberdar î ji xeḍrai`d-dimen xuy ʿeql û hûş (58/4-6-7)

Dîsa li cihekî din mirovên ku ji pey nefsa xwe diçin, daxwaziya wan dikin dişibîne *kerên ku palas datînin pişta wan* û şev û roj ji bo xwediyê xwe dixebitin. Dinyaya din jî ango axiretê jî wekî *meclisa şahan* nîşan dixe. Lewra dibêje, kesê ku pey nefsê biçe nikare bikeve bihişta ezelî. Ew kesê ku bihiştê nexwaze jî *ker* e û palasa pişta wî jî mafê wî ye:

Dûrî yaran û meqaman e kesê pê nefsê çû
Nayêtin meclisa şahan kerê laîqê palas (53/5)

Wek encam mirov dikare bibêje ku zimanê Hezîn gava rexneyî be li gor helbestên din bêtir hişk dibe. Hingê mirov dikare bibêje ji helbestên Hezîn dikeve rengê helbestên *Axayokê Bêdarî* ku di edebiyata kurdî de bi rexneyên xwe ve navdar e.[165] Herwiha Hezîn rexneyên xwe

[165] Axayokê Bêdarî di helbesteke xwe de wiha yekî din rexne dike: "Şêrê ji heft bavê xwe şêr de'wa bi şêrtî nakitin / Tûlê pîsê heft kopekan 'ew'ew dikit eslan im ez" Ji temamê helbestê bnr. Tehsîn Îbrahîm Doskî,

piranî mijarên bi dîn re têkildar in, kirine. Herwiha rexneyên wî carna ji bo kesekî carna jî ji bo civatê ne. Ji vir mirov dikare bibêje ku Hezîn bi civatê re her tim elaqeder bûye û serê xwe bi pirsgirêkên wan re êşandiye, lewra di helbestên wî de ligel rexneyê xemxurî, berketin û kesirîn jî hene.

### 3.4. Helbestên Hîkemî û Tesewifî

Hezîn qasî ku helbestên dîdaktîk, helbestên hîkemî û tesewifî jî nivîsîne û hejmara wan jî gelek in. Mirov dikare bibêje ku sedema vê yekê rewşa ku Hezîn tê re derbas bûye ye. Lewra Hezîn ji biçûktiya xwe ve di medreseyan de maye, li wan deran mezin bûye û her tim întîsabê şêxekî kiriye, ango piraniya jiyana wî di bin siya terîqa Neqşîbendî de maye. Ji ber vê yekê rengê tesewif û terîqetê di helbestên wî de bi awayekî zelal dixuyê. Lewra di helbestên Hezîn de bi dehan têgehên tesewifê hene û helbestvan li ser wan sekiniye û ew rave kirine. Herwiha mijarên tesewifî di şiklê helbestên klasîk de hatine heciqandin û ji aliyê dînî ve hatine qedexekirin, wek *mey*, bi awayekî mecazî hatine bikaranîn.

Ḥezîn herdem dinoşit xelqê`j destê dostê mey nabê
Ḥeyata vê dunê xweş hat welê zivr e ji bo min ra (1/14)

Dilkul û jar û belengaz, mestê cama ʿişqê me
Qimekê min jê vexarî ʿumrê borî pur surûr (42/13)

Di tesewifê de çar xalên bingeh hene ku bi navê *şerî'et, terîqet, heqîqet* û *me'rîfet*ê tên zanîn. Hezîn gelek caran di helbestên xwe de behsa wan têgehên tesewifî dike.

Îman çûye maye guman
Şerʿ û ḥeqîqeṭ qeṭ neman
Werd û ṭerîqet bûn dûman
Ya Reb li me reḥmê bikey (135/2)

Herçî bibînî ḥeqq e ew, herçî bibêjî rast e ew
Ḥeqîqeta tiştan te ra her weke hêk û hêlî tê (139/54)

---

"Axayokê Bêdarî Şa'irê Rexnegir", *Nûpelda*, j. 14, Wan 2013, r. 44-47.

Hezîn dilê ku bi nasîna Xwedê tijî bûye dişibîne gula li ber avê. Lewra gul û darên li ber avê çawa her dem geş û rewnaq dimînin, dilê ku tê de baweriya Xwedê hebe û Wî nas bike, ew dil jî wekî wê ye, dibêje:

Dilê bû mexzena îman û ʿirfanê dibit geş wek
Gula ber ro dibit menẓûr bi her ḥal û bi her anek (77/1)

Dilopek ava ʿirfanê ji dil ra bit neṣîb carek
Dimînit saġ û geş ḥetta ebed bê êş û bê derdek (77/26)

Mirov ji aliyê afirandinê ve du alî ye. Aliyê yekem ev e ku bi çav tê dîtin, cismî û bedenî ye. Yê din jî aliyê me‘newî ye. Di aliyê me‘newî de ruh, sir, dil/qelb û hwd. gelek têgeh hene ku ji van re letaîf tê gotin.[166] Di dîwana Hezîn de em rastî gelek têgehên bi vî awayî tên. Hezîn ruhê mirovan carna wekî bengî carna jî wek çûk dibîne. Herwiha Xwedê jî wekî dilber, sosina ku hîç naçilmise, yara eslî, yara napeyda dibîne. Dinya jî di vê pêwendiyê de mînanî zindan e ku ruh bi hatina dinê ve edî wekî mirovê dîl e û tim dixwaze ji zindanê derê ango ji vê dinyayê biçe diyarê eslî û bigihîje dilbera xwe.

Wuṣay pur nebîne serxoşî û mestîya ruḥ cano
Ku meʿşûq ẕatê napeyda ye ʿaşiq ruḥ e qenc cano (128/107-108)

Gelo kengê difirrit çûka ruḥ bal dilbera yekta
Li henber sosina tim geş mîna bulbul dibit şeyda (10/8)

Derdê dil, yar û diyarê eṣlî ye
Lew dinale wek pepûkan şev û roj (49/12)

Dil yan jî qelb di gelek ciyan de bi heman wateyê de hatine bikaranîn. Li gor helbestvan îman/bawerî di dilê mirov de ne. Xwedê li vir tecellî dike û dil jî *mezherê Wî* û *mecla cemala Wî* ye. Li hemberê tîrêjên zahirbûna Xwedê wekî hêlî/neynik e. Gava ku Xwedê li dil tecellî dike hingê dil di nûra Wî de serxweş dibe, her tişt wekî leylanê dibe lê çi dibîne û çi dibêje rast e û heq e.

Weya tecellayek Xudê ronî dide qelbê te da
Dil ġerq bikey nûra xu da serab te ra şerabî tê

[166] Ji bo letafet, letaîfê xemse, letaîfê sîtte bnr. Cebecioğlu, *b.n.,* r. 307.

Herçî bibînî ḥeqq e ew, herçî bibêjî rast e ew
Ḥeqîqeta tiştan te ra her weke hêk û hêlî tê (77/53-54)

Tîrêjik wê nûra mora gewez bavêje ser qelbek
Dixemle ew dila dest da, çu gulzar û gulistanî (137/3)

Ṭîrêjekî nûra zelal, ji yarê bû dil ra heval
Ruḥ bû li henber ker û lal, ġerq bû di beḥra feyż û luṭf (70/3)

Yek ṭîrêjek nûra zelal daye di qelban da şemal
Hilkir di qelbê bengîyan arekî wek arê seqer (43/4)

Hezîn şîretên xwe arifane û gotinên xwe wekî ravekirina sirran dibîne. Ji ber vê kesên cahil û ehlê dinyayê nikarin her dem gotinên Hezîn têbigihîjin. Helbestvan îdraka razan ne tenê bi eqlî, her wiha bi dil û işqî dibîne. Lewra gelek tişt di vê dinê de hene ku ji derve wek hev dixuyên lê hundirê wan cuda ne.

Ey Ḥezîn îdraka razan nîne karê her kesî
Gerçî wek hev bin di şeklê dîtin û bîstina goş

Nêm û nafe wek hev in lê nêm elem û êş e her
Emma bêhna nafeya xweş, xweş diket mêjûy nexoş (58/8-9)

Ji bilî van, di dîwanê de têgehên tesewifî wek şuûnat, lutf, feyz, cûd, fuyûdat, nisbet, xeflet, şîrk, fisq, fucûr, irfan, raz, sir, esrar, ixlas, ihsan, zikr, hikmet, tecellî, lamekan, mezher, zahirbûn, cemal, xilqet, saqî, mey, şerab û hwd. gelek in. Ev jî nîşan dide ku helbestên Hezîn bi tesewifê re zêdetir têkildar in.

Derê cûd û fuyûḍatan ji jaran ra vekey cana
Di yabana qetanê da Ḥezîn mame gihan kanê (94/14)

Lê îro em hatine ser kanîya ava ḥeyat
Meḥrûmê avê nekey saqî tihê teyha ʿebeṣ (26/12)

Işq li gorî Hezîn sedema hebûna kewn û aleman e. Xwedê bi evînê hemû afirîde afirandine. Hemû hêmanên asîmanan wek stêrk, hîv, roj, gerestêrk, ewr bi işqê di kewnê de digerin. Mirov eger çavên xwe veke û li jor binêre dê hingê bibîne ku di tevgera wan de guherînek tu car çênabe (77/7-8). Heta ku roja qiyametê jî ev gera wan dê bidome, lewra bi bendê işq û evînê ve li hev hatine girêdan.

Evîn sirr e bo çêkirina Xudê
Hemî mexlûqê ku me dîne û nedîne
...
Sitêr û hîv û roj û ʿewr û hewa
Bi ʿişqê yeka yek emrê pêk tîne

Di nav wan da bendê evînê ku hey
Ḥeyat ḥetta hebe wanan digerrîne (108/3, 9-10)

Hezîn qala mezinahiya işqê jî dike. Ji bo têgihîştina wê dide ber hev ku mijar zelaltir bibe. Helbestvanên gewre Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî herçiqas jiyana xwe di rêya işqê de borandibin jî, di mijara işqê de hêj gelek pêşgotin li pêşiya wan maye, dibêje. Hezîn işqê wek behreke bêbin û bêkevî dibîne. Ji ber vê yekê, ji evîndarên mezin Mensûrê Hellac û Îbnî Erebî mînakan dide û behsa xenixandina wan a di behra işqê de dike.

Nuqṭekî ṭûmara ‘işqê tête qas Şerḥa ʿUbab
Çilkekî barana ʿişqê tête wek deryaya gêj

Pur wekî Cezrî û Miksî dane dersa metnê ʿişq
Jîna wan gîşte nihayet pur dîbace mabû hêj

Deryaya ʿişqê gir e lew bêkenar û bêbin e
Xendiqîne tê da ṣed Ḥellac û Muḥyeddîn ji mêj (50/2-3-4)

Mijara pîr, şêx û mirşîd di dîwana Hezîn de gelek caran derdikeve pêşberî me. Hezîn, her tim dilgirêdana mirşîdekî rastîn dike, wan mînanî mirovên rast, zana û destegîr dibîne. Hezîn wan dişibîne nêrgiz û sosinên xweşbêhn û ter û taze. Lewra mirov eger dilê xwe bi wan ve girêde hingê mirov jî wek wan xweşbêhn û pakruh dibe. Yan ne, hingê mirov wek xar û strînan dibe û bêhna pîs jê tê. Hezîn di helbestên xwe de carna îstînadê ayeta 119. a sûreyê Tewbê dike.

Bibin tev li rastan, Xudê gotîye
Ji gotina ḥeq berê xu nezvirîne

Der û dorê rastan gul û sunbul in
Der û dorê xaran hemî isturîn e (106/17-18)

Digel zanan hevalî û mijûlî şîrîn e kar e
Nezanan ra hevalî mirin e, ṭal e wekî jarek

Ji zanan nêzikî karek hêja ye lewra tê girtin
Ji baġan bêhna xweş ya nêrîna xweş ya şîrîn dengek (77/175-176)

Kesên ku dixwazin bigihîjin miraz/evîna xwe, divê destê mirşîd bigire. Mirov bes bi kesekî rêya sulûkê dizane, dilê xwe bi nûra Xwedê ve tijî kiriye, kamil bûye digihîje miraza xwe. Divê ji suhbetên wan sûd werbigire. Ji ber ku rêya ke‘bê (miraz, evîn) rêyeke dûr û dirêj e. Di vê rê de bi hezaran xar û xes hene ku mirov bi tena serê xwe ve nikare bimeşe.

Gulek taze nûrek ṣade pîrek bîtkel divêt dil ra
Ji çûna bal meqaman ve divêt destegîrek dil ra (9/1)

Dil birîndar e bi ʿişqê, dîtina yarê şifa ye
Jana wî janek giran e, ṣuḥbeta pîran dewa ye (103/1)

Her dem bi şîretê pîran derman bikey qelbê birîn
Birîna qelbê xu bizan di qelbê ʿalem da mela! (132/23)

Wekî piranî helbestvanên klasîkan Hezîn jî di bin bandora hizra *wehdetu‘l-wucûd* de maye. Di helbestên xwe de gelek caran rengê vê hizrê dixuye. Li gor vê hizrê ji bilî hebûna Xwedê tu tişt di alemê de nîne. Lewra alema xeybî û batinî ji hebûna Xwedê pêk tê. Ji ber vê yekê alem û kewnê de çi hebe tecelliya Wî ye. Kulîlk, sosin, nêrgiz, dar û çîmen hemû li ber çavê helbestvan wek hêlî/neynik dixuyê û cihê diyarbûna Wî ye.

Gul û rîḥan û sosin tev benefş û sunbul û sêvan
Bûne hêlî ji ḥusna dêmdurra bêçûn di baġan da (3/17)

Meẓherê ḥusna te ye herçî kulîlkê der çimen

Lewra bulbul ser dinale wek ney û ṭenbûr û rûd (34/4)

Bêhna yara eṣlî jê tê, çi dikî ḥorî cinan
Wekî ava kewṯerê ye çilkê ser belgê hewes (55/5)

Mestê ḥaletê dil im ez bengîyê nûra Xuda
Wek sîperrik can didim lew bûm bi yarê rû bi rû (120/4)

Di helbestên Hezîn de herçiqas pesn û şayesandinên beşerî hebin jî, ew ji bo vegotina işqa îlahî wek obje û remz hatine bikaranîn. Lewra helbestvanên ehlê tesewif hizr û boçûnên xwe yên di derbarê heqîqetê de bi rindahî û xweşikiyên beşerî tînin ziman. Li gor wan rûyê dilberên gulîn tecelliya îlahî dinimîne. Wekî wan keziyên reş, birû û bijang tiştên din dinimînin.[167] Hezîn jî ev yek di dîwana xwe de bi terzeke xurt nexişandiye.

### 3.5. Hin Mijarên Din ên Girîng

Ji bilî mijarên li jor gelek mijarên din jî di helbestên Hezîn de hene. Di dîwanê de du helbest derbarê welat û hesreta welêt de hene. Di sêrî de em dikarin bibêjin; Hezîn, piştî ku koçî Stenbolê dike (1987) ji helbestên wî jî diyar e ku bêriya welêt dike. Hezîn carna behsa zozan, newal, deşt, çiya, çemên welatê xwe dike û hesreta dilê xwe tîne zimên. Hezîn di vê helbestê de tîne zimên ku bi kêfa xwe welatê xwe terk nake. Rewşa welêt a xirab jî kêm zêde bilêv dike û hêvî dike ku rojekê welat jî dê ji rewşa xirab derê.

Çiqas bêjim tu şîrîn î
Pir delal û ġemrevîn î
Wek cenneta derewîn î
Ax welato ax welato
...
Meraq nekin rojekê tê
We ra dibe xêra Xudê
Xellaṣî we ra çê dibê
Ax welato ax welato (123/1-15)

[167] Kılıç, *b.n.*, r. 58-59.

Hezîn di helbesta din de jî xweşî û bedewiya welêt (Gêxî) bi Efes a navçeya Îzmîrê re dide ber hev. Rindahiya dar û ber, newal û çîmenên welatê xwe dişibîne Efesê.

Gêġî ye`b dar û bî ye nûrîn newal û çîmen e
Têk kulîlk û yasemîn e pur şîrîn e wek Efes (55/1)

Hezîn di dîwana xwe de heşt caran peyva *Kurdistan* bi kar aniye. Di wan malikan de mirov dibîne ku evîneke mezin ji bo Kurdistanê heye. Lewra helbestvan ji bo ku bigihîje yara xwe ya mezin (Xwedê) herî dawî Kurdistanê jî qurban dike. Lewra li ber dilê wî welatê wî zehf şîrîn e; zozan, deşt û çiyayên wî li tu cihî tuneye. Herwiha li gor helbestvan Kurdistan welat e; cihê alim, heval û dilqencan e; lê welatên din ne wisa ne dibêje û tim û tim pesnê welatê xwe dike.

Gerçî Kurdistan û Gurcistan nêz in
Lefẓê dalê hey di nêv wan da firaq

Lewra Kurdistan şûna meʿnarewan
Emma Gurcistan cihê dostê firaq

Lewra Kurdistan şûna dilqencan e
Emma Gurcistan cihê şeklê firaq

Lewra Kurdistan şûna xû nerman e
Emma Gurcistan cihê sincê firaq (70/47-50)

Merovê Kurdistan digel zozan û avê wê nedî
Îran û Turan û ʿIraq ber çavê wî cennet dibî (140/22)

Helbestvan gelek caran behsa fanibûna dinyayê, reng û rewşa wê, derewbûna mal û milkê dinê dike. Hezîn di helbestên xwe de dinê wekî jina qehpik dibîne. Her rojên wê ji hev cudatir e, dost û hevalên wê her diguhêze; ango dinya ne ew tişt e ku mirov pê baweriya xwe bîne û jê re bibe heval.

Geh dikenne geh digîre ji me ra
Karê wê xapandin e her şev û roj

Bi muradan şad dike carî dilan

Carî dî ġemgîn dike wan şev û roj

Wek jina qehpe nîne jê ra qerar
Diguhêze dost û yaran şev û roj (49/53-54-55)

Li ciyekî din jî bi heman şêweyî dinê ji derve wek bûkeke xemilandî lê, di hundir de mînanî pîrejinek rûpîs û xûyxirab dibîne û teswîr dike.

Tê bi der ve her wekî bûkekê xemlandî dunê
Lê bi hindûr pîrejinek ʿekrût e wek jar e helm (87/9)

Helbestvan, gelek caran di helbestên xwe de pênaseya dinê dike.

Dunya ne ya dildanê ye, warê derd û qetanê ye
Kûlġanîya her janê ye, her niʿmetê wê ber ʿedem (89/11)

Di dîwanê de tiştên ilmî jî hatine vegotin. Di nav van de mentiq, exlaq, sîyer, mucîzeyên pêxember û hwd. di serî de dixuyin. Di vê mînakê de jî diyar e ku Hezîn ji ilmê mentiqê nimûneyek dide û rave dike.

Di ʿilmê menṭiqê da ker mis̱al e ittifaqê ra
Ewêk wê ra dinasit ḥukm di nêv guhkê xu da kerek (77/84)

Di helbesta 141. de ku ji 87 malikan pêk tê, Hezîn gelek ji mucîzeyên Hz. Muhemmed (asw.) rêz kirine. Di wan de çûyîna mîracê, zayîna avê ji nav tiliyên Wî, girîna koka dara xurmê û hwd. Û dîsa di vê helbestê de Hezîn behsa rewşa wî zemanî jî dike, ji xûy û xeysetên dewra cahiliyê jî mînakan dide wek saxesax binaxkirina qîzikên biçûk û hwd.

Suwarê bûraq hevalê Cebraîl
Di bilindbûna semayê da tu yî (141/16)
...
Mirîyê goran bi ʿÎsa saġ dibûn
Yê koka xûrmê li ser nala tu yî (141/33)

Hezîn li ser wefata Şêx Elauddîn, Şêx Izeddîn şîngerî/mersîye nivîsine. Hezîn di wan helbestan de xemgîniya xwe aniye zimên.

Yeʿqûb wenda kir û Yûsif şev û rojan wî nalîn bû
Welê ruḥê xu yê şîrîn **Ḥezîn** wenda kirî îro

Bi can bû jana Eyyûb û Zekeriya û bil wanan
Bi ruḥ e jana me yara, werin reḥmê li me îro (119/15-16)

Herwiha di gelek cihan de pesnê Şêx Ehmedê Xezna, Şêx Elauddîn, Şêx Mesûm, Şêx Izeddîn, Xewsê Xeyda û Şêxên din dike, di gelek cihan de ji wan meded û hîmmetê dixwazê.

Ketime tennûra ʿişqê şahê Xeznayê meded
Perritîm tê da seraser şahê Xeznayê meded (36/1)

Were cem şiblê Eḥmedî were cem ʿIzzê Xeznewî
Were cem ḥebrê lewẕeʿî ṣeyyad serayê da çi ket

Himmet bilind û dawer e, xulaṣa ʿilim jiber e
Rebbanî ye rengbeşer e, Ḥeq dîtîye xelqê çi ket (25/32-33)

Helbestvan gelek caran gazincên xwe bi zeman dike, xortên misilman di halekî perîşan de dibîne, bêriya demên berê dike. Mirovên mezin wek Selahedînê Kurdî el-Eyyûbî, Îbnî Erebî, Îbnî Xeldan, Îbnî Xelkan, Xezalî, Farabî, Îbnî Sîna mînak dide û çima îro di vî halî de ne, ji wan dipirse. Dûre bersîva wê yekê jî bixwe dide: kêmasiya xwendinê.

Hilo ey xortê Îslamê çima wuṣa perîşan î
Berê ḥukmê te carî bû ji Tuna ḥetta Turanî
...
Bi roj û şev bixûn xorto, ji zanînê bibe derya
Di ṣenʿet da here pêş da dunê da bikey gerranî (142/1-19)

Bi vî awayî gelek mijarên curbicur hene ku behsa roja mehşerê, axiretê, mirinê, xapandina nefsê, kirina nimêj û ibadetê, halê însanan û hwd. dike. Wek kurte em dikarin bibêjin ku Hezîn helbestvanekî jîr û jêhatî ye. Naveroka Helbestên wî gelek dewlemend e; di sêrî de helbestên tesewifî, lîrîk, dîdaktîk û rexneyî cih bigire jî gelek mijarên cuda jî hene. Vê yekê jî dewlemendiya dîwanê zêde kiriye û ji aliyê wêjeyî ve payeya wê bilintir kiriye. Dîsa em dikarin bibêjin ku mijarên dîwanê li ser sê stûnên qerase hatine danîn; ya yekem eql (ilm, xwendin, zanîn); ya duyem dil (bawerî, tesewif, dîn); ya sêyem işq (evîn, hezkirin, işqa îlahî) e:

Divêtin mermîya ʿeql bête danîn namlûya dil da
Bi pêta barûta ʿişqê biket seyran û gerranek (77/86)

# ENCAM

Ev xebata me ya bi navê *Dîwana Hezîn; Metn, Lêkolîn û Ferheng* li ser jiyana helbestvan û hemû berhemên wî; kesayetiya wî ya edebî; û ji aliyê şiklî û ruxsarî ve li ser lêkolîna dîwanê sekinî û di dawiyê de gihîşte van encaman:

1. Navê Hezîn ê rastîn Husnî Geçer e. Ji gundê Tûmika Gêxiyê ye û di sala 1943'an de hatiye dinê û hê jî li heyatê ye. Ji ber ku karê wî melatî bûye, wek zêdenav *mela*; herwiha gelek feqî li ber destê wî xwendine û gihîştine, dûre *seyda* jî li ber navê wî hatiye danîn ku di nav ulema û muderîsên medreseyan de bi navê *Seydayê Mela Husnî* tê nasîn.

2. Seydayê Mela Husnî di helbestên xwe de pirî caran mexlesa *Hezîn*; ligel vê kêm caran *Husnî* û herwiha *Husnî Hezîn* jî bi kar aniye.

3. Hezîn, di biçûktiya xwe de dest bi xwendina medreseyê kiriye. Di wan medreseyan de li ber destê seydayên navdar ên serdema xwe wek Şêx Hadiyê Qewmanî, Şêx Mesûmê Norşînê, Şêx Muhyedîn, Şêx Cuneydê Zubeydê, Mela Xelîlê Qizilpare, Şêx Elauddînê Xeznayê, Şêx Îzzedînê Xeznayê, Şêx Muhemmed Mesûm û Şêx Muhemmedê Erebkendî ders girtiye.

4. Hezîn, ji seydayên xwe gelek sûd wergirtiye û hem ji aliyê ilmî-tesewifî ve hem jî ji aliyê edebî ve di bin bandora wan de maye. Di vî warî de bandora Şêx Hadiyê Qewmanî û Şêx Elauddînê Xeznayê bi awayekî eşkere tên dîtin.

5. Hezîn di sê zimanan de bi tevahî 15 pirtûk nivîsîne. 3 heb ji wan bi erebî; 4 heb ji wan bi tirkî; 7 heb jî ji wan bi kurdî (kurmancî) ne. Herwiha di helbestên wî de kêm be jî hebûna peyv û malikên farisî nişan didin ku Hezîn di farisî de jî yekî şareza ye.

6. Hezîn, piraniya (nêzîkî % 90) helbestên dîwana xwe li gundê Kamrûdê (1966-1987) nivîsîne. Di wan salan de em dibînin ku di Komara Tirkiyê de li dijî zimanê kurdî qedexeyeke mezin heye. Herwiha di Derbeya Leşkeriya 1980'yî de ew zext û zora li ser kurdan digihîje asta herî bilind. Hezîn di bin wan şert û mercên dijwar de helbestên xwe yên kurdî bi dizîka ve dinivîse û di bin arîkê mizgeftê de vedişêre. Ev jî nîşan dide ku helbestvan evîndarê zimanê xwe bûye.

7. Hezîn, di warê edebiyatê de gelek berhem xwendine û gelek helbest jî jiber kirine. Em dikarin wan wiha rêz bikin; di kurdî de Dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Xanî û Rewdu'n-Ne'îma Şêx Evdirehmanê Axtepî; di farisî de Mela Camî, Hafizê Şîrazî, Mesnewî, kulliyata Sadî Şîrazî û Îbnû'l Xeyam; di erebî de jî Îbnû'l Farid, Hesan bin Usabîd, Meqamata Herîrî, Lamîyetû Îbnî Werdî, Nûniyetû Sibtî, Muellaqatî Seba, qesideya Burdiyye û hwd. Em dibînin ku wan li ser Hezîn bandoreke mezin kirine.

8. Di dîwanê de 149 helbest hene ku 94 hebê wan qesîde; 45 hebê wan xezel; 10 hebê wan jî murebbe‘ in. Herwiha di vê dîwanê de bi tevahî 4167 malik hene; ji ber vê yekê em dikarin vê îddîayê bikin ku di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Dîwana Hezîn ji aliyê hejmara malikan ve dîwana herî dirêj û mezin e.

9. Hezîn hemû helbestên xwe bi erûzê ve nivîsîne. Di dîwanê de 6 cure behr hatine bikaranîn. Herwiha hemû helbestên dîwanê bi 15 qalibên erûzê hatine nivîsîn. Behra ku zêdetirîn hatiye bikaranîn *behra hezec* e ku rêjeya wê %33.5 e, piştre *behra remel* e ku rêjeya wê %32.2 ye û dûre jî bi rêjeya %27.5ê ve *behra recez* e. Em dibînin ku di gelek dîwanên kurdî yên klasîk de yên herî zêde tên bikaranîn ev behr in ku di Dîwana Hezîn de jî ev qaîde xira nebûye.

10. Hezîn, di vê serdemê de yek ji nûnerên (zindî) Edebiyata Kurdî ya Klasîk e.

11. Hezîn, di mijara serwa û paşserwayê de terzeke cuda saz kiriye. Hin helbestên wî bi serwa ne, lê paşserwa nînin; hin helbestên wî bi paşserwa ne, lê serwa nînin; hin helbestên wî jî ne bi serwa ne jî bi paşserwayê ve hatine nivîsîn. Lê hemû helbestên wî dîsa di çarçoveya erûz û kêşeyê de ne. Ev mijar hê jî gelek têkil û aloz e. Ji ber ku li ser edebiyata kurdî ya klasîk têra xwe lêkolîn û îstatîstîk nehatine kirin, em nizanin ka gelo standartên edebiyata kurdî ya klasîk çi ne? Lêbelê em li vir digihîjin vê encamê ku Hezîn ji aliyê serwa û paşserwayê ve hinek azad e ku xwe bi wan ve girênedaye.

12. Gelek helbest di Dîwana Hezîn de hene ku bi serwa yan jî paşserwayeke nû hatine nivîsîn. Ango Hezîn ji helbestvanên beriya xwe hatine, îqtîbas an jî nezîre nekiriye. Ev jî reseniya helbestên Hezîn nîşan dike.

13. Di xezelên Hezîn de bi piranî mazmûnên ku di edebiyata klasîk de tên bikaranîn hene. Herwiha gelek xezelên evînî jî hene. Di murebbe‘ên dîwanê de Hezîn pesnê mirşîdên xwe dane, mijarên wek mirinê û fanîbûna dinê vegotine. Di qesîdeyên wî de jî wehdetê wucûd, mijarên tesewifî û felsefîk hene; ligel van, mijarên dînî, têgehên dînî gelek hatine bikaranîn. Lêbelê me mijarên dîwanê yên sereke li dor çar stûnan berhev kirin ku ev jî; helbestên lîrîk, dîdaktîk-şîretî, hîkemî-tesewifî û yên rexneyî ne. Ligel van, mijarên cûrbicûr jî hene ku wek bêriya welêt, behsa fanibûna dinyayê, reng û rewşa wê, derewbûna mal û milkê dinê, gilî û gazincên xwe ji zeman û însanan, rewşa xirab a misilmanan, ibadet û hwd. Ev mijarên pircure nîşan didin ku Dîwana Hezîn ji aliyê mijaran ve gelek dewlemend e.

14. Dîwana Hezîn dîwaneke tesewifî ye û termînolojiya tesewifê bi awayekî berfireh di nav xwe de dihewîne. Ji aliyê şêwaz û vegotinê ve jî seqaya tesewifê bi awayekî eşkere tê hîskirin û di honandina helbestan de tesewif yek ji wan xîmên bingehîn e.

15. Di helbestên wî de peyvên erebî û farisî, kêm caran jî tirkî hebe jî ev yek, zimanê dîwanê girantir nekiriye. Ji bilî biwêj û gotinên pêşiyan, Hezîn ji her herêmê peyv û bêjeyên cuda di dîwana xwe de bi kar anîne ku ev jî ji aliyê zimên ve pirrengiyek daye dîwanê. Hezîn vê rewşê wiha pênase dike: "...dîwana min ne tenê Serhedî û ne jî Botî ye; dîwana min hemû Kurdistanî ye."

16. Ji ber sedemên cûrbicûr, gelek dîwanên kurdî yan wenda bûne, yan nîvco mane yan jî tam negihîştine roja îro. Lê Dîwana Hezîn ji ber ku hêj di heyata Seydayê Mela Husnî de ji aliyê me û bi alîkariya wî hat temamkirin; em dikarin bibêjin ku di edebiyata kurdî ya klasîk de yekemîn dîwan e ku %100 em dizanin ku tam e û helbestên wê wenda nebûne.

17. Ji bilî dîwanê, gelek helbestên Hezîn di berhemên wî yên kurdî de hene. Me ew helbestan nexisitine nev xebata xwe. Mirov dikare xebateke xweser li ser helbestên wî yên ku di dîwanê de cî nagirin, bike.

# BEŞA ÇAREMÎN

## METN Û FERHENGA DÎWANÊ

### Bi Navê Xudayê bi Ram[168] û Qencîkar

Dîwan;
Mostiren[169] e ji heyat û tarîxa zimanê gelê xwe ra,
Berdan û irşad in ji xwendevanê xwe ra,
Rêzanî û beledî ne ji dîn û dunyayê ra,
Vekirin û nîşandan in ji gula dil ra,
Tefkir[170] û ponijandan in ji dûrbîna heş ra,
Arastî[171] û zelalî ne ji ava çirika zêrrîna ziman ra,

Ev dîwana digel ku baxçeyê tevî van gulan e, hêvî ev e ku bibe setem[172] ji hezkirin û qayîlbûna Xudê ra, lewra evîn ji her çekûy[173] û çavîyê wê dibilqê.

Xudêyo! Tu berê me bidey karê ku babet[174] e ji qencîkarîya te ra.

Amîn…

**el-Feqîr el-Hezîn Husnî Geçer**

[168] **Ram**: Dilovan, birehm. Di devoka Çewlîgê de wiha dibêjin; ramê li filankesê bikin. [H.]
[169] **Mostire**: Mostere, mînak, numûne, perçeyek ji bo nîşandanê
[170] **Tefkir**: Tefekkur, ponijandin, hizirkirin, fikirîn
[171] **Arastî**: Arastetî, fesahat, zelalî, herikbarî, rewanbêjî
[172] **Setem**: Sedem, sebeb, eger
[173] **Çekûy**: Nîvmalik, misra, rêzek di helbestê de
[174] **Babet**: Hêja, layiq, sezawer, şayesteyî

## 1.

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

"Ucîbû deʿwete`d-daʿî "[175] temaşa ye ji bo min ra

Keremkarê xudan şefqet yeqîn şah e ji bo min ra

2.

Nehin bîmem ez an dûzex ku her "hel min mezîd"[176] goyed[177]

Ku xweş pişt û neẓergah[178] e "reûfûn bi`l-ʿibad"[179] min ra

3.

Hêwirgeh[180] nîne bo min ra ji bil wî Xaliqê bêçûn[181]

Ku "ellahû`ṣ- ṣemed"[182] xweş neynikek ṣaf e ji bo min ra

4.

Ji bo rizqê xu nakêşem ġemê mûyek ġemê mûyek

Ku xweş "neḥnû qesemna beynehum silwane"[183] bo min ra

5.

Naçim bal çimena dunya ji bo gerran û seyranê

---

[175] **Ucîbû deʿwete`d-daʿî**: Ez hewara wî kesî de têm çi demê ew gazî min bike.
Îşareta vê ayetê dike:

**(وَإِذَا سَأَلَكَ عِبَادِي عَنِّي فَإِنِّي قَرِيبٌ أُجِيبُ دَعْوَةَ الدَّاعِ إِذَا دَعَانِ فَلْيَسْتَجِيبُواْ لِي وَلْيُؤْمِنُواْ بِي لَعَلَّهُمْ يَرْشُدُونَ)**

(Ya Muhemmed!) Dema evdên min pirsa min ji te kirin; bêguman ez pir nêzîkî wan im, muheqeq ez hewara wî kesî de têm çi demê ew gazî min bike. Naxwe, bila evdên min guhdariya min bikin û bila baweriyê bi min bînin da ku ew bi ser rêka rast ve bibin. (Beqere: 2/186)

[176] **Hel min mezîd**: Ma hê jî tune ye?

Îşareta vê ayetê dike: **(يَوْمَ نَقُولُ لِجَهَنَّمَ هَلِ امْتَلَأْتِ وَتَقُولُ هَلْ مِن مَّزِيدٍ)** Wê rojê, em ê ji cehenemê re bibêjin: Erê ma tu tije nebûyî? Ew jî dê bibêje: Ma hê jî tune ye? (Qaf: 50/30)

[177] Tirsa min tuneye ji wê cehennema ku dibêje "ma hê jî tune ye?"

[178] **Nezergah**: Cihê nêrînê, ciyê ku lê temaşa tê kirin

[179] **Reûfûn bi`l-ʿibad**: Ji bo bendeyên xwe pir dilovîn e. Îşareta vê ayetê dike:

**(وَمِنَ النَّاسِ مَن يَشْرِي نَفْسَهُ ابْتِغَاء مَرْضَاتِ اللّهِ وَاللّهُ رَؤُوفٌ بِالْعِبَادِ )**

Hin mirov hene ku ji bo qayîlkirina Xweda canê xwe didin. Rewş ev e; Xwedê ji bo bendeyên xwe pir dilovîn e. (Beqere: 2/207)

[180] **Hêwirgeh**: Êwirheg, stargeh, hewing, wargeh

[181] **Xaliqê bêçûn**: Ew afirînerê ku her heye û tune/wenda nabe, Xweda.

[182] **Ellahû`ṣ-ṣemed**: Ew Xwedê ye ku her tişt hewcedarê wî ye, lê ew hewcedarê tu tiştî nîne.

Îşareta vê ayetê dike: **( لَمْ يَلِدْ وَلَمْ يُولَدْ وَلَمْ يَكُن لَّهُ كُفُوًا أَحَدٌ اللَّهُ الصَّمَدُ  قُلْ هُوَ اللَّهُ أَحَدٌ )**

Bibêje: Xwedê her yek e. Her Xwedê ye bergeha hewcedaran. Kes jê çênebûye û ew jî ji kesî çênebûye. Tu hemkûf û hevta jî jê re nîn in. (Îxlas: 112/3-4)

[182] **Neḥnû qesemna beynehum silwane**: Me, di navbeyna wan de par vekiriye. (Ango; jixwe Xwedê rizqê me teqsîm kiriye, ne hewceye ku em bona rizqê xwe xemê bikişînin.) Îşareta vê ayetê dike:

**(أَهُمْ يَقْسِمُونَ رَحْمَةَ رَبِّكَ نَحْنُ قَسَمْنَا بَيْنَهُم مَّعِيشَتَهُمْ فِي الْحَيَاةِ الدُّنْيَا وَرَفَعْنَا بَعْضَهُمْ فَوْقَ بَعْضٍ دَرَجَاتٍ لِيَتَّخِذَ بَعْضُهُم بَعْضًا سُخْرِيًّا وَرَحْمَتُ رَبِّكَ خَيْرٌ مِّمَّا يَجْمَعُونَ)**

Erê ma ew qenciya Xwedayê te (ku ew pêxemberî ye) pareve dikin? Di jiyana cihanê de me rizqê wan di neqeba wan de pareve kiriye. Me hin ji wan di ser hinan re girtiye da ku hin ji wan hinekan bidin xebatê. Qenciya Xwedayê te (roja qiyametê) ji tiştê ku ew kom dikin, gelek çêtir e. (Zuxruf: 43/32)

Ku baġê ʿalema ʿişqê şîrîn seyrangeh e min ra

6.

Dixazim hey ji Wehhabê[184] bide tewfîq[185] û riḍwanê[186]

Ku mal û mulk û zîv û zêr ne meqṣûd[187] in ji bo min ra

7.

Nabêm wek ʿalimê ẓahir çi ra va ye xuzî wa ba

Ku her ḥalê Xudê da min ew e çêtir ji bo min ra

8.

Der în baġê wiṣaleş gulşenî mehrûyî mî dîdem[188]

Ji herdû ʿaleman her ew pur e min ra, bes e min ra

9.

Di nêv pêlê Ferata ʿişq*ê* da dil serûbin ger bit

Ji çîyay yaqutan ew dur[189] bes e min ra pir e min ra

10.

Tecellîyek ji burca lamekan[190] ger bête Ṭûrê dil[191]

Hemî dar û ber û girnûk[192] dibin sosin ji bo min ra

11.

Şeva tarî di deryayê di nav pêlan kevim carek

Şîrîn ger bête bîra min yeqîn gulzar e bo min ra

12.

Ḥedîs̱a "kuntu kenzen mexfîyen"[193] dersek weha da kî

Nîne meqṣûd ji bil nasitîya ẕatê Xudê min ra

13.

Nîne ġeyrî nebî, ustad û rehber kes cehanê da

---

183 **Wehhab**: Yek ji navên Xwedê ye. Ew ê ku dayîn û kerema wî digihîje mexlûqên wî û ji her kesî re Dayende ye.

185 **Tewfîq**: Alîkirina Xwedê ji ‘evdên xwe re, serfirazbûn, biserketin, miyeser

186 **Riḍwan**: Dilxweşî, kêfxweşî, qayîlbûn

187 **Meqṣûd**: Ew ên ku tên xwestin, dilxwazî, armanc, mebest, xaye

188 Di vê baxê gihanê de min şengulkê hîvrû dît.

189 **Dur:** Mirarî, mirwarî

190 **Lamekan:** Bêmekan, bêcih

191 **Ṭûrê dil**: Dilê wek çiyayê Tûr. (Tûr li çola Sînayê navê çiyayekî ye ku Hz. Mûsa li vir tecelliyata Xwedê dîtiye û ji Wî re axiviye. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Qûrana Pîroz, Meryem 19/80; Süleyman Uludağ, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, weş. Kabalcı, İstanbul 2012, r. 361.; Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, weş. Otto, Ankara 2014, r. 498.)

192 **Girnûk**: Gihayekî bi stirî ne ku di nav zeviyan de digihije. Stirîn, dirî, sinc

193 **Kuntu kenzen mexfîyen**: Ez gencîneyek veşartî bûm.

Îşareta vê hedîsa qudsî dike: (كنت كنزا مخفيا فأحببت أن أعرف فخلقت الخلق وتجليت عليهم فعرفوني)
Ez gencîneyek veşartî bûm. Min xwest ku ez werim nas kirin. Ji bo werim naskirin min mexlûqat afirand.

Ku da “lewlake lewlake”[194] weha dersek ji bo min ra

14.

**Ḥezîn** herdem dinoşit[195] xelq*ê*`j destê dos*tê* mey[196] nabê[197]

Ḥeyata vê dunê xweş hat welê zivr[198] e ji bo min ra

15.

**Ḥezîn** geryay di yabana[199] nezanînê d*a* mest û gêj

Rehaker[200] çilkekî baran*a* reḥma yar*ê* ye min ra

**2.**

faʿ ilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Cism*ê*[201] min jar e bi dil pergende[202] me

Dilcivîn û şafîyê[203] cismêm ku da

2.

Fikr*a* min wêrane kir derd û ġeman

Ġemrevîn û çar*a* bêçaran ku da

3.

Têk ji ber tîrê qetanê[204] bûm birîn

Merhema daġ û birînê min ku da

4.

Gulr*û*ya ʿerʿerbeden[205] dûr ket ji min

Mûṣilê[206] min ey delalê min ku da

5.

---

[194] **Lewlake lewlake:** Eger tu nebûyayî.
Îşareta hedîsa meşhûr dike: (لولاك لولاك لما خلقت الافلاك)
Eger tu nebûyayî, eger tu nebûyayî min gerdûn çênedikirin.

[195] **Dinoşit:** Vexwarin, noşîn

[196] **Mey:** Şerab, bade, xemr

[197] **Nabê**: Kurtkirina “nabêje” ye.

[198] **Zivr**: Girûzîn, girûzekî, zivirî, dirdirkî, pizronekî

[199] **Yaban:** Çol, çolistan, beyaban, sehra

[200] **Rehaker**: Xilasker, rizgarker

[201] **Cism**: Beden, laşê mirov

[202] **Pergende**: Belawela, gij

[203] **Şafî**: Şîfabexş, yê ku şîfayê dide

[204] **Qetan**: Cudayî, veqetan, dûrketin

[205] **ʿErʿerbeden**: Bejna wek dara serwî. ‘Er’er, dara serwî, selwiya çiyayî ye û dareke dirêj e. Mebest jê nîşankirina bejn û bala dilberê ye.

[206] **Mûṣil**: Ewê ku wesl/gihîştinê pêk tîne; yê ku mirovan digihîne, gihaner

Pur zeman e mame nêv zencîr û qeyd[207]

Muṭliqê[208] min ey hevalê min ku da

6.

Ah*î* koşka dil ji bin talan kirin

Pehlewan û şehsuwarê[209] min ku da

7.

Mame sêwî ez li ber dar û d*î*war

Dilb*ê*ş[210] û hem destegîrê min ku da

8.

Nay tebata can, şewitye dil birîn

Ma *a*ramgeh û hedana[211] min ku da

9.

Pur elemdar û nexweş bûme ji mêj

Ma ḥebîbê[212] ruḥ û canê min ku da

10.

Xûn ji daġan û birînan tê bi cûh[213]

Ey heval kafûr[214] *û* pûnga[215] min ku da

11.

Kar(i)wan çû mam li rê, bê zad[216] û mil[217]

Ma dil aram û teḥemmul kan[218] ku da

12.

Ah tenê mame di vê çolê da leng[219]

Hey hewar feryadires[220] kanê ku da

13.

Baz*ê* nefsê serkirî[221] ser çûk*a* jar

---

207 **Qeyd**: Bend, qeydik, şancûl

208 **Muṭliq**: Ewê ku mirov ji qeyd û bendan xilas dike, berdanker

209 **Şehsuwar**: Şahê siwaran, kesê ku hespê xweş dajo

210 **Dilbêş**: Xwedan şefqet, dilovan, rehmdar, biram, piyar

211 **Hedan**: Aram, sebr, tebat

212 **Hebîb**: Xoşewîst, dildar, yar, berdilk

213 **Cûh**: Cû, co, cew, qanal

214 **Kafûr**: Gihayek bêhnxweş e û kulîlkên wê dişibe beybûnê.

215 **Pûng:** Gihayek bêhnxweş e wekî naneyê heşîn e.

216 **Zad**: Xwarin, xurik

217 **Mil**: Piştik, heywana ku mirov siyarî wê dibe û diçe cihekî

218 **Kan**: Kurtkirina “kanê” ye.

219 **Leng**: Kulek, kuloke, qop, şaht

220 **Feryadires**: Alîkar, destyar, yê ku alî dike

Ma dîyarê[222] yar*a* min kanê ku da

14.

Ketime nêv penc*ê* şahînê ẓelûm[223]

Ma keremkar û ġeyûrê[224] min ku da

15.

Nîne min ra bil ji weṣla[225] te murad

Ger bibit her ew bes e bil Wî ku da

16.

Rê me wenda kir Xudê! êvare hat

Ma musafirperwerê min kan ku da

17.

Ev cehana ron*î* ser min tar*î* bû

Ma îşîntaqa[226] ḥebîba min ku da

18.

Ey **Ḥezîn** pur dilkul û ġemgîn mebe

Meʿneya settar[227] û ġeffarê[228] ku da

19.

Meṣderê[229] derman û derdan ew bitin

Tirs ji derdan û ġeman bo çi ku da

20.

Ger li yek rûyek n*ê*rîn ke mirîyek

Dê bibit saġ û mirin êdî ku da

21.

Ger di şêva[230] ḥuzn û şînê bit xuya

Dê bibit rojê du ceşnan ġem ku da

22.

Ger tebessum ke ji qendê[231] xûyş*î*rîn

---

221 **Serkirî**: Serkirin, êrîşkirin, gujgujîn, rikêfkirin
222 **Dîyar**: Welat, cih, war
223 **Zelûm**: Zalim, çavsor, xedar
224 **Ġeyûr**: Bixîret, xîretdar, hewldar, jêhatî, bihemiyet
225 **Weṣl**: Gihîştin, gihîn, gihaştin, lehiqîn
226 **Îşîntaq**: Fener, çira, fanos
227 **Settar**: Ewê ku şerm û gunehan dinixumîne û vedişêre.
228 **Ġeffar**: Ewê ku pir têbihur, efûhez û bexşînker
229 **Mesder**: Çavkanî, jêderk, serekanî
230 **Şêv**: Şev
231 **Qend:** Şekir

Dê muradat pêk werin nalîn ku da

23.

Dilbera rûken te ra yar bit dilo

Tirs*î*na herdû cihanan da ku da

24.

Ey **Ḥezîn** bes key ş*î*n û nalîn mekey

Ḥal*ê* te yar way dibînit ġem ku da

**3.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Di feṣla[232] nûbeharê da giha û dar û ber tevda

Bi mestî têne govendê wekî ruhê min ê şeyda[233]

2.

Behara ruḥ*ê* min tenha ne çend rojê beharê ne

Behara ruḥ*ê* min weqta tecellî ket delal dil da

3.

Evîna ruḥ ne wek bulbul ku çend rojê gulê geş tê

Gulê baġê delalê geş dimînit tim ku napeyda

4.

Madam dilber qedîmî[234] ye, evîna bengîyê jî wer

Evînkeşê belengaz lewr*a* hey maye di agir da

5.

Hemî tiştê diṣojit ḥub[235] fena sîperrikan[236] bêdeng

Welê nabit tu teʾsîrek di canê dilbera min da

6.

Delala dilbera nazik bi destê xu bide tasek

Dimînit can*ê* bengî hey di nêva ar û pêtê da

7.

[232] **Feṣl**: Demsal, werz, pişksal, mewsîm
[233] **Şeyda**: Evîndar, bengîn
[234] **Qedîmî**: Ezelî, mêjîn, pêşreva wî/ê nîne.
[235] **Ḥub**: Evîn, yarenî, hezkirin
[236] **Sîperrik**: Perperok, minminîk, baperik, sihperik

Dema Şîrîn[237] tecella ket li kohê[238] dil wekî Şîrîn

Hemî erwaḥê[239] Ferhadan dibin qurban di gavê da

8.

Dema narîn hejînê ket bi serdana şehîdê xu

Dibin qurban hezar canê şîrînê di devê rê da

9.

Eger bêhnek ji biskê[240] dilberê bayê ṣeba[241] bînit

Dê geş bin ruḥ dê xweş bin dil surûr[242] ʿam[243] bit di ʿamê[244] da

10.

Şeva tarî eger dilber ji dêman[245] perdeyan raket

Hemî ʿalem diket ronî wekî rojê di şerqê[246] da

11.

Delalê kofî[247] kel kir[248] hat bi şahî meclisa ʿîşret[249]

Ji ser dostan ġem û derd û keder têk da dîsa firda

12.

Ji dil rakey niqaba[250] ẓûlmetê dilber ji bo bînem[251]

Bi çavê dil şuʾûnatê[252] te danîne di kewnê[253] da

13.

Sema û qad,[254] çiya û deşt, nebat û av, sitêr û roj

Yekayek neynika raza[255] delal danî cihanê da

14.

---

237 **Şîrîn**: Dilber, evîn, yar

238 **Koh**: Çiya

239 **Erwaḥ**: Pirjimariya peyva "ruh" e. Ruh, giyan

240 **Bisk**: Porê jinan a ku li ber guhê wan der tê û bixelek e.

241 **Bayê ṣeba**: Bayekî hênik e û her tim ji hêla rojhilatê tê. Di edebiyatê de ew ba ye ku bêhna yarê ji dûr ve tîne û li herderî belav dike. Her tim rêçek an jî bêhnek ji dilberê tîne. Cihê ku tê re derbas dibe, geş dibe. Ji bengî re wekî postevanek e. (Pala, *b.n.,* r. 383.)

242 **Surûr**: Şahî, şadî, kêf

243 ʿ**Am**: Gelemperî, giştî, tevahî

244 ʿ**Am**: Herkes, xelq

245 **Dêm**: Rû, sûret

246 **Şerq**: Rojhilat

247 **Kofî**: Kumê pîrekan, kepê kalan

248 **Kel kirin**: Xwarkirina kofiyê, yan jî danîna alikî.

249 **Meclisa ʿîşret**: Meclîsa kêf û şahiyê.

250 **Niqab**: Perde

251 **Bînem**: Bibînim, dîtin

252 **Şuʾûnat**: Kar, 'îş, behremendî, tecelliyatê Xwedê

253 **Kewn**: Alem, gerdûn

254 **Sema û qad**: Esman û 'erd

255 **Raz**: Sir, nehênî, nepenî, pin

Tefekkur key dir û belga hebûnê da bi dil bînî
Çi xweş mefhûm*ê* weşfan[256] hatine danîn di rezan da
15.
Ḥebîbî leyse muḥtacen îla mîrati ʿettar in[257]
Kemal û rindîya yarê xuyaye`d kevirê reş da
16.
Vekey çavan binêre kûr li çar awir*ê* dunyayê
Seraser dilkul û dîn in ji ḥusna dilbera min da
17.
Gul û rîḥan û sosin tev benefş û sunbul û sêvan
Bûne hêlî[258] ji ḥusna dêmdurra[259] bêçûn di baġan da
18.
Ji bo Wî bulbulê jar hey bi nalîn û bi wîllîn e
Pepûka derbeder nîne hedan[260] wê ra di çolê da
19.
Hîşar be serbijorê pozbilendê navnigê[261] ʿekrût[262]
Heval çûn kariwan borî li cih mayî tenê xew da
20.
Hemî ʿalem şev û roj bê hedan û bê xew û raḥet
Wekî avan dirijin hey tenê mayî di golê da
21.
Feṭehhîr qelb*î* ya Rebbî mine`l-eṣdaîʾ we`r-ranî[263]
Ji êşan ra bidî derman li cem te`y belsema[264] derda
22.
Delalê va kula merxur[265] dil û can way dide bo xu
Tu luqman î **Ḥezîn** bêḥal n*î*şan de şaneke[266] dêm da
23.

---

[256] **Mefhûmê weşfan**: Derbirina û îfadeya sîfetên (Xwedê)
[257] Pêdiviya Hebîbê min, ji neynika çerçiyan re tune ye.
[258] **Hêlî**: Neynik, eynik
[259] **Dêmdur**: Rûyê wek mirwarî geş û spehî, sûretmirarî
[260] **Hedan:** Aram, sebr, tebat
[261] **Navnig**: Xax, rezîl, ketina ber piyan
[262] ʿ**Ekrût**: Rûpîs, rûtehl, kesê pîs û nebaş
[263] Ya Rebbî, Tu qelbê min ji jeng û perdeyan paqij bike.
[264] **Belsema**: Derman, şifa
[265] **Kula merxur**: Nexweşiya penceşêrê, qanser
[266] **Şan**: Nîşan, xal, şanik

Li ser lêva helakê me eger nûr nebitin cana[267]

Ji qanşêra di dil peyda, n*î*ne derman di ʿalem da

24.

Ţîrêjek roj*a* nûra xu dirêj key hêl*a* bêḥalan

Tu car nayêt hedana me ji ber jana kula dil da

25.

Keremkar û delal î tu, ġerîban ra heval î tu

Şeva tarî şemal[268] î tu, vekey yara ji min benda

**4.**

faʿ ilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Eḥreqe`l-wecdû wecûdî we`l-ḥebîbû fî`l-hewa[269]

Deng û ahê min hemî pîrê[270] ketî anîn sema[271]

2.

Lêbelê dilber*ê* xu da yek m*û*yek xira nekir

Wek neyaran borîy û çû qeṭ neda min îʿtina[272]

3.

Lik vegerya gote bengî, ey delal boy çi tu *ţen*g î

Gîştina yaran mefa[273] ye, lê divêt ser çit[274] di rê da

4.

Tarîy û sermê[275] dibînit, ê divêt ava ḥeyat

Germ û tîbûnê dibînit, ê diçit keʿba murada

5.

Kî ku ţawûsan[276] dixazit dikş*î*ne westa n*a*rê

---

[267] **Cana**: Ey can. Li vir banglêkirin/nîda heye.
[268] **Şemal**: Çira, find, mûm
[269] ʻIşq û evîn bedena min şewitandiye, dilbera min hêj di kêfa xwe de ye.
[270] **Pîr**: Kal, extiyar
[271] **Sema**: Reqs, govend
[272] **Îʿtina**: Pûte, pûtepêdan
[273] **Mefa**: Sûd, havil, kêr, wec, menfaʻet
[274] **Çit**: Biçit, biçe
[275] **Serm**: Serma, sir, seqem
[276] **Ţawûs**: Teyreke per û baskên wê reng rengî ye û welatê wê Hindîstan e. Li vir mebest ji tawûsê miraz e. Kesekî/ê bixwaze bigihîje tawûsan (miraza xwe) divê rêya Hindistanê bimeşe (zor û zehmetiya wê bikişîne.) bixwaze tawûsan bibîne divê wan zor û zehmeta gihîştina Hindistanê jî bikişîne.

Kî ku rûhîvan[277] divêtin dê ji wî dil bit cuda

6.

Ger bişojî şubh*ê* perwanê[278] di nêva agirê

Nabitin boy te tu carek gileh[279] û zarîn û wa

7.

Lew cefaya dilberê ʿeynî sefayê bi xu ye

Înne mewten yuʿţîhî`l-ḩubbe ḩeyatûn ya tura[280]

8.

Lew dibêjit ehl*ê* dil, vê şiʿr*a* dilkeşa[281] leţîf[282]

Beng*î* ra sebr û hedan e can*ê* wî ra xweşşifa

9.

Uqtulûnî uqtulûnî uqtulûnî ya suqa[283]

Înne fî qetlî ḩeyaten we ḩeyaten fîʿl-ḩeya[284]

10.

Rehm*ê* key dilber li vê rêdûr*ê* jarê pur **Ḩezîn**

Tahe fî seḩraîʾ yeʾsîn eyne weʿdûn bî`l-liqa[285]

11.

Got teḩemmul key **Ḩezîno**[286] hey qiyaman[287] ra nişiv[288]

Nik bide ber xu zemankî hey cefayan ra şefa

**5.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Dilber serapa[289] bû xuya tarîtîy û ḩeyret nema

---

[277] **Rûhîv**: Rûyê wek hîv, dêmhîv, tefeşa mîna hîva çardeşevîn
[278] **Perwane**: Perperok, minminîk, baperik
[279] **Gileh**: Gilî, gazinc, gazind
[280] Hezkirina mirinê miheqeq ji mirovan re jiyan e.
[281] **Dilkeş**: Cezbedar, dilrakêş, dilniwazî, rakêşer
[282] **Leţîf**: Xweş, şêrîn, narîn
[283] Ey kesên dilsoz û ewledar! Min bikujin, min bikujin, min bikujin.
[284] Di kuştina min de jiyan heye, lewra jiyan di jiyanê de ne.
Îşareta vê ayetê dike: **(وَلَكُمْ فِي الْقِصَاصِ حَيَاةٌ يَاْ أُولِيْ الأَلْبَابِ لَعَلَّكُمْ تَتَّقُونَ)**
Gelî aqildaran! Ji bo we di tolvekirinê de jiyan heye, da ku hûn xwe biparêzin. (Beqere: 2/179)
[285] Ew bêhêvî di çolê de şaş û matmayî ma! Ka li ku ye ew soza rasthatinê?
[286] **Hezîno**: Ey Hezîn. Li vir banglêkirin heye.
[287] **Qiyam**: Li ser piyan, serpiya
[288] **Nişiv**: Rûniştin

ʿAlem seraser ronî bû sirrê veşartî bûn xuya

2.

Ya Reb çi ḥal e vê demê rakir ji ʿalem derd û ġem

Dengê ṣenaya[290] dêmdurrê[291] ji bengîyan çûye sema[292]

3.

Hay hûyê cez̲ba ʿaşiqan ḥemd û s̲enayê ṣadiqan

Kewn[293] û mekan têk ḥerrikand reş û sipî anîn sema[294]

4.

Dar û kevir hatin ziman gaz[295] û çiya, deşt û newal

Tev sosinan û sunbulan bi lerzîn û cez̲be û ta

5.

Mêrg û çimengeh xemilîn rengê gulan têk ʿedilîn

Dengê kevok û bulbulan xweş tê digel bayê ṣeba

6.

Ḥusna[296] ḥebîba lemyezel[297] xweş bû xuya her tiştî da

Deryaya ʿişqê coşî bû, boy dilbera şîrînliqa[298]

7.

Êş û elem, derd û keder, dûrîtîy û ah û keser

Tev ahîn û nalînê kûr, dûr bûn ji qelbê pur weza[299]

8.

Wîlwîlê ṭeyran û ṭuyan, ġullînê avan û çeman

Dengê kevok û goyînan[300] ji kûr birîn rabû dewa

9.

Luqmanê qelban hatîye, ʿeynik li ber dil danîye

Gote **Ḥezînê** dilbirîn, bê z̲ikrê ḥeq nîne şifa

10.

---

[289] **Serapa**: Serdanpê, ji serî heta pê, seranser
[290] **Ṣena**: Pesnandin, pesindan, wesfandin
[291] **Dêmdurr**: Rûdurr, rûgeş, rûyê mîna mirwariyan spehî û xweşik
[292] **Sema**: Asîman
[293] **Kewn**: ‘Alem, gerdûn
[294] **Sema**: Reqs, govend
[295] **Gaz**: Çiyayê bêdar
[296] **Ḥusn**: Rindî, bedewî, spehîtî, xweşikî
[297] **Ḥebîba lemyezel**: Ew dilbera ku qet wenda nabe û her heye. Mebest jê Xweda ye.
[298] **Liqa**: Dîtin, hevdîtin, rastlihevhatin, (dîtina dilberê)
[299] **Weza**: Jar, qels, lewaz, zeîf
[300] **Goyin**: Goyîn, tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.

Teslîm û ixlaṣ û evîn, tev ẕikr*ê* ḥeq dihebitin

Ḥużur û şahîy û xweşî ji nû dibit qelbê te ra

11.

Min gotê, ey luqman*ê* dil! ev sistîya ma boy çi ye?

Go, ṣuḥbeta naehl û pur xarin û xew şerṭ in w*ê* ra

12.

Rabe **Ḥezîn** wek bulbulan boy sunbulan zarîn mekey

Rojek digêjî ṣorgulan ger tu bibî her wekî ba

**6.**

mustefʿilun / feʿûlun / mustefʿilun / feʿûlun

Munserih – – + –/+ – –/– – + –/+ – –

1.

Teʿlitîya mematê[301] dibit neṣîb ji min ra

Şîrînîya ḥeyatê çi feyde ye ji min ra

2.

Ger jîn*a* min dirêj bit dê pîr[302] û kûz[303] û kel[304] bim

Di çend r*o*jê şeb*a*bê[305] çi şahî ye ji min ra

3.

Çar metre caw[306] dimînit ser min ji vê cihanê

Kincê qumaş*ê* hêja, ne meqṣ*û*d[307] e ji min ra

4.

Zarok û mal û zozan nabin heval*ê* gorê

Pîsîtîy û rindî min dibin heval ji min ra

5.

Xulî[308] li ser dibêjim, ger şer heval*ê* gor bit

Xuzî bi min dibêjim, ger xeyr[309] heval be min ra

6.

---

301 **Memat**: Mirin

302 **Pîr**: Kal, extiyar

303 **Kûz**: Bûl, kov, xûz, piştodik

304 **Kel**: Xwar, şeftûl

305 **Şebab**: Ciwanî, xortanî

306 **Caw**: Cureyek qûmaşeke rengspî ye. Mebest jê kefen/qerqer e.

307 **Meqṣûd**: Ewên ku tên xwestin, dilxwazî, armanc, mebest, xaye

308 **Xulî**: Xwelî, ax, xak

309 **Xeyr**: Xêr

Por û ʿ*es*tî[310] dibin ax, kurm dê bixûn *çer*m û goşt

Nazperwera wucûdê tê beyh*û*de ji min ra

7.

Ji ʿalema wucûdê ger dil ji min r*a* yar bit

Di baġçeyê dunê da her ew bes e ji min ra

8.

Ger neqd*ê*[311] dil bimînit heval be min r*a* der[312] gor

Dibim ġenîyy[313] û dilxweş gor gul*zar* bit ji min ra

9.

Hemî cewariḥê[314] dî tev kole ne ji dil ra

Ger wî hebit ṣelaḥî[315] ê dî teba ne wî ra

10.

Ger baġçeyê wucûdam bi ava dil nebit geş

ʿIşk û zuha û jar e nabit tu yar ji min ra

11.

Dar û nebat*ê* qadê ger av nebit ji wan ra

Dê ʿişk(i) bin temamî nabin temaşe min ra

12.

Herçî ku dil bivêtin eʿża hemî divêtin

Qanûn*a* şeh[316] çi bit ew xelqê teba ye wê ra

13.

Ey dost*ê* nazenînê şîretekî dibêjim

Nabit te ra ṣefayî bê teṣfîye ji dil ra

14.

Di tar*î*kê[317] dimînî bê luks û pîl û fanûs

Tu rêk*î* dern*a*xînî ger nûr nebit ji dil ra[318]

---

310 ʿ**Estî**: Hestî, hastû

311 **Neqd**: Peyman

312 **Der**: Daçeka farisî ye ku berdêla vê di kurdî de daçeka “di... de” ye.

313 **Ġenîy**: Dewlemend, maldar

314 **Cewariḥ**: Ûnsûr, hêman, rêgez

315 **Selaḥî**: Qencî, çêyî, rindî, başî

316 **Şeh**: Şah

317 **Tarîk**: Tarî, tarîtî, bêronî

318 Îşareta vê hedîsê dike:

**(ألا وإن في الجسد مضغة إذا صلحت صلح الجسد كله وإذا فسدت فسد الجسد كله ألا وهى القلب)**

15.

Her pênc cewariḥê te dil ra wekî derî ne

Madam ku dergevan î, ġeflet nebit ji te ra

16.

Lewra li her derîyek her heye dizzekî dî

Dema *sis*tî û ġeflet xweş furṣet e ji wî ra

17.

Yek yek ji wan dikarit xezna[319] *dil* tarûmar ket

Eman ku dergevan î, mebe *ser*nerm ji diz ra

18.

**Ḥezîn** h*î*şar be her dem ṣebr û teḥemmulê key

Sebir eger çi teʿl e, xweş ber[320] heye ji wê ra

**7.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Di ṣubha[321] ceşn*a* qurbanan, me dî dilber di ġafil da

Derî da hat wekî şahan, b*û*mê[322] derdan ji dil firda

2.

Gulê canan bi ava nûbeharê dîs*a* têk geş bûn

Çira nûrê d*î*sa pêket, bela kir ẓulmeta[323] dil da

3.

Dîsa roja dilan hilbû şeva tarî ji wan dûr ket

Dil û can têk ji xew rabûn, kawûsê dev ji wan berda

4.

Bi nar û nûr*a* rûyê yar*ê* kêvjingê[324] kul û derdan

Ji mij û pence derxistin ḥeyat nû bû di canan da

---

Bi baldar bin! Di bedenê mirov de qetek goşt heye ku eger ew durûst be bedenê mirov jî durûst e; ne eger xirab be hingê beden jî xirab e. Bizanin ku ev dil e. (Buxarî, Îman 39; Muslîm Musaqat 107; Ebû Dawûd, Buyû‘, 3)

[319] **Xezna:** Cihê ku tiştên biqîmet tên veşartin, barxane, ‘embar

[320] **Ber:** Fêkî, mêwe

[321] **Ṣubh**: Sibe, beyanî

[322] **Bûm**: Kund

[323] **Ẓulmet**: Tarîtî, bêronahîbûn; diltengî, tengasî

[324] **Kêvjing**: Kevjal, kêfşing

5.

Çikî ava giyana dil, li ser lêva helakê bû

Wekî masîk*î* ṭava hav*î*nê da, ma reben req da

6.

Di yabana fereh[325] da, ma tîy û birçî û bêhêvî

Heval gîştin muradê xu, tenê ma çol*ê* da xew da

7.

Hîşyar bû pez ç*û*ye danan,[326] heval û hogirek nîne

Bi berxê meqṣedan şad in, tenê maye di meġel da

8.

Bilind kir dest*ê* zarînê, rijandî hêstirê xûnê

Digel feryad û qîrînê, Xudêyo her tu may dest da

9.

Serî danîye ser şêmûk*a*[327] koşka reḥmetê bêḥal

Ji tîyan cerg*ê*[328] qîjîn pê *ket* ji germê *hil*bû ar[329] da

10.

Zemanek pur dirêj dil ma di atûna qetanê[330] da

Şukur ya Reb gihana wek bihiştê îr*o* bû peyda

11.

Wekî sîperrikan şahî li dora dil kirin gerran

Îlahî! vê j*î*na şîrîn li pêşber dil nekey wenda

12.

Kişandî te cezayê xu, di dozexa[331] şeva hicrê

Bihiştê da dimînî hey dilo, yarê weha soz da

13.

Guhertin nabitin tu car, di peyġama[332] delalê da

**Ḥezîn** ġemgîn mebe êdî, j*î*na te şahî ye tev da

---

325 **Yabana fereh**: Çola fireh

326 **Pez çûye danan**: Dana nîvro pêz ji çolê, ji çêrê ji bona dotinê tên malê. Jê re dibêjin “pêz hatiye/çûye dana”

327 **Şêmûk**: Derçik, şêmûg, derezûng, derizgeh

328 **Cerg**: Kezeb, ceger

329 **Ar**: Agir

330 **Atûna qetanê**: Şewata cudabûnê, agirê dûrketinê, kela hicranê

331 **Dozex**: Dojeh, cehenem

332 **Peyġam**: Peyam, soz, gotin

**8.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Ji Xeznayê[333] xuya bû dilberek hîvro ji qelban ra

Dilê jar pare bû ya Reb ji ʿişqa w*ê* delalê ra

2.

Mîna goyîn*ê*[334] em her dem bi nalîn in li ser şaġan

Hedan hate birîn dilber bibêjim derd*ê* dil kî ra

3.

Bes e cana demek nêz be, bi dûrîyê te em kuştin

Nîşan de ṣûretê sêvîn[335] ji dilṣojê evînê ra

4.

Giran e derd*ê* hecra te, nikarin em teḥemmul kin

Me yê dilkul bikey meẓher[336] ji luṭf û ʿefw *û* reḥmê ra

5.

Ne carek bênewa[337] me ez, tu mîr û serwer î îro

Li hêvîya te mame ez, tu sulṭan î cihanê ra

6.

Derê cûd[338] û fuyûḍatan[339] ji jaran ra vekey yara

Ji ġeyrî te *î*ro nîne, tu hêvîyek ji bo me ra

7.

Sitûxar in li henber te, ricakar in ji luṭfa te

Birîndar in bi dil îro, tu derman î ji derdan ra

8.

Tu îro şah*ê* seḥra yî, celîsê[340] text*ê* Xezna yî

Ji Sûrîyê ḥetta Serḥed tu sulṭan î ji qelban ra

9.

Kemala[341] te cemala[342] te, digel şewq û şemala te

---

[333] **Xezna**: Xezna li Rojavayê Kurdistanê gundekî girêdayî Qamişloyê ye. Gundê şêxên Xeznayîyan e.
[334] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.
[335] **Sêvîn**: Weke sêvê sor, gelek sor, gevez
[336] **Meẓher**: Cihê zahirbûn/diyarbûnê, cihê ku lê dixuyê.
[337] **Newa**: Deng, awaz
[338] **Cûd**: Comerdî, camêrî
[339] **Fuyûḍat**: Pirjimariya "feyz"ê ye. Feyz, bereket, kerem, îhsan
[340] **Celîs**: Yê ku li ser textê rûdinê

Digel nêrîn*a* rûyê te, bes e muncî[343] murîdan ra

10.

Ji Xeznayê ji Tilmeʿrûf[344] m*î*na rojê ṭulû[345] kir te

Tîrêjê nûr û pêlê fey*ża* te ʿam bû ji ʿalem ra

11.

Fena darek*î* şîn bûyî di Xezna ya x*î*p û xalî

Gerî[346] Xezna bi saya te xezîne ʿilm û feyżê ra

12.

Ji wê darê dirêj bûn sê çiqûlkê[347] muṣmirê[348] nûrîn

Mîna ṭûbay*ê*[349] bûn ber dar*ê* bi xaşkî ji qencan ra

13.

Barana nisbeta barî li Aşîtan[350] li Ġerbîyan[351]

Nebû ew bar*a*na hêja ji Tûran û Îranê ra

14.

Li Xeznayê li Tilmeʿrûf, li Ṭor[352] û Isṭila[353] pur qenc

Nûra hilbû nedîtî kes, Semerqend[354] û Buxara[355] ra

15.

Her roj ṣuḥbeta pîran e digel nêrîna wan rûyan

Mala munkîr[356] dikin wêran, mefa[357] ne lê muḥîbban[358] ra

---

[341] **Kemal**: Gihîştî, têkûz, bêkêmasî

[342] **Cemal**: Rindî, bedewî

[343] **Muncî**: Xilasker, rizgarker

[344] **Tilme'rûf**: Gundekî girêdayî Qamişloyê ye. Şêxê Xeznayê Şêx Ehmedê Xezna (qs.) piştî ku gundê Xeznayê derketiye hatiye li wir bicih bûye. Medreseya xwe cardin li vir ava kiriye.

[345] **Ṭulû**: Helatin, hilbûn, derketina (rojê)

[346] **Gerî**: Digerî

[347] **Sê çiqûlk**: Mebest lê her sê kurê Şêx Ehmedê Xeznewî (qs.) ne ku navê wan bi rêzê ve; Şêx Muhemmed Xezna (qs.), Şêx Elaudînê Xezna (qs.) û Şêx ʻÎzzedînê Xezna (qs.) ne.

[348] **Muṣmirê**: Xwedî fêkî û mêywe, dara ku fêkî dide

[349] **Ṭûba**: Navê dareke bihiştê ye ku rîçên wê digije asîmanan û serê wê jî bin erdê ye.Siha vê darê ji bihiştê re dibe sî û hênikî û cûre cûre fêkiyên vê hene. (Pala, *b.n.*, r. 459.)

[350] **Aşît**: Navê taxeke bajarê Qamişloyê ye. (H.)

[351] **Ġerbî**: Navê taxeke bajarê Amûdê ye. (H.)

[352] **Ṭor**: Tor, Tûrabdîn. Navê çiyayê Mêrdînê ye. Herêmeke ji çiya pêkhatî ye. Dikeve navbera Mêrdîn, Botan û Êlihê. Midyad jî weke navenda vê herêmê tê dîtin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Tûrabdîn

[353] **Isṭila**: Taxekê Mîdyadê ye. Pirraniya wê taxê misilman in. (H.)

[354] **Semerqend**: Bajarekî dîrokî ye. A niha di nav sînorên Ozbekîstanê ye. Gelek ʻalim û mutesewifên mezin li wir xwendine û herwiha gelek mizgeft û tirbên ʻaliman di wî bajarî de hene. Ji ber vê yekê ji aliyê tesewifî ve bajarekî gelek girîng e.

[355] **Buxara**: Li Ozbekîstanê ye û wekî Semerqendê bajarekî dîrokî ye. Ji aliyê tesewifî ve bajarekî gelek girîng e, gelek alim û mutesewif li wir gihîştine. Şahê Neqşîbend Muhammed Bahaûddîn (qs.) ji wir e.

[356] **Munkîr**: Yê ku (hebûna Xwedê) înkar dike, napejirîne.

[357] **Mefa**: Sûd, havil, kêr, wec, menfaet

16.

Ji wan her sê çiqûlkan îr*o* ʿIzzuddîn*ê*[359] pur şîrîn

Fena bav û bira nin xu b*û*ye sîwan ji insan ra

17.

Bilindîyê d*a* wek roj e di merdîyê m*î*na derya

Bereketê d*a* wek qad e kulîlk e bulbulê dil ra

18.

Mîna avan n*î*ne wî ra sukûn[360] û raḥet û razan

Şev û rojan xebatê ket ji irşada ʿibadan[361] ra

19.

Ji leʿlê[362] wî dibarin dur ji rûyê wî difûrit nûr

Mîna behar*ê* xweş tê tim d*î*dara[363] wî ji canan ra

20.

Ji ḥeq ra dil evîn e ew gelekî ġemrevîn e ew

Mîna qendê[364] ş*î*rîn e ew delal û dilber e dil ra

21.

Cehan û maf*î*hayê[365] wê, nehêja ne n*ê*rînek wî

Feda bin mamelek[366] can û cesed, cah[367] û şeref wî ra

22.

Bi ṣuḥbeta w*î* ya germîn b*û* musteġnî[368] dilê ġemgîn

Ji xandina m*î*na Meṡnewîyan[369] û Meʿnewîyyan[370] ra

---

358 **Muḥîb**: Evîndar, dildar, dilketî

359 **ʻIzzuddîn**: Şêx ʻIzzedînê Xeznewî (qs.). Alim û mutesewif. Di sala 1925'an de li gundê Xeznayê hatiye dinyayê. Kurê Şêx Ehmedê Xeznewî ye. Piştî birê xwe yê Şêx Elauddîn li Tilmeʻrûfê ew bû Şêx. Yek ji wan xelîfeyên wî Seydayê Mela Husnî (Hezîn) e. Şêx Îzzedîn di sala 1992'an de çûye rihma Xwedê.

360 **Sukûn**: Sekinîn, rawestîn

361 **ʻIbad**: Evd, bende

362 **Leʻl**: Kevirekî sor e û wekî yaqût û qewherê giranbiha ye. Mebest jê lêvên sor e.

363 **Dîdar**: Rû, sîma, nêrîn

364 **Qend**: Şekir

365 **Mafîha**: Tiştên ku nav wî/ê de cih digirin. Li vir mebest hemû tiştên ku di dinyayê ne.

366 **Mamelek**: Çi malê mirov hebe, her tişt, hemû malê mirov

367 **Cah**: Meqam, paye; qedr, giramî, îtîbar

368 **Musteġnî**: Kesê ku pêdivîya wî tu tiştî/kesî tune ye, hewcehiya tiştan/kesekî nîne.

369 **Meṡnewî**: Pirtûka Mewlana Celaledînê Romî (k.d. 672/1273) ye. Romî ev pirtûka xwe bi zimanê farisî û bi şêweya mesnewiyê nivîsiye. Tê de gelek çîrok, qisse û qewlik hene û 27.000 malikan pêk tê û şeş cild e. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Semih Ceylan, "Mesnevî" *İslâm Ansiklopedisi*, c. 29, weş. MEB, Eskişehir 2004, r. 325-334.)

370 **Meʿnewî**: Pirtûka Îbrahîm Gulşenî (k.d. 940/1534) ye ku li Amedê nivîsiye. Zimanê vê farisî ye û ji 40.000 malikan pêk tê. Îbrahîmê Gulşenî ev pirtûka xwe ji Mesnewiya Mewlana Celaledînê Romî re wek nazîre nivîsiye. (Derbarê Îbrahîmê Gulşenî û Meʻnewî de ji bo agahiyên zêdetir bnr. Nihat Azamat, "İbrâhim Gülşenî" *DIA*, c. 21, 2000, r. 301-304.)

23.

Wekî Romî[371] ye fikrê da, Ġezalî[372] ye di ʿirfanê

Behaûddîn*ê*[373] weqtî ye, *î*ro nîne heval wî ra

24.

**Ḥezînê** jar û aware, wekî sêwyan[374] sitûxar e

Bi luṭfa te umîdwar e, b*û*ye qurban ji ʿişqê ra

**9.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − − /+ − − − /+ − − − /+ − − −

1.

Gulek taze n*û*rek ṣade p*î*rek bîtkel[375] divêt dil ra

Ji çûna bal meqaman ve divêt desteg*î*rek[376] dil ra

2.

Mehêle dil ku nig bavêje vê rê da ʿezîzê can

Meger pîrek*î* rûḥanî bibe heval û yar dil ra

3.

Hezaran hey di vê rê da çiya û deşt*ê* tev girnûk[377]

Borîna wan ve çênabe meger rêzan hebe dil ra

4.

Nexape tu bi zanîn û bi zir û zor*a* xu xorto

Evîn û pîr û ẕikr û fikr, di vê rê da divêt dil ra

---

[371] **Romî**: Mewlana Celaleddîn Romî (1207–1273). Navê wî yê eslî Muhemmed e. Pêşengê terîqeta Mewlewî, mutesewif, alim û helbestvan e. Nivîskarê Mesnewiya meşhûr e. Di berhemên xwe xîmên tesewifê, diyalog, xweşbînî û hwd. vegotiye û parastiye. Piştî wefeta wî ji aliyê xwendekarên wî ve terîqeta Mewlewî tê avakirin. (Derbarê terîqeta Mewlewî û Mewlana Celaleddîn Romî de ji bo agahiyên zêdetir bnr. Şinasi Gündüz, *Din ve İnanç Sözlüğü*, weş. Vadi, Ankara 1998. r. 78 û 259.)

[372] **Ġezalî**: Ebû Hemîd Muhemmed bîn Muhemmed Xezalî (1058-1111). Alimê mezin, mutesewif û fîlozofê Îslamê. Li Tûsê hatiye dinê. Di sala 1091'an de li Bexdayê bû serokê medreseyên Nîzamiye û hingê namdar bû. Berhemên Farabî û Îbnî Sîna tenkîd kir û derbarê felsefeya Yûnaniyan gelek tişt nivîsî. Di berhemên xwe de nêrînên ehlê sinnetê parast. Gelek berhem nivîsîn, ya herî namdar Îhyau 'Ulumî'd-dîn e. (Gündüz, *b.n.,* r. 139)

[373] **Behaûddîn**: Şahê Neqşîbend Muhemmed Behauddîn (1318–1389). Li gundê Qesrê 'Arifan a Ozbekîstanê hatiye dinê. Alim û mutesewifê mezin. Damezrînerê terîqeta Neqşîbendiyê. Li cem Muhemmed Baba Semmasî û Emîrê Kulal mezin bûye. Ji bo perwerdehiya tesewifî li cem Xace Yûsifê Hemedanî ders girtine. Hetanî serdema Muhemmed Behauddîn terîqet bi navê Terîqa Hacegan dihate nasîn, lê piştî wî navê terîqetê guheriye û wek Terîqa Neqşîbendiyye belav bûye. Gelek alim û mutesewif li medreseya wî gihîştine. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Hamid Algar, "Bahâeddin Nakşibend", *DIA*, c. 4, 1991, r. 458-460.)

[374] **Sêwyan**: Sêwî, bêdê, bêdayîk

[375] **Bîtkel**: Pispor, mahir, şareza

[376] **Destegîr**: Alîkar, destekar,

[377] **Girnûk**: Navê gihayekî wek nokan bêbejn e û bistrîn e. Di nav zeviyan de digîje.

5.

Di zaninê tu Mûsa bî di zorê da Sikender[378] bî

Dîsa her lazim e Xiḍrek[379] di vê rê da mudam dil ra

6.

Wekî Romî[380] b*î* fikrê da m*î*na Cam*î*[381] bî ʿilmê da

Seʿîd[382] û Tebr*î*zî[383] dîsa divêt dil ra divêt dil ra

7.

Gehana sosinan bê pay*ê* ʿişqê nabitin mumkin

Ji berf û serm*a* zozanan r*a* germî lazim e dil ra

8.

Kesî bi germîya ʿişqê neḥellit nabe ronîdil

Ji bo ṣadeb*û*nê her lazim e evîn hebe dil ra

9.

Gelo cewher dibit ṣade eger atûn[384] nebe tu`ccar[385]

Ji pîsxûyan xelaṣ nabe dema ʿişqek nebit dil ra

10.

---

[378] **Sikender**: Sikenderê Zulqerneyn. Derbarê wî de gelek efsane û rîwayet hene û herwiha gelek kitêb û helbest derbarê wî de hatine nivîsandin. Di edebiyatê de piranî bi sê şiklî cih digire; kesê ku ava jiyanê digere, hevaltiya wî ya bi Xizir re, wendabûna wan a di welatê taristanê. Li gor rîwayetê Sikender bi artêşa xwe ve ji bo ku ava jiyanê bibîne diçe ser welatê taristanê. Wezirê wî Xizir jî bi wî re ye. Li wir gelek çîrokên cuda hene ku dawiyê de Xizir ava jiyanê dibîne vedixwe û lewma li dinyayê de dimîne. Dike ku ji hevalê xwe Sikender re jî bibe lê rêya xwe wenda dike û nikare bigihîne wî. Herwiha li ser Sikender bûyerên cuda jî tên vegotin ku yek jio wan ji qewma Yecûc û Mecûc re seddek mezin ava kiriye. Dîsa di efsaneyan de derbarê neynika wî (ayîneî Îskender) de jî gelek tişt hatine gotin. (bnr. Pala, *b.n.*, r. 237.)

[379] **Xiḍr**: Wisa tê bawerkirin ku, ew kes e ku ava jiyanê vexwariye û ji mirinê xilas bûye. Derbarê wî de gelek tişt hatine gotin ku carinan wek pêxember carinan wek ewliya hatiye pejirandin. Di Quranê de çîroka wî ya bi Hz. Mûsa (as.) re derbas dibe, heye (Kehf/ 59-81). Herwiha rîwayet dikin ku di dema Hz. Nûh, Hz. Mûsa û Sikenderê Zulqerneyn de jiyaye. Lê nêrîna giştî ev e ku ava jiyanê di dema Sikender de vexwariye û êdî nemiriye. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Pala, *b.n.,* r. 204-205)

[380] **Romî**: Mewlana Celaleddînê Romî. (bnr. 8/23)

[381] **Camî**: Mewlana Camî (1414-1492). Navê wî yê eslî Nûreddîn ‘Evdirrehman kurê Ehmed e. Ji Îranê ye. Alim, matematîkzan, şa’ir û mutesewifekî mezin e. Yek ji wan helbestvanên mezin yên Îranê tê pejirandin. Perwerdehiya xwe ya yekem li Medreseyên Nîzamî dîtiye. Li Semerqendê li ser stêrzanî û matematîkê xebitiye. Piştî ku waqifê hemû ilmên serdema xwe dibe, diçe întîsabê Se‘dîdûnê Kaşxerî dike û dikeve terîqeta Neqşîbendiyê. Piştî wefata wî jî întîsabê Xace Ubeydûllahê Ehrar dike. Bi zimanê erebî û farisî gelek berhem nivîsiye. Herwiha Dîwana wî gelek namdar e. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Ömer Okumuş, “Abdurrahman Câmî”, *DIA*, c. 7, 1993, r. 94-99.)

[382] **Seʿîd**: Se‘dîdûnê Kaşxerî (? -1456). Ji welatê Tirkîstanê ye. Li cem Mewlana Nîzamedînê Hamûşî perwerdehiya xwe dibîne. Alim û mutesewifekî mezin ê serdema xwe bû. Gelek alim û ehlê tesewif li ber destî wî gihîştine. Yek ji wan şagirdên wî jî *Mewlana Camî* ye. (bnr. 9/6)

[383] **Tebrîzî**: Şemsê Tebrîzî (1185–1248). Mutesewif û alimê mezin. Navê wî yê eslî Muhemmed e. Ji Tebrîzê ye. Li cem gelek mutesewifên mezin maye û xizmet kiriye û herwiha gelek ciyan geriyaye wek Bexda, Heleb, Dimeşq, Erzirom, Erzîncan, Qeyserî, Konya û hwd. Di berhema xwe ya Meqalatê de gelek pesnê Îbnî Erebî daye û di bin bandora wî de maye. Herwiha Şêxê Mewlana Celaleddîn Romî ye. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Semih Ceylan, “Şems-i Tebrîzî”, *DIA*, c. 38, 2010, r. 511-516.)

[384] **Atûn**: Firin, argûn, ocax

[385] **Tu`ccar**: Tu car, qet, hîç

Mîna zinnarṭebîʿet sar û bêkêr û giran e her

Kêlakî agirê ʿişqê nekelînit d*î*za dil ra

11.

Şûrê heş nabirit û baz*ê* ruḥ nafirre tu`ccarek

Dema dajo nebit îksîr*a* ʿişqa dilberek dil ra

12.

Xelaṣbûna ji derd û çûyîna bal sosina yekta

Me ḥalek ʿeqlî ye cano meger evîn hebit dil ra

13.

Welê bê dîtina nûrek ji yara dilreva berxo

Livîn[386] çênabitin ruḥ ra evîn çênabitin dil ra

14.

Ji bo naskirina nûrê divêt meʿerrifek[387] mahir[388]

Ku zana be bi her ḥal û meqam û menzilê dil ra

15.

Eger ev şerṭ nebin rêwî dimîne dûr*ê* wargehan

Çûyîna bal meqaman ra, divêt ʿIzzudd*î*nek[389] dil ra

16.

Girîftar im bi ʿişqa te, d*î*n û dûr im ji weṣla[390] te

Perîşan im pur êşan im, tu Zîn û Şîr*î*n î dil ra

17.

Em in bengî tu yî dilber, em in sîper[391] tu yî fenner

Em in masî tu yî derya, ḥeyat û şahî yî dil ra

18.

Di nêv baġê cemalê[392] da tu yî her ṣorgula reʿna[393]

Di xûbanê[394] cihanê da tu meʿşûq î *î*ro dil ra

19.

Cehan tev da bibit dilber, tijî bit ṣorgul û fenner

---

[386] **Livîn**: Livandin, lebitandin, leqandin
[387] **Meʿerrif**: Mamoste, perwedekar, rêzan
[388] **Mahir**: Pispor, şareza, bîtkel
[389] **ʻIzzuddîn**: Şêx ʻIzzedînê Xezna. (bnr. 8/16)
[390] **Weṣl**: Gihîştin, gihandin
[391] **Sîper**: Sîperik, pirpirok, minminîk, baperik
[392] **Cemal**: Rindî, bedewî, spehîtî
[393] **Reʿna**: Rind, bedew, rewnaq, geş û xweşik
[394] **Xûb**: Rind, bedew

Ji bil te nabe yarek dî, ji mestê bulbulê dil ra

20.

Tu yî lebrêj*ê* ḥikmet beḥr*a* ʿilmê quṭb*ê* irşad î

Çiyay himmet*ê* yî Rustem*ê* Zal[395] î weswesa dil ra

21.

Di bajarê reşadê[396] da m*î*na te dûrb*î*nek[397] nîne

Di teqwa û sed*a*dê[398] da fena te naxuyê dil ra

22.

Birîndar im tu doxtor î ş*î*rîn û nazenîna min

Bes e dûrî were êdî, heval be bîstekî dil ra

23.

Ziman lal e ji weṣfê te, ʿeqil ko[399] ye ji kunhê[400] te

Bi dostê fan*î* bim yekser, nayê zanîn d*î*sa dil ra

24.

Çiyayê rehberîyê da û deryayê îfadê da

Di meydana berê da nî, n*î*ne wek te kesek dil ra

25.

Seraser ḥikmet û nûr î, melekxûy î fikirkûr î

Ḥira[401] û Keʿbe û Ṭûr î, qewî qenc rehber î dil ra

26.

Tu rêzan î ji kerwanê reha[402] bajar*ê* ʿirfanê

Tu nîşan î ji wendan ra, ḥużûr û dawer[403] î dil ra

27.

Wekîlê Ġewṣ*ê* Xezna[404] î, emînê sirr*ê* irşad î

---

395 **Rustemê Zal**: Rustemê Zalê Kurd. Pehlewan û lehengê efsanewî yê Îranî. Bi wêrektiya xwe ve namdar e û sembola têkneçûn û hêzê ye. Bavê wî Zal e ku şahê Sicistan û Seyistanê bû. Li gor efsaneyê gava ku ji dayika xwe bûye yekî porspî bûye. Ji ber vê bavê Rustem, ew qebûl nekiriye û ew biriye avêtiye Çiyayên Elborzê. Rustem li vir ji aliyê teyrê Sîmûrxê ve hatiye mezinkirin. Hê di xortaniya xwe de gelek dêw kuştine û di şerên mezin de gelek mêrxasî kirine. Li gorî texmînana di sedsala 4. a beriya zayînê de jiyaye. (bnr. Pala, *b.n.,* r. 382.)

396 **Reşad**: Di rêya rast de çûyîn, di rêya heq de bûyîn

397 **Dûrbîn**: Pêşbîn, bergizan

398 **Sedad**: Rastî, heqî

399 **Ko**: Netûj, nebirrek. Li vir wate; tênagihije, fêm nake

400 **Kunh**: Heqîqet, ‘esl

401 **Hîra**: Şkefta Hîrayê. Li Mekkê ye. Hz. Muhemmed (asw.) li wê derê ketiye xelwetê û Qurana Pîroz cara ewil li wir hatiye hinartin.

402 **Reh**: Rê

403 **Dawer**: Dadger, dadrês, ferwerde

404 **Ġewṣê Xezna**: Şêx Ehmedê Xezna. Alim, murşîd û mutesewif. Di sala 1886‘an de li gundê Xeznayê Qamişloyê hatiye dinê. Di medreseyên Diyarbekir, Xîzan, Silîvan/Farqîn û Norşînê de xwendiye. Li cem xelîfê

Melikê ʿalema qelban *î*, serraf î *î*ro dil ra

28.

Girîftar im bi ʿişqa te elemdar im bi hicra te

Ḥeyata min evîna te`y gul î tu bulbulê dil ra

29.

**Ḥezîn** im dil birîn im, çav tijî xûn im s̱enaxan[405] im

Bişîne tavîyek[406] feyżê ji bustanê bejê[407] dil ra

**10.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Dilê min pare bû çawa ji ʿişqa dilbera yekta

Seraser bûm kebab derda[408] ji hecra[409] yar*a* napeyda[410]

2.

Teḥemmul nabe ev jana der e ji kar*î*na insan

Birîn kûr e, elem dişwar[411] e agir hilb*û*ye dil da

3.

Di dozexa qetanê[412] da me ra ṣebr û hedan nîne

Şewitî dil peritî dil b*û*ye ax û x*a*lî bin da

4.

Hilo rêzan*ê* kerwanê Xudêçûyan ji bona ḥeq

Rêwenda me tenê mame binêre ca h*ê*la min da

5.

Reha key[413] me ji vê yaban*a*[414] yabanîy*a* bêdawî

Ji nêrîna xu ya pîrane van jaran nekey wenda

---

Şêx Evdirehmanê Taxî, Şêx Evdilqadirê Xîzanî maye û demeke dirêj xizmeta wî kiriye. Piştî wefata Şêx Evdilqadirê Xîzanî derbasî cem Muhemmed Diyaûddînê Norşînê bûye. Li wir xelîfetî standiye. Xelifê Şêx Muhemmed Diyaûddînê Norşînê bû. Di sala 1949'an de li Tilme'rûfa Qamişloyê çûye rehma Xwedê.

405 **Senaxan**: Yê ku hemd û şukur dixwîne

406 **Tavî**: Rêjne, rejne. Barana ku ji nişkê ve destpê dike û demeke kurt dibare.

407 **Bej**: Erd, reşahî, cihên bêav

408 **Derda**: Ey derd, derdo. Li vir bangî derdê xwe dike.

409 **Hecr**: Hicran, cudahî, fîraq, dûrketin

410 **Yara napeyda**: Ew yara ku li ber çavan nîne, naxuye. Mebest jê Xwedê ye.

411 **Dişwar**: Dijwar, zor

412 **Qetan**: Cudayî, veqetan, dûrketin, fîrqet

413 **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike

414 **Yaban**: Çol, çolistan, sehra

6.

Me ne şan e ne nîşan e, me ne war e ne dîyar e

Di şeḥraya[415] ḍelalê da nizanim ez biçim ku da

7.

Ji qudsa enwerîn[416] ruḥê reben hat tarîya canan

Mîna goyîn[417] bi wîllîn e di ḥebsa cism*ê* axîn[418] da

8.

Gelo kengê difirrit çûk*a* ruḥ bal dilbera yekta

Li henber sosina tim geş m*î*na bulbul dibit şeyda[419]

9.

Weya kengê reha bit ruḥ ji tarîya şeva hecrê

Li henber nûr*a* napeyda fena sîperrikê can da

10.

Weya kengê xelaṣ bit ruḥ ji tor û tarp*ê*[420] vê şîrpê[421]

Dibit sûber[422] m*î*na ḥûtan[423] di beḥra nasîya ḥeq da

11.

Hilo ey Qaṣidê ekber[424] xudanê duldul û kewser

Ji wendan ra tu yî rehber di vê rêwîtîya dûr da

12.

Hilo qebtan*ê* deryaya xu dinasîy*î* bigre me

Di vê beḥra k*û*r a bêbin ji bo ḥeq geştîya[425] xu da

13.

Bi me nîşan bide mercan û durrê ʿilm û ʿirfanê

Ji bo ruḥê reben bibîne hedanek[426] qetanê da

14.

Hilo ey şal*û*lê[427] baġê cemala yar*a* napeyda

---

415 **Şeḥra**: Çol, çolistan

416 **Enwerîn**: Ya binûr, nûrîn

417 **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.

418 **Cismê axîn**: Ew cismê ku ji axê hatiye çêkirin. Mebest jê laş, bedenê mirov e.

419 **Şeyda**: Evîndar, bengîn, dilbestî, dîwane

420 **Tarp**: Bendava biçûk. Ji bo ku masiya bigirin, li ber çeman bi keviran çêdikin. Masiyên ku nav avê tên di nav wê tarpê de dimînin û tên girtin.

421 **Şîrp**: Ava ku xweş û bilez diçe û hertiştî kaş dike. Çemên bi wî rengî re dibêjin “şîrpê çeman”

422 **Sûber**: Yê ku soberî dike, sober, melevan, avjen

423 **Ḥût**: Masiyê mezin, neheng, balîna

424 **Qasidê ekber**: Qasidê mezin. Mebest jê Hz. Mûhammed (saw.) e.

425 **Geştî**: Keştî

426 **Hedan**: Aram, sebr, tebat

Gulek geş sosinek taze kulîlkê nû b*î*ne vir da

15.

Ji bo keyfxweş bibe ruḥê d*û*rê yar û dîyarê xu

Bibîne carekî kundê k*o*rê derdan ji ser fir da

16.

Ji wî baġê ji wê avê, ji wê nûr û ji wê ṭavê

Ji wê bêhn û ji gulavê[428] neṣîb bit beng*î*[429] ra ferda[430]

17.

Tu hewar û tu hêvî yî, tu behar û tu tavî yî

Nekey meḥrûm ji elṭafan,[431] dilê daġ û keser tê da

18.

Ḥebîbu`llah[432] *î* tu`y cana şefîʿu`l-xelq*î*[433] tu`y dilber

Celîsê[434] text*ê* "lewlak" î[435] ku ʿalem bû bi te peyda

19.

**Ḥezîn** im her ji hecra te purengwar[436] im ji ʿeşqa te

Hêvîdar im ji luṭfa te ku sar key germîya dil da

20.

Carek şaho[437] temaşa key bi dîdara[438] xu me şa key

Bi feyża xu dil ava key xerabḥal in evînê da

**11.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / feʿûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1.

Esîrê nefs*ê* me sulṭan*ê* Xezna[439]

Birîndar im ji dil luqman*ê* Xezna

---

427 **Şalûl**: Teyrekî mînanî bilbilê dengxweş e.
428 **Gulav:** Ava gulê
429 **Bengî**: Evîndar, mecnûn
430 **Ferda**: Sibe
431 **Elṭaf**: Pirjimariya "lutf"ê ye. Qencî, çêyî, başî, îhsan
432 **Ḥebîbu`llah**: 'Evdê ku Xwedê herî zêde jê hez dike ango Hz. Muhemmed (asw.) e.
433 **Şefîʿu`l-xelq**: Ewê ku ji xelqê re şefa'atê dike
434 **Celîs**: Yê ku ser textê rûdinê
435 **Lewlake**: Ger tu nebûyayî. (Îşareta hedîsê dike. Bnr. 1/13)
436 **Purengwar**: Kozir, pêta agirê, pola êgir
437 **Şaho**: Ey şah. Li vir banglêkirin heye.
438 **Dîdar**: Rû, sûret, nêrîn, awir
439 **Sulṭanê Xezna**: Şêx Ehmedê Xezna. (bnr. 9/27)

2.

Ḥeyata me hemî tarî *û* dûman

Perîşan im hewar şehbaz*ê*[440] Xezna

3.

Rêwenda me di şeḥraya ḍelalê

Hewarxaz im ji te rêzan*ê* Xezna

4.

Me bîne ser reha[441] rasta Xudayî

Hêvî her tu`y me ra rûxal*ê*[442] Xezna

5.

Ġeriqî beḥr*ê* ʿişyan û gunah em

Dirêj key dest*ê* xu qebtan*ê* Xezna

6.

Xelaṣ key me ji vê tirs û ʿenayê[443]

Nenasin em ji bil Îlyas*ê*[444] Xezna

7.

Hezaran qelb*ê* tarî bûne ronî

Bi nûr û ḥikmeta Mûsay*ê* Xezna

8.

Çiyay Ṭorê[445] b*û*ye wek Ṭûr*ê* Sîna

Bi feyż û hîmmet[446] û nîsbeta Xezna

9.

Li Tilmeʿrûf welew hilbûye ew nûr

Cihan tev ronî kir newwar*ê*[447] Xezna

10.

ʿEreb, kurd û ʿecem, koçer *û* begler

Hemî ġerq bûn di beḥra feyż*a* Xezna

---

[440] **Şehbaz**: Şahê bazan
[441] **Reh**: Rê
[442] **Rûxal**: Rûyê bixal, bişanik, binîşan. Li ser rûyê Şêx ‘Îzzedîn xalek hebûye, işareta wê xalê dike. (H.)
[443] ʿ**Ena**: Tirs, saw, xof
[444] **Îlyas**: Hz. Îlyas (as.). Yek ji pêxemberên ku ji kurê Îsraîliyan re hatiye şandin. Qewmê wî qewmekî pûtperest bû. Hz. Îlyas bi Tewratê ‘emel dikir û qewmê gazî li ser riya rast dikir.
[445] **Ṭor**: Tor, Tûrabdîn. Navê çiyayê Mêrdînê ye. Herêmeke ji çiya pêkhatî ye. Dikeve navbera Mêrdîn, Botan û Êlihê. Midyad jî weke navenda vê herêmê tê dîtin. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. http://ku.wikipedia.org/wiki/Tûrabdîn
[446] **Himmet**: Lutûf, kerem, alîkarî, parastin
[447] **Newwar**: Pirjimariya “nûr”ê ye. Nûr, rewnaq, ronak

11.

Seraser lah*û*t[448] e ew ẕat*ê* qudsî

Di şeklê nas*û*t[449] e purnûr*ê* Xezna

12.

Bi derve tev murîdan e, bi hundûr

Meqamê lamekan[450] day, baz*ê* Xezna

13.

ʿEnînûr e, d*î*tindûr e, dizane

Bi her ḥalê dilan ew şah*ê* Xezna

14.

Ṣalê çend car bide qelbê xu xortê

delal, rotken*a*[451] ser ṭebîb*ê* Xezna

15.

Ji her derdê dilan ra heye derman

Li cem wî rehber û dilzan*ê* Xezna

16.

Ji bil peyġemberîyê bide bê tirs

Kemalatê beşer wî quṭb*ê* Xezna

17.

Nîne wek wî cihanê da hunermend

Seraser himmet e hemmam*ê*[452] Xezna

18.

Dîwar neqiş dikir Manî[453] bi derve

Dilan dinneqişe neqqaş*ê* Xezna

19.

Sînan[454] miʿmar*ê* koşkan û seran e

---

448 **Lahût**: Îlahiyet, ‘alema îlahî, alema ruhanî

449 **Nasût**: Însaniyet, her tiştê ku bi însanan re elaqeder e.

450 **Lamekan**: Bêmekan, bêcih, bêwar

451 **Rotken**: Amûrê rontgenê

452 **Hemmam**: Xwedan himmet, xwedî lutf û îhsan

453 **Manî**: Neqqaş û wênesazê Çînî. Di serdema Sasaniyan de hatiye Îranê jî. Bi wêne û kitêbên xwe yên neqş neqşî ve namdar bûye. Herwiha avakerê dînê Manî ye. (Pala, *b.n.,* r. 297.)

454 **Sînan**: Mîmar Sînan (1489-1588). Ji bajarê Qeyserî ye. Di dewleta Osmanî de sermîmar bû. Di mîmariyê de formek nû aniye û ekola xwe afirandiye. Nêzîkî 400 mizgeft, pir, kanî, medrese avahiyên din çêkirine. Di nav wan berhemên wî de yê herî girîng Mizgefta Selîmiye ya Edîrnê ye ku di salên navbera 1568 û 1574’an de ava kiriye. Herwiha gelek mîmar jî gihandiye û bi berhemên xwe ve ji wan re bûye mînak. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Selçuk Mülayim, “Sinan”, *DIA*, c. 37, 2009, r. 224-227.)

Dilan ra çêker e ev pîr*ê* Xezna

20.

Bi keşfa Ed*î*son[455] ronî b*û*ye der

Dilan ronî dike keşşaf*ê* Xezna

21.

Di beḥran da *ger*rînker bû Mecellan[456]

Li eflakan[457] digerre kal*ê* Xezna

22.

Nîşanker e ji qadê ra muxerriṭ[458]

Nîşan dide semayê Ġews*ê* Xezna[459]

23.

Dide zanîn ḥewadîs̱an muerrîx[460]

Dide zanîn şuûnan[461] pîr*ê* Xezna

24.

Dilê qelbê nehêja ye dibe zêr

Bi iksîra n*ê*rîna ferd*ê* Xezna

25.

Ruḥê nîvmir*î* yê bêkêr û bêdeng

Digerrîne quling derrak*ê*[462] Xezna

26.

Sirrê sarê[463] bi dunyay ve qemitî[464]

Dibe pêtî bi ʿişqa yarê Xezna

27.

Ji qeyda can cuda dibin leṭaîf[465]

Bi rehberîy*a* wî rehber*ê* Xezna

28.

Ew e sosin*a* zozanê meqaman

---

[455] **Edîson**: Thomas Alva Edîson (1847- 1931). Ji Emerîkayê ye. Mûcîdê ampûlê ye.
[456] **Mecellan**: Ferdinand Mecellan (1480- 1521). Ji Portekîzî ye. Deryavan, gerok, keşşaf.
[457] **Eflak**: Pirjimariya "felek"ê ye. Felek, çerx, gerdûn
[458] **Muxerriṭ**: Ewê ku tişta nîşan dide
[459] **Ġewsê Xezna**: Şêx Ehmedê Xezna. (bnr. 9/27)
[460] **Mûerrix**: Dîrokzan, mêjûnas
[461] **Şuûn**: Kar, fiîl, hewadîs
[462] **Derrak**: Pir zana, têhigîştî, xwedan feraset
[463] **Sirrê sarê**: Li vir mebest 'dilê sar' e.
[464] **Qemitî**: Qemitandin, zeliqandin
[465] **Leṭaîf**: Têgeheke tesewifî ye. Hestên letîf, pejnên narîn. Wek; qelb, ruh, sir, xefî, exfa û hwd.

Gula baġê dilan e şah*ê* Xezna

29.

Hezaran dil bi govend û bi reqṣ in

Mîna bulbul li henber gul*a* Xezna

30.

Hezaran can bi şewat û bi lerzîn

Fena sîperrikan[466] dûr nûr*a* Xezna

31.

Gelek mûnkîr b*û*ne dilkor *û* tarî

Wekî şevşev*o*kan[467] ber roj*a* Xezna

32.

Tu şîr û şekker û nûr û îman î

Ḥeyat û şahîyê serkar*ê* Xezna

33.

Me hêvî hey ji te carek binêrî

Li dildarê gula bustan*ê* Xezna

34.

**Ḥezîn** aware ye, mest e, xerab e

Hêvîdar e welê ji luṭf*a* Xezna

35.

Welew nîne w*î* ra şeʾn[468] û ṣelaḥek[469]

Bi ixlaṣ teslîm e ferman*a* Xezna

36.

ʿEzîzê qelb û canan î tu cano

Em in Ferhad tu yî Şîrîn*a* Xezna

37.

Bi şahî rê dikim ṣed canê şîrîn

Hebin min ra di rahê ʿIzzê[470] Xezna

38.

Binêre bal me yê bêḥal*ê* dilkul

---

[466] **Sîperrik**: Pirpirok, minminîk, baperik
[467] **Şevşevok**: Pêçermok, baçemok, çilîçilî
[468] **Şeʾn**: Hal, rewş
[469] **Ṣelaḥ**: Xweşî, qencî, çêyî
[470] **ʿIzzê Xezna**: Şêx ʻIzzedînê Xezna (qs.). (bnr. 8/16)

Bi ḥeqqê Ġews*ê* Ġeyda[471] pîr*ê* Xezna

39.

Felek yar û zeman behar be bo te

Mubarek be te ra irşad*a* Xezna

40.

Li textê şahîya qelban tu rûnê

Bi dilşahî mudam feyyaḍê[472] Xezna

**12.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Ji Ḥicazê ji Beġdayê li Kabîl[473] û Buxarayê

Li Şehrêzor[474] û Şemdînê[475] n*û*ra Îslam*ê* ronî da

2.

Ji Ġeydayê[476] ji Norşînê[477] giha ew nûr*a* Xeznayê

Ji wê Ehmed*ê* Sanî[478] bû m*î*na rojê di meşrîq[479] da

3.

Ji wê rojê dirêj bûn sê ṭ*î*rêj, ronî kirin ʿalem

Bû wek şemsû`ḍ-ḍuḥa[480] ʿIzzedd*î*nê[481] şîrîn di nav wan da

4.

---

[471] **Ġewsê Ġeyda**: Şêx Sibxetûllah Erwasî (qs.). ‘Alim û mutesewifê mezin. Li Xîzana Bilîsê rûdinişt, ji ber vê bi navê Xewsê Xîzanî jî namdar bûye. Di biçûktiya xwe de li cem gelek alimên mezin xwendiye, li Wanê li cem Şêx Muhyeddîn maye û xizmeta wî kiriye. Dûre çûye Cizîrê û li cem Şêx Xalid û Şêx Salihê Sipkî maye û beşdarî suhbeta wan bûye. Gelek alimên mezin li ber destê wî gihîştine. Şêxê Evdirehmanê Taxî ye. Di sala 1870’ê de çûye rihma Xwedê.

[472] **Feyyaḍ**: Feyyaz, ew kesê ku zehf feyzê dide, tiştên rind û xweş belav dike.

[473] **Kabîl**: Paytexta Afganistanê ye. Bajarekî dîrokî ye.

[474] **Şehrêzor**: Bajarekî li Başûrê Kurdistanê ye ku li ber sînora Îranê ye. Di navbera Silêmanî û Derbendîxanê de dimîne. Gundên şêxên Neqşîbediyan ên navdar Beyara û Tewela jî li wî bajarî ne. Alim û mutesewifê mezin Mewlana Xalidê Şehrezorî el-Kurdî ji wî bajarî ye.

[475] **Şemdîn**: Şemzînan. Yek ji navçeyên Colemêrgê ye. Gelek alim li wir jiyane. Şêx ‘Ubeydellah jî li wir hukum kirye.

[476] **Ġeyda**: Gundekî bi ser navçeya Xîzan a Bilîsê ye. ‘Alim û mûtesewifê mezin Şêx Seyyîd Sibxetûllahê Erwasî (qs.) ji wî gundî ye û li wir wefat kiriye. (bnr. Xewsê Xeyda, 11/38)

[477] **Norşîn**: Yek ji navçeyên Bilîsê ye. Bi medreseya xwe ve namdar e ku ji aliyê Şêx ‘Evdirehmanê Taxî (qs.) hatiye avakirin. Gelek alim û mutesewifên mezin li wir gihîştine. Yek ji wan aliman jî Bedî‘uzzeman Seîdê Kurdî ye.

[478] **Ehmedê Sanî**: Şêx Ehmedê Xezna (qs.). (bnr. 9/27)

[479] **Meşrîq:** Rojava

[480] **Şemsû`ḍ-ḍuḥa**: Roja ku hilkişiyaye heya dema taştê, roja li taştiyan.

[481] ʿ**Izzeddîn**: Şêx ‘Izzedînê Xeznewî (qs.). (bnr. 8/16)

Bi nûra xu r*o*nî kir wî ʿErebistan[482] ʿEcemistan[483]

Xemilîn dil bi feyża wî fena zozan beharê da

5.

Li zozanê ceberûtê[484] di gulzara reḥemûtê[485]

Li welatê melekûtê[486] wekî gul bû di ber ro[487] da

6.

Mîna bulbul hezaran dil li ser wî bûn d*î*n û bengî

Ji germîya evîna wî çi agir hilb*û*ye wan da

7.

Gelek kûr e di fikrê da, gelek dûr e di nêrînê

Fena baran e nefʿê[488] da, mîna derya ye ʿilmê da

8.

Zanîna wî ne wek ya me ji xandin û d*î*tinî ye

Welê zanîn*a* wî nûr e, dizê bêkesb[489] dilê pak da

9.

Semawat û s̱erayê da tenê roj her ew e îro

Sîmak[490] û ferqed[491] û mirrîx[492] li henber wî bûne wenda

10.

Di irşad û ṭerîqê da li ber çavan xuyaye ew

Di meydana Xudênasîyê da îro ew e pêş da

11.

Hilo ey şah*ê* qelban, meḥb*û*bê ruḥan, n*û*ra ʿeqlan

Ji barana fuyûḍatan[493] bişîne tavîyek vir da

12.

Şehê textê cemal î tu, keramkar û delal î tu

---

482 ʿ**Erebistan**: Welatê ku Ereb lê dijîn.
483 ʿ**Ecemistan**: Cihên ku li derveyî Erebistanê dibînin.
484 **Ceberût**: Alema qehra celalê Xwedê
485 **Reḥemût**: Alema rehma cemalê Xwedê
486 **Melekût**: Alema mulkê Xwedê
487 **Ro**: Çem, rûbar
488 **Nef**ʿ: Menfaet, havil, sûd, mefa
489 **Bêkesb**: Bêxebatkirîn, bêşixulîn
490 **Sîmak**: Sîmak, semmak. Navê stêrkekê biçûk e ku stêrka herî bilind e.
491 **Ferqed**: Ferqedeyn. Navê du stêrkan e. Her tim li aliyê bakûrê nin. Şev ji bo naskirina rêya rast, dîtina îstîqametê tên bikaranîn. Herwiha tê wateya birca cêwîkan jî. Di kurdî de derbarê wan de biwêjek heye: Du bira ji hev diqetin lê ferqedeyn ji hev naqetin.
492 **Mirrîx**: Stêrka Merîx. Stêrkek sor û gevez e.
493 **Fuyûḍat**: Feyz û bereket

Ji bil ʿişqa te îro dil ji her tiştek*î* dev berda

13.

Şev û rojan m*î*na avan xewa şîrîn n*a*kev çavan

Ji ʿişqa te b*û*me kovan[494] neẓerkî berde ser min da

14.

Ji vê ʿişqê ji vê janê, ji vê dûrî û hicranê

Mîna Yeʿqûb*ê* Kenʿanî bi ahîn im qetanê da

15.

Bi ahîn û bi gîrîn im wekî xûnê dibarînim

Ji çavan hêstiran cana, Mem û Qeys[495] im di vê rê da

16.

Çima dilber xuya naket ġem û derdan bela naket

Li bengîyan qe purs naket di atûna[496] evînê da

17.

Evînê da şewitî dil bi carek bû kebab yara

Nema me ṣebr û aramek di vê hicran û zecrê da

18.

Gelo çi bit ku rojek yar biket pursê li me jaran

Weya weha dimînin em di vê zindan û ḥebsê da

19.

Gelo agir*ê* dil rojek bi ava weṣl*ê*[497] xar vebit[498]

Weya her dem dimînit dil di agirê firaqê da

20.

Behara ṣuḥbeta yarê gelo wê bit neṣîb min ra

Li henber ṣorgula ber ro[499] bibim wek bulbulê şeyda[500]

21.

Bes e dilber were êdî kula bengî bikey hêdî

Şewitî dil perritî dil bi dûrîyê di ʿişqê da

22.

---

[494] **Kovan**: Xemgîn, dilbiêş, dilbikeser, xemnak

[495] **Qeys**: Evîndarê Leylayê ye. Bi navlêka *Mecnûn* namdar bûye.

[496] **Atûn**: Argûn, hetûn, kuç, firin, ocax

[497] **Weṣl**: Gihîştin, gihan

[498] **Xar vebit**: (Agirê) vemirandin, temirandin, vekuştin

[499] **Ro**: Çem, av

[500] **Şeyda**: Dilbestî, dildayî, dilketî, dilda

**Ḥezînê** jar û aware, elemkêş e sitûxar e

Bikey pursê li wî yara di zencîra cefayê da

23.

ʿEzîzê dil delalê dil, ş*î*rîn û rûḥ li balê dil

Şemal[501] û nûr*a* çavê dil, tu yî îro di ʿalem da

24.

Dilan ra nûr tu yî îro, kulan ra merhem î îro

Pêşiwa yî tu her îro, ji kerwanê rahê ḥeq da

25.

Ji kerwan ra tu rêzan î, ji derdan ra tu derman î

Ji êşan ra tu luqman î, di vî ʿeṣr[502] û zemanî da

26.

Mîna rojê çiqas dûr bî, dilan ra dîs*a* her nûr î

Ṭîrêjê roj*a* rûyê te, t*ê*te dîtin di her cih da

27.

Tu qenc û dilber î cana, tu şîr û şekker î yara

Tu find û fenner î narîn, di qozîya[503] dilê min da

28.

Tu nûr î dil wekî sîper, tu gul î dil m*î*na bulbul

Tu hingiv î dil e wek mêş, ji te nabe tu`ccar cuda

**13.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / feʿûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1.

Qesem bi`llah[504] *î*ro ʿizza[505] zemîn[506] î

Seraser ḥikmet û ʿilm û yeqîn[507] î

Muʿînê[508] sunnet û şerʿa mubîn[509] î

---

[501] **Şemal**: Rewnaq, ronak, şahîk
[502] **ʻEṣr**: Sedsal; demeke diyarkirî; dem, zeman
[503] **Qozî**: Qorzî, kuncik, qunc, goşe
[504] **Qesem bi`llah**: Bi navê Xwedê sond dixwim
[505] **ʻIzz**: Îzzet, şeref, xoşewîst, evîndar. Li vir qesda Şêx ʻIzzeddînê Xeznayê (qs.) dike. (bnr. 8/16)
[506] **Zemîn**: Zeman, dem
[507] **Yeqîn**: Zanîna teqez, zanîn
[508] **Muʻîn**: Arîkar, destyar
[509] **Şerʻa mubîn**: Şerîʻeta eşkere û zelal

Bi qurbana te me şehbaz*ê*[510] Xezna

2.

Di irşad û ṭerîqê da tu pîr[511] î

Ji qelban ra *î*ro şah û emîr î

Neẓerkî berde ca ser min feqîrî

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

3.

Melekxûy î perîrû yî delal î

Ş*î*retvan î ji ʿalem ra şemal î

Dixom sondê tu nûra layezal[512] î

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

4.

Fesubḥaneh![513] n*a*yê zanîn çi rengî

Bi wê bejnê bi wê bêhnê w*î* dengî

Xuya be`l ʿaşiqê xu ne`b derengî

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

5.

Ne wek Leylê ne wek Zîn û Ş*î*rîn î

Ne wek nêrgiz*a* zîz û yasemîn î

Meger tu sosina xulda berîn[514] î

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

6.

Yeqîndar im[515] tu dermanê dilan î

Di irşadê *î*ro şahê cihan î

Sitûna Îsl*a*mê quṭbê[516] zeman î

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

7.

Ji ruḥan ra ḥeyat î can*ê* canan

Ji ʿeqlan ra şixat[517] î nûr*a* çeʿvan

---

[510] **Şehbaz**: Şahê bazan

[511] **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

[512] **Layezal**: Ewê ku qet wenda nabe, namire û her heye.

[513] **Fesubḥaneh**: Xwedê çiqas bedew afirandiye!

[514] **Xulda berîn**: Bihişta ezelî. **Xuld**, yek ji wan heşt tebeqeyên cennetê ye.

[515] **Yeqîndar im**: Teqez baweriya min heye

[516] **Qutb**: Ewliyayê mezin, serê murşîdan, xews

Ji nefsan ra xelat î merhema can
Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna
8.
ʿUbeydu`llahê Eḥrar[518] î bi himmet
Tu Necmuddînê Kubra[519] î bi sifet
ʿElaûddînê ʿEttar[520] î bi nîsbet
Bi qurbana te me şehbazê Xezna
9.
Ji wê bêhnê ji wê feyżê tu berde
Were nêzik me ra gavek xeber de
Hemî dunya biçe bo me çi derd e
Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna
10.
Lein qame ʿewalî fewqe reʾsî[521]
Ewin mittu we udxiltu f*î* remsî[522]
Û ḥafiẓ ḥubbeke ebḍen f*î* nefsî[523]
Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna
11.
Leqed eccecte naren fî ḥeşaî[524]
Leqed el qeytenî beḥre belaî[525]
Fenaun fî fenaîn fî fenaîn[526]

---

[517] **Şixat**: Niftik, pêtîk

[518] **'Ubeydûllahê Eḥrar**: Alim, mutesewif û şêxê Neqşîbendî. Di sala 1404'an de li gundê Baxistana Ozbekîstanê hatiye dinê. Di biçûktiya xwe dest bi xwendinê kiriye. Piştî 22 saliya xwe diçe Semerqendê û li cem mutesewif û şêxên mezin dibîne, beşdarî suhbeta wan dibe. Piştî dagirkirina dewleta Tîmûrî derbasî Semerqendê dibe û li wir dersên xwe didomîne û di sala 1490'an de wefat dike. Kitêbên wî yên derbarê tesewif û terîqe de hene. (bnr. Necdet Tosun, "Ubeydullah Ahrar", *DİA*, c. 42, 2012, r. 19-20.)

[519] **Necmuddînê Kubra**: Alim, muteswif. Di sala 1145'an de li bajarê Herîzmê hatiye dinê. Li cem gelek aliman xwendiye, gelek bajar û dewletan de li pey ilmê geriyaye. Di nav wan bajaran Semerqend, Bilîs, Misir û hwd. hene. Piştî ku ilm û seyr û sulûka xwe temam dike tê li Herîzmê cih dibe û tenê dersên xwendekaran dide. Gelek alim û mutesewifên mezin li cem wî dixwînin. Herwiha avakerê terîqeta Kubreviyyê ye. Di sala 1221'an de wefat dike. (bnr. Hamid Algar, "Necmeddîn-i Kübra", *DİA*, c. 32, 2006, r. 498-506.)

[520] **'Elauddînê 'Ettar**: Alim û mutesewif. Ji Buxarayê ye. Piştî wefata bavê xwe li Buxarayê medreseyan de dixwîne. Alimê mezin ê wê serdemê Şêx Bahaeddînî Neqşîbendî ew dibîne û hildide li bal xwe mezin dike. Elauddînê Ettar li cem Şêx Bahaeddînî Neqşîbendî dibîne, dixwîne û beşdarî suhbetîn wî dibe. Piştî wefata Şêx Bahauddîn mirîdên wî întîsabê Elauddînê Ettar dikin. Di serdema Elauddînê Ettar de Neqşîbendîtî li derveyê Buxara bela dibe digihîje gelek kesan. Di 1400'an de çûye rihma Xwedê. (bnr. Hamid Algar, "Alaeddîn Attar", *DİA*, c. 2, 1989, r. 319-320.)

[521] Eger bi şûr û rim rabin ser serê min,

[522] Eger ez bimirim û bikevim goristanê,

[523] Ez dîsa jî di dilê xwe de hezkirina te diparêzim.

[524] Di nav min de te agirek hilxistiye.

[525] Te ez avêtim avşîn/deryaya belan.

Bi qurbana te me şehbazê Xezna

12.

Bi qurbana te me şaho neẓer key

Ji vê derd û ʿenayê[527] zû me der key

Ji wiṣalê[528] bibêje me xeber key

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

13.

Cihan tev da gul û baġ û zerî be

Bi bal cennet*ê* ve tev da derî be

Ḥeyat bê te d*î*sa ṭeʿl û ġerîb e

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

14.

**Ḥezîn** im dilbirîn im çav tijî xûn

ʿUmur borî demê me`y qenc hemî çûn

Penahê[529] me xerabḥalan tenê hûn

Bi qurbana te me şehbaz*ê* Xezna

**14.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

Ji derdê ṣorgulan ya Reb

Dilê jar pare bû ya Reb

2.

Ji êşa tîr*a* hicranê[530]

Nema dil da hedan[531] ya Reb

3.

Birûska firqeta[532] yarê

Nîşan kir berx*ê* dil ya Reb

---

526 Tunebûneke di tunebûnê de, tunebûneke di tunebûnê de.
527 ʿ**Ena**: Tirs, saw, xof
528 **Wiṣal**: Gihîştin, gihan
529 **Penah**: Spartin, cihê spartinê
530 **Hicran**: Cudabûn, firqet, êş û derdê cudabûnê
531 **Hedan**: Aram, sebr, tebat
532 **Firqet**: Cudabûn, cudayî, veqetîn

4.

Dema lê ket q*î*rîn pey ket

Li erḍê ket reben ya Reb

5.

Wekî ṭeyrik*î* ber can da

Li cih hilpirtikî ya Reb

6.

Fena[533] masîy*ê* ma req da

Tebat pey nakevit ya Reb

7.

Mîna zarokê nîvgoştî

Li qadê mariqî[534] ya Reb

8.

Wekî rovîy*ê* dîl[535] girtî

Çîkîn jê çû felek ya Reb

9.

Giran e barê hicranê

Nedî ser duşminan[536] ya Reb

10.

Qetan derdek*î* dişwar e

Nedî bavkuştîyan ya Reb

11.

Di atûna qetanê[537] da

Dilê jar bû kebab ya Reb

12.

Bi barana gihanê, xar

vekey[538] agir*ê* dil ya Reb

13.

Çûka jar daye nêv pencan

Hiloyê[539] firqetê ya Reb

---

[533] **Fena**: Mîna, wekî, nola
[534] **Mariqî**: Hilperîn, lerizîn
[535] **Dîl**: Bende, kole, êxsîr
[536] **Duşmin**: Neyar, dijmin
[537] **Atûna qetanê**: Şewata cudabûnê, agirê dûrketinê, jana hicranê
[538] **Xar vekey**: (Agirê) temirandin, tefandin, vemirandin

14.

Hîna ku hey wî da helmek

Reha key[540] çûk*a* dil[541] ya Reb

15.

Bilind kir dest*ê* zarînê

Li henber reḥm*a* te ya Reb

16.

Ji çavan tê wekî xûnê

Dilopê hêstiran ya Reb

17.

Fiġanê tên digel ahan

Tînin xar baġiran[542] ya Reb

18.

Ji lorînê k*û*rê ġemgîn

Şewitîn ruḥ û can ya Reb

19.

Şewat ḥeqqê dil e lewra

Cihê ʿişqê ew e ya Reb

20.

Welê agir*ê* dil can û

Cesed kirye kebab ya Reb

21.

Di qanûna qedîmî da

Gerek weha neba ya Reb

22.

Ku her nefsek bi karê xu

Cezayê dikş*î*ne ya Reb

23.

Neçar û ist*û*xar û jar

Bi dergah hatime ya Reb

24.

---

539 **Hilo**: Eylo, daraş, qertel
540 **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike
541 **Çûka dil**: Dilê ku mînanî çûkê biçûk
542 **Baġir**: Kevirên li hev sûwar bûne û bi rêz dirêj bûne, zinar, lat

Bibîne çar*a* bêçaran

Bi destê te`y xelaṣ ya Reb

25.

Hêvîya me heye îro

Ji ʿewrê reḥm*a* te ya Reb

26.

Bişîne ser gula dil da

Dilopek ṭavîyan[543] ya Reb

27.

Bi qeṣda girtina gulkî

Me danî darekî ya Reb

28.

Mezin bû dar û bişkov[544] kir

Bi wê em şad dibûn ya Reb

29.

Kulîlkê nazenînê geş

Zer û ṣor kir li wê ya Reb

30.

Nigê bulbul ji keyfan qeṭ

Li qadê nediket ya Reb

31.

Negirt û me gulek hat ser

Gulan da bay*ê* sar ya Reb

32.

Hîna bulbul ji nêrînê

Nebû têr, baġ b*û* dar ya Reb

33.

Dilê jar car*î* dî wê geş

Dibînit çîçekan ya Reb

34.

Weya bulbul û gul dîsa

Dibin cot baġê da ya Reb

---

[543] **Ṭavî**: Rêjne, rejne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demeke kurt dibare.

[544] **Bişkov**: Ji bo gupika gul û kulîlkan ya ber vebûnê re tê gotin.

35.

Weya dildar û dildayî-

yê ra dibit gehan ya Reb

36.

Me çêkir torekî bîtkel[545]

Ji bo nêçîr bikin ya Reb

37.

Hatin lêva[546] *a*va çemkî

Me avêt golekî ya Reb

38.

Me derxist tê d*a* ye gama-

sîkî[547] gir û giran ya Reb

39.

Bi vewşandin*a*[548] xu vewşand

Qetandî bend û dar ya Reb

40.

Jixu masî bi dest vanat[549]

Xu ra bir tor û tarp[550] ya Reb

41.

Bi qeṣda girtina torê

Me, da avê hemen ya Reb

42.

Ḥetta destê me gîşt torê

Ketin şîrpa[551] ġedar ya Reb

43.

Ji bo masîk*î* rê kir me

Dil û canê ş*î*rîn ya Reb

44.

Ev e ḥalê dunê dosto

---

[545] **Bîtkel**: Zexm, pihêt, xurt

[546] **Lêv**: Rex, qerax,

[547] **Gamasî**: Masiyên terrikî û zehf mezin

[548] **Vewşandin**: Veweşandin, daweşandin, hejandin

[549] **Vanat**: Bi wateya "nehat"ê ye. Ango; çûye, derketiye. Ev gotin taybetiya devoka Çewlikê ye. Wek mînak dibêjin: Çêleka min natiye. (Çêleka min nehatiye)

[550] **Tor û tarp**: Amûrên ku kêrî girtina masiyan tên.

[551] **Şîrpa**: Ava an jî çema ku bi şîddet û sûret diçe.

Şev û rojan bibêj ya Reb
45.
Ji her derd û kulan da ku
Reha bî[552] hey bibêj ya Reb
46.
Serê her kar*ê* hêja da
Ji bo pêk bin bibêj ya Reb
47.
Ji bo ţarî û ţengîyê
Nebînî hey bibêj ya Reb
48.
Wegerne[553] wek **Ḥezîn** dûr may
Ji yarê qeţ mebêj ya Reb

**15.**

feʿ ilatun / feʿilatun / feʿilun
Remel + + − −/+ + − −/+ + −
1.
Hey *û* hey[554] çav*nêr* û guhdar be li qelb
Xez*î*na zêr*an* û zîvê te ye qelb
2.
Demekî ġa*fil* mebe bext*ê* te da
Piçekî ġeflet*ê* wêran dike qelb
3.
Ţov*ê* qenc bavêje qelbê xu bira
Lewr*a* çi ba*joy* w*î* hiltîn*î* ji qelb
4.
Bibj*ê*re a*jan*[555] û dayne t*ê* da hêj
Dirrîyê[556] jeʿr*î* j*î* hêşîn dike qelb
5.

---
552 **Reha bî**: Xilas bî, rizgar bî
553 **Wegerne**: An na, yan na
554 **Hey û hey**: Tim û tim, her dem
555 **Aj**: Zîl, zîlik, ajda, tirh
556 **Dirrî**: Stirîn, sinc

Kaġuk[557] û kulbek*ê*[558] li wî bike zû

Binve rakey ḥiss*ê* ḥeywan*î* ji qelb

6.

Çaw*a* çara *qan*s*ê*ra qert n*a*bitin

Naçitin xûy*ê* xerabê qert ji qelb

7.

Ṣal*ê* çend ca*ran* bidey rotkena[559] pîr

Bêje wî ra her çi êşa *hey* di qelb

8.

Çîkekê a*gir* seray wê*ran* diket

Yek xeyalek *pîs* serûbin dike qelb

9.

Wek gurê har e neyarê te, tu car

Bê ş*û*r û mer*tal* reha nakey tu qelb

10.

Neç*î* bê reh*ber* di vê rê da eman

ʿAlemek dî ye eva ʿalem*a* qelb

11.

Çiy*a*kî bêdih *û* bêbav e bira

Deştekî bê*a*v e ev ṣeḥ*r*ay*a* qelb

12.

Çiy*a* da nig nedey[560] rê bê *reh*berek

Paş*ê* beyhûde ji dest te diçe qelb

13.

Li dîyaran *çav*n*ê*r in qer*tal* û baz

Kî ku bînin *dûr* dixînin ji w*î* qelb

14.

Meçe bê ço di v*ê* xaçreh*a*[561] pir tirs

Ger dixazî bigêjî baj*arê* qelb

15.

---

557 **Kaġuk**: Kax kirin, alax kirin, gihayê biyanî ji kok ve derxistin

558 **Kulbe**: Amûrê kulb, tevir, xepar. Destiyê wê dar e, serê wê jî bi hesinê hatiye çêkirin. Kulbekirin jî navê wê şixulê ye ku bi kulbê xweliyê kolan e.

559 **Rotken**: Amûra rontgenê

560 **Nig nedey**: Piyê xwe neavêje, gavê xwe neavêje

561 **Xaçreh**: Şiverê

Li der û dor*ê* r*ê* hey her gur *û* mar

Bê selaḥa *pîr* xelaṣ na*key* tu qelb

16.

Ten*ê* guh de g*o*tinê qenc*ê* delal

Lewr*a* gotin*ê* nebaş reş dike qelb

17.

Guh bidey çi, ew diçe meşg*a* dilan

Lewr*a* tê go*tin* guh e kovik*a* qelb

18.

Ya **Ḥezîn** rabe rûnê ġafil mebe

Dû ra diz talan dike xezîna qelb

**16.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Ev ʿalemek wêrane ye, wê da n*î*ne ʿeyş[562] û ṭereb[563]

Ev war e ne xanyê me ye, pey dilgirêdan pur ʿeceb

2.

Pur kes di wê zengîn dibin, xuy[564] mal û zarok û pere

Nişkiv belakê ser da tê, mal û melal tev çit ʿeṭeb[565]

3.

Ya derd*ê* lê peyda dibit, ya tête ser êşek ġedar

Ṣadî û le*ẕẕ*et nam*î*nit, jîna w*î* yekser bit kereb[566]

4.

Da xweş bizanit ehl*ê* dil, dunya ne ya dildan*ê* ye

Da ew ʿibadet kin ji dil, vê nukt*ê* da nîne tu reyb[567]

5.

Berdin temamê xaliqê, wî ra bikin wî ra bidin

Her wî bizanin nig[568] belan, bil wî nenasin yek sebeb

---

562 ʿ**Eyş**: Jiyan, heyat

563 **Ṭereb**: Tevger, lebat

564 **Xuy**: Xwedî, xweyî

565 **ʻEṭeb**: Helaq, hilak, mehfbûn

566 **Kereb**: Kerb, derd, xem

567 **Reyb**: Şek, guman

6.

Herçî merovê hûrdizan,[569] dibit dunê da wek ġerîb

Ya wek musafir[570] be li rah, têt û diborit çit[571] Ḥeleb[572]

7.

Kûr kûr binêrin borîyan, kanê Nebî[573] kanê Ṣedîq[574]

Kanê Hireql[575] û Dariyûz,[576] kanê Welîd[577] kanê Leheb[578]

8.

Kanê *Suq*raṭ[579] û Calinos,[580] kanê *Ef*laṭûn[581] û S*î*na[582]

Kanê *Gûh*derz[583] û Rustem û Firʿewn[584] û Nemrûd bû`l-ʿ*e*ceb[585]

9.

Her yek ji wan ʿumrek buwart[586] hin isturî hin di *dest* gul

---

[568] **Nig**: Cem, rex, bal

[569] **Hûrdizan**: Ew kesê ku tiştan hûrehûr dizane, baş dizane

[570] **Musafir**: Mêvan

[571] **Çit**: Diçit, diçe

[572] **Ḥeleb**: Yek ji mezintirîn bajarekî Kurdistana Sûriyê ye. Bajarekî dîrokî ye. Piraniya wî bajarî Kurd in. Li vir mebest jê; axiret e.

[573] **Nebî**: Pêxemberê dawî Hz. Muhemmed (asw.)

[574] **Şedîq**: Hz. Ebû Bekrî Siddîq (ra.) xelifeyê yekem e.

[575] **Hireql**: Hireklius. Împaratorê Romayê bû. Hz. Muhemmed (asw.) ji bo ku bila were ser dînê Îslamê, ji wî re jî nameyek şandiye.

[576] **Dariyûz**: Dara anjî Darîus. 9. şahê Îranê. Di şera ku bi Sikenderê Mezin re kiriye de miriye (b.z. 300). Di Şahnameyê de jî gelek caran behsa wî dike. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Pala, *b.n.,* r. 106.)

[577] **Welîd**: Xalid bîn Welîd an jî Welîd bîn Mûxîre ye.

[578] **Leheb**: Ebû Leheb, 'Ebdûl 'uzza bîn 'Ebdûlmûttalîb. Apê Hz. Pêxember (asw) e. Di heyata xwe de her tim li dijî pêxember helwest girtiye. Di Quranê sûreyê Tebbetê de, di derheqê wî de wiha dibêje: "Herdu destên Ebû Leheb hişk û şeht bibin û şeht jî bûn. Serwet û qezenca ku kirî tu feyde nedayê (û ew xelas nekir). Ew dê bikeve agirekî bipêt. Digel jina wî jî ku ew piştîhilgira dar û stiriyan bû. Di stûyê wê de werîsekî girêdayî heye. (Tebbet: 111/1-5)

[579] **Suqraṭ**: Soqrates. (470 b.z.–399 b.z.) Fîlozofekî ji Yewnenîstana kevn e. Yek ji fîlozofên herî bibandor yên hemû deman tê hesibandin. Navdartirîn şagirdê wî Eflatûn e.

[580] **Calinos**: Calînûs, Galen, Claude Galen, Galenos. (b.z. 199- b.z. 129.) Ji Bergamayê ye. Yek ji wan mezintirîn hekîmên Yewneniyan e. Li Romayê maye û kar û barên xwe li wir domandine. Pirtûkên wî yên li ser hekîmtiyê nivîsîne, dûre wergernadine erebiyê. Lewra di alema Îslamê de bandoreke mezin kiriye. (Pala, b.n., 82)

Fîlozof û hekîm e. Di Romaya kevn de yek ji navdartirîn hekîman bû. Bi navê *Şêyxûs Seyadîle* meşhûr e ango "bavê hekîman".

[581] **Eflaṭûn**: Platon. (427 b.z – 347 b.z) Şagirdê Sokrates e. Fîlozofekî Yewnenîstana kevn e. Avakerê Akademiya Atînayê ye. Eflatûn, destpêk û yekemîn fîlozofê grîng ê felsefa rojavayê ye. Mamostetiya Arîstotalesî kiriye.

[582] **Sîna**: Îbnî Sîna, Ebû 'Elî el Hisên îbn 'Evdile îbn Sîna, (980 – 1037, Hemedan) Fîlozofekî navdar e. Di beşên matematîk, stêrnasî, bijîşkî, fîzîk, felsefe, mûzîkê de xebatên gelek girîng kirine. Wî hewl daye ku felsefeya Arîstotalesî di çerçoveya misilmantiyê de şîrove bike.

[583] **Gûhderz**: Di dewra Eyyûbiyan de fermandarekî mezin bû. 'Eqrebayê Selahadînê Kurdî bû.

[584] **Firʿewn**: Navê şahê Misrê ye. Hz. Mûsa re gelek zorî derxistine û nehatiye ser dînê Wî jî. Di Quranê de jî çîroka wî heye (bnr. Sûreyê Yûsuf). Herî dawî di Behra Sor de dixendiqe û dimire. (Pala, *b.n.,* r. 157.)

[585] **Nemrûd bû`l-ʿeceb**: Nemrûdê bavê 'ecêban. Şahê dewleta Babîlê. Birca Babilê ava kiriye û ew pergala ew pergala ku Hz. Îbrahîm avêtiye nêv êgîr (mencenîq) çêkirine, lewra ji wî re *bavê 'ecêban* tê gotin. Li dijî Hz. Îbrahîm derketiye û îman nekiriye. Li gor rîwayetê mêşek ketiye nav serê wî, mejîyê wî xwariye. Ji serêşiya xwe miriye. (Pala, *b.n.,* r. 356.)
zemanê xwe. Wî, Hz. Îbrahîm (as.) avêtiye nav êgir.

ʿAm[587] bû ji hemyan ra mirin, emma p*î*roz sernerm*ê* Reb

10.

Mehma eteyte ya **Ḥezîn** bi`ş-şeʿri we`l-meʿna re`z-zîn[588]

Îdrakuna kelle[589] ji bin nîne di seryan da tu leb[590]

**17.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Di bustanê cihanê da divê dil dilberek ya Reb

Di çîmena ḥeyatê da divêt hey rehberek ya Reb

2.

Ji dergûşê ḥeta gorê r*ê*wî ne em diçin hey hey

Ji bo dîtin*a* rahê ḥeq[591] divêt rûfennerek ya Reb

3.

Seraser tarîy û mij e eva reha d*û*ra pir tirs

Nîşan de nûrekê dil ra hewar û ṣed hewar ya Reb

4.

Selamet nabitin mumkin dilan ra bê keremkarek

Meger hilbe li ṭûrê dil[592] ji nasîyê n*û*rek ya Reb

5.

Çîrûskandina nûrê dil da dîsa nabe rêzanek

Ji wî derxîn*î* ḥubba[593] herdu dunyayan meger ya Reb

6.

Di tarîya fesada daw*î*ya kêlê[594] da maye dil

Tu ferqê nax*î*ne nava reha xirab û rast ya Reb

7.

Der û mador*ê*[595] dil tev da dirîy û ʿeqreb[596] û mar in

---

[586] **Buwart**: Borî, derbaskir
[587] ʿ**Am**: Gelemperî, giştî, tevahî
[588] Ya Hezîn, çi weqtê tu şî'r û me'neyên qewî werînî.
[589] **Îdrakuna kelle**: Îdrak/têgihîştina me ko bûye
[590] **Leb**: Heqîqet, kunh
[591] **Rahê ḥeq**: Rêya rast
[592] **Ṭûrê dil**: Çiyayê dil
[593] **Hub**: Hezkirin, evîn, yarenî
[594] **Kêl**: Zeman, weqt, dem

Berê[597] dara j*î*nê jar[598] e çiqulkê wê ye mar ya Reb

8.

Bi nasîyê nekey ronî di vê taritî da heş

Dimînit dil m*î*na koran li vî berwar*î* mat ya Reb

9.

Xudêyo key dilê me masîyê deryaya nasîyê

Bi wî nîşan bidey her durrê[599] wê beḥra muḥîṭ[600] ya Reb

10.

Xudêyo dil bikey zana bi zozanê şuûnatan[601]

Ji sehraya delalê fir bidit bal wî ve hey ya Reb

11.

Mîna quling feżaya weşf*ê* ẕatî da biket firrê

Mîna bulbul bi wîllîn be di baġê ḥusn*ê*[602] da ya Reb

12.

Mîna avan birije her h*ê*la deryay*a* nasîyê

Bi zencîra evînê bikş*î*ne wî bal xu ve ya Reb

13.

Çemengah û gulistan û çiyayê tev gul û reyḥan

Mîna hingiv diqemite[603] bi wan ve mêş*a* dil ya Reb

14.

Evanan û digel mal û melal[604] û zar*o*k û cahan[605]

Giran qeyd in dilê qeyd bû bi wan leq[606] naketin ya Reb

15.

Ṭîrêjek nûr*a* napeyda meger bavêje ser qelbek

Bi wî xuya bibit kar û ziyan, baş û nebaş ya Reb

16.

---

595 **Der û mador**: Derûdor, hawirdor, çarmedor
596 ‘**Eqreb**: Dûpişk
597 **Ber**: Fêkî, mêwe
598 **Jar**: Jehr, jehrî
599 **Dur**: Mirarî, merwarî
600 **Beḥra muḥîṭ**: Behra ku li her derî îhata kirye/wergirtiye, okyanûs
601 **Şuûnat**: Kar, ‘îş, tecelliyatên Xwedê
602 **Ḥusn**: Rindî, bedewî
603 **Diqemite**: Qemitandin, zeliqandin
604 **Melal**: Mal, xanî
605 **Cah**: Meqam, paye
606 **Leq**: Lebat, bizav, liv

Weya dil bit n*ê*rîngeha n*ê*rîna pîrekî ḥeqnas

Ji rahê rast bi berdana w*î* dil wenda nebe ya Reb

17.

Dîtina nûr*ê* bê pîran dilan ra nabitin rehber

Meger dengek ji burca lamekan[607] were dilan ya Reb

18.

Bi nûra Ṭûr*ê* Mûsa nedidît rahek h*ê*la ḥeq da

Eger dengê "ene`llahu`l-ʿezîzû"[608] neb*û*ya ya Reb

19.

Ji Eḥmed[609] ra divêt Cibrîl[610], ji Mûsa ra divêt Xiḍrek[611]

Ji Romî[612] ra divêt Şems[613] û ji Xanî[614] Xalidek[615] ya Reb

20.

Çiqas zana û gerra[616] bî cihanê da ʿezîzê dil

Gehana sirr*ê* hûr ra her divêt Xiḍrek divêt ya Reb

21.

Bi dil nîşan bidey dostek*î* zanayê bi rahê ḥeq

Çûyîna bal meqaman[617] ve bibe dil r*a* delîl ya Reb

22.

Qetaye dil ji kerwanê Xudêçûyan di vê çolê

Gelek germ e r*ê* wenda me, helak nêz e hewar ya Reb

23.

---

[607] **Lamekan**: Bêmekan, bê cih û war

[608] **Ene`llahu`l-ʿezîzû**: Ez Xwedayê 'ezîz im. (Hz. Mûsa li çiyayê Tûrê li ser darekî agirek dibîne, ditirse û paş ve vedigere. Hingê dengek dibihîse ku wiha dibêje: "Ey Mûsa, Ez Xwedayê 'ezîz im." Wê demê Hz. Mûsa diçe secdê.) (bnr. Neml: 27/9)

[609] **Eḥmed**: Hz. Muhemmed (saw.)

[610] **Cibrîl**: Hz. Cebraîl. Yek ji çar firîşteyên mizintirîn e ku peyvira wî ji pêxemberan re wahyê anîne.

[611] **Xidr**: Hezretî Xidir. (bnr. 9/5)

[612] **Romî**: Mewlana Celaleddînê Romî. (bnr. 8/23)

[613] **Şems**: Şemsê Tebrîzî. Şêxê Mewlana Celaleddînê Romî bû. (bnr. 9/6)

[614] **Xanî**: Necmeddînê Xanî. Alim, mutesewif, şêxê Neqşîbendiyye. Ji gundê Xanî yê Helebê ye. Necmeddînê Xanî yek ji xelîfeyên Mewlana Xalîdê Şehrezorî el-Kurdî bû. Kitêba wî ya Hedaîqû'l Werdiyye namdar e. (H.)

[615] **Xalid**: Mewlana Xalidê Şehrezorî El-Kurdî. Alim, mutesewif. Di sala 1779'an de gundekî Sileymaniyê hatiye dinê. Hê biçûktiya xwe de ilmen medresê xilas kir û bi wefata Şêx Evdilkerîm Berzencî re di medreseya wî de 7 sal muderrîstî kir. Dûre ji bo diçe Hîndîstanê û întîsabê Şêx Evdille Dehlewî dike. Îcazeya xwe di terîqetên Neqşîbendiyye, Qadirî, Kubrewiyye, Suhrewerdiyyê de jî hildide. Dûre cardin tê Silêymaniyê û îrşadê dike. Bi sedan xelîfê wî çêdibe. Terîqa Neqşîbendiyê herî zêde di dewra wî de li Kurdistanê bela dibe û digihîje li her derî. Piştî Bexdayê diçe li Şamê cih dibe û li wir di sala 1827'an de wefat dike. Dîwaneke wî heye ku bi zimanê kurdî, erebî û farisî hatine nivîsandin. (bnr. Hamid Algar, "Halid El-Bagdadi", *DİA*, c. 15, 1997, r. 383-285.)

[616] **Gerra**: Gerok

[617] **Meqam**: Cih, war

Ji germîya evînê dil qijîn pey ket şewat pê ket

Ji dûrîya ji hîvrûyê n*î*ne wî ra hedan[618] ya Reb

24.

Şev û rojan bi gîrîn e, j*î*na wî tev ġem û şîn e

Ji çavan hey dibarîne, dilopê hêstiran ya Reb

25.

Ji dil îro birîndar im, bi luṭfa te umîdwar im

Ji bil te kes n*î*ne yarim,[619] di vê yaban*ê* da ya Reb

26.

Di vê wêraneya gir da ġudûdek[620] serx*o*ş û dîn em

Ji bil te kes tu nabîne çi ḥalê da me ez ya Reb

27.

Dîtî û kar*a*[621] tu`y min ra, h*ê*vî û dara[622] tu`y min ra

Selam û çare tu`y min ra, di vî kavil x*o*pan ya Reb

28.

Leqed ḍaqet biye`d-dûnya felem yebqe siwa cûdik[623]

Femi`l-feḍlên ʿela ʿebdik bi iḥsanî bihî ya Reb[624]

29.

Leqed eṣbeḥtu fî ṣeḥraîʾ teyhîn taîʾhen ḍalen[625]

Feente ẕû`l-hibatî we`l-ʿetaya cûd bina ya Reb[626]

30.

**Ḥezîn**ûn fî feya fî`l yeʾsi meʾyûsûn mine`l-xelqî[627]

Femînke ḍariʿun dewmen îʾleyke lacîûn ya Reb[628]

31.

Febeṣ-ṣûṣ-şekwa ʿinde babike şeynûn ʿelel ʿebdî[629]

Muḥîṭûn ʿilmuke bîna keṣîrûn feḍluke ya Reb[630]

---

[618] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[619] **Yarim**: Yara min, yarêm
[620] **Ġudûd**: Dojeh, cehenem
[621] **Kara**: Qewî, yê ku dikare (wî tiştî) bike
[622] **Dara**: Dadger, hakim
[623] Dunya bi min teng bûye, ji xêncî comerdiya te ji min re tiştek nema ye.
[624] Ya Rebbî! Tu bi îhsan meyl bide ser ‘ebdê xwe.
[625] Ez di wê çola xwalî de geriyame, wenda bûme, heyirî mame.
[626] Tu yî xwediyê dayînê, sexî/comerdî bide min
[627] Hezîn, ji xelqê bêhêvî ye.
[628] Ez daîm zar û fîzarê bal te ve dikim, îltîca bal te ye.
[629] Li ber deriyê te şîkayet kirin tiştekî nerind e.

32.

Felew la îmtisalû`l-emri makane lena suʾlûn[631]

Fema yûcdîs suûlû mîn kerîmîn ʿalimîn ya Reb[632]

**18.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Hewar yaranê yaran şêlûy û tarî ye jîn û bext[633]

Bi dirrîyê qetanê[634] kesekî wek me nedî zeḥmet

2.

Serê istûrîyê[635] derdan wekî xencerê têk aġû[636]

Dilê jar kirne wek bêjing êdî raḥet hêvî naket

3.

Wekî çûka kevokê ketye nêv tennûra hilbûyî

Nîne per fir bide ya deng biqîre ya hewarê ket

4.

Hewar û ṣed hewar ṣerraf û zanayê şewata dil

Li vê çûka reben carek bona Xudê bikin reḥmet

5.

Hêvî hatîye birrîn û mirin hatîye ber çavan

Ji ġeyrê şefqeta pîran ji her tiştî me şûştî dest[637]

6.

Zemanek pur dirêj e em di vê çolê da wenda ne

Meded rêzan li vî wendayê bêçare bikin şefqet

7.

Ji dêman[638] perdeyan rakin bi gîhanê dûran[639] şad kin

---

630 ʻIlmê te, em îhata kiriye, fezla te zehf e.

631 Heke ji bo cih anîna emrê te nebana, ji me re xwestin çênedibû.

632 Kesê ku comerd û zana ye, çi feyde heye ku mirov jê dixwaze.

633 **Bext**: Si'ûd

634 **Dirrîyê qetanê**: Stirîna cûdabûnê

635 **Istûrî**: Stirîn, sinc

636 **Aġû**: Jehr, jehrî

637 **Me şûştî dest**: Dest jê şûştin, hêvî birrîn.

638 **Dêm**: Rû, sûret, sîma

639 **Dûr**: Kesên ku ji yarê dûr in

Ma ev êşa qetana we ḥeta kengê dewamê ket

8.

Bi hêvîya gehana we sipî bû por*ê* me yekser

ʿUmur borî cuwanî her wekî masî ji dest derket

9.

Di reha hûn diçûn tê da, serî danî û hey em çûn

Me hey lezkir dirêj bû rê, çiqas çûn zêde bû ḥeyret

10.

Hey û hey dost di bin kunbed*a* nûrê da veşartî bin

Eger teʾsîr nebit wan ra nezanim ḥikmeta xilqet[640]

11.

Wekî ʿenqa[641] û kabûsan m*a* hûn ismê bi lacism[642] in?

Di ġeyrê ʿalema zihnê hebûna we xuya naket

12.

Wekî me pur reben bû we bi nalîn û bi kalîn in

Dilopê çav*ê* wan xûn tên hedan carek bi wan naket

13.

Wekî berxa li ber ṭava temûzê[643] dil b*a*rîn pê ket

Ji tihan çû helakê way li ber çavan şewat pê ket

14.

Barîna[644] berx*a* tî û birç*î* tîne xar baġir[645] û gazan[646]

Ma boy çi ker b*û*ye mihî xu da mûkî xira naket

15.

Herê,[647] qelb û giran derd û tenê afet te ra hatî

Pîrê dilbêş*ê*[648] wek dîyan[649] j*î* nakitin li te reḥmet

16.

---

640 **Xilqet**: Fitrat, xû, aferandinerayî, afirandinêr

641 ʿ**Enqa**: Teyrekê efsanewî ye ku navê wê heye lê bi xwe tune ye. Dibêjin pişt çiyayê Qafê dijî, teyrekî zehf mezin e, tûkên wê reng rengî ne, mê ye, rûyê wê dişibe mirovan û her tim li esmanan difire.

642 **Lacism**: Ew tiştê ku cism nîne, necism, ne şênber. Mebest lê, navên wan heye lê cism û hebûna wan nîne.

643 **Temûz**: Meha tîrmehê, heyva heftê.

644 **Barîn**: Dengê ku ji berxê der tê. Wek mînak; ker dizîre, hesp dihîre û hwd.

645 **Baġir**: Kevirên li hev sûwar bûne û bi rêz dirêj bûne, zinar, lat

646 **Gaz**: Çiyayê biçûk û bêdar

647 **Herê**: Erê, belê

648 **Dilbêş**: Xwedan şefqet, dilovan

649 **Diyan**: Dayîk, dê, da

Dikin hêvî ji we yaran, li van jaran bikin nêrîn

Di atûna qetanê[650] da dilê wanan qijîn pê ket

17.

Bi ava gîştina xu, xar vekin[651] agir*ê* hicranê[652]

Fiġanê bengîyan yekser wucûda wan şewat pê xist

18.

**Ḥezîn** im dil birîn im, çav tijî xûn im, hewarxaz im

Meded erwaḥ*ê*[653] Şîrînan li Ferhadan bikin şefqet

**19.**

faʿ ilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Nuşḥ*ê*[654] bê guhdan*a* şagirdê[655] çi ket

Deng*ê* şîrîn bi ker û kerran çi ket

2.

Ronîya şîret*ê* pîr[656] ronî diket

Dil û can, lê roj bi koran dê çi ket

3.

Gîh*a*na yaran bi rehber tête dest

Lêbelê destkeş bi serkeş dê çi ket

4.

Her divêt nefsa nezan ra rehberek

Ders û teʿlîm[657] ger nebin suxte[658] çi ket

5.

Her p*î*r e nefsê digînit wargehan

Mûriya jar bi nigê xu`y leng[659] çi ket

---

650 **Atûna qetanê**: Şewata cudabûnê, agirê dûrketinê, jana hicranê
651 **Xar vekin**: (Agirê) vemirandin, temirandin, tefandin
652 **Hicran**: Cudabûn, firqet, êş û derdê cudabûnê
653 **Erwaḥ**: Pirjimariya "ruh"ê ye. Ruh, giyan
654 **Nuşḥ**: Şîret, pend
655 **Şagird**: Feqî, xwendevan, suxte
656 **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx
657 **Teʿlîm**: Perwerdehî, hîndekarî
658 **Suxte**: Feqî, xwendevan, şagird
659 **Leng**: Kulek, şaht

6.

Xandin û zanîn divêt her kes*î* ra

Rehrewê[660] bê mûm şeva tarî çi ket

7.

Ya nebit çeng[661] fir didit ṭeyrek ji cih

Ya nebit can ma tenê cendek çi ket

8.

ʿAlema ʿeqlan bi ʿilmê ron*î* ye

Di dunê da roj nebit jîn dê çi ket

9.

ʿEql*ê* bê zanîn ji bin bê feyde ye

Ger nebit quwwet ş*û*rê birreh çi ket

10.

Dil bi ẕikr û fikr*ê* paqiş dibe her

Fereha[662] jengar*î*[663] bê qelay çi ket

11.

Dil ji bona fikr û ẕikr û nûr*ê* ye

Ger nebin vanan bi dil ṭalib çi ket

12.

Hûş*î*[664] yar key lez dilê ġafil ji xew

ʿUmr*ê* têk ġeflet e, bê ẕikr e çi ket

13.

Ya cuwanî çû ji dest pîrî çi ye

Bi p*a*yîza ṣar, gul û bulbul çi ket

14.

Qelb*ê* bê ʿişq(i) x*a*nek wêrane ye

Xan*a* wêrane gelo rehrew çi ket

15.

Ew cih e bo pîrika xûyê nebaş

Nûr û ʿirfan û xebat tê da çi ket

---

660 **Rehrew**: Rêwî

661 **Çeng**: Bask, per

662 **Fereh**: Fere, firaq, aman

663 **Jengarî**: Jeng/zeng girtî, tiştê ku jeng girtiye

664 **Hûşî key**: Hişyarkirin, şiyarkirin, ji xew rakirin

16.

Qelb*ê* bê ʿişq leq[665] bi insan nax*î*nit

Ger nebit benzîn tirûnpêl[666] dê çi ket

17.

Darekî ʿişk e dilê bê ʿişq*a* ḥeq

Baġçevan ma dar*a* bê meywe çi ket

18.

Dil*o*pek ava evînê her divêt

Ji tîyê teyhê[667] r*a* beḥra şor çi ket

19.

Dîtina rindî y*a* meʿşûqê divêt

Bê cemalê ʿişq*ê* dil da dê çi ket

20.

Dîtinê ra lazim e ṣed wasiṭe

Bê kelek[668] rehrew di beḥrê da çi ket

21.

Rehberek mahir[669] divêt cahil mebe

Ma di vê rê da nezanê jar çi ket

22.

Meft*û*nê[670] şêm*û*ka[671] te ye dil*ê* jar

Bi gulan û av û gulzaran çi ket

23.

Ger divêtî rehberek hêja biger

Ma n*ê*çîrvan di serayan da çi ket

24.

Çav*ê* dil ra toz*a* ṣolê pîr divêt

Tutîya[672] û merhema Sîna[673] çi ket

---

665 **Leq**: Lebat, bizav, liv
666 **Tirûnpêl**: Tirimbêl, ‘erebe
667 **Teyh**: Çol, çolistan, sehra
668 **Kelek**: Geştiyê biçûk ji bo çem û bendan, bot
669 **Mahir**: Pispor, şareza, bîtkel
670 **Meftûn**: Bengî, evîndar, dilketî, dilbestî
671 **Şêmûk**: Asîtan, derîzan, derçik, derezûng
672 **Tutî**: Dermanê çavan, kil
673 **Sîna**: Îbnî Sîna. Feylesofê mezin, hekîm. Di sala 980’an de li gundekî nêzî Buxarayê hatiye dinê. Hêj di biçûktiya xwe de Quran jiber kir; perwerdehiyeke baş li ser zimên, edebiyat, eqaîd û fiqihê dît. Dûre ji alimên mezin ilmên mentiq, fîzîk, metafîzîk, felsefe û stêrknasî fîrbû. Piştî wan dersan dest bi ilmê tibbê kir û di vê qadî

**20.**

mustefʿilun / feʿûlun / mustefʿilun / feʿûlun

Munserih – – + –/+ – –/– – + –/+ – –

1.

Ger dilberam xuya bit canêm bi wê r*a* rabit

Pir rind û nazenîn e Xuda *her* dem p*ê* ra bit

2.

Wek hîv*a* çardeşevîn derhat ji perd*ê* dêmdur[674]

Ellah! çi ḥusn e da te, te ra meṯîl[675] tu nabit

3.

Bejna w*ê* wek ṣenewber[676] cismê w*ê* weku ʿenber

Şîrînkelam û rûken gelo li min xuya bit

4.

Ger zulf*ê* xu`y muʿenber carek*î* vewbişîne

ʿAlem dibit mubeddel[677] dest da qiyam*ê* rabit[678]

5.

Ger şev*a* tarîy û ʿewr li ʿalemê xuya ket

Dê hîv û roj(i) hilbin ʿalem tijî żiya[679] bit

6.

Ger bal çiyay Ḥimalay[680] bi çav*ê* hêrs binêre

Dê pê kevit hejînek dest da d*ê* tarûmar bit

7.

Îksîr*a*[681] nasitîyê her meʿdenê kem[682] û xelṭ[683]

---

de çi kitêb hebû, hemû jî xilas kirin. Îbnî Sîna di ilmê hekîmtiyê de digihîje asteke bilind û di gelek qesrên şahên wê serdemê de dibe hekîmê qesrê. Herwiha di felsefeyê de gelek pirtûkên girîng dinivîsîne, felsefa Arîsto û Farabî cardin rave dike û di felsefeya îslamê de jî metodolojiyeke nû ava dike. Ji ber rewşên siyasî gelek ciyan digere û dimîne. Di sala 1037'an de li Hemedanê wefat dike. (bnr. Ömer Mahir Alper, "Îbn Sîna", *DİA*, c. 20, 1999, r. 319-322.)

674 **Dêmdur**: Rûdurr, rûyê mîna durrê geş û rewnaq.

675 **Meṯîl**: Wekî, mînanî

676 **Ṣenewber**: Dara çamê, dareke tim û tim şîn û bilind e. Mînanî dara serwî û dara 'er'erê, ji bo nîşankirina bejn û bala dildarê tê bikaranîn.

677 **Mubeddel**: Hatiye guherandin, hatiye tebdîlkirin.

678 **Qiyamê rabit**: Rabe ser piyan

679 **Żiya**: Rewnaq, şewl

680 **Ḥimalay**: Çiyayê Hîmalaya. Di dinyayê de mezintirîn û bilindtirîn çiya ye ku li Çînê ye.

681 **Îksîr**: Sîmya, 'ilmê kîmyayê

682 **Kem**: Kêm

683 **Xelṭ**: Tevlihev, têkel, aloz

Teqlîb[684] diket ji ʿunṣur wê dest d*a* sîm û zer [685] bit

8.

Ger neynika ṣifatan bigre muqabilê ẕat

Dê bê*jit* her ez im yek êdî hemî xeyal bit

9.

Ger ew bi dil n*î*şan de gulek ji baġ*ê* ḥusnê[686]

Dê dil bibit perîşan ḥetta Decal*ê*[687] rabit

10.

Ger ew li ser merovek carek neẓer nedêre

Çare tu nîne wî ra ger Rus*tem* kur*ê* Ẕal[688] bit

11.

Ger ew bi çav*ê* reḥmê li jarekî binêre

Dê dil xweş û qewî bit çendan bi can weza[689] bit

12.

Çilkek ji ʿewr*ê* cûdê[690] di ʿalemê xuya ket

ʿAlem hemî seraser di cûd û luṭf*ê* wer bit

13.

Unẓur ile`l-**Ḥezînî** ya qaḍiye`l-hewaîc[691]

Ew pur birîn ġedar e derman ji bil te nabit

14.

Ersil ʿeley-ye qeṭran mîn qeṭri ṣewbi ʿefwik[692]

Key yeḥye bihi rûḥî di qelbê min cela bit[693]

**21.**

mustefʿilun / feʿûlun / mustefʿilun / feʿûlun

Munserih – – + –/+ – –/– – + –/+ – –

1.

---

684 **Teqlîb**: Guherîn

685 **Sîm û zer**: Zîv û zêr

686 **Ḥusn**: Rîndî, bedewî

687 **Decal**: Yek ji alametên qiyametê ye ku nêzî rabûna qiyametê dê were dinê. Deccal yekî cihû ye ku çavekî wî kor e. Dê doza xwedatiyê bike û ji aliyê Mehdî ve bê kuştin. (Pala, *b.n.,* r. 109)

688 **Rustem kurê Ẕal**: Rustemê Zalê Kurd. (bnr. 9/20)

689 **Weza**: Jar, qels, ze'îf

690 **Cûd**: Camêrî, comerdî

691 Ey ew kesê ku hewcehiyan pêk tîne, li Hezînî binêre

692 Tu dilopek ji dilopên 'efwa xwe bişîne li ser min.

693 Bi wê dilopê ruhê min sax û qelbê min jî sîqal/cîla bike.

Guh dêre vî kelamî tê nîne yek xilafek[694]

Her qelb û ruḥ û ʿeqlek pê ṣaġ û hem cela bit[695]

2.

Gelî biray musulman ʿemel bikin bi ixlaṣ

Da ser ziman ji qelban kanîy*a* ʿilm*ê* der bit[696]

3.

Xazî bi ṣadekaran ku ew çira[697] huday[698] ne

Fitney mezin*ê* tarî yekser ji wan bela bit[699]

4.

Ger tu divê d*î*tina dilber û perwerê[700] xu

Bikey ʿibadetik wer ku tê d*a* şirk*ê* nabit[701]

5.

Ger xu bi dil sipêrî[702] ser wî Xuday*ê* bêçûn[703]

Dê ew li te binêre her ew ji te r*a* bes bit

6.

ʿIbadetê bikey her ji bêşigê ḥeta gor

Rastan r*a* her heval be da dêw ji te cuda bit[704]

7.

Yarê bi zar*ê*[705] xu`y xweş gote civat*a* yaran

Perhîz[706] û qenc*î*kar bin da yar we ra heval bit[707]

---

[694] **Xilaf**: Dijber, dij, tewş

[695] **Cela bit**: Bibiriqe, bi sîqal be

[696] Îşareta vê hedîsê dike: **( مَنْ أَخْلَصَ لِلَّهِ أَرْبَعِينَ يَوْمًا ظَهَرَتْ يَنَابِيعُ الْحِكْمَةِ مِنْ قَلْبِهِ عَلَى لِسَانِهِ)**

Kê çil roj ji bo Xwedê (di ibadetên xwe de) bi îxlas bibe, ji qelbê wî/ê bigirin heta zimanê wî/ê kaniyên ilm û hikmetê dizên. ( Feyzu‘l-Qadir, 6, 43)

[697] **Çira**: Fanos, lambe

[698] **Huday**: Hîdayet, di rêya îmanê de çûyîn

[699] Îşareta bal hedîsa: **(طُوبَى لِلْمُخْلِصِينَ ، أُولَئِكَ مَصَابِيحُ الْهُدَى تَنْجَلِي عَنْهُمْ كُلُّ فِتْنَةٍ ظَلْمَاءُ)**

Çi bextewariyeke xweş ji mirovên biîxlas re heye ku ew çavkaniyên hîdayetê ne, her tarîtî bi wan ve dibe ronahî. (Me çavkaniya vê hedîsê nedît.)

[700] **Perwer**: Hezker, parêzker

[701] Îşareta vê ayetê dike: **قُلْ إِنَّمَا أَنَا بَشَرٌ مِّثْلُكُمْ يُوحَى إِلَيَّ أَنَّمَا إِلَهُكُمْ إِلَهٌ وَاحِدٌ فَمَن كَانَ يَرْجُو لِقَاء رَبِّهِ فَلْيَعْمَلْ عَمَلًا صَالِحًا وَلَا يُشْرِكْ بِعِبَادَةِ رَبِّهِ أَحَدًا**

Bibêje: Bêguman ez bes wekî we mirovek im. (Lê ev heye) peyam ji bo min hatiye hinartin (ku ez ji we re bibêjim:) Xwedayê we her Xwedayekî bi tenê ye. Edî kesê ku xelata Xwedayê xwe hêvî bike û ji ezabê wî bitirse, bila karekî qenc bike û di îbadeta xwe de qet tiştekî ji Xwedayê xwe re neke hevpişk! (Kehf: 18/110)

[702] **Siperî**: Bispêrî, spartin

[703] Îşareta vê ayetê dike: **(وَمَن يَتَوَكَّلْ عَلَى اللَّهِ فَهُوَ حَسْبُهُ)** Kî xwe bispêre Xwedayê bilind vêca ew besî wî ye. (Telaq: 65/3)

[704] Îşareta vê ayetê dike: **(يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُواْ اتَّقُواْ اللّهَ وَكُونُواْ مَعَ الصَّادِقِينَ)**

Hey gelî yên ku bawerî anîne! Xwe ji (ezabê) Xwedê Teala biparêzin û bibin digel rast û duristan. (Tewbe: 9/119)

[705] **Zar**: Ziman

8.

Ya Reb **Ḥezînê** dilkul bê hêvîy û mil[708] û zad[709]

Ser danîye reha dûr, nêz e *can* jê cuda bit

9.

Ji ʿewr*ê* luṭf û reḥmê çilkek neyête ser dil

Dawî didit j*î*na xu gazî li wî tu nabit

10.

Ger ʿalema dilê wî ronî nekey bi nûrê

Ḥalê wî pur fena ye xelaṣî jê re nabit

11.

Çavnêr û dil perîşan bêḥal û dûr*î* yaran

Pursîn nekey li wî tu, pursîn li wî tu nabit

12.

Ser şêm*û*ka[710] serayê rû danîye bi zarî[711]

Dirije hêstirê xûn, dil nêz e jê qeta bit

13.

Nîne j*ê* ra tebatek wek masîyê li req ma

Ber can didit belengaz nizane ḥal ç*a*wa bit

14.

Ji herdu derîyan lê vekey derîyek cana[712]

Ya jîna tev ṣelaḥê[713] ya mirin û *î*man bit

15.

Der da **Ḥezîn** e bêḥal yara li te dinêrit[714]

Ser da birêj ji luṭfê gula dilê wî geş bit

**22.**

faʿ ilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

---

[706] **Perhîz**: Teqwa, ji gunehan xwe parastin

[707] Îşareta vê ayetê dike: (إِنَّ اللّٰهَ مَعَ الَّذِينَ اتَّقَواْ وَّالَّذِينَ هُم مُّحْسِنُونَ)
Bêguman Xwedê digel ên teqwadar, ên qencîkar û qencîxwazan e. (Nehl: 68/128)

[708] **Mil**: Piştik, tiştê ku mirov siyarî wê dibe û diçe cihekî.

[709] **Zad**: Xwarin

[710] **Şêmûk**: Asîtan, derîzan, derçik, derezûng

[711] **Bi zarî**: Bi zarezar, bi lava û bi hêvî

[712] **Cana**: Ey can, ey dilber. Li vir banglêkirin/nîda heye

[713] **Ṣelaḥ**: Qencî, çêyî, rindî

[714] Ey yar! Li der ve Hezîn bêhal e û li te dinêre.

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Di dunê[715] da mirin û pîr*î* heye xortî çi ket

Di dunê da derd û jan û ġem hene şahî çi ket

2.

Di dunê da firqeta[716] ʿaşiq û meʾşûqê heye

Gîştina[717] rojek du rojan dê çi bit yan dê çi ket

3.

Di dunê da ma gelo kesek heye bê derd û kul

Kêf eger ṣade nebit ġem*gîn* bi kêfê dê çi ket

4.

Di dunê da ʿumr*ê* insan pur *kur*r[718] e, lez çit ji dest

Dil girêdana bi dunya û hevalan dê çi ket

5.

Pişt*î* zengîn û neçar wek hev dibitin ew di gor

Zîv û zêr û baġ û bostan, koşk û dîwan dê çi ket

6.

Dîw*a*rê koşka dunê hatîye danîn ser fena[719]

Jîn nebit baqî du rojê ʿumr*ê* têk ġem dê çi ket

7.

Ez **Ḥezîn** im, dil tije ʿirfan û ʿilm û ḥikmet im

Yê ku xanî[720] dîtîye dê`b hol û harzilan[721] çi ket

**23.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Ger rehberek zana nebit rêzan te ra hêla Xudê

Cehd[722] û xebata ku dikey ma dê di vê rê da çi ket

---

715 **Dunê**: Dinê, Dinya
716 **Firqet**: Cudabûn, veqetîn, dûrketin
717 **Gîştin**: Gihîştin, gihandin
718 **Kurr**: Kurt, kin
719 **Fena**: Fanî, demî, demborî, xirab
720 **Xanî**: Mal, derban
721 **Hol û harzil**: Herdu jî xaniyên ku ji bo rûniştina havînê tê çêkirin e. **Hol** bi keviran tê çêkirin bê herî û xerc; **harzil** jî bi daran tê çêkirin, bi şev li ser banê wî tê razan, bi roj jî bin siya wî tê rûniştin.

2.

Eger nebit dilbêşekî kor ra di rê da dest(i)kêş

Ma ew di vê reha çetîn bi vew*şan*dina[723] ço çi ket

3.

Ger ʿişqekî dişwar nebit rehrew[724] bi firrê nexînit

Ma`d vê reha dûra dirêj lengî[725] bi gavdanê çi ket

4.

Yan pîrekî bîtkel[726] nebit şagird*ê* ra nebit beled[727]

Nezan*ê* rah û menzilan tenha di teyhê[728] da çi ket

5.

Gelo firoker[729] bê ş*o*fêr çawa bi jor ve fir didit

Ya geştîyê qebtan nebit ma ew li deryayê çi ket

6.

Kolêt*î* ye sirra *î*cada ʿalema insan û cin

Yek yek ji wan kole nebit, ma ew li vê xanê çi ket

7.

Boy rindîy û bilindîyê ʿalem seraser neynik e

Yarê ġered[730] ev nebitin ma dê bi îcadê çi ket

8.

Her yek ji rêzê ʿalemê nîşan*a* remzekê[731] d*î* ye

Dilber*ê* ev meqṣed nebit ma ew bi van çînan[732] çi ket

9.

Çûm nêv civata bulbulan purs kir ji weṣla[733] ṣorgulan

Gotin, evîn ji dil nebit dilber bi dîdarê[734] çi ket

10.

Her baġ*ê* gul pur tê hene her reng*ê* çûkan tê hene

---

[722] **Cehd**: Xebat, şixulîn
[723] **Vewşandin**: Hejandin, raweşandin
[724] **Rehrew**: Rêwî
[725] **Lengî**: Kulek, şaht, ew kesê ku dikule
[726] **Bîtkel**: Mahir, pispor, şareza
[727] **Beled**: Rêzan
[728] **Teyh**: Çol, çolistan
[729] **Firoker**: Balefir, firinde
[730] **Ġered**: Mebest, armanc
[731] **Remz**: Nîşan, şan, hêma, îşaret
[732] **Çîn**: Neqş
[733] **Weṣl**: Gihîştin, gihandin
[734] **Dîdar**: Rû, sîma, dirûv; nêrîn, awir

Her dem li gul nêrîn dikin ma gul ji bil bulbul çi ket

11.

Kî ku evîn ji dil bitin ew dê bibit mecla cemal[735]

Kî ku d*î*tî ji dil delal dê`b şahîy û kêfan çi ket

12.

Nûra zelala żûlcemal[736] henber*ê* çavê dil bitin

Di tarîya fesadîyê bi luks û fanûṣan çi ket

13.

Ji rojhelat roj bête der, ʿalem r*o*nî bit serteser[737]

Hîv û sitêr dê can bidin mûma belengaz dê çi ket

14.

ʿAşiq bi dil qulzem[738] bitin, tijeh dur û cewher bitin

Muḣîṭê Hindê[739] xu ew e, dê`b weʿẓ û irşadê çi ket

15.

Dara ku nêzî ro[740] bitin avê dinoşit hey mudam[741]

Giha û darê nûbehar dê`b av û avdanê çi ket

16.

Bîzar*î* ket[742] dilber ji te qayîlbûna ġeyran[743] çi ket

Qayîl bibit ẕatê eḥed[744] **Ḥusnî** bi dildaran çi ket

17.

Xebat*ê* key roj û şevan vekey dilan bigre devan

ʿEmel eger ṣade nebit bi av*a* şêlû şah çi ket

**24.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

---

735 **Mecla cemal**: Cihê bedewiyê, cihê ku rindahiyê Xwedê tê dixuye, neynika rindahî û bedewiya Xwedê
736 **Żûlcemal**: Xwedî rindî û bedewiyê
737 **Serteser**: Serdanser, serdanpê, ji serî heta binî
738 **Qulzem**: Behra Qulzemê, Behra Sor. Li vir bi wateya "behra mezin, okyanûs" e.
739 **Muḣîṭê Hindê**: Okyanûsa Hindê
740 **Ro**: Çem, rûbar
741 **Mudam**: Tim û tim, her dem, her tim
742 **Bîzarî ket**: 'Aciz bû, tengezar bû
743 **Ġeyr**: Xelq, ji xeyrî dilberê herkes
744 **Ẕatê eḥed**: Xwediyê yekîtiyê, ango Xwedê

Heywax[745] li min heywax li min, heywax li min dîn

Şikest*î* peymana elest,[746] heywax li min dîn çû ji dest

2.

Şerîʿeta Muḥemmedî maye li erḍê bêxudî

Rabû ji bin şerm û fedî, heywax li min dîn çû ji dest

3.

Îman ç*û*ye maye guman, ʿilm û ṭerîq[747] li erḍ*ê* man

Kesek n*î*ne purs ket li wan, heywax li min dîn çû ji dest

4.

Îman ji dil dûr ketîye, nûr jî ji ro derketîye

Qanûna ḥeq jibîr b*û*ye, heywax li min dîn çû ji dest

5.

ʿEdalet û qencî nema, ẓulm û nebaşî bûn xuya

Adab û exlaq çûn hema, heywax li min dîn çû ji dest

6.

Pîqrût û serqotê jinan, serbest digerrin li deran

Ji wan r*a* kes nabêj çiman, heywax li min dîn çû ji dest

7.

Park û pilaj û medrese, camî û çarşû`w kil*î*se

Tijî j*ê* dêlê taz*î* ye, heywax li min dîn çû ji dest

8.

Zengîn b*û*ye bê merḥemet, zana b*û*ye cahilṣifet

Naçar b*û*ye gurînş*î*met[748], heywax li min dîn çû ji dest

9.

Ey mer*o*vê serwer*ê* xelq, wenda nebe ji rah*ê* ḥeq

Wek bal*î*na[749] dibî li req, heywax li min dîn çû ji dest

10.

Ey mer*o*vê serxoş û dîn, dîsa veger dînê mubîn[750]

---

[745] **Heywax**: Dengê bangewaziyê, dengê gazindkirinê, hawar

[746] **Elest**: Bezma elest, roja elest, peymana elest. Xwedê Te'ala, gava ku 'alema ruhan afirand ji wan re wiha got: "Elestû bî Rebbîkûm?" (Ma Ez rebbê we nîn im?) Hingê ruh jî wiha bersîv dan: "Qalû, bela." (Belê, Tu rebbê me yî.) Ew bûyer di Qurana Pîroz de derbaz dibe. Ew cihê ku ruh hemî berayî bal hev bûne re "bezma elest, meclîsa elest", wê rojê re "roja elest" û sozdayîna wê rojê re jî "peymana elest" tê gotin. (Pala, *b.n.,* r. 72.)

[747] **Ṭerîq**: Terîqet, rê, rêya menewî ye ku mirovan digihîne Xwedê.

[748] **Gurînşîmet**: Wekî gur, mînanî gur, gurînsifet

[749] **Balîna**: Hût, masiyên herî mezin

Şîrîn dibe ji te ra jîn, heywax li min dîn çû ji dest

11.

Ax muslumanê navgiran, tevgerr*a* wan wek kafiran

Dîn dan bi zêran û peran, heywax li min dîn çû ji dest

12.

Bûne neyar bav û biran, dilʿişk b*û*ne wek keviran

Hev didirin mîna guran, heywax li min dîn çû ji dest

13.

Pîrek diçe çente di dest, bi xeml û xiz ber xort*ê* mest

Mêr nab*ê*je çi ye te qeṣd, heywax li min dîn çû ji dest

14.

Dîn çûye maye jeng û pas, kakûl çûye maye kiras

Nas nabit ser hev xam[751] û xaṣ[752], heywax li min dîn çû ji dest

15.

Mezinîy û piçûk*î* çû, dilbêşîy[753] û teqwa li dû

Zêde dibin fitne *her* ro, heywax li min dîn çû ji dest

16.

Fitne di dîn da ye eman, felaketa axir zeman

Me girtîye dunya bi can, heywax li min dîn çû ji dest

17.

Şêx û melan zor dan çekan, aġa`w m*î*ran zor dan zikan

Girtin bi dunyay hem*î*kan, heywax li min dîn çû ji dest

18.

Amir û meʾmûr bûne yek, ġaye[754] birina dîn e tek

Bûne li dor fisqê[755] xelek, heywax li min dîn çû ji dest

19.

Dîn ders*î* nadin zar*o*kan, xortan dixin nav keçikan

Da hev bidin ber qurçikan,[756] heywax li min dîn çû ji dest

20.

---

[750] **Mubîn**: Eşkere, zelal, eyan
[751] **Xam**: Beredayî, negihîştî, bêedeb
[752] **Xaş**: Qenc, spehî
[753] **Dilbêş**: Xwedan şefqet, dilovan, birehm
[754] **Ġaye**: Armanc, mebest
[755] **Fisq**: Derketina ji rêya rast
[756] **Qûrçik**: Qurçikandin

Ew *ḥalê* vê dewrê me dî, ji pêş ḥeta hêj kes nedî
Xûyê k*o*vî[757] bûnê kedî,[758] heywax li min dîn çû ji dest
21.
Berê kedî bûy, bûy k*o*vî; berê tu şêr bûy, bûy r*o*vî
Bal rah*ê* ḥeq ve nalivî, heywax li min dîn çû ji dest
22.
Berê tu baz bûy, bûy*î* çûk; berê tu mêr bûy, bûy*î* bûk
Berê mezin bûy, bûy biçûk, heywax li min dîn çû ji dest
23.
Carek leqê[759] bixe bi xu, bizivire bal dîn*ê* xu
Biçe di rêça bav*ê* xu, heywax li min dîn çû ji dest
24.
Îslam*î* nîşana te ye, mîrat*a*[760] kalikê te ye
Hemî kemal wê da heye, heywax li min dîn çû ji dest
25.
Neyar ç*û* pêş mayî li dû, dizîn ji te kemal û xû
Helmêz[761] bikey Quran bi zû, heywax li min dîn çû ji dest
26.
Deryay*a* razan[762] e Quran, bustan*ê* bazan e Quran
Fikrê r*a*z û zan e Quran, heywax li min dîn çû ji dest
27.
Heşan r*a* wek hesan[763] e ew, dilan r*a* tev îman e ew
Ḥeyat*a* ruḥ û can e ew, heywax li min dîn çû ji dest
28.
Bes e *xor*tê delal were, bal dîn*ê* xu ve vegere
Li Qur*a*nê qenc bi*nê*re, heywax li min dîn çû ji dest
29.
Nûr û *î*man te ra divêt, zanîn û nasî te divêt
Xandin*a* Quranê divêt, heywax li min dîn çû ji dest

---

757 **Kovî**: Heywanên hov û wehş
758 **Kedî**: Heywanên nehov, newehş
759 **Leq**: Lebat, liv, bizav, tevger
760 **Mîrat**: Mîras, kelepor
761 **Helmêz**: Hemêz, hembêz
762 **Raz**: Sir, xef, nehênî, nepenî
763 **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û keran tûj dikin, kevirê tûjkirinê

30.

Derxistine ji mekteban, ʿilm û fežîlet û Quran

Xande bi dîn bûye nezan, heywax li min dîn çû ji dest

31.

Rastî ç*û*ye maye derew, hîşar*î* çûye maye xew

Derewç*î* nin îro qelew, heywax li min dîn çû ji dest

32.

Derewç*î*nan girtin rewac,[764] ew in xudanê text û tac

Derew dirêj bûn wek qulac,[765] heywax li min dîn çû ji dest

33.

Dema ḥeyat çû hat mirin, em bikevin gor û kefin[766]

Wî çaġ*ê* em hîşar dibin, heywax li min dîn çû ji dest

34.

Pişman dibin çi fayde ye, gîrîn dikin ġema kê ye

Lava dikin çi çare ye, heywax li min dîn çû ji dest

35.

Lazim e dunyay da kirin, ʿibadet û cehd[767] û evîn

Da em nebêjin ax li min, heywax li min dîn çû ji dest

36.

Dînê Muḥemmed Muṣṭefa, hîdayet û nûr û ṣefa

Em bûne wî ra bê wefa, heywax li min dîn çû ji dest

37.

Ya Reb tu ḥeq navê xu key, dînê mubîn wenda nekey

Me nailê[768] luṭfa xu key, heywax li min dîn çû ji dest

38.

Bes e **Ḥezîn** ḥikmet merêj, çav kor e dil girtî qirêj

Vê mebḥesê[769] bes key dirêj, heywax li min dîn çû ji dest

## 25.

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

---

[764] **Rewac**: Mûteber, giramî, birêz, hêja
[765] **Qulac**: Cureyek amûrên pîvandinê ye wekî mîtroyê, qasî ku vekirina herdu destan e.
[766] **Kefin**: Kefen, cawê sprî yê ku ji miriyan dialînin
[767] **Cehd**: Xebat, şixulîn
[768] **Nail**: Yê ku digihe miraza xwe
[769] **Mebḥes**: Mijar, babet, tiştên ku beriya wê hatine behskirin

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Dil bû pureng[770] ji meḥbetê, bê yar*a* hîvrû[771] dê çi ket

Yarê divêt qelbê murîd, cennet û ḥoran dê çi ket

2.

Bihişt*a* bê yara delal, dozex û weyl[772] dizane dil

Bustan*ê* tê gul nebitin, bulbul bi wî ma dê çi ket

3.

Çiya û gaz[773] nebin eger hêlî[774] ji rindîyê r*a* her

Bi kevir û ax û gihayê bê cemal dil dê çi ket

4.

Zozan eger nexemmile, bi sosin û kulîlk*ê* geş

Bi ax û pelaxê[775] zuha, quling û şalûl[776] dê çi ket

5.

Yara *dil* yarek dilber e, her wek*î* qend[777] û şekker e

Melekxû ye rûfenner e, ew bes e dil êdî çi ket

6.

Kêla[778] xuya ket ew delal, dil ra demek bibe heval

Bi cah[779] û mulk mal û melal,[780] dilê delal dîtî çi ket

7.

Serxoş û sekran[781] im mudam, bengî û meftûn[782] im mudam

Dilber n*û*r e dil sîper[783] e, gelo qetanê da çi ket

8.

Zozan *î* sosinê me ra, bustan *î* reyḥanê me ra

Ḥeyat *î* ji canê me ra, dil te divêt bil te çi ket

---

[770] **Pureng**: Pereng, kozir, pola êgir, pêta êgir
[771] **Hîvrû**: Rûyê wekî hîvê geş û rewnaq
[772] **Weyl**: Di dojehê de navê newalekê ye. Ava wê pir kel e û bêhna pîs jê tê.
[773] **Gaz**: Çiyayê bêdar
[774] **Hêlî**: Neynik, ‘eynik
[775] **Pelax**: Gihayê hişk
[776] **Şalûl**: Teyrekî wekî bilbilê dengxweş e.
[777] **Qend**: Şekir
[778] **Kêla**: Dema, gava, çaxê, weqta
[779] **Cah**: Meqam, paye
[780] **Melal**: Mal, xanî
[781] **Sekran**: Serxweş, sermest
[782] **Meftûn**: Bengî, evîndar, dilketî, dilbestî
[783] **Sîper**: Sîperik, pirpirok, minminîk, baperik

9.

Deryayeke tev cewher î, dukkan*a*[784] misk û ʿenber î

Xulda berîn[785] û kewser î, bengî Hezargolê[786] çi ket

10.

Tu gaz*ê*[787] razan î delal, hêlûn*a* bazan î delal

Mellaḥ*ê*[788] qelban î delal, dajo[789] tu bî derya çi ket

11.

Dil keng*ê* wenda bû ji xu, gihîşte baġê yar*a* xu

Bo bulbulê gulzar*a* xu, êdî bi cihanê çi ket

12.

Dema here şev were roj, hilbe ji rojhelat*ê* roj

Dunya bibe nûr û t*î*rêj, sîper bi çirayê çi ket

13.

Derdek hebe derman *î* tu, êşek hebe luqman *î* tu

Ji qel*ban* ra hedan[790] *î* tu, ger tu hebî derd dê çi ket

14.

Sosin hebe zozan *î* tu, kulîlk hebe bustan *î* tu

Delav hebe her av *î* tu, ger av nebit delav çi ket

15.

Mewsim hebin behar *î* tu, wenda hebin hewar *î* tu

Rêzan hebin wek nûr *î* tu, bê nûr*î* rehber dê çi ket

16.

Bes e ʿezîzê[791] dîn *î* tu, Eḥrar[792] û Ġujdevan[793] *î* tu

Gulek*î* ġemrevîn *î* tu, heval b*ê* tu ġem dê çi ket

17.

---

[784] **Dukkan**: Firoşgeh, dikan
[785] **Xulda berîn**: Bihişta ezelî. **Xuld**; yek ji wan heşt tebeqeyên cennetê ye.
[786] **Hezargol**: Bîngol, Çewlîg. Bajarekî li Bakûrê Kurdistanê ye.
[787] **Gaz**: Çiya
[788] **Mellaḥ**: Qebtan, ajokerê geştiyê
[789] **Dajo**: Ajovan, şofêr
[790] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[791] ʿ**Ezîz**: Xwedan ʻîzzet û rûmet. Wateya din jî qesda Şêx ʻÎzzedînê Xezna (qs.) ye.
[792] **Eḥrar**: ʻUbeydullahê Ehrar. (bnr. 13/8)
[793] **Ġujdevan**: Şêx Evdilxaliqê Xujdewanî. Alim, mutesewif, şêxê Neqşîbendiyye. Di sala 1103’an de ji gundê Xujdewana Buxarayê hatiye dinê. Li Buxarayê di gelek ciyan de xwendiye. Di biçûktiya xwe de li ser tefsîrê sekiniye. Li cem Yûsufê Hemedanî maye û terîqa Neqşîbendiyê hîm bûye. Dûre bi metodolojiyeke nû Neqşîbendiyetiyê fireh kir û 11 rêzikên terîqeta Neqşîbendiyyê diyar kir. Di sala 1119’an de li gundê Xujdewanê wefat kir. (http://tr.wikipedia.org/wiki/Abdulhâlık_Gucdevanî) (17.03.2015)

Rukn[794] û Meqam[795] û Keʾbe yî, Quds û Şefaʾ[796] û Merwe[797] yî

Ḥira[798] û Ṭûr û Sidre yî, Keʾbe nebit ṭewaf çi ket

18.

Lewra hezaran dilmunîr,[799] li dora te ṭewfî[800] dikin

Nebit te da sirra Xuda, li dor*a* te insan çi ket

19.

Kesê di bin nûra te ye, xuyay w*î* ra herçî heye

Gotin w*î* ra ne ḥewce ye, dîtî bi durbînê çi ket

20.

Rêzan dixazit rê*yek* dilpak û derpak û muṭîʿ[801]

Rehberê dilqirêj û serʿişk û dûran dê çi ket

21.

Çira bi koran dê çi ket, şîret bi dînan dê çi ket

Roj dê bi xeffaşê[802] çi ket, Mûsa bi Firʿewnan çi ket

22.

Were sitûxar î eger, were tu neçar î eger

Were evîndar î eger, dilber ji bil vanan çi ket

23.

Were belengaz î eger, were xudîxaz î eger

Were bi dilsazî eger, cihanhevînan[803] yar çi ket

24.

Were sulukvan î eger, were xudîşan[804] î eger

Were h*î*na cuwan î eger, pîrê perîşan pîr çi ket

25.

Ger tu elemdar î were, ger dilbirîndar î were

Hîna li piyan î were, luqman bi mirîyan çi ket

26.

---

[794] **Rukn**: Ji her yek aliyê Ke’bê re “rukn” tê gotin.

[795] **Meqam**: Li Ke’bê, cihê Hz. Îbrahîm re tê gotin.

[796] **Şefa**: Li rojhilata Mekkeyê navê girekî ye. Girê Sefayê ji Merweyê mezintir û nêzîktirê Ke’beyê ye.

[797] **Merwe**: Li rojavayê Mekkeyê navê girekî ye.

[798] **Ḥira**: Çiyayê ku wehya ‘ewil ji Hz. Muhammed (asw.) re li wir hatiye. Çiyayê Cebelînnûr jî tê gotin.

[799] **Dilmunîr**: Ew kesê ku dilan ronî dike

[800] **Ṭewfî**: Tewafkirin, li dora wî/ê gerîn

[801] **Muṭîʿ**: Kesê ta‘etker û ‘ibadetker, ew kesê ku ji rêya Xwedê dernakeve.

[802] **Xeffaş**: Şevşevok, baçermok, pêçermok, çilîçilî

[803] **Cihanhevîn**: Dinyahezker, hezkerê cihanê, hezkerê malê dinê û tiştên fanî

[804] **Xwedîşan**: Navdar, meşhûr, binavûdeng

Tu kar*a*[805] û jîr î were, ẕûlfiq*ar*[806] û tîr î were
Kêla nebit nêçîr*ê* re, bê tûle nêçîrvan çi ket
27.
Were *cem* dil hîşarekî, were *cem* ḥeq li balekî
Ava ḥeyatê yê divêt, li deşt*a* Urfayê[807] çi ket
28.
Ger tu divê nûra ṣemed[808] bibîne xu ra quṭbê ferd[809]
Berjor dixazî fir bidî, çeng[810] lazim e dar dê çi ket
29.
Meʾşûk ji ʿaşiq ra ew e, kulîlk ji bulbul ra ew e
Derman ji dilkul ra ew e, zêr û z*î*van bengî çi ket
30.
Çawa dikin naçe ji bîr, meger bi wî dil bû hevîr
Bi ʿişq*a* wî em bûne pîr, yarê ji bil wî dil çi ket
31.
Ger baġ û bustan î were, ṣehra[811] û zozan î were
Ava ḥeyatê hey liha[812] ma tî bi şor avê çi ket
32.
Were *cem* şiblê[813] Eḥmedî[814] were *cem* ʿIzzê Xeznewî[815]
Were *cem* ḥebrê lewẕeʿî[816] ṣeyyad[817] serayê da çi ket
33.
Himmet bilind û dawer[818] e, xulaṣ*a* ʿilim jiber e
Rebban*î* ye rengbeşer[819] e, Ḥeq dît*î*ye xelqê çi ket
34.
Lewra ji xelqê bû cuda, dem dem diçe hêla Xuda

---

805 **Kara**: Qewî, bihêz, yê ku dikare
806 **Ẕûlfiqar**: Navê şûrê Hz ʻElî.
807 **Urfa**: Riha. Bajarekî li bakûrê Kurdistanê ye. Welatekî pir germ e û bêav e. Bi deşta xwe namdar e.
808 **Nûra ṣemed**: Nûra Xwedê
809 **Quṭbê ferd**: Serekê ewliyan, pêşengê weliyan, xews
810 **Çeng**: Bask, per
811 **Ṣehra**: Çol, çolistan
812 **Liha**: Li vir
813 **Şibl**: Têjika şêran
814 **Eḥmedî**: Şêx Ehmedê Xeznewî (qs). (bnr. 9/27)
815 **ʿIzzê Xeznewî**: Şêx ʻIzzedînê Xeznewî (qs). (bnr. 8/16)
816 **Ḥebrê lewẕeʿî**: Alimê mutrîq; alimê ku tiştekî nedîtiye lê wekî ku dîtiye her tiştî îdraq kiriye
817 **Ṣeyyad**: Nêçîrvan
818 **Dawer**: Dadger, dadrês, hakim
819 **Rengbeşer**: Wekî însan, di rengê mirovan de

Hey hey dirêjit ḥikmeta,[820] şîret*ê* wî li dil çi ket

35.

Nûrûn mine`ṣ-ṣeḥraî` ca ʿemme`s-suhûle weẕ-ẕura[821]

Kehfe`l qulûbî qed eḍa şemsûn mine`l Xezna bedet[822]

36.

Kun munşerîḥen ya **Ḥezîn** bî ʿizzê dunyae we dîn[823]

Enwarehû esrarehû enẓarehû qed şemelet[824]

**26.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

ʿUmr*ê* bê dilber heba ye cehd*a*[825] bê ʿişqê ʿebeṣ[826]

Jîn*a* bê rehber bela ye qelb*ê* bê nûr e ʿebeṣ

2.

Mîn*a* hîva çardeşevîn[827] dilberek hebû me ra

Me wekî koran ji dest berda wekî kewkî ʿebeṣ

3.

Her zemanê nay*ê*tin furṣet[828] dilo hûşyar(i)[829] be

Piṣt*î* furṣet çû ji dest ah û puşimanî ʿebeṣ

4.

Wek birûskan vedidin wenda dibin enwar*ê*[830] ḥeq

Wê demê da hûş*î*[831] yarê lazim e ġeflet ʿebeṣ

5.

Ṣed hezaran wek te mane ġa*fil* xewê da li rê

Hûşîyar çûn menzilan ġafil tenê dûr ma ʿebeṣ

---

820 **Hikmeta**: Hikmetan. Ji ber ku erûz li hev were, wisa hatiye nivîsîn.
821 Nûrekê ji çolê hat, hemî çiya û deştan wergirt.
822 Rojek ji Xeznayê diyar bû, şkeftên qelban ronî kir.
823 Tu kêfxweş be ya Hezîn bi wî 'Îzzeta dîn û dunyayê.
824 Nûrê wî, sirrê wî, temaşekirina wî, hertişt di xwe de girtine.
825 **Cehd**: Xebat, şixulîn
826 **'Ebeṣ**: Vale, beyhûde, bêfêde, bêkêr
827 **Hîva çardeşevîn**: Heyveron
828 **Furṣet**: Fersend, keys
829 **Hûşyari**: Hîşar
830 **Enwar**: Nûr, rewnaq, ronahî
831 **Hûşî**: Hişyarkirin, şiyarkirin, ji xew rakirin

6.

Ê ku ʿişq û ḥub[832] di dil da neçûne baġê gulan

Ê nîne dil da evîn ma dûrî dildaran ʿebeṣ

7.

Her kesî girtî xu ra gulkî ji gulzara[833] murad

Ah dilo dûrî muradê tu tenê mayî ʿebeṣ

8.

Bi gihana dilberan şad û umîdwar in heval

Ah dilo mayî tenê arê qetanê[834] da ʿebeṣ

9.

Dil birîndar î bi tîrê firqetê[835] me hey hewar

Nay li me reḥmê gelo yar ʿumrê me çû ber ʿebeṣ?

10.

Bi umîda merhema qelbê birîndar hatime

Bi ʿilaca kûrbirînan me nezivrîne ʿebeṣ

11.

Pur zeman e rê me wenda kirye çolê da hewar

Ji tihan agir bi dil ket hêvîyê me bûn ʿebeṣ

12.

Lê îro em hatine ser kanîya ava ḥeyat

Meḥrûmê avê nekey saqî[836] tihê teyha[837] ʿebeṣ

13.

Ketme nêv beḥra gunehan nêz e ġerqê avê bim

Canê me hatîye ser lêvan di vê beḥra ʿebeṣ

14.

Bil ji we nîne me ra hêvî eya[838] qebtanê ruḥ

Me reha kin[839] bo Xudê îro ji vî ḥalî ʿebeṣ

15.

Duşmenê dişwar gelî yaran emana me birî

---

[832] **Ḥub**: Evîn, hezkirin, yarenî
[833] **Gulzar**: Bostanê gulan, baxçeya gulan
[834] **Arê qetanê**: Agirê cudabûnê, şewata dûrketinê, jana firqetê
[835] **Firqet**: Cudabûn, cudayî, veqetîn
[836] **Saqî**: Meygêr, ew kesê ku di civatan de meyê belav dike
[837] **Teyh**: Çol, çolistan
[838] **Eya**: Dengê banglêkirinê ye. Di Kurdî de berdêla wê "ya" ye. Wek mînak; Ya qebtanê ruh!
[839] **Reha kin**: Reha kirin, xilas kirin, rizgar kirin

Taz*î* kirye xencera xu bi x*û*na jaran ʿebes̱

16.

Me xu avêtîye hêşa[840] kon*ê*[841] we ey nazenîn

Hey hewar dûr xin ji me vî duşmenê xûnxur ʿebes̱

17.

Pur **Ḥezîn** im mest û gêj im j`herdu çavan xûn dirijim

Bêmukûn[842] û dilqirêj im girt*î* pîyê rah*ê* ʿebes̱

18.

Hêvîya me hey ji yaran purs bikin l`ḥalê neçaran

Dilfikar[843] û ist*û*xaran zor e hakin jê ʿebes̱

19.

Qeṭ mekin wenda`j ç*a*van wan şîr*î*n û noqzir*a*van

Wan delalê wek delavan ey tihê çola ʿebes̱

20.

Hingivîn in gotinê wan, pur bi ṭîn in şîretê wan

Padişah in hogirê wan, bil ji wan her tişt ʿebes̱

21.

Ah behara gîştina yar borîy û çû pur biġar[844]

Boy delalan bûm elemdar nêv*a* hicrana ʿebes̱

22.

Nebe bê hêvî **Ḥezîn** ma hey zivistan bê behar

Gul d*î*sa dê şîn bibin firqet d*î*sa dibit ʿebes̱

**27.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1.

Bo delala xu ji Bîngolê[845] ç*û*me Saḥil*ê* ʿAc[846]

Da bi axa asitanê[847] dil*ê* purxûn kim ʿilac

[840] **Hêş**: Sî, parastin, muhafaza
[841] **Kon**: Çadir
[842] **Mukûn**: Derfet, îmkan
[843] **Dilfikar**:Ew kesê ku di dilê wan da metirsî, qisawet û xem hene
[844] **Biġar**: Bilez, zû bi zû
[845] **Bîngol**: Çewlîg. Bajarekî li Bakûrê Kurdistanê ye.
[846] **Saḥilê ʿAc**: Li başûrê parzemîna Afrîkayê dewletek e. Bi tirkî, Fildişi Sahilleri.

2.

Axik e derdê dilan ra tûtîya[848] û merhem e

Tozek e çavê dilan ra surme û nûr û hewac[849]

3.

Şêm*û*ka wê balgeh e bûrûy*ê*[850] têk şan û n*î*şan

Pêl*a*va yarê ji şahanê cihanê ra ye tac

4.

Serteser ʿalem muṭîʿê[851] emr û fermana w*ê* ye

Ser hemî şahê welatan ferż e dayîna xerec[852]

5.

Yek ṭ*î*rêjek roj*a* rûyê dilberê bibit xuya

Ji evînê di dilan da hildibin ṣed ṣed sirac[853]

6.

Durr*ê*[854] beḥr û av*a* Bîngol û xunava ser gulan

Ji xuya dêmê delalê girtine qedr û rewac[855]

7.

Ser nişivîn[856] perîy û ḥorî li henber wê hemî

Wek gula rûken ş*î*rînnêrîn e xweşbêhn û mizac

8.

Bi umîda gîştina yarê **Ḥezîn** jînê dike

Ya Îlahî! La texeyyîbuhû iẕa me`l-leylu dac[857]

**28.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

---

[847] **Axa asitanê**: Xweliya li ber dêrî, xaka şêmûkê

[848] **Tûtî**: Dermanê çavan, kil

[849] **Hewac**: Koka gûrzî ye. Gihayek serê wê bi stirîn e, kulîlkê wê hene û hêşîn e. Di zeviyan de şîn dibe. Tev li mûmê dikin, dixin ʻîlac. Belgên wê şîfa ye û ji gelek derdan re jî derman e.

[850] **Bûrû**: Birû, birh

[851] **Muṭîʿ**: Yê ku îtaet dike, îtaetker

[852] **Xerec**: Bac

[853] **Sirac**: Çira, fanos

[854] **Durr**: Mirarî

[855] **Rewac**: Mûteber, qîmet, giramî, rûmet

[856] **Ser nişivîn**: Serê xwe xwar kirin

[857] Ey Îlahî! Dema ku şev tarî dibe, Tu wî bêhêvî nekî.

Guh bidey ser ʿalemê çi nal*î*nek kûr tê ji ruḥ

Lewr*a* dûrê yar û dîyarê xu[858] ye miskîni ruḥ

2.

Dûritî yaban*a*[859] derd û êş û ahînê kûr e

Lew ji dergûşê[860] ḥeta gorê bi ah û zar e ruḥ

3.

Weku bulbul wîlw*î*lê wî bû li dor sosin*a* geş

Lê di dafa[861] can*ê* axîn[862] da *î*ro lal maye ruḥ

4.

Mas*î* bo ajnê[863] dikir deryay*a* ʿirfanê[864] d*a* hey

Lê *î*ro tora nezanînê d*a* istûxar e ruḥ

5.

Wek kewan qebqeb dikir hey ser zinar û ber çîyan

Ah*î* cismê wek qefeṣ da îr*o* pur bêḥal e ruḥ

6.

Lez dixazit fir bidit dîsa biçit wan menzilan

Hiss*ê* ḥeywanî girêdane pel û çengê di ruḥ

7.

Can*ê* axîn di welat da hey bi kêf û ṣahî ye

Ê d*û*rê yar û welat û hey bi jan û êş e ruḥ

8.

Ah şeraba layezalî[865] ya zelal dibit neṣîb

Bi gihana yar*ê*[866] dîsa geş w*ê* bit sosin*a* ruḥ

9.

Gulkî geş bû baġ*ê* yarê da zemanek pur dirêj

Bi *sir*ra bayê qetanê pirmilî[867] nêrgiz*a* ruḥ

10.

---

[858] **Yar û diyarê xu**: Yara ruh Xwedê ye; diyarê ruh jî ʻerşê Xwedê ye. (H.)

[859] **Yaban**: Çol, çolistan

[860] **Dergûş**: Landik, kincîl, mehdik

[861] **Daf**: Kemîn, telik, dafik, xepik

[862] **Dafa canê axîn**: Mebest jê bedenê insan e.

[863] **Ajne**: Avjenî, melevanî, soberî

[864] ʿ**Irfan**: Zanîn û nasîna Xwedê

[865] **Şeraba layezalî**: Şeraba nemirînê, meya wek ava heyatê

[866] **Yar**: Xwedê

[867] **Pirmilî**: Çilmisî

Av*a* ʿirfana delavê lamekanî[868] vedixar

Bi bihara nêr*î*na yarê xweş û rûken b*û* ruḥ

11.

Bi n*û*ra ʿerşê Xudê nêrîn dikir dîtin dikir

Nedima veşart*î* sirrek henberê idrak*a* ruḥ

12.

Lê *î*ro roj lê ç*û*ye avan seraser tarî ye

ʿAlema wî lew tu nabyî[869] bil ji ahînê ji ruḥ

13.

Dûr ji dost û xane û cîran*ê* xu maye reben

Lew ji ber derdê qetanê hey fiġan têtin ji ruḥ

14.

Hêvîya bêhêvîyan û çar*a* bêçaran tu yî

Carekî pursîn bikey cana[870] li vî bêḥal*ê* ruḥ

15.

Ma gelo ḥeq nîne cîran purs*ê* ke`l ḥalê c*î*rên[871]

Ġeyretê key dilberê pir bi *ê*ş û jan e ruḥ

16.

Ne bi dengê bulbulan ne jî bi rengê ṣorgulan

Ne bi bêhna nêrgizan têtin hedan[872] û sekn*a*[873] ruḥ

17.

Ne bi ġulġulê delavan ne`b dêmê xoyxunavan[874]

Ne bi şanê misk*î*nî[875] çêbit s̱ebat û ṣebr*a* ruḥ

18.

Ne bi baġan û kulîlkan ne bi serxêlîyê[876] b*û*kan

Ne bi biskê Ḥeyderî[877] xweşyê dibînit mest*î* ruḥ

---

868 **Lamekan**: Bêmekan, bê cih û war

869 **Nabyî**: Nabihizî

870 **Cana**: Ey Can. Li vir banglêkirin heye.

871 Îşareta vê hedîsê qudsî dike: Ne ‘erş ne ‘erd min di xwe de nagire, lê tenê qelb min di xwe de digire. (Îbnî Teymiyye gotiye ku eslê vê hedîsê tuneye. Sehâvî, **el-Makâsıdu’l-Hasene**, r: 438, Hedîs no: 990; Aliyyü’l-Kârî, **el-Esrâru’l-Merfûa**, s: 301, Hedîs no: 423; Aclûnî, **Keşfü’l-Hafâ**, c: 2, s: 195, Hedîs no: 2256)

872 **Hedan**: Aram, tebat, sbr

873 **Sekn**: Sekinandin, tebat

874 **Dêmê xoyxunav**: Ew dîlberên ku xwêdana li ser rûyê wan wekî xunavê xweş in.

875 **Şanê miskînî**: Ew dilberên ku bêhna mîskê ji şanikên rûyên wan tê, xalên bêhnmîsk.

876 **Xêlî**: Rûber an jî kemna ku diavêjin ser bûkan

877 **Ḥeyderî**: ‘Eşîrekî Kurdan e. Bi jinên xwe yên rind û bedew ve namdar in.

19.

Bengîyê nûra ḥeqq e mestê cemala muṭleq e

Lew bi ah û ḥesret e tim jar û istûxar e ruḥ

20.

Ma çilo[878] bengî ji bil gîştin*a* yarê şad dibit

Ya gelo bê beḥr û avan çer dijî masîy*ê* ruḥ

21.

Ma dimînit geş gulek weqta ku jêbit ji ç*û*qulk[879]

Ya dimînit xweş cesed ger jê qeta bit nûr*a* ruḥ

22.

Ey **Ḥezîn** derdê qetanê pir giran û zeḥmet e

Ġem mekey ceşna gihanê dê bibînit roj*ê* ruḥ

**29.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1.

Wek me yê rojreş n*î*ne kes dikş*î*ne azar*ê* çerx[880]

Êş û derdan hey dibarîne me ra ġeddar*ê* çerx

2.

Dil hedef kirne t*î*rê jeʿrî li pey hev tên û tên

Hey hewar ma dê çibit ḥalê dilê amanc*ê*[881] çerx

3.

Hatine danîn li ser dil ṣed hezar xencer û şûr

El-eman[882] ey yar*ê* dilbêş[883] ji ş*û*rê xûnrêj*ê* çerx

4.

Bi hezaran gujgujîn[884] ser berx*ê* dil qertal[885] û baz

El-meded ey şah*ê* merdan[886] ji cefa û xeşm*a* çerx

---

**Biskê Heyderî**: Biskê wan jinên bedew ên ʻeşîra Heyderî ne.
[878] **Çilo**: Çawa
[879] **Çûqulk**: Çiqil, şaxa darê
[880] **Çerx**: Gerdûn, felek
[881] **Amanc**: Armanc, mebest
[882] **El-eman**: El meded, hawar, alîkarî
[883] **Dilbêş**: Xwedan şefqet, dilovan
[884] **Gujgujîn**: Êrîş kirin
[885] **Qertal**: Eylo, hilo

5.

Penc*ê* şahînan di nêva cerg û dil da çûne xar

Dê çi bit ḥalê me ya Reb ji sitemkarîy*a* çerx

6.

Ma gelo tîroj*ê* van derdan ji ser dil rabitin?

Yan li ser ḥalek dimînit hey cefadarîy*a* çerx

7.

Nedikir teʾs̱îr di dil da gurz*ê*[887] Rustemê giran

Lêbelê têk tarûmar bû bi serê movik*a* çerx

8.

Agirê Nemrûd nikarîbû şewatê pê x*î*nit

Lêbelê kir xal*î* bin da çîkekê agir*ê* çerx

9.

Pehluwanan bi hezar zencîr*ê* dil qeyd ned’kirin

Lê bi yek mûyek girê da wek qimek av dest*ê* çerx

10.

Ma zinarê dil bi ṣed dozer*ê* Japon radibit?

Lêbelê bû wek kereng[888] rabû hewa ber bay*ê* çerx

11.

Ev şeva tarî diçit axir bi ṣubḥê ġem mekey!

Tim li ser rengek*î* namînit dil û bazar*ê* çerx

12.

Qeṭ mebe dilṭeng **Ḥezîn** têt pişt*î* şînê şah*î*tî

Fir didit rojek ji ser dil derd û azarîy*a* çerx

**30.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + −

1.

Dery*a*ya derdê me nîne wê r*a* rex[889]

---

[886] **Şahê merdan**: Şahê mêran, xwadişahê mêran

[887] **Gurz**: Çekekî klasîk e û heya serdema navîn di artêşan de hatiye bikaranîn. Bi bendik (an zincîr) in, ango guleya lajwerdî bi bendikê bi doxa gurzê ve hatiye girêdan.

[888] **Kereng**: Cûreyek giyayê xwedî pel û qurm e ku biharan şîn dibe. Serê pir pirçî bi stirîn e. Gava hişk dibe, dema ba lê dide belawela dibe û hewa dikeve.

Wek me ḥalpergende[890] nîne kes di çerx[891]

2.

Ji çiyay derdê me yek parekî qûm

Ser kî da bê dê zirav bit wekî nex[892]

3.

Dil bigîrya ser çiqûlkan da wekî

Goyînan,[893] dest da dibû pîr çam û merx[894]

4.

Mem û Zînê, Şîrîn û Ferhad dibin

Cem dilê ġem dîdeyê me wekî ferx[895]

5.

Ey **Ḥezîn** razê[896] dilan nîşan mede

Gerçî wek ḥenẓel[897] û aġûyê[898] be telx[899]

6.

Şîrînîy û talitî herdu yek in

Lew nivîsandîye yarê herdu rex[900]

**31.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – – / – + – – / – + –

1.

Herdu çav hey[901] xûn dirijin ax û ax

Jana ʿişqê em kirin xalî û ax[902]

2.

Derdê yara kewmeşa[903] zivînbeden[904]

---

[889] **Rex**: Lêv, qerax, kevî
[890] **Ḥalpergende**: Halperîşan, belawela, gij, perperîşan
[891] **Çerx**: Gerdûn, felek
[892] **Nex**: Dezî, tayê herî zirav
[893] **Goyin**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.
[894] **Merx**: Darekî wekî dara çamê bi stirîn e û her dem heşîn e. Bi tirkî, ardıç.
[895] **Ferx**: Çêlî, çêlik, têjik, cûcikên çivîkan
[896] **Raz**: Sir, nepenî, nehênî, xef
[897] **Ḥenẓel**: Gihayekî pir tehl e. Bi Kurmancî dibêjin "kundirok".
[898] **Aġû**: Jehr, jehrî
[899] **Telx**: Tehl, tal
[900] **Rex**: Hêl, alî, teref
[901] **Hey**: Tim û tim, her dem
[902] **Ax**: Xwelî, xak

Hêj ku xort bûn por li me kirye pelax[905]

3.

Her kesek girtî xu ra sêvek ji dar

Ḥesreta bê sêv tenê em bûne xax[906]

4.

Lew me nalîn tên ji qelbê têk birîn

Wek pepûka jar li ser her dar û şax[907]

5.

Destegîrê dilbirînan yar bitin

Ey **Ḥezîn** ma bo çi ne ev ah û ax

**32.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Pêçek[908] ji dêman rakirî biskê di reş lê bakirî

Qelbê birîndar şad kirî wê dilbira pur şeng[909] û şox[910]

2.

Gula dilan geş bû d*î*sa bulbul li henber mellisa[911]

Qelbê ḥesûdan[912] hellisa[913] şukur bi vê roja furûx[914]

3.

Ava biharê coşî bû kulîlk û gul têk geşî bûn

Bulbulê dil serxoşî bû bi vê demê ṣed ax û ax

4.

Şingîn*a* xişrê[915] zîv û zêr kerwan*ê* ʿişqê radikir

Bal menzilan ve rê dikir bi şahiy û lez̲z̲et*ê* çox

---

903 **Yara kewmeş**: Ew dîlbera ku meşa wê weke ya kewan bi hejîn e.

904 **Zivînbeden**: Bedena ku dibiriqe û diçilvile

905 **Pelax**: Gihayê hişk. Lêbelê bi wateya; mînanî gihayê hişk belawela, gij

906 **Xax**: Rezîl, navnig

907 **Şax**: Çiqil, şaxê darê

908 **Pêçek**: Perdeya li ser rû, xavik, şar

909 **Şeng**: Bedewî û rindahiya bi por û keziyê

910 **Şox**: Nazik, narîn, xweşik, bedew

911 **Mellisa**: Melisîn, melisandin, rûniştin

912 **Ḥesûd**: Dexes, çavnebar

913 **Hellisa**: Hûrhûr bûyîn, perçe perçe bûyîn

914 **Furûx**: Ronî, ronahî

915 **Xişr**: Xeml û bergên jinan

5.

Hîna heye furṣet bi lez bal wan delalan ve bibez

Hey hey gihanê jê bixaz kuştin qetanê em bi dox[916]

6.

Hêvî bikey ji perîyan da dûr nexînin bengîyan[917]

Qetan*a* wek hirça çiyan çerm kirye puştevan bi zox[918]

7.

Bibe delalê tim weha şînan bide ber av û ba

Pişta me derdan kir du ta[919] porê me yekser bû pulox[920]

8.

Got, ey **Ḥezîn** mizgîn te ra êdî were geştê[921] me ra

Nêrîn ḥelal e ji te ra bo me te rê kirye kulox[922]

**33.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Ṭavîyê ʿewrê beharê şîn kirin sosin û werd[923]

Xemmilîn mêrg û çimengeh reng*ê* bulbul bûye zerd[924]

2.

ʿAşiq û feṣla[925] beharê hate nû dilxweş be tu

Ṣed hezar leşker*ê* kêfan dane dil ṣed ṣed meded[926]

3.

Gul di bağan da vebûn gulşen bilez hatin sema[927]

Geş b*û*ye rengê dilan û şahitî çû der ji ḥed[928]

4.

---

[916] **Dox**: Bend, bendik
[917] **Bengî**: Evîndar, dilketî, xoşewîst
[918] **Zox**: Perçeyek ji postên heywên e ku bi wan perçê postan çarix dihate çêkirin.
[919] **Ta**: Ker, perçe
[920] **Pulox**: Pelax, gihayê hişk. Ango belawela, gijik, gij
[921] **Geşt**: Seyran, ger, gerrîn
[922] **Kulox**: Kilox, serî, serê mirovan
[923] **Werd**: Gul
[924] **Zerd**: Zer
[925] **Feṣl**: Demsal, mewsîm
[926] **Meded**: Hawar, alîkarî
[927] **Sema**: Reqs, govend, dîlan
[928] **Çû der ji ḥed**: Ji heddê xwe derket, ji sînorên xwe der bû

Hate dewra remz[929] û nazan borî dewrana nîy*a*zan[930]

Dilkul û ġemgîn mebe ʿalem hemî şahî û rind

5.

Bê ḥisab der bûn fuyûḍat[931] j`qulzema[932] sulṭan*ê* kewn[933]

Roj bi derhate ji meşrîq[934] têk*î* dunya mûm û find

6.

Mey di tasan hate gastina[935] ʿ*uş*şaqê ḥusn*a* ḥeq

Îşrebîl xemrete ʿibben[936] saq*î*[937] têtin zewc[938] û ferd[939]

7.

Ew cemala[940] bê heval lewra ji ʿilmê hate ʿeyn[941]

Ṭîr*ê*jê roja ṣemed[942] têtin peyapey[943] bê ʿeded

8.

Nûbehar e surperî tev da bi hev ra çûne seyr

ʿEmmeti`l-efraḥu ʿuşşaqe`l-cemalî hulle qeyd[944]

9.

Dengê çîngîna guharê dilberan çûye felek[945]

Hev ketin eflak[946] û ebrac[947] hatine ḥelqa govend

10.

Ev çi gummîn û *zim*mîn e dar û ber hey hey dikin

Wîlw*î*lê ṭeyran e derya tê li pey hev cezr û med[948]

11.

Kêf dikin tev da bi kêfa dilberê mêrg û çimen

---

929 **Remz**: Nîşan, îşaret

930 **Nîyaz**: Lavahî, libergerî, du'a

931 **Fuyûḍat**: Feyz û bereket

932 **Qulzem**: Behra Qulzem, Behra Sor.

933 **Sulṭanê kewn**: Sultanê gerdûnê, şahê 'aleman. Mebest jê Xwedê ye.

934 **Meşrîq**: Rojhilat

935 **Gastin**: Meclîs, civak

936 **Îşrebîl xemrete ʿibben**: Şerabê vexwe bi qurte qurt

937 **Saqî**: Ew kesê ku di civat/meclîsan de meyê bela dike, meyger

938 **Zewc**: Cot, du

939 **Ferd**: Kit, yek

940 **Cemal**: Rindî, bedewî

941 **'Eyn**: Çav

942 **Ṣemed**: Yek ji navên Xwedê ye. Wateya vê, her tişt hewcedarî wî ye lê ew hewcedariya kesî nîne.

943 **Peyapey**: Li pey hev, li pişt hev, li dû hev

944 Dilfirehî herkesî girtiye, qeyda lingê min hate vekirin.

945 **Felek**: Asîman, çerx

946 **Eflak**: Pirjimariya felekê ye. Felek, çerx, gerdûn

947 **Ebrac**: Pirjimariya bircê ye. Birc

948 **Cezr û med**: Med cezîr, kêşe û vekêş

Ya **Ḥezîn**û qum terennem fî`l-cibalatî we beyd[949]

**34.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Pesn û medḥê te didin her dem peyapey rûd û ʿûd[950]

Tim zimanê bengîyan nîşan diditin ṣed surûd[951]

2.

Beng*î* ne dilbend*ê*[952] zincîra te ne her mah û ṣal

Dil vekey j`qeyda[953] qetanê îl*a* ruşdih key yeʿûd[954]

3.

Katibê ḥusna ezel[955] da ser semawatan sitêr

Sunbul û gul, sosin û pel der riyażan[956] daye ʿûd[957]

4.

Meẕherê[958] ḥusna te ye herçî kulîlkê der çimen

Lewr*a* bulbul ser dinale wek ney û ṭenbûr[959] û rûd

5.

Şemme[960] yek bêhna ʿebîra[961] te bidil ʿaşiq giha

Serxoş û nalan û mest kir hîşte ḥeyran der sucûd[962]

6.

Lemʿeyek[963] şewqa cemala te tecella bû li kewn[964]

Pur bi çav kor bûn û bê çav nig li ser serê seʿûd[965]

7.

---

949 Rabe ey Hezîn li çiya û deştan terennumê bike.
950 **Rûd û ʿûd**: Du amûrên mûzîkê ne.
951 **Surûd**: Awaz, naxme, stran; medh, pesn
952 **Dilbend**: Dilgirêdayî
953 **Qeyd**: Bend, zincir, şancûl
954 **Îla rûşdih key yeʿûd**: Vegere bal eqlê xwe ve
955 **Katîbê ḥusna ezel**: Mebest jê Xwedê ye
956 **Der riyażan**: Di baxçeyan de
957 **ʿÛd**: Dar
958 **Meẕher**: Cihê xuyandinê, cihê ku bedewiya Xwedê diyar dibe.
959 **Ney û ṭenbûr**: Du amûrên mûzîkê ne.
960 **Şemme**: Mîqdar, tibab (ji bo bêhnê)
961 **ʿEbîr**: ʻEmber, mînanî mîskê bêhnxweş e.
962 **Der sucûd**: Di secdê de
963 **Lemʿê**: Birq, çîrûsk, tîrêj
964 **Kewn**: ʻAlem, gerdûn; pêkhatin, çêbûna gerdûnê
965 **Seʿûd**: Navê stêrkekê ye.

Çîkekê arê celala[966] te li derya bû xuya

Lew bi lerz û cez̲be û pêl hate der baġê wucûd

8.

Z̧erreyek lut̹fa te kir arê Xelîlu`llah[967] çimen

Nukteyek ʿilmê te kir Xid̹rê ji Mûsa ra ʿemûd[968]

9.

Pertewê nûra te kir der Yûsifê Mis̹rî z̹uhûr

Lew Zelîxaya ʿezîz ser dilkul û bengîn*í* bûd[969]

10.

Tûtiyayek[970] bû ji gulzarê cemala te kiras

Lewr*a* çavê Yeʿq*û*bê Kenʿan*í* pê xweş bûye zûd[971]

11.

Meʿdena derman*é* derdan û ġeman hey te li bal

Îşfi esfam el **H̹ezîn**î kade bi`n-nefsî yecûd[972]

12.

Tu bi çavê şefqetê carek li dilkul key nez̹er

Çavn*é*rê lut̹fa te ye hey der qiyam[973] û der quʿûd[974]

**35.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Dol*a*ba[975] ʿişqê dilê bengî dijend[976]

Nedihat xar lê ji ʿezma[977] xu`y bulend[978]

2.

Di reha yarê d*a* bêperwa[979] diçû

---

966 **Celal**: Mezinahiya sermedî, xwedan ʻezamet
967 **Xelîlu`llah**: Hezretî Îbrahîm (as.) e. Bi wateya "dostê Xwedê" ye.
968 ʻ**Emûd**: Mamoste, ûstad, ûstaz
969 **Bengînî bûd**: Evîndar bûbû
970 **Tûtî**: Dermanê çavan, kil
971 **Zûd**: Zû, lez
972 Tu nexweşiya Hezîn derman bike, nêzike ku bi nefsa xwe comerdiyê bike. (Ango ruhê xwe bide, bimire.)
973 **Der qiyam**: Li ser piyan
974 **Der quʿûd**: Rûniştî
975 **Dolab**: Çerx, felek, deweran, gerdûn
976 **Dijend**: Disot, dişewitand
977 ʻ**Ezma**: Asîman, ezman
978 **Bulend**: Bilind, berz, bala

Gerçî duşmen danîbû ṣed daf[980] û bend

3.

Sistîya bo zeḥmetan jan e bira

Wek wê nîne dûrkerê yarê kemend

4.

Ê di yabana muradê[981] da diçit

Weku hev tên bona wî jarî[982] û qend[983]

5.

Mumkine her kes bigêj yara xu lê

Nagêjit yara xu sistê pozbulend

6.

Ê dixazit xweş biçit wan menzilan

Her divêt bişkêne qeyd, hilçîne zend

7.

Ey **Ḥezîn** bê terka bandê[984] ẓen mekey

Dest ve tê qayîlbûna yara lewend[985]

**36.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Ketime tennûra ʿişqê şahê Xeznayê meded[986]

Perritîm tê da seraser şahê Xeznayê meded

2.

Ṣebr û aram[987] min nema ye dil û can bûye pureng

Tev li ahan hey dibêjim şahê Xeznayê meded

3.

Her wekî ferxa[988] kevokê ketme nêv atûna ʿişq[989]

---

979 **Bêperwa**: Bêtirs, bêxof, bêsaw

980 **Daf**: Kemîn, xefik, telik

981 **Yabana muradê**: Çola mirazê, çolistana xwestekan

982 **Jar**: Jehr, jehrî

983 **Qend**: Şekir

984 **Band**: Dinya. Peyveke kurdî ye û biwêjeke wiha jî heye: Îro bandê ye, sibê axret!

985 **Yara lewend**: Ew yara bi bejn û bal, bihêz

986 **Meded**: Hawar, arîkarî, yarmetî

987 **Aram**: Huzûr, tebat

Hey hewara bêhewaran şah*ê* Xeznayê meded

4.

Min ne çeng[990] e fir bidim pê, min ne deng e qîr bikim

Hêvîya bêhêvîyan î şah*ê* Xeznayê meded

5.

Xar vekey[991] agir*ê* ʿişqê bi gihanê şa ke dil

Berde pîrane neẓerkî[992] şah*ê* Xeznayê meded

6.

Mam di yabana qetanê[993] da hewar mat û tenê

Bişî*n*e boy me mededkî şah*ê* Xeznayê meded

7.

Tu m*î*na roj em wekî gul her dikin bal te ve meyl

Rê bikey bal me t*î*rêjek şah*ê* Xeznayê meded

8.

Çavn*ê*r im dûr im ġerîb im, birçîyê luṭfa te me

Menbeʿa[994] feyżê *î*ro tu`y, şah*ê* Xeznayê meded

9.

Dil birîndarê bi tîr û xencerê ʿişqa te me

Li birînkûran binêre şah*ê* Xeznayê meded

10.

Luqm*a*n î can û dilan ra, derm*a*n î derd û kulan ra

Dafiʿ[995] î şer û belan ra, şah*ê* Xeznayê meded

11.

Pêş*î*wa yî rah*ê* ḥeq ra, serwer û ṣalar[996] *î* tu

Hûn keremkar em neçar in, şah*ê* Xeznayê meded

12.

Ḥamîyê[997] şerʿa mub*î*n[998] î, ḥawîyê[999] ʿilm û yeqîn

---

[988] **Ferx**: Çêlî, çêlik
[989] **Atûna ʿişq**: Agirê ʻişqê, şewata evînê
[990] **Çeng**: Per, bask
[991] **Xar vekey**: (Agirê) temirandin, tefandin, vemirandin
[992] **Pîrane neẓerkî**: Nêrînekî pîrane, awireke bi zanîn û hikmet
[993] **Yabana qetanê**: Çola cudabûnê, çolistana fîrqetê
[994] **Menbe**ʿ: Çavkanî
[995] **Dafi**ʿ: Yê ku diqewirîne, def dike, qewîker
[996] **Ṣalar**: Serok, pêşeng
[997] **Ḥamî**: Yê ku diparêze, parêzker
[998] **Mubîn**: Eşkere, zelal

Ḥamilê[1000] barê ṭerîq î, şah*ê* Xeznayê meded

13.

Ger qebûl key wer bizivrînî me, em her kole ne

Deriyek dî em nezanin şah*ê* Xeznayê meded

14.

Menbeʿê cûd[1001] û kemal î, Ḥatimê[1002] weqtê tu yî

Em neçar û ist*û*xar in şah*ê* Xeznayê meded

15.

Ṣaḥibê sirra cemal[1003] î, Yûsifê Miṣrî tu yî

Bal te ve hey bendewar[1004] in, şah*ê* Xeznayê meded

16.

Nisbet[1005] û feyża te cana! girtiye ʿalem xu da

Em gelek bîzar û jar in, şah*ê* Xeznayê meded

17.

Pur zeman e em li ber dergah*ê* te bûne muqîm[1006]

Hêstirê çavan dibarin, şah*ê* Xeznayê meded

18.

Nûbehar e her hevalê ra neṣîb bû ṣorgulek

Em tenê meḥrûm ji behr[1007] in, şah*ê* Xeznayê meded

19.

Pur **Ḥezîn** im can*ê* canan muḥt*a*cê luṭfa we ne

Tavîyek feyżê hunarin[1008] şah*ê* Xeznayê meded

**37.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

---

999 **Ḥawî**: Guncandin, vegirtin

1000 **Ḥamî**: Yê ku dibe, dikşîne

1001 **Cûd**: Comerdî, camêrî

1002 **Ḥatim**: Hatimê Taî. Navê wî Îbn ‘Evdulahê kurê Sa’d e ku ji ‘eşira Taî ye. Di nav ‘eşîrên ‘Ereban de bi camêrî û comerdî ya xwe hatiye nasîn. Di serdema Hz. Muhammed (saw.) jiyaye lê pêxembertiya wî neditiye.

1003 **Cemal**: Rindî, bedewî

1004 **Bendewar**: Girêdayî

1005 **Nisbet**:

1006 **Muqîm**: Ewê ku îkametê dike, lê dirûnê, li wir bi cih bûye

1007 **Behr**: Par, pişk, pay

1008 **Hunarin**: Bişînin, hinartin, şandin

1.

Wê dilbera lêvşekkerîn, bi ʿişweyan can perritand

Şîşên hesin xar kir di dil, ker kir ciger xoy lê reşand

2.

Geh dûr e geh nêzîk e, geh xuya û wenda ye bedew

Geh ṣorgul e geh bulbul e, heşê h*î*şaran ḥeyyirand[1009]

3.

Geh dilberek rûfenner e, geh serwer[1010] e geh dawer[1011] e

Dilê reben ma ḥeyyirî, bi cilweyan heş jê pekand

4.

Hem nêrgiz e hem sunbul e, hem qaşik[1012] e hem kakil e

Gelek bedew û qabil[1013] e, ṣebr û hedana me birand[1014]

5.

Hem can e hem cesed e ew, hem av e hem cemed e ew

Wendan r*a* xweş beled[1015] e ew, feyż û meded[1016] her dem dişand

6.

Ya Reb ji wî me dûr nekey, ya Reb bo wî me kor nekey

Bo weṣl*a*[1017] wî dil şa bikey, qetan*ê*[1018] pişta me şikand

7.

Vê dûrîyê em pîr kirin, xûnhêstiran çav kor kirin

Cerg[1019] û hunav tev kul kirin, şîşên di sor tê da ṭewand

8.

Dilber xuya naket çima, biskan l*ê* ba naket çima

Derdan bela naket çima ʿişqê hunavê me pijand

9.

Pursê bikey carek delal, li vî rebenê payemal[1020]

---

[1009] **Ḥeyyirand**: Şaş û matmayî hîşt
[1010] **Serwer**: Serok, serek, pêşeng
[1011] **Dawer**: Dadger, dadrês, hakim
[1012] **Qaşik**: Kirasê ser kakilê gûzê, qalçik
[1013] **Qabil**: Yê ku dikare bike, kara, biqabiliyet, behremend
[1014] **Birand**: Hişk kir, koka wê qeland
[1015] **Beled**: Rêzan, rêber
[1016] **Meded**: Arîkarî, hawar
[1017] **Weṣl**: Gihîştin, gihandin
[1018] **Qetan**: Cudabûn, veqetîn, durketin, firqet
[1019] **Cerg**: Ceger, kezeb
[1020] **Payemal**: Bernig, rezîl, xax

Wî ra n*î*ne yar û heval, ḥubbê[1021] ziravê me qetand

10.

Êş û elem, dûrîy û xem, tevda me ra bûne neṣîb

Êdî were cana[1022] bes e, derd û ġeman dil ḥerrişand

11.

Mîna pepûk û goy*î*nê[1023] nalîn diçin ji dil mudam[1024]

ʿIşq û evîna zerîyê[1025] welat nema dil lê gerand

12.

ʿIşq û enîn[1026] û dûr*î* û wah û g*î*rîn karê me ne

Dilber xuya naket gelo, vê dûrîyê dil şewitand

13.

Reş kakulan ca şe bikey, ava gulan pê wer bikey

Bal bengîyan ve meş bikey, ʿeşqê hedana[1027] me qeland

14.

Ṣebr û hedan hate birîn, can û ciger tev bû birîn

Sertîr*ê* burhê[1028] dilberê li dil ket û kezeb dirand

15.

Roj bûne meh, meh bûne ṣal gelo xuya naket delal

Demek me ra nabe heval, evîn*ê* dîza[1029] dil keland

16.

Êdî bes e dilber were, can perritî sertasere

ʿIşq e ji karînê der e, êşê emana me birand

17.

Eyne`l-ʿuhûdû we`s-suel, eyne`s-sukûnû we`l-wiṣal?[1030]

Sare`l-**Ḥezîn**û fî`l-xeyal, lew ehremen[1031] xatim revand?[1032]

---

[1021] **Ḥub**: Evîn, hezkirin

[1022] **Cana**: Ey can, ey dîlber. Li vir banglêkirina evînê heye.

[1023] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye

[1024] **Mudam**: Her tim, her dem

[1025] **Zerî**: Porzer. Mebest jê dilber û evîn e.

[1026] **Enîn**: Nalîn, nalenal, zarîn

[1027] **Hedan**: Aram, sebr, tebat

[1028] **Burh**: Birh, birû

[1029] **Dîz**: Dîzik, kilosk, kûzik

[1030] Soz û pirs li ku ye, sukûnet û gihan li ku ye?

[1031] **Ehremen**: Navê Şeytên e. Di baweriya Zerdûştî de navê xwedayê şer û xerabiyê ye. Wisa tê bawer kirin ku serokê artêşa şeytênan e. Herwiha remza sikayî, zistî û xirabiyê ye. Gustîla Hz. Sileyman jî ew revandiye.

[1032] Hezîn ketiye nav xeyalan, gelo Ehrem çima gustil rewand?

**38.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Ew dilbera zêrînkemer îro ji burcê hate der

Ġebġebkewa[1033] rûgulgulî[1034] zivînqirika[1035] nûr li ser

2.

Ya Reb çi nûrekî zelal heye li ser bejna delal

Kezeb li bengî xilxilî[1036] jîna w*î* bû derd û keder

3.

Esmay*ê* ḥusnê[1037] ku hene tev nav û nîşanê te ne

Lewra bi ʿeşqa bulbulî[1038] qaqirc*î*ga[1039] wê bû du ker

4.

Tewrat û Încîl û Zebûr, Quran*a* tev ḥikmet û nûr

Yek yek ji wan xweş bûn h*ê*lî[1040] me ra ji te tînin xeber

5.

Ev gerr*a* dolaba dunê, bi ẕewq û tertîb û huner

Tevda bi emrê ezelî ezman û qad û beḥr û ber

6.

Tîrê ji nûra sermedî, li qelb*ê* insankî bidî

Dê ew bi ʿeşqê bikelî, dibit weza[1041] û reng(e)zer[1042]

7.

Wî ra dibin dost û heval bi wî dibin qenc û delal

Deşt û newal û nepelî[1043] insan û cinn û dar û ber

8.

---

[1033] **Ġebġebkew**: Ew dilbera ku xebxeba/binçenê wê wekî ya kewê rind û dilrakêş e.

[1034] **Rûgulgulî**: Ew rûyê ku bi gulan ve hatine pêçandin, bi gulan ve hatine xemilandin.

[1035] **Zivînqirik**: Ew dilberên ku qirika wan wekî zîvê dibiriqe û rewnak e.

[1036] **Xilxilî**: Perçe perçe kirin, hêrifandin

[1037] **Esmayê ḥusn**: Nav û sifatên Xwedê.

[1038] **ʻEşqa bulbulî**: Eşq du cûre ne. Ya yekem *eşqa perwanî* ya duyem jî *eşqa bilbilî* ye. Di eşqa bilbilî de bilbil evîndarê rûyê gulê ye. Ango ji bo bedewiya gulê şev heta sibê dixwîne. Lê di eşqa perwanî de pirpirok/minminîk li dor evîna (mûm, find) xwe diçe û tê wekî perwanê û dawiyê de jî xwe davêje nav wê û dişewite û dimire. (H.)

[1039] **Qaqircîg**: Zengilok, kirkirka li qirika mirov.

[1040] **Hêlî**: Neynik, eynik

[1041] **Weza**: Jar, qels, zeʻîf

[1042] **Reng(e)zer**: Kesê nexweş, rengê rûyê wî/ê zerbûyî

[1043] **Nepelî**: Şiverê

**Ḥezîn** *dûr* bûy ji hîvr*û*yan ji çavbelek û zerîyan
Lewra tu îro dilkul î bi ḥesret û ax û keser

**39.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun
Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –
1.
Ez dinalim şev û rojan wekî ṭeyrê di seḥer[1044]
Lew dilê jar da hene ṣed kul û ṣed derd û keser
2.
Ah firaqa[1045] te li min cerg û mîlak[1046] kirye kebab
Herişandîye dil û can serda xoy danîye ser
3.
Pur zeman e hêstirê çavan dirijim weku xûn
Can seraser peritî çû dil*ê* jar bûye du ker
4.
Ma gelo rojek dibit can ra hużûr dil ra tebat
Ah*î*nê derd û qetanê[1047] li me ker kirye ciger
5.
Me nema ṣebr û hedan[1048] ey yar*a* dilbêş[1049] hey hewar
Sêw*î* û jar û belengaz û reben mame li der
6.
Ketme nêv pencê evînê wekî şîşê di hesin
Dike xar pencê ġedar nêv dil û canê me y*ê* zer
7.
Pêşy*ê* xweş hat ev*î*na yarê welê dû ra çi dît
Dil*ê* jar rê da ji destê şîr*î*na dil wekî ber
8.
Şeyx*ê* Senʿanê[1050] nedît cewr û cefa ya ku me dît

---
[1044] **Seḥer**: Berbang, spêde
[1045] **Firaq**: Cudabûn, veqetîn, dûrketina yarê
[1046] **Mîlak**: Ceger, kezeb
[1047] **Qetan**: Veqetîn, cudabûn, fîrqet
[1048] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[1049] **Yara dilbêş**: Ew yara ku xwedan şefqet e, dilovan e

Roj bi roj zêde dibû derd û kul û êş û keder

9.

Pur zeman e em diçin, dawî xuya nabit me ra

Zad[1051] û ṭaqet me nema hêj dûr û zor maye sefer

10.

Mûrîya[1052] jar ji welat çawa diçit Qudsa Şerîf[1053]

Hey di rê da bi hezaran çem û gul û beḥr û ber

11.

Dest*ê* ṭiflê[1054] dil*ê* jar çawa digêj sêva li dar

Pehlewan wa ne li ser sêvê dikin tim ceng û şer

12.

Nexweşê êşa zirav[1055] can û hunav lê zer*î* bin

Çer dibînit gul*a* jîna şî*rîn* duxtor were ser

13.

Ya **Ḥezîn** "la teqneṭû"[1056] yekfîke silwanan fela[1057]

Tebteîs haza kerîmûn în we῾de e῾ṭa`l-beder[1058]

**40.**

mustef῾ilun / mustef῾ilun / mustef῾ilun / mustef῾ilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Hate behar ma kan*ê* yar dil dîs*a* maye bê qerar

Jîna ş*î*rîn dîsa nema cerg û hunav têk bûne ar[1059]

---

[1050] **Şeyxê Sen῾an**: Navê wî 'Evdirrezzaq e. Di derheqê wî zatê de zehf tişt nayê zanîn. Ji welatê Yemenê ye. Di helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî de jî navê Şêxê Sen'an derbas dibe. Çîrok, behsa evîna Şêxekî zahid ji bo keçeke Mesîhî ya Ermenî dike. Şêxê Sen'an mirovekî zana, mahir, xwedî zuhd û teqwa ye. Ev evîna wî dike ku Şêx tekya û mirîdên xwe terk bike û biçe welatê evîndara xwe. Di encamê de Şêx terka dînê xwe kiriye, xaç xistiye stûyê xwe û şivantiya berazan bavê mehbûba xwe kiriye. Piştî demekê dema ku Şêx digihe ruşda xwe, herdu bi hev re dibin misilman. (Adak, *b.n.,* 214.)

[1051] **Zad**: Xwarin

[1052] **Mûrî**: Gêle, gêrik, morî

[1053] **Qudsa Şerîf**: Mescîdî Aksa.

[1054] **Ṭifl**: Tifil, zarokê biçûk

[1055] **Êşa zirav**: Nexweşiya weremê

[1056] **La teqneṭû**: Bêhêvî nebin.

Di Qurana Pîroz de gelek cihan de ew ayet derbas dibe ku Xwedê ji însanan re dibêje "bêhêvî nebin" û bêhêvîbûnê qedexe kiriye. Ji bo ayetên derbarê bihêvîbûnê de bnr. Zumer 39/53, Sebe 34/17, Taha 20/48, A'raf 7/156 û yên din.

[1057] Ey Hezîn! Xwedê gotiye "bêhêvî nebin", ji te re ev tessellî bes e.

[1058] Dilkul nebe, ew merivekî comerd e, heke sozê bide sed hezaran dide.

[1059] **Ar**: Agir

2.

Ya Reb m*a* ev êş û elem ya Reb m*a* ev hicran û ġem

Tevda me ra bûne neṣîb kan şahî û kêf û behar

3.

Ahî dilê min çû ji dest her dem me ne ah û fiġan

Rencîde[1060] me dil xeste[1061] me bêhêv*î* mame ist*û*xar

4.

Dûr im ʿelîl[1062] im kûrbirîn, mest im ġerîb im pur ḥezîn[1063]

Ey destegîrê bêkesan carek were bo me biġar[1064]

5.

Der da heval çûn menzilan gîştin murad û ṣorgulan

Kî nar û kî gulnar di dest sêva me tenha ma li dar

6.

Cismê me zer bû wek şima[1065] cerg û hunav têk peritîn

Mest û neçar û dilxerab mame li rê bê zad[1066] û war[1067]

7.

Dilber were bes key sitem perde ji dêman[1068] rabikey

Ṣebr û teḥemmul me nema carek temaşa key li jar

8.

Bayê nesîm[1069] weqtê seḥer[1070] beḥra evînê coş*î* kir

Nêv pêl*ê* vê beḥra mezin maye dilê jar bê hewar

9.

Lewra şev û roj bê hedan qîrîn û zarînê dike

Dengê dilê jar çû sema dildar xuya naket tu car

10.

Qelbê **Ḥezîn** ji germîya arê qetanê[1071] bû pureng[1072]

---

[1060] **Rencîde**: Dilşkestî, dilmayî, şûşa dilê wî/ê şkestî

[1061] **Xeste**: Westiyayî, mandî, betilî

[1062] ʿ**Elîl**: Birîndar

[1063] **Ḥezîn**: Xemgîn, melûl

[1064] **Biġar**: Bilez, zû

[1065] **Şima**: Mûma hingivîn, mûm. Zer e û di pîşesaziyê de tê bikaranîn.

[1066] **Zad**: Xwarin

[1067] **War**: Cih, diyar

[1068] **Dêm**: Rû, sîma, sûret

[1069] **Bayê nesîm**: Bayê hênik. Bayekî hênik û xweş e, bi giştî berbangê sibê tê. Di edebiyatê de bayê nesîm ji ber ku bêhna dîlberî tîne, li welatê yarê digere û tê, bi bisk û keziyên evînê re hemhal dibe û hwd. lewra di navbera evîn û evîndarê de wekî qasid tê hesibandin. (Pala, *b.n.,* r. 357.)

[1070] **Seḥer**: Berbang, spêdê

Ma xar venaket[1073] agirê qelbê ḥerîq[1074] yar hey hewar

**41.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – – / – + – – / – + – – / – + –

1.

Dilberê nûra cemala te xuya kir ta ji Ṭûr[1075]

Henberê min herdu ʿalem ê di wan da bûn qubûr[1076]

2.

Her şikeftê tarîy û kûr tê d*a* hilbûn mûm û find

Ji semayê ta bi qadê tevd*a* ʿalem bûye nûr

3.

Gul di baġan da vebûn way bulbulan e hay û hûy

Dûr ketin derd û elem barî d*î*sa jor da surûr[1077]

4.

Min g*o* dilber, tim weha be ʿişk û mişkan[1078] şîn bikey

Got qebûl e, ger tu bavêjî ji xu koka futûr[1079]

5.

Min g*o* narîn, meṣderê[1080] her derd û dermanan tu yî

Ji gihanê dûr mekey dil ger tu xinc key[1081] can bi şûr

6.

Got, bi yaran ra heval be neynika dil pak bidêr

Da temamen roj di mirata[1082] dilê te ket ṭuhûr[1083]

**42.**

---

[1071] **Arê qetanê**: Agirê cudabûnê, şewata firqetê

[1072] **Pureng**: Pereng, bîzot, pol, kozir, pêta êgir

[1073] **Xar vekirin**: (Agirê) temirandin, vemirandin, tefandin

[1074] **Ḥerîq**: Şewitî

[1075] **Ṭûr**: Çiyayê Tûrê an jî Tûrê Sîna. Hz. Mûsa bi Xwedê re li wî çiyayê xeber daye. Ji ber vê yekê Hz. Mûsa sifata “Kelîm”ê hildaye. Gava ku nûra Xwedê li çiyayê diyar dibû, çiya perçe perçe dibû. Di tesewufê de çiyayê Tûrê maddiyatê însên nîşan dide. Gava ku nûra Xwedê li vir diyar dibe ev maddiyat wenda dibe. (H.)

[1076] **Qubûr**: Gor, qebr. Li vir bi wateya bêqîmetbûn, bênirxbûnê e.

[1077] **Surûr**: Kêf, şahî, şadî

[1078] **ʿIşk û mişk**: Li vir dubarekirina peyvan heye, wekî dar û ber, şox û şengê

[1079] **Futûr**: Sist, sistî, livok

[1080] **Meṣder**: Çavkanî

[1081] **Xinc key**: Qet qetî kirin, ker kerî kirin

[1082] **Mirat**: Neynîk

[1083] **Ṭuhûr**: Diyarbûn, xuyabûn

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Baġ û bustan û çiya û mêrg û deşt têk ṣorgul in

Bulbul û şalûl[1084] û goyîn[1085] lewr*a* mane bê ḥużûr

2.

Rûpera herdu cihanan tercuma ḥalê te ye

Çer mirov kare bixûne van r*ê*zê zav[1086] hûrehûr

3.

Lewr*a* hey ʿarif dibêjit nas nekir min kunh*a* ẕat[1087]

Çer digêjit çêkerê kewn[1088] ʿeql*ê* têk ḍeʿf[1089] û quṣûr

4.

ʿUmr*ê* bengî têk buhûrî carekî dilber nedî

Roj û şev lewra dinale bê hedan[1090] û bê hedûr[1091]

5.

Cerg diqijin can dipijin ah û wah çûne felek[1092]

Îr ḥemen ya Reb leqed qade`l-keîbû en yebûr[1093]

6.

Agirê ʿişqê Xudêyo! cism û mîlak peritand

Ṣebr û ṭaqet me nema xanim[1094] xuya naket li Ṭûr

7.

Beḥr*a* ʿişqê pêl didit ya Reb ji bayê rojhelat

Tar*î* ye baran dibare bêbin e deryak*ê* kûr

8.

Xendiqandin nêz b*û*ye nîne me ra bil te umîd

Dest dirêj key me reha key[1095] minke ʿewnî ya Ġeyûr[1096]

---

1084 **Şalûl**: Mînanî bilbilê teyrekî dengxweş e.

1085 **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.

1086 **Zav**: Zehf, gelek, pir

1087 **Kunha ẕat**: Heqîqeta Xwedê

1088 **Çêkerê kewn**: Afirînerê ‘alemê, çêkerê gerdûnê, ango Xwedê

1089 **Ḍeʿf**: Zeîf, jar, qels

1090 **Hedan**: Aram, sebr, tebat

1091 **Hedûr**: Hedan, aram

1092 **Felek**: Asîman, çerx

1093 Rehmê bike ya Reb, nêzîke ku dil li êşê helak bibe.

1094 **Xanim**: Dîlber, evîn

1095 **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike

9.

Mest û jar im ist*û*xar im, çar*a* bêçaran tu yî

Can bi êş im xûn dirijim, tim dibêjim ya Şebûr[1097]

10.

Şebr*ê* bid me ya reha key me ji vî derdê giran

Kan*a*[1098] dermanan li cem te`y ji birînan xûn difûr

11.

Jar û gêj im xûn dirêjim, dilqirêj im bê mukûn[1099]

Pur b*ê*zar î reḥm*ê*xaz im, navnig im her weku mûr

12.

Bêhn*a* misk û mawerî tête ji biskê te`y şerîf[1100]

Can birîn im dilbixûn im, ma dibînim can bilûr

13.

Dilkul û jar û belengaz, mest*ê* cama[1101] ʿişq*ê* me

Qimekê min jê vexarî ʿumr*ê* borî pur surûr[1102]

14.

Lal û dîn im cerg birîn im, pur evîn im ruḥ nexweş

Dil şewitî can peritî, yar li bengî key murûr[1103]

15.

Ah*î*nê me çûn felek hatin ji ezmanan melek

Rakirin ceng[1104] bê şer û deng bûn di dil da wek şuqûr[1105]

16.

Ey **Ḥezînê** dilkulê jar, pur mekey ah û fiġan

Pê şeva tarî dibêjim tête daîm şubḥ [1106] û nûr

17.

Zêr dibit şade eger agir nebit ḥellîn nebit?

Bê cefayê kî şefayê dib*î*nit yan jî ḥużûr?

---

1096 **Mînke ʿewnî ya Ġeyûr**: Ya Xebûr alîkarî ji te ye.
1097 **Ya Şebûr**: Yek ji navên Xwedê ye. Yê ku sebr dike, gelek bitebat, yê ku cezayan paşde davêje.
1098 **Kan**: Çavkanî, kûrik
1099 **Mukûn**: Derfet, biwar, mefer, îmkan
1100 **Şerîf**: Pîroz, biqîmet, birûmet
1101 **Cam**: Mey, şerab
1102 **Surûr**: Kêf, şahî, şadî
1103 **Murûr**: Gîhandin, gîhîştin
1104 **Ceng**: Şer
1105 **Şuqûr**: Seqer, yek ji wan tebeqeyên dojehê ye.
1106 **Şubḥ**: Sibe

**43.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Dilber ji burcê hate der ya Reb çi ḥusnek[1107] bû li ser

ʿAlem hemî têk nûr*î* bû hilbû ji afaqan[1108] qemer[1109]

2.

Der[1110] ʿalema ḥusnê ku rûniştî li textê selṭenet

Ṣaḥib cemalê noqzirav[1111] hatin ziyaret dest li ber

3.

ʿEksa[1112] cemala dilberê hate bi derve`j pencerê

Dilber û rindê ʿalemê êdî nema wan ra huner

4.

Yek ţîr*ê*jek nûra zelal daye di qelban da şemal[1113]

Hilkir di qelbê bengîyan arek*î*[1114] wek arê seqer[1115]

5.

Yek piçekî raza cemal[1116] bû, sosin û gul da xuya

Lew bulbulan tim nal*î*ne, der baġ û gulzar qal û şer[1117]

6.

Dilê ku tê ew nûr heye herdu cihanan da ye saġ

Tev bulbulan nêv ṣorgulan ḥetta ebed wê ye meqer[1118]

7.

Ṣaḥib evîna ẕû`l-celal[1119] her dem di nêv werdan[1120] e ew

Xweş xweş digêjit meqṣedê bê renc[1121] û mayîn û keder

---

1107 **Ḥusn**: Bedewî, rindî
1108 **Afaq**: Asmîn, aso, bergeh
1109 **Qemer**: Hîv, heyv
1110 **Der**: Di zimanê farisiyê de li berdêla daçeka "di...de" ya kurdî ye.
1111 **Noqzirav**: Piştzirav
1112 ʿ**Eks**: Şewqvedan
1113 **Şemal**: Rewnaq, ronahî
1114 **Ar**: Agir
1115 **Seqer**: Dojeh, yek ji wan tebeqeyên cehenemê ye
1116 **Raza cemal**: Sirra rindahiya Xwedê
1117 **Qal û şer**: Qal û qîl, gengeşî, bi devkî şer kirin
1118 **Meqer**: Xwedan cih û mekan
1119 **Ẕû`l-celal**: Xwediyê mezinahiyê, xwedan 'ezamet
1120 **Werd**: Gul

8.

Dilê ku tê ew nûr nebit, bê jîn û şahî ye mudam

Herçî heyata ew diket tewş û heba û bê s̱emer[1122]

9.

Çawa merovê tarîrew[1123] xweş xweş digêjit meqṣedê

Yan korekî bê dest(i)keş[1124] çawa dinasit rê ji der

10.

Yan pur nezanê bêtemîz ger wî muʿerrifek[1125] nebit

Çawa dizanit xar[1126] ji gul, kengê dinasit dur ji ber[1127]

11.

Evîn*a* żatê ẕû`l-celal xweş dest(i)keş û rehber e

Dilê ku tê ḥub[1128] nebitin sêva w*î* nayêtin ji dar

12.

Bê nûr*a* ʿişqê ey heval cehd[1129] û cihad têtin ʿebes[1130]

Bê kimy*a*ya meḥbet*ê* herçî riy*a*ḍat[1131] der heder[1132]

13.

Herçî **Ḥezîn** der ʿalemê xweş nuktekî[1133] beyan kirî

Ger wî muḥebbet neb*û*na, nîne ji wî ra ev qeder

14.

Ava ḥeyat û şerbetek ṣade digel xemra[1134] ḥelal

Di şiʿr û elfaẓê[1135] **Ḥezîn** xweş xweş dibilqê tête der

**44.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

---

[1121] **Renc**: Zehmet, tengasî

[1122] **S̱emer**: Fêkî, mêwî. Li vir bi wateya "bêkêr, bêfeyde" ye.

[1123] **Merovê tarîrew**: Ew mirovê ku di tariyê de bêrêber diçe.

[1124] **Dest(i)keş**: Destyar, destegir, rêber, rêzan

[1125] **Muʿerrif**: Mamoste, fêrmend

[1126] **Xar**: Stirî, dirî, sinc

[1127] **Ber**: Kevir, kuç

[1128] **Ḥub**: Evîn, hezkirin

[1129] **Cehd**: Xebat, şixul

[1130] ʿ**Ebes**: Vale, beyhûde, bêkêr, beredayî

[1131] **Riyaḍat**: Ezîyet dîtin, çîlekeşî

[1132] **Der heder**: Diçe boşê, vala ye, 'ebes.

[1133] **Nukte**: Xal, nuqte; mijar, babet

[1134] **Xemr**: Mey, şerab

[1135] **Elfaẓ**: Pirjimariya "lefz"ê ye. Lefz, bêje, peyv

1.

Ma gelo ev agirê Mûsa ye hilbûye li Ṭûr

Yan ku ba bû rakirî pêçek[1136] ji roja rûy*ê* yar

2.

Ma gelo ev dar*a* serwî[1137] ye ş*î*rîn rabûye ya

Xişr xuşîn[1138] û dilrevîn û gulb*a*rîna bejn*a* yar

3.

Ma gelo sêv e di nêv belgan d*a* va ṣor û sipî

Yan di nêva bisk û poşîyan[1139] xuya bû dêm*ê*[1140] yar

4.

Ma gelo hîv û sitêr in wan p*o*rê rûgeş û xweş

Yan n*î*şan û şan û burhên di semaya rûy*ê* yar

5.

Ma gelo ev nesr*î*n û sosin û rîḥan û gul in

Ya guhar û bazin û gustîl*ê* guh û dest*ê* yar

6.

Ma gelo çilkê xunavê ne li ser belgê gulan

Yan ku xoydan e dizêtin ji d*ê*mê durbar*î* yar[1141]

7.

Ma gelo ev şekker e yan hingiv e yan şerbet e

Yan zulal[1142] e tê li pey hev ji delavê lêv*ê* yar

8.

Dery*a*ya têk cewher e yan kan[1143] e têk yaqût *û* dur

Yan ji bo ʿalem reha bit[1144] gotin û şîret*ê* yar

9.

Ma gelo helma ʿÎsa[1145] ye van nexweşan xweş diket

---

1136 **Pêçek**: Perdeya ser rûyê dilber

1137 **Serwî**: Dara selwa, selwî jî tê gotin. Dareke dirêj û zirav e. Mebest ji wê ziravî û dirêjiya darê, bejn û bala dîlberê ye, bedewiya wê ye.

1138 **Xişr xuşîn**: Dengê ku bi hejandina bayê ye ku ji daran der tê.

1139 **Poşî**: Laçikê reş, xavik, şar. Rengê poşiyan bi piranî reş in.

1140 **Dêm**: Rû, sîma, sûret

1141 **Dêmê durrbarî yar**: Rûyê yarê yê wekî mirwariyan dibiriqe û geş e. Li vir xwêdana yarê dişibîne durran. Lewra li gor bengî her niqutên xwêdana yarê mînanî durran e.

1142 **Zulal**: Navê kurmekî ye ku li berpalên çiyayên bilind, binê berfê de çêdibe. Kurmikên berfê jî dibêjin. Qasî tilîkî mirovan mezin dibin. Di hundirê wan kurmikan de av heye ku ew av gelek şîrîn û xweş e. Li vir mebest ji zulalê ew ava xweş e.

1143 **Kan**: Cihên ku maden tê derxistin, çavkaniya madenê

1144 **Reha bit**: Xilas be, rizgar be

Yan ku ruḥ e hatiye şandin ji baġê emr*ê* yar

10.

Ji xewê rabe binêre kûrekûr ser ʿalemê

Bi şifatê xu xuyaye serteser ʿalem d*a* yar

11.

Ne ku ʿewrek heye lêkin girtîye qelban qirêj

Lew xuya naket di wan da sî û resm û nûr*a* yar

12.

Ey heval û hogirê min bo Xudê hêvî bikin

Da **Ḥezînê** dilbirîn ra bit neṣîb dîtin*a* yar

**45.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Behara reng*î*nî hat lez were dilber bes e dilber

Çiyay derdan ji dil rakey mekey tosin[1146] *zû* ke dilber

2.

Di baġan da gul û bulbul b*û*ne cot ma ḥeta kengê

Dikey serkeşîyê, bes key cefayê dûr mebe dilber

3.

Bi hêvîya gihana te dike jînê dilê pur xûn

Demek pursê li ḥalê me bikey cana, mekey dilber

4.

Ji ber derdê evîna te b*û*me wek hîv*a* yekşevîn[1147]

Li jaran û belengazan bikey carî neẓer dilber

5.

Li ser pişta evîna wek cehennem dard*a* maye dil

Bi çangulê[1148] serê biska te ya nazik, eman dilber

6.

[1145] **Helma ʿÎsa**: Hz ʻÎsa jî gelek mûcîze nîşan daye. Yek ji wan jî ew bû ku Hz. ʻÎsa bi hêlma xwe nexweşan baş dikir, miriyan ji gorê radikir, çavê koran baş dikir.

[1146] **Tosin**: Serkêşî, bêîtaetî

[1147] **Hîva yekşevîn**: Hîva ku nû çêdibe, wekî dasê zirav e

[1148] **Çangul**: Çengal, mebest jê xelekên keziyê dilberê ne

Zimanê pêtîya hecrê şewat pê xist qijîn pê ket

Bi ava weşl*a*[1149] xu xar vebikey[1150] agir*ê* dil dilber

7.

Wekî bayê şeba[1151] sekn û şebat nîne me ra cana

Ji ber derdê qetanê[1152] hatîye birrîn hedan[1153] dilber

8.

Wekî goyîn*ê*[1154] ser şax û zinaran hey me nalîne

Dikin xarê wekî ʿewrê beharê hêstiran dilber

9.

Digel ahan wekî volkan[1155] ji dil tê agir û dûman

Ji ber ṭîna evînê bû dilê rojreş pureng[1156] dilber

10.

Mekey cana were êdî kula bengî bikey hêdî

Şewitîn em şewitîn em, şewitîn em bes e dilber

11.

Bi çavê şefqetê carek binêre bo Xudê xanim[1157]

Birîndar im birîndar im, birîndar im hewar dilber

12.

Tu dixtor î were ser me, hîna birîna kûr germ e

Xerabḥal im xerabḥal im, xerabḥal im were dilber

13.

Ji dêman[1158] perdeyan rakey bi dîtinê dilan şa key

D*î*n û dûr im d*î*n û dûr im, d*î*n û dûr im ji te dilber

14.

Ji bo dêmê te yê sêvîn[1159] me rê kir band*ê*[1160] û axret[1161]

---

[1149] **Weşl**: Gihan, gihîştin, gihîştina dilberê

[1150] **Xar vebikey**: (Agirê) bitefîne, vemirîne, bitemirîne

[1151] **Bayê şeba**: Bayê ku ji hêla rojhilatê tê. Bayekî hênik û her tim tê. Ji ber ku bayê seba her tim diçe û tê, bê sekn û bê sebat e, lewra dilê bengî jî dişibe bayê sebayê. (Pala, *b.n.,* r. 383.)

[1152] **Derdê qetanê**: Derdê cudabûnê, êşa fîrqetê, jana veqetînê

[1153] **Hedan**: Aram, sebr, tebat

[1154] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.

[1155] **Volkan**: Çiyayên ku carna diteqin û gava diteqin jî gokên êgir û lawan dipekînin derûdorê xwe.

[1156] **Pureng**: Pereng, bîzot, pol, kozir

[1157] **Xanim**: Dilber, evîn, xoşewîst, yar

[1158] **Dêm**: Rû, sîma, sûret, tefeş

[1159] **Sêvîn**: Wekî sêva sor, gewez, gelek sor

[1160] **Band**: Dinya. Bêjeyekî kurdî ye û dîsa kurmancî biwêjekî wiha jî heye: Îro bandê ye, sibê axret!

Giriftar[1162] im giriftar im, giriftar im bi te dilber

15.

Li jarê dil bi şîşa ʿeşq*ê* dax[1163] bûye bikey pursê

Elemdar im elemdar im, elemdar im ji dil dilber

16.

Şev û rojan wekî avan xewa şîrîn neket çavan

H*î*na xort im b*û*me kovan ji derdê ʿeşq*a* te dilber

17.

Ji kovana[1164] te şîrînê[1165] peyapey tê wekî xûnê

Ji çavê ʿaşiqan ê jar dilopê hêstiran dilber

18.

ʿUmur borî b*û*me ax û x*a*lî bona gihana te

Were reḥmê bibir xeşmê[1166] zemanek tev me be dilber

19.

**Ḥezîn** im dil birîn im, bo gihana te bi nalîn im

Li jaran û belengazê derê xu purs bikey dilber

**46.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Furatên[1167] ġem li min wer bûn, li kohê dil[1168] birîn der bûn

J*ê*r û jor da *hîs*kek[1169] hilbûn, gelî yaran ġerîq[1170] im ez

2.

Cuyûş[1171] û leşkerê derdan, hucûmek zor li ser dil dan

Liwaya[1172] ṣor pê ra hildan, gelî yaran weḥîd[1173] im ez

---

[1161] **Rê kir bandê û axret**: Bandê û axretê (ji bo tiştekî/kesekî) rêkirin. Biwêjeke kurdî ye ku bi wateya; her tiştê xwe ji bo tiştekî/kesekî fedakirin e.

[1162] **Giriftar**: Dildayî, dilketî, dilbestî

[1163] **Dax**: Birîna ku bi hesinê sorkirî tê çêkirin.

[1164] **Kovan**: Xemgînî, kerb, keser

[1165] **Şîrînê**: Ey şîrîn. Li vir banglêkirina dilberê heye.

[1166] **Xeşm**: Xezeb, xişim, hêrs

[1167] **Furat**: Çemê Feratê.

[1168] **Kohê dil**: Çiyayê dil.

[1169] **Hîsk**: Ew dengê ku gava mirov di nav avê de noq bibe û derkeve, jê der tê. Îske îsk, îsk

[1170] **Ġerîq**: Ew kesê ku xeniqî ye, xeniqandin

[1171] **Cuyûş**: Leşker

3.

Kirim nîşan*a* mizraqan reşandin tîr wekî baran

Hewar û ṣed hewar îro, gelî yaran ḥezîn[1174] im ez

4.

Seraya dil helavêtin nuqûdê[1175] wî hemî girtin

Jar û bêkes û wenda me, gelî yaran feqîr im ez

5.

Bazirgan çû tenê mame di vê rê da kulek[1176] û kor

Diqîrim ez dinalim ez, gelî yaran tenê me ez

6.

Seraser ʿalema jînam[1177] bi tarîk[1178] û bi dûman e

Di ser da dilkul û dîn im, gelî dostan keîb[1179] im ez

7.

Pêlapêl lehîya derdan bi kendê[1180] dil ve wer tîne

Hemî goncan û xaşakan,[1181] gelî yaran qetîl im ez

8.

Li ser me ṭeng b*û*ye dunya *roḥ*nîka roj*ê* bû tarî

Li hev ket ʿalema necman,[1182] gelî yaran r*ê* wenda m`ez

9.

Hemî deşt û çîya û lat[1183] bi qîrîn û bi gîrîn in

Hejîn ket ʿalema qadê, gelî yaran bi tirs im ez

10.

Deqeqtû babekum[1184] ḥetta şikayet kir ji min destan

Vekin derî vekin derî, gelî dostan **Ḥezîn** im ez

**47.**

---

[1172] **Liwaya sor**: Ala sor
[1173] **Weḥîd**: Bi serê xwe, tenê
[1174] **Ḥezîn**: Xemgîn, melûl
[1175] **Nuqûd**: Dirav, pere
[1176] **Kulek**: Leng, şaht
[1177] **Jînam**: Jîna min, heyata min
[1178] **Tarîk**: Tarî, bi mij û dûman
[1179] **Keîb**: Şewitî, sotî
[1180] **Kend**: Kendal, berpala çiyê yê tîk
[1181] **Goncan û xaşak**: Dar, kevir û qirşikên, qirm û qalên li ber lehî/lêmiştê kaş dibe tê.
[1182] **Necm**: Stêrk
[1183] **Lat**: Kevirên mezin, zinar, baxir
[1184] **Deqeqtû babekum**: Dêri dixim

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Rabe dilo xew da nemîn firṣet diborit pur bilez

Hîna heye çare te ra dest xu bixe yara gewez

2.

Bo gîştina yara berîn[1185] feda ke can û mal û mulk

Sernerm*ê* fermana w*ê* be tiştê dixazit lê bibez

3.

Bişkêne zencîra dunê suwar be`l hespa ev*î*nê

Bilind ke destê zar*î*nê qayîlb*û*na dostê bixaz

4.

Yek aferînek yar*ê* hêja ye hemî malê dunê

Tek rûkenînkê dilberê hêja ye ṣed zozan û rez

5.

Dilê b*û*ye neynik*a* cilwa yar*ê* pîroz e mudam[1186]

Salar[1187] û sulṭanê dunê dibin li cem wek ga û pez

6.

Bo gîştina yarê divêt hey tu nimizḥal[1188] bî dilo

Çiqas bibî giranbeha bibêje beyhûde me ez

7.

Meʿden ji bo ku xalî ye veşartîye bê deng û beḥs

Ji zar*o*kê bûka dunê ra, bûye dêkî[1189] pur bi naz

8.

Delav ji bo nimzin[1190] dilo bûne c*û*hê[1191] avê zelal

Ji bo ku ev berjêr diçin jîna dunê ra bûne raz[1192]

9.

Gerçî ji ʿirfanê bibî derya, nebîne xu dilo

Ji bo gihana hîvr*û*yan divêt te ra her dem niyaz[1193]

---

[1185] **Yara berîn**: Yara ezelî, dilbera berê. Mebest jê Xweda ye.
[1186] **Mudam**: Her tim, her dem
[1187] **Salar**: Serok, serek, pêşeng
[1188] **Nimizhal**: Nefsbiçûk, dilnizm
[1189] **Dêkî**: Dayikekî
[1190] **Nimizn**: Nizm
[1191] **Cûh**: Co, cew, cihê av tê re diçe
[1192] **Raz**: Sir, xef, nepenî, nehênî

10.

Ji bo ku sêv nîşan didit rûyê xu yê ṣor û sipî

Hêj ku nedîtîye kemal lê dikevit birîn û gez

11.

Sirra dilan nîşan mede ji bo nebînî zeḥmetan

Têtin kişandin neyn*û*kê belakerê razan bi gaz[1194]

12.

Ḥetta ku kew qebqeb[1195] neket li ser zinaran û çiyan

Beyhûde nabit nêç*î*ra penctûnc*î*nê[1196] şahîn û baz

13.

Ji ʿewr*ê* luṭfa sermedî[1197] dilopeke baran divêt

Bigije insanê nezan da ku bibitin serfiraz

14.

Yan ne nikarit wek **Ḥezîn** veşare sirra sermedî

Li ʿalemê bela diket razan wekî zurne û saz

**48.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Dil ji dest me çû delalê were lez

Hatme ser kendê[1198] newalê were lez

2.

Hirrifî kend tişt nema way gîşte min

Nêz e wer bim dilesarê were lez

3.

Lehî ye, birçîy*ê* xûna bengî[1199] ye

Weku aşît[1200] têde xarê were lez

4.

---

[1193] **Niyaz**: Dua, lava
[1194] **Gaz**: Çiyayên biçûk û bêdar
[1195] **Qebqeb**: Dengê ku ji kewan der tê
[1196] **Penctûncîn**: Pencên wekî me'dena tûncê (misê zer) hişk û zexm.
[1197] **Sermedî**: Tiştê ku dawiya wê tune ye, bêdawî, ebedî
[1198] **Kend**: Berpala çiyê yê tîk, kendal, dûlêr, hendef, terîş
[1199] **Bengî**: Evîndar, dilketî, 'aşiq
[1200] **Aşît**: Şape

Radikey çaman[1201] û gûzan ji rîçik[1202]

Gêr dikey[1203] lat[1204] û zinaran were lez

5.

Bay*ê* pêlan çerm*ê* ʿenyê radike

Hey hewar qebtan*ê* derya were lez

6.

Gumm*î*na jê tê wekî ʿewrê behar

Yek yekê çilkan birûsk e were lez

7.

Wek cehennem ûff*î*n û kûffîn dike

Kend*ê* baġir[1205] tîne xarê were lez

8.

Weyl û ġeyyê[1206] bid*î*na va menẓera

Di zuhabûna ji tirsan were lez

9.

Av*a* hicran û evînê bûne yek

Nêv d*a* mame bê hewarî were lez

10.

Ketime nêva du żiddan el-eman[1207]

Şaş b*û*me mame delalê were lez

11.

Me bi ṣed zencîr*ê* dikşîne evîn

Bal te ve ey yar*a* dilbêş[1208] were lez

12.

Lêbelê tirsa ç*û*yîna can û dil

Nah*ê*lit em herne pêş da were lez

13.

Pur giran e derd*ê* me ey can*ê* can

---

[1201] **Çam**: Dara çamê, qaj

[1202] **Rîçik**: Reh, kok

[1203] **Gêr kirin**: Qulipandin

[1204] **Lat**: Zinar, baxir, kevirên mezin

[1205] **Baġir**: Lat, zinar

[1206] **Weyl û ġey**: Navê du newalanên dojehê ne. Di vê malikê de jî dibêje: Ey Yar de zû were! Di dîtina vê dîmena newalên dojehê de mirov ji tirsan zuha dibe.

[1207] **El-eman**: Hawar, alîkarî

[1208] **Dilbêş**: Xwedan şefqet, dilovan

Pişt*a* me hûr bû di bin da were lez

14.

Bil te nîne bo me kes feryadires[1209]

Tu tenê hêvî y*î* bo me were lez

15.

Dest me rakirye li henber reḥma te

Purs bikey carî li jaran were lez

16.

Dil peritî can şewitî bû xalî

Jan*a* wey bav[1210] em ḥelandin were lez

17.

Çar*a* bê çaran tu yî ey nazenîn

Pur **Ḥezîn** im, dil birîn im were lez

**49.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + −

1.

Dil dinale boy delalê şev û roj

Bê ḥuzûr û bê hedan[1211] e şev û roj

2.

Rûgeşa ʿerʿerbeden[1212] dûr ket ji dil

Lew bi ah û wah û jar e şev û roj

3.

Dest*ê* dostê da ye gula jîn*a* dil

Lewr*a* bal ve ist*û*xar e şev û roj

4.

Ruḥ*ê* wî yar e di gulzara wucûd

Lew bi wê tim bendewar e şev û roj

5.

Dûr kevit bîstek[1213] ji yarê can didit

---

[1209] **Feryadires**: Alîkar, destegîr, destekêş
[1210] **Wey bav**: Baneşaneke kurdî ye ku şaşbûn û ‘ecêbmayîn der dibe. Wey bavo!
[1211] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[1212] ʿ**Er**ʿ**erbeden**: Bedenê ku mînanî dara ‘er‘er/serwiyê zirav û dirêj, bi bejn û bal

Lew bi wê ra hey heval e şev û roj

6.

Dil wekî masî ye yar her weke av

Qeṭ nikarit jê cuda bit şev û roj

7.

Yar*a* dil nûrek zelal e lewr*a* wek

Sîperan[1214] dorê digerrit şev û roj

8.

Wer nebit sîper di agir can nedit

Nabitin jê ra hedanek şev û roj

9.

Qelbê bengî ger nebit fanî bi dost

Bê wefa û bê qerar e şev û roj

10.

Çîk*a* ʿeşqê dil dikoje tim û tim

Lewr*a* wek çûkan diçîkî şev û roj

11.

Agirê ʿişqê di bin da hilb*û*ye

Lew dibilqê weke dîzan şev û roj

12.

Derd*ê* dil, yar û diyarê eṣl*î*[1215] ye

Lew dinale wek pepûkan şev û roj

13.

Jan*a* dil janek giran e lewr*a* hey

Weku mar lîf dide[1216] serhev şev û roj

14.

Qeṣd*a* dil deryay*a* ʿirfanê[1217] ye lew

Wekî avan hey dirêjit şev û roj

15.

Ji gulistana wucûdê dil ġered[1218]

---

[1213] **Bîstek**: Gavek, demeke kin

[1214] **Sîper**: Minminîk, pirpirok, baperik

[1215] **Yar û diyarê eṣlî**: Yara eslî Xudê ye, diyara eslî jî ʻerşa Wî ye. (Dîwana Hezîn, r. 113)

[1216] **Lîf dide**: Xwe pêçandin, ser hevde alandin

[1217] **ʿIrfan**: Zanîn û naskirina Xwedê

Yek gulek taze dimînit şev û roj

16.

Ya ne,[1219] nehêja ye şînê bike dil

Bon*a* tiştê tê guhertin şev û roj

17.

Dil girêdayî bi fanî wek ker e

Dixebite boy zikê xu şev û roj

18.

Ger tu insanî bikey karê bilind

Da nebî beyhûde barkeş şev û roj

19.

Tev li kerwankî mezin rê girt û çûn

Bê hedan û xew û raḥet şev û roj

20.

Rê me wenda kir ketin çolek zuha

Wek g*ê*jan geryan li dor hev şev û roj

21.

Çar *a*wirê[1220] me b*û* mij û bû d*û*man

Nediqetya ji hev û dîn[1221] şev û roj

22.

Toz û bayê germ emana me birî

Tim hewayek bû li ser me şev û roj

23.

Bil ji feryad û fiġanan nedihat

Ji dilê kerwan*ê* reşbext[1222] şev û roj

24.

Gîr*î*n û zarîn b*û* karê wan mudam

Lor*î*n û şîn bû *î*şê wan şev û roj

25.

Weku sêwyan dest*ê* wan ket paşilê

---

1218 **Ġered**: Mebest, armanc

1219 **Ya ne**: An, yan, yan na

1220 **Çar awir**: Çar alî, çar teref

1221 **Hev û dîn**: Hev û du

1222 **Reşbext**: Bedbext, bextê reş û xerab

Sinb*é*lê wan çûn di dev wan şev û roj

26.

Zîllikek[1223] ber çav*ê* wan bû, wekî çam

Gonîyek[1224] bû, wekî gazek şev û roj

27.

Girekî bû, wekî koşka Nînewa[1225]

Kevirek bû wekî ehram[1226] şev û roj

28.

Serteser ecram[1227] li henber çav*ê* wan

Tev li leylanê[1228] dihejya şev û roj

29.

Me digot êdî qiyamet rabûye

Lew dihejit qad û ezman şev û roj

30.

Saniye bû saʿet û saʿet bû ṣal

Mat bûn û man li cihê xu şev û roj

31.

"We tere`n-nase sukara"[1229] bû xuya

Wekî neynik bû li ber me şev û roj

32.

Roj veda bû ron*í* nişkiv çû d*û*man

Bû xuya hîva umîdê şev û roj

33.

---

[1223] **Zîl**: Aj, ajda, filîz, tirh

[1224] **Gonî**: Geven

[1225] **Nînewa**: Nînowa. Bajarekî nêzîkî Misil ê ye. Hz. Yûnis ji bo gelê wê derê wek pêxember hatiye şandin. Nînowa, bi destê sen'eta mirovan tê zanîn û namdar e.

[1226] **Ehram**: Navê gorên Fir'ewnan in ku wekî pîramîdan hatine avakirin. Hinek ji wan sed û pêncî mîtro bilind in.

[1227] **Ecram**: Guneh

[1228] **Leylan**: Rewrewk, revrevik, serab

[1229] Tu dibînî, mirov hemî serxweş in.
Îşareta van ayetan dike:

**(يَوْمَ تَرَوْنَهَا تَذْهَلُ كُلُّ مُرْضِعَةٍ عَمَّا أَرْضَعَتْ وَتَضَعُ كُلُّ ذَاتِ حَمْلٍ حَمْلَهَا وَتَرَى النَّاسَ سُكَارَى وَمَا هُم بِسُكَارَى وَلَكِنَّ عَذَابَ اللَّهِ شَدِيدٌ)**

Gelî mirovan! Xwe ji (ezabê) Xwedayê xwe biparêzin! Bêguman erdheja roja qiyametê bûyereke mezin e. Roja ku hûn wê (erdhejê) bibînin, her dayîka şîrdar ji şîrmija xwe bêhay dibe û her jina li halekî berê xwe diavêje. Tu mirovan dibînî ku serxweş in. Ew ne serxweş in, lê belê ezabê Xwedê pir dijwar e? (Hec: 22/1-2)

Dil ji şahîyan b*û* wek bulbul û lîst

Henberê bûka muradê şev û roj

34.

Ew şevê tarîyê derdan çûn şukur

Em dijendin wekî penbo şev û roj

35.

Lêbelê çiqas bilind bû roj b*û* germ

Germekî wer ned*î*tibû şev û roj

36.

Ṭîr*ê*jê rojê wekî şîşê di ṣor

Daġ dikir canê perîşan şev û roj

37.

Ba wekî pêtîy*a* agir bû diṣot

Tişt*ê* bigîştay*ê* wek merx[1230] şev û roj

38.

Her kevirek bû wekî ku ṣaw*î*kî[1231]

Ne dibû kêm ṭîn*a*[1232] tê da şev û roj

39.

Duny*a* bû wek at*û*nek[1233] ṣoġîn[1234] me ra

Dişewitîn tê d*a* her em şev û roj

40.

Wekî Mûsa man di teyha[1235] ḥeyretê

Tim li şûnek man û geryan şev û roj

41.

Bak*î*[1236] hûnik hat kezeb hêdî kirî

Em reha bûn[1237] ji şewata şev û roj

42.

Hêvîya xelaṣ*ê* xweş bû, bû xuya

Na umîdê dûr b*û* dîsa şev û roj

---

[1230] **Merx**: Dara merxê. Dareke wekî çamê ye, her dem heşîn e lê bejna wê ji çamê biçûktir e. Ardiç.
[1231] **Ṣaw**: Bîzotê êgir, pola êgir
[1232] **Ṭîn**: Germ, germahî
[1233] **Atûn**: Ocax, argûn, firin
[1234] **Ṣoġîn**: Dawî, encam, netîce
[1235] **Teyh**: Çol, çolistan
[1236] **Bakî**: Bayekî
[1237] **Reha bûn**: Xilas bûn, rizgar bûn

43.

Pê r*a* baranek wekî ava ḥeyat

Çilk*a* çilk barî li ser me şev û roj

44.

Pur neçûn dîsa b*û* ṭav û bû d*û*man

Heyl û meded[1238] kete nav me şev û roj

45.

Ji tihan agir bi dil ket bû pureng[1239]

Cerg û mîlak[1240] herdu qijyan şev û roj

46.

Ji tihan can hatibû ser lêv û poz

Nêz dibûn bal mirinê ve şev û roj

47.

Boy dilopek av me qurban di*kir* can

Kar*ê* me bû ah û zarî şev û roj

48.

Nag*î*han[1241] dûr ve xuya bû çemekî

Ji Xuda hêvî me ew bû şev û roj

49.

Wek deveha[1242] tî, me êrîş kir û çûn

Bal murada me dixastî şev û roj

50.

Em çiqas çûn çem ji me dûr ket û çû

Hêvîy û bêhêv*î* bûn wek şev û roj

51.

Wek sitêr û roj dibûn peyda me ra

Yek diçe yê dî xuyaye şev û roj

52.

Tu n*a*bey ew çem serab e ne şerab

Ev e ḥalê me û dunyay şev û roj

---

1238 **Heyl û meded**: Hawar, alîkarî

1239 **Pureng**: Pêt, pol, kozir, pêta êgir

1240 **Mîlak**: Cerg, ceger, kezeb

1241 **Nagîhan**: Ji nişka ve

1242 **Deveh**: Deve, hêştir

53.

Geh dikenne geh digîre ji me ra

Kar*ê* wê xapandin e her şev û roj

54.

Bi muradan şad dike carî dilan

Car*î* dî ġemgîn dike wan şev û roj

55.

Wek jina qehpe n*î*ne jê ra qerar[1243]

Diguhêze[1244] dost û yaran şev û roj

56.

Gir dike mezin dike dostê xu lê

Dû r*a* pînê lê dixînit şev û roj

57.

Digijîne yar*ê* xu dara murad

Pişt*î* dînê dûr dixîne şev û roj

58.

Deq*î*qekî da dide xu ṣed çivî[1245]

Şahîya wê lewr*a* şîn e şev û roj

59.

Bê cefa nîne ji wê ra tu ṣefa

Gul*a* wê her isturîn e şev û roj

60.

Wek Bekoyan[1246] kar*ê* wê şeyṭanî ye

Yar ji yaran dûr dixîne şev û roj

61.

Bi hezaran nazenîn û nazikan

Bal mirin ve dişîne şev û roj

62.

Jîn*a* tê da derd û êş û reḥmet e

Lew **Ḥezîn** tim dilbirîn e şev û roj

---

1243 **Qerar**: Sekn, sekinandin, tebat

1244 **Diguhêze**: Diguherîne

1245 **Çiv**: Bezîn, revîn, bazdan

1246 **Beko**: Di destana Memê Alan û mesnewiya Mem û Zînê de lehengekî sereke ye. Xulamê mîrê Botanê ye. Bi fesadiya xwe ve namdar e. Ji bo ku Mem û Zîn negihîjine hevûdû, di qesra mîr de şeytaniyê dike, fesadiya wan ji mîr re dike. Di nav gel de jî navê Beko, ji bo kesê ku fesad û ‘ewan e tê bikaranîn.

**50.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Wekî Amazon[1247] fireh û wek Misîsîpî[1248] dirêj

Qiṣṣeya[1249] jana dil û wan herdu çavê xûndirêj

2.

Nuqṭekî ṭûmar*a*[1250] ʻişqê tête *qas*[1251] Şerḥa ʿUbab[1252]

Çilkekî baran*a* ʿişqê tête wek deryay*a* gêj[1253]

3.

Pur wekî Cezrî[1254] û Miksî[1255] dane dersa metn*ê* ʿişq

Jîn*a* wan gîşte nihayet pur d*î*bace[1256] mab*û* hêj

4.

Dery*a*ya ʿişqê gir e lew bêkenar û bêbin e

Xendiqîne tê d*a* ṣed Ḥellac[1257] û Muḥyeddîn[1258] ji mêj

5.

Lêbelê nav û n*î*şanê wan ḥetta îro hene

---

[1247] **Amazon**: Di dinê de yek ji wan çêmê dirêjtirîn û firehtirîn e. Li vir ji rûberûkirinê mebest, diyarkirina mezinahiya jana dil e.

[1248] **Misîsîpî**: Dirêjtirîn çêmê bakûrê Emerîkê. Di zimanê Çermsoran de bi wateya *çemê mezin* e. Armanc ev e ku rijandina hêstiran bi wan çemê mezin ve nîşandayîn e.

[1249] **Qiṣṣe**: Qewl, hîkayet

[1250] **Ṭûmar**: Kitêbên stûr, gir û terrikî.

[1251] **Qas**: Qasî ku, qeder

[1252] **Şerḥa ʿUbab**: Navê kitêbeke ferhengê ye ku Sexxanî ew nivîsiye lê temam nekiriye. Piştî bîst cildî ew hê gihaye herfa "م : mîm" ya ʻErebî.

[1253] **Deryaya gêj**: Okyanûsa mezin

[1254] **Cezrî**: Mela Cizîrî. Navê wî Ehmed e û di sedsala XVI û XVII'an de li Cizîrê jiyaye. Di Medresa Sor de ders daye. Helbestvanekî mutesewif e. Yekem helbestvanê Kurd e ku bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî dîwaneke bi Kurdî nivîsiye. Dîwana piranî ji helbestên evînî pêk hatiye ku di mijara evînê de gelek kûr e. (Adak, *b.n.,* r. 186-210)

[1255] **Miksî**: Feqiyê Teyran. Navê wî Mihemed e û di salên navbera 1563-1641'an de li Miksê jiyaye. Li Cizîrê Melayê Cizîrê ditiye û li cem wî xwendiye. Di derheqê çîrok û serpêhatiyên tesewifî wek Şêxê Sen'anî, Bersîsê ʻAbid, Zembilfroş de menzûme nivîsandine. Her wekî Melayê Cizîrê, wî ji bandor li helbestvanên pey xwe kiriye. (Adak, *b.n.,* r. 211-219)

[1256] **Dîbace**: Pêşgotin, destpêk

[1257] **Ḥellac**: Mensûrê Hellac. Navê wî yê eslî Mensûrê kurê Hiseyn e. Di sala 858'an de Li Îranê gundê Tûrê bûye. Hêj biçûktiya xwe de ji bo xwendinê gelek bajaran geriyaye. Li ber destê Cûneydê Bexdedî xwendiye. ʻAlim û mutesewifekî mezin bû. Gelek sofî û mirîdên wî hebû. Ji ber gotina xwe ya "Enel Heq" (Ez Xwedê me), ji aliyê waliyê Bexdeyê ve di sala 922'an de li Bexdayê hatiye daleqandin. (Pala, *b.n.,* 185)

[1258] **Muḥyeddîn**: Muhyedîn Îbnî ʻErebî. ʻAlim, mutesewif û şa'ir. Di sala 1165'an de li Îspanya hatiye dinê. Hêj di biçûktiya xwe de dikeve riya terîqê. Li Endûlûs, Mekke, Medîne, Şam û Bexdayê gelek ʻalim û ehlê tesewifê nas kiriye û ders hildaye. Yek ji wan ʻaliman jî Îbnî Rûşd bû. Gelek kitêbên wî heye. Di hêla tesewifê de bandorek mezin mutesewifên piştî wî hatine, kiriye. Di sala 1239'an de li Şamê wefat kiriye.

Lewr*a* kuştîyê evînê hey dimînin geş ṭ*î*rêj

6.

Bû ṭ*î*rêjek nûr*a* ʿişqê li çiyay Mûsa xuya

Gurminî pê ket û hat xar her wekî Quran dibêj

7.

Henberê ṭîna evînê bû dilê Mûsa pureng[1259]

Lew li qadê ket wekî goyîn*ê*[1260] wî ye qîj û qîj

8.

Dûr nexîne ya Îlahî! bengîyan ji hîvr*û*yan

Bi gihanê şa *key* cana, vî **Ḥezînê** dilqirêj

**51.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Rabe ji xew nefsa teres ʿumur buhûrî ber ʿebes[1261]

Çûyîn heye veger j*î* hey ji ġefletê hîşar be bes

2.

Cuwan*î* çûye bê mefazîyan[1262] te ra ew ten*ê* bes

Dafê sipî bûne xuya dibêj h*ê*jî maye meres[1263]

3.

Eger bimînî tim weha ji dawîya xu pur bitirs

Tu çi cihê xu çêdikî bo rab*û*nê lêdxe ceres[1264]

4.

Hewar mebe ġafil dilo ʿumrek*î* bo te yek nefes

Mebe d*û*rî dostan dilo bê wan ṣefa nedye[1265] tu kes

5.

Bi bend*ê* wan ve xu bigir bendê d*î* bavêjê meqes

Şîret*ê* wan bigre bi can bibe li dor wan wek mekes[1266]

---

[1259] **Pureng**: Pereng, kozir, pola êgîr, pêta êgîr
[1260] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkeke mîna kevokê ye.
[1261] ʿ**Ebes**: Vale, beyhûde, bêkêr, bêfêde
[1262] **Mefazî**: Tiştê bêfeyde, bêkêr
[1263] **Meres**: Gîştina armancê
[1264] **Ceres**: Zengil
[1265] **Nedye**: Nedîtiye

6.

**Ḥezîn** birîndar e ji dil gelo heye feryadires?[1267]

Ey dilbera ʿîsaṣifet[1268] ser wî d*a* berde yek nefes

**52.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Vekey dilber ji dêman[1269] perde û bendan delalî bes

Nîşan de ṣûretê sêvîn[1270] ji dildaran veşarî bes

2.

Bi tîr û xencerê hecrê[1271] çima dil xinc dikey[1272] cana!

Demek nêzîk were yara dil azarî û dûrî bes

3.

Di nêva agirê ʿişqê me hey gîrîn û qîrîn e

Bikey carek li me reḥmê sitemkarî û yarî[1273] bes

4.

Ji bona gîştina te em b*û*ne hey lazimê dergah

Were carek xu nîşan de cefa û bendewarî bes

5.

Wekî sêwî û tûlan[1274] hey me çav maye di derî da

Bipirs carî li ḥalê me eẕa[1275] û ist*û*xarî bes

6.

Bi ahîn û bi kovan[1276] in, wekî bulbul delovan[1277] in

Şev û rojan bi efġan[1278] in, li yaran ev neyarî[1279] bes

---

1266 **Mekes**: Kelmêş, pêşû, mixik, mixmixk
1267 **Feryadires**: Alîkar, destegîr, rêber
1268 **Dilbera ʿîsaṣifet**: Ew dilbera ku dişibe Hz. ʻÎsayê. Hz. ʻÎsa bi hêlma xwe nexweşan baş dikir û miriyan ji gorê radikir.
1269 **Dêm**: Rû, sûret, sîma
1270 **Ṣuretê sêvîn**: Rûyê ku wekî sêvê sor û gewez
1271 **Hecr**: Cudayî, dûrketin, fîraq
1272 **Xinc dikey**: Qetqetî dike, perçe perçe dike
1273 **Yarî**: Henekî, henek kirin, laqirdî kirin
1274 **Tûle**: Kûçik, seg
1275 **Eẕa**: Qehirandin, êşandin
1276 **Kovan**: Xemgînî, kerb, keser.
1277 **Delovan**: Ew ê ku diloyan dixwîne, her tim bi xwendinê ye
1278 **Efġan**: Fîxan, nalîn, zarezar

7.

Bi lorîn û bi gîrîn in, ji janê hey dibarînin

Ji çavan hêstirê xûn in, li dildaġan kibarî bes

8.

Xerabḥal in pur êşan in, birînkûr in perîşan in

Ġulam û dîl*ê*[1280] biskan in, bi dostan êş û zarî bes

9.

**Ḥezîn** im dil birîn im, çav tijî xûn im hewarxaz im

Vekey benda x*ê*lîyê[1281] hey ji yaran perdedarî bes

10.

Birîndar im bi tîra ʿeşq*ê* can û nazenîna min

Tu dixtor î were ser me ji bengî rûveşarî bes

**53.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1.

Ey dilo bo dîtina Yûsuf divêt bo te kiras

Ji gunehan herdu çavê te giran girtîye pas[1282]

2.

Tirs*a* ḥeq bo te kiras e perh*î*zî[1283] nûra dil e

Ṣuḥbeta pîran ji pişta nefs*ê* ra wek bivr û das

3.

Ji hucûma leşkerê şehwet*ê* nefsanîyye ra

Her silaḥ e tirs*a* ḥeq ey qelb*ê* wek mermer û as[1284]

4.

Ji ḥeramîyê bizane dûr*î* nûr û jîr*î* ye

Te divêt perhîz*ê* karê boy bibî cem yar*ê* nas

5.

---

[1279] **Neyar**: Dijmin

[1280] **Dîl**: Kole, bende, êxsîr

[1281] **Xêlî**: Dersok/laçika ser rûyê bûkan

[1282] **Pas**: Jeng, zeng. Li vir bi wateya "qirêj" e.

[1283] **Perhîz**: Teqwa, xwe ji gunehan parastin

[1284] **As**: Dara asê. Darekî pirr hişk û zexm e. Wê darê dibirin û paşê jî dixine nav avê û şeş meha di nav avê de disekine, piştre li ber tavê hişk dikin. Dawiyê de ew dar, wekî hesinê zexm û xurt dibe. (H.)

Dûr*î* yaran û meqaman e kesê pê nefs*ê* çû

Nay*ê*tin meclis*a* şahan ker*ê* laîqê p*a*las[1285]

6.

Nefs dixazit te bixit dafê[1286] ji bo yek danekî[1287]

Ji muradan wek Beko[1288] dûr xist*î*ye pur nefs*ê* nas

7.

Herçî tiştê bîne pêş te nefs*a* şûm jar e dilo

Serd*a* hingiv rihtîye[1289] bo kuştina te kirye tas

8.

Ger vexî jê qimmekê êdî xu mesʿûd ẓen mekey

Bo dilopek reqy*ê*[1290] Berşîş[1291] ma weke masî li pas[1292]

9.

Qerqela[1293] kufrê li xu kir jê d*a*ket kinca *î*man

Ji dunê rûreş û destṭal çû hebû zana çiqas

10.

Tê guhertin nefs*a* emmare[1294] bi nefsa muṭmeîn[1295]

Ey dilê dilkul ji afatan tu nîne tu xelas

11.

Pur **Ḥezîn** im ya Îlahî rûreş im wa ḥesreta

Ger neyêt danîn xebata me pepûkan ber esas[1296]

12.

Nîyyeta qenc her esas e bo d*î*warê kar û bar

---

[1285] **Palas**: Berê ku bi mûyên bizina hatiye ristin, xalîça biçûk, berik

[1286] **Daf**: Dafik, telik, kemîn, xepik

[1287] **Dane**: Lib, liba gênim, daneyê gênim

[1288] **Beko**: Bekoyê ʻEwan. (bnr. 49/60)

[1289] **Rihtin**: Rijandin

[1290] **Reqî**: Eraq

[1291] **Berşîş**: Bersîsê ʻAbid. Bersîs alim û zahidekî mezin bûye. Li çiyayekî Şamê ji xwe re şkeftek dîtiye û li wir bi nimêj û ta'etê re mijûl bûye û bi roj û şev ibadetê ji Xwedayê xwe re kiriye. Dem bi vî rengî derbas bûye çûye, Bersîs bûye alimekî mezin, nav û kerametên wî gihîştine her derî. Rojekê şeytan xwestiye ku Bersîs bixapîne û ji rê derxîne. Dikeve şiklê jineke bedew û diçe li cem Bersîs. Di dawiya çîrokê de eraqê ji Bersîv re dide vexwarin, zîna pê dide kirin û herî dawî jî wê jinikê dide kuştin. Dûre dibînin ku Bersîs ji rê derketiye, ji aliyê şahê wê serdemê ve tê daleqandin. Bersîs beriya daleqandinê, ji şeytên alîkarî dixwaze û bi vî awayî ser kufrê dimire. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Yakup Aykaç, "Çar Çîrokên Cuda yên Bersîsê Abid", *Nûpelda*, j. 19, Wan 2015, r. 58-63.)

[1292] **Li pas**: Li holê, li meydanê

[1293] **Qerqel**: Kefen

[1294] **Nefsa emmare**: Ew nefsa ku tenê çêyî, başî û helaliyê dixwaze ye.

[1295] **Nefsa muṭmeîn**: Ew nefsa ku her tim xirabiyê, tiştên şehwanî û lezzetên dinyewî dixwaze ye.

[1296] **Esas**: Hîm, bingeh, binyad

Dayne karê xu li ser qencîy*ê* da bin mebe pas

**54.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Dayne xebata xu bira bo tu reha bî[1297] ber esas

Ji bo bibînî jîn*a* xweş dilê xu paqiş key ji pas

2.

Ji bo ku feyża nû bi nû her dem bibe bo te neṣîb

Qela ke[1298] qelbê xu bira bi ṣuḥbeta pîran*ê* xas

3.

Hevalîya yarê Xudê iksîr û kîmîya[1299] bizan

Di çimena hebûn*ê* da tenê kulîlka wan binas

4.

"Wekûn*û* meʿe`ṣ-ṣadiqîn"[1300] emrê Îlahî sermedî[1301]

Pêk bîne ḥerfîyan bi cih perhîzîyê[1302] bikey kiras

5.

Dû ra dibînî nisbetan datîne ser dil wekî bars[1303]

Ref ref dibînî himmetan dûr dix*î*nin ji te *wes*was[1304]

6.

Ya Reb nekey meḥrûm dilan ji wan fuyûḍat[1305] û gulan

Ji wan şemal[1306] û sunbulan bo xaṭirê serwer*ê* nas[1307]

7.

---

[1297] **Reha bî**: Xilas bî, rizgar bibî

[1298] **Qela kirin**: Paqij bike, cîla bike, bibiriqîne

[1299] **Kîmîya**: 'Ilma kimyayê. Ew 'îlma ku tiştan vediguherîne tiştekî din. Gelek zanayên zemanê berê bi wê 'ilmê re mijûl bûne, gelek ji wan xwestiye ku bi wê 'ilmê ji xweliyê zêr peyda bike.

[1300] Tev bi rast û durûstan bibin.

Îşareta vê ayetê dike:

(يَا اَيُّهَا الَّذِينَ اٰمَنُوا اتَّقُوا اللّٰهَ وَكُونُوا مَعَ الصَّادِقِينَ)

Hey gelî yên ku bawerî anîne! Xwe ji (ezabê) Xweda Teala biparêzin û bibin digel rast û duristan. (Tewbe: 9/119)

[1301] **Sermedî**: Bêdawî, ew tiştê ku dawî jê re tune ye, ebedî

[1302] **Perhîzî**: Teqwa, xwe ji gunehan parastin

[1303] **Bars**: Ew cihê ku mêşên hingivîn berav dibin, zeviya mêşan, êla mêşan,

[1304] **Weswas**: Yek ji wan navê şeytên e.

[1305] **Fuyûḍat**: Feyz û bereket

[1306] **Şemal**: Çira, mûm, find; rewnaq, ronak, şahîk

[1307] **Serwerê nas**: Mebest jê Hz. Muhammed (asw.) e.

Dilbend*ê* fermana te me, çavnêr*ê* îkrama te me

Sêwîy*ê* ber arê te me, me`j tewşîyan bikey xelas

8.

Jar im belengaz im ji dil, destṭal[1308] bi dergah hatime

Dilopeke reḥmê bişîn ser vî **Ḥezînê** dil çû as[1309]

**55.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Gêġ*î*[1310] ye`b dar û b*î* ye nûrîn newal û çîmen e

Têk kulîlk û yasemîn e pur ş*î*rîn e wek Efes[1311]

2.

Bi çem û av û delavê dilkeş[1312] û zozan*ê* xweş

Her wekî baġê irem[1313] nêrîn ş*î*rîn û xweş nefes

3.

Pur welatek dilber e ew ax*a* wê zêrê zer e

Pesn*ê* wê`j heddan der e karim bibêjim êd*î* bes

4.

Meġelê nêrîy*ê* mêran e cihê şêrê Xudê

Hem welatê bengîyan e lewr*a* dil wê kin hewes

5.

Bêhn*a* yara eşl*î*[1314] jê tê, çi dikî ḥorî cinan

Wekî ava kewṯerê ye çilk*ê* ser belgê hewes[1315]

6.

Cennet û cihan li henber wê dibin her wek vizik[1316]

---

[1308] **Destṭal**: Dest vala

[1309] **As**: Darekî pirr hişk û zexm e. Vê darê dibirin û paşê jî dixine nav avê û şeş meha di nav avê de disene. Piştre li ber tavê hişk dikin. Dawiyê de ev dar, wekî hesinê zexm û xurt dibe. Li vir bi wateya “hişk” e.

**Dil çû as**: Dil hişk bû.

[1310] **Gêġî**: Navçeya Çewlîg/Bîngolê ye.

[1311] **Efes**: Li navçeya Selçûk a Îzmîrê cihekî tev bi dar û şînatî ye û cihekî dîrokî ye.

[1312] **Dilkeş**: Bi cazîbe, kêşwer

[1313] **Baġê îrem**: Padîşahek bi navê Şeddad, baxçeyek çêkiriye ku xwestiye bila bişibe bihiştê û navê wê jî baxê îrem daniye. Baxê bihiştê.

[1314] **Yara eṣlî**: Mebest jê Xwedê Te‘ala ye

[1315] **Hewes**: Navê gihayekî ye, belgên wî tahl e û ji nexweşiyan derman e jî.

[1316] **Vizik**: Virvirok, gizgizok, gizik

Lewr*a* deryaya dilan e ew welatê deng ceres[1317]

7.

Wîlw*î*lê ṭeyran û ḥûkḥûkê şivanan xweş dikin

Wan dilê mirîy*ê* tînin cez̲b û coşê xar û xes[1318]

8.

Ġulġulê av û delavan gurgurê darê ber avan

Geşt û gerra xoyxunavan[1319] hey di vê qada teres

9.

Ew ş*î*rînîya Xuda rihtibû ser wê ax*ê* da

Ji berê ḥetta bi îro ẓen mekey dîtî tu kes

10.

Ez **Ḥezîn** im lal û dîn im pesn*ê* te nadim temam

Tu delavê av*a* jîn î wek te nabin ṣed Efes

11.

Hey welat xopan welato bê xudî û bê xebato

Ġem mekey pur, tête bo te rojekê feryadires[1320]

**56.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Êdî behar e lo dilo baġan d*a* gul têk bûne geş

Sosin û sunbul ʿedilîn bulbul dixûnit xweş û xweş

2.

Mêrg û çimengeh xemilîn zozan û deşt pê ʿedilîn

Yaran*ê* nû xweş kemilîn[1321] bal wan ve lez key tu bimeş

3.

Bê gîştina yaran gihana menzilan pur zeḥmet e

Çawa diket korê reben wî ra nebitin dest(i)keş

4.

---

1317 **Ceres**: Zengil

1318 **Xar û xes**: Stirîn, dirî, sinc

1319 **Xoyxunav**: Ew dilberên ku xwêdana wan wekî xunavên li ser belgan ter û taze û pak in.

1320 **Feryadires**: Alîkar, destyar, yê ku alî dike

1321 **Kemilîn**: Gihîştin, xemirîn

Mikrob ji bo bête d*î*tin divê te mikruskob bira

Nexweş*î* bo bê naskirin divêt ḥekîmekî keleş[1322]

5.

Mikrob*a* dil pur piç*û*k e nayê*tin* dîtin wer reḥet

Ji bo ku ew bête d*î*tin lazim e îdrakeke xweş

6.

Neyête avêtin ji dil ew mikr*o*ba mirî bizan

Gulek*î* tetûr[1323] lêxinît çulo[1324] dibit xweşreng û beş[1325]

7.

Şahê li textê ʿalema "lewlake"[1326] rûnişt û nebû

Vala ji wê çilka qirêj bixûn "elem neşreḥ"[1327] bi goş[1328]

8.

Piştî ku hate av*ê*tin ew nuqṭe ya ew bû tijî

Nûr û fuyûḍat[1329] û ḥikem[1330] bilind b*û* çû ber saq*ê* ʿerş[1331]

9.

Ya Reb ji wê nûrê nekey meḥrûm me yê jarê reben

Di deftera hidayetê xame[1332] bi navê me bi keş

10.

Roja me çû avan xerab zeman*ê* me têk fitne ye

Hêvî tu yî ya Reb me ra wenda nekey me`j rah*ê* baş

**57.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Bi ġulġulê ava behar deryay*a* ʿeşqê pêl didit

---

1322 **Keleş**: Mahir, pispor, bîtkel
1323 **Tetûr**: Maşot, meyrok, tirtûl, naşor
1324 **Çulo**: Çawa, çilo
1325 **Beş**: Geş, rewnaq
1326 **Lewlake**: Ger tu nebûyayî**.** (Îşareta hedîsa qûdsî dike. bnr. 1/13)
1327 **Elem neşreḥ**: Ma me fireh nekir?
Îşareta vê ayetê dike: اَلَمْ نَشْرَحْ لَكَ صَدْرَكَ
Erê ma me sînga te (resûlê min, ji bo ahkamên dîn) fireh nekir? (Eş-Şerh: 94/1)
1328 **Goş**: Guh
1329 **Fuyûdat**: Feyz û bereket
1330 **Hikem**: Pirjimariya hikmetê ye. Hikmet, armanc, tiştên bi sûd û kêr, zanîn, felsefe
1331 **Saqê ʻerş**: Li jorê asîmanê, rajorî ezmên
1332 **Xame**: Pênûs, qelem

Baġirê[1333] derdan tête xar derman dibit qelbê nexweş

2.

Wek ʿewrê nîsanê dilo birije hêstiran mudam[1334]

Bona gihana ṣorgulan wek bulbulan key pênc û şeş

3.

Çavê nerêjit hêstiran delavê bê av in dilo

Qelbê nebînit dilberan jê hêvîya xeyrê ye tewş

4.

Dil baġçeyê bextê xu da dî bû gulek geş û gewez

Wek ṭeyrikî serjêkirî hilpirtikî di xûna reş

5.

Wek Dicle[1335] û Feratê[1336] nisbet tên dirijin ser dilan

Deryaya dil pur mezin e mat maye tê qebtanê heş

6.

Her pêlekî feyżê ku tê qirrêjîyê ji dil dibit

Qela dikey qelban dû ra dikşîne ser cilakî xweş

7.

Ser danîye ser şêmûka seraya reḥmeta bedew

Pursê bikey carek cuwan li vî **Ḥezînê** dilnexweş

**58.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Me di yabana qetanê[1337] da bi dil dît gulfiroş

Îsturû[1338] destaye istûxar e dûr û jarînoş[1339]

2.

---

[1333] **Baġir**: Lat, zinar, kevirên li hev sûwar bûne û bi rêz dirêj bûne

[1334] **Mudam**: Her tim, her dem

[1335] **Dicle**: Çemê Dîcleyê. Yek ji du çemên herî mezin ên Kurdistan, Mezopotamya û Rojhilata Navîn e. Li bakûrê Kurdistanê dest pê dike. Di nav bajarên girîng wek Amed, Cizîra Botan, Mûsil, Bexdayê re derbas dibe û li başûrê Iraqê bi çemê Feratê dibe yek û dirije Kendava Farsê/Behra ʻUmmanê.

[1336] **Ferat**: Çemê Feratê. Çemê herî dirêj û bi av e. Bi çemên Avareşa Erzeromê û Mûrada Agiriyê pêk tê. Li Elezîz, Meletî, Amed, Semsûr, Rihayê digere û li Herranê re derbasî Sûriyê dibe. Li Iraqê bi Dîcleyê re dirije Behra ʻUmmanê.

[1337] **Yabana qetanê**: Çola cudabûnê, çolistana fîrqetê

[1338] **Îsturû**: Stirîn, xar, hêstrî, sinc, qelem

[1339] **Jarînoş**: Jehrî vedixwe

Îsturûxûyan di destan e gulê baġê murad

Rûgeş û can saġlem û şad in bi ḥalê xu y*ê* xweş

3.

Mat nemîne qeṭ ji vî ḥalî tu ageh î dilo

Bi miraran kêf dikin kûçik û kurm û kêz û mûş[1340]

4.

Mêş dibêjit bulbul im sillop*a* rêxê[1341] çîmen e

Lew li ser wê fir didit tê û diçit dorê r*a* xweş

5.

Hêk*ê* xu datîne wê da çêlikan tê derdixe

Lew dibînî hav*î*nê kurm rêx*ê* da têtin xurûş[1342]

6.

Bi dunê kêfxweş dibin ʿekrût[1343] û kêmê[1344] wekî mêş

Lewr*a* her tiştek bi cinsê xu diket rabûn û roş[1345]

7.

Gerçî rengkesk e silopa rêx*ê* çimen ẕen mekey

Ger xeberdar î ji xeḍrai`d-dimen[1346] xuy ʿeql û hûş[1347]

8.

Ey **Ḥezîn** îdrak*a* razan[1348] nîne karê her kesî

Gerçî wek hev bin di şeklê dîtin û bîstin*a* goş[1349]

9.

Nêm[1350] û nafe[1351] wek hev in lê nêm elem û êş e her

Emm*a* bêhna nafeya xweş, xweş diket mêjûy nexoş

10.

Agir û yaqût[1352] wekî hev tên di rengê ṣor welê

Can r*a* yaqût zînet e agir wekî merx[1353] wî diṣoş

---

[1340] **Mûş**: Mişk
[1341] **Sillopa rêxê**: Koma rêxê, sila rêxê
[1342] **Xurûş**: Tên û diçin, diqilqilin
[1343] ʿ**Ekrût**: Rûpîs, kesê pîs û nebaş
[1344] **Kêm**: Merivê kêm, kêm aqil, sefik
[1345] **Rabûn û roş**: Rabûn û rûniştin
[1346] **Xeḍrai` d-dimen**: Keskên derewîn
[1347] **Xuy ʻeql û hûş**: Xwedan eql û hiş, kesên baqil
[1348] **Raz**: Sir, nepen, xef, nehênî
[1349] **Bîstina goş**: Bihîstina guh
[1350] **Nêm**: ʻEdap, adep, bezek
[1351] **Nafe**: Wekî miskê ye ku ji navika heywên tê derxistin û bêhna wê zehf xweş e. Cureyek ji miskê ye.
[1352] **Yaqût**: Kevirekî bi qîmet û biha ye. Çar rengê yaqûtê hene ku ew jî sor, şîn, spî û zer in.

11.

Pizikê[1354] xortî û xuryê[1355] herdu yek şeklê ne lê

Yek n*î*şana ronîya çavan e, yê dî çavfiroş[1356]

**59.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Çû ji dest me ew delala xweş û baş

Dil*ê* jar her bi w*ê* yarê dib*û* haş[1357]

2.

Ah *î*ro maye tenê lewra dike

Qîr*î*n û zarîn wekî şeqşeq*a* aş[1358]

3.

Piçekî derdê me bata[1359] ser çiyan

Dê bibana wek m*û*yê rûyan tiraş

4.

Can*ê* can bû ew delala bejnbedew

Rûgul[1360] û şîrînmeş[1361] û ew çekqumaş[1362]

5.

Pêşuway[1363] û şah*ê* rinda ne delal

Ṣed wekî Şîrîn û Leyla ne li paş

6.

Pesn*ê* wê dertê ji karîna **Ḥezîn**

Bi hezaran ʿeqlê tê da mane şaş

---

1353 **Merx**: Dara merxê. Dareke wekî çamê ye, bi stirîn e, tim û tim heşîn e lê bejna wê ji çamê biçûktir e. Hevrêz, hevrist, qaç.

1354 **Pizik**: Pirzik, pizrik, zirpik, xişrûk

1355 **Xurî**: Nexweşiya xurî, xurîsorik.

1356 **Çavfiroş**: Ango rindahiya çavan dibe. Pirzikê xortaniyê îşareta rindiyê ye, mirov re şanazî ye lê pirzikên xuriyê nexweşiye, mirovan 'aciz dike, rindiya çavan dibe hetta pêşve here hinekan kor jî dike. Di Kurdî yê de gotinek li ser wê meselê jî heye: Sorik can dibe, xurik jî rindiya çavan dibe. (H.)

1357 **Haş**: Aram, asûde, ker dibû

1358 **Şeqşeqa aş**: Şeqşeq, çeqçeq. Li aşê ji bo ku genim di dewla genim de bê eyarkirin parçeyeke dewlê ye.

1359 **Bata**: Bihata

1360 **Rûgul**: Ew dilberên ku rûyên wan gulgulî ne.

1361 **Şîrînmeş**: Mebest jê meşa dilberê, rêveçûyîna şîrîn û bihejîn e.

1362 **Çekqumaş**: Kinc û libasê qûmaş.

1363 **Pêşuway**: Pêşeng, serek, serok

**60.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Hey di dil da bi hezaran ġem û derd û jan û êş

Tê me pey hev tîr*ê* derdan hem li paş û hem li pêş

2.

Rend*a*[1364] derdan wekî textan dil*ê* têk jan û birîn

Bi devê her wekî gûzan[1365] daye ber xu dike rêş[1366]

3.

Serd*a* destê jan*a* ʿeşqê xoy*a* şor pê wer dike

Henberê rindîy*a* yarê dipijînit wekî leş

4.

Çar *a*wirê[1367] dil d*î*war e, jêr û jorê wî ye ar[1368]

Dişewite wekî dar e, hey hewar ey dest(i)keş[1369]

5.

Nav t*ê*rafa[1370] ʿişq*ê* da dil lîf dida her wekî mar

Diç*û* xarê tê d*a* şîşê serṭ*û*jê her wek dirêş[1371]

6.

Me d*î* yarê nêr*î*nek kir li dilê têk ar û pêt

Got çi qîrînî bi te ketye, te ra way di*bêm* hiş

7.

Me go dilber, bes e evqas êş û derdan nede me

Gote çer wer tu dibêjî, ev çi ḥal e wiş û wiş[1372]

8.

ʿAşiqê ḥeq ra divêt her ṣebr û sekn[1373] û kerḥesî[1374]

---

1364 **Rend**: Rendeş, amûrekî hesin e ku kêrî rastkirina û tiraşkirina daran tê.
1365 **Gûzan**: Kerên tûj ên berê ku mêr bi wan serê xwe kur dikirin, ustûra.
1366 **Rêş**: (Tiştê hişk û zexm) hekandin, rêşkirin
1367 **Çar awir**: Çar alî, çarmedor
1368 **Ar**: Agir
1369 **Dest(i)keş**: Alîkar, destyar
1370 **Têraf**: Hêl, alî
1371 **Dirêş**: Biz, cureyek ji derziyê ye ku ji şûjinê stûrtir e û destiyê wî heye
1372 **Wiş û wiş**: ‘Ecêb ‘ecêb, xerîb xerîb
1373 **Sekn**: Sekinandin, sebat, tebat
1374 **Kerḥesî**: Bêdengî, kerayî

Yan ne, wek bulbul dibit hey bê murad û yar û xîş[1375]

9.

Bê nigê şebrê ji dirrîyê evînê tu kesek

Nabihûre ey **Ḥezîn** terk key temamen şeş û bêş[1376]

**61.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Gujgujî[1377] ser berx*ê* dil şahîn*ê* ʿişqê el-xelaṣ[1378]

Daye nêv pencê qetanê yar*a* dilbêş[1379] el-xelaṣ

2.

Ji fiġan û barîna[1380] dil sedd*a* Çînê[1381] hilk*ê*şî

Bal we ve gazîy*ê* tîne dost*ê* dostan el-xelaṣ

3.

Wek kevoka serj*ê*bûyî xûn*ê* da hilpirtikî

Çilk*ê* xûnê dipekîne ser we da way el-xelaṣ

4.

Ger neyên reḥmê li me hûn ey keremkarê mezin

Dê çi bit ḥalê me yê jarê belengaz el-xelaṣ

5.

Bil ji dergahê we nîne bo me tu hêwirgehek[1382]

Hûn me der kin ma ku da êdî biçin em el-xelaṣ

6.

Bil ji we nîne kesek vê jan*a* dişwar ra şifa

Ger nekin pursê li me hûn kî diket purs el-xelaṣ

7.

Me xu avêtîye hêşa[1383] kon*ê* we ey pehluwan

---

[1375] **Xîş**: Tunebûn, wendabûn, fenabûn
[1376] **Şeş û bêş**: Xeberdanên vir de wê de, axaftinên beredayî
[1377] **Gujgujî**: Êrîş kirin
[1378] **El xelaṣ**: Hawar, alîkarî
[1379] **Yara dilbêş**: Ew dîlbera xwedan şefqet
[1380] **Barîn**: Dengê ku ji berxê der tê. Wek mînak; ker dizîre, hesp dihîre û hwd.
[1381] **Sedda Çînê**: Li dinyayê dîwara herî mezin e ku ji bo parastinê beriya zayînê hatiye avakirin nêzî 8851 km ye.
[1382] **Hêwirgeh**: Stargeh, hewing

Nûcuwan im dilbijan im bê eman im el-xelaṣ

8.

Bil ji yaranê Xuda nîne **Ḥezîn** ra tu hewar

Îst*û*xar im ber derê we çare hûn in el-xelaṣ

**62.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Bil ji axa Yeṣribê[1384] nîne te ra ey dil xelaṣ[1385]

Bil ji feyża Eḥmedî[1386] nîne ji derdan tu xelaṣ

2.

Lez biçe xu bigihîne bal w*ê* feyż û ax*a* pak

Lewr*a* êşa çav*ê* dil ra hey bi wê axê xelaṣ

3.

Biweşîne toz*a* wê axê li ser qelbê birîn

Da di zindana dunê da bib*î*nî bo xu xelaṣ

4.

Kanîya jînê di wê qada mubarek da heye

Ger vexî jê qimekê[1387] dibî ji her derdî xelaṣ

5.

Roj*a* îmanê ji wê axa mubarek hildibit

Ger bigêjit te ṭ*î*rêjek pê dibî serbest xelaṣ

6.

Kan*a* ʿirfanê[1388] ye Yeṣrib, Betḥ*a*[1389] ye beḥra kemal

Her bi wan canan*ê* pakî wan d*a* razane xelaṣ

7.

Serteser ʿalem bi wê nûra mubarek ronî ye

Ji hemî tarîy*ê* afatan bi wê ye her xelaṣ

---

1383 **Hêş**: Sî, parastin, muhafaza

1384 **Yeṣrib**: Navê Medînê yê berê. Hz. Muhemmed (asw.) li wir çûye rihma Xwedê.

1385 **Xelas**: Rizgarî, felat,

1386 **Eḥmed**: Pêxembera dawî Hz. Muhemmed (asw.)

1387 **Qimek**: Qurtek, gulpek

1388 **ʿIrfan**: Naskirin, zanîn, naskirina Xwedê

1389 **Betḥa**: Li Mekkeyê navê newalekê ye. Li vir qesda Mekkeyê dike.

8.

Hey dibilqê av*a* Îslamê ji wê axa p*î*roz

Jê t*ê* bona teyh*a*[1390] dunyay ra her ew av e xelaṣ

9.

Dilbera çola dunê da dil ji tihan perritî

Çilkekî wê av*ê* bid me da bikin pê dil xelaṣ

10.

Çer dihêlî dil bişewite ku kûllûna[1391] te ye

Hêv*î*dar im ist*û*xar im ji tihan dil key xelaṣ

11.

ʿEskerê nefsê xu berda ser dil wek zurba[1392] guran

Bo kulîlka baġ*ê* Yeṯrib ji guran dil key xelaṣ

12.

Pur **Ḥezîn** im ḥalxerab im tih*ê* bal luṭfa te me

Bo diyar û yar*ê* pakîn me reha key[1393] jê xelaṣ

**63.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Dilber ji îcada te dil yek nukteyek kirye ġereḍ[1394]

Ji bo ku tu ṣade bibî koletîya te kir ġereḍ

2.

Ji nasîya ẕatê eḥed[1395] bibî wekî derya mezin

Ji lah*û*tê[1396] bibin xuya te da ṣifatê ḥeq ġereḍ

3.

Ya wek h*ê*lîya[1397] ṣaderû ʿeksa ṣifatê ẕat*î*[1398] ye

[1390] **Teyh**: Çol, çolistan
[1391] **Kûllûn**: Kîler, xenzik, xanî
[1392] **Zurb**: Zurbe, koma guran, keriya heywanên hov û wehş
[1393] **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike
[1394] **Ġereḍ**: Armanc, mebest
[1395] **Eḥed**: Ew Xwedayê ku yek û tenê ye û hevalê wî tune ye
[1396] **Lahût**: Îlahiyet, ‘alema îlahî
[1397] **Hêlî**: Neynik, ‘eynik
[1398] **Ṣifatê ẕatî**: Ew sifatên ku tenê di zatê Xwedê de henin û ji bilî wî tu tiştî de nînin. Sifatê zatî şeş lib in. Wan bi dor; wucûd (hebûn, Xwedê her heye û nebûna wî nayête hizrkirin), qidem (destpêka hebûna Xwedê nîn e), beqa (dawiya hebûna Xwedê nîn e), wehdaniyet (yekîtiya Xwedê ye ango Xwedê yek e, tenê ye û hevalê wî

Bibiriqe ʿenya te da ji heb*û*nê ev e ġereḍ

4.

Ya wek b*a*rana tê bi reḥm heşîn biket gulên x*û*yan

Di baġ û bustanê te da kolet*î* lew bûye ġereḍ

5.

Kera ku baran nak*ê*şit derve dihêlin bo guran

Dilê neket koletîyê di wê leʿîn[1399] ra ye ġereḍ

6.

Gahê ku pê nay cot kirin ser jê dikin yan jî didin

Nefsa ku nabit bar(i)keş bil ṭerd*ê*[1400] nabit jê ġereḍ

7.

Rabe biçe cem bulbulan purs key ji weṣla[1401] ṣorgulan

Ger tu nebînî wan gulan ji heb*û*na te çi ġereḍ

8.

Madam ku piştî mirinê dibî *a*x û xalî diçî

Bo çi tu bilind difirî ji nas*û*tê[1402] çi ye ġereḍ

9.

Piştî nebînit her kesek cezay*ê* karê xu çi ye

Ferqa Ebû Cehl[1403] û ʿUmer[1404] yan ji *rin*dîy çi ye ġereḍ

10.

Wek hev dibin camîd[1405] û ḥey[1406] wek hev dibin xerab û çê

Madam wuṣay ji qan*û*n û pesn û ẕeman çi ye ġereḍ

11.

Çiman li hespan suwar dibî çima kera jar bar dikî

Wusay ji ʿîş û kar*ê* te ẓulm û cefa ye her ġereḍ

---

tune ye), mûxelefetûn lî"l-hewadîs (Xwedê naşibe tiştê ku ji dû re hatine afirandin), qiyam bî nefsîhî (hebûna Xwedê ji xwe ye, Xwedê hewcedarî kesî nîn e) (H.)

1399 **Leʿîn**: Yê ku hatiye naletkirin

1400 **Ṭerd**: Qewitandin, qewirandin, qeşitandin, derkirin

1401 **Weṣl**: Gihandin, gihîştin

1402 **Nasût**: Însaniyet, her tiştê ku bi însanan re elaqeder e.

1403 **Ebû Cehl**: Apê Hz. Muhemmed (asw.) e. Di dewra Îslamiyetê de yek ji wan pêşberê neyarên Hz. Pêxember bûn. Navê wî yê eslî 'Amrê kurê Hîşam el-Mûxira ye lê ji hêla misilmanan ve bi leqeba "ebû cehl" ango "bavê nezanînê" hatiye gazîkirin. Ji bo misilmana gelek zilm û zordarî kirine. Sedema derketina şera Bedrê bûye û dîsa di wê şerê de hatiye kuştin. Di Îslamiyetê de wek "fir'ewna dînê Îslamê" tê naskirin.

1404 ʿ**Umer**: Hz. Omer (584- 644). Navê Omerê kurê Hettab e. Xelîfeyê duyemîn e. Bi dadmendî û desthelatiya xwe ve namdar bû. Di dewra xelîfetiya xwe de teqwîma hîcriyê saz kiriye. Di sala 10. a xelîfetiya xwe de ji aliyê koleyekî Îranî ve hatiye şehîd kirin.

1405 **Camid**: Bêruh, bêgiyan, nezindî

1406 **Hey**: Zindî

12.

Madam ku insan î bira koletî şerṭe ji te ra

Yan ne, wekî Darwîn[1407] diçî ḥerrîyê da xar bê ġereḍ

13.

Darwîn ku mûweffeq nebû ḥewale kir ser nesla tê

Ew derewa bin da tune, da ku nebit rûreş ġereḍ

14.

Darwîn digel hem fikrê xu digot ji daran berx dizêt

Derew bi buhtanan[1408] di van teqrîr[1409] û iṯbat kin ġereḍ

15.

Hem felsefa Yûnanîyan ji heykelan[1410] dixast meded

Dînê ji heykelan dixazit mededê, tewş e ġereḍ

16.

Carnan digot şeş in Xuda, yê pur mezin li ser çiyan

Carnan bi piryê ve diçû Xudên ewanê bê ġereḍ

17.

Dînê bi piryê ve diçit Xuda û efkar û ġereḍ

Dîwar li ser weḥyê nebit bizan ji wî şerr e ġereḍ

18.

Bo dî li henber agirê duşwar şev û roj diskinê[1411]

Birçîy û tih û perîşan agir wî neṣohte[1412] ġereḍ

19.

Ṣed ṣalê xidmetê biket agir ra ew bûdî[1413] dema

Nêzik bibit ji wî hema diket şewata wî ġereḍ

20.

Bil baġê Îslamê hemî dînê dî têk sinc[1414] û dirî

Kesê bi wan kevit ji tîrê kufrê ra dibit ġereḍ

---

[1407] **Darwîn**: Charles Darwîn (1809-1882) Zanyarê sirûştê. Xwediyê ramana darwînîzmê ye. *Darwînîzm*; her aferîde/bûnewer/candar kêmzêde bi hev re têkildar in û di demeke dûr û dirêj de ji hev dûr ketine. Di zemanên berê her tişt wekî organizmayeke asan bû lê bidemane her tişt bû organizmayeke kompleks. Ew doktrîna peresanparêz, netêw û li dijî dînê ye. (bnr. https://tr.wikipedia.org/wiki/Charles_Darwin 10.04.2015)

[1408] **Buhtan**: Şîltaxî, buxtan, şel, îftîra

[1409] **Teqrîr**: Dubarekirin, ducar, carî

[1410] **Heykel**: Peyker

[1411] **Diskinê**: Disekine

[1412] **Neşohte**: Neşewitîne

[1413] **Bûdî**: Bûdîst, ew kesê ku baweriya xwe bi dînê Bûdîzmê re aniye.

[1414] **Sinc**: Stirîn, dirî

21.

Borîn bikey carî hela li baġ*ê* Îslamê binêr

Hemî kulîlkê xûy*ê* qenc û sosinê bilind ġereḍ

22.

Yek bêhnekî wan sosinan eger bibit te ra neṣîb

Ji jîn*ê* ew bes e te ra ey şendilê şîrîn ġereḍ

23.

Vexî eger ji kanîya ḥeyat*a* Îslamê qimek[1415]

Dibî tu ṣaġê sermedî[1416] ji heb*û*nê ev e ġereḍ

24.

Borîn bikey carî di nêva mêrg û zozanê w*ê* da

Cehan*ê* da te ra ji bil Îslam*ê* namînit ġereḍ

25.

Paqişîy û nezaketa heye di wî dînê mubîn[1417]

Ruḥ û dilan ṣade dikin enwar*ê*[1418] ḥeq rakin ġereḍ

26.

Ye Reb me yê jarê reben bi wan gulan key şad(i)man[1419]

Bi bulbulê wî bağçeyê me goyinan key hem ġereḍ

27.

Bigîj*î*nî lengê[1420] peya bal wan suwarê wek birûsk

**Ḥezîn** diket zarîn û şîn, rižay*a* te`y wî ra ġereḍ

**64.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Dil ji bil yara berîn[1421] nîne ġereḍ[1422]

Gîştina wê yar*ê* ye dil ra ġereḍ

2.

---

[1415] **Qimek**: Qurtek, kulmek, mitsek, çengek
[1416] **Sermedî**: Tiştê ku dawiya wê tune ye, bêdawî, ebedî
[1417] **Mubîn**: Eşkere, zelal
[1418] **Enwar**: Nûr, rewnaq, ronak
[1419] **Şad(i)man**: Şadman, dilşa, karman, dilgeş, bextewar
[1420] **Leng**: Kulek, şaht
[1421] **Yara berîn**: Yara ‘ewil, dilbera pêşîn, evîna ezelî. Mebest jê Xwedayê Jorîn e.
[1422] **Ġereḍ**: Armanc, mebest

Ṣed hezar sosin û yasemîn hebin

Dil ji bil wê nergizê naket ġereḍ

3.

Bi hezaran dilberê ser xu hebin

Dil ji bil wê zer*î*nê naket ġereḍ

4.

Şîr*î*nî çendan hebit ma mêş diket

Bil ji hingiv şîr*î*nîkî dî ġereḍ

5.

Yan hebit ṣed gul gelo sîper[1423] diket

Bil ji ronîyê şeva tarî ġereḍ

6.

Dil bizane dişewite wek s*î*per

Dîs*a* naket bil ji wê canê ġereḍ

7.

Yan bizane xinc[1424] dibit wî derdî da

Dîsa naket ġeyrê wê yarê ġereḍ

8.

Ṣed hezar zindan*ê* ve derbaz bikin

Nakirit[1425] bil nazikê dîsa ġereḍ

9.

Ṣed hezar dilber hebin Ferhad diket

Bil ji Şîrînê gelo keskê ġereḍ

10.

Yan hezar meḥbûb[1426] hebin Mecnûn diket

Ġeyr*ê* Leylayê kesî qeṣd[1427] û ġereḍ

11.

Yan hezaran nûr hebin Mûsa diket

Bil ji nûra Ṭûr*ê* nûrek dî ġereḍ

12.

---

[1423] **Sîper**: Sîperik, minminîk, pirpirok
[1424] **Xinc**: Pare pare, perçe perçe
[1425] **Nakirit**: Nake, wisa nake
[1426] **Meḥbûb**: Dilber, evîn
[1427] **Qesd**: Armanc, mebest, xered

Yan hezar rehber hebin Romî[1428] diket

Bil ji Tebrîzî[1429] n*î*şanek dî ġereḍ

13.

Mas*î* bê av ma dibit jînê biket

Jîn*a* dil dildar e lew wê ket ġereḍ

14.

Ne tenê dil qeṣda wê canê diket

Serteser ʿalem diket yarê ġereḍ

15.

Ne tenê dil ketye dafa ʿişqa wê

Têk cihan maye di wê dafê[1430] ġereḍ

16.

Ger bizanit dil bi dafê ser diçit

Daneya[1431] tê da ye dîsa ket ġereḍ

17.

Lew reha[1432] yarê d*a* çûyîna serî

Bi hezar hêvîy*ê* dil ra ye ġereḍ

18.

Gaz*ê*[1433] şînan[1434] bête ser qelbê **Ḥezîn**

Dil bi şahî dîs*a* yarê ket ġereḍ

19.

Ger bibin dil cenneta firdews[1435] dîsa

Dê cemala[1436] wê delalê ket ġereḍ

20.

Ger bi ṣed şahîy*ê* dil kêfxweş bikin

Agirê ʿişqê d*î*sa dil ket ġereḍ

21.

Şah*ê* ḥusnê ger bibit dil ra heval

---

[1428] **Romî**: Mewlana Celaleddînê Romî. (bnr. 8/23)
[1429] **Tebrîzî**: Şemsê Tebrîzî. Şêxê Mewlana Celaleddîn Romî ye. (bnr. 9/6)
[1430] **Daf**: Dafik, telik, xepik, kemîn
[1431] **Dane**: Lib, liba gênim
[1432] **Reh**: Rê
[1433] **Gaz**: Çiya
[1434] **Şîn**: Derd, keser, kovan
[1435] **Cenneta firdews**: Li bihiştê qata şeşemîn e. Bihişt, cennet
[1436] **Cemal**: Rindî, bedewî

Nabitin dil ra ji wê meztir ġereḍ

22.

Xelq dixazit zengînîya wê dunê

Ebedîyyet û *î*man dil ra ġereḍ

23.

Gîştina hîvê dixazit astronot[1437]

Çêkerê[1438] ʿalem ji dil ra ye ġereḍ

24.

Padişah girtina bajaran divêt

Lêbelê fetḥa dilan dil ra ġereḍ

25.

Xûn*a* meʿṣûman dirêjit pêşuwa[1439]

Kuştina nefsa neyar dil ra ġereḍ

26.

Ey **Ḥezîn** dunya wekî qeḥpe jin e

Roj*ê* dostekî diket qeṣd û ġereḍ

27.

Xu biparêze ḥetta karî eman

Nav û dengê te nebit paymal[1440] ġereḍ

28.

Qeṣd*a* yara sermedî[1441] key her bi dil

Lew bi dest wê ye kilîta her ġereḍ

**65.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Dil di rahê ʿişq*ê* da nîne ġeleṭ[1442]

Ruḥ di ceẕb û coş*ê* da nîne ġeleṭ

2.

---

1437 **Astronot**: Stêrger, esmanger

1438 **Çêker**: Aferîner, afirandêr

1439 **Pêşuwa**: Pêşeng, serek, serok

1440 **Paymal**: Bernig, xax, rezîl

1441 **Yara sermedî**: Ew yara ku her heye. Mebest jê Xwedayê Jorîn e.

1442 **Ġeleṭ**: Çewt, şaş

Pur zeman e dil bi wê rê girtîye
Baqilê[1443] zana neket evqas ġeleţ
3.
Dil*ê* l`pêşya xu nûrek şade dîye[1444]
Lew ç*û*yîn û rah*ê* da naket ġeleţ
4.
Daf*a*[1445] biska yar*ê* da tiştik heye
Ţeyr*ê* baqil nakevit dafê ġeleţ
5.
Çangulê[1446] zencîra ʿişqê dil dibit
Bi xu ser dil nade vê çolê ġeleţ
6.
Beḥr*a* ʿişqê da dîye durrek beha
Yan ne, nadit beḥr*ê* bê geştî ġeleţ
7.
ʿAlema ʿişqê d*a* jînek xweş heye
Xiḍr*ê* dil, tarîy*ê* naket qeşd ġeleţ
8.
Kanîya ava ḥeyatê tê heye
Nakêşînit dil evan cewran[1447] ġeleţ
9.
Şed keser çawa cuwanî çû ji dest
Ġafil û xew da û beyhûde ġeleţ
10.
Nîv*ê* ʿumrê me buhûrî bê mefa[1448]
Me nekir karek h*ê*ja tewş û ġeleţ
11.
Îʿtecîl fe`l-weqtu seyfun qaţiʿun[1449]
Nate[1450] dayîn ḥeqq*ê* wê rastî ġeleţ

---

[1443] **Baqil**: Kesê biaqil, biheş, heşdar
[1444] **Dîye**: Dîtiye
[1445] **Daf**: Dafik, telik, xepik, kemîn
[1446] **Çangul**: Çengal, mebest jê xelekên keziyê dilberê ne.
[1447] **Cewr**: Cefa, tade, zulm, sîtem
[1448] **Mefa**: Menfa'et, havil, sûd
[1449] Zû bike, zeman wekî şûrê birrînker e.

12.

Lê *î*ro ahîn dikin çer[1451] çû ji dest

Ew zemanê qenc*ê* dilber ber ġeleṭ

13.

Hey gelo wan roj*ê* pîroz ra veger

Ṣond dixûnim qeṭ nekim wan da ġeleṭ

14.

Ah gelo ew jîn û jîrî dizvire

Teqd*î*ra wan kim temamî bê ġeleṭ

15.

Ax û xalî way li serê min be çer

Me di wan rojan d*a* girt rahê[1452] ġeleṭ

16.

Tişt*ê* me av, ẓen dikir bûye îro

Henberê me leyl*an*[1453] û dûman ġeleṭ

17.

Ew ḥeqîqeta li pê wê em diçûn

Îr*o* bûye bin d*a* beyhûde ġeleṭ

18.

Her, ḥeqîqet nûr*a* Eḥmedî bizan

Bil ji wê nûrê hemî dî zir ġeleṭ

19.

Yê dimînit geş gula îmanê ye

Pirmilîye[1454] yê d*î* ber bayê ġeleṭ

20.

Yê dimînit pêketî luksa d*î*ne

Vemirîne mûm*ê* dî`b bayê ġeleṭ

21.

Hîn*a* cuwanî vekey çavê xu ʿezîz

Te nebit nefsa neyar rahê ġeleṭ

---

[1450] **Nate**: Nehate.
[1451] **Çer**: Çawa
[1452] **Rah**: Rê
[1453] **Leylan**: Revrevik, rewrewk, serab
[1454] **Pirmilî**: Çilmisî, pelisîn

22.

Çûye bin da bal helakê ve kesê

Hêj ku xort e girtîye rahê ġeleṭ

23.

Lez nezivrînî serê hespa xu xurt

Diçe xarê her di zinnarê ġeleṭ

24.

Dar h*î*na taze ye bin ve ranebit

Piştî qert bû kok ve derxistin ġeleṭ

25.

Av h*î*na hindike tê girtin p*ê*şî

Piştî bû ro[1455] çûy*î*na pêşyê ġeleṭ

26.

Şiv[1456] h*î*na ṭerr e eger ney rast kirin

Pişt*î* ʿişk bû rastkirina wê ġeleṭ

27.

Hêj ku ronî ye negijî menzilan

Ġer*î*ban ra şev ç*û*yîn bin da ġeleṭ

28.

Neç*û*ye avan h*î*na roja te xurt

Xu reha key[1457] ji hemî karê ġeleṭ

29.

Bigirey rehberekî zana xu ra

Da nebî wenda di vê çola ġeleṭ

30.

Yan bibe zana bi her dirb û rehan

Da nebînî zeḥmetan b`karê ġeleṭ

31.

Kar(i)wan çû hate êvar ma li cih

Ah **Ḥezînê** jar li vî warî ġeleṭ

32.

---

[1455] **Ro**: Çem, rûbar

[1456] **Şiv**: Şivik, dar, darika testan

[1457] **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike

Hêvîya bêhêvîyan tu`y ey delal
Mat b*û*ne mane li ber warê ġeleṭ
33.
Çav*ê* me girtîye pas û tarî ye
Naqetînin rasitîyê ji ġeleṭ

**66.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun
Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –
1.
Şerab*a* fîncana dilan xweş û zelal e bê ġeleṭ[1458]
Gulek*î* şîn bûye di dil bêḥed delal e bê ġeleṭ
2.
Kî ku vexû wê şerbetê saġ dim*î*nit ḥetta ebed
Kesê bibîne wê gulê dimî*nit* bengî bê ġeleṭ
3.
Geş(i)tîya gula dilan ebed*î* ye yeqîn bizan
ʿIşqa xu pê va girtîye baqî ye wek wê bê ġeleṭ
4.
Di nêv*a* ḥadiṣ[1459] û qedîmê[1460] da *fer*qek mezin heye
Çawa qedîm dibit mekan bo ḥadiṣa tewş û ġeleṭ
5.
Piçek ḥerî bipeke ser berfê dibit dest da xuya
Hinek ṭenî ji rûy*ê* dilkeş ra dibit ʿeyb û ġeleṭ
6.
Laîq*ê* ser belgê gulan xunav û şebnem[1461] her bitin
Pekandina çilka ḥudûṣ[1462] li rûy*ê* napeyda ġeleṭ
7.
Laîq*ê* sosina qedîm ṣifat*ê* napeyda ne her
Birrîn*a* kinca ḥadiṣê li bejn*a* napeyda ġeleṭ

---

[1458] **Ġeleṭ**: Çewt, şaş
[1459] **Ḥadiṣ**: Ew tiştê ku dûre peyda bûye, ne ezelî ye, destpêka wî heye. Ji xêncî Xwedê her tişt hadîs e.
[1460] **Qedîm**: Ew tiştê ku despêka wî nîne, ezelî.
[1461] **Şebnem**: Xunav
[1462] **Ḥudûṣ**: Hadîs, ew tiştê ku dûre peyda bûye, ne ezelî ye, destpêka wî heye.

8.

Ḥetta qiyasa dîtina li nad*î*tiyan nay kirin

Saġ û mirî çawa li ser hev bin qiyas û bê ġeleṭ

9.

Rastî dixazî ey bira îdrak*a* kunhê[1463] zeḥmet e

ʿUmmanekî kûreh*î* pir ʿeqlan di wê mat û ġeleṭ

10.

Çawa digêjit ‘eql*ê* meşnûʿan[1464] bi Şaniʿê eḥed[1465]

Ma nas diket dîwar û mase çêkerê rast û ġeleṭ

11.

Ji hendese`w[1466] muhendisan ma heye pîlan ra xeber

"Tefekkerû fî`l-mexluqî"[1467] natîye ku tên ber ġeleṭ

12.

Rêwîy*ê* rahê ḥeq divêt wek berf*ê* wî dil bit sipî

Îskan û neynika şehan piçek qirêjî lê ġeleṭ

13.

Dilê bi pasa gunehan tarî b*û*ye bê nefʿ[1468] bizan

Pêxistina lanba bi ḥerrîyê ṣ*o*waġ bûye ġeleṭ

14.

Divêt evîn dil ra hebit ronî bidit bi nûr*a* ḥeq

Eger nebit lanbê d*a* gaz ji hêv*î*ya nûrê ġeleṭ

15.

Zinar*ê* dil bi zenc*î*ra ʿişqê tenê tête kişan

Yan ne, bi kendiran kişandina tirênê pur ġeleṭ

16.

Dozer*a* ʿişqê lazim e veket reha feyżê di dil

Veger*î*na reha çiyan bi ṭevr û bêran e ġeleṭ

17.

---

[1463] **Kunh**: Heqîqet, ‘esl

[1464] **Meşnû**ʿ: Aferîde, mexlûq

[1465] **Şaniʿê eḥed**: Ew hunermendê ku yek û bêheval. Mebest jê Xwedayê Jorîn e.

[1466] **Hendese**: Endaze, geometrî

[1467] Di mexlûqê (tiştê ku hatine afirandin) de tefekurê bikin.
Îşareta vê hedîsê dike: **لا تفكروا في الله , و تفكروا في خلق الله**
(Taberanî, el-Avsat, 6456; el-Lâlâkâî, es-Sünne, 1/119/1-2; Beyhâkî, Şuabü’l-Îmân, 1/75; Ebu Nuaym, el-Hilye, 6/66-67; el-Elbânî, es-Silsiletü’s-Sahîha, 4/395.)

[1468] **Nef’**: Menfaat, havil, sûd

Kesê dixazit bulbulan divêt biçe baġê gulan

Bo dîtina şahan ç*û*yîna gom û axûran ġeleṭ

18.

Hevalê şahan lazim e rûnê li şûna pur temîz

Rûniştina li mîndera ṭajîy*ê* zanan ra ġeleṭ

19.

Laîq bi merdanê Xuda[1469] ra kinc*a* parastin*ê* ye

Xukirina çeka[1470] qirêj rinda cihanê ra ġeleṭ

20.

Dil lazim e nebit giran zêde bi eşġalê dunê[1471]

Pêxistina firrê li ṭeyyara giranbar pur ġeleṭ

21.

Paqiş bikey dil û bixemilîn bi sosinê x*û*yan

Ji bo nebit cehd[1472] û xebata te heba û ber ġeleṭ

22.

Bustan*ê* neyêt kaġ kirin,[1473] kulbe kirin[1474] ṭofê d*ê* qenc

Nejoy t*ê* da ji hêvîya girtin*a* meḥṣûlan[1475] ġeleṭ

23.

Bi av*a* ʿirfan û gulê yeqîn û ʿilmê qenc *key* dil

Çer bulbulê nûra Xuda ra weste qelbê têk ġeleṭ

24.

Kesê nebit qelbê w*î* da nûra Xuda mirî bizan

Hevalîya bi mirîyan ji saġ dilan ra pur ġeleṭ

25.

Dûr be ḥeta karî, hewar! ji wan mirî dilê dewar[1476]

Ji bo nemînî ist*û*xar tev wan perîşanî ġeleṭ

26.

Digel nebaşan ger bibî dibî nebaş û xûxirab

---

[1469] **Merdanê Xuda**: Ew mêr/kesê ku di rêya heq/Xwedê de ne

[1470] **Çek**: Kinc, cil, libas

[1471] **Eşġalê dunê**: Mijûliya dinyayê

[1472] **Cehd**: Xebat, şixul

[1473] **Kaġ kirin**: Alax kirin, gihayê biyanî ji kok ve derxistin

[1474] **Kulbe kirin**: Amûrê kulb, tevir, xepar. Destiyê wê dar e, serê wê jî bi hesinê hatiye çêkirin. Kulbekirin jî navê wê şixulê ye ku bi kulbê xweliyê kolan e.

[1475] **Meḥṣûl**: Ber, zad

[1476] **Mirî dilê dewar**: Ew dilê wan mîna yê dewaran in û mirî ne.

Her kes digel heval*ê* xu ḥeşîr dibit nîne ġeleṭ[1477]

27.

“Wekûnu meʿes-sadiqîn”[1478] madam ku gotîye Xuda

Bil ji durûstan ra hevalî ẓulm û xusran û ġeleṭ

28.

Bibjêre hevalan **Ḥezîn** dû ra bibe wan ra heval

Bê tecrube hevalîya bi her merovê zêr ġeleṭ

29.

Destê xu bermedey ji pêşa yar û merdanê Xuda

Ji bo nebî çola dunê da bê hewar û rê ġeleṭ

30.

Kesê bibit wenda liha[1479] nîne w*î* ra dawî dilo

Bibe hevalê rehberan ji bo nebî dawî ġeleṭ

**67.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + −

1.

Dil ji ber wan şîş*ê* ʿişqê bûye daġ [1480]

Lew w*î* her nalî ye wek bulbul*ê* baġ

2.

Bû ṭ*î*rêjek roj*a* ḥusnê[1481] tê xuya

Hilkirî tê da hezar ar[1482] û çiraġ [1483]

3.

Ew dilê tê da hebit ẓerrek*ê* ʿişq

Nam*î*nit tê da tu car piçek feraġ [1484]

4.

Ẓerrekî ʿişqê dunê wêran diket

Pêdixe agir*ê* dişwar wekî maġ [1485]

---

[1477] Mirov [di roja heşrê] bi hezkerê xwe re ye. (Ebû Dawûd, Edeb, 113; Muslîm Birr, 50)

[1478] Digel merivê rastan re bibin. (Tewbe: 9/19) û (bnr. 52/4)

[1479] **Liha**: Li vir

[1480] **Daġ**: Birîna ku bi hesinê sorkirî tê çêkirin.

[1481] **Ḥusn**: Rindî, bedewî, spehîtî, xweşikî

[1482] **Ar**: Agir

[1483] **Çiraġ**: Çira

[1484] **Feraġ**: Valatî, valahî

5.

Germîya agir*ê* ʿişqê bêḥed e

Diḥelit henber w*î* qelbê wekî saġ

6.

ʿIşq ji bil sosin*ê* xûyan hez n*a*ket

Dil ji exlaqê xerab qenc bi*key* kaġ[1486]

7.

Dil ji kanîya ʿ*iş*qê vexû qimek

Bê keder ḥetta ebed dimîne saġ

8.

Tev li şalûlan[1487] feżaya ḥusn*ê* da

Bi perê ʿişqê diket firr û belaġ[1488]

9.

Tek ḥużûra caw*î*danê[1489] ʿişq didit

Ey **Ḥezînê** dil birînê tewş dimaġ[1490]

**68.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Dilber*ê* dil da danîye bi dûrîyê ṣed şîş û daġ[1491]

Biskeyn*ê* kesk[1492] vewşandîye[1493] dil kiriye fena û daġ

2.

Ava ḥeyatê her dizêt ji dev û lêvê wê`y bedew

Çilkê x*o*ya wekî xunav[1494] danîye dil da heft*ê* daġ

3.

Ew kewmeşa[1495] zivînbeden[1496] nêrînxweşa şîrînsuxen[1497]

---

1485 **Maġ**: Ew tîrê ku tiştan dişewitîne

1486 **Kaġ**: Kax kirin, alax kirin, gihayê biyanî ji yên baş cudakirin û kok ve derxistin

1487 **Şalûl**: Şalûr. Çivîkek weke bilbilê dengxweş e

1488 **Belaġ**: Gihîştin

1489 **Cawîdan**: Bêdawî, sermedî, ebedî

1490 **Dimaġ**: Eql, hiş

1491 **Dax**: Birîna ku bi hesinê sorkirî tê çêkirin.

1492 **Biskeynê kesk**: Biskên kesk, keziyên kesk.

1493 **Vewşandin**: Veweşandin, daweşandin, hejandin

1494 **Çilkê xoya wekî xunav**: Ew dilberê ku dilopek xwêdana wê wekî xunavan xweş û pak

1495 **Kewmeş**: Rêveçûyîna wek kewan. Ango meşa dilberê ye ku wekî ya kewan bihejîn û xweşik e.

Mulk kirye ʿalema dilan lêxistîye nîşan û daġ

4.

Pur wend*a* ye pur wend*a* ye, çawa bike bê feyde ye

Dilê nedît bi şîş*a* ʿişqa yar*ê* ser guhê xu daġ

5.

Beyhûde ye beyhûde ye, wek xanîyê wêrane ye

Dilê nebit bi ʿişq*a* yara sermedî[1498] kebab û daġ

6.

Dilber bes e êdî were, ji perdehan derkev der e

Te bi d*û*rî dil kir ker e, êdî bibir hicran[1499] û daġ

7.

Dil şewitî dil şewitî ber ţîn*a* ʿişqê perritî

Vekey derê reḥmê bedew bi dûrîyê dil mekey daġ

8.

Dil bû birîn dil bû birîn, bi tîr*ê* wan birhê ş*î*rîn

Zor e teḥemmul nakirin evqas cefa û derd û daġ

9.

Dilbende yim dilbende yim, ji kar*ê* xu şermende yim

Li hêvîya luţfa te yim, dil çû helak ji jan*a* daġ

10.

Pêşyê li me xweş hat evîn dû ra li me şêlû b*û* jîn

Karê me bû şîn û g*î*rîn dil da vebû ṣed êş û daġ

11.

Rojê me tarî bûn temam derket ji destê me zimam[1500]

Karê me bûn fiġan mudam ji berd*ê*lê kûr bûye daġ

12.

Qijîn bi mîlaka[1501] me xist hejîn bi ʿalema me xist

Agir bi kîllera[1502] me xist wê dûr*î*y û wan derd û daġ

13.

---

1496 **Zivînbeden**: Ew yara ku bedena wê mînanî zîv û zêran dibiriqe.
1497 **Şîrînsuxen**: Şîrînkelam, xweşaxêv
1498 **Yara sermedî**: Ew dilbera ku ji ezel heta axir her heye, ango Xwedê.
1499 **Hicran**: Cudabûn, veqetîna ji yarê, fîrqet; êş û derdê cudabûnê.
1500 **Zimam**: Gem, gemê heywên
1501 **Mîlak**: Cerg, ceger, kezeb
1502 **Kîller**: Kîler, xenzik, xanî

Dil da nehîşt piçek hedan[1503] wan kûrbirînê pur bi jan

Hêstir di çavan da çikand wê ʿişq*a* dil kiriye daġ

14.

ʿIşqa delala rû zelal pêxist di dil ṣed reng şemal[1504]

Nehîşt me yê jar da tu ḥal wan bisk*ê* karê wan e daġ

15.

Ḥikmetrija şîrînkelam da me bi mujganan[1505] selam

Got ġem mekin nîne mudam jana ku çê bit ew ji daġ

16.

Ji bo bibî nas û durist li dil me nîşana xu xist

Bi qan*û*na roja elest[1506] dostan dikin bi ʿişq*ê* daġ

17.

Ġeman mekey êdî **Ḥezîn** qetan[1507] ji bo te nîne şîn

Çendan ku dûr bî tê d*í*yîn[1508] lewra te hey nîşan û daġ

18.

Wenda nekey wan ṣorgulan wan dil bi ʿişqê va kelan

Da lez bigijî menzilan tev bulbulê dil da ne daġ

19.

Dûr be ji her xar û xesî[1509] rûnê li kunc bi kerḥesî

Da`b ḥalê te kes neḥesî ger te hebin ṣed êş û daġ

20.

Taliʿ[1510] bi meqsûda[1511] te tê dilber bi serdana te tê

Mizgîn bi gîhana te tê eger bi ʿişqê dil be daġ

**69.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

---

1503 **Hedan**: Aram, sebr, tebat

1504 **Şemal**: Çira, find, mûm

1505 **Mujgan**: Bijang, mijang

1506 **Roja elest**: Bezma elest, peymana elest. Xwedê Te'ala gava ku 'alema ruhan afirand ji wan re wiha got: "Elestû bî Rebbîkûm?" (Ma Ez rebbê we nîn im?) Hingê ruh jî wiha bersîv dan: "Kalû, bela." (Belê, Tu rebbê me yî.) Ew bûyer di Qurana Pîroz de derbaz dibe. Ew cihê ku ruh hemî berayî bal hev bûne re "bezma elest, meclîsa elest", ji wê rojê re "roja elest" û ji sozdayîna wê rojê re jî "peymana elest" tê gotin. (Pala, *b.n.,* r. 72.)

1507 **Qetan**: Cudayî, veqetan, dûrketin, fîrqet

1508 **Tê diyîn**: Tê dîtin

1509 **Xar û xesî**: Stirîn û sinc. Li vir qest, ew kesên ku di gotinên xwe de ne rast in, mirovên xwar e.

1510 **Tali**ʿ: Bext, sernivîs

1511 **Meqsûd**: Armanc, mebest, meqsed

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Min dî cehana fan*î* da ber tewş*î*yê bêḥed xilaf[1512]

Hinek di dest da ne murad, yê dî bi wan ra kin[1513] xilaf

2.

Madam ku xaliqê eḥed[1514] danîye teqsîmat[1515] û ḥed[1516]

Êdî ji bo çi ye ḥesed daha çima çê bit xilaf

3.

Xuda di zikê biġ*ê*ran xarin didit mar û m*û*ran[1517]

Eger nebî ji dilk*o*ran bo rizq*ê* xu dikey xilaf

4.

Xuda di serm û berf*ê* da bi kov*î*yan xarin dida

Eger nebî bê behwerî[1518] nakey ji bo zik tu xilaf

5.

Subḥan[1519] ji karê dilberê, alistina nigan kirî

Ji hirç*a* hûrgir[1520] ra t*ê*r î, wuṣay çi ye derd û xilaf[1521]

6.

Binêr*î* deryayê li ḥût[1522] çi ye ji wî ra bûye qût[1523]

Bi çi evqas mezin dibût[1524] ji dil diçit şekk û xilaf

7.

Luṭfa Xudayê lemyezel[1525] raxistye rizqê bê bedel

Têr kir*î*ye bizin bi pel rakey ji dil çiyay xilaf

8.

Eger nebî tu bê beṣer[1526] darda dibî`b qulpê qeder

---

[1512] **Xilaf**: Dij, dijber, dijberî
[1513] **Kin**: Dikin
[1514] **Xaliqê eḥed**: Ew Xwedayê ku yek û tenê ye û hevalê wî tune ye
[1515] **Teqsîmat**: Dabeş, dabeş kirin, parvekirin
[1516] **Ḥed**: Sînor
[1517] **Mûr**: Mûrî, morî, gêle, gêrik
[1518] **Behwerî**: Bawerî
[1519] **Subḥan**: Subhanellah. Baneşana şaşbûn û ecêbmayînê ye wek; Hela hela.
[1520] **Hûrgir**: Zik mezin
[1521] Hirç di ziviztanê de diçe cihekî û da kû bihar tê radizê. Di wê demê de debara xwe bi rûnê bedena xwe dike û lingê xwe dialêse. Li vir jî tefekkûra Xwedê dike û dibêje: Ey Xwedayê mezin, te hirçekî ewqas qeder gir û terrikî afirandiye lê ew bi tenê alastina lingê xwe di zivistanê de xwe têr dike da kû bihar tê. (H.)
[1522] **Ḥût**: Masiyên herî mezin, balîna
[1523] **Qût**: Xwarin, xurek, zewade
[1524] **Dibût**: Dibit, dibe
[1525] **Lemyezel**: Ewê ku wenda nabe, her heye

Ji dil dibî toza keder jê derdixî pûmê[1527] xilaf

9.

Her tişt bi teqdîra Xuda xuya dibit jîna me da

Ḥesûdîyê bikey cuda nevêj*î* dil ṭovê xilaf

10.

Dû ra dibî dawî nebaş ji jîn*a* xweş dimîn*î* paş

Ji xûy*ê* qenc dibî tiraş dûr be ji girnûga[1528] xilaf

11.

Şeyṭan bi çavnebarîyê[1529] ket ḥerrîya rûreşîyê

Dûr ket ji dergahê Xuda li pişt*ê* ma barê xilaf

12.

Qabîl[1530] bi çavnebarîyê bû duşmenê biratîyê

Ket xendeqa pîşman*î*yê bû dara agirê xilaf

13.

Firʿewn bi çavnebarîyê poz rakirî bêxud*a*tî

Lê xiste bay qurretîyê[1531] ġerq kir di deryaya xilaf

14.

Qarûn bi çavnebarîyê birrî d*a*ra kurap*î*yê[1532]

Girtê reha fesad*î*yê çû xar di qadê ber xilaf

15.

Bû Le*heb*[1533] bi çavneb*a*rîyê nedît roja Îsl*a*mê

Ket tar*î*ya înkarîyê şaş ma di yabana[1534] xilaf

16.

Lêxist nîşana kufr*ê* ḥeq bû weku masîyê li req

Çikkî ji ser ava *î*man feṭis*î* ber ṭava xilaf

17.

Madam ku insan î bira nexo hevalan wek guran

Pevçûn nekey wekî keran di bin giranbarê xilaf

---

1526 **Beser**: Çav, dîtin
1527 **Pûm**: Bûm, kund, pû
1528 **Girnûg**: Gihayekî bi stirî ne.
1529 **Çavnebarî**: Dexesî, hesûdî, çavreşî
1530 **Qabîl**: Yek ji wan zarokên Hz. Adem e ku birê xwe, Habil, kuştiye.
1531 **Bay qurretîyê**: Bayê quretiyê
1532 **Kurapî**: Kurê apê. Li vir qala mesela Qarûn û Hz. Mûsa (as.) dike. Lewra Qarûn kurapê Hz. Mûsayê bû.
1533 **Bû Leheb**: Ebû Leheb. (bnr. 16/7)
1534 **Yaban**: Çol, çolistan

18.

Bin lah*û*tê[1535] ra nas*û*t[1536] e gula b*aġ*ê melek*û*t[1537] e

Welê ji kemalan r*û*t e eger hebit tev wê xilaf

19.

Divête sernermî te ra ji pêl*ê* beḥra teqd*î*rê

Bayê muxalîf radike wan pêl*ê* têtin ber xilaf

20.

Eger tu qayîl bî bi wan ṣebrê bikey li êş*ê* wan

Reha dibî ji her kulan eger nebit te ra xilaf

21.

Ḥetta ku mast ney kil kirin[1538] di parz*û*nan ney da kirin

Mumkin e rûn jê rakirin ey dil birîndarê xilaf

22.

Bi tecruban divêt mirov bête k*î*yan her wekî gov[1539]

Wek kovîyan nemîne hov bê meʿr*î*fet û xû xilaf

23.

Dilber*ê* neynik girtîye li ber dilê me danîye

Ṣûret*ê* karan[1540] girtîye gerek qebûl gerek xilaf

24.

Divêt merov hişar*î* be li kar*ê* xu guhdar*î* be

Ferman*ê* ra sernerm*î* be teqdîr*ê* ra neket xilaf

25.

Ji bo ku sernerm in melek nig dan*î*ne serê felek

Ṣad in bi ḥalê xu gelek dûr in ji her pûkê[1541] xilaf

26.

Ḥeywan*a* serʿişk e her roj lê dix*î*nin çoyan[1542] li poz

Birçî û tî dikin mudam da jê biçit xûyê xilaf

27.

Dizan*î* tu ḥekîm kî ye kesê birîn li xu d*î* ye

---

1535 **Lahût**: Îlahiyet, ‘alema îlahî, alema me’newî
1536 **Nasût**: Însaniyet, her tiştê ku bi însanan re ‘eleqedar e
1537 **Melekût**: ‘Alema mulkê Xwedê; alema ruhan
1538 **Kil kirin**: Di nav meşk, qoq an jî sirsimê de mast kiyandin
1539 **Gov**: Gok, top
1540 **Kar**: ‘Îş, şixul
1541 **Pûk**: Bahoz, bager, gilele
1542 **Ço**: Çov, şivik, çiv

Her qul*ê* ve derbaz b*û*ye kîp kiriye[1543] derê xilaf

28.

Eger bibînî wan kesan wan qenc û wan xweşnefesan

Bibe li cem ji kerḥesan nekey ji wan ra tu xilaf

29.

Guh de bi dil şîret*ê* wan bigre bi can gotin*ê* wan

Bermede rah û rîç*ê* wan santîmekî meçe xilaf

30.

Lewra reha wan e d*û*rist tê da n*î*ne newal û best

Nehêle ew biçe ji dest lewra giranjan e xilaf

31.

Ya Reb me yê **Ḥezînê** jar, me yê belengazê neçar

Bigîne wan qencan biġar[1544] me girtîye rahê xilaf

32.

Îro ji karê xu me hey dil da hezar birîn û key

Yara me yê bêḥal bikey reha[1545] ji gîrdaba[1546] xilaf

33.

Di baġirê şînan[1547] d*a* bûm şevxan[1548] mudam her wekî pûm[1549]

Kêfxweş bi jîna xu nebûm lew dil di nêv sincê xilaf

**70.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Şukur *î*ro şahê şeref hat baġ*ê* dil bi nay û def[1550]

Mizgîn ji ruḥ ra be ku şah serdan*a* wî kirye hedef

2.

Şahê dilan e ʿîs*a*dem[1551] wek ṣorgula baġê irem[1552]

---

[1543] **Kîp kiriye**: Dadaye, daxistiye, qûfilandiye, girtiye

[1544] **Biġar**: Bi lez, zû bi zû

[1545] **Bikey reha**: Xilas bike, rizgar bike

[1546] **Gîrdab**: Gerav, gerînek

[1547] **Baġirê şînan**: Zinarê xem û derdan, çiyayê keseran

[1548] **Şevxan**: Bi şev xwendin. Lewra bûm/kund bi şev dixwînin.

[1549] **Pûm**: Bûm, kund

[1550] **Nay û def**: Herdu jî amûrên mûzîkê ne. Nay, bi pifkirinê; def jî bi lêdanê deng derdixe.

Bi wê diçin her derd û ġem paqiş dibin dil wekî berf

3.

Ṭîrêjekî nûra zelal, ji yar*ê* bû dil ra heval

Ruḥ bû li henber ker û lal, ġerq bû di beḥra feyż[1553] û luṭf[1554]

4.

Nisbet dihat wek ṭavîyan[1555] bej[1556] dikirit wek avîyan

Pê şîn dibû gulê x*û*yan di qelb*ê* têk ḥuzn û esef

5.

Şukur *î*ro şîn têk firîn ah û keser hatin birîn

Saġ bûn li dil hemî birîn bi hatina şahê şikerf[1557]

6.

Ruḥ çû ji hêlûnê bi der çû baġ*ê* dilber tê meqer[1558]

Diçû dihat wekî s*î*per[1559] li dor*a* wî şahê şeref

7.

Dema ku hat bayê şeba[1560] ser bejn*a* yara xweş῾eba[1561]

Mest bûm bi bêhn û heş reva hatin ṭ*î*rêj ji çar ṭeref

8.

Ġerq bû di beḥra nûr*a* mor[1562] hatin temaşayê ji dûr

Ji Fas[1563] û Cawa[1564] û Lehûr[1565] rûḥanîyê yaran bi xef

9.

Dil bû ji gulzarê cemal hatin ji her hêlê heval

Ji Şam[1566] û Şîraz[1567] û Ḥicaz[1568] bo dîtina wî ref bi ref

---

[1551] **'Îsadem**: 'Îsanefes, helma wî/ê wekî ya Hz. 'Îsa. (Hz. 'Îsa bi hêlm/bêhna xwe nexweşan baş dikir û miriyan j gorê radikir.)

[1552] **Baġê irem**: Padîşahek bi navê Şeddad, baxçeyek ku xwestiye bila bişibe bihiştê çêkiriye û navê wê jî baxê îrem daniye. Baxê bihiştê.

[1553] **Feyż**: Ji qelb, dil, ruhê mirov re herikîna/hatina 'ilm, nûr, bereket, tiştên manewî û hwd. e

[1554] **Luṭf**: Qencî, çêyî, axaftina xweş û nazîk, tevgera bi rindahî

[1555] **Ṭavî**: Rêjne, rejne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demeke kurt dibare.

[1556] **Bej**: Erd, reşahî

[1557] **Şikerf**: Pîroz, bimbarek

[1558] **Meqer**: Cih, war, şûnewar

[1559] **Sîper**: Minminîk, pirpirok, baperik

[1560] **Bayê şeba**: Bayê ku ji hêla rojhilatê tê. Bayekî hênik e û her tim tê.

[1561] ῾**Eba**: Cureyek ji libasê ye ku bi hiriyê hatiye çêkirin û kincekî fireh e.

[1562] **Mor**: Rengê pembeyê, kinûşk

[1563] **Fas**: Dewleta Fas. Li bakûrê rojavayê parzemîna Afrîqayê ye.

[1564] **Cawa**: Dewleta Cezayîr. Li bakûrê parzemîna Afrîqayê ye.

[1565] **Lehûr**: Bajarekî Pakîstanê ye. Cihekî kevn û dîrokî ye.

[1566] **Şam**: Paytexta dewleta Sûriyê ye. Bajarekî kevn û dîrokî ye. Dî dîroka Îslamê de jî xwedî cihekî girîng e lewra gelek 'alim û zana li wir gihîştine.

10.

Fûlaẕ*ê*[1569] qelbê me b*û* nerm bi at*û*na[1570] evîn*a* germ

Ya Reb şukur te ev kerem kir nêz b*û* dil biçe telef

11.

Ya Reb me hêvî hey ji te nebî v*î* ḥalê qenc ji me

Hey hey bikey me yê guneh ji feyż û luṭfê ra hedef

12.

**Ḥezîn** ji bil te bû cuda mal û melal[1571] kirye feda

Dema li dil nûrê veda hîştin hemî kitab li ref

13.

Ew dilbera şîrîneda[1572] rûfennera[1573] rengînliqa[1574]

Bi ʿişq*ê* dîza dil keland jê rakirî dûman û kef

14.

Çendan heye zeḥmet evîn bi ṣohtin û jan û g*î*rîn

Welê dikey dilan bi ṭîn paqiş wekî zulal[1575] û berf

15.

Lew rah*ê* ʿişqê da hezar bengî bi mûyek bendewar

Wek sêwîyan in ist*û*xar zarîn dikin wek nay û def

**71.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Çiqas xweşbêhn û xweşreng in gulên bustan*ê* Tilmeʿrûf[1576]

---

1567 **Şîraz**: Bajarekî li Îranê ye. Bajarekî kevn e, gelek caran wek paytext hatiye bikaranîn, di mîmariyê de gelek avahî hatine çêkirin. Ji bo Farisan warekî gelek girîng e. Şêx Se'dî Şîrazî û Hafiz ji wî bajarî ne.

1568 **Ḥicaz**: Li 'Erebîstanê herêmek e. Di wê herêmê de bajarên Mekke û Medîne jî cih digire. Ji ber vê yekê cihekî pîroz e.

1569 **Fûlaẕ**: Pol, pola, çelîg

1570 **Atûn**: Firin, argûn, ocax

1571 **Melal**: Mal, xanî, avahî

1572 **Şîrîneda**: Xweşdeng, şîrînawaz

1573 **Rûfenner**: Rûgeş, ew dîlbera ku rûyê wê wek hîvê, fenerê dibiriqe, ronak e.

1574 **Rengînliqa**: Hevdîtina xweş û rengîn a bi dilberê. Dîtina dilberê ye ku dilber carna bi kincên rengîn ve xwe dixemilîne û ji evîndarên xwe re dixuye, derdikeve li hemberî wan. Hingê ji bo evîndaran her der, her tişt wekî libasên dilberê rengo rengî dibe, hiş li serê wan namîne.  Li ku mêze dikin wek dilberê rengîn dibînin.

1575 **Zulal**: Navê kurmekî ye ku li berpalên çiyayên bilin, binê berfê de çêdibe. Kurmikên berfê jî dibêjin. Hindî tilîkî mirovan mezin dibin. Di hindurê wan kurmikan de av heye ku ew av gelek şîrîn û xweş e. Li vir mebest ji zulalê ew ava xweş e.

Li zozanê j*o*rîn nîne m*î*na reyḥan*ê* Tilmeʿrûf

2.

Çiqas şîrîn û nûrîn e Xudêyo merqeda[1577] narîn

Hemî feyż û p*î*rozîn e c*a*mî`w dîwan*ê*[1578] Tilmeʿrûf

3.

Melekxû ne xweşikrû ne, bi reqṣ û cez̲b û govend in

Bi adaban xudî bûne, feqe`w mêhvan*ê*[1579] Tilmeʿrûf

4.

Hewar e murşidê ʿalem dilê kul ra divê melhem

Tu haydar[1580] î ji me jaran eman luqman*ê* Tilmeʿrûf

5.

Tu ʿIzzeddîn*ê*[1581] şîrîn î, sitûna sunnet û dîn î

Gelek comerd û zengîn î, tu yî serkan*ê*[1582] Tilmeʿrûf

6.

Bi ḥeqqê Eḥmedê S̱anî[1583] Muḥemmed Meʿṣ*û*mê[1584] fanî

ʿElauddîn*ê*[1585] nûranî binêr dûrman*ê*[1586] Tilmeʿrûf

7.

Neẓerkî berde ser min da çiku ji dil birîndar im

Tew dixtorê hemî derda hewar ḥalzan*ê*[1587] Tilmeʿrûf

8.

Ji kerwanan gelek dûr im di vê yaban*a* bêdawî

Hewarê bal te ve tînim hilo Belyan*ê*[1588] Tilmeʿrûf

---

[1576] **Telmeʿrûf**: Gundekî girêdayî Qamişloyê ye. Di dawiya şerê cihanê yê yekemîn de hatiye çêkirin. Gundê Şêxê Xezna ye. Şêx Ehmedê Xezna li wir çûye rihma Xwedê û merqeda wî li wir e.

[1577] **Merqed**: Gor, tirb

[1578] **Dîwan**: Cihên ku mêvan û sofî diçin lê rûdinên, suhbetê dikin

[1579] **Feqe`w mêhvan**: Feqe û mêvan. **Feqe**: Feqî, suxte, şagirt, xwendekarê medresê

[1580] **Haydar**: Agahdar

[1581] **ʻIzzeddîn**: Şêx Îzzedînê Xezna. (bnr. 8/16)

[1582] **Serkan**: Serê kanê, serê me'denê ango serê Tilme'rûfê

[1583] **Eḥmedê S̱anî**:  Şêx Ehmedê Xezna. (bnr. 9/27)

[1584] **Muḥemmed Me'ṣ*û*m**: Şêx Muhemmed Me'sûm. Di sala 1915'an de li gundê Xeznaya Qamişloyê hate dinê. Kurê Şêx Ehmedê Xeznayê ye. Di 24 saliya xwe de xilafetê jî ji babê xwe girt. Bi ilm, tesewif û îrşadê re mijûl bû. Di sala 1958'an de li gundê Tilme'rûfê wefat kir. Piştî xwe şeş xelîfe hîştin ku yek ji wan birê wî Şêx Elauddîn Xezna bû. (http://www.ahmedhaznevi.net/seyh-muhammed-masum-el-haznevi-(k.s)-284.html 18.04.2015)

[1585] **ʻElauddîn**: Şêx Elauddînê Xezna. Kurê Şêx Ehmedê Xezna ye. Li gundê Xeznayê hatiye dinê. Li cem bav û birayê xwe yê mezin di medreseyan de xwendiye. Piştî wefata Şêx Elauddîn di sala 1960'an de derbasî şûna wî bû. Di gelek gund û deveran de îrşad kir, ji bo doza Îslamê geriya. Di sala 1969'an de wefat kir. (http://www.ahmedhaznevi.net/Seyhalaaddinhaznevi-seyh-alaaddin-haznevi-239.html 18.04.2015)

[1586] **Dûrman**: Ew kesên ji Tilme'rûfê dûr mane

[1587] **Ḥalzan**: Ew kesê ku halê mirovan dizane, mirşîd, welî

9.

Şukur îro Muḥemmed ma li şûna rehber in Xezna

Xudêyo wî biparêzî m*î*na şahan*ê* Tilmeʿrûf

10.

Hemî derman*ê* derdê dil li cem wan e xerab ḥalo

Kana[1589] feyż û kemalatan li ba pîran*ê* Tilmeʿrûf

11.

Bi wanan menzilan ṭey kin[1590] bi wanan qelb*ê* xu ḥey kin[1591]

Birînê kûr bi wan key kin[1592] bi wan rêzan*ê* Tilmeʿrûf

12.

**Ḥezîn** im mame aware[1593] ji ġeyrî we n*î*ne çare

Sitûxar û belengaz im Muḥemmed can*ê* Tilmeʿrûf

**72.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Ji ber çîka qetanê[1594] dil diçîka[1595] tim bi roj û şev

Li ber ṭîna evînê dil bi ṣohtin bû bi roj û şev

2.

Şukur îro bi gihanê b*û*ye dilşad û pur şahî

Bi bêhna sosina geş mest*ê* wicdan e bi roj û şev

3.

Wekî masî li req mabû di germa ṭav*a* hicranê

Şukur îro bi weṣlê[1596] ġerq*ê* ʿirfan[1597] e bi roj û şev

4.

Bi oksicîn*a*[1598] rindîyê kelîye dil bi yarê ve

---

[1588] **Belyan**: Yek ji navê Hz. Xidir e.
[1589] **Kan**: Çavkanî, serekanî, ocax
[1590] **Ṭey kin**: Rêpêçan, di rê de wek birûskê çûyîn,
[1591] **Ḥey kin**: Sax bikin, jîndar bikin
[1592] **Key kin**: Qenc bikin
[1593] **Aware**: Beredayî, sêwak
[1594] **Çîka qetanê**: Êş û jana cudabûnê
[1595] **Diçîka**: Diqîre, dike gazî
[1596] **Weṣl**: Gihîştin, gihandin
[1597] **ʿIrfan**: Zanîn, nasîn, nasîna Xwedê
[1598] **Oksicîn**: Oksîjen, di kîmyayê de “$O_2$”

Zîra ẕikrê zimanê wî hemî yar e bi roj û şev

5.

Bi bayê bengîtîyê dil di beḥra meḥwê[1599] da wer bû

Civana durrê[1600] ʿirfanê wî ra kar e bi roj û şev

6.

Cehan gerçî bûye dafa[1601] dilan lêkin leṭîf e dil

Keṡîf[1602] çawa letîfê[1603] ra dibit zenḥîr[1604] bi roj û şev

7.

Cehan û mafîha[1605] têk da nikarit dil bixit qeydê

Gelo ṣed[1606] sedd[1607] û dîwar ma dibin maniʿê[1608] roj û şev

8.

Dema dil emrê yarê ra bi nuṣḥê ʿişqê bû serkeş

Ji karînan bi der hat dil wekî hatina roj û şev

9.

Dema bazê evînê gujgujî[1609] ser bulbulê dil da

Xu avêt bağçeyê yarê senaxan[1610] e bi roj û şev

10.

Di bin siha ceberûtê[1611] li ser ava reḥemûtê[1612]

Li henber sosina ḥusnê wî hey şahî ye roj û şev

11.

Bi fikihê[1613] ṣifatê ḥeq li ser wê dara napeyda

Digirit leẕẕeta ruhî û ʿeqlî her bi roj û şev

12.

Ji bo wê ruḥ bi lerzîn e wekî bayê ketî tayê[1614]

---

[1599] **Meḥw**: Tunebûn

[1600] **Dur**: Mirarî

[1601] **Daf**: Dafik, telik, xepik, kemîn

[1602] **Keṡîf**: Hişk, tîr, sift. Ew tiştê ku xwedan hecm e. Wek; kevir, şekir

[1603] **Letîf**: Ew tiştê ku ne xwedan hecm. Wek; ba, hêlm, bêhn

[1604] **Zenḥîr**: Zincîr

[1605] **Mafîha**: Ew tiştên ku di dinyayê de nin, li dinyayê çi hebe hemî mafîha ye.

[1606] **Ṣed**: Jimara sedê, di matematîkê de "100"

[1607] **Sed**: Bend, dîwar

[1608] **Maniʿ**: Asteng, berbest

[1609] **Gujgujî**: Êrîş kir

[1610] **Senaxan**: Meth xwendin, pesn dayîn

[1611] **Ceberût**: 'Alema qehra celala Xwedê, qudret, celadet, mezinahî, ezamet

[1612] **Reḥemût**: 'Alema rehma cemala Xwedê

[1613] **Fikih**: Fêkî. Kurdên binxetê ji fêkî re dibêjin "fikih"

[1614] **Ketî tayê**: Direcife, bi hejîn e, bi lerzîn e

Bi ceẕb[1615] û ʿişq û lorîn e wekî bulbul bi roj û şev

13.

Çûka ʿeql û xeyala min ji ḥissê ḥey(e)wanî dûr

Feżaya lamekanî[1616] da diket firrê bi roj û şev

14.

Bi çavê nas*î*yê nêrîn diket bal gul*a* napeyda[1617]

Digirit ḥikmet û feyżan ji eṭwaran[1618] bi roj û şev

15.

Dema bayê şuûnatan[1619] p*ê*lê wê gêr diket ser hev

Dibin wek hev ji ʿeqlê ra *î*man û kufr û roj û şev

16.

Ji ʿewrê lah*û*tê[1620] baran*a* ʿirfanê dikev xarê

Ji rûyê bûk*ê* sirran perde tên pêçan bi roj û şev

17.

Dibin ba û beden wek hev, dibin zar û kefen wek hev

Li ber dil raz*ê* veşartî xuya têtin bi roj û şev

18.

Digel tiştê ji can rût in w*î* hey seyran û gerran e

Digel sade ruḥan mucẕûb[1621] û mestane bi roj û şev

19.

Cihê canan biket seknê, ne ḥeddê cism û canan e

Gihana wê gula nazik bi rûtruḥan e roj û şev

20.

Cisim bo ku keṣîf e bend û qeyd e jê r*a* her tiştek

Ji bo eṣlê w*î* ax e tenbel û sist e bi roj û şev

21.

Ji bo ku fan*î* ye her dem di fanî da ye her wî çav

Di yara baq*î* da reġbet bi ruḥan e bi roj û şev

22.

---

[1615] **Ceẕb**: Ji ber evîn û hezkirina Xwedê jixweçûn e

[1616] **Lamekanî**: Bêmekanî, bê cih û warî

[1617] **Gula napeyda**: Mebest jê cemala Xwedê ye

[1618] **Eṭwar**: Hal, rewş

[1619] **Şuûnat**: Tecelliyata Xwedê; li ser tiştan, kelmelan, karan diyarbûna Xwedê

[1620] **Lahût**: Îlahiyet, ‘alema îlahî, alema me’newî

[1621] **Mucẕûb**: Meczûb, ji xwe çûye, dîn

Ji bo ku ġafil e bêḥed giran e nakevit pê leq

Hîşarruḥ e li ber yaran diket gerran bi roj û şev

23.

Eger insan neyêt paqişkirin ji ḥiss*ê* ḥeywanî

Ji her ḥal û meqematê[1622] dibit aware roj û şev

24.

Ji qadê[1623] yê diçit jor û dibit reḥmet û tête jêr

Heçî avê ji cismê ax*î*n in rût in bi roj û şev

25.

Ji bo firdî wekî zîbeq[1624] û avê bal semawatan[1625]

Divêt germîy*a* ʿişqa tê ji ṭava ḥusn*ê* roj û şev

26.

Wekî ʿewran feżaya lah*û*tê da da bikey seyran

Ji ḥissê cism*ê* axîn in cuda be her bi roj û şev

27.

Eger ṣade nebit av û leṭafet jê r*a* nebit weṣf

Dibit ʿewr û gulan heşîn diket aya[1626] bi roj û şev

28.

Digel axê mukedder[1627] bit biçit ser çi dibit ʿeybdar

Zuha ket qirrikê li dar û gihayan bi roj û şev

29.

Ji ḥiss û hewesê cisman*î* lazim e bibit rûtruḥ

Wegerne[1628] wek *a*va şêlû w*î* kar zîyan e roj û şev

30.

**Ḥezîn** lal û kerr û dîn e ji karê xu bi gîrîn e

Ji çavan hêstirê xûnê dibarîne bi roj û şev

31.

Ji ʿilmê bû wekî derya ji rahê ḥeq b*û*ye wenda

Nezanit çi ye ev sewda ku da dajo w*î* roj û şev

---

[1622] **Meqamat**: Pirjimariya "meqam" e. Meqam, cih.
[1623] **Qad**: 'Erd, zemîn
[1624] **Zîbeq**: Ciwa, di kîmyayê de "Hg"
[1625] **Semawat**: Asîman
[1626] **Aya**: Gelo
[1627] **Mukedder**: Qirêj, gemarî
[1628] **Wegerne**: An na, yan na

32.

Me hêvî hey ji wan yaran bikin nêrîn li me jaran

Tenê mame li şûn waran hedan nîne bi roj û şev

**73.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + −

1.

Hey di dil da me ji ber derdê firaq[1629]

Bi hezaran daġ [1630] û eşkencê firaq

2.

Kar*ê* me gîrîn û şîn e hey û hey[1631]

Lew me dil daye bi şahînê firaq

3.

Ḥesret û kerb û keder karê me ne

Mat b*û*me mame di yabana[1632] firaq

4.

Herdu çav hey dirijin hêstir*ê* xûn

Lew di çavê dil d*a* hey sincê[1633] firaq

5.

Ah ç*î*ka wey bav emana me birî

Lew di dil da tê dirêt[1634] şîşê firaq

6.

Pur giran jan e Xuda çawa bikem

Dar*a* dil rabû li ber bayê firaq

7.

Çaw*a* rakir keçk*ê* zeʿf[1635] dûr nebira

Wê sitemkar û w*ê* xûnrêja firaq

8.

---

[1629] **Firaq**: Cudabûn, cudayî, hicran
[1630] **Daġ**: Birîna ku bi hesinê sorkirî tê çêkirin
[1631] **Hey û hey**: Her tim, her dem
[1632] **Yaban**: Çol, çolistan
[1633] **Sinc**: Dirî, stirîn
[1634] **Dirêt**: Diçe, tê re çûyîn
[1635] **Zeʿf**: Jar, ze’îf

Mirina nîva hevalan çêtir e

Ji gihana nêv neyaranê firaq

9.

Ṣuḥbeta naehl*ê* ra dil mirin e

Hey hewar dûr be ji bazarê firaq

10.

Nefiroşî cewhera dil bi p*û*lan[1636]

Ned*î* bêdera dilan bayê firaq

11.

Ṣed keser, çawa me wêran kirye dil

Sosina dil da me[1637] naehlê firaq

12.

Wek gula geş taze û rûken bû dil

Pirmilî[1638] bin da bi sar bayê firaq

13.

Bêhnxweş û nêrînxweş û rengxweş b*û* dil

Bû fena şakîl[1639] bi payîza firaq

14.

Çek li ser bejnê qeta bû ġerq*ê* xûn

Reş girêda dil dema nêz bû firaq

15.

Wek guran dil kir ji baġê wî cuda

Dest*ê* naehlê sitemkarê firaq

16.

Berx*ê* dil dûr xist j*ê* birr û girt û çû

Wan gurê devbix*û*nê harê firaq

17.

Wekî bazan pêşy*ê* çavê dil rijand

Lewr*a* çû hey ma di nêv xarê firaq

18.

Serteser ʿalem li ser wî tar*î* bû

---

[1636] **Pûl**: Dirav, pere
[1637] **Da me**: Me da, me daye
[1638] **Pirmilî**: Çilmisî
[1639] **Şakîl**: Pelê ku ji dara maziyê/çamê hişk dibe û payîzê dikeve ʻerdê

Lew wiṣalê naqetînit jê firaq

19.

Bo gihana yar*ê* çendan xu dixo

Pişt*î* kor bû ser d*a* ser ṣalê[1640] firaq

20.

Ser gemîya[1641] ‘işq*ê* suwar bûn çûn heval

Ah tenê mame di deryaya firaq

21.

Nav*a* pêlan da me zarîn e mudam[1642]

Nêz e can dim ez di şor ava firaq

22.

Kevirê aşan ji cî davêje dûr

Bay*ê* pêlê biç*û*kê beḥra firaq

23.

Deng*ê* pêlan têne xarê baġiran[1643]

Dil dibin pare ji ber pêlê firaq

24.

New*ê*rin şahîn*ê* dilpola[1644] bikin

Nêr*î*nê bal hêl*a* deryaya firaq

25.

Hey hewarxaz in ji qeptanê du kewn[1645]

Da reha kin me ji gîrdaba firaq

26.

Bil ji wî nîne me ra feryadires

Lew zelal e ser me ra ava firaq

27.

Bil ji wê nîne xeber kes ra ji me

Çi dibînin em di gîrdaba firaq

28.

Ma gelo nayêt hewar bo me gelo

---

1640 **Şal**: Kevirê pehn û mezin

1641 **Gemî**: Keştî

1642 **Mudam**: Her dem, her tim

1643 **Baġir**: Zinar, lat

1644 **Dilpola**: Dilê ku wekî polê xurt û hişk

1645 **Du kewn**: Herdu ‘alem, ango dinya û axiret e

Nayê reḥmê yar li jaranê firaq

29.

Çoleke têk ḥerr*î* ye çola firaq

Deşteke têk dirr*î* ye deşta firaq

30.

Xu bi destê xu nevêj arê[1646] firaq

Xar nekey çavê xu da xarê[1647] firaq

31.

Ṭov*ê* curm[1648] û gunehan hêşîn dikin

Di reha yarê d*a* dirrîyê firaq

32.

Ji gunehan dûr be ḥetta kar*î* dil

Da nemînî hey di yabana firaq

33.

Bil gunehkaran n*î*ne kes bê murad

Kes n*î*ne bil wan li zinnarê firaq

34.

Ji hewa[1649] û ḥiss*ê* nefsê dûr keve

Da nemînî tim di bin barê firaq

35.

Bigre çavê xu ji tiştê nefs divêt

Da nebînî xu li sergoyê[1650] firaq

36.

Ger tu insan î bizan tekrîm[1651] çi ye

Kar*ê* mêşa gû ye sergoyê firaq

37.

Ve*key* çavan ji gunehan bireve

Wer nebî da tu di zinnarê firaq

38.

Bil merovê kordil e nîne tu kes

---

[1646] **Ar**: Agir
[1647] **Xar**: Stirîn, dirî
[1648] **Curm**: Guneh
[1649] **Hewa**: Daxwazên nefsê yên nebaş
[1650] **Sergo**: Zibar, zibil, qirş û qal, çop, cihê ku rêx tê avêtin
[1651] **Tekrîm**: Qencî, çêyî, şabaşî

Bi gunehan ketye çamûra[1652] firaq

39.

Bi hesanê[1653] fikr*ê* ṭûj key şûr*ê* ʿeql

Jê ke bavêj ser ji ser bejna firaq

40.

Bê tefekkur nev*ê*je yek gavekî

Danîye nefsê hezar dafê firaq

41.

Li ziyanê kinc*a* karê kirye wê

Rihtîye[1654] hingiv li ser jara firaq

42.

Guh mede wek hevbûna resm û rûyan

Çê dibit wek hev be ʿIraq[1655] û firaq

43.

Cenneta himmetbilinda ne ʿIraq

Dozexa[1656] himmetbilinda ne firaq

44.

Baġ*ê* şalûlê[1657] dilan e her ʿIraq

Daf*a* şalûlê dilan e her firaq

45.

Meġelê nêrîy*ê* mêran e ʿIraq

Ax*û*rê naxir*a* kêman[1658] e firaq

46.

Ger teleffuẓ da heval in şîr û şûr[1659]

Şîr şifa ye şûr silaḥê her firaq

47.

Gerçî Kurdistan û Gurcistan[1660] n*ê*z in

---

[1652] **Çamûr**: Herî

[1653] **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û kêran tûj dikin, kevirê tûjkirinê

[1654] **Rihtin**: Rijandin, ro kirin

[1655] ʿ**Iraq**: Dewleta Iraqê.

[1656] **Dozex**: Dojeh, korim, cehenem

[1657] **Şalûl**: Teyrekî mînanî bilbilê dengxweş e.

[1658] **Kêm**: Merivê kêm, nîvaqil

[1659] **Şûr**: Di hin devokan de ji şûr re "şîr" tê gotin. Bi tîpên erebî ve nivîsandina wan herdu peyvan wekî hev in. bnr. Ehmedê Xanî, *Nûbehara Biçûkan*, Analiz ve Şerh Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2008, r. 375.

[1660] **Gurcistan**: Dewleta Gurciyan. Li başûrê Rûsyayê û bakûrê rojhilata Tirkiyê ye.

Lefẓ*ê* dalê[1661] hey di nêv wan da firaq

48.

Lewr*a* Kurdistan ş*û*na meʿnarewan[1662]

Emm*a* Gurcistan cihê dostê firaq

49.

Lewr*a* Kurdistan ş*û*na dilqencan e

Emm*a* Gurcistan cihê şeklê firaq

50.

Lewr*a* Kurdistan ş*û*na xû nerman e

Emm*a* Gurcistan cihê sincê firaq

51.

Em **Ḥezîn** in dilbirîn in çavbixûn

Ya Îlahî, me reha key ji firaq

52.

Gerçî şîretker xuya me ez bi der

Lê bi hindur dil me wek şaġê[1663] firaq

**74.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Çû şeva derdan dilo hilbû di meşrîq[1664] da şefeq

Tê ṭ*û*rê qelban[1665] li pey hev nûr ji hêla luṭf*ê* ḥeq

2.

Xweş dibilqê av*a* ʿirfanê[1666] ji çavîyê[1667] dilan

Tê dirêjit ser zimanan wek xunava roj*ê* zerq[1668]

3.

Hey li ser belgê gula rûyê h*î*şaran ew xunav

---

[1661] **Dal**: "**د :** dal". Di alfabeya 'Erebiyê de tîpa heyştemîn e. Kurdistan bi tîpên 'erebî "**كردستان**", Gurcistan jî "**كرجستان**" tên nivîsandin. Cudahiya nivîsandina wan tîpa "**د :** dal" e.

[1662] **Meʿnarewan**: Ewê ku hêla me'nayê de diçe

[1663] **Şaġ**: Kevirên hişk û pehn yên li ber çeman

[1664] **Meşrîq**: Rojhilat

[1665] **Ṭûrê qelban**: Çiyayê qelban. Li vir qelb şibandiye çiyayê Tûrê ku Xwedê li wê derê diyar bûbû.

[1666] **ʿIrfan**: Zanîn, nasîn, nasîna Xwedê

[1667] **Çavî**: Cihê ku av jê dizê, çavkanî, serekanî

[1668] **Zerq**: Zeretiya rojê ku hêj nû hildibe

Hildiçînin wan dilopan bi hezar şahîy*ê* xelq

4.

Nay*ê* xîsa[1669] te dilo her dem h*î*şar û jîr*î* be

Ev zemanê hingivîn pur lez diçit her weke berq[1670]

5.

Nûbehar e zerkulîlkan dîtine ḥeddê kemal

Bicivîne hingivê wan hêj te ra hey gerr û leq[1671]

6.

Di gulana[1672] xortîyê da lazim e hîşarb*û*yîn

Lew h*î*şarbûna p*î*rîyê ji xewê nîne tu ferq

7.

Ey **Ḥezîn** tewş wan kulîlkê xortîyê mekey ji dest

Dû r*a* wek masî dibî bê av*a* ʿirfanê li req

**75.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Dilo rabe dilo rabe bibîne bo xu dermanek

Xerabḥal î xerabḥal î perîşan î bi yek carek

2.

Hezar cî da birîndar î umûr nakey umûr nakey

Nezan im ez nezan im ez çima naket te da kajek

3.

Kirî talan kirî talan seraya te xerabxûyan

Hîşar nabî h*î*şar nabî bi ḥalê xu qewî halek

4.

Wekî Hîtler[1673] wekî Hîtler te rêkir mulk*ê* elmanî

---

[1669] **Xîs**: Kêf, şahî

[1670] **Berq**: Birûsk, birq

[1671] **Leq**: Liv, bizav, lebat

[1672] **Gulan**: Meha gulanê, meha pêncan a ku 31 roj diajo. Mebest jê “bihar” e.

[1673] **Hîtler**: Adolf Hîtler. (1889 Awûstûralya- 1945 Elmanya) Ji 1921’an pê ve “Fûhrer” ango rêbera Partiya Karkerên Alman a Nasyonalsosyalîst (*Nationalsozialistische Deutsche Arbeiterpartei*, *NSDAP)* kiriye û ji 1933’an şûnde jî serokwezîrê Elmanyayê bû. Li Elmanyayê dîktatoriya nîjadperest ava kir. Di şerê cihanî ya duyemîn de xwest ku heyfa xwe ji dijminên xwe hilîne. Dîsa di rêveberiya wî de nêzî şeş mîlyon cihû hatin kuştin. (https://tr.wikipedia.org/wiki/Adolf_Hitler 03.01.2015)

Dibêjî tewş dibêjî tewş cihanê da ez im şahek
5.
Digot qenc im digot qenc im wekî te ibl*î*sê ey dil
Çi bû dawî çi bû dawî ji êgir ra nebû darek?
6.
Dileyzin hey dileyzin hey wekî te mas*î*yê avan
Xeber nînin xeber nînin dibin qurban*a* baranek
7.
Ditirsim ez ditirsim ez ji nişkêv da werit ser te
Lehîya mirinê nîne te ra yek ẕerre îmanek
8.
Bikey nêrîn bikey nêrîn li koşka xu demek ey dil
Perîşan e perîşan e di bin da wek xerab warek
9.
Ne kasa zêr*ê* ʿirfanê ne tasa ʿişq û îmanê
Ne ew xûyê zerefşanê[1674] heye tê da ne wicdanek
10.
Were carek were carek temaşa key li baġê xu
Ne sosina hedanê hey t*ê* da ne şahiy û şanek
11.
Biçûleskî[1675] b*û*ne tev da bi bayê pay*î*zê nêrgiz
Ne bêhna nisbeta rûḥê heye tê da ne xweş ḥalek
12.
Nede berbay*ê* payîza fesadê wan gulê nazik
Bi destê xu nekey wêran tu baġê xu wekî korek
13.
Hevalîya xerabxûyan kirî bajar*ê* dil talan
Zû key çêkey *zû* key çêkey li ber wan bo xu dîwarek
14.
Welê girtin*a* rê ser Yeʾc*û*cê[1676] xûyê xirab ey dost

---

[1674] **Zerefşan**: Kesê/a zêran belav dike û davêje, zêravêj, zêrbelaker
[1675] **Biçûleskî**: Çilmisî, pirmilî
[1676] **Yeʾcûc**: Ye'cûc û Me'cûc. Herdu jî navê civatê ne. Dibêjin ku li nêzî roja qiyametê dê derkevin holê û li rûyê erdê fesadiyê derxînin. Di Qurana pîroz de di sûreyên Kehf (ayet 88- 96) û Enbiya (ayet 96- 97) navê wan derbaz dibin. Ji Quranê tê fêmkirin ku, ye'cûc û me'cûc li rûyê erdê carekî fesadiyê derxistine, cara dudyê jî nêzî

Nekare her kesî ra wek Sikender[1677] lazim e şahek

15.

Divêt behwarîyek[1678] bo te wekî sedda Ç*î*nê muḥkem[1679]

Wegerne tedb*î*ra te henberê xûyê xirab xabek[1680]

16.

Eger tih rakevî ey dil ji ḥalê xu bibî ġafil

Vexî avê çeman xew da dibit bo te gelo karek

17.

Tenê îqrar*a* dev tewş e eger dil da nebit teṣdîq

Hezar avê bi dev wer dî dilê tih ra dibit feydek

18.

Neyêt ava *î*manê ser ziman ji qelb*ê* kûr menbe[1681]

Wekî çilkê li ser belgan dibit zuha bi yek ṭavek

19.

Eger dara *î*manê bernedit rîçek*î* xu dil da

Ji pûka[1682] fitne û derdan ji bin ve radiket surrek[1683]

20.

Bi ava kar*ê* qenc ey dil tu av de dar*a* îmanê

Wegerne[1684] ẓen mekey jê digirî xu ra ji wê meywek

21.

Di meşka fikrê da ḥetta dikarî qenc bikey karek

Wegerne tête karê hungivînê te wekî jarek

22.

Seh key pêşîy*a* xu pur qenc d*û* ra bavêje gavê xu

Mujûlî bê tefekkur nîne jê ra qîmet û qedrek

23.

---

roja qiyametê derkevin holê û dîsa fesadiyê derxin. Li gorî sûreyê Kehfê, rojek Hz. Zûlqerneyn ber bi rojhilatê ve derketiye seferê, piştre berê xwe daye bakûrê. Wê demê rastî qewmekî hatiye ku gazindê ye'cûc û me'cûcê kirine û ji Hz. Zûlqerneyn xwestine ku navbera wan de bend/seddek ava bike. Bi wî avayî dayîna bacê qebûl kirine. Zûlqerneyn jî bi alîkariya wan wê bendê ava kiriye. Tê gotin kul i nêzî roja qiyametê ew bend dê hilweşe û di dinyayê de dîsa fesadî derkeve û ew jî bi destê civatên Asyaya Navîn ve dê çêbe. (Pala, *b.n.,* r. 480-481.)

[1677] **Sikender**: Sikenderê Zûlqerneyn. (bnr. 9/5)

[1678] **Behwarî**: Bawerî

[1679] **Muhkem**: Tam, têkûz, zexm

[1680] **Xab**: Xew

[1681] **Menbe**: Çavkanî

[1682] **Pûk**: Bahoz, bazor

[1683] **Surrek**: Bayekî hênik, maşelan

[1684] **Wegerne**: Yan ne, an na

Ji Luqmanê Ḥekîm[1685] pursîn te ev zanîn ji çi rakir
Ji koran gote lewra kor nedavêt bêfikir gavek
24.
Mujûlî ba ye tête der ji lêvan car*î* dî ey dil
Veger jê ra n*î*ne mumkin sukût key yan bibêj xeyrek
25.
Mujûlî ger ji zîv bit têt sukutî zêrê xaliṣ dil
Negûhêze bi zîvan zêrê xu`y xaliṣ wekî dînek
26.
Ḥeta teşxîṣ neket êşê gelo dixtor didit derman
Weha ye nab*ê*jit zana dema çê neb*î*nit lafek
27.
Bi ezman[1686] hatine dardakirin cihan*ê* da pur kes
Egerçî[1687] nîne wan ra bil ji ezman qeṭ xerabxûyek
28.
**Ḥezîn** êdî bibrî çendan dirijî ḥikmeta sade
Heçî tiştê bi piryê ve biçit nîne jê ra şanek
29.
Eger xewda nebit guhdar jê ra evqas pir e lewra
Hîşaran ra dibit vingîn*a* mêşê her wekê sazek

**76.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun
Remel – + – –/– + – –/– + –
1.
Hey felek ẓalim felek xain felek[1688]
Can ji canan te cuda kirye gelek
2.

---

[1685] **Luqmanê Ḥekîm**: Li gorî hin mufessîran pêxember, welî an jî mirovek salih bûye. Beriya Îslamiyetê jiyaye. Luqman, hekîmek ku hemî nexweşiyan karibûye baş bike bûye. Pisporê gihayan bûye. Çi nebat, giha kêrî kîj nexweşîyê dihat dizanîbûye. Ji çar aliyê dinyayê gihayên cûrbicûr cem hev dike û dermanê nemirinê dibîne. Dibêjin ku dest bi nivîsandina formûla wê dermanê dike lê bayek xurt tê û wê defterê dibe, rûpelên wê bela vela dike. Û bi vî awayî dermanê nemirinê jî êdî nayê dîtin. Di Qurana pîroz de derheqê Luqman de; ew kese ku jê re hikmet hatiye dayîn, tê gotin. (Pala, *b.n.,* r. 290.)
[1686] **Ezman**: Ziman
[1687] **Egerçî**: Welew ku
[1688] **Felek**: Felek, çerx, dolab, gerdûn

Ez û dilber her wekî berx û mihê

Çer te qîm kir[1689] me cuda key wek gurek

3.

Hêj ji şîrê dê nebû têr mêtinê

Ṭer û taze nûcuwan bû çû helek[1690]

4.

Dê ji dara danî meywe qet nexar

Bi qetanê[1691] bû du ker lê qelb û cerg

5.

Barînê berxa sêwî çûye sema

Ji fiġan û dengê wê qil bûn[1692] melek

6.

Tev li ahan agirê derket ji dil

Çi şewatek xist dilê şêr û piling

7.

Baġirê[1693] ʿişkê li ser hev hirifîn

Heyl û meded[1694] ketye nêv ʿalem bi deng

8.

Berxekî ʿalem hîşar kirye bi deng

Şîn û gîrînê dikin ser yek mihek

9.

Hey felek ʿalem bira hev ket bes e

Ber mihê dayn bo Xuda berxê demek

10.

Hey felek ġeddar felek wey bav felek

Çer te îstûnê hesin kirne xelek

11.

Hey felek xeşmê[1695] bibir bextê te da

Berx li ber bayê te bûye wek kepek[1696]

---

[1689] **Çer te qîm kir**: Te çawa qêmîş kir

[1690] **Helek**: Hilak, helaq, mehfbûn

[1691] **Qetan**: Cudayî, veqetan, dûrketin, fîrqet

[1692] **Qil bûn**: Cingdan, cî xwe de pekîn, pengizîn

[1693] **Baġir**: Lat, zinar

[1694] **Heyl û meded**: Hawar, alîkarî

[1695] **Xeşm**: Xezeb, xişim, hêrs

12.

Waye laxur[1697] nêz e wê pare biket

Ma guney te nay bi vê berxa çeleng

13.

Roj li ser berxa reben bû mah û sal

Ev çi rojê tarî ne çi ṭaliʿek[1698]

14.

Hêj ne girtî gul ji bustanê dunê

Ba ji cih rakir bi jor ve wek kereng

15.

Hêj bi jîna xu`y şîrîn kêfxweş nebû

Hilb*û* dil da pêt û dişwar agirek

16.

Hêj negîştê ḥewş*ê* serda hat d*î*war

Hêj ne gîştê gol*ê* ket torê semek[1699]

17.

Bo diha xu[1700] rah*ê* Hindê[1701] girt û çû

Wend*a* kir rê del*a*[1702] Hindê çû fireng[1703]

18.

Ev çi rêkî zor e bê dost û heval

Ev welatek har e bê nan û nemek[1704]

19.

Ahî ʿumrê me buhûrî serteser

Me ji jîna xu nedît yek raḥetek

20.

Pay*î*z e hat ser gulan da bay*ê* sar

Bor*î* mewsim me negirt xu ra gulek

21.

---

1696 **Kepek**: Kapek, kapik, kelpik
1697 **Laxur**: Leşxur, leşxwar, beratexur, kelaxxur, yê ku leşan dixwe
1698 **Ṭaliʿ**: Bext, qeder
1699 **Torê semek**: Torê masiyan
1700 **Diha xu**: Diya xwe, dayîka xwe
1701 **Rahê Hindê**: Rêya welatê Hindistanê
1702 **Del**: Bedel, li şûna wê
1703 **Fireng**: Firengistan, welatên biyaniyan
1704 **Nem**: Xwê

Bi muradan zû heval şabûn dilo

Lê murada me tenê maye dereng

22.

Dilberê carî tecella key li dil

Dil ji ber arê qetanê bû pureng[1705]

23.

Dûr nebe bextê te da dil pare bû

Kun ʿeṭûfen bî cerîḥîn fî ḥelek[1706]

24.

Pur **Ḥezîn** im jar û dîn im istûxar

Reḥmê key yara li vî rêdûrê leng[1707]

**77.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Dilê bû mexzena îman û ʿirfanê dibit geş wek

Gula ber ro[1708] dibit menẓûr[1709] bi her ḥal û bi her anek[1710]

2.

Dilê kundê nifaqê[1711] danîye tê da bizan xopan[1712]

Nehêle koşk*a* dil da çi ji kufra her wekî arek[1713]

3.

Tu çer gastîn*a*[1714] salaran[1715] dikey axûr ji hespan ra

Bi destê xu ç*a*wa nêv çav*ê* xu da xar dikey[1716] xarek[1717]

4.

Dil e hêlûn*a* teṣdîq û *î*manê her di insan da

---

[1705] **Pureng**: Pereng, kozir, pêta êgir, pola êgir

[1706] Bişefqet bibe ji bo wî birîndarê ku di taritiyê de ye.

[1707] **Leng**: Kulek, şaht

[1708] **Ro**: Çem, rûbar

[1709] **Menẓûr**: Ew ê ku tê dîtin, tê temaşekirin, tê ‘ecibandin

[1710] **An**: Dem, gav

[1711] **Nifaq**: Xerebebûn, dubendî, gelacî, bi dil cuda bi derve cuda xuyabûn

[1712] **Xopan**: Kavil, wêran, xirbe

[1713] **Ar**: Agir

[1714] **Gastîn**: Meclîs, cihê rûniştin û axaftinê

[1715] **Salar**: Giregir, pêşeng, serek, serok

[1716] **Xar dikey**: Tê re dike, dike xwarê

[1717] **Xar**: Stirîn, sinc

Neşîne bazê kufrê ser hélûna çûçika yek tek

5.

Dunê da bo çûka îmanê nêçîrê diket her kes

Ji dest te ger biçit îman dibî bê nêçîr û behrek[1718]

6.

Dibit beyhûde mayîna dunê da bona te êdî

Ji zengînî û zanînê tije bî her wekî beḥrek

7.

Belê zanîna bê îman wekî ava di beḥran da

Ji bil qada ku av tê da dibînit nefʿê[1719] her tiştek

8.

Eger îman nebit xizanîy û neçarî ye s̠erwet

Gelo ronatîya rojê ji koran ra dibit nefʿek

9.

Eger îman nebit maldarî xusran û ġem û derd e

Ji yaqûtê di nêva cergê da hêvî dibit karek

10.

Gelo Firʿewn û Nemrûdan digel Qarûn û Şeddadan[1720]

Ji xezna[1721] s̠erwetê weqta ʿez̠abê girtine qirşek

11.

Gelo Eflaṭûn[1722] û Suqraṭ[1723] digel Lamark[1724] û Calînos[1725]

Ji zanînê dema mergê[1726] ji wan ra bû heval ḥerfek

12.

Ji nûra roja îmanê wekî şevşevokan[1727] korbûn

Ji bona agirê rêz bûn wekî daran bi yek carek

---

[1718] **Behr**: Par, pişk, pay

[1719] **Nef**ʿ: Menfa'et, havil, sûd

[1720] **Şeddad**: Navê şahê qewmê 'Ad. Bi navê îrem bajarekî bi koşk, qesr, bax û baxçe ava kirine û piştre doza xwedatî kiriye. Herwiha di dewra Hz. Hûd de jiyaye û guh nedayê wî û hem ew hem jî baxê îrem helak bûne. (Pala, b.n., r. 423.)

[1721] **Xezna**: Gencîne, xizne

[1722] **Eflaṭûn**: Platon. (bnr. 16/8)

[1723] **Suqraṭ**: Soqrates. (bnr. 16/8)

[1724] **Lamark**: Jean Baptiste Pierre Antoine de Monet, Chevalier de Lamarck. (1744- 1829) Zanyarekî Fransizî ye. Li ser heywan û nebatan xebitine. Bi xebatên xwe yên li ser peresînê (evolutin/evrim) namdar bûye. Li wê qadê gelek teoriyên wî hene. Lê fikr û ramanên wî bi kişfbûna genetîkê ji holê rabûne.

[1725] **Calînos**: Galen, Claude Galen, Galenos. (bnr. 16/8)

[1726] **Merg**: Mirin

[1727] **Şevşevok**: Pêçermok, baçemok, çilîçilî

13.

Îman nûr e ji qelban ra wekî roj e wekî luks e

Ġerîb rê da şeva tarî dibit bê nûr çûyîn marek

14.

Bi ẕenna masî destê xu dixî bin kevîrê avê

Nezanî mar di bin da ye bi gezkî wî dibî darek

15.

Çi heylo ez diçim ser menzilê bê nûr dibêĵî lê

Wekî te pur kesan gotin, ji wan ma te nekir ʿarek[1728]

16.

Hela bê nûr di raha dûr bi çavê kor û bê destkeş

Kî hey serbest diçit ser menzilê canan wekî avek

17.

Kerê kufrê tu dîn î ẕen dikem ya cahil î lewra

Cesûr î wek kerê Mişrê didî avê ḥeta navêk

18.

Binêre kûr bi çavê dil li bezma[1729] ʿalema mêran

Ji mulkê bal melekûtê[1730] kî avêt bê îman gavek

19.

Gelo bê kaġida îẕnê diçit kes meclisa şahan

Weya bêper hewayê da dikarit fir bidit ṭeyrek

20.

Eger îman nebit çawa di meʿnê da dikey seyran

Gelo geştî nebit deryayê da insan diket gerrek

21.

Dilê nûra îmanê tê nebit beyhûde ye tewş[1731] e

Semayê da eger roj nebitin nîne jê ra feydek

22.

Dixazî dil bimînit taze jê fikih[1732] bixûy her dem

Ji îman û ji ʿirfanê tu berde ser wî da avek

---

[1728] ʿ**Ar**: Şerm, heya
[1729] **Bezm**: Civak, meclîs
[1730] **Melekût**: ʻAlema mulkê Xwedê
[1731] **Tewş**: Beyhûde, vala, beredayî
[1732] **Fikih**: Fêkî, mêwe

23.

Eger îman û ʿirfan nebitin dil ʿişk û wêran e

Gelo av nebitin dar ter dimînit yan didit meywek

24.

Dixazî dil bibit ronî û laîq bit ji feyżan ra

Bi îmanê munewwer[1733] key bi ʿirfanê muzzeyyen[1734] bik

25.

Dixûnit bulbul û şalûl dibit xweşnêrîn û dilkeş?

Eger baġ û çimengah, sosin û gul û kulîlk rind nek[1735]

26.

Dilopek ava ʿirfanê ji dil ra bit neşîb carek

Dimînit saġ û geş ḥetta ebed bê êş û bê derdek

27.

Eger ḥerfek kitêba beḥṣa ʿirfanê bixûnî tu

Dibin Firdewsî[1736] û Wail[1737] li cem te her wekî çûkek

28.

Dibî lêvrêjê ḥikmet her wekî Gulşenî[1738] û Romî[1739]

Dibin Qanûnî[1740] û Erslan[1741] li bal te bê qîmet ferxek[1742]

29.

Lebaleb beḥra ʿirfanem xeredmendem suxendanem[1743]

Der în kişwer çû xaqanem kî men ʿerrafî yek yarek[1744]

---

[1733] **Munewwer**: Ew tiştê ku hatiye biriqandin, çirisandin, teyîsandin; ew tiştê ku binûr e

[1734] **Muzzeyyen**: Ew tiştê ku hatiye xemilandin, bixeml û xêz

[1735] **Nek**: Neke, nebe (Gul û sosin di bax û çîmengahan de rind nexuyîn, bilbil hîç li ber wê dixwîne?)

[1736] **Firdewsî**: Fîrdewsê Tûsî. (940 Tûs-1020) Di dewra Samanî û Xezneliyan jiyaye. Yek ji mezintirîn helbestvanên Farisan e. Kitêba wî ya Şêxname nêzî 60.000 malikan pêk tê. Wek "bavê zimanê Farisî" tê nasîn.

[1737] **Wail**: Sehbanê Wail. Gotarbêj û xatibê mezin. Bi zelal û fesîh axaftina xwe ve namdar bûye. Di kitêbên edebî yên berê de jî gelek caran navê wî derbas dibe û pesnî tê dayîn. Sadî Şîrazî jî di Bostan û Gulistana xwe de behsa wî dike, pesna herîkbariya axaftina wî dide.

[1738] **Gulşenî**: Îbrahîmê Gulşenî. Li gorî hin çavkaniyan li Diyarbekrê hatiye dinê. Hêj zaroktiya xwe de dest bi perwerdehiyê kiriye. Li Maweraûnnehîr û Tebrîzê xwendiye. Di serdema Şah Îsmaîl de ji zordestiya Şah Îsmaîl û siyaseta wî ya Şî'îtiyê reviye hatiye Amedê. Li wir medrese û dergahan de ders dane. Dîwana wî ya Ma'newî ku 40.000 malikan pêk tê, ji Mesnewiya Mewlana Celaleddînê Romî re wek nazîre, bi zimanê Farisî hatiye nivîsandin. Îbrahîmê Gulşenî nêzî 200 sal piştî Mewlana Celaleddînê Romî hatiye dinê lê wî Mewlanayê xwe re wek murşîdekî rûhanî qebûl kiriye. (bnr. Nihat Azamat, "İbrâhim Gülşenî", *DİA*, c. 21, 2000, r. 301-304.)

[1739] **Romî**: Mewlana Celaleddînê Romî. (bnr. 8/23)

[1740] **Qanûnî**: Qanûnî Sultan Silêman. (1494-1566) 10. padîşaha dewleta Osmanî ye. 46 sal li ser textê maye û di serdema xwe de nemaze li hêla Ewropayê gelek cî wergirtine.

[1741] **Erslan**: Mihemmed kurê Çaxrî. (1029-1072). Bi navlêka Alparslan namdar bûye. Duyemîn serwerê dewleta Selçûkiya Mezîn bû. Digel Kurdan li dijî Bîzansiyan şer kiriye.

[1742] **Ferx**: Çêlik, cûcik

[1743] Heta devê xwe bi 'irfanê ve tijî me, xwedî eql im, xeberê jî zanim bidim

30.

Der în baġê gulan cuz sosina reʿna nemînasem[1745]

Di nêva şehr*ê* dil ġeyrê delalê ra n*î*ne şûnek

31.

Bi ʿezma[1746] nezhetê[1747] dilber di baġê dil tecellî kir

Ji sirran perde têk rabûn nema mechûl*ê* dil sirrek

32.

Sirrê mulk û melekûtê bi mikroskob*ê* kişf nabin

Ji nûra rûy*ê* şîrînê xuya bûn her wekî hêkek

33.

Ji ʿewrê nûr*ê* sirbarîn[1748] li ser qada dilê vala

Giha û sosin û sunbul bira hev ket wekî pêçek[1749]

34.

Dema dem bulbulê feyżan ref û ref têne seyranê

Li pey hev pêl*ê* elṭafan[1750] di dil da xweş dikin gêcik[1751]

35.

Dûmana hav*î*na ʿişqê ne leylan[1752] e welê nûr e

Ji ʿeksa roj*a* lahûtî[1753] li henber dil tecellayek

36.

Mebe ġafil demek ey dil her roj xîsa[1754] te nayêtin

Tije key xu ji enwaran[1755] ji hebûnê ġered vayek[1756]

37.

Eger nûr nebitin çawa dinasî Xaliqê kewnê[1757]

Diçit bal meqṣedê ve kesk*î* bê ronî bi yek gavek

38.

---

[1744] Di wê welatê de wekî xaqan im, (lewra) naskerê yarekê me

[1745] Ji xeyrî wê sosina bedew di baxê gulan de keseke din nas nakim

[1746] ʿ**Ezm**: Qest, armanc

[1747] **Nezhet**: Henek, laqirdî, tinaz

[1748] **Sirbarîn**: (Ew ʻewrê ku) sirran dibarîne, razan dibarîne

[1749] **Pêçek**: Gihaya ku hev diale û dirêj dibe. Lavlavk, laflafok, lawlaw

[1750] **Eltaf**: Lutf, qencî, çêyî, îhsan

[1751] **Gêcik**: Gerav, gerînek, gîrdab

[1752] **Leylan**: Rewrewk, revrevik, serab

[1753] **Lahût**: Îlahiyet, ʻalema îlahî, alema me'newî

[1754] **Xîs**: Kêf, şahî

[1755] **Enwar**: Nûr, ronî, ronahî

[1756] **Ġered vayek**: Armanc ev e, mebest ev e

[1757] **Xaliqê kewnê**: Afirînerê gerdûnê

Şerabek ṣade ye nisbet di cama[1758] ṣade ya nûrîn

Vexî yek qeṭrekî carî di dil da nam*î*nit ranek[1759]

39.

Ji ser çeşmey*ê* ʿirfan tê bi destê dost*ê* yaran tê

Li qelbê kûrbirîn xweş tê wekî wê nîne dermanek

40.

Zemanek pur elemkeş bûm bi dil pergende û gêj bûm

Dilopek bû neṣîb bo min di dil da qeṭ nema derdek

41.

Ḥużûr û raḥet û şahî wekî mêşan li dil danî

Fiġan û derd û ḥesret bûn wekî toza li ber bayek

42.

Ji wê rojê ḥetta îro me dil pur şahîy û kêf e

Ji bustanê ḥeyatê wek me girtî nû xu ra sêvek

43.

Welê îman û ʿirfan û xulûṣ[1760] in nûr û çav û per

Ji vanan yek nebit peyda gihana meqṣedan ẓen mek[1761]

44.

Eger ixlaṣ[1762] nebit eʿmal[1763] ne meqbûl in li cem yaran

Ji ava şêlû ra çawa li nik şahan dibit qedrek[1764]

45.

ʿIbadet bê xulûṣ ger bête meydanê wekî nîne

Ji gûza pûç û sêva kurm*î* ra dil da dibit meylek

46.

ʿIbadet dar e, ixlaṣ av e, jîna wî diparêze

Ji dara ʿişk*a* bê av ra çilo hêvî dibit meywek

47.

Dixazî karekî hêja di nêva meleyê eʿla[1765]

Divêt peyda bibit ṣade bi awakî bi yek rengek

---

1758 **Cam**: Piyale, badîn, îskan
1759 **Ren**: Şek, guman
1760 **Xulûs**: Xalis, kirina bi dil û can, ji bo rizaya Xudê kirina tevger an jî tiştekî
1761 **Ẓen mek**: Zen meke, texmîn neke
1762 **Ixlaş**: Her tiştî tenê ji bo Xwedê kirin, di kirina ‘emelên xwe de tenê riza Xwedê xwestin.
1763 **Eʿmal**: ‘Emel, kirin, vîrik
1764 **Qedr**: Qedir, seng, biha
1765 **Meleyê eʿla**: Civata bilind, cemaata bala

48.

Zelalî lazim e lewra zulal[1766] şîrîn û narîn e

Welew kurm e di nêv axê welê wî dil wekî berfek

49.

Bi çend salan li pey weṣlê me ah û wah û feryad bû

Wekî goyîn*ê* bû yaran fiġanê me diçûn eflak[1767]

50.

Bi dil bûn pareyê agir hedan hate birîn bin da

Me ʿestî[1768] wek şima[1769] zer bûn wucûd bû şubh*ê* ʿişk darek

51.

Bi dengek dil şewat bû nazikê hey me terennum[1770] bû

Ji feryad û ji gîrîn û ş*î*nê vala nebû gavek

52.

Welê dilber qeṭ yek carek ji bin perdê bi der va nat[1771]

Dirêj bû hêvîya weṣlê dunê bû wek xerab warek

53.

Bi qeṣda tûtîya[1772] çavan reha gazan[1773] me girt û çûn

Li henber me xuya bû pir gir û tarî û kûr ġarek[1774]

54.

Ji bo derman*ê* derdê xu me qeṣda çûn*a* ġarê kir

Bi lerzîn û bi tirs û ta, ketin hindûr me dît kalek

55.

Li ser çokan wekî koma n*û*rê rûniştîye kerḥes[1775]

Di beḥra fikr*ê* da noq e w*î* ra bil wê n*î*ne bendek

56.

Me got, apo te xêr e vê şikeftê da te çok daye

---

[1766] **Zulal**: Navê kurmekî ye ku li berpalên çiyayên bilind, binê berfê de çêdibe. Kurmikên berfê jî dibêjin. Qasî tilîkî mirovan mezin dibin. Di hindurê wan kurmikan de av heye ku ew av gelek şîrîn û xweş e. Carnan mebest ji zulalê ew ava xweş e.

[1767] **Eflak**: Pirjimariya "felek"ê ye. Felek, çerx, dolab, gerdûn

[1768] **'Estî**: Hestî. Kurdên binxetê "hestî"yê wisa bi lêv dikin.

[1769] **Şima**: Mûma hingivîn, mûm. Zer e û di pîşesaziyê de tê bikaranîn.

[1770] **Terennum**: Nihûran, nehwiran, di ber xwe de nermenerm strîn

[1771] **Nat**: Nehat

[1772] **Tûtî**: Dermanê çavan, kil

[1773] **Reha gazan**: Rêya çiyayan

[1774] **Ġar**: Şkefta sirûştî, şkeft

[1775] **Kerḥes**: Bêdeng

Belê xêr e me ra got wî, tu xêr hatî eya[1776] dilṭenek

57.

Dema dilṭeng me ra gotî wekî dunya b*û* malê me

Hinek ma fir bidin bêper ji kêfan her wekî ṭeyrek

58.

Me zanî ew ḥekîmek zan*a* ye agah*ê* razan[1777] e

ʿEqilmend e bidilzan e me jê ra got hema qalek

59.

Em in dilbend*ê* dildaran şev û rojan me zarîn e

Ḥebîba ġemrevîn kanê nema me ṣebr û aramek

60.

Bi baran û bi ser baran me vê rê da bi rêkir mal

Me da can û cesed serda welê têk da nebûn tiştek

61.

Go ixlaṣ lazim e lewra ġiramek[1778] cewherê xaliṣ

Li bal merdan[1779] di qedr û qîmetê da tê wekî lîtrek

62.

Eger karê te xaliş bit beha nayê birîn jê ra

Bihişt û niʿmet û riḍwan[1780] û dîtin pê dibin karek

63.

Ji dest xu bermede nuṣḥê[1781] P*î*rê pêşîn[1782] di rîça wî

Biçe pur xweş digijî sosina reʿna[1783] tu bê teʿbek[1784]

64.

Eger ixlaṣ hebit rojî[1785] diçî şûna şehê rindan[1786]

Ji bo ku baq*î* ye dilber dibit gîştin neṣîb carek

65.

Reha dûr ra divêt ʿişq ta biçî ser menzilê canan[1787]

---

[1776] **Eya**: Ey ya! Baneşîna denglêkirinê ye.
[1777] **Raz**: Sir, nehênî, nepenî, xef
[1778] **Ġiram**: 1/1000 kg, gram
[1779] **Merd**: Mêr, mirov
[1780] **Riḍwan**: Dilxweşî, xweşhalî, razîbûn
[1781] **Nuṣḥ**: Şîret, pend
[1782] **Pîrê pêşîn**: Mebest jê Hz. Pêxember (asw.) e
[1783] **Reʿna**: Rind, bedew, letîf
[1784] **Teʿb**: Tade, renc, zorî, zehmetî
[1785] **Rojî**: Rojekî
[1786] **Şehê rindan**: Şahê rindan. Mebest jê Xweda ye

Di yabana bi qûma germ divêt borîn*ê* ra piştek

66.

Eger piştek nebit çûyîn di çolan da gelek zor e

Eger ʿişq nebitin qeṭʿa meqaman pur giran barek

67.

Eger geştî nebit deryay*ê* da rêwît*î* çê nabit

Evîn ger nebitin cehd[1788] û xebat zir beyh*û*de karek

68.

Gihana hîvr*û*yan[1789] bê pay*ê* ʿişqê nabitin mumkin

Li nik weṣla[1790] perîrûyan[1791] hemî girnûk[1792] heye deştek

69.

Cefaya girn*û*kan ger leẕẕeta ʿişqê neket wenda

Teḥemmul nabitin êşa gihana dilberê bêşek

70.

Cefa û êş li nik ʿişqê ṣefa û xweş*î* ne lewra

Ji bo nûrê di agir da didit perwane[1793] can bêdeng

71.

Şîrîn tê tal*î*ya ʿişqê wekî insan*ê* girgirtî[1794]

Li hêlkî can kul û xûn e, xurandin jê ra xweş zewqek

72.

Dunê da karekî bê ʿişq tu nîne bête meydanê

Eger bête ne hêja ye wekî dîwar*ê* bê bendek

73.

Hebit bo te eger meqṣed meçe bê ʿişq reha wê da

Welew wek Rustemê Zal[1795] bî dibî rê da fena mûrek[1796]

74.

Ji Qersê[1797] mûrîya goyîn[1798] çilo bê pa diçit Qudsê[1799]

---

[1787] **Menzilê canan**: Cihê dîlber
[1788] **Cehd**: Xebat, şixul
[1789] **Hîvrû**: Ew rûyên wekî hîvê geş û rewnaq
[1790] **Weṣl**: Gihîştin, gihan
[1791] **Perîrû**: Ew dilberên mînanî perî û firîşteyan bedew û spehî
[1792] **Girnûk**: Gihayekî bi stirîn e. Stirîn, sinc
[1793] **Perwane**: Pirpirok, minminîk, baperik
[1794] **Girgirtî**: Gurî bûyî, nexweşiya guriyê lê girtî
[1795] **Rustemê Zal**: Rustemê Zalê Kurd. (bnr. 9/20)
[1796] **Mûr**: Morî, gêle, gêrik
[1797] **Qers**: Bajarekî li Bakûrê Kurdistanê ye. Mebest jê dûrîtî ye.

Ji qadê ṭeyr*ê* bêper ma hewayê da diket firrek?

75.

Dilê bê agirê ʿişqê dimînit bê gihan lewra

Turûnpêl ger nebit benzîn dibit rê da biket meşyek[1800]

76.

Dilê atûn*a*[1801] ʿişqê da eger ṣade nebit tewş e

Eger meʿden nebit ṣade bi agir beyh*û*de axek

77.

Neyêt derbaz kirin insan di parzûnê evînê da

Dimînit tevlihev bê nefʿ[1802] û qîmet wek şêlû avek

78.

Eger hilnebitin mûma dilan bi kibr*î*ta[1803] ʿişqê

Dimînit tarîy û bênûr xu ra dernax*î*nin rahek

79.

Tu karek nay*ê*te birrîn bi ʿeqlê bê evîn lewra

Eger quwwet nebit nayêt qetandin darek û şûrek

80.

Dibû çi zûlfiqar[1804] ger quwweta Ḥeyder[1805] nebûna pişt

Dibû çi ʿeqlê Şêx Ehmed[1806] eger dil da neba ʿişqek

81.

Eger ʿişq nebitin ʿeqlan, bizane camidê[1807] ʿişk in

Wucûdê ra eger can nebitin dê pêkevit leqqek[1808]

82.

Gihana meqṣedan bi ʿeql*ê* bê ʿişq nabitin mumkun

Gelo bê tûle û tîran di reş da[1809] çer dibit ṣeydek[1810]

---

1798 **Mûriya goyîn**: Mûriya feqîr, jar û belengaz

1799 **Quds**: Di dinê de yek ji bajarekî herî kevn e. Ji bo misilman, xirîstiyan û cihûyan cihekî pîroz e. Mescîdî Eqsa li wî bajarî ye. Mebest jê miraz û armanc e.

1800 **Meşyek**: Meşîn, çûyîn

1801 **Atûn**: Firin, argûn, ocax

1802 **Nef**ʿ: Sûd, havil

1803 **Kibrît**: Nift, pêtîk

1804 **Zûlfiqar**: Navê şûrê Hz. ʻElî ye.

1805 **Ḥeyder**: Navlêka Hz. ʻElî ye ku wateya wê; ʻegît, mêrxas, wêrek

1806 **Şêx Ehmed**: Dibe ku Şêx Ehmedê Xanî an jî Şêx Ehmedê Cizîrî (Melayê Cizîrî) be. (H.)

1807 **Camid**: Bê giyan, bê ruh, ne zindî

1808 **Leq**: Liv, lebat, bizav

1809 **Di reş da**: Di tariyê de

1810 **Seyd**: Nêçîr

83.

Welew ku kew li ço ket, tête gotin car*î*nan lêkin

Lehî tim nay*î*nit goncan,[1811] tifaqê ra n*î*ne ḥukmek

84.

Di ʿilmê menṭiqê da ker mis̱al e ittifaqê ra

Ewêk[1812] wê ra dinasit ḥukm di nêv guhkê xu da kerek

85.

ʿEql ger ʿeqlê baqil bit dîs*a* beyhûde ye bê ʿişqê

Eger barût nebit mermî[1813] çi ket ma dê bibit tiştek

86.

Divêtin mermîya ʿeql bête danîn naml*û*ya dil da

Bi pêta bar*û*ta ʿişqê biket seyran û gerranek

87.

Di ezmanê[1814] ṭerîqê da hewaya[1815] nefs*ê* wêran ket

Hedef ke yaqûta nasitîya ḥeq, da biket karek

88.

Welê ṣed ṣal*î* raweste f*î*şek bê bar*û*tê naçit

Weha ye ʿeql*ê* bê ʿişq bal tu karî nav*ê*jit gavek

89.

Bi ʿişq û hezkirinê mexl*û*qan dîtin hebûn lewra

Dibilqê ʿişq ji "lewlake"[1816] digel "eḥbebte"[1817] wek avek

90.

Divêtin dilberek rûken bi dil wek hêl*î*kî[1818] ṣaf bit

Di dil da ron*î* bit da ku evîn li te bixit firrek

91.

Çiya û deşt, gelî û best li henber te hemî viz tên

Eger dil da hebit ʿişqek li pêşber te hebit yarek

---

[1811] **Goncan**: Qurmên daran ên gir û mezin.

[1812] **Ewêk**: Ew ê ku

[1813] **Mermî**: Gule

[1814] **Ezman**: Asîman

[1815] **Hewa**: Daxwazên nefsê yên nebaş

[1816] **Lewlake**: Ger tu nebûyayî**.** (Ji bo vê hedîsa qudsî bnr. 1/13)

[1817] **Eḥbebte**: (Ew kesê ku Tu) hez dikî.

Îşareta vê ayetê dike: (**كَ لَا تَهْدِي مَنْ أَحْبَبْتَ وَلَكِنَّ اللَّهَ يَهْدِي مَن يَشَاء وَهُوَ أَعْلَمُ بِالْمُهْتَدِينَ**)

(Ya Muhemmed!) Tu nikarî yê ku tu jê hez dikî bînî hîdayetê, lê belê Xwedê kê bivê wî tîne hîdayetê û ew çêtir dizane; ka kî layîqê hîdayetê ye. (Qeses: 28/56)

[1818] **Hêlî**: Neynik, ʻeynik

92.

Dilê şahê cihanê meẕhera[1819] nûra Îlahî bû

Li bûraqa[1820] evînê suwar b*û* çû gîşt qab*ê* qewseynek[1821]

93.

Eger dilber bi dil bit xas*î*[1822] ra girnûk[1823] dibin sosin

Cefa û ṭeʿl*î* şîrîn tên dibit dûrî te ra nêzik

94.

Dilê sistê mirî bayê evînê lêx*î*nit dest da

Dibit jîr û xweş û nûrîn hezar gavê diket gavek

95.

Bi ʿişqê qelb*ê* pasgirtî dibit wek neynikek ṣade

Bi ʿişqê ruḥ*ê* peşmûrde[1824] dibit geş wek gula rûyek

96.

Bi nar û nûr*a* ʿişqê ger nebî zengîn dilê ġafil

Di yabana hebûnê da dimînî bargiran lengek

97.

Dibî wek parekî bûzê bi pûka[1825] fitne û derdan

Hey û hey sar û ḥesretkêş d*û*rê yaran û bê behrek

98.

Eger nûr nebitin rê da tu hey ruḥ birçîy û kor î

Di tarîya qetanê da dimînî mat û ḥeyranek

99.

Ne mumkin bû Xiḍir ra çûy*î*na serkanîya ḥeywan[1826]

Di taristan[1827] û sermê da nebûna nûrek û narek[1828]

---

[1819] **Meẕher**: Cihê diyarbûnê, warê peydabûnê, qada zahirbûnê

[1820] **Bûraq**: Heywana suwarbûnê ye ku di şeva mîracê de Hz. Muhammed (asw.) li wê suwar bûye.

[1821] **Qabê qewseyn**: Navbera ji herdu biruyan e. Mebest jê nîşandayîna ewqas nêzîkbûna wê ye. Di Qurana pîroz de li sûreya Necmê ayetên 8 û 9'an gava di şeva mîracê de qala serpêhatiya Hz. Muhammed (asw.) dike, derbaz dibe. Hin ʻalim wê ayetê wisa şîrove dikin; wê şevê Hz. Pêxember hindî qabê qewseynê nêzîkî Xwedê Teʻalayê bû. (Pala, *b.n.,* r. 245.)

[1822] **Xasî**: Pêxas

[1823] **Girnûk**: Gihayekî bi stirîn e. Stirîn, sinc, dirî

[1824] **Peşmûrde**: Perîşan, belawela, şepirze

[1825] **Pûk**: Bahoz, bager, gilele

[1826] **Kaniya heywan**: Kaniya ava jiyanê

[1827] **Taristan:** Welatê tarî. Dibêjin ku ava jiyanê li wî welatî ye. Îskenderê Zûlqerneny û Hz. Xidir ji bo ku dîtina wê avê dikevin rê, diçin. Dîsa dibêjin ku taristan ewqas qeder tarî bû ku çav çavî nedidîtin. Ji ber vê yekê, yê ku biça ava heyatê bigeriya, serê giloka rîsê digirt û diçû. Kengê edî dizanî bû ku rîsa wê nedihat, paş ve dizivirî dihat. Dor tê Hz. Xidir. Hz. Xidir jî bi vî awayî serê giloka rîs digire û diçe, ava heyatê dibîne, têr vedixwe lê nikare vegere. Riya xwe tevlihev dike. Hevalê xwe Sikenderê Zulqerneny nikare bîne ser kaniya ava

100.

Sikender[1829] gerçî sulṭan bû xudanê zor û zêran bû

Welê bê nar û nûra ʿişqa dil dest nakevit karek

101.

Eger terka meqam û leşker û cahan[1830] bi kirna wî

Li kuncê jîn*a* tenha ba dibû jê ra neṣîb qimek

102.

Seha pîran[1831] e pişta nefs*ê* ra hûrker elemkêşo[1832]

Şikestina beran[1833] ra lazim e her bêt te vayrozek[1834]

103.

Bi roja şîretê pîran ji nefsê tar*î*tî rabit

Di firra bal meqamatan dibit pîr jê r*a* wek perrek

104.

Ḥeyat piştî gihana wan meqaman her dibit ṣade

Hedana hey dimîn û dilxweşî nû çê dibit bêşek

105.

Dilê tê da hedan nîne wekî xanek*î* xopan e

Cihê maran û mişkan e di wî da nabit ʿirfanek

106.

Gelo koşka xerabe bil ji kundan qû diket tê da

Gelo bustan*ê* bê gul da ji bulbul ra heye cahek[1835]

107.

Bixemlîn dil bi sosina yeqînê da bibit hêlî

Ji elṭafê[1836] îlahî ra d*û* ra bînî ji wî nefʿek[1837]

108.

---

jiyanê. Bi vî awayî, dibêjin ku Hz. Xidir ava jiyanê vexweriye û li dinyayê maye lê Sikenderê padîşahek mezin bû jî lê wî re nebû nesîb. Bi Farisî malikek heye: "*Îskendera nemî bexşendî avî, mûyesser nisfî înkar*." Li vir şîrove ev e ku: Hin tişt hene ku bi karê mirov dest nakeve, encaq bi teqdîra Xwedê Teʿala dibe. Lewra Sikender şahekî zehf mezin bû, li her derê dinyayê geriya ji bo ava jiyanê, lê jê re qurtek jî nebû nesîb. (H.)

1828 **Nar**: Agir, ar

1829 **Sikender**: Sikenderê Zûlqerneyn. (bnr. 9/5)

1830 **Cah**: Paye, meqam

1831 **Seha pîran**: Siha murşîdan, siya weliyan. Mebest ji siyê parastin e.

1832 **Elemkêşo**: Ey yê ku elem û derdan dikşîne

1833 **Ber**: Kevir

1834 **Vayroz**: Kerane, zomp, mezrebe, amûrekî wekî mîrkûtê mezin e ku ji bo şkandina keviran bikar tînin

1835 **Cah**: Cih, war

1836 **Elṭaf**: Pirjimariya "lutf"ê ye. Lutf, qencî, çêyî, îhsan

1837 **Nefʿ**: Menfaat, havil, sûd

Bi itmî᾿nan*ê*[1838] dil paqiş bikey ji girn*û*ga şekkê

Wegerne zerzewatê aj*o*tî ra nab*î*nî feydek

109.

Bide destê p*î*ran hefser*a* nefsa serkeşa cunbûz[1839]

Biçe bê tehluke serçeşmeyê ʿirfan wekî bayek

110.

Di şûna ṣuḥbeta pîr da edeblî[1840] rûn*ê* pir ḥessas

Ji bilî beḥr*a* feyżan ra ji dil ra sîng bixey kovik

111.

Bibe kerḥes[1841] li bal wan dilberê rûken wekî lalan

Biqîrînê b*û*ye bulbul ji meqṣed dûr û hey dilṭeng

112.

Dixazî lez bigijî meqṣed û feyż û meqamatan

Li henber pîr*ê* ronîdil bibe perwanekî[1842] bê deng

113.

Evîn û teslim û ixlaṣ ṭerîqê da te ra şerṭ in

Çi ket destkeş eger nîne dilê kor da ji wanan yek

114.

Li cem Hemdanî[1843] wek Geylanî[1844] be bona bibî serdest

Ne wek Îbnû`s-Seqa[1845] û Îbn-î ʿEsrûn[1846] xu bînî[1847] tiştek[1848]

---

1838 **Îtmî᾿nan**: Giranî, sergevezî

1839 **Cunbûz**: Bêxû, bêcir, serkêş

1840 **Edeblî**: Biedeb

1841 **Kerhes**: Bêdeng, devmirî

1842 **Perwane**: Pirpirok, minminîk, baperik

1843 **Hemdanî**: Şêx Yusûfê Hemedanî, Hace Yûsûfê Hemedanî an jî Ebû Ya'qûbê Hemedanî. (1048-1140) Li Bexda, Semerqend, Îsfahanê xwendiye. Rêya terîqê li cem Şêx Ebû 'Elî el Fermadî (qs.) hîm bûye û gihîştiye. Li Merw, Bûxara, Herat û Semerqendê ji bo xizmet û îrşadê geriyaye. 'Alim û mutesewifekî gelek mezin bû. Yek ji wan şêxan e ku navê wî di sîlsîleya Neqşîbendiyê de derbaz dibe. Gelek şagirdê wî hebûn. Ji wan yên meşhûr Ehmedê Yesevî û 'Evdulxaliqê Xujdevanî, Hesenê Endakî û 'Evdullahê Berkî bû. (Necdet Tosun, "Yusûf el- Hemedanî", *DİA*, c. 44, 2013, r. 12-13.)

1844 **Geylanî**: Şêx Evdulqadirê Geylanî (qs.). (1077-1166) Navê wi yê eslî Muhyîddîn Ebû Muhammed 'Evdûlqadir b. Ebî Salih e. Nêzîkî behra Hezarê li gundê Nafyê hatiye dinê. Li Bexdayê li bal 'alimên mezin hedîs, fiqih û edebiyat xwendine. Piştre ketiye nav terîqê. Terîqeta Qedirî navê xwe ji wî hildaye û di nav misilmanan de gelek bela bûye. Jê re "Şêxê Meşrîq" ango "Şêxê Rojhilatê" jî dibêjin. Kitêbên wî yên meşhûr Futûhû'l-Xeyb, el-Fethûr-Rebbanî û el-Gûnye ye. (Süleyman Uludağ, "Abdulkadir-i Geylani", *DİA*, c. 1, 1988, r. 234-239.)

1845 **Îbnû`s Seqa**: 'Alimekî meşhûr ê dewra xwe ye. Bi xweşaxêv/belaxata xwe gelek namdar bûye.

1846 **Îbnî ʿEsrûn**: 'Alimekî meşhûr ê dewra xwe ye. Îbnû's Seqa, Îbnî 'Esrûn û 'Evdulqadirê Geylanî tev xwendine û hevalê hev bûne.

1847 **Bînî**: Bibînî

115.

Di yabana ḍelalê da dibî ḥesretkeş û medhûş[1849]

Di herdu ʿaleman da her dibî meḥrûm ji her feyżek

116.

Li cem şahê dilan lal û ker û kor û nimêjḥal be

Ji barana beharê lew dixemle deşt bi her rengek

117.

Li cem wan deʿw*a* zanînê mekey lewra ne hêja ye

Çirayê pêx*î*nî, xanak*î* tê da hildibit luksek[1850]

118.

Dilê ji zinpira nêrîn*a* pîran dûr e, qirrêj e

Teʿakus[1851] naketin tê da, tecellîyat[1852] bi yek carek

---

[1848] Di vê malikê de çîroka her sê hevalan û çûyîna wan a bal Şêx Yusûfê Hemedanî tê vegotin. Çîrok bi kurtahî wiha ye: Îbnû's Seqa, Îbnî 'Esrûn û 'Evdilqadirê Geylanî li Bexdayê dixwînin. Ew hersêk hevalên hev in 'alim in, zana ne; lê 'Evdilqadirê Geylanî hingê hêj ciwan e. Rojek her sê heval biryar didin ku herin cem Şêx Yusûfê Hemedanî. Îbnû's Seqa dibêje; "Ez ê pirseke wisa jê bipirsim ku nekare bersîva wê pirsa min bide." Îbnî 'Esrûn dibêje; "Ez ê jî pirsek jê bipirsim, ka gelo dikare bersîva wê pirsa min bide." 'Evdilqadirê Geylanî jî hêj biçûk e lê bi şiklekî edebî wiha dibêje; "Xwedê neke! Ez ê çawa pirsan ji wî bikim. Ez ê tenê li huzûra wî rawestim. Bi tenê dîtina wî besî min e."

Ew roj hat, hersê heval xwe gihandine cihê Şêx Yusûfê Hemedanî. Lê dîtin ku Şêx li wê derê nebû. Hinek bêhna xwe distînin, radiwestin. Nêzî sa'etek din Şêx rasterast tê bal wan û Îbnû's Seqa re dibêje; "Tê ji min pirsekî wisa bipirsî ku ez bersîva wê nizanibim, erê? Pirsa te ev e, bersîva wê jî ev e. Lê bizane ku bêhna kufrê ji te tê." Paşê dizivire û Îbnî 'Esrûn re dibêje; "Tê jî pirsekî ji min bikî, binêrî ka ez ê çawa bersîva wê pirsê bidim. Pirsa te ev e, bersîva wê jî ev e. Lê dibînim ku 'emrê te jî dê bi mijûliya dinyayê bibore û tu, tu xweşî jê nabînî." Pişt re vegeriya, berê xwe da 'Evdilqadirê Geylanî û nêzîkî wî bû û got; "Ey 'Evdilqadir! Bi vê edeba xwe, te rizaya Xwedê û qasidê wî hildaye. Dibînim ku tu li Bexdayê ser kursîkî rûniştiyî û piyê te ser sitûkurê 'alimên dî ne, û herkes stûyê xwe li hemberî te tewandiye." Şêx Yusûfê Hemedanî ji wan re wan gotinên xwe dike û diçe. Piştre her sê heval dîsa dikevine rê û diçine Bexdayê.

Gelek sal li ser wê bûyerê re dibore. 'Evdilqadirê Geylanî dibe 'alim û mutesewifekî gelek mezin. Digihije gelek paye û meqamên bilind, li her derî gelek 'alim û gel ji bo şuḥbetên wî tên cem wî û jê îstîfade dikin. 'Alimên wî zemanî mezintiya wî qebûl dikin û li ber wî stûyên xwe ditewînin.

Îbnû's Seqa jî dibe 'alimek mezin. Bi 'ilmên şer'î re mijûl dibe. Xwedan axaftineke gelek xweşik e. Bi wê belaxata xwe ve namdar dibe. Şanê wî digije bal siltanê wê demê. Siltan gazî wî dike. Di qesra xwe de karekî hêja dide wî. Ji ber ku Îbn-ûs Seqa xweş diaxive, siltan wek qasidê xwe, wî dişîne Bîzansê. Li Konstantînapolîs/Stenbolê gelek 'elaqe dibîne. Kralê Bîzansê gelek keçikên bedew dide xizmeta wî. Di dawiyê de Îbn-ûs Seqa li wê derê dizewice, dibe xirîstiyan û li wê derê dimîne û li wê derê dimire.

Îbnî 'Esrûn jî dibe 'alimekî mezin. Ew jî li Şamê dibe serokê waqifên giştî. Di nav wan karên waqfê de nikare serê xwe rake. Tim bi wan re mijûl dibe û tu zewqek ji heyata xwe nabîne û wisa wefat dike. Û rojek dibêje; "Şêx Yusûfê Hemedanî di derheqê me de wiha gotibû. Gotina wî rast derket."

[Me ji Seydayê Mela Husnî şîroveya vê malikê xwest, Seyda jî ji me re qala vê menkibê/çîrokê kir. Ji xeynî wê, ev çîrok di kitêba *Fetavayî Hadîsi*ye ya Îbn-î Hacerê Mekkî de derbaz dibe. Lê, kêm zêde gelek cureyen vê menkibê hene. Yakup Aykaç, 15.11.2014 û bnr. https://tr.wikipedia.org/wiki/Yusuf_Hemedanî 02.01.2015]

[1849] **Medhûş**: Serxweş, hişçûyî

[1850] Li cem mirovên 'alim doza zanînê meke, lewra ew wekî luksê ne. Di malekî de luks hebe, ronî be tu li wê derê çirayê pêxînî dê çibe? Qet li ber şewqa luksê, çiraya te xaniyê ronî dike?

[1851] **Teʿakus**: Şewq, 'eks

[1852] **Tecellîyat**: Diyarbûn, xuyabûn, zahirbûn

119.

Ji ezmanê melekûtê[1853] *ṭ*î*r*êjê nûr*ê* kişf nabin

Di hêlîya dilan da ger nebin rûṣade wek camek

120.

Temîzbûna ji afatê dilan ra her divêt murşid

Kul û janê wucûdan ra divêt derman û luqmanek

121.

Dibînî roj bi roj zêde dibit êşa dilê mecruḥ[1854]

Çi rûniştî xerabḥalo li derdê xu bikey pursek

122.

Bihêle mal û ewladan bilez biç nig ṭebîbê dil

Hîna hey helm*a* germ belkî dibînî boy xu dermanek

123.

Ji dil bavêje ḥubba cah*ê*[1855] herdu ʿaleman lewra

Giran qeyd e nekarî bal kemalan va bikey meşyek[1856]

124.

Bi şev ronî didit agir li henber çav*ê* bê ʿillet

Bi şev nûra cemala layezalî[1857] bîn*î* bê ʿewrek

125.

"Ene'llahu`l ʿezîzu"[1858] seḥ dikey bi guhk*î* cismanî

Nesîma[1859] ṣubḥ*a*[1860] ruḥanî li te xînît hej û ceẕbek

126.

Ji mulkê[1861] fir didit dil ku dibit ṭeyrê melekûtê

Feżaya ẕat û ewṣafê[1862] îlahî da diket seyrek

127.

Bi der va ṣade insan e wekî serxoş û dînan e

Welê meczûb*ê* Reḥman[1863] e ji ʿeql û ʿilm*ê* wek beḥrek

---

[1853] **Melekût**: 'Alema mulkê Xwedê
[1854] **Mecruh**: Birîndar
[1855] **Ḥubba cahê**: Hezkirina meqam û payeyê
[1856] **Meşyek**: Meşîn, çûyîn
[1857] **Cemala layezalî**: Rindî û bedewiya her heyî, bedewiya ku hîç wenda nabe.
[1858] Îşareta vê ayetê dike: Ey Mûsa! Rewş ev e; Ez Ellah Teala me, ew ê ku di kar û barê xwe de serdest, desthilat û xwedanhikmet e. (Neml: 27/9)
[1859] **Nesîm**: Bayê nesîm, bayê hênik. Bayekî hênik û xweş e, bi giştî berbangê sibê tê.
[1860] **Ṣubḥ**: Sibe
[1861] **Mulk**: 'Erd
[1862] **Ewsaf**: Wesf, taybetî, sifet, taybetmendî

128.

Feû’bud rebbeke ḥetta yuqale înneke mecnûn[1864]

Ḥedîs̱a rehberê ruḥan weha daye me ra dersek

129.

Bibe dilbend*ê* yara xu wekî Mecnûn*ê* Leylayê

Dibit her tişt te ra hemdem dibit yaban[1865] te ra şehrek[1866]

130.

Wekî Mûsay*ê* ʿImran î ku yabana xipexalî

Ji avan û ji delavan dibit bo te wekî mêrgek

131.

Dibit ṭav û qûm û germ û ġubar[1867] û ʿillet[1868] û zeḥmet

Sih û sosin xweşî û raḥetiy û elkenê hûnik[1869]

132.

Hezaran nefs*a* firʿewnî digel şeyṭan*ê* qarûnî

Di qada Miṣr û beḥra Qulzemê[1870] da wê bibin halik

133.

Welê piştî gihana pîr*ê* Medyen[1871] dest ve tên vanan

Bizane, kor û wenda ye kesê jê ra nebit pîrek

134.

Li hev xîn herdu deryayan yekî meʿna y*ê* dî sûret

ʿEmel û ʿilm bi hev ra bin didin ruḥan ş*î*rîn zewqek

135.

Ji zanînê divêt çûyîn*a* bal yaqût*ê* karan[1872] va

N*î*ne hêja dema gustîl nebit jê ra ş*î*rîn qaşek[1873]

---

[1863] **Mecẕûbê Reḥman**: Evîndarê Xwedê

[1864] Ji Rebbê xwe re ‘îbadetê bike heta ku bibêjin; bi rastî jî ew dîn e.

[1865] **Yaban**: Çol, çolistan

[1866] **Şehr**: Bajar

[1867] **Ġubar**: Toz

[1868] **‘Illet**: Nexweşî

[1869] **Elkenê hûnik**: Bayê xweş î hênik

[1870] **Behra Qulzem**: Behra Qulzem, Behra Sor.

[1871] **Pîrê Medyen**: Ebû Medyenê Mexrîbî (1121-1198). Navê wî yê eslî Şû’ayb bîn Hesen e. Nêzîkî bajarê Îşbîliyye (Sevîlla) hatiye dinê. Hêj biçûktiya xwe de dest bi xwendinê kir, Quranê jiber kir. Ji bo ku zêdetir ‘ilm hîm be, çû Fasê. Li wir gelek ‘alimên mezin nas kir û ji wan ders girt. Li Hecê rastî Şêx ‘Evdulqadirê Geylanî hat. Beşdarî ṣuḥbetên wî bû, ji wî gelek îstîfade kir. Ebû Medyen di tesewifê de gelek pêş ket, gihîşte meqamê qutb û xewstiyê. Gelek ‘alimên mezin li ber destê wî gihîştin ku yek ji wan Îbnî ‘Erebî ye. Şêx Evdulqadirê Geylanî re Şêxê Meşrîq, Ebû Medyen re jî Şêxê Mexrîb dibêjin. (Tahsin Yazıcı, “Ebû Medyen”, *DİA*, c. 10, 1994, r. 186-187.)

[1872] **Yaqûtê karan**: Ew kesê ku yaqûtan dineqişîne, çêdike. Hostayê yaqûtan, pisporê wî karî

136.

ʿIlim ger bê ʿemel bit, tar*î*tiy û cehl[1874] û bê nefʿ[1875] e

Firaq ger bê xebat bit, jeng û pas girtî û bê qedrek[1876]

137.

Tenê zanîn çiqas pir bit, ne hêja ye d*î*sa bê kar

Nebin masî û durr[1877] û geşt*î* derya ṣade şor avek

138.

Bi ronîya ʿemel ger ʿilm nebit ronî wekî nîne

Ne hêja ye eger ronî nebit tê da tu car koşkek

139.

Hebûna ʿilm*ê* encaq tête paraztin bi teṭbîqê

Gul û bustan*ê* bê av ra çilo[1878] çê bit dirêj ʿumrek

140.

ʿEmel jînê nedit ʿilmê bizane camidek[1879] tewş e

Çilo hêvî dibit karek ji resm û rûy*ê* bê ruḥek

141.

Nekarit zan*a* çit[1880] bêjit bi ʿilmê xu neket karek

Gelo radyoy*a* tê da pîl nebit çawa didit dengek

142.

ʿIlmê ger bê ʿemel bit, darekî rût e ne hêja ye

Ji dara ʻişk*a* ṭer bûye bi avê kes nedî meywek

143.

Ji ʿilmê bê ʿemel hêvî b*o*na nefʿê gelek tewş e

Ji dara bih*î*[1881] baqil ra h*ê*vîya meyweyan ʿarek[1882]

144.

Dilan ra zan*î*na rût ez̠yet û êş û cefa ye lew

Lukus girtin*a* koran bil ji westanê dibit tiştek

---

[1873] **Qaş**: Kevirê giranbiha
[1874] **Cehl**: Nezanî, cahêlî
[1875] **Nef**ʿ: Menfaʻet, havil, sûd, feyde
[1876] **Bê qedrek**: Bêqîmet, bênirx
[1877] **Dur**: Mirarî, merwarî, încî
[1878] **Çilo**: Çawa
[1879] **Camid**: Bêruh, bêgiyan, ne zindî
[1880] **Çit**: Dema mirov şaş û mat dibe nikare tiştek bibêje, hingê wiha dibêjin: nekarî çit bêje. Bi wateya; tiştek, peyvek, gotinek e.
[1881] **Dara bihî**: Darekî şîn e, bi piranî li her derî şîn dibe û bêfêkî ye.
[1882] ʿ**Ar**: Şerm, fêdî

145.

Dilê bi zinp*a*rakaran[1883] nebit ṣade û ronîrû

Ne meqbûl e li cem yaran ne hêja ye bi yek carek

146.

Bi rindê[1884] rûy*ê* textan ger nebit şahîk û rind û rast

Dibit dilkeş û meqbûl û ş*î*rînnêrîn û xweşrûyek

147.

Çi ket rinda ʿemel bê quwweta dûlkerekî[1885] bîtkel[1886]

Pes her karek*î* hêja ra divêt pîrek divêt pîrek

148.

Wekî Mûsa lebaleb[1887] beḥra ʿilmê bî dîsa kêm î

Gihana her kemalê ra divêt Xiḍrek divêt Xiḍrek

149.

"We fewqe kulli ẕî ʿilmîn ʿelîmûn"[1888] ders weha daye

Divêtin kes nebêjit bes li nik gîştin*a* her cahek

150.

Bikey ajnê[1889] di beḥra ʿilm*ê* da bona mezin bî tu

Ji bo girbûn*a* masî ta bibit ḥût[1890] lazim e beḥrek

151.

Kesî rût e ji zanînê mezin nabit bilind nabit

Gelo fîdan*a* bê av ra çilo çêbit dirêj bejnek

152.

Bi ava zan*î*nê ger saġ nebit insan bizan ʿişk e

Fidana ʿişk r*a* ġeyrê ṣohtinê ma dê bibit feydek

153.

Heçî tiştê n*î*ne ġeyrê şewatê faîdek jê ra

Xazî jê ra nebûna heb*û*nê da navek û dengek

---

[1883] **Zinparakar**: Ew kesê ku karê zinparayê dike, bi zinparayê tiştan ronî dike, diçilvilîne. Pisporê wî karî.
[1884] **Rind**: Rendeş, amûrekî hesin e ku kêrî rastkirin û teraşkirina daran tê.
[1885] **Dûlker**: Necar, xerat, merengoz
[1886] **Bîtkel**: Pispor, mahir, di karê xwe de zana
[1887] **Lebaleb**: Heta qirika xwe tijî, heta devê xwe tijî
[1888] Di ser her zanayekî re yekî zanatir heye. Îşareta vê ayetê dike:

(وَفَوْقَ كُلِّ ذِي عِلْمٍ عَلِيمٌ)

Di ser her zanayekî re yekî zanatir heye. (Yûsuf:12/76)
[1889] **Ajne**: Avjenî, soberî, melevanî
[1890] **Ḥût**: Masiyê herî mezin, balîna

154.

Bi zanînê digêjî baġ*ê* riḍwan[1891] û reḥemûtê[1892]

Li ser çoka murada xu dikevî xar*ê* wek bazek

155.

Wekî şalûl feżaya ẕat û ewṣafê[1893] îlahî da

Dibî xweşreng û xweşdeng û ş*î*rînnêrîn û pur nazik

156.

Dibî baġê dilan da wek gula geş nazik û dilber

Merov wek bulbulan bo te dibin bengî bi yek carek

157.

Dibî xweşxûy û şîrîngotin û ẕewqxweş wekî hingiv

Dibit civandina xelqê li ser te her wekî barsek[1894]

158.

Ji bo meʿrîfet û ʿilmê, xelaîq[1895] têk b*û*ne peyda

Kesî vanan nebîn jê ra bizane beyh*û*de resmek

159.

Madam ku çêb*û*ne bona birrînê, qeṭ ne hêja ne

Welew ṣade p*o*la[1896] bin, ger nebirrîn xencer û birrek

160.

Ji ʿewrê lah*û*tê[1897] pêşyê dilopa emr*ê* "îqra"[1898] hat

Ji bo nîşan bide xandin û zanîn pêşy*a* her tiştek

161.

Eger zanîn nebit dil tête xemlandin bi xûyê qenc

Giha û gul çilo dê şîn bibin axê d*a* bê avek?

162.

Gelo bê av*a* zanîn û benefş û sosinê xûyan

Çilo ṭeyrê n*û*ra ḥeq dil d*a* çê ket bo xu hêlûnek?

---

1891 **Baġê riḍwan**: Bihişt, cennet
1892 **Reḥemût**: 'Alema rehma cemala Xwedê
1893 **Ewṣaf**: Wesf, sifet, taybetmendî
1894 **Bars**: Zeyiya mêşan, cihê ku mêşên hingivê komî ser hev dibin
1895 **Xelaîq**: Mexlûqat, aferîde
1896 **Pola**: Pol, pola, çelîg
1897 **Lahût**: Îlahiyet, alema îlahî, alema me'newî
1898 **Îqra**: Bixwîne.
Îşareta vê ayetê dike: (**اقْرَأْ بِاسْمِ رَبِّكَ الَّذِي خَلَقَ**)
Bi navê Xwedayê xwe bixwîne, ew ê ku her tişt çêkiriye! (Eleq: 96/1)

163.

Gelo bulbul cihê bê av û gul da çer diket seknê

Weya rinda dunê çawa di goman da diket gerrek?

164.

Bi zanînê bilindtir bû ji qudsîyan[1899] hemen Adem[1900]

Wegerne eṣlê wan nûr bû ji axê eṣlê wî mistek

165.

Dema hilbû di axê da r*o*ja zanîn*ê* wenda bû

Sitêra nûr*ê* lewra ʿeks*a* zanînê ye her tiştek

166.

Di Adem da dema geş dîn[1901] suruştan[1902] sosina ʿilmê[1903]

Kulîlka ṭaʿeta wan pirmilî[1904] jê ra nema qedrek

167.

Nedîtin cewherek wek zan*î*nê pîroz xu da lewra

Mezindêran û çûn secdê ji Adem ra bi yek carek

168.

Wucûdê ra egerçî[1905] ʿilletê ġaîyye[1906] taʿet tê

Welê bê zan*î*na hostê xanî qeṭ nabitin tiştek

169.

Şeva tarî baran dibarî zemîn têk ḥerrîy û av e

Digêjit menzilan rehrew[1907] eger dest da nebit nûrek

170.

Dilê tê da nebit zanîn û ʿirfan, tarîy û tewş e

Tenê beyhûde cama lambe ger tê da nebit gazek

---

1899 **Qudsî**: Ewên ku pak û paqij in, melek, firîşte
1900 **Adem**: Pêxemberê yekem Hz. Adem.
1901 **Geş dîn**: Geş dîtin
1902 **Suruşt**: Melaîket, firîşte
1903 Li vir qala axaftina di navbera Hz. Adem û sirûştan de derbaz dibe. Îşareta vê ayetê dike:
وَعَلَّمَ اٰدَمَ الْاَسْمَاءَ كُلَّهَا ثُمَّ عَرَضَهُمْ عَلَى الْمَلٰئِكَةِ فَقَالَ اَنْبِؤُنِي بِاَسْمَاءِ هٰؤُلَاءِ اِنْ كُنْتُمْ صَادِقِينَ * قَالُوا سُبْحَانَكَ لَا عِلْمَ لَنَا اِلَّا مَا عَلَّمْتَنَا اِنَّكَ اَنْتَ الْعَلِيمُ الْحَكِيمُ * قَالَ يَا اٰدَمُ اَنْبِئْهُمْ بِاَسْمَائِهِمْ فَلَمَّا اَنْبَاَهُمْ بِاَسْمَائِهِمْ قَالَ اَلَمْ اَقُلْ لَكُمْ اِنِّي اَعْلَمُ غَيْبَ السَّمٰوَاتِ وَالْاَرْضِ وَاَعْلَمُ مَا تُبْدُونَ وَمَا كُنْتُمْ تَكْتُمُونَ
Xwedê navê tevekê tiştan bi Adem da hînkirin. Paşê ew tişt nîşanî meleyîketan dan û ji wan re got: “De navên van tiştan ji min re bibêjin, eger bera hûn rast dibêjin.” Melayîketan got: “Xwedayê me! Em, Te ji hemû kêmasiyan pak didêrin, ji tiştê te bi me dabe zanîn pê ve tu zanîneke me nîne. Birastî her tu yî yê ‘elîm, yê hekîm.” Xwedê got: “Hey Adem! De bi navên van tiştan melayîketan agahdar bike.” Vêca çi gava Adem bi navên wan ew agahdar kirin, Xwedê got: “Ma qey min ji we re negotibû ku ez bi xeyba erd û asîmanan dizanim û ez bi tiştê ku hûn eşkere dikin û bi yên ku hûn vedişêrin jî dizanim?” (Beqere: 2/31-32-33)
1904 **Pirmilî**: Çilmisî
1905 **Egerçî**: Welew ku
1906 ʿ**Illetê xaîyye**: Her tişt ji bo armancekê tê kirin ku jê re ‘illetê xaîyye tê gotin.
1907 **Rehrew**: Rêwî

171.

Çiqas xweşbêhn û ṣûret bit, ne hêja ye d*î*sa cahil

Welê ʿekrûtîya[1908] zanan dibit kemket[1909] ji wan qedrek

172.

Sela rêxê welew ṣade ḥerîr[1910] bit dîs*a* bê qedr e

Kupê hingiv bilindqedr e welew ku bê q*î*met axek

173.

Meqamê ʿaliman jor e meqamê cahilan jêr e

Dibînî serşivan pêşya birrê dajo li dû tê leng[1911]

174.

Bi gor karê ku pêk têtin merovan ra dibit qîmet

Cihê havlêk*ê*[1912] dîwan e, cihê saqo[1913] li reş gomek

175.

Digel zanan hevalîy û mijûlî şîr*î*n e kar e

Nezanan ra hevalî mirin e, ṭal e wekî jarek

176.

Ji zanan nêzikî karek h*ê*ja ye lewr*a* tê girtin

Ji bağan bêhn*a* xweş ya nêr*î*na xweş ya ş*î*rîn dengek

177.

Wekî bulbul welew ku dengê zanan nayête zanîn

Welê guhdan dîsa dil ra şifa ye xweş didit ẕewqek

178.

Zana wek nêrgiz e yê kor û ker jî jê dikin nefʿê

Eger nêrîn nebit wan ra neṣîb bêhna wê bes behrek

179.

Şev û rojan wekî avan bi can û dil xebatê key

Bigêj deryay*a* zanînê dibit bo te ş*î*rîn jînek

180.

Nebêje bes di piştî gîştina zanînekê hindik

Dema havîn û ṭînê[1914] da zuha ne gul*ê* av hindik

---

[1908] ʿ**Ekrûtî**: Rûpîsîtî, pîsî, nebaşî
[1909] **Kemket**: Kêm dibe, kêm kirin. (Ango zana çiqas pîs be jî ʻekrûtiya wî, qîmeta wî kêm nake.)
[1910] **Ḥerîr**: Hevrîşim, hermûş
[1911] **Leng**: Kulek, şaht
[1912] **Havlêk**: Sirnik, gêziya pûşî, melkes
[1913] **Saqo**: Gêziya darî, seqevêl

181.

Hîna xortî xebatê key reha[1915] zanîn*ê* da berxo

Ku xortê destxuda çargav*ê* pîran xweş diket gavek

182.

Gulo zanîn*ê* biger hêj ku can î ey ʿezîzê min

Ku bayê pîr*î*yê bağ û gulan ra duşwar[1916] afatek

183.

Hîna cuwan î bibe kanî eger çend roj*ê* norozê[1917]

Biborin zen mekey êdî dibînî ʿewr û baranek

184.

Reha zanîn*ê* da mal û melal[1918] rê key bi dilşahî

Ku zenginîy*a* bê zanîn dibit wek nan*ê* bê xoyek

185.

Nekev ber mal*ê* dunyayê reha zanîn*a* zaryan[1919] da

Bi bavê hat*î*ye lêva helakê dê çiket kurek

186.

Nezan kor e perîşan e ji gavaran û dîna ne

Ne xu ra ne j*î* kur û keç*ê* xu ra derdixe rahek

187.

Bi zanîn û bi ʿirfanê digijî nûr*a* îmanê

Ji dil paqiş dikey ranê[1920] di ruḥ da nam*î*nit janek

188.

Di bağê dil d*a* zanîn wek gulê xweşbêhn û xweşreng e

Bi ava nas*î*ya ḥeq geş dibit zanîn di her anek

189.

**Ḥezîn** jar û belengaz e welew ʿaṣî ye xêrxaz e

Îlahî! wî biparêze ji cehla[1921] her wekê marek

190.

**Ḥezîn** dîn û ker û gêj e w*î* dil tariy û qirrêj e

---

[1914] **Ṭîn**: Germ

[1915] **Reh**: Rê

[1916] **Duşwar**: Dijwar

[1917] **Noroz**: Roja nû, lê di mana beharê de hatiye bikaranîn.

[1918] **Melal**: Mal, xanî

[1919] **Zaryan**: Zarokan

[1920] **Ran**: Qirêj

[1921] **Cehl**: Nezanî, cahêlî

Ji ʿewrê feyżê birrije Xudêyo ser wî baranek
191.
Di yabana nezanînê ji tihan cerg qijîn pê ket
Ji beḥra ʿilm û ʿirfanê nigara[1922] berde ser çilkek

**78.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun
Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –
1.
Min dît di mirata[1923] xu da nûrek munezzeh[1924] bê miṯal
Hem ʿalema rûḥanî da ţîrêjê roja layezal[1925]
2.
Xef[1926] bû seraser ʿalema kewnê[1927] di nêv berq[1928] û birûsk
Der bû meʿîna kewṯerê[1929] girtî xu da her qirş û qal
3.
Wê nûrê xweş ronî kirî her qelbê tarîyê qirêj
Wê avê qenc paqiş kirî pasa dil û daye kemal
4.
Ruḥê mirî pê bûne xweş rengê dilan têk bûne geş
Serxoş û dîn hatin bêheş gîştin mirazê xu heval
5.
Ḥemd û ṯena bona Xuda lewra ku îro cilwe da
Roj bû di meşriq[1930] da veha têk da cihan mûm û şemal
6.
Şev çû bi axir hate roj derket di şerqê da çi roj
Ronî kirî her ġar[1931] û doj[1932] nisbet dihata bê mecal
7.

---
1922 **Nigara**: Ey nîgar, ey dilber. Li vir banglêkirin heye.
1923 **Mirat**: Neynik
1924 **Munezzeh**: Tam, têkûz, bê kêmasî
1925 **Layezal**: Ew ê ku wenda nabe, her heye
1926 **Xef**: Nepen, nehênî, raz
1927 ʿ**Alema kewnê**: Hebûna ʿalemê, heyîna gerdûnê
1928 **Berq**: Birûsk
1929 **Meʿîna kewṯerê**: Kaniya ava kewserê
1930 **Meşriq**: Rohhilat
1931 **Ġar**: Şikefta sirûştî
1932 **Doj**: Di aşên avê de qulek e ku av dikeve nav wê û aşê dizivirîne, rêjing

Dêmdurr û canʿerʿer[1933] bi xweş hatin bi hev ra mest û xweş

Çûn baġ*ê* tê da ye benefş berdane ser nûrek zelal

8.

Yarê beyan kir raz û sir kişf kir muʿemmay nukte pur

Esrar[1934] xuya bûn bir bi bir[1935] Ellah![1936] çi xweş ḥebr[1937] e delal

9.

Tev wan bi gulzar çû **Ḥezîn** firda ji ser şîn û gîrîn

Vê nameyê hûr hûr bixûn tê da heye ṣed beḥs û qal

10.

Cewherfeşan[1938] got ʿaşiqan bibne hevalê ṣadiqan

Lewra ku ew rehber bitin dê pur bilez çê bit wiṣal[1939]

11.

Nebne hevalê nekesan dûr bin ji her xar û xesan[1940]

Qeṣda we ez bim tim ji dil wek vî tu nîne tu meqal[1941]

**79.**

mefʿûlu / mefaʿîlu / mefaʿîlu / feʿûlun

Hezec – – +/+ – – +/+ – – +/+ – –

1.

Ref ref[1942] bi ney û nay û bilûr[1943] hatine ṣorgul

Lewra bi hezar rengî fixanan dike bulbul

2.

Sosin û benefş yasem*î*nê baġ û çemengan

Bulbul d*î*tîye lewr*a* b*û*ye ser*xoş* û dilkul

3.

Der ṣubḥ[1944] e gehan na*lîn* û ahîn*ê* w*î* kûr tên

---

1933 **Canʿerʿer**: Ew dîlberê ku bejna wê weke dara ʻerʻerê dirêj

1934 **Esrar**: Pirjimariya "sir" e. Sir, raz, xef, nepen

1935 **Bir bi bir**: Kom bi kom, ref bi ref

1936 **Ellah**: Ya Rebbî! Li vir bi wateya dengê şaşmayîn û ʻecêbmayînê ye.

1937 **Ḥebr**: ʻAlimê mezin, kesê alim û salih, ehlê ilm

1938 **Cewherfeşan**: Ew ê ku cewheran bela dike.

1939 **Wiṣal**: Gihîştin, gihîştina dîlberê

1940 **Xar û xes**: Li vir du mane heye. Ya yekem stirîn, sinc, dirî e, ya duyem; merivê xwar, tiştên bê qîmet e.

1941 **Meqal**: Gotin, peyv

1942 **Ref ref**: Kom bi kom

1943 **Ney û nay û bilûr**: Hersêk jî amûrên mûzîkê ne û bi pifkirinê deng derdixin

1944 **Der Ṣubḥ**: Di serê sibê de, di spedê de

Lew ḥes*ret* û kerbê ev*î*nê ew kir*î* bê dil

4.

Her lat û zinar her deşt û çiya, av û nebat

Ayîneyê ḥusna ezel[1945] in dane muqabil[1946]

5.

Lew serw û ṣenewber[1947] bi hejîn û bi xuşîn in

Pepûk û kevok lewr*a* dikin na*lîn* û ġulġul

6.

Tesbîḥ dikitin herçî di qad[1948] û di semayê[1949]

Ma j`ḥemd û s̱enayan dibitin car*î* muʿeṭṭel[1950]

7.

Her tişt*î* xu da girtîye burhanek*î*[1951] dîger[1952]

Barî[1953] ji ezel danîye ev dal[1954] û wesail[1955]

8.

Çavê xu vekey kûr bin*ê*re ʿalema jorîn

Ma`d gerr*a* sitêran dibitin car*î* tebeddul[1956]

9.

Yekbûn[1957] dixuyê`j belg*ê* çiqulkan di rezan da

Kun muntebihen ya **Ḥezînu**![1958] qet mebe ġafil

10.

Hebbe nesîmu`ṣ-ṣubhi ʿela ʿaşiqi ḥeqqin[1959]

Wek bulbul*ê* der baġ û gulistan b*û*ye hadil[1960]

**80.**

---

[1945] **Ḥusna ezel**: Rindahiya Xwedê ya ku destpêka wê nîne, bedewiya destpêka wê tuneye
[1946] **Muqabil**: Berdêl, beramber
[1947] **Ṣenewber**: Dara çamê
[1948] **Qad**: ‘Erd
[1949] **Sema**: Asîman
[1950] **Mu‘eṭṭel**: Terkkirin(a ew karê ku tê kirin), betlane kirin, vewestan
[1951] **Burhan**: Delîl
[1952] **Dîger**: Yekî din
[1953] **Barî**: Yek ji navên Xwedê ye. Bi wateya; ew ê ku li her tiştî û cihî li gorî hev û bi întîzam diafirîne
[1954] **Dal**: Delîl
[1955] **Wesail**: Wesîle, araç
[1956] **Tebeddul**: Guhertin
[1957] **Yekbûn**: Yekîtiya Xwedê
[1958] Hîşyar be ey Hezîn!
[1959] Bayê sibê li ser wî aşiqê heq de hat.
[1960] **Hadil**: Xwende. (Wek bilbilan di bax û gulistanan de dixwîne.)

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Ellah![1961] çi xweş derbûn ḥikem[1962] barîn li ser ezman ji dil

Xweş xweş li pey hev tên ṭ*î*rêj roja sirran hilbû di dil

2.

Yarê çi şîrîn cilwe kir weqta ji perde hate der

Dîsa li ʿaşiq bû xuya hate behar û ceşn*a* dil

3.

Yar wek kevokê meşîya xişrê li bejnê xuşîya

Ox ox li bengî bû xuya ew nazik û miraz*a* dil

4.

Ehlen we sehlen merḥeban[1963] xêr hat*î* ser çav û seran

Ey dilbera meqṣûd[1964] liqa[1965] ey merhema jana di dil

5.

Ey mal û mulk û cism û can feda û qurbana te in[1966]

Ey ġemrevîna dil birîn, ey bil ji te nîne di dil

6.

Ey ronîya qad û sema ey mûm û finda korb*û*yan

Ey ṣorgula ṭeyrê seḥer, ey tûtîya[1967] a çav*ê* dil

7.

Ey dil ji mêj da hujmukarê[1968] bejn û balaya te bû

Ey nazika şîrîneda[1969] ey her tu yî menẓûr*ê* dil[1970]

8.

Ez pur zeman e ʿaşiq im ʿişqa xu da pur ṣadiq im

Nêv pêtîyê ʿişqê d*a* wer bû wek s*î*perrik jar*ê* dil

9.

---

1961 **Ellah**: Dengê şaşbûn û ‘ecêbmayîn e.
1962 **Ḥikem**: Hikmet, armanc, tiştên bi sûd û kêr, zanîn, felsefe
1963 Bi xweşî û rihetî hatî, merheba
1964 **Meqṣûd**: Meqsed, armanc, mebest
1965 **Liqa**: Dîtin, hevdîtin, (dîtina dilberê)
1966 **Te in**: Te ne
1967 **Tûtî**: Dermanê çavan, kil
1968 **Hujmûkar**: Hezker, bengî, aşiq
1969 **Şîrîneda**: Xweşdeng, şîrînawaz
1970 **Menẓûrê dil**: Ew ê ku tê mêzekirin/nezer kirin; ew ê ku tê ecibandin

Can e şewatek pêketî zor e teḥemmul nabitin

Bil te n*î*ne dil ra heval bil te n*î*ne ʿÎsay*ê* dil

10.

Sermest*ê* cama[1971] ʿişq*ê* me dil min girêdaye bi te

Luṭfen were carî binêr çawa perîşan im ji dil

11.

Pergende[1972] me xu bende me min can di ʿişqê da firot

Ahî ji ber tîrê qetana te çi dî miskîn*ê* dil

12.

Hêstir dirêjim ez mudam hey hey min e ah û fiġan

Behra[1973] me bû derdê giran ḥelyam ji ber jana di dil

13.

Pur êşeke duşwar û zor Xuda nede bavkuştîyan

Yara! bikey reḥmê li vî jarê feqîrê xestedil

14.

Yara! heval çûn menzilan gîştin murad û ṣorgulan

Wek bulbulan dûrê muradê mame lew bêḥal e dil

15.

Yara! xuya nabit delal mame di çolê bê heval

Mat û perîşan ist*û*xar lewra xerabḥal im ji dil

16.

Yara! wekî min bêmikûn nîne di vê rê da kesek

Lew bê hedan ah û fixan tev pêtîyan têtin ji dil

17.

Yara! nema min ṣebr û aramek ji ber jana giran

Wek goy*î*nan[1974] min nal*î*n e wek şal*û*lan[1975] wîlwîle dil

18.

Yara! li ber dergah*ê* te ser dan*î*, me ser şêm*û*kê

Zanî bi ḥalê dilkulan zanî tu çawa jar e dil

19.

---

[1971] **Cam**: Mey, şerab

[1972] **Pergende**: Belawela, gij

[1973] **Behr**: Par, pişk, pay

[1974] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.

[1975] **Şalûl**: Teyrekî mînanî bilbilê dengxweş e.

Gote delalê ey **Ḥezîn** bes tu bikey şîn û g*î*rîn
Nêzîk dibit şahî û kêf weqta gihana dost û dil
20.
Min got eger ew roj werit dê ez bibim wek sîperik
Bê deng û beng dê pê kevim dû ra dibit surûr*a*[1976] dil
21.
Gote delalê ʿişq*a* bulbul zor e lê bê feyde ye
Ḥetta nebî sîper[1977] li ber ʿişqê nebî baqî bi dil
22.
Min got **Ḥezîn** im pur evîn, lewra dinalim wek g*o*yîn
Cerg û hunav têk da birîn lewra me nalîye ji dil
23.
Got, bulbulan hey nal*î*ye bê gîştina yar û murad
Rojî[1978] dibit xuya biket dîsa te ra dilber di dil
24.
Min got nema ṣebr û qerar hindûr seraser bûye xûn
Çare çi ye çawa bikem lew xweş birîndar im ji dil
25.
Got, ma zebeş ji xalîyê derdikevit dil xûn nebit?
Tê ṣênîyê pare nebit tê meclisê bê cerḥa[1979] dil?
26.
Min got ḥeyata min seraser tarîy û derd û ġem e
Çawa digêjit derd(i)mendê[1980] tar*î*rew ṭawûs*ê* dil[1981]
27.
Got, ger bixazim vedixî ava ḥeyatê wek Xiḍir
Piştî kiras gîşte murad Yeʿqûb*ê* dûrê ṣadedil
28.
ʿEṭfen bina ya muqteḍa nale`l-cewa ḥedden sema[1982]
Qeyyed tewekkel ya **Ḥezîn**[1983] dû ra dibînî çeşna dil

---

[1976] **Surûr**: Kêf, şahî
[1977] **Sîper**: Sîperrik, pirpirok
[1978] **Rojî**: Rojek
[1979] **Cerḥ**: Birîn
[1980] **Derd(i)mend**: Derdmend, xwedîderd, xemgîn
[1981] **Ṭawûs**: Teyrekî ji welatê Hindîstanê ye ku perên wî reng rengî ye. Li vir mebest jê; meqsed, armanc, mebest
[1982] Bi me şefket bike ey Hebîba ku tê xwestin, muhabbet gihîşte heddekî bilind.

29.

Heş tewişîn[1984] can herrişîn dema delal şîrîn meşî

ʿAlem seraser nûr*î* bû dema xuya bû dost di dil

30.

Dema ku raz[1985] wek tavîyan[1986] pê hev bibarin tim û tim

Muşkil[1987] yekayek ḥel bibin zanim ku ew roj Ṭûr e dil

31.

Got ey **Ḥezînê** dilbirîn ḥetta nebî mis̱lê[1988] hilal[1989]

Bi tilîyan nabî xuya nay hezkirin ʿalem da dil

32.

Pasa[1990] hesin ger rîş nebit[1991] ma mumkin e ronî bidit?

Diçi*rûs*ke carî gelo bê paqişî hêlîy*a*[1992] dil?

**81.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez − − + −/− − + −/− − + −/− − + −

1.

Ahî ji destê dûrîyê, jar û perîşanḥal e dil

Ji ev*î*n û ġerîbîyê, her dem bi êş û jan e dil

2.

Dûr bûm ji wê lêvşekkerê[1993] wê kewmeşa rûfennerê[1994]

Wê rûgeşa xalʿenberê[1995] lewra her roj bi zar[1996] e dil

3.

Dûr bûm ji wê ġebġeb kewê[1997] wê bejn*a* wek serwa sehî[1998]

---

[1983] Pêşî (hêştira xwe) girêde dûre tewekkûl bike. (Tirmizî, Sifahu'l- Qiyame, 60)
[1984] **Tewişîn**: Şaş bûn, 'ecêb man
[1985] **Raz**: Sir, nepen, nehênî
[1986] **Tavî**: Rejne, rêjne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demeke kurt didome
[1987] **Muşkil**: Pirsgirêk
[1988] **Mis̱l**: Weke, mîna, fena, nola
[1989] **Hilal**: Hîva ku hêj nû çêdibe, hîva mîna dasê
[1990] **Pas**: Jeng, zeng
[1991] **Rîş nebit**: Neyête biriqandin, neyête teyîsandin
[1992] **Hêlî**: Neynik, 'eynik
[1993] **Lêvşeker**: Lêvên mîna şekiran şîrîn
[1994] **Rûfenner**: Rûyên fena feneran geş û rewnaq
[1995] **Xalʿenber**: Xal/nîşanên mînanî 'enberan xweşbêhn
[1996] **Zar**: Zarîn, zarezar, nalîn, gîrîn
[1997] **Ġebġeb kewê**: Xebxeba wê weke ya kewan bedew. **Xebxeb**: Bin çenê, lama binê çenê candaran.
[1998] **Serwa sehî**: Dara serwi ya ripûrast

Wê rûh*î*va di çardehî[1999] lewra me hey bi nal e dil

4.

Nalîn ji me çûne felek ra hev ketin cinn û melek

Ji ber qetanê çûm helek weyl û seʿîr[2000] hilbûn di dil

5.

ʿIşqa cemala sermedî[2001] weqta ku ruḥ di dil d*a*nî

Me ra nema şerm û fedî lew aşikar nalîne dil

6.

Çawa bikem na mumkin e ev raz*a* nay veşartinê

Wek tavîyan[2002] dibar*î*ne çav hêstiran ji jan*a* dil

7.

Wek xûn dirijim hêstiran ji dûr*î*ya ji dêmduran[2003]

Qetan*ê* day ber xenceran xinc xinc[2004] dike pepûk*a* dil

8.

Wek şal*û*lan û bulbulan me nal*î*ne bo ṣorgulan

Ji dûrîya reş kakulan[2005] wek gul*a* istûxar e dil

9.

Bo dûrîya bejna ş*î*rîn bo dûrîya dêmê s*ê*vîn[2006]

Karê me ye her dem g*î*rîn wekî d*î*za ber ar[2007] e dil

10.

Êdî were dilber were ji perdehan derkev dere

Da ber xu can serteser e agir*ê* dişwarê di dil

11.

Jîna me têk derd û ġem e jana me her bê merhem e

Li hêvîya luṭfa te me ey nazika luqman*ê* dil

12.

Ger tu li me pursîn nekey birîn*ê* kûr derman nekey

---

1999 **Rûhîva di çardehî**: Ew rûyê ku wekî hîva çardeşevîn geş û ronak

2000 **Weyl û seʿîr**: Herdu jî di dojehê de navê newalekê ne. Li vir bi wateya “agirekî dijwar” hatiye bikaranîn.

2001 **Cemala sermedî**: Rindahiya bêdawî, bedewiya ebedî

2002 **Tavî**: Rejne, rêjne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demeke kurt dibare.

2003 **Dêmdur**: Rûyê ku mîna durrê geş, rûdurr, rûgeş

2004 **Xinc xinc**: Hûr hûrî, perçe perçe

2005 **Kakul**: Gulî, kezî

2006 **Dêmê sêvîn**: Ew rûyê ku mîna sêvê sor û gevez

2007 **Ar**: Agir

Tîrek*ê* tûj ḥewale key da can bidit lez jar*ê* dil

13.

Luṭfa te girtî serteser ʿalem xu da bi beḥr û ber

Van nal*î*nê min kûr bibir carî tecella key di dil

14.

Ava gihanê ser d*a* key arê qetanê xar vekey[2008]

Me waṣilê[2009] dîdar*ê* key yan ne xerabḥal im ji dil

15.

Çendan me hey sûc û guneh hûn kanîyê iḥsan*ê* ne

Em çavn*ê*rê luṭfa we ne carek temaşa key li dil

16.

Ya Reb **Ḥezînê** dilbirîn karê wî ye şîn û g*î*rîn

Baranekê ser da bişîn yabanekî[2010] bê av e dil

**82.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Dilê min çû ji destê min gelî yaran perîşan im

Ji destê dilbera tosin[2011] şev û rojan bi efġan[2012] im

2.

Qetana rûreşa ʿekrût[2013] ḥeta kengê dimînit ma

Ji derdê weṣl*a*[2014] hîvrûyan wekî bulbul bi êşan im

3.

Mekey hêvî ku dê pêk bên cihanê da hemî peyman

Ji yarê ra di her gavê heye şeʾnek[2015] wekî zanim

4.

---

[2008] **Xar vekey**: (Agir) temirandin, tefandin, vemirandin
[2009] **Waṣil**: Ewê ku digihe, bi dest dixe
[2010] **Yaban**: Çol, çolistan
[2011] **Tosin**: Serʿişq, bêîtaʿet
[2012] **Efġan**: Fîxan, nalîn, zarezar, qîrîn
[2013] ʿ**Ekrût**: Xerab, bed, pîs
[2014] **Weṣl**: Gihîştin, gihandin
[2015] **Şeʾn**: Hal, rewş. Îşareta vê ayetê dike:

(كُلَّ يَوْمٍ هُوَ فِي شَأْنٍ)

Ew, her gav di karekî ji hev cuda de ye. (Rehman: 55/29)

Demek dûr e demek nêz e, demek ẓahir demek baṭin

Demek girtî demek dayî, di karê yarê ḥeyran im

5.

Seraser ḥeyret û ʿecz e çiqas ber roj difirrit heş

Nîşanê bê n*î*şanan kî dikarit bêje ez zanim

6.

Wekî ṣarûx[2016] bilind bû heş, feżayê da kirî cewlan[2017]

Muḥîṭê Hind*î*[2018] da wer bû[2019] nihayet lew b*ê* saman[2020] im

7.

Belengaz û neçar im bêheş û dil hatime dergah

Vekey derî zivistan e helak nêz e ku ʿuryan[2021] im

8.

Ji mêj da dilkul û mest im bi jana xencera hecrê

Bes e dilber were êdî ḥeyata min tu yî xanim[2022]

9.

Wekî saġê[2023] li dor avan tih û ʿişk û zuha ye dil

Gelo dê şil biket baran*a* reḥma dilberê canim?

10.

Gelo êdî ş*î*rîn nayê bi serdana şehîdê xu

Çi pêtî hilb*û*ye dil da ji yarê ra çi qurban im

11.

Ji baġê jîn*a* dunyayê negirtime gulek geş lew

Şev û rojan wekî goyîn bi ah û wah û nalîn im

12.

Ḥeyata min evîn û ʿişq bihiştam[2024] meclisa ʿişret[2025]

Şemala[2026] min gula rûken li dor nûrê çi perwan[2027] im

---

[2016] **Şarûx**: Fûze
[2017] **Cewlan**: Çûyîn û ger, seyran, meş
[2018] **Muḥîṭê Hindî**: Okyanûsa Hîndê
[2019] **Wer bû**: Daket, peya bû
[2020] **Saman**: ʻEql, heş
[2021] ʿ**Uryan**: Rût, tazî
[2022] **Xanim**: Dilber, yar, evîn
[2023] **Saġ**: Kevirê li ber çeman e ku pir hişk û sexm e
[2024] **Bihiştam**: Bihişta min
[2025] **Meclisa ʿîşret**: Meclîsa kêf û şahiyê, civata xwarin û vexwarinê.
[2026] **Şemal**: Mûm, find
[2027] **Perwan**: Perwane, pirpirok, minminîk

13.

Mi[2028] ne war e ne dîyar e, mi ne mal e ne pergal[2029] e

Mi ne dost e ne heval e, ji bil yarê xerabḥal im

14.

Şev û rojan wekî avan dirijim hêstirê çavan

Ji derdê dil b*û*me kovan xerabê şah*ê* xûban[2030] im

15.

Ji kovana te şîrînê dinalim şubh*ê*[2031] goyînê

Dirêjim hêstirê xûnê wekî bulbul delovan[2032] im

16.

Tu hingiv ez wekî mêş im, tu nûr î ez wekî sîper[2033]

Tu Şîrîn î ez im Ferhad, fedayê bejn û bala nim

17.

Tu ṣorgul ez wekî bulbul, tu av î ez wekî masî

Tu Zîn î ez Memê Alan, Cezîrê da di zindan im

18.

Ġulamê qameta[2034] yekta esîrê awûrê bê ta

Ez im Mecnûn tu yî Leyla, evînê da ḥukumran im

19.

Şepalê[2035] ʿezm*a*[2036] suhbet kir, dil û cerg û hunav ker kir

Di ser da xoy j*î* pê wer kir[2037] perîşan im perîşan im

20.

Di atûna evînê[2038] da bi ṣaġî wer b*û*me cana

Nema min ṣebr û aramek hewarxaz im senaxan[2039] im

21.

ʿUmur borî di vê rê da tenê carek p*ê*çek rakir

---

[2028] **Mi**: Min. Ji ber ku kêşa helbestê li hev bê, helbestvan vê peyvê kurt kiriye.
[2029] **Pergal**: Hêlûna mirîşkan, pînik, koxik
[2030] **Xûb**: Rind, bedew
[2031] **Şubh**: Wekî, mîna, nola, fena
[2032] **Delovan**: Ew kesê ku diloyan dixwîne
[2033] **Sîper**: Sîperrik, minminîk, pirpirok
[2034] **Qamet**: Bejn, qam
[2035] **Şepal**: Ew kesê rind, bedew, nazik; şêrê mê
[2036] **ʿEzm kirin**: Qest kirin, mebest kirin
[2037] **Xoy pê wer kir**: Xwê lê reşand
[2038] **Atûna evînê**: Şewata evînê, agirê ʿişqê
[2039] **Senaxan**: Meth xwendin, pesn dayîn

Ji çavan nûr revand wek berq[2040] ji wê rojê ji koran im

22.

Wekî min jar û mest û ist*û*xar nîne dunê da kes

Xerabmal im nexweşḥal im yetîmê ber d*î*waran im

23.

Ricaya min ev e yara![2041] nevêjî min ji dergahê

Birîndar im tu dixtor î li cem te`y merhema canim

24.

**Ḥezîn** hoy hoy diket hey hey[2042] ji ber janê w*î* ye wey wey

Seḥergahan[2043] dixazit mey ji bil wê nîne dermanim[2044]

**83.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1.

Yê ku sîngê xu li ber ʿişqê kirî mertal ez im

Yê ku hespa wî beza meydan*a* ḥubbê[2045] da ez im

2.

Yê ku boy durra yetîm[2046] ket beḥr*a* bêbin bê kelek[2047]

Yê ku maye bê hewar nêv penc*ê* pêlan da ez im

3.

Yê ku bo yarê reha pêçûn*ê*[2048] kirye ixtiyar[2049]

Yê di nêv arê qetanê[2050] tirzilî[2051] bin da ez im

4.

Gîştina yaran ji bona pur hevalan bû neṣîb

Yê feqîr û dilbirîn û dûr*ê* dîdarê[2052] ez im

---

[2040] **Berq**: Birûsk
[2041] **Yara**: Ey Yar! Li vir banglêkirina yarê heye.
[2042] **Hey hey**: Her dem, her gav
[2043] **Seḥergah**: Spêde, berbang
[2044] **Dermanim**: Dermana min
[2045] **Ḥub**: Evîn, hezkirin, yarenî
[2046] **Durra yetîm**: Durra yek û bêheval, ew mirarî û mercanên bijare û giranbiha
[2047] **Kelek**: Keştiyê biçûk, lotke
[2048] **Reha pêçûnê**: Rêya mirinê. Biwêjekê kurdî jî heye: Tu pêçûyî!
[2049] **Îxtiyar**: Bijartin, hilbijartin
[2050] **Arê qetanê**: Agirê cudabûnê
[2051] **Tirzilî**: Şewitî

5.

Carekî borîn bikey yara[2053] li vî jarê xerab

Yê ji mêj da çav li rê çûbû liqaya[2054] te ez im

6.

Hey delalê bi *xeṭṭ* û xalê te dilê jar *kir*ye xinc[2055]

Ah li ber tîrê qetanê yê b*û* wek bêjing ez im

7.

Roj bi roj zêde dibit arê qetana te di dil

Bes key ey dilber cefayê yek ji eḥbaban ez im

8.

Çer diṣojî dil digel ew kûll*û*na[2056] sirra te ye

Çer dikey xeşmê digel yê can firot bo te ez im

9.

Surperî der hat ji burcê tar*î*tî xweş pare bû

Way heval seyrê dikin yê dûr û jar maye ez im

10.

Xweş dem e ev saʿeta bona hevalan nûbehar

Herkesî ra bû neṣîb gul, lê tenê meḥrûm ez im

11.

ʿÎd[2057] e, govend e ref û ref dêmzerî têne sema[2058]

Girt*î* binda hatne berdan lê tenê Yûsif ez im

12.

Ey dilo rabe wekî bulbul bikey ah û fiġan

Hezkirin çû der ji ḥed[2059] yê bê gihan dîsa ez im

13.

Ya Îlahî! ʿişq*a* bê gîştin nekey para kesî

Nar û nûr e dil diṣoje yê li xu dîtî ez im

14.

Ah*î* ew rojê gihanê bor*î*n û çûn wek birûsk

---

[2052] **Dîdar**: Rû, sîma; nêrîn, awir

[2053] **Yara**: Ey yar, ey dilber. Li vir banglêkirina dilberê heye.

[2054] **Liqa**: Dîtin, hevdîtin

[2055] **Xinc**: Parçe, kerî

[2056] **Kûllûn**: Kîler, xanî, xenzik

[2057] **ʿÎd**: Cejn, ʻeyd

[2058] **Sema**: Reqs, govend

[2059] **Der ji ḥed**: Ji heddê xwe derket

Yê li ber tîrê qetanê ma n*í*şan îro ez im

15.

Ew çi xweş roj û gulistan û çi xweş reng û kulîlk

Ew çi zêde remz[2060] û naz bûn bêje min ḥeyran ez im

16.

Lo hevalo şîretê pîran xu ra key wek guhar

Xu nebîne tu li cem wan qeṭ nebêj zana ez im

17.

ʿUmr*ê* bê pîran[2061] heba ye jîn*a* bê dilber ʿebes[2062]

Cehd*a*[2063] bê ʿişqê bela ye neynika razan[2064] ez im

18.

Ger nebit arê evînê çer digêje meqṣedan

Yê di yabana muradê dît*î* îşkence ez im

19.

Bê xebat û êş û zeḥmet naç*î* bezma[2065] ṣuḥbetê

Bê dil û can da di rê da dû r*a* borîzan[2066] ez im

20.

Rûy*ê* textan ger neyêt girtin bi rinda[2067] dûlkeran[2068]

Çer dibit şayîk û dilkeş ban diket[2069] hêlî[2070] ez im

21.

Dil bi rinda nuṣḥ*ê*[2071] pîran çê dibit ronî didit

Ah*î* yê bê pîr purê ʿumrê w*î* çû tewş her ez im

22.

Nig tu daneyne divê rê da hewar bê rehberek

Yê ku bê pîrê ṭerîqê ma li rê tenha[2072] ez im

23.

---

2060 **Remz**: Nîşan, îşaret, şan, hêma

2061 **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

2062 **ʿEbes**: Vale, beyhûde, bêkêr, bêfêde, tewş

2063 **Cehd**: Xebat, şixul

2064 **Raz**: Sir, nepen, nehênî

2065 **Bezm**: Civat, meclîs

2066 **Borîzan**: Kesê ku rê de diçe, rêwî

2067 **Rind**: Rendeş, amûrekî hesin e ku kêrî rastkirina û teraşkirina daran tê

2068 **Dûlker**: Necar, xerat

2069 **Ban diket**: Gazî kirin, bang kirin, qîrandin

2070 **Hêlî**: Neynik, eynik

2071 **Nuṣḥ**: Şîret, pend

2072 **Tenha**: Tenê

Lewr*a* jîna min g*î*rîn e kar*ê* min ah û fiġan

Der û dorê min d*û*man e bê heval û purs ez im

24.

Wek kevokê bê hedan ġulġul ji min bêḥed diçin

Hey hewar ey pîr*ê* ʿişqê bendewar û jar ez im

25.

Iḥtereqtu fî hewa werdi`r-ruba cud ya Kerîm[2073]

Yê di atûna[2074] evînê da eman birrî ez im

26.

Lê hevalê bes key xeşmê xûn ji dil cûh cûh diçit

Pur ḥezîn im dil birîn im çav g*î*rîn her dem ez im

27.

Xûn di dil da çênebû kanî di çavan da vebû

Gul û deryayê mezin çêbûn li ber masî ez im

28.

Çar *a*wirê[2075] min seraser tor û xişt û tarp[2076] û daf[2077]

El-meded[2078] ey destegîr! têk qeşd*a* rimbazan[2079] ez im

29.

Roj vedaye xweş*î* ye, rabûn ji xew yar û heval

Yê tenê maye di xew da bê xeber dîsa ez im

30.

Ya Îlahî! her tu yî **Ḥusnî** r*a* meqşûda bilind

Bo gihana te hey û hey yê bi zarîn e ez im

**84.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Hey dilberê rûfennerê biskê herîr[2080] rakey ji dêm

---

[2073] Ez di hezkirina gula girikan de şewitîm, şefqetê li min bike ya Kerîm.

[2074] **Atûn**: Ocax, argûn, firin

[2075] **Çar awir**: Çarmedor, derûder, hawirdor

[2076] **Tor û xişt û tarp**: Hersêk jî amûrên ji bo masîgirtinê ne. Wek kemîn, dafik, telik

[2077] **Daf**: Dafik, kemîn, telik

[2078] **El-meded**: Hawar, alîkarî

[2079] **Rimbaz**: Ew kesê ku rima davêjin

Wek sîperê`l dora n*û*rê bêt û biçim[2081] bêt û biçim

2.

Bengî r*a* agir ṣorgul e dema xuya ket dêm di dil

Dilber buraqan ger divêt qurban ez im qurban ez im

3.

Hate behar dîsa li min deşt û çiya têk xemilîn

Ṣorgul di baġan da vebûn bulbul ez im bulbul ez im

4.

Arê evînê coş*î* bû bengî d*î*sa serxoş*î* bû

Ya Reb di nêva pêtîyan wer bû[2082] dilim wer bû dilim[2083]

5.

**Ḥezîn** di deryaya evînê da wekî ḥût[2084] noq b*û*ye

Yara! ji bo gihan*a* te, yê daye dirrihan[2085] ez im

**85.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Derdê me ra nîne dewa kêm nabe belkî tête ser

Lewra ḥekîm dûr e ji min yê bêxudî maye ez im

2.

Carek were dilber mekey qelbê birîndar xoy mekey

Deryay*a* ava şîr*î*n î, yê tih ez im yê tih ez im

3.

Ey saqîyê[2086] jîna ebed saġ key dil û canê mirî

ʿÎsay*ê* weqtê her tu yî, mest û xerab û jar ez im

4.

Canê **Ḥezîn** tev bû birîn, cerg û hunavê wî ne xûn

Lewra heval gîştin gulan, yê bê murad maye ez im

---

2080 **Herîr**: Hevrîşim, hermûş
2081 **Bêt û biçim**: Werim û herim
2082 **Wer bû**: Bêhemdî ket (nêva pêtiyan)
2083 **Dilim**: Dilê min
2084 **Ḥût**: Masiyê mezin, balîna
2085 **Dirrih**: Dirî, stirîn, sinc
2086 **Saqî**: Ew kesê ku di civatan de meyê bela dike, meygêr.

**86.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Îşev di xewnê da me dît yarek wekî bedra temam[2087]

Awûr li min kir carekî got min çi ra nakey qiyam[2088]

2.

Ḥetta li pey nefsê biçî raḥet xu ra ṭeleb bikî

Naçî meqamê weṣletê[2089] destê xu naxînî meqam

3.

Cehd[2090] û xebat ger nebitin zewq û evîn ger nebitin

Şewat û ʿişq ger nebitin sernerm te ra nabit meram[2091]

4.

Meqṣed bizane agir e wek sîperê[2092] ger nebitî

Wek bulbulan weṣla gulan nabit neṣîb bo te mudam[2093]

5.

Ger tu divêtî gîştina yarê te ra zû bit neṣîb

Bigir bi pêşa murşidek terk key welat lez firde Şam[2094]

6.

Mal û melal[2095] zarok û jin yek yek ji wan qeydek mezin

Yê dil girêdabe bi wan dê ew bibit bê behr û cam[2096]

7.

Yê ku nebit ḥub[2097] behr*a* wî yê ku nebit dil pur evîn

Dûr e ji weṣla dilberan dûr e ji bezma şah*ê* ʿam[2098]

8.

---

[2087] **Bedra temam**: Heyveron, hîva panzde şevîn

[2088] **Qiyam**: Rabûn, sekna ser piya

[2089] **Weşlet**: Gihan, gihîştin

[2090] **Cehd**: Xebat, şixul

[2091] **Meram**: Meqsed, armanc, mebest, xwestek

[2092] **Sîper**: Sîperrik, pirpirok, minminîk

[2093] **Mudam**: Her tim, her dem

[2094] **Şam**: Bajarê Şamê. Paytexta dewleta Sûriyê. Li vir mebest “dûrbûn” e.

[2095] **Melal**: Mal, xanî

[2096] **Bê behr û cam**: Bê par û piyale

[2097] **Ḥub**: Evîn, hezkirin

[2098] **Bezma şahê ʿam**: Civata şahê herkesî

Dîsa **Ḥezîn** hate behar çavê kulîlkan bişk*o*vîn[2099]

Ġemgîn mebe lewra behar têk da gihan û kêf û kam[2100]

**87.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Gor murada me nebit dewran*a*[2101] dunyayê çi ġem

Lew bi dor têt vê dunê da ṭav û sîy û sar û germ

2.

Yan zemanek gor murada me werit gerra dunê

Dê çi bit şahî eger baqî nebit dê pê çi kem

3.

Şahîy û şînê cihanê ra n*î*ne mayîn mudam

Tê guhertin ḥal*ê* dunyayê li ser me dem bi dem

4.

Dilgirêdayê bi dunyayê nedîtin jê wefa

Gerçî jîna wan hebû tê da xweş û şîrîn û nerm

5.

Yar û neyarê cihanê wek hev in wê ra dilo

Ji cihana bê wefa ra nîne tu fedî[2102] û şerm

6.

Ṣed hezar ṣalî girêdey dil bi wê dunyay*a* dûn[2103]

Nab*î*nî weqta qetanê[2104] bil ji êş û derd û ġem

7.

Yan hezar ṣalî bikey xidmet ji dunyay ra dilo

Naxuyê ber çav*ê* wê tiştek n*a*bit wê ra kerem

8.

Bo qetana wê hevala bê wefa dilkul mebe

Bikş*î*ne ser nav*ê* wê ḥetta dikarî zû qelem

---

2099 **Bişkov**: Gupika gul û kulîlkan ya ber vebûnê
2100 **Kam**: Armanc, meqsed
2101 **Dewran**: Gerrîn, zivrîn, çerx
2102 **Fedî**: Şerm, heya
2103 **Dûn**: Kêm, nimz
2104 **Qetan**: Cudayî, fîrqet, veqetan, dûrketin

9.

Tê bi der ve her wekî bûkek*ê* xemlandî dunê

Lê bi hindûr pîrejinek ʿekr*û*t[2105] e wek jar e helm[2106]

10.

Ew bi dafa[2107] şehwetan nêçîr diket bo xu kesan

Ew bi qurnazîy*ê* insanan li qadê dike ṭirm[2108]

11.

Lê cuwanî wê r*a* xidmetê diket nêrîn diket

Li devê kalê nekarîyê reben da têne gem

12.

Kenn*a* wê bo te g*î*rîn e şahîya tê da ş*î*n e

Kar*ê* wê xapandin e jîna di wê da derd û ġem

13.

Hey ji wê ra bi hezaran yar û mêr û nas û dost

Jin eger ṣadiq nebit mêrê xu ra dê pê çi kem

14.

Ey **Ḥezîn** dunyay*ê* ra soz û wefaʾ kesek nedît

Çaw*a* nedîtîye keskî meyweyê dara çekem[2109]

**88.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Gelek jar û belengaz im tu sulṭan û m*î*r î îro

Xerabḥal im û dilxaz im bi ḥewce bal te ve hatim

2.

Dîn û dûr im sitûxar im bi can û dil birîndar im

Tu dûxtor î elemdar im bi hêvî bal te ve hatim

3.

Behara reng*î*n e îro dinê kesk û ş*î*n e îro

[2105] ʿ**Ekrût**: Rûpîs, kesê pîs û nebaş

[2106] **Helm**: Bêhn

[2107] **Daf**: Dafik, telik, kemîn, xepik

[2108] **Ṭirm**: Term, cenaze, cinyaz

[2109] **Çekem**: Darekê ji malbata dara bihî ye. Ji dara bihiyê kurtir e, pelê wê boz e û bêfêkî ye.

Demek pir ş*î*rîn e îro ricûkar bal te ve hatim

4.

Şev û rojan bi lorîn im bi derd û şîn û gîrîn im

M*î*na bocîyekî[2110] dûn[2111] im bi kazîn bal te ve hatim

5.

Hilo sulṭan*ê* irşadê hilo Şîrîn*a* Ferhadê

Hilo pîrozîya qadê xerabḥal bal te ve hatim

6.

Tu dûxtor î were ser me h*î*na birîn*a* kûr germ e

Nemaye tu hedan[2112] bo me hewarxaz bal te ve hatim

7.

Tu yî serçeşmeyê ḥeywan[2113] tu yî her derdê ra derman

Tu yî her êş*ê* ra luqman birîndar bal te ve hatim

8.

Muḥemmed[2114] baġ û bustan e Muḥemmed ʿewr û baran e

Muḥemmed dîn û îman e bi şahî bal te ve hatim

9.

Rêwenda me di çolê da tenê mame di vê rê da

Ġerîb dostê ġerîbyê da belengaz bal te ve hatim

10.

Çi ʿilm û ḥikmet e îro Xudê ew daye te îro

K*a*rê te reḥmet e îro hewaro bal te ve hatim

11.

Kulîlka baġ*ê* qelban î, ḥeyata cism û canan î

Sefer dûr im bi mêhvan î, ġerîb im bal te ve hatim

12.

Mi ne çenk e bifirim pê, mi ne deng e biqîrim pê

Mi ne ʿeql e binêrim pê, bi hêvî bal te ve hatim

13.

Tu îro şah*ê* merdan[2115] î, tu îro beḥr*a* iḥsan î

---

[2110] **Bocî**: Çêlikê kuçikan, têjikê kuçikan
[2111] **Dûn**: Kêm, nizm, pîs
[2112] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[2113] **Serçeşmeyê ḥeywan**: Serekaniya ava jiyanê, çavkaniya ava heyatê
[2114] **Muḥammed**: Pêxemberê dawî Hz. Muhammed Mustefa (saw.)

Tu îro ʿewr*ê* nîsan î, t*î* û mat bal te ve hatim

14.

Xudanê şûr û Quran î, xudanê ʿeql û burhan[2116] î

Xudanê şan û nîşan î, emano bal te ve hatim

15.

Qewî qenc û delal î tu, qewî pak û zelal î tu

Hemî nûr û kemal î tu, sitûxar bal te ve hatim

16.

**Ḥezîn** im çav tijî xûn im, bi ahîn û bi nalîn im

Hewarê bal we ve tînim, delalo bal te ve hatim

**89.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Hey dilberê rû fennerê, carek xuya be`d pencerê

Wek sîperê`l dora n*û*rê, bêt û biçim bêt û biçim

2.

Lêvşekkera zîvînbeden, xweş xweş me ra gotin kirin

Wek morîyan ta ra kirin,[2117] şîrînqezî[2118] ye ʿîs*a*dem[2119]

3.

Nayête şerḥ û qelemê, hezkirina Zîn û Memê

Ne vê demê ne wê demê, rake ji rûpelan qelem

4.

Mewsim hebin behar e ew, kulîlk hebin gulnar e ew

Wenda hebin hewar e ew, kana her iḥsan û kerem

5.

Çare û hêvî her ew e, baran û tavî her ew e

Delav û çavî her ew e, ew hebe tişt nebe çi ġem

6.

---

[2115] **Şahê merdan**: Şahê mêran

[2116] **Burhan**: Ewê ku ji bo hebûna tiştekî delîlên teqez dîne

[2117] **Morîyan ta ra kirin**: Ta bi moriyan re kirin, morî li bendikan rêz kirin,

[2118] **Şîrînqezî**: Şîrînpeyv, xweşgotin

[2119] **ʻÎsadem**: ʻÎsanefes. Behna/hêlm yarê şibandiye bêhna Hz. Îsa. Lewra Hz. Îsa bi pifkirinê nexweşan baş dikir û miriyan jî ji gorê radikir.

Her ew e luqmanê dilan, her ew e melhema kulan
Her ew e rakerê belan, çid`kî ji Key[2120] çid`kî ji Cem[2121]
7.
Her wê bixaze wê bi nas, li cem w*ê* ye ʿesa`w[2122] kiras[2123]
Bi ẕikr*ê* wê radibe pas, ji qelb*ê* qirrêjê ʿedem[2124]
8.
Yara berîn[2125] yara berîn, bi salix û navên ş*î*rîn
Her wê binas her wê bixûn, her wê bibêje dem bi dem
9.
Her wê bizane dilcivîn, her wê bizane ġemrevîn
Li cem wê ye şahî û şîn, milkê ʿereb milkê ʿecem
10.
Bixûne Qurana bi nûr, bizane wan meʿnay*ê* kûr
Dirêj dibin tîrêj ji dûr, bi wan dibin dil germ û nerm
11.
Dunya ne ya dildan*ê* ye, warê *der*d û qetan*ê* ye
Kûlġanîya[2126] her jan*ê* ye, her niʿmetê wê ber ʿedem[2127]
12.
Dunya hemî malê mi be, pûnik[2128] û pergalê[2129] mi be
Her kes met û xalê mi be, dê pê çikem dê pê çikem
13.
Çiqas w*ê* ra xizmet bikî, roj û şevên xu rê bikî
Dawîy*ê* da jê bar dikî, ma kan*ê* kal û bav û ʿem[2130]
14.
Ma nay*ê* bîra te gelo! ew rûy*ê* şayîkê[2131] hilû[2132]

---

[2120] **Key**: Şahê mezin, padişah.
[2121] **Cem**: Şahekî Îranî ye ku li gorî mîtolojiya Îranî 700 sal û di dewra Hz. Nuh de jiyaye. (Pala, *b.n.,* r. 86.)
[2122] **'Esa**: Gopal. Li vir mebest jê 'esa/gopala Hz. Mûsa ye.
[2123] **Kiras**: Ji kirasê mebest, kirasê Hz. Yeqûb e ku çavên wî yên kor bi wê kirasê baş bû.
[2124] **'Edem**: Pîsî, necisî
[2125] **Yara berîn**: Yara berê, dilbera ezelî, xoşewîsta 'ewil. Mebest jê Xwedê ye.
[2126] **Kûlġanî**: Gencîne, xezîne
[2127] **Ber 'edem**: Tunehî
[2128] **Pûnik**: Ew hêka ku datînin hêlûna mîrîşkan ku mîrîşk wê dibîne û tê ser rûdinê û hêk dike. Li serhedê jê re dibêjin; hêlavink.
[2129] **Pergal**: Kolika mîrîşka, koxika mîrîşk. Lê mebest ji pûnik û pergalê, malê dinê ye.
[2130] **'Em**: Ap, mam
[2131] **Rûyê şayîk**: Rûyê bêmû, bêrih
[2132] **Rûyê hilû**: Rûyê neqermiçî, bêgirûz

Tev bû xeyal û xew wulo, karîn û bîr çûn çem û çem[2133]

15.

Mal û melal, dost û heval, gaz û çîya`w deşt û newal

Welat û milkê dillibal[2134] kê ra dimînin ew mudam

16.

Sulṭan*ê* dunyayê tu bî, Mişr û *Kur*distan ê te bî

Textê Kerîm Xan[2135] ê te bî, te ra n*a*mîne ew meqam

17.

Çiqas wefay jê hêv*î* kî, berbigerî xu gîr*î* kî

Tu havilêkî[2136] pê dikî? ber[2137] nagire bihî`w çekem[2138]

18.

Zana*yên* zemîn[2139] gotine “dunya me ra pir xain e

Her roj *dos*tan dighêz*î*ne[2140]” jîna di wê jan û elem

19.

Naçilmisin kulîlk û gul, nayêne xar ji dar*ê* pel?

Pîr nabe xortê reşk*a*kûl[2141] ma hişk nebû baġê irem?

20.

Ey dil girêdayi`b dunê, rojek diqetî`j vê x*a*nê

Xelqê p*ê*şî hatin k*a*nê, xudan*ê* jîna nerm û germ?

21.

**Ḥezîn** dibarre[2142] ser xu da, wek berxika ji birr cuda

Lew ʿemr*ê* hêja kir feda, bi tewşîy û bi derd û ġem

22.

Ew dem û dewra nexweşî, her kêf û ẕewq lê dimeşî

Ew xort*î* û xurtî geşî, tev bor*î* çû tev bû ʿedem[2143]

---

[2133] **Çem û çem**: Peyderpey, hêdî hêdî, hindik hindik

[2134] **Dillibal**: Mal hezker, hezkerê malê dinê

[2135] **Kerîm Xan**: Kerîm Xanê Kurd. Di sala 1705’an de li Şîrazê hate dinê. Damezîrînerê Xanedaniya Avşar a Kurdên Îranê ye. Dûre di salên 1760 û 1179’an de bû şahê Îranê. Lê di serdema şahtiya xwe de navnasa *Şah* xwe nekir, li şûna wê navnasa *Wekilê Gel* bikar anî û bi vê navî dewletê rêvebir. Di sala 1779’an de li Şîrazê wefat kir. (https://fa.wikipedia.org/wiki/کریم%E2%80%8Cخان_زند 02.02.2015)

[2136] **Havil**: Sûd, fayde

[2137] **Ber**: Fêkî, mêwe

[2138] **Çekem**: Dara çekem. Darek ji famîla bihiyan e ku bejna wê hinek din kurt e.

[2139] **Zemîn**: Zeman, dem

[2140] **Dighêzîne**: Diguherîne

[2141] **Reşkakûl**: Reştûncik, reştûmik

[2142] **Dibarre**: Barrîn, dengê ku ji berxikan der tê.

[2143] **‘Edem**: Wenda bû, tune bû, fena bû

23.

Hewar nekî hewar nekî, bi tevş*î* rojan rê nekî

Barê giran jî piştl nekî, xu bigire bi bend*ê* zexm

24.

Zexm bend*ê* îman û d*î*n e, tirsa Xudayê jor*î*n e

Li ser gunehan gîr*î*n e, dunê d*a* kar dike nedem[2144]

25.

Puşmanîya di axretê, ẓen nekî ew kêrî te tê

Zêde dike ew ḥesretê, axîna bê feyde çi kem

26.

Meġel û zozan ê te bin, zevî û xozan ê tebin

Her baġ û bustan ê te bin, tev te diçin çola ʿedem

**90.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Dilo rabe dilo rabe cihanê da bikey seyran

Ku "safirû teṣiḥḥû belseme"[2145] hem mizg*î*n û silwan[2146]

2.

Dibit dîna ṭebîbek baṭinî bo te neṣîb lewre

Li ser cerḥa[2147] k*û*ra ġeddar *zû* dayne merhem û derman

3.

Hemî mal û melal, can û cesed, cah[2148] û şeref bin da

Bi kêf û dilxweş û şahî di vê rê da bikey qurban

4.

Ḥużûra caw*î*dan[2149] û raḥeta ruḥ ger dixazî tu

Ji bona murşidê kamil feda key wan û Kurdistan

5.

Ji baġê ʿalema ʿişqê neṣîb bit bo te yek sêvek

---

[2144] **Nedem**: Poşmanî
[2145] Seferê bikin, sihhetê bibînin.
[2146] **Silwan**: Liberdildan, teselî
[2147] **Cerh**: Birîn
[2148] **Cah**: Paye, meqam
[2149] **Cawîdan**: Bêdawî, sermedî

Cehanê da dibî mesʿûd çi ye Îran çi ye Tûran

6.

Ji deryaya evînê yek dilopek ger vexî ey dil

Hey û hey dê bimînî saġ çi ye ḥeywan[2150] û Taristan[2151]

7.

Ji nûra roj*a* lahûtê[2152] t*î*rêjek bav*ê*je ser te

Cuwan û geş dimînî hey çi ye derman çi ye luqman

8.

Tecellayek[2153] ji kaxa lamekan[2154] ger bête Ṭûrê dil[2155]

Tu xweş bî ṣar*û*x[2156] û fûze feżayê da dikey cewlan[2157]

9.

Meqamê lamekan bînî[2158] tu bê perde bi çavê dil

Heyîv û zuhre[2159] û merrîx[2160] çi ne hem ʿalem û dewran

10.

Tereqqe fî selali mi`l-huda neḥwe`l-ʿula dewmen[2161]

Kemalu`l-mecdi bi`l-weṣli dewamu`l-weṣli bi`l-wicdan[2162]

11.

Îẕa ṣahedte în ʿame`l-hebîbî kûn lehû ʿebda[2163]

Îza eṣbeḥte ʿebden yemlu`l-qelbu mine`l-ʿirfan[2164]

12.

Febi`liʿirfani yelqe`l-mer û eʾla ẕirweti`l-wecdî[2165]

We bi`l-wecdî yere`l-qelbu ḥudûren muʿdime`l-eḥzan[2166]

13.

Leqed cabe`l-**Ḥezîn**û min zuhûri`l-wecdi baqatin[2167]

---

[2150] **Ḥeywan**: Ava heyatê, ava jiyanê
[2151] **Taristan**: Welatê tarî. Cihê ku Sikender û Hz. Xidir bi hev re ava jiyanê geriyane. (bnr. 77/99)
[2152] **Lahût**: Îlahiyet, ‘alema îlahî, alema me’newî
[2153] **Tecella**: Diyarbûn, zahirbûn
[2154] **Kaxa lamekan**: Burca lamekan, burca bêcih
[2155] **Ṭûrê dil**: Çiyayê dil
[2156] **Ṣarûx**: Fûze
[2157] **Cewlan**: Çûyîn û ger, seyran, meş
[2158] **Bînî**: Bibînî
[2159] **Zuhre**: Stêrka sibê, stêrka şivanan, Venûs
[2160] **Merrîx**: Stêrka Merîx. Stêrkek sor û gevez e, Mars
[2161] Di pêlekana hîdayetê de her tim jor ve biçe.
[2162] Kemala şerefê bi gihanê ye, dewama gihanê jî bi dîtinê ye.
[2163] Dema te dît ku nî’metên Hebîbê ji te re heye, jê re bibe kole.
[2164] Weqtê tu jê re bibî kole, dil bi nasiyê tijî dibe.
[2165] Bi me’rîfetê mirov rastî bilintirê ‘işqa Xwedê tê.
[2166] Dil bi hezkirinê huzûrê dibîne, ew huzûr derdan wenda dike.

ʿEla texti`l-huḍûri ṣareke`l-ebdali we`s-sulṭan[2168]

**91.**

mefʿûlu / mefaʿîlu / mefaʿîlu / feʿûlun

Hezec − − + / + − − + / + − − + / + − −

1.

Hey dilbir*î*nê tîr û rim û xencer*ê* yaran

Der badiye[2169] û gaz[2170] û newalan mebe nalan[2171]

2.

Lewra ku ṣefa tête çinîn tev li cefayê

Ma kes digirit ṣorgul*ê* bê xar*ê*[2172] nihalan[2173]

3.

Ṣade fereḥek[2174] nîne kesî ra di dunê da

Koşka fereḥan leşker*ê* derdan kir*î* talan

4.

Kî dilkul*ê* qebḍê[2175] û d*î*ger kêfxweş*î* besṭê[2176]

Kî şîn û g*î*rîn kî ṭereb[2177] û ʿeşq*a* delalan

5.

Bo dûr nebitin reh*rew*[2178] ji emn[2179] û ji qunûṭê[2180]

Nêv xewf[2181] û recayê[2182] biçitin ʿalem*a* ḥelal

6.

Barî[2183] ku xudanê reḥemût[2184] û ceberûtê[2185]

---

[2167] Hezîn ji kulîlkê hezkirinê çend qewş qetandiye.
[2168] Li ser textê huzûrê wekî sultan û wezîr geryaye.
[2169] **Der badiye**: Di çolê de
[2170] **Gaz**: Çiyayê bêdar
[2171] **Nalan**: Ew kesê ku dinale, diqîre
[2172] **Xar**: Stirîn, dirî, sinc
[2173] **Nihal**: Çiqil, şax
[2174] **Fereh**: Kêf, şahî
[2175] **Qebḍ**: Stres, tabîat tutucu
[2176] **Besṭ**: Şahî, şadî
[2177] **Ṭereb**: Kêf, şahî
[2178] **Rehrew**: Rêwî
[2179] **Emn**: Ewlehî
[2180] **Qunûṭ**: Bêhêvîbûn
[2181] **Xewf**: Tirs, saw, xof
[2182] **Reca**: Tika, rica
[2183] **Barî**: Yek ji navên Xwedê ye ku bi mana; her tiştî û her derî li gorî hev û bi nîzamî diafirîne
[2184] **Reḥemût**: ʻAlema rehma cemala Xwedê
[2185] **Ceberût**: ʻAlema qehra celala Xwedê

Lewra ku tecellî dibitin b`herdu hevalan

7.

Ger ronîy*a* roja reḥemûtê bide qelban

Dê şah*î* k*ê*f û cez̠be û ta bête kemalan

8.

Can saġ dibitin qelb*ê* h*î*şar ʿeqlê ronî

Ezman*ê* digel nuṭq*a* fesîḥ[2186] tê hem*î* lalan

9.

Ger berq[2187] û birûskê ceberûtê bide qelban

Dê ʿeql û şuʿûr firde ji tirs û ji celalan

10.

Her kes ji ʿibadan dikevit paşilê dest

Wek goy*în*ê[2188] nalîn di*ket* ber best û newalan

11.

Wek gaz*ê* Muḥîq[2189] dil d*ê* bibit pare û pare

Ger dil bibitin ʿişk*ê* wekî lat[2190] û zinaran

12.

Wê tirs*ê* leqeb danîye ser **Ḥusnî**, **Ḥezîn**[2191]

Der ʿehd*ê*[2192] şebabê[2193] b*û*ye meḥsûb*ê*[2194] ji kalan

**92.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Ji sertapa[2195] b*û*me agir ḥebîba ġemrevîn kanê

Der û dor têk d*a* tarî bûn delala dilmunîr[2196] kanê

---

[2186] **Nuṭqa fesîḥ**: Axaftina xweş û zelal
[2187] **Berq**: Birûsk
[2188] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.
[2189] **Gazê Muḥîq**: Çiyayê Hz. Mûsa, çiyayê Tûr
[2190] **Lat**: Kevirên mezin, zinar, baxir
[2191] **Ḥezîn**: Xemgîn, bihuzn, bikeser. Wateya din; ew tirs, leqeba *Husnî* ku navê şa'irê wê dîwanê ye, wekî zêdenav *Hezîn* daniye.
[2192] **Der ʿehdê**: Di zemanê de
[2193] **Şebab**: Xortî, ciwantî
[2194] **Meḥsûb**: Hatiye hisabkirin
[2195] **Sertapa**: Seranser, serdanpê, ji serî heta pê
[2196] **Dilmunîr**: Yê ku dilan ronî dike

2.

Seraser ṣuhtim û borîm ji ber jana evîna dil

Belengaz û neçar û dûr tenê mame heval kanê

3.

Gelo kengê ṣeba[2197] bête ji yarê tîne peyġamê

Wekî Yeʿqûb digel ahan dibêjim Yûsifêm kanê

4.

Ji mêj da dilkul û dîn im bi ḍerba xencera ḥecrê[2198]

Ḥeta kengê dewamê ket qetan û ma gihan kanê

5.

Çikandî çangulê[2199] biskan di dil da dilbera hîvrû

Dema dem kaş diket bal xu qetanê da hedan kanê

6.

Dema ʿişqê *ê*rîş kir ser dilê goyîn[2200] wekî şahîn[2201]

Cuda kir dil ji canê jar gelî yaran dilêm kanê

7.

Ne ez tenha[2202] bi biskê dilbera hîvrû b*û*me nêçîr

Cihanê da kesê bê xişt*ê*[2203] biskê dilberan kanê

8.

Hemî baġ û çiqûlk û belg digel av û delavan hey

Şev û rojan digel ahan dibêjin ma delal kanê

9.

Ji sertapa perritî can di nêva dozexa ʿişqê

Dilê miskîn qijjîn pê ket gelî dostan kiras kanê

10.

Ji bustanê dunê girtî hevalan gul xu ra borîn

Ez im meḥrûm di nêv koma hevalan ma gulam[2204] kanê

---

[2197] **Şeba**: Bayê ku ji hêla rojhilatê tê. Bayekî hênik û her tim tê. Ji ber ku bayê seba her tim diçe û tê, bê sekn û bê sebat e, lewra dilê bengî jî dişibe bayê seba.

[2198] **Ḥecr**: Cudayî, dûrketin, qetan

[2199] **Çangul**: Çengal, xelekên keziyê

[2200] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.

[2201] **Şahîn**: Baz

[2202] **Tenha**: Tenê

[2203] **Xişt**: Darekî zirav û hişk e, nêzî du mitroyan e, serê wî de hesinek heye ku bi wî darî nêçîra masiyan tên kirin.

[2204] **Gulam**: Gula min

11.

Behar e ʿewr*ê* nîsanê hêşîn kir sosin û sunbul

Welê bulbul li henber gul dibêjit ma gulam kanê

12.

Ġerîb nîne kî wer bêjit: ku bêhn û reng*ê* bişkovan[2205]

Firandin heş, pijandin leş, kirin nexweş dewa kanê

13.

Dilê qimmek[2206] ji yenbûʿa evînê[2207] girt dibit bêḥal

Ji her derdê r*a* hey derman ji bê dil ra dewa kanê

14.

Dema bazê evînê gujgujî[2208] ser qelbê wek çûkê

Revandî dil xu ra birçû ji bê dil ra ḥeyat kanê

15.

ʿEqil firda ji ber ʿeşqê wekî Qeysê[2209] di çolan da

Şev û rojan bi nalan im gelî dostan delal kanê

16.

Ṣeba[2210] ger tu bi taxa dilberê borî vekey beḥsê

**Ḥezîn** jar e birîndar e, gelo ʿehd û m*î*ṣaq[2211] kanê

**93.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1.

Her kesî girtî xu ra dost û heval mame tenê

Her kesek gîştî muradan bê murad mame tenê

2.

Her hevalî girt*î* werdek ji gulistana dinê

Ah dilo bê gul di nêva ʿalemê mame tenê

3.

---

2205 **Bişkov**: Gupika gul û kulîlkan ya ber vebûnê

2206 **Qimmek**: Qurtek, çengek

2207 **Yenbû‘a evînê**: Çavkaniya evînê, serekaniya ‘işqê

2208 **Gujgujî**: Êrîş kir

2209 **Qeys**: Navê Mecnûnê ye. Mecnûnê ku evîndarê Leylayê bû.

2210 **Ṣeba**: Bayê seba, bayê rojhilatê. Li vir banglêkirina bayê jî heye ku dibêje: Ey bayê seba!

2211 ʿ**Ehd û mîṣaq**: Soza qewî, peymana zexm

Ah hevalan ṭey kirin rê[2212] borîn û çûn wek birûsk

Ah di yabana qetanê[2213] rê nenas mame tenê

4.

Ya Îlahî! çi bikim ku da biçim çawa ye rê?

Çol bi qûm e ṭav bi ṭîn e bê şerab mame tenê

5.

Ew şeraba kîm(i)yawî kî vexar borîy û çû

Meḥrûm û dûrê şerab û dilberê mame tenê

6.

Merditîya dilberê girtî xu da heft asiman

Her kesî girtî neṣîbek bê neṣîb mame tenê

7.

Meqṣed û şahî û raḥet bû neṣîbê her kesî

Dil fikar û istûxar û bê hedan mame tenê

8.

Agirê dil derve hat û mulk kirî tevda wucûd

Wekî perwanê[2214] di nêva pêtîyan mame tenê

9.

Ah heval û hogirêm nêz bûn ji gulzara murad

Lê ġerîb û dilbijan û der bi der[2215] mame tenê

10.

Ref bi ref bengî diçin bal baġ û bustanê gulan

Dilkul û bêḥal û dûrê gulrûyan mame tenê

11.

Gul di baġan da vebûn bengî çi xweş nêrîn dikin

Ah li min wek bulbulan xew da dîsa mame tenê

12.

Ronîya rûyê delalê ronî kir her ġar[2216] û doj[2217]

Lê di nêva tarîtîyê mat liha[2218] mame tenê

---

[2212] **Ṭey kirin rê**: Rêpêçan, di rê de wek birûskê çûyîn

[2213] **Yabana qetanê**: Çola cudahî, çolistana dûrketinê

[2214] **Perwane**: Pirpirok, minminîk, baperik

[2215] **Der bi der**: Derî bi derî. (Ango li derve mame.)

[2216] **Ġar**: Şkefta sirûştî

[2217] **Doj**: Li aşê, cihê ku av dikeve tê. Li vir mebest jê ev cihên ku kuncik, kûr û tarî ne.

[2218] **Liha**: Li vir

13.

Tev hevalan biç[2219] newalan guh de ahê bulbulan

Ew j*î* wek te tim dibêjin bê murad mane tenê

14.

Bulbulo wek dil be ṣabir[2220] pur mekey ah û fiġan

Ew j*î* nêva bengîyan da bê gihan maye tenê

15.

Ah û zarî bo çi ne dilber dibînit ḥal*ê* me

Gerçî nêva dirrîyê hicran*ê*[2221] da mame tenê

16.

Dil girêdî ger bi yarê ve emirkêşê w*ê* bî

Qeṭ nebit bo te heval dîsa nebêj mame tenê

17.

Ger te bit cehd û xebat, ʿezm û hewes, şewq û evîn

Zar*î*n û ahîn çima daim dikey mame tenê

18.

Tev hevalan lal bibe zarîn bikey l`tenhatîyê

Wek pepûkê deşt û gazan[2222] da bibêj mame tenê

19.

Av ku pur be kerḥes[2223] e lêkin newalan da ji bo

Hindike zarîn dike bêḥed dibêj mame tenê

20.

Ya ḥebîbî qed helektu fî hewa kum ferḥemû[2224]

Canik im[2225] atûn*a*[2226] ʻeşqê da ḥerîq[2227] mame tenê

21.

Ya ṭebîbî eyne entum ṭaḥenî`l-dau`l-ʿuḍel[2228]

Dil birîn û pur **Ḥezîn** û bê ʿilac mame tenê

---

[2219] **Biç**: Biçe, here
[2220] **Ṣabir**: Sebirker
[2221] **Dirrîyê hicranê**: Stirînên dûrbûnê
[2222] **Gaz**: Çiyayê bêdar.
[2223] **Kerḥes**: Bêdeng, deng jê nayê
[2224] Ey dosta min! Ez di hezkirina te de çûme helakê, merhemetê li min bike.
[2225] **Canik im**: Ez canekî tenê me, yek canê min heye
[2226] **Atûn**: Ocax, argûn, firin
[2227] **Ḥerîq**: Şewitî
[2228] Ey tebîba min! Êşek ku merivan dikuje ez birim helakê, hûn li ku ne.

**94.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Birîndar im bi ḍerba xencera hecrê[2229] ḥebîb[2230] kanê

Perîşan im elemkêş im cigerxûn im ṭebîb kanê

2.

Wekî bazan ġem û derdan hucûmek zor li ser dil dan

Ku nêze dil bikin talan delala ġemrevîn kanê

3.

Şewata agirê hecrê nikarim ez teḥemmul kim

Hewarxaz im ji te şaho[2231] dil û can çû ṣebir kanê

4.

Dilê tazî qijîn pê ket di nêva agirê ʿişqê

Hewar û ṣed hewar derdo peritîm ez Şîrîn[2232] kanê

5.

Dîsa bayê evînê beḥra ʿişqê mest û serxoş kir

Şeva tarî di nêv pêlan tenê mame kelek kanê

6.

Hewar ehlê dilan dil çû ji destê min bikin şefqet

Wekî bulbul bûme bê dil vebûna gul gelo kanê

7.

Ez im tazî û pêxasê di vê çola bi qûma germ

Tenê mame rê wenda me gelî yaran reham[2233] kanê

8.

Wekî bayê ṣeba[2234] qeṭ nîne aram û hedana[2235] me

Mem im îro di zindanê gelo Zîna şîrîn kanê

9.

---

[2229] **Hecr**: Hicran, cudayî, dûrketin, veqetan

[2230] **Hebîb**: Evîn, yar, xoşewîst, berdil

[2231] **Şaho**: Ey şah. Li vir banglêkirin heye.

[2232] **Şîrîn**: Dilbera Ferhad. Bi Ferhad û Şîrîn namdar in.

[2233] **Reham**: Rêya min

[2234] **Bayê seba**: Bayê ku ji hêla rojhilatê tê. Bayekî hênik û her tim tê. Ji ber ku bayê seba her tim diçe û tê, bê sekn û bê sebat e, lewra dilê bengî jî dişibe bayê sebayê.

[2235] **Hedan**: Aram, sebr, tebat

Eger raket niqabê[2236] yar bibînim pareyê hîvê

Dimînim ṣaġ û ṣaġ ḥetta ebed êdî mirin kanê

10.

Ji roja rûy*ê* dildarê ṭ*î*rêjek bav*ê*je ser dil

Bi xu bit hêlîya[2237] nûrê, cela û luks û find kanê

11.

Dilopek bar*a*na ʿewrê evînê ger vexî ey dil

Bi xu bî rehberek zana, ji Xiḍran ra luzûm kanê

12.

Leqed mittû bikum wecden febane rûḥ*î* min cismî[2238]

Dilê jar pare bû cana gihana ṣorgulan kanê

13.

Wekî bulbul şev û rojan bi ah û wah û efġan im

Ji sertapa[2239] b*û*me agir dîyarê yar*a* min kanê

14.

Derê cûd[2240] û fuyûḍatan[2241] ji jaran ra vekey cana

Di yabana qetanê[2242] da **Ḥezîn** mame gihan kanê

**95.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / feʿûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1.

Xandin te ra xweş esas[2243] e biray min

Zanîn te ra *biv*r û das e biray min

2.

Bi zanînê serê duşmen nişîve[2244]

Bi xu bindest e wek gêlan[2245] biray min

---

2236 **Niqab**: Perde
2237 **Hêlî**: Neynik, ʻeynik
2238 Sond dixwîm ku ez bi ʻişqa we mirim, ruhê min jî ji bedena min qetiya.
2239 **Sertapa**: Serapa, serdanpê, ji serî heya pê
2240 **Cûd**: Camêrî, comerdî
2241 **Fuyûḍat**: Feyz û bereket
2242 **Yabana qetanê**: Çola veqetanê, çolistana dûrketinê
2243 **Esas**: Bingeh, hîm
2244 **Nişîve**: Berjêr bike, bitewîne
2245 **Gêl**: Mûr, morî, mûrî

3.

Dikarî zexm girêdî duşmenê xu

Bi zanîna bilind bê bend biray min

4.

Te ra zanîn şeva tarî d*a* luks e

Ji cehlê ra ew e atom[2246] biray min

5.

Te ra zanîn li tenhayê heval e

Di nêv xelqê cemal[2247] e lo biray min

6.

Bi zanînê dinasî çêkerê[2248] xu

Bi zanînê dibî rêzan biray min

7.

Bi zanînê dibî mesʿûd û menẓûr[2249]

Bi zanînê tereqqî[2250] key biray min

8.

Bi zanînê dibî meşhûr û meʿrûf[2251]

Bi zanînê dibî bîtkel[2252] biray min

9.

Bi zanînê ji xizanyê reha bî[2253]

Bi zanînê dibî zengîn biray min

10.

Bi zanînê bilindî ser hevalan

Xuyayî ronîy û rindî biray min

11.

Bi zanînê dibînî her reha rast

Bi zanînê dibînî dûr biray min

12.

Bi zanînê xebatê key biray min

---

[2246] **Atom**: Zerreya herî biçûk di maddeyê de, xudûd.
[2247] **Cemal**: Bedewî, rindî, spehîtî
[2248] **Çêker**: Afirîner
[2249] **Menzûr**: Tê ʿecibandin, (cihê ku) tê dîtin û temaşekirin
[2250] **Tereqqî**: Bilind, bala
[2251] **Meʿrûf**: Namdar, meşhûr
[2252] **Bîtkel**: Mahir, pispor, zana
[2253] **Reha bî**: Xilas bibî, rizgar bî

Bi zanînê diçî pêş da biray min

13.

Bi zanînê ġerîban ra dibî nas

Bi qedr û niʿmet û ʿizzet[2254] biray min

14.

Bi zanînê dibî azade[2255] xorto

Bi zanînê dibî serbest biray min

15.

Bi zanînê bilind û serfiraz î

Bi zanînê dibî karzan biray min

16.

Reha ʿilmê da bê sistî xebat key

Ji beşîgê[2256] ḥeta gorê biray min

17.

Melayê me`y[2257] Cezîrî[2258] her bi ʿilmê

Dunê da nam û şan daye biray min

18.

Bi ʿilmê Eḥmedê Xanî[2259] wekî roj

Bûye meşhûr*ê* afaqan biray min

19.

Şerefuddînê Beṭlîsî[2260] bi ʿilmê

Bela bû nav û dengê wî biray min

20.

ʿEliyyê me`y Ḥerîrî[2261] lo hevalo

---

[2254] ʿ**Izzet**: Qîmetdarî, birêzî, hêjatî

[2255] **Azade**: Azad, xweser

[2256] **Beşîg**: Landik, dergûş

[2257] **Meʿy**: Me yê, yê me. Ji vê mebest diyarkirina Kurdbûna wan e. Wek mînak ʿEliyê Herîriyê Kurd

[2258] **Melayê Cezîrî**: Mela Ehmedê Cizîrî. (bnr. 50/3)

[2259] **Eḥmedê Xanî**: Helbestvan û mutesewifê Kurd. Di sala 1651ʿan de li Hekariyê hatiye dinê û di 1707ʿan de li Bazîdê çûye rihma Xwedê. Li Bazîd, Xelat, Riha, Cizîr û Bedlîsê xwendiye. Li bal mîrê Bazîdê katibiyê kiriye. Ehmedê Xanî yek ji wan navdartirîn şa ʿirên Kurdan e ku berhemên wî yên ku gihîştiye destê me, qismek ji dîwana wî, Mem û Zîn, Nûbehara Biçûkan û Eqîdeya Îmanê ye. (Adak, *b.n.,* r. 224-232)

[2260] **Şerefuddînê Beṭlîsî**: Şeref Xan. Kurê mîrê Bedlîsê ye. Bavê wî li dijî Osmaniyan şer kiriye û xwe spartiye dewleta Sefewiyan. Şerefxanê Bedlîsê jî di sala 1543ʿan de li bajarê Îranê, Qûmê hatiye dinê. Tevî kurê Şah Tehmasbê I. perwerdehiyeke baş ditiye, nêzî 20 salan li gelek bajaran walîtî kiriye. Di sala 1578ʿan de bi ʿeqrebayên xwe ve hatiye Wanê û piştre jî li Bedlîsê derbasî şûna bavê xwe bûye. Di derheqê dîroka Kurdan de kitêba xwe ya *Şerefname*yê di sala 1597ʿan de nivîsandiye. Di sala 1603ʿan de li wir çûye rihma Xwedê. (Sağniç, *b.n.,* 656-661)

Bi ʿilmê ketye tarîxan biray min

21.

ʿEbdurreḥman[2262] bi zanîna xu ya pur

Çêkir Rewdi`n-Neʿîm[2263] bo me biray min

22.

Melayê Sêrtî[2264] reḥma Barî[2265] lê be

Bi ʿilmê maye ṣaġ û ṣaġ biray min

23.

ʿElaeddînê Oxûnî[2266] bi ʿilmê

Bûye rehber û nivîsker biray min

24.

Jîna xweş merhema leş rehbera heş

Bi zanîn û evînê ye biray min

25.

Ji herdu ʿaleman ra ʿilm e îstûn[2267]

Ji wendan ra ew e rehber biray min

26.

Mêr û jin ferż e wan ra xastina ʿilm

Weha hatî ji peyġember biray min[2268]

27.

---

[2261] ʿ**Eliyyê Ḥerîrî**: Elî Herîrî. Ji ber ku beriya wî helbestekî tu kesî negihîştiye destê me, ʿEliyê Herîrî yekem helbestvanê Kurmanc tê hesibandin. Li gorî hin Kurdologan di salên navbera 1010 û 1078ʿan de li herêma Şemzînanê gundê Herîrê hatiye dinê. Dîwaneke wî heye. Ehmedê Xanî û Siyehpoş di helbestên xwe de behsa wî kirine. (Adak, *b.n.,* 181-186)

[2262] ʿ**Ebdurreḥman**: Şêx ʿEvdirrehmanê Axtepî. Di sala 1850'an de li gundê Axtepê hatiye dinê. Xwendina xwe ya ʿewil li cem bavê xwe Şêx Hesenê Nûranî girtiye û piştre çûye Başûrê Kurdistanê. Li wir xwendin û perwerdehiya xwe qetandiye. Paşê vegeriyaye gundê xwe û li wir li medresê ders daye. Di sala 1905'an de li Amedê wefat kiriye. Çar kitêbên wî hene ku ew; Rewdûn Neʿîm, Dîwana Rûhî, Kîtab-ûl Keşfîz Zelam û Kîtab-ûl Ebrîz in. (Sağniç, *b.n.,* r. 453-459.)

[2263] **Rewdi`n-Neʿîm**: Kitêba herî navdar a Şêx ʿEvdurehmanê Axtepî ye ku di sala 1884'an de bi Kurdî/Kurmancî û bi tarza manzûm nivîsandiye.

[2264] **Melayê Sêrtî**: Mele Xelîlê Sêrtî. Di sala 1750'an de li gundê Gulpika Hîzanê hatiye dinê. Yek ji wan navdartirîn ʿalimê mezin e ku ji medreseyên Kurdan derketiye. Di gelek medreseyan de xwendiye û li Amedê bal Mela Mehmûdê Behdînî îcazeta xwe hildaye. Piştre çûye Mûsûlê û li wir întîsabê şexê Qedîrî, Şêx Ehmedê Reşîdî bûye. Li Bedlîsê 5 salan ders daye û dû ra li Sêrtê niştecih bûye û di sala 1843ʿan de li wir çûye rihma Xwedê. Lewra Melayê Sêrtî dibêjin. Nêzî 25 kitêbê wî hene ku du hebê wan; Nehcuʿl Enam û Rîsaleya Tecwîdê bi Kurdî ye. Ji bilî wan helbestên wî jî hene. (Adak, *b.n.,* 295- 301.)

[2265] **Barî**: Yek ji navên Xwedê ye ku wateya vê; yê ku bi rêk û pêk û bi xweşikî diafirine.

[2266] ʿ**Elaeddînê Oxûnî**: Şêx ʿElaedînê Oxînî. Kurê Şêx Fetûllahê Werqanisî ye, di sala 1881/1882ʿan de li Norşînê hatiye dinê. Li medresa Şêxê Taxî (qs.) xwendiye, demeke kin ji Seʿîdê Norsî jî ders girtiye. Cara ʿewil li bal bavê xwe întîsabê terîqê kiriye, piştî wefata wî întîsabê Hizret (Şêx Muhemmed Dîyaûddîn) dike. Şêx ʿElaedîn di sala 1949ʿan de wefat dike. 9 kitêbên wî hene.

[2267] **Îstûn**: Sitûn, dîrek

[2268] Îşareta hedîsê dike: Fêrbûna ilmê li ser hemû misilmanan ferz e. (Îbnî Mace, Muqeddîme, 17)

Bixazin ʿilm*ê* gerçî biçne Çînê

Weha ye emr*ê* peyġember biray min[2269]

28.

Ji ezmanan p*ê*şî emrê “bixûn”[2270] hat

Ji rêzanê cihanê ra biray min

29.

Wekî xandin ji her tiştê ye pêş da

Çima cahil dimînî zir[2271] biray min

30.

Çiqas ʿumrê te borî tev nezanî

Mekey lawê xu, zana key biray min

31.

Şewitî boy x*a*lî bextê te dema

Neşewtîne tu zarokan biray min

32.

Cihanê da tu may bê luks û fanûs

Di tarîyê mehêl zaryan[2272] biray min

33.

Ji xeyrê carîye[2273] zarokê ṣaliḥ

Ṣelaḥ[2274] bê ʿilm li ku çê bit biray min

34.

Nezan kor e, kerr e, lal e, bela ye

Nenasit dur[2275] ji ber,[2276] ev kes biray min

35.

Îlahî! min reha key[2277] tu ji cehlê

Digel yar û heval û dost biray min

36.

Bela key tar*î*ya cehlê bi ʿilmê

---

[2269] Îşareta vê hedîsê dike: Ilm ger li Çînê be jî herin fêrbin. (Camiu‘s-Saxir 1/30)
[2270] Îşareta sûreyê ‘Eleqê dike. (bnr. ‘Eleq: 96/1)
[2271] **Zir**: Sade, xwerû
[2272] **Zaryan**: Zarokan
[2273] **Ji xeyrê carîye**: Ji xêncî (wan tiştan; zarokê salih û hwd. li ku xêr) tê, dirije, diherike.
[2274] **Ṣelaḥ**: Xweşî, çêyî, rihetî, hêsanî
[2275] **Dur**: Mirarî, mirwarî
[2276] **Ber**: Kevir
[2277] **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike

Bikey ronî reha min û biray min

37.

**Ḥezîn** im dilbirîn im çav tije xûn

Reha key min digel yar û biray min

**96.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Divêt wek sosinan nerm û ş*î*rînbêhn û x*û*[2278] bit insan

Wekî belgê gulan paqiş der û hundûr be her insan

2.

Xûyê qenc tev li zanîna bikêr dil ra divêt lewra

Bi ava zan*î*n û sosin*ê* xûyan tam dibit insan

3.

Bi wî baġê kulîlk û av nebit tê da çi ket bulbul

Weya kûp û kewarê ax*î*nê[2279] vala çi ket insan

4.

Bi zanîna bikêr û xûy*ê* qenc hêja ye her insan

Wegerne, wek k*û*pê vala tenê ax e bi can insan

5.

Eger xûyê xirab û cehl*ê*[2280] ra insan bibit avis

Wekî kûpê tije jar[2281] û ʿeraq û pîs*î* ye insan

6.

Dema derbit zimanê wî dirêjit gotinê berbad

Wekî kûpan dide der tişt*ê* tê da ye meger insan

7.

Bi der çendan li ser xu bit bi hundûr ger nebit paqiş

Wekî bonbak*î*[2282] qab zerîn ziyankar û şerr e insan

8.

---

[2278] **Xû**: Sinc, exlaq

[2279] **Kewarê axîn**: Kupê mezin, kupê ku hingivê tixine nav wê ku ji xweliyê tê çêkirin

[2280] **Cehl**: Nezanî, cahêlî

[2281] **Jar**: Jehr, jehrî

[2282] **Bonba**: Bombe

Çiqas dilgeş û nazik bit d*î*sa guh mede reng û rû

Bi dil dilber nebit insan bi reng û rû çi ye insan

9.

Wekî bûk bête xemlandin bi der dar e d*î*sa êzing[2283]

Nebit ruḥek*î* xêrxaz û bilind meqṣed çi ye insan

10.

Bi kok û rîçikan ber roj firîn beyhûde ye lewra

Eger cewher nebit tê da bi eṣlê xu çi ye insan

11.

Bilindqedr e gula nazik egerçî eṣl*ê* wê sinc[2284] e

Wehay nêrgiz*a* bêhnxweş xu bi kok pîvaz e ey insan

12.

Ji nêmê[2285] misk dibit peyda ji axê sosin û sunbul

Ji agir nûr dibit peyda ji çilka men*î*yê insan

13.

Ji ehlê beyt*ê* bû Selman*ê* Farisî[2286] welê Bû Cehl[2287]

Nîşana kufr*ê* danî ser Xudayê çêkerê insan

14.

Wuṣay kok û r*î*çikan ra n*î*ne ʿibret di vê rê da

"Fela ensabe beynehûm"[2288] bes e ʿibret ji bo insan

15.

Bi gor karan*ê*[2289] kêrhatî merovan ra dibit qîmet

Kesî nîne j*ê* ra ew kar di meʿnê da n*î*ne insan

16.

Ji ḥerfan û ji lefẓan[2290] ra dibit qîmet bi kûr meʿnan

---

[2283] **Êzing**: Darê hişk ê ku bona şewatê

[2284] **Sinc**: Stirîn, dirî

[2285] **Nêm**: ʿEdab, bezek, îltîhab

[2286] **Selmanê Farisî**: Yek ji wan namdartirîn sahabeyan e. Beriya ku misilmantiya xwe kole bûye, piştî ketina Îslamiyetê ji aliyê Hz. Pêxember hatiye azad kirin. Di şerê Hendekê de fikra hendek/kor kolandin ya wî bû. Nêzî 60 hedîs rîwayet kirine. Di serdema Hz. ʿOmer de bûye waliya bajarê Medayînê û di sala 655'an de li wir wefat kiriye.

[2287] **Bû Cehl**: Ebû Cehl. (bnr. 63/9)

[2288] Di navbeyna wan de neseb tune ye. Îşareta vê ayetê dike:

(فَإِذَا نُفِخَ فِي الصُّورِ فَلَا أَنسَابَ بَيْنَهُمْ يَوْمَئِذٍ وَلَا يَتَسَاءَلُونَ)

Dema di sûrê de were pifkirin, êdî wê rojê di nav wan de ne neseb feydê dide ne jî li hev dipirsin. (Mumînûn: 23/101)

[2289] **Karan**: Kar, ʿîş

[2290] **Lefẓ**: Gotin, peyv, bêje

Bi xûyê qenc û ḥissê qenc tenê insan dibit insan

17.

Eger meʿna nebit lefẓ û ḥurûf[2291] beyhûde çizgî[2292] ne

Wehay qencî nebit qalibekî beyhûde ye insan

18.

Gelo lêxistina zêran nebit ma dê çi bit sikke[2293]

Weya ew kar*ê* kêrhatî nebin ma dê çi bit insan

19.

Bes her meʿna bi gor azatîya[2294] fikrê dibit dilkeş

Çi ye meʿna di fikra az*a* da derbaz neke insan

20.

Welê azatîya fikrê bi gor dost û hevalan e

Bi hogir û hevalê pîs p*û*ç e fikra serê insan

21.

Gelo kakil*ê* hêja têtе derxistin ji gûza pûç

Çilo fikra xirab meʿnay*ê* şîrîn ẕewq dide insan

22.

Xudayê lemyezel[2295] kirye ji meʿnê ra fikir kanî

Eger paqiş nebit kanî çilo jê vedixût insan

23.

Egerçî nêr*î*na ʿeqlê ji meʿnê ra dibit kanî

Dirêjit mast*ê* meʿnayê di ʿeqlan da dilê insan

24.

Wuṣay kovik ji meʿnê ra dil e ʿeql her wekî meşk e

Qirêjîn bit eger kovik qirêj e mast j*î* ey insan

25.

Welê tê mast*ê* meʿnayê ji dost û hogir û çewran[2296]

Dirêjit kovika qelban bi destê dostan ey insan

26.

---

[2291] **Ḥurûf**: Pirjimariya "herf" e. Herf, tîp

[2292] **Çizgî**: Xêz

[2293] **Sikke**: Ew muhra hesinî ye ku li ser wê, navê şah/padişahekî dinivîsî. Her şahek li ser perê zêrên hingê, ji bo ku navê şah hebe, bi wê muhrê hesinî îşaretê datanîn. Sikke navê wê muhra hesinî bû.

[2294] **Azatî**: Aza, sexm, xurt, ne pûç

[2295] **Lemyezel**: Ew ê ku wenda nabe, her heye

[2296] **Çewran**: Pirjimariya "çewre" ye. Çewre, dorhêl, derûdor, çarhêl

Heval û hogir û çewre xirabxûy û qirêjîn bin
Heçî meʿna ji wanan tê qirêj û pîs e ey insan
27.
Divêt bo te hevalek pa*qiş* dil ṣade wekî neynik
Bi feyża suḥbeta wî da bibî kamil tu ey insan
28.
Kesî tev kijikê rabe r*û*nê nikil di gû da ye
Wuṣay dûr birreve ḥetta dikarî ji şerrê insan
29.
Hevalê xûxirab wêran dike mala dilan berxo
Tînin xar hêl*û*na qelban dijî li ser serê insan
30.
Digel naehl*ê* rûniştin ji qelban ra wekî ar[2297] e
Neke wêran **Ḥezîn** mala dilê te xûxirab insan

**97.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun
Remel − + − − / − + − − / − + −
1.
Pesn*ê* bê dawî Xudê ra bin ku Wî
Daye me Îslam û Quran û *î*man
2.
Em kirine pêç*û*yê peyġemberê
Ûmmeta wî çêtirînê ûmmetan
3.
Bar*a*na reḥm û emanê tim û tim
Bib*a*re ser serwerê axir zeman
4.
Ew nebîyyê ḥeq di nêv peyġemberan
Bon*a* teşrîfê bilind kir as*î*man
5.
Hem bibare ser heval û al*ê* wî

---
[2297] **Ar**: Agir

Wan muselmanî bela kir li cihan

6.

Bê xew û raḥet xebitîn şev û roj

Rê kirin bo dîn*ê* Eḥmed mal û can

7.

Qenc bizane wan ş*î*retan ey delal

Tên bi îlhamê ji qudsê ser dilan

8.

Ṣade ḥikmet in Xudê ew rihtine[2298]

Ji dilê tev nûr*ê* bengî[2299] ser ziman

9.

Beng*î*yê nûra cemala[2300] ḥeqq e ew

Gerç*î* bengîyê birra[2301] îro nema

10.

Dewr*a* payîzê, ne çaġ e boy gulan

Lêbelê dem dem dibînî tê gulan

11.

Di zivistanê ji bulbul nay*ê* deng

Neku wê danîne cinsê bulbulan

12.

Ref bi ref bulbul hene wê da welê

Nab*î*nin wê da p*î*vok û sosinan

13.

Kel n*a*yê dîzê dema germî nebit

Dil n*a*yê coşê b*ê* ʿeşqa hîvr*û*yan[2302]

14.

Dost*ê* ḥeq bin perdeya nûrê ne her

Neku nînin lewr*a* nayên ber ç*a*van

15.

Nûr b*û*ye perde ji dîtina ewan

---

2298 **Rihtin**: Rijandin, ro kirin

2299 **Bengî**: Evîndar, dildar

2300 **Cemal**: Rindî, bedewî, spehîtî

2301 **Bengîyê birra**: Evîndarên rastîn, ʿaşiqên heqîqî

2302 **Hîvrû**: Ew rûyên ku mînanî hîvê geş û rewnaq

Çaw*a* roj perde ye bo şevşev*o*kan[2303]

16.

ʿIlm û ḥikmetê dirije ev qelem

Ji xu ra van gotinan niʿmet bizan

17.

Pur mekey beḥsa p*î*rek û pesn*ê* wan

Peyv bikey areste[2304] dûr be`j tewşîyan

18.

Gerçî pîrek sirr e boy ʿiffet*ê* lê

Dûrketin boy te ç*ê*tir tê her ji wan

19.

Nabe wek Yûsif*ê* Mişrî her ẓulam

Wek Zelîxayê bizan giştê jinan

20.

Terk bikey rindan û hevalîy*a* wan

Boy bibî rind û bilind û serşivan

21.

Jin*a* rind û zev*î*ya ber gund d*a* xêr

Tu n*î*ne weha g*o*tîye baqilan

22.

Dûrkeve ji aletê lîstik*ê* xweş

Hem ji rû rûtê geşê nermê cuwan

23.

Roj*a* taştê tête girtin ger xuyab[2305]

Viz t*ê* şûr û tîr dema rû ket guzan

24.

Ger bipîvî wî li hîvê zêde tê

Ron*î*ya rûyê w*î* xortê wek f*î*dan

25.

Kûr binêre daw*î*ya rindîy*a* te

Hujmukarî[2306] ma dibînî her wusan

---

[2303] **Şevşevok**: Pêçermok, baçermok, çilîçilî

[2304] **Areste**: Fesîh, zelal, xweş

[2305] **Xuyab**: Xuya bibe

26.

Ma kȋjan gul e n*a*pirmile[2307] kȋjan

Cuw*a*n e pîr nabe bi borîna zeman

27.

Yan kȋjan rû ye ku naqûrmiçike

Pişt*î* pîrîya dixînit ber nigan

28.

Yan kȋjan por e sipî nabe tu car

Yan kȋjan pişt e ku nabe wek kevan

29.

Ḥeq bizane, ḥeq binase, ḥeq bixaz

Ḥeq bibêje, ḥeq bibîne her zeman

30.

Ger tu mêr î, nêz*î* ʿeraqê mebe

Çer dixaze dîn*î*yê xudyê heşan

31.

Her bitirse ji Xudê, tirsa Xudê

Çi dilê da hebe dibe`j gîşt*î*yan

32.

Ne j*é*hatî ye kesê rêbir tu car

Her j*é*hatî ê`j Xudê tirsok bizan

33.

Her bi şerʿa Muṣṭefa[2308] bawer bikey

Guh medê şev hêv*î*yê îstir*é*kan[2309]

34.

Qudreta ḥeq da hemî heş mane mat

Her w*î* rîya me bi me daye n*î*şan

35.

Tişt*ê* ḥeq teqdîr biket her ew dibit

Tişt*ê* ew jê ra bibêje: "kun fe kun"[2310]

---

[2306] **Hujmukarî**: Evîndarî
[2307] **Napirmile**: Naçilmise
[2308] **Muṣṭefa**: Hz. Pêxember Muhammed Mustefa (saw.)
[2309] **Îstirêk**: Stêrk
[2310] Dibêje bibe, dibe. Îşareta vê ayetê dike:

36.

Niv*î*sandîye mirin her tişt*î* ra

Pur civat kêm bûne, pur dewlet neman

37.

Pur beyaban[2311] bûne bajar, pur b*a*jar

Bûne yaban,[2312] pur seray bûne x*o*pan[2313]

38.

Kan*ê* Nemrûd kan*ê* Kenʿan kan*ê* ew

Qodemanê dan*î* û avête kan

39.

Li ku ne Firʿewn û ʿAd[2314] û ew kesê

Rakirin ehram[2315] û burcê Nînuwan[2316]

40.

Kan*ê* xudî ʿeql û zanîn û kemal

Kan*ê* qewmê pêş*î*n û mêrê beran[2317]

41.

Kan*ê* ew mêrê bi kilsê[2318] çêkirin

Tevd*a* mirin fayde neda qilʿetan[2319]

42.

Wê Xudê veger*î*ne her yek ji wan

Wê bide wanan cezayê kar*ê* wan

43.

Gedeyo! guh de evan şîret*ê* ku

Bûne para çêtirînê ûmmetan

44.

Her bixaz ʿilmê, ṭeral mebe çiqas

---

**(اِنَّمَا اَمْرُهُ اِذَا اَرَادَ شَيْئاً اَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ)**

Fermana Xwedê –dema ku ew tiştekî bixwaze- tenê ev e ku jê re bibêje “bibe”. Vêca ew jî di cih de dibe. (Yasîn: 36/82)

2311 **Beyaban**: Çol, çolistan

2312 **Yaban**: Çol, çolistan

2313 **Xopan**: Kavil, wêran, xirbe

2314 ʿ**Ad**: Ew kewma ku Hûd (as.) ji wan re wek pêxember hatibû şandin.

2315 **Ehram**: Goristanên mezin ên firʿewnên/şahên Misirê.

2316 **Nînuwa**: Nînowa. Li bajarê Mûsilê navê cihekî ye ku bi kela û burcên xwe ve namdar in. Herwiha Hz. Yunûs ji wan re wek pêxember hatibû şandin. (Pala, *b.n.,* 483.)

2317 **Mêrê beran**: Biwêjeke kurdî ye ku bi wateya; mêrê xurt û bihêz.

2318 **Kils**: Cis, kirêç

2319 **Qilʿet**: Kele, keleh

Dûr e xêr û bêr[2320] ji insanê nezan

45.

Pur bibe zana di dînê Eḥmedî

Neqete ji bon*a* zarok û jinan

46.

Bê xew û raḥet bixûn teḥṣîl*ê* key

Dery*a*ya ʿilmê d*a* noq be wek ḥ*û*tan[2321]

47.

Derx*î*ne ji durr û mercanan xu ra

Pê bigêje feyż û nûr û nisbetan

48.

Meb*ê*je borîye çaġa zan*î*nê

Kî biçe rê da digije wargehan

49.

Av ji boy hey hey dirijin û diçin

Tête rojek ew digijin dery*a*yan

50.

Ma k*î*jan hevraz*ê* ra dawî n*î*ne

Yan k*î*jan şev e dimîne her wusan

51.

Wek nezanînê şevek tarî n*î*ne

Bixebitî daw*î* tê lê bê guman

52.

Kuştina duşmen di pur zanîn*a* te`y

Her bi karê qenc e xemla zanînan

53.

Bixebite bilebite şev û roj

Hêl*a* beḥra ʿilm*ê* da biç wek çeman

54.

Gor*a* qanûna zimanan tu bipeyv

Tevlihev diket b*ê* qanûn gotinan

55.

---

[2320] **Bêr**: Bereket

[2321] **Ḥût**: Masiyên herî mezin, balîna

Her bi qanûnê qezîdan[2322] dilber e
Xoy nebit xarin kelî tê ser ziman
56.
Şiʿrê çêkey, lê reha min da here
Karê dunyayê nede qeṭ ber çavan
57.
Pê bixaze pesnê ḥeq berdana ḥeq
Ber bide qencîyê ne pesnê jinan
58.
Şiʿr nîşan e ji kemal û feżlê ra
Pur hêja ye dema nekev ber nigan
59.
Bernigîya şîʿrê wek were gotin
Bona pê malê dunê were civan
60.
Ehlê feżlê tev mirin borîn û çûn
Ġeyr ji bê navê bêbavan kes nema
61.
Kî îro şêx e kî aġa ye kî mîr
Rastî nîne navê wan têteʾj bavan
62.
Ger nebêjî şeyxo, mîro, aġawo
Dilê te mêze bikin wek duşminan
63.
Gotina min tevhevê wan ra nîne
Gotina min sexteyan ra ye ji wan
64.
Ramûsana dest tu carî naxazim
Ji kirin çi ye wî ra wek ramûsan
65.
Ger bide koletî ye, eger nede
Şermî ye, bêşek ji bona merovan

2322 **Qezîdan**: Axaftin, qisekirin

66.

Dest*ê* ehlê ʿilm û ʿedl û feżl*ê* her

Ram*û*sana wan xu ra qencî bizan

67.

Lewr*a* ava ye cihana me bi wan

Pur bizane qîmeta wan pêşuwan[2323]

68.

Tar*î* ye ʿalem nebe zanîn ç*a*wa

Şêl*û* ye jîna b*ê* ʿedla[2324] ʿadilan[2325]

69.

Di dinê da roj nebe nabe ḥeyat

Roj li jor nebe ḥeyat nabe d*î*san

70.

Milletê mezin nedêre[2326] daweran[2327]

Tev li zanan dikeve her ber nigan

71.

Gerçî bilind be ḥetta pê wer biçe

Têt*e* xarê daw*î*ya wî ye z*î*yan

72.

Wek "bigire" nîne şîrîntir qezî[2328]

Ṭal*ê* gotinan, bibêjî "hêv*î*yan"[2329]

73.

Merd bibe merdî bikey her kes*î* ra

Merd*î* kar e bon*a* mêrê pozberan

74.

Mulk*ê* Kisra[2330] neh*ê*jaye kerk*î* nan

Dil*a* beḥran bes t*ê* ava kan*î*yan

---

[2323] **Pêşuwa**: Pêşeng, serek, serok

[2324] ʿ**Edl**: Dad

[2325] ʿ**Adil**: Dadwer

[2326] **Nedêre**: Dernexîne

[2327] **Dawer**: Dadger

[2328] **Qezî**: Axaftin, xeberdan

[2329] Kesek biçe cem yekî jê tiştek bixwaze û ew kes jî heke bibêje keremke "bigire", ji wê xeberdanê şîrîntîr xeberdan nîn e. Lê tiştê ku jê tê xwestin, nedê û bibêje "hêviya min heye ku…" hingê ji wê gotinê tahltir tu gotin tune ye. (H.)

[2330] **Kisra**: Bi giştî navê şahên Îranê.

75.

Bide ber çavan “qesemna beynehum”[2331]

Dib*î*nî wê da hemî kûrê *sir*ran

76.

Ji xebatê nîne tiştê tête dest

Hem ji ṭeralîy*ê* nîne ḥewceman

77.

Pur xebatker mane mat rizqê xu da

Çaw*a* heşvan mane rê da bê gihan

78.

Lêbelê ṭeral û xêv[2332] çûne meqam

Saġ dimîne leng diçe xweş wargehan

79.

Teqs*î*mata ḥeq ezel da çêb*û*ye

Her bi gor wê rizq*ê* me tê bê guman

80.

Dev ji dunyay berde lewra ʿadet e

Wê r*a* rakirin û danîna kesan

81.

Jîn*a* dev berday*ê* dunyayê m*î*na

Jîn*a* dostê wî ye belkî ev bizan

82.

Pur merovê pur nezan tê zeng*î*n in

Pur *za*na tê per*î*şan û pur *ê*şan

83.

Pur j*ê*hatî nagijin jê meqṣedek

Lêbelê tirsok digijin meqṣedan

84.

Hêd*î* dunyay da biçe terk key ḥ*î*lan[2333]

Li dinê ḥîlekirin terkê bizan

---

[2331] Di navbeyna wan de par vekir. Îşareta vê ayetê dike:

(نَحْنُ قَسَمْنَا بَيْنَهُمْ مَعِيشَتَهُمْ فِي الْحَيٰوةِ الدُّنْيَا)

Di jiyana cîhanê de me rizqê wan di neqeba wan de pareve kiriye. (Zuxruf: 43/32)

[2332] **Xêv**: Xêvik, sefik, kêmaqil

[2333] **Ḥîlan**: Hîle, fêl, fend, dek

85.

Xud*ê* çawa daye te, tu jî bide

Li serê xu neh*ê*le ḥeqqê kesan

86.

Dest*ê* tiştê ḥeq d*a*ye wî ew nede

Xud*ê* bavêje *ser* wî derd û belan

87.

Nefire bi kok û çiqûlkan tu car

Cewhera zatî ye her eṣlê m*ê*ran

88.

Pur c*a*ran mezin dibe merov b*ê* bav

Biḥelînî zêr diqete`j xurdeyan

89.

J`ist*û*rîyan gul dibin çawa ku her

Ji p*î*vazan em diçînin nêrgizan

90.

Tê ji golika ġezalê misk*a* xweş

Çêdibe ji ax*a* ber nig jîn û can

91.

Qîmeta insan e qencîya w*î* her

Çi gelek û hin*dik* bike`j qenc*î*yan

92.

Veş*a*re zengîn*î* û neçarîyê

Ji ṭeralan dûr keve kar key peran

93.

Vî zemanî da divê heyî[2334] hebe

Ku selam her li mihane, ne`l r*û*yan[2335]

94.

Her xweş e bustan bi nêrgiz û gulan

Hêj*a* ye derya bi durr û mas*î*yan

95.

---

[2334] **Heyî**: Dewlemendî

[2335] **Rû**: Li vir ji "rû"yê mebest "rûmet û şeref" e. Ango di vê zemanê de divê dewlemendî hebe, lewra însan selama xwe ji bo rûmeta mirovan nade, ji bo zêdebûna hejmara pez û mihan ango dewlemendiya însên dide. (H.)

Bixebite biqefile[2336] dûr keve

Ji hevalîya xudî ʿeyb û xêvan

96.

Rek[2337] di nêv çikot*î*[2338] û îsraf*ê* hey

Herdu daîm bin dikujin merivan

97.

Xu nexe ʿeybdarîya qencê berê

Ew nelaîq in ji bo şemtandinan[2339]

98.

Paç bixe guhkê xu[2340] borînê ke qenc

Da bibî millet*ê* xu ra serm*î*yan[2341]

99.

Her kesî ra heye tim tim xêrnexaz

Ger bijî tenha li ser pozê ç*î*yan

100.

Dûr*ê* dernojan[2342] here terk key ewan

Tim nebaşî her dibare ser ewan

101.

Ẓulm*a* cîranê nebaş derbaz bikey

Ger nema ṣebra te çêtir tê revan

102.

Tim û tim bitirs ji zulma padişah

Pev[2343] meçe tev wî kesî bêje heman

103.

Ḥakimî te ra ne lazim e welew

Bix*a*zin ji te tu guh med lewmkeran[2344]

104.

Nîv*ê* insanan neyarê ḥakim in

---

2336 **Biqefile**: Biweste

2337 **Rek**: Rêkî, rêyekî

2338 **Çikot**: Tima, destgirtî, pintî

2339 **Şemtandin**: Şemitandin, şelifîn

2340 **Paç bixe guhkê xwe**: Biwêjekî kurdî ye ango; guhê xwe nedê

2341 **Sermiyan**: Serok, pêşûwa, pêşeng

2342 **Dernoj**: Ew kesê ku şerm û ʿeybên mirovan vedikolin û derdixin.

2343 **Pev**: Pê, dû

2344 **Lewmker**: Lomaker, ew kesî ku loma mirovan dike

Weqt*a* ʿadil be tu bihêl ẕaliman

105.

Ḥa*kim* her dûr e ji her leẕẕet*ê* xu

Herdu destê wî dix*î*nin zenc*î*ran

106.

Ji giranî û ji kêmîya heye

Lefẕ*ê*[2345] qaẑî[2346] da bigire ʿibretan

107.

Leẕẕeta ḥakim ne henber e tu car

Eẕyetê wî wê dema jê tê qetan

108.

Ḥukm û walitî welew xweş tên welê

Wek zehîr in ew di nêva hingivan

109.

Eẕyetê cahan[2347] weza kir[2348] cism*ê* min

Ji mudarata[2349] neehlan el-eman[2350]

110.

Kurt bikey hêvîy*ê* dunyay da hema

Heş r*a* nîşan kurtkirina hêv*î*yan

111.

Ew kesê mirin w*î* ġafil da divê

Ḥeqq e ew daim biket ah û fiġan

112.

Ser hevalan da *her*re pey hev *mer*re[2351]

Pur ç*û*yîn têne d*o*ra melûlîyan[2352]

113.

Roj zivistanê d*a* boy kî kêm xuyay

Tê ji hezkirin ne wek ya hav*î*nan

114.

---

2345 **Lefẕ**: Peyv, bêje
2346 **Qaẑî**: Dadger, qadî
2347 **Cah**: Meqam, paye
2348 **Weza kir**: Zeʿîf, jar û qels kir
2349 **Mudarat**: Birêvebirin, kargerandin
2350 **El-eman**: Hawar, alîkarî
2351 **Merre**: Were
2352 **Melûlî**: Kerb, keser

Guh mede reng û r*û*yan, rext û çekan

Cewherê insan bigire ber çavan

115.

Ker ker e, bê huner e dîsa welew

Bîn*î* dîwanê, l*ê* key kincê şehan

116.

Zan*a* hêja ye, welew qetabe çek[2353]

Çer dibe kêm, zêr bi kevnîya k*î*san[2354]

117.

Bi xizanîyê kemal kêm nabe qeṭ

Roj*a* ber avan d*a*ra nîne ziyan

118.

Gerçî ronî kêm e wê çaġê welê

Dîs*a* roj e sip*î* û geş tê cihan

119.

ʿAcizî ye, hezkirana ji welat

Dûr keve, rast tê ji ehlan[2355] bedelan[2356]

120.

Ew bi seknandin*ê* bêhn dide welê

Hîv bi gerrê tête tam ser ʿaleman

121.

Rovîyek gerra ç*ê*tir tête ji wî

Şêr*ê* seknandî li cem xudyê heşan

122.

Nêz bizane dûr eger te ra nebe

Jar*ê* wek hingiv bizan kar bide can

123.

Şevşevokê ra şeva tarî divê

Gerçî roj ronî ye bona ʿaleman

124.

Pîr*ê* bernig[2357] ra mirin zêr*ê* zer e

---

[2353] **Çek**: Kinc, cil, libas

[2354] **Kîs**: Ji bo pere, dirav û zêr xistinê torbê biçûk, kîsik, qewlik

[2355] **Ehl**: Eqrebe, nas û dost

[2356] **Bedel**: Li şûna wan

Gerçî jînê tim dixaze nû cuwan

125.

Neku her tiştê bedew tê ber dilek

Ew bedew tête li cem hemî dilan

126.

Leyl*a* dilber bû li cem Mecnûn welê

ʿAşiqek reş bû li cem şahê cihan

127.

Hatina Eḥmed p*î*rozî bû welê

Rûreşî bû ew li cem Bû Leheban[2358]

128.

Ew yedî beyḍak*î*[2359] Mûsa ra hebû

Kor*î*ya çavan b*û* bona Qar*û*nan

129.

Îbr*a*hîmê ku xelîl[2360] bû cem Xudê

Ṣade duşmen bû di qelbê Nemr*û*dan

130.

Ey **Ḥezîn** ḥikmet*a* ṣade bes birêj

Lewr*a* nankor in purê ehlê zeman

131.

Hezkirina vê dunê ko kirye heş

Birre nabe tu çiqas pê dî hesan[2361]

132.

Bes bibêje ḥikmetê ma dê çiket

Çir*a* bi koran û şîret bi dînan

133.

Lê çi kem ez îxtiyar çûye ji dest

Tev b*ê* ḥemdî tîne der ah û fiġan

134.

Bulbulê gul dît*î* çer kerḥes[2362] dibe

---

[2357] **Pîrê bernig**: Ew mirovên pîr û kal bûne û ketine ber nigan, nikarin xwe bi xwe xwedî bikin

[2358] **Bû Leheb**: Ebû Leheb. (bnr. 16/7)

[2359] **Yedî beyda**: Destê sipî. Ji hêla Xwedê ve ji Mûsa pêxember re hatiye dayîn. Hz. Mûsa bi destûra Xwedê destê xwe dixiste nav bin çengê xwe û derdixist, destê wî wekî rojê dibiriqî û diçilwilî.

[2360] **Xelîl**: Dost, heval û hogir. *Xelîlullah* navlêka Hz. Îbrahîm e ku tê wateya; dostê Xwedê.

[2361] **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û kêran tûj dikin, kevirê tûjkirinê

Ev di rê da çer dibirre ġulġulan

135.

Baqilê dîtî dema bibîne kûr

Hatiye ser lêv*a* kaş diket eman

136.

Bo xelaṣîya w*î* korê bê temîz

Ev e can û ḥikmeta van gotinan

137.

Ez dizanim dîk*ê* bang de bê zeman

Ser*ê* wî tê jê kirin dest da heman

138.

Gerçî vê bangê r*a* ev dem nîne çaġ

Lê b*û*me qurban ji bo xelqê nezan

139.

Xud*ê*yo iḥsan bikey, inʿam[2363] bikey

Belkî ev şîret*a*, şîn be`l hindikan

140.

Av*a* ḥeyatê dizê ji lefẓ*ê*[2364] wan

Her wekî jarê[2365] dikujin duşmenan

141.

Ey merovê gotinêm[2366] ʿeybdar dikey

Mêş*a* rêxê ra *ê*ş e bêhna gulan

142.

Bizvire ji henberîya şiʿr*ê* min

Da bi ahê min te nedin ber t*î*ran

143.

Nermîya mêran nexapîne te ha![2367]

Nermîya maran heye jê tê revan[2368]

144.

---

[2362] **Kerḥes**: Bêdeng, deng jê dernayê
[2363] **Inʿam**: Nîmet
[2364] **Lefẓ**: Gotin, peyv, bêje
[2365] **Jar**: Jehr, jarî
[2366] **Gotinem**: Gotinê min
[2367] **Ha**: Daçeka hişyarkirinê ye.
[2368] **Revan**: Revîn, jê dûrketin

Her wekî avê diçim xar û xweş im

Av dema germ bit dikuje dide jan

145.

Çer bixazî wer d*ê* fetlinî[2369] welê

Wek ḥezîran im z*û* nayêmê şikan

146.

Çi bikim mame zemanek wer d*a* ez

Kî xudîmal be ew e aġa û xan

147.

Her divê her kes w*î* ra ḥurmet bike

Ku mirovê ḥalsivik ra nîne şan

148.

Tevhevê insan*ê* çaġê cahil e

Ez ji wan im berde dev ji meʿn*a* wan

149.

Beḥrekî bêbin e ev meʿna h*ê*lû-

na, civînî[2370] ji binê wê cewheran

150.

Ji v*ê* seydatî[2371] û suxtetîy*ê*[2372] ra

Xiḍr û Mûsa her divêtin bê guman

151.

Lew me kurt kirîye şerḥa Lamiya[2373]

Îbnî Werdî[2374] da nede melûliyan[2375]

152.

Ev j*î* wek eṣlê xu şîrîn û ş*î*n e

Dilreva ye xweşeda ye bê guman

153.

---

[2369] **Fetlinî**: Fetilandin, zivirandin

[2370] **Civînî**: Bicivînî, berhev bikî

[2371] **Seyda**: Mamoste, fêrmend

[2372] **Suxte**: Feqî, xwendekar, şagirt

[2373] **Lamiya**: Helbestekî Îbnî Werdî ye. Ji ber ku qafiyeya wê bi tipa " ل : lam"ê hatiye çêkirin, navê wê helbestê jî wisa danîne. (Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Selami Bakırcı, "İbnü'l-Verdî'nin Nasîhatü'l-İhvan Adlı Kasidesi Ve Çevirisi", *Turkish Studies*, Volume 8/13 Ankara 2013, p. 13-20.)

[2374] **Îbn-î Werdî**: Yek ji wan namdartirîn şaʿîrên ʿEreban e. Di sala 749ʿan de wefat kiriye. Qesîdeya wî ya Nasîhetu'l-Îhvan (Ji hevalan re çend nesîhet) gelek namdar e.

[2375] **Melûlî**: ʿAcizî, şeqizî

Ger bibînî wê d*a* kêmîyek bizan

Ew ji ḥalê min û kurtîya zeman

154.

Lewr*a* şevek ji şevê payîz*a* kurt

Dem*a* çêkir gerdena van cewheran

155.

Di s*a*la ḥezar û çar ṣed û *dud*yê[2376]

Hicr*ê* da me tercume kirye bizan

156.

Hêlekê beṭlandin û tedrîs[2377] hebû

Hêlekê nexweş*î* bend kirib*û* can

157.

Ez gelek pîroz û dilxweş im ji bext

Ger ji wê nefʿê[2378] bibînin xandevan

158.

Bar*a*na reḥm û emanê birrije

Ser Resûlê çêtirînê çêb*û*yan

159.

Hem li ser alê delalê Muṣṭefa

Hem li ser heval û qencê borîyan

160.

Ḥett*a* ser belgê gulan da, ket xunav

Ḥett*a* ba raxîne ser hev çimenan

161.

Ḥett*a* bulbul wîlw*î*lê kin boy gulan

Ḥett*a* dostê ḥeq birêjit hêstiran

162.

Tu kerîm[2379] î, Tu reḥîm[2380] î, Tu ʿelîm[2381]

Tu dizanî çi ye derman çi ye jan

---

2376 Hezîn vê helbestê hîcrî di sala 1402’an (m. 1982) de , wek şerha qesîda Lamiyê nivîsiye.

2377 **Tedrîs**: Perwerde kirin, ders dayîn

2378 **Nef**ʿ: Menfaʿet, havil, sûd

2379 **Kerîm**: Ew ê ku camêrî, merdî û kerema wî pir e û bêpirsîn dide.

2380 **Reḥîm**: Ew ê kul i axretê li bawermendan tê rehmê, li wan dibûre, wan dibe cihê xweşî nimetan.

2381 ʿ**Elîm**: Ew ê ku zana û pispor e, zanîna wî dor li her berçav û veşareyan, raz û eşkereyan, mumkin û nemumkinan, ʿalema jorîn û jêrîn, dema borî, dema têdeyî û dema bê girtiye û tiştek li ber wî veşartî û nehan namîne.

**98.**

faʿilun/ faʿilun/ faʿilun/ faʿilun

Mutedarik – + –/– + –/– + –/– + –

1.

Ey cuwanan *ê* Îslam*ê* ca tevgerin!

Çû welat û ç*û* dîn bo me ḥeq bû mirin

2.

Bon*a* Quran û Îslam û şerʿa Resûl

Rê bikin mal û can, cennetê bikirin

3.

Musluman xort*ê* qenc nîne boy te mirin

Riy*a* dîn da mirina te ye jîn kirin

4.

Ẓen mekey kuşt*î*yê rîy*a* ḥeq da mirî

Ew li cem Rebb*ê* xu xweş e tê rizq kirin

5.

Bixebit bilebit bon*a* dîn û dunê

Çûk bi yek çengekê[2382] tu c*a*rî nafirin

6.

Zêr û zor ger nebin dîn û dewlet diçin

Heb*û*na me diçe dîn û dewlet herin

7.

ʿEwʿewa kûçikan li welatê we tê

Hûn bi rastî ş*î*rîn deng*ê* wan bibirin

8.

Gujgujîn wek hilo[2383] ser b*û*mê[2384] duşmenan

Hev d*a*xin hêl*û*nan kok*ê* wan bibirin

9.

Ger nebit ax*a* Îslam*ê* paqiş ji wan

Tariy û şêl*û* ye ew j*î*na tê kirin

---

[2382] **Çeng**: Per, bask
[2383] **Hilo**: Eylo, qertel
[2384] **Bûm**: Kund

10.

Ma *ḥeq*q e tu hebî xort*ê* dil tev *î*man

Şer῾*a* Eḥmed were îr*o* pê qirf kirin[2385]

11.

Nêz bibin, dest bidin hev ji bo dîn*ê* xu

Van neyarê ġedar dîn ji bin rakirin

12.

Qiştina qijikan bêreḥet kirne em

Hûn quling in birra ser me da vegerin

13.

Vegerin ser me da xweş bixûnin bilez

Deng*ê* wan qijikan guhk*ê* me ker kirin

14.

Duşmenê dîn û millet*ê* me ne qijik

Wan welatê ş*î*rîn bin d*a* wêran kirin

15.

Bixunin, bixunin, bixunin xort*ê* qenc

Hûn quling in bi deng boy me berjêr werin

16.

Ellah! Ellah! bibêjin êrîş kin li wan

Bi cesaret herin ew hemî laxxur[2386] in

17.

Bi helanek[2387] ji tirsan dibin tar û mar

Ew ji şe῾nan[2388] d*û*r in, bon*a* lax[2389] digerin

18.

Lax*ê* madê[2390] li ku dîn[2391] li ser dat*î*nin

Xançeha[2392] me῾n*ê* dîn, ji hema dûr terin[2393]

19.

---

[2385] **Qirf kirin**: Tinaz kirin, henek kirin
[2386] **Laxxur**: Mirarxwar, kelaxxur, leşxwer, beratexwer, ewê ku miraran dixwe
[2387] **Helan**: Meydan xwestin, li meydanê qîr kirin, gefandin, tehdît kirin
[2388] **Şe῾n**: Hal, rewş
[2389] **Lax**: Mirdar, kelax, berate, termê heywanê mirî
[2390] **Laxê madê**: Berateya maddeyê, mirdara maddeyê
[2391] **Dîn**: Dibînin
[2392] **Xançeha**: Sifrê nan xwarinê ye ku piçek ji ‘erdê bilind e û girover e
[2393] **Dûr terin**: Dûr dikevin, dûr diçin

Bon*a* dînê mubîn[2394] cehd*ê* tim ket[2395] **Ḥezîn**

Ḥett*a* ku nekeve qirika wî xirin[2396]

**99.[2397]**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

P*a*yîza paş*î*n e îro

Dilê min ġemg*î*n e îro

Li min ḥuzn û ş*î*n e îro

Gelî dost û gelî yaran!

2.

Li daran tev pelan zer kir

Dil û kezeb li min ker kir

Ji dostan, dost û yar dûr kir

Gelî dost û gelî yaran!

3.

Ji zozanan quling çûne

Gul û bilbil tine bûne

Warê vala me ra şûn e

Gelî dost û gelî yaran!

4.

Tenê mame di şeḥrayê

Weka Mecnûn*ê* Leylayê

Şev û rojan me xew nayê

Gelî dost û gelî yaran!

5.

Heval çûn menzilê canan

Gihîştin xan*î* û xanan

Tenê mame li şûn konan

---

[2394] **Mubîn**: Eşkere, zelal

[2395] **Cehdê ket**: Xebatê bike, bişuxile

[2396] **Xirin**: Dema meriv dimire dengê ku jê derdikeve, xirexir

[2397] Ev helbest cara yekem di hejmara 14. a kovara Nûpeldayê de hatiye weşandin. bnr. Emin Agahdar, "Çîroka Helbesta Payîza Paşîn a Melayê Hezîn", Nûpelda,Wan 2013, j. 14., r. 39-41.

Gelî dost û gelî yaran!

6.

Tenê mame li van waran

Dibarin hês*tir* wek baran

Hevalê kevir û daran

Gelî dost û gelî yaran!

7.

Çima pirsê li me nakin

Şûna bavan ava nakin

Çavên tim şil zuha nakin

Gelî dost û gelî yaran!

8.

Bihara ʿumr*ê* qenc borî

Bi axîn û ġem û dûrî

Ne Behram e ne jî gûrî[2398]

Gelî dost û gelî yaran!

9.

Dunê xweş tê ji mêran ra

Ku ava kin ji xêran ra

Xu hazir kin ji bêran ra

Gelî dost û gelî yaran!

10.

Dunê ne dostekî rast e

Emîn[2399] tê da neraweste

Diçin jê pale û hoste

Gelî dost û gelî yaran

11.

Gelek bajar*î* û gundî

ʿEreb, rom û ʿecem, kurdî

Elemdar in bi vî derdî

Gelî dost û gelî yaran!

---

[2398] **Behram û gûrî**: Navê şahekî Îranê ye. Behram nêçîra gûran (kerên çolê/zebra) gelek hezdikir û gelek caran li pey gûran diçû. Dîsa rojekê li pey gûrekî diçe êdî qet venagere. Li her derî digerin lê ne gûrî dibînin ne jî Behram. (Pala, *b.n.,* r. 63.)

[2399] **Emîn:** Wêra, wêrek

12.
Gelek hatin gelek çûne
Gelek mirin gelek bûne
Belê dunya ne tu şûn e
Gelî dost û gelî yaran!
13.
Di nava sar û sermayê
Neçar mame li ber bayê
Hewar dikem hewar nayê
Gelî dost û gelî yaran!
14.
Her roj koç e *her* roj bar e
Demek germ e demek sar e
Karek rast e k*a*rek xar e
Gelî dost û gelî yaran!
15.
Di vê çolê tenê mame
Me ne mam e ne kurmam e
Li benda pirs*a* we mame
Gelî dost û gelî yaran!
16.
Di vê çola xip û xalî
Namînî tim bi vî ḥalî
Îro xort î şibê kal î
Gelî dost û gelî yaran!
17.
Behar e qad xemilî hey
Gula nazik ʿedilî hey
Çikem payîz nahêle hey
Gelî dost û gelî yaran!
18.
Bi hev ra bin, bi hev ra bin
Ji vê xewa ş*î*rîn rabin
Birîn kûr in dewa nabin

Gelî dost û gelî yaran!

19.

Birîn kûr in, birîn kûr in

Ji tedbîran çiman dûr in

Mîna hûn nab*î*nin kor in

Gelî dost û gelî yaran!

20.

Li xu pirsê n*a*kin carek

We da teʾs̱îr n*a*ke karek

Nemaye we cih û warek

Gelî dost û gelî yaran!

21.

Gelek heval me dîtin çûn

Gelek bostan û baġ hişk bûn

Gelek xortê xweşik pîr bûn

Gelî dost û gelî yaran!

22.

Çi kes heye di dunyayê

Mîna kereng*ê* ber bayê

Ji cî rabe p*a*ra nayê[2400]

Gelî dost û gelî yaran!

23.

Rabûn rast e t*ê* şik nîne

Xu ra tedbîr*ê* bistîne

Eva jîna n*a*domîne

Gelî dost û gelî yaran!

24.

Mê çêkir xanîyek hêja

Li ber ava newalê da

Bi pêlkî hev d*a*ket binda

Gelî dost û gelî yaran!

25.

---

[2400] **Para nayê**: Venagere, nazivire

Dunê ne şênî ye û war e
Demek germ e demek sar e
Ḥeyata wî giranbar e
Gelî dost û gelî yaran
26.
Kanê şahên cihanê da
Hemî wanê di gorê da
Nayê tu kes hewarê da
Gelî dost û gelî yaran!
27.
Ġezala berya Şengal im
Ji birr dûr im ku dikalim
Ġerîb û jar û bêḥal im
Gelî dost û gelî yaran!
28.
Bi hev ra baş û kêfxweş bin
Bi hev ra rûnên û rabin
Bi hev ra wek bira`w bav bin
Gelî dost û gelî yaran!
29.
Ji bêşigê heyan gorê
Hemî kes ketine dorê
Hîşar nabe kurê ḥorê
Gelî dost û gelî yaran!
30.
Bi xandin û bi zanîn bin
Bi hevgirtin û karîn bin
Bi hev ra qenc û narîn bin
Gelî dost û gelî yaran!
31.
**Ḥezîn** im çav tijî xûn im
Bi axîn û bi gîrîn im
Hewarê bal we ve tînim
Gelî dost û gelî yaran!

**100.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

ʿAşiq û feṣla[2401] beharê sosin û gul tê hene

Der çimengah û gulistan[2402] ref bi ref bulbul hene

2.

Gul û sosin vedibin boy xweş bibin mecla cemal[2403]

Lew dilê bulbul*ê* jar da ṣed birînê kûr hene

3.

Gaz[2404] û deştê nûbeharê şîn û kesk û ṣor dibin

Lewr*a* her nimz û bilindî da hezaran ṭeyr hene

4.

Dilberê pur rind*ê* ser xu kêf bi gulzaran dikin

Lew temaşeya cemalê bir bi bir sir tê hene

5.

“Kulle yewmî huwe fî şeʾnîn”[2405] çimen da bû xuya

Lew bi her rengî kulîlk û sosin û gul tê hene

6.

Der beharê hêstirê ʿewr û çeman têtin mudam

Lew di qelbê wan d*a* eşwaqê cemalê[2406] pur hene

7.

Baġ û bustan, mêrg û çimen da cemala ḥeq heye

Lew çiqûlk û belg û hîvrûyê xeraman[2407] tê hene

8.

Goyîna jar ser zinar û dar û gaz nalîn diket

Lew birîn û pêt*ê* ʿeşqê zav[2408] dilê wê da hene

9.

---

[2401] **Fesl**: Demsal, mewsîm
[2402] **Der çimengah û gulistan**: Di cihê çîmen û bostanê gulan de
[2403] **Mecla cemal**: Ew cihê ku rindahiya Xwedê lê diyar dibe, cihê ku bedewiya Xwedê lê zahir dibe.
[2404] **Gaz**: Çiyayê bêdar
[2405] Xwedê Teʿala her roj di halekî de ye. (Rehman: 55/29) (bnr. 79/3)
[2406] **Eşwaqê cemalê**: Hezkirina rindahiya Xwedê
[2407] **Xeram**: Hejandin
[2408] **Zav**: Zehf, pir

Nûbehar e bûye behr[2409] her tiştî ra sosin û gul

Lew hejîn û xûşîn û şahî û wîlwîl pur hene

10.

Heyheya reqs û semaya[2410] av û daran çû sema[2411]

Lewra elţaf[2412] û fuyûḍat[2413] pur beharê da hene

11.

Kullu ehli`l ʿişqi fazû bi`l muradî[2414] bil ji min

Lew dilê min da hezar îşkenc û ahînî hene

12.

Kullu hem qed exeẕe`l came wela came lena[2415]

Ey heval hêvî bikin boy wî **Ḥezînê** pur gune

13.

Kulluhum qed exeẕe`l feyḍe wela feyḍe lena[2416]

Hey hewar ʿewrê beharê em li hêvîya we ne

**101.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Hewar û ṣed hewar îro ji yarê dûr tenê mame

Di nêva ehlê ʿişqê da ji dilber dûr tenê mame

2.

Her roj derdê qetanê[2417] agirek nû hildike dil da

Mîna perwanê[2418] nêv pêtê evînê da tenê mame

3.

Hevalan bar kirin borîn û çûn ser menzilên yaran

Reben û rênenas û mat[2419] di çolê da tenê mame

---

2409 **Behr**: Par, pişk, beş
2410 **Sema**: Reqs, govend
2411 **Sema**: Asîman, ezman
2412 **Elţaf**: Lutf, qencî, çêyî, îhsan
2413 **Fuyûḍat**: Feyz û bereket
2414 Hemî ehlê ʻişqê gîhîştin miraza xwe.
2415 Her kes piyaleya hezkirinê girtiye lê ji min re tune ye.
2416 Hemiyan feyzê girtine lê feyz ji min re tune ye.
2417 **Qetan**: Cudayî, veqetan, dûrketin, fîrqet
2418 **Perwane**: Pirpirok, minminîk, baperik
2419 **Mat**: Heyirî mayîn, ʻecêb mayîn, şaş mayîn

4.

Belengaz û neçar û dilkul û mest û xerab ya Reb

Ġerîb û rênenas û mat di vê rê da tenê mame

5.

Me ne war e ne dîyar e, me ne dost û ne heval e

Me ne zad[2420] e ne hewar e, ġerîbê rê tenê mame

6.

Ji ber arê qetanê[2421] hey ji dil nalan[2422] û gîran[2423] im

Wekî bulbul ji gul ya Reb! ġerîb û dûr tenê mame

7.

Behar e waye dilber tev hevalan diçne gerranê

Ji vê şahî û geşta[2424] xweş dilo, meḥrûm tenê mame

8.

Ji baġê nûbeharê her kesek girtî gulek geş lê

Wekî goyînê[2425] jar û bê murad îro tenê mame

9.

Bes e dilber mekey xeşmê, meṣoje[2426] dil bi hicranê[2427]

Di atûna[2428] evînê da wekî buryan tenê mame

10.

Ḥeyata min seraser lew bi ah û wah û efġan[2429] e

Bi can û dil di nêva pêtîyan ya Reb tenê mame

11.

Şev û rojan bi nalîn û bi ahîn û bi gîrîn im

Ku dûrê dilber û dîdara[2430] yarê ez tenê mame

12.

Bi pencê şahînê ʿişqê dilê min pare bû cana![2431]

---

[2420] **Zad**: Xwarin
[2421] **Arê qetanê**: Agirê cudabûnê, şewata dûrketinê
[2422] **Nalan**: Ew kesê ku dinale, digîrî
[2423] **Gîran**: Di halê gîrînê de bûyîn
[2424] **Geşt**: Seyran, ger
[2425] **Goyîn**: Tivilk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye.
[2426] **Meṣoje**: Nesoje, neşewitîne
[2427] **Hicran**: Cudabûn, fîrqet, êş û derdê cudabûnê
[2428] **Atûn**: Ocax, argûn, firin
[2429] **Efġan**: Fîxan, nalîn, zarezar
[2430] **Dîdar**: Rû, sîma; nêrîn, awir
[2431] **Cana**: Ey can. Li vir bangê yarê dike.

Wekî bulbul *î*ro bê dil di ʿalem da tenê mame

13.

Hemî dost û heval îro bi nazê dilberan mest in

Welê bê weşl*a*[2432] hîvrûyan **Ḥezîn** îro tenê mame

14.

Heval û hogirê ṣadiq ji yarê hêv*î* kin carek

Ku wek bulbul ji weṣla gul d*û*r û bê dil tenê mame

**102.**

mefʿûlu / mefaʿîlu / mefaʿîlu / feʿûlun

Hezec − − + / + − − + / + − − + / + − −

1.

Yabanek*î*[2433] têk dizz e, dilo xew d*a* nemîne

Kerwan*ê* hewaran h*ê*l*a* dostê ve bişîne

2.

Tîbûn û ġem û germ û q*û*m û pûk[2434] heye tê da

Tu car*î* kesan jê *xêr* û raḥet ned*î*tine

3.

Hin mirine, hin wa ne di ber can d*a*, hinê dî

Jîna *wan* hemî derd û ġem û gî*rîn* û şîn e

4.

Çavê xu vekey bixebite bê *xew* û raḥet

Bal war*geh* û kerwan*ê* hevalan bilezîne

5.

Wenda kirîye vê ç*o*l*a* wey bav[2435] bi hezaran

Hîna te heye keys xu r*a* çarek*î* bibîne

6.

Halê te perîşan e mirin hatîye ber nig

Hîna te heye can xu bi yarê bigihîne

7.

Yaban*a* ġem û êş û kul û derd*a*n e dunya

---

[2432] **Weşl**: Gihîştîn, gihandin

[2433] **Yaban**: Çol, çolistan

[2434] **Pûk**: Bahoz, bager

[2435] **Wey bav**: Wey Bavo! Baneşanekî kurdî ye û rewşa ʻecêbmayîn û heyirînê diyar dike.

Kesra xweşîy û ra*ḥet* û şahî t*ê* d*a* nîne

8.

Bêşîg*ê*[2436] bigir ḥett*a* bi gor em di r*ê* da ne

Rêwîy*ê* reben şah*î* û kêfê ji ku tîne

9.

Insan ji welatê xu y*ê* dûr hatîye şandin

Boy durr*ê*[2437] *î*man û gul*ê* xêran bicivîne

10.

Insan*ê* hebit wî r*a* *î*man û *xêr* û çêyî

ʿEnya w*î* p*a*s e, kêf li cih e, xweş*dil* û jîn e

11.

Lê ġafil*ê* xew da nekirit bon*a* xu karek

Weqta vegerê rûreş e, bê ḥed bi g*î*rîn e

12.

Ṣed ah û keser! ʿumrê hêja borî û çû

Çav û ḥeqq*ê* te`y hêstir*ê* xûnê bib*a*rîne

13.

Wan çaġ*ê* delal da me nekir boy xu tu karek

Dest û ḥeqq*ê* te`y ax*ê* li ser min birijîne

14.

Nêçîr*a* me hat wel*ê* feṣala[2438] me ji dest çû

Dost û ḥeqq*ê* te`y ṭeʿne û qirfan[2439] li me xîne

15.

Nêv baġ*ê* gulan da, me negirt gul bor*î* mewsim

Dilo ḥeqq*ê* te`y her weku bulbul bi *wîl*lîn e

16.

Ah roj*ê* cuwanîy*ê* ji dest me *tim* û tim çûn

Ruḥ û ḥeqq*ê* te`y me weku daran bi hejîn e

17.

Ya Reb! me h*ê*vî hatîye birrîn ji binî ve

Bal dunyay*ê* ve carê dî tu me vegerîne

---

[2436] **Bêşîg**: Landik, dergûş

[2437] **Dur**: Mirarî, mirwarî

[2438] **Feṣal**: Fersend

[2439] **Teʿne û qirf**: Tinazî, henek

18.

Da em ji te ra xidmet*ê* kin bê *xew* û raḥet

Da em bin*a*sin ḥeqq*ê* zemîn[2440] qedr*ê* c*î*rên[2441] e

19.

Îro ji me ra bûye xuya her tu mefa[2442] yî

Bil te hem*î* tiştê d*î* m*î*na xew d*a* me dîne[2443]

20.

Baranek*î* reḥmê bikey iḥsan ji me ra yar

Ser curm[2444] û gunehan qelema ʿefw*ê* kişîne

21.

Havîn*a* dunê da bixebit her weku gêlan[2445]

Rizqê xu h*î*na natye zivistan bicivîne

22.

Qencîy*ê* bikey emr*ê* Xudê ra bibe sernerm

Tev rast*ê* *bir*ra[2446] be *dil* ji wanan neqetîne

23.

Bil rah*ê*[2447] Xudê rah*ê* d*î*, têk dirr*î* û mar in

Bil dost*ê* Xudê dost*ê* d*î*, têk beyh*û*de bîne[2448]

24.

Ê qenc*î*y*ê* ket[2449] qenc*î* t*ê* pêşîy*a* w*î* lewra

Rencber çi b*a*vêje zev*î*yê wî j*ê* *hil*tîne

25.

Ê pîs*î*y*ê* ket pîs*î* t*ê* pêşîy*a* w*î* lewra

Xuday*ê* kerîm[2450] gor k*a*r*ê* qûl[2451] ḥ*alan* dişîne

26.

Dunyay*ê* nexap dostek*î* bêbext e biray min

---

2440 **Zemîn**: Zeman, dem
2441 **Cîrên**: Cînar, cîran
2442 **Mefa**: Menfa‘et, havil, sûd
2443 **Dîne**: Dîtine
2444 **Curm**: Guneh
2445 **Gêl**: Gêle, gêrik, morî, mûrî
2446 **Birra**: Heqîqî, rastîn
2447 **Rah**: Rê
2448 **Bîne**: Bibîne
2449 **Ket**: Biket, bike
2450 **Kerîm**: Ew ê ku camêrî, merdî û kerema wî pir e û bêpirsîn dide.
2451 **Qûl**: ‘Evd, bende

Çendan bi ken û kêf e te ra sip*î* û şîn e[2452]

27.

Her şah*î*y*ê* wê tev li ş*î*nê bûye hevîr

Ser jar*a*[2453] cefan[2454] toz*a* şefayan[2455] direşîne

28.

Ger baqil û hîşar û *î*mandar *î* **Ḥezîn**

Bil rah*ê* Xudê dest ji *her* tiştî bikişîne

**103.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + – –

1.

Dil birîndar e bi ʿişqê, dîtina yarê şifa ye

Jan*a* wî janek giran e, şuḥbeta pîran dewa ye

2.

Jîn*a* me yekser ḥezîn[2456] e, qelb*ê* me têk da birîn e

Kar*ê* me her dem g*î*rîn e, lew ji can dil bû cuda ye

3.

Dil ji dafa[2457] can*ê* axîn,[2458] fird*a* çû bal baġ*ê* nûrîn

Boy kulîlk û av*ê* şîrîn, terk*a* dunyayê w*î* daye

4.

Çer dijîn ew can*ê* bê dil, çer dibit bê av*ê* sunbul

Gaz*ê*[2459] derdan daye ser mil, lew bi şîn û jan û wa ye

5.

Can diket bê ḥed g*î*rînê, dixe xar hêstir*ê* xûnê

Dest dilê meqṣed bilind da, wek kereng ber bay*ê* da ye

6.

Can ji kok ve dihejînit, ser ji ser wî diqetînit

Ar[2460] bi mala wî dixînit, ew dilê ʿişqê lê daye

---

[2452] **Sipî û şîn**: Dema ku rengê sipî û şîn têkilî hev dibin rengekî xweş derdike holê. Mebest jê; xweşî ye

[2453] **Jar**: Jehr, jehrî

[2454] **Cefa**: Tade, renc

[2455] **Şefa**: Xweşî, çêyî, dilfirehî

[2456] **Ḥezîn**: Bixem, biderd, bijan

[2457] **Daf**: Dafik, telik, kemîn, xepik

[2458] **Canê axîn**: Laşê mirov ku ji axê hatiye afirandin, bedena însan

[2459] **Gaz**: Çiyayê bêdar

7.

Ṣed hezaran daf*ê* danan,[2461] dil nikarin qeyd bikin

Lewr*a* ber çavan ji canan, ron*î*ya yarê xuya ye

8.

Rindîya yara berîn e, qeyd û bendan diqetîne

Ji dunê dil dûr dixîne, qan*û*na ʿişqê weha ye

9.

Ġud*û*dek[2462] ʿişqê giha kê, ji dunê destan dişo

Ḥusn*a* yar e bê beha ye, ʿişq bi jan û dilreva ye

10.

Kî ku gîştê nûr*a* ʿişqê, ew dibit wek xeṭṭ*ê* meşqê[2463]

Pur perîşan ḥal e lewrê, ʿişq*ê* derdek bê dewa ye

11.

Baz*ê* ḥusnê ser kirî ser çûk*a* dil[2464] girt û bilind bir

Baġirê[2465] ʿişqê d*a* wer kir rah*ê* ʿişqê pur cefa ye

12.

Dil dikoje çîk*a* ʿişqê, dil diṣoje çîk*ê* ʿişqê

Dil birîndar e bi ʿişqê, lewr*a* bengî tim weza[2466] ye

13.

Can dibit ax û x*a*lî lê, dil d*î*sa bengîy*ê* Leylê

Mubtelayê işq û meylê, qelb*ê* bengîḥal[2467] fena ye

14.

Pehnîya dunyay*ê* ṭeng tê, weku zindan û xepeng[2468] tê

Dil r*a* sosin wek xedeng[2469] tê, derd*ê* wî ẕatê Xuda ye

15.

Ger ji dil yar bibe razî, nêv*a* agir da bi tazî

---

[2460] **Ar**: Agir

[2461] **Dafê danan**: Ew daf e ku daneyê/libê genimê danîne tê

[2462] **Ġudûd**: Atom, zerre, di sirûştê de biçûktirîn parçe

[2463] **Xeṭṭê meşqê**: Berê di medreseyan de seyda dersê feqiyek dida, li ser kaxezê tiştek an jî dersa wî dinivîsî. Dûre feqî jî ew dersa xwe li ser wê kaxezê dûbare dikir. Ji bo ku hem nivîsa wî çêtir be hem jî nivîsê hîm bibe, li ser xettê Seyda, wî jî cardin dinivîsî. Bi vî awayî hem kaxez zayî nedibûn, hem jî feqî dersa xwe hîn dibû. Wê tiştê re digotin "xettê meşqê". Wek mînak; Filankes meşqê dike. (H.)

[2464] **Çûka dil**: Ew dilê ku wekî cucikê biçûk û nazik

[2465] **Baġir**: Lat, zinar

[2466] **Weza**: Jar, qels, zeʿîf

[2467] **Qelbê bengîḥal**: Ew dilê ku di halê evîndaran de ye

[2468] **Xepeng**: Kulek. Qulekî teng e ku raserî tenûrê tê hîştin ku dû û dûman bikişe derve.

[2469] **Xedeng**: Tîr

Ya bibit pare bi gazê[2470] dil r*a* ew ḥal xweṣṣefa ye

16.

Ger şeva tarî di nêva pêl*ê* beḥrê da bimînit

Wê dema yar lê xuya bit jê r*a* kêf e roj vedaye

17.

Dil bi feyża tê ji yarê, bûye cangîr[2471] fena ʿenqa[2472]

Sed hezar dafê wucûdê, jê r*a* viz tên mîn*a* ba ye

18.

Wê dema yar bête bîrê, radiket cendek digel xu

Di feżaya melekûtê,[2473] çer biket cendek p*ê* ra ye

19.

Her wekî masîy*ê* birrek,[2474] tor*a* cismîn pare ket[2475]

Noq dibit beḥra beqayê da dilê jîrḥal weha ye

20.

Ew kesê dil da n*î*ne ʿişq û evîn û ẕikr û fikr

Gerçî sûretademî ye lê bi dil ew mîn*a* ga ye

21.

Qîmeta dara genim her bi ser û dane heye

Ger nebit ew dane wî da, şekl*ê* mayî sap û ka ye

22.

Qîmeta wê daneyê hey, ger nebit kûray*î*[2476] ew

Yan ku kûrayî be dane, can r*a* jan e ne ġida[2477] ye

23.

Dil r*a* ʿişq şîrîn ġida ye, ger bibit ʿişqa Xudê

Yan ne ʿişqê dî ji dil ra, êş û jan e bê mefa[2478] ye

24.

Çûy*î*na pê ḥiss*ê* nefsanî mirin e can bira

---

2470 **Gaz**: Kelpetan

2471 **Cangîr**: Cihangîr, ew kesê ku dinyayê girtiye, desthilatdar, serdest

2472 ʿ**Enqa**: Teyrekê efsanewî ye ku navê wê heye lê bi xwe tune ye. Dibêjin pişt çiyayê Qafê dijî, teyrekî zehf mezin e, tûkên wê reng rengî ne, mê ye, rûyê wê dişibe mirovan û her tim li esmanan difire.

2473 **Melekût**: ʿAlema mulkê Xwedê

2474 **Masîyê birrek**: Masiyê ku devê wî mîna şûran e, bi tirkî “kılıç balığı”

2475 **Pere ket**: Perçe perçe kir

2476 **Kûrayî**: Ew genimê ku nav wê reş bûye, edî pûç bûye. Li serhedê dibêjîn; genim tolî bûye.

2477 **Ġida**: Xurek, xwarin

2478 **Mefa**: Menfaʿet, havil, sûd

Ê didit qelban ḥeyatê, her bizan ʿişqa Xuda ye

25.

Ji dilê pur niʿmetê me, ṣed hezar pesn bin j`Xudê ra

Dêl*a* malê duny*a*yê ve, iks*î*ra ʿişqa Xuda ye

26.

Ez **Ḥezîn** im lal û dîn im, şukr*ê* te nakim temam

Her zemanî kêfxweş im ku dil bi ʿişqa te kelaye[2479]

**104.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Baraneke nerm bar*î*ye ji ʿewr*ê* luṭfê ca were

Ser qad*a* qelbê bê nebat[2480] were bibîn dîsa here

2.

Kanîy*a* ʿilmê der b*û*ye dibilq*ê* ji ava zelal

Tê da h*ê*şîn bûne kulîlk tê bulbulan qal û şer e

3.

Bulbul*ê* meʿnan ref û ref têtin ji her hêlê li hev

Ev meʿn*î* ye wehay ġerîb ji ḥedd*ê* ṭûmaran[2481] der e

4.

Dil weku lewḥê meḥf*ûẓ*[2482] e tiştê t*ê* û çû girtîye

Hela hela![2483] lewḥa dilan da kainat serteser e

5.

Ġerîb n*î*ne ev ḥal ji dil lewra ew e mecla cemal[2484]

Dema ku nûrê lê veda ʿalem xuya bû yekser e

6.

Camek*î*[2485] ḥerfan gir dike bigre bide ber çav*ê* ʿeql

Yan ne, bi ʿeqlê rût kesê dinêre lewḥa dil ker[2486] e

---

[2479] **Kelaye**: Keliyaye

[2480] **Nebat**: Giha, rîwek

[2481] **Tûmar**: Kitêbên stûr, gir û zexm ên berê

[2482] **Lewḥê meḥfûẓ**: Ew lewhayê ku hatiye parastin. Ew lewha ya ku ew tiştên bi înayeta Xwedê Te‘ala dê çêbin, tê de hatine nivîsandin.

[2483] **Hela hela**: Di kurdiyê de baneşana şaşmayîn û ‘ecêbmayînê ye.

[2484] **Mecla cemal**: Ew cihê ku rindahiya Xwedê lê diyar dibe, cihê bedewiya Xwedê lê zahir dibe.

[2485] **Camekî**: Mebest ji vê camê, girdok e. Bi tirkî; büyüteç.

7.

Çendan biçûk e dil welê ʿummanekî bê kev*î*[2487] ye

Sed Dicle û Nîl û Feratê meʿneyan wendaker e

8.

Bê gêmîya behwar*î*yê[2488] deryay*a* dil da noq nebe

Çendan tu ṣûber[2489] bî bira, bê gêm*î*yê dîsa mere[2490]

9.

Xendiq*î*ne ʿeqlê puran[2491] nêv pêl*ê* deryaya dilan

Hindî d*î* mat mane li şûn nezan e ew ku da here

10.

Gijgêleka[2492] felaketan dema li dil hejê bixit

Qebtanekî wek Nûḥ divêt dil têk *î*man û behwer[2493] e

11.

Lenger*ê*[2494] îmanê divêt berdî binê beḥra dilan

Yan ne, dema felaketan ji xu umîdê bibire

12.

Bi ʿeql û zanînê **Ḥezîn** ger tu ʿeqilmend î nexap

Madam bi ʿeql û zan*î*nê dawî xuya nabit te re

**105.**

mefʿûlu / mefaʿîlu / mefaʿîlu / feʿûlun

Hezec − − +/+ − − +/+ − − +/+ − −

1.

Kêfxweş be dilo bes ke ş*î*nê îr*o* behar e

Çekkê keseran[2495] derxe ji xu bav*ê*je xar e

2.

Rabe bixebit lez bigire şûn û h*é*lûngê

---

[2486] **Dil ker**: Dilê wî/ê mîna heywanan, ew kesê ne aqil

[2487] **Kevî**: Rex, kenar

[2488] **Gemîya behwarî**: Keştiya baweriyê

[2489] **Sûber**: Ajnêber

[2490] **Mere**: Meçe, neçe

[2491] **Puran**: Gelekî ji wan

[2492] **Gijgêlek**: Bagerên mezîn, bahozên bihêz

[2493] **Behwer**: Bawerî, îman

[2494] **Lenger**: Ew hesînê duserî ye ku dema geştî di behrê de cihekî bisekine, ji bo ku cihê wê neguhere, davêjin nav behrê.

[2495] **Çekkê keseran**: Kincê xeman, libasên derdan

Ref ref diçitin qaz û quling, zo*zan* û war e

3.

Rabe bilezîn da ku nemînî ji refê xu

Vê rê d*a* *çû*yîna bi tenê tehlukezar[2496] e

4.

Bextê te d*a* me, vê reh*a* dûr da nebe tenha[2497]

Nefs pêşiy*a* te`y hil*o*yê[2498] şeyṭan li dîyar e

5.

Ḥetta dikarî rabe digel ṭeyr*ê* bilindfir

Da qurş*ûna*[2499] vê nefs*a* neyar te nexe xar e

6.

Daf[2500] dan*î*ye pêşya te cihanê bi hezar cî

Boy qût*ê*[2501] cehanê nex*a*pe lew ṣ*a*de jar[2502] e

7.

Cû cû diket insan t*î*ne bal xu ve welakin

Qeṣda w*ê* ne qûtdan e welê kuş*tin* û şar[2503] e

8.

Ey qelb*ê* **Ḥezîn** vê dun*ê* pur kirine şargeh[2504]

Wek hirç*a* birîndar kirine pare û pare

9.

Destê xu nexe bin kevirê çem*ê* cehanê

Raza bin*î* da mas*î* n*î*ne mar e h*î*şar e

10.

Rojê bi hezaran mîna te çem da diçin

Hin kêfxweş *in* hin ah û keser tim w*î* ra kar e

**106.**

feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl

---

2496 **Tehlukezar**: Bixeter, xeterdar, tisnak, bitalûke
2497 **Tenha**: Tenê
2498 **Hilo**: Eylo, qertel
2499 **Qurşûn**: Gule
2500 **Daf**: Dafik, telik, xefik, kemîn
2501 **Qût**: Xurîn, xwarin
2502 **Jar**: Jehr, jehrî
2503 **Şar**: Tûzak, kemîn
2504 **Şargeh**: Cihê veşartinê. **Şar**: Laçik, dersok, şarê jinan. Şargeh jî bi vê şarê hatiye nixûmandin û veşartin

Muteqarib + – –/+ – –/+ – –/+ –

1.

X*û*baş[2505] be delalo dilan bicv*î*ne

Heval û hogiran jʿxu dûr nex*î*ne

2.

Dibînî ku av nerm e, ber jêr diçe

Ḥeyatê r*a* sirr e, xweşîyê t*î*ne

3.

Ji boy roj*a* me serbijêr e mudam[2506]

Bilind e, ji boy ʿalemê nûr û jîn e

4.

Ji boy ax*a* me tête pêlêkirin

Gul û sunbul û sosinan der t*î*ne

5.

Welê xûnebaş[2507] her kesî ra bela ye

Ji her kar û barî j*î* para dimîne

6.

Mirovek ç*û* nêv bus(i)tanê gulan

D*î* xortek li wê diçe û dilezîne

7.

Dema gîşte ber dar*a* gula delal

D*î* gulan bi rûyê xu disûr*î*kîne[2508]

8.

Welê isturîyan dide ber diran

Serê wan bi diran*ê* tûj didirrîne

9.

Go, xortê delal ev gul û isturî

Ne xûşk û bira ne, hevalcêwr*î*[2509] ne

10.

Go herê wuṣa ye, welê gul xweş e

---

[2505] **Xubaş**: Exlaqê baş, sinc çê
[2506] **Mudam**: Her dem, her tim
[2507] **Xûnebaş**: Sinc xerab, exlaq pîs
[2508] **Disûrikîne**: Dirûçikîne, li rûyê xwe dide
[2509] **Hevalcêwrî**: Cêwî, cêwîk

Bi bêhn û bi reng û ber, ġemrevîn e
11.
Welê isturî zivr e, ţûj e`w bi jan e
Hevalê xu ra xain û ġemcivîn e
12.
Welew gul û istur*î* eṣlê xu da
Yek in, lê tu wanan m*î*na hev nebîne
13.
Bi eṣl û çiqûlkê xu berjor nefir
Bi dûrbîn*a* heş hey li xu bimêzîne[2510]
14.
Hevalîy*ê* her dostê ḥeq ra bikey
Hevalîy*a* wan mîn*a* hingiv şîrîn e
15.
Dixe bîr*a* te Rebb*ê* te ew delal
Ji te weswesan û şerran diqetîne
16.
Ji nefsa beraz ra hevalîy*a* wan
M*î*na bivr*ê* ţûj e, m*î*na marê şîn[2511] e
17.
Bibin tev li rastan, Xudê gotîye[2512]
Ji gotina ḥeq ber*ê* xu nezvirîne
18.
Der û dor*ê* rastan gul û sunbul in
Der û dor*ê* xaran[2513] hemî isturîn e
19.
Bi wanan kemal û gihan çê dibe
Bi van ê ku çê dibe dawî ş*î*n e
20.
Li felsef*a* Yûnanîyan pur menêr[2514]

[2510] **Bimêzîne**: Mêze bike, temaşe bike
[2511] **Mîna marê şîn e**: Biwêjeke kurdî ye ku bi wateya; gelek bi talûke û xeternak e.
[2512] Bnr. Qurana Pîroz, Tewbe: 9/119.
[2513] **Xar**: Stirîn, dirî, sinc. Li vir ji xêncî wê bi wateya; mirovên ne rast, kesê derewîn e jî.
[2514] **Menêr**: Menêre, nenêre, temaşe neke, nexwîne

Ku çêker*ê* wê tev d*a* diltar*î* ye

21.

Cihê nêz bike, dûr dixe te ji ḥeq

Dil û heş û nêrîn*a* te dimr*î*ne

22.

Gelek heşṭûj û dilronî wenda bûn

Bi wê sefseṭa ṣade kufr û kîn e

23.

Bi wê felsefa Suqr*a*ṭ û Eflaṭûn

Ji îman*ê* ha! pur mirov dûr ketîne

24.

Welê ḥikmeta Eḥmedê dilmunîr[2515]

Bi weḥya Xudê ye gelek şîr*î*n e

25.

Hidayet û feyż û kemal çê dibe

Bi wê ḥikmetê ku şifa û j*î*n e

26.

Li bustan*ê* Îslam*ê* borîn bikey

Ji sosin û nêrgiz û avan tijî ne

27.

Hezaran gulê wek Ġezalî[2516] û Romî[2517]

Di axa wî bustan*ê* da şîn b*û*ne

28.

Musulman*î* nûr e, îman e, ḥeyat e

Xweşî û ḥużûr û heş û zanîn e

29.

Musulman*î* her rast*î* rê ye bira

Li cem Rebb*ê* jorîn her Îslam d*î*n e[2518]

30.

Musulman*î*yê ra Resûl rehber e

---

2515 **Dilmunîr**: Ew kesê ku dilan ronî dike.
2516 **Ġezalî**: Îmamê Xeznalî. (bnr. 8/23)
2517 **Romî**: Mewlana Celaleddînê Romî. (bnr. 8/23)
2518 Îşareta vê ayetê dike:

(إِنَّ الدِّينَ عِنْدَ اللّٰهِ الْإِسْلَامُ)

Bi rastî li cem Xwedê dînê heq (û meqbûl) bes Îslam e. (Alî Îmran: 3/19)

Kitaba wê, Quran*a* ku wek wê nîne

31.

D*û* ra pêşuwayê w*î* dînê delal

Ebû Bekr[2519] û Farûq[2520] û ê wek ʿElî[2521] ne

32.

Ji Îslam*ê* ra her bes e ev kemal

Ku hogir*ê* wê Cibr*î*lê em*î*n e

33.

Bê xew û bê raḥet xebatê bikey

Kemala d*î*n û dunyê dest xu x*î*ne

34.

Dûr e her kemal ji mirovê ṭeral

Dunê da ṭeralê r*a* parek n*î*ne

35.

Hewar beyh*û*de ʿumr*ê* xu rê mekey

Bi tewşî k*î* ʿumrê xu rêke d*î*n e

36.

Ma davêje avê z*ê*r û zîv*ê* xu

Merovê bi heş yan xu dişewt*î*ne

37.

Xebatker digijin cih û wargehan

Mirovê ṭeral nîv*ê* rê da d`mîne

38.

H*î*na saġ*î* û keys[2522] heye ji te ra

Ji bustan*ê* dunyay gulan bicv*î*ne

39.

Kesî ev feṣala[2523] ji dest wî *her*re

Gelek puşman e, gelek dilbir*î*n e

40.

Di deryay*a* tev durr û cewher *î* tu

---

[2519] **Ebû Bekr**: Hz. Ebû Bekir. Xelîfeya yekem.
[2520] **Farûq**: Hz. Umer. Xelîfeya duyem.
[2521] **ʻElî**: Hz. Elî. Xelîfeya çarem.
[2522] **Keys**: Fersend, fesal
[2523] **Fesal**: Fersend, keys

H*î*na hey te ra vês,[2524] durran derx*î*ne

41.

Dixazî bibî zan*a* û serşivan

Ḥeta ku dimînî tim û tim bixûne

42.

Bi xandin*ê* ye dewleta milletan

Berê xu h*ê*la ʿilm*ê* da vegr*î*ne

43.

Bi xandin*ê* ye may*î*na dewletan

Bi xandin*ê* nav û şeref dim*î*ne

44.

“Bixûne”[2525] Xudê pêş(i)yê şand*î*ye

Ji Quran*a* lefẓê[2526] wî hingiv*î*n e

45.

Kilîd e derê her kemalê r*a* ew

Eger ew hebe her derî vekirîne

46.

Bilindî û nûr û ḥeyat zan*î*n e

Bela û perîşan*î* nezan*î*n e

47.

Ṭenikdest[2527] be zana, d*î*sa dilber e

Ṭenikî q*î*metê d*a* zêr nax*î*ne

48.

Çiqas ʿeqr*û*t[2528] û çek qetabe d*î*sa

Merivê z*a*na dilber û nar*î*n e

49.

Dibêje Resûlê Xudayê mezin

Bixaze tu ʿilmê welew li Ç*î*n e[2529]

50.

Heçî eẕyetê bon*a* ʿilmê dixwî

---

[2524] **Vês**: Bêhn, helm
[2525] Bnr. Qurana Pîroz, ‘Eleq: 96/1.
[2526] **Lefẓ**: Peyv, bêje, kelîme
[2527] **Ṭenikdest**: Xizan, naçar, feqîr
[2528] **‘Eqrût**: Rûpîs, kesê pîs û nebaş
[2529] Îşareta vê hedîsê dike: Ilm ger li Çînê be jî herin fêrbin. (Camiu‘s-Saxir 1/30)

Te ra baġ û bustan*ê* gulgul*î* ne
51.
Şevê tar*î*yê wan d*a* teḥṣil dikey
Ḥeyatê d*a* boy te r*o*jê ron*î* ne
52.
Q*î*rîna ku seyda li ser te dike
Teḥemmul bikey ṣade ew qenc*î* ne
53.
Hemî nan*ê* ʿişkê dixwî wê demê
Ji ruḥ û heşê te r*a* vîtem*î*n e
54.
Heçî nimz*î*ya boy hevalan dikey
Te ra rojekê tev d*a* mezin*î* ne
55.
Ji bo zan*î*nê dûrb*û*na ji welat
Ji ẕatê Xudayê mezin nêzb*û*ne
56.
P*î*roz e kesî dar*a* zanîn*ê* her
Bi piçûk*î* qelbê xu da biçk*î*ne
57.
Bi xandin*ê* boy pêş d*a* tê her kemal
**Ḥezîn** tim û tim her b*ê*je, bix*û*ne!

**107.**

feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl
Muteqarib + − −/+ − −/+ − −/+ −
1.
Xudê tev li ṣebirker*a*n e, dibêje[2530]
Qurana kitaba Rebbê bir*ê*ne
2.
Bi alîkirîn û keremkar*î*yê

[2530] Îşareta vê ayetê dike: (إِنَّ اللّٰهَ مَعَ الصَّابِرِينَ)
Bêguman Xwedê digel sebirkêşan e. (Enfal: 8/46)

Xudê tev li sebirker*a*n e biz*a*ne

3.

Wegerne, Xudê ra n*î*ne tu heval

Ç*a*wa wî r*a* cih û cihet[2531] tu n*î*ne

4.

Xudê pak e ji her ṣifatê hene

Ji her tişt*î* ra taze peyda b*û*ne

5.

Herê[2532] Ḥeq d*û*r e ji ṣifatê beşer

Welê ew j`me wek me n*ê*zîktir*î*n e

6.

Xudêyo tu ṣebrê bidey bengîyan[2533]

Şewata evîna te gelek b`j*a*n e

7.

Ji te ye bela û ji te ye ṣebir

Bi te her kenîn e, bi te her gîrîn e

8.

Kî ku bêje, bê te dibin kar û bar

Nezan e, gavar[2534] e, xêvik[2535] û d*î*n e

9.

Eger tu nedî ṣebr*ê* ava çeman

Li ser tim ç*û*yînê çulo[2536] dikûdîne[2537]

10.

Bi her kevir û kend*ê* tê werkirin

D*î*sa ew ji çûnê p*a*ra nam*î*ne

11.

Ḥetta ku neçe beḥr û golê mezin

Şev û roj dirije, gelek dilezîne

12.

---

[2531] **Cihet**: Hêl, alî

[2532] **Herê**: Erê, belê

[2533] **Bengî**: Evîndar, dildar, dilketî

[2534] **Gavar**: Ehmeq, ‘eqlga, xêvik

[2535] **Xêvik**: Ehmeq, sefîk, ‘eqlsivik

[2536] **Çulo**: Çawa

[2537] **Dikûdîne**: Didome, dewam dike

Ji boy eṣlê wê beḥr û gol in, loma

Li ser wan bi lorîn û bi ġullîn e

13.

Dema gîşte wanan d*î*sa naskine

Bi pêl û bi kêş û hej û lerz*î*n e

14.

Bi timtêl*a*[2538] dûman*ê* berjor diçe

D*û* ra ḥeq dixe reḥmet û dirijîne

15.

Bi wê reḥmetê şîn dibe her nebat

Gul û sosin û sunbul û yasemîn e

16.

Bi wê reḥmetê çê dibe durr*ê* qenc

Di hindur*ê* masiy tev bêhn û x*û*n e

17.

Hilo baqilo hey û hey[2539] key xebat

Hevalîy*a* pîrek*î*[2540] dest xu x*î*ne

18.

Şev û roj tu seyr û sulûkê bikey

Ji dunyay leṭaîfê[2541] xu biqetîne

19.

Hêla ʿalema ʿulw*î* ve rê bikey

Bi meqam*ê* wanan wan bigih*î*ne

20.

Ji beḥra fenayê[2542] reha key[2543] ewan

Di baġê beqayê[2544] d*a* wan biçk*î*ne

21.

Li wê şîn dibin ew digirin berê[2545]

Ku tev nas*î* û nûr û feyż û xwazîn[2546] e

---

2538 **Timtêl**: Şekl, wekî (wê tiştî)

2539 **Hey û hey**: Her tim, her dem

2540 **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

2541 **Leṭaîf**: Tiştên wek ʻeql, qelb, raz/sir, ruh in ku di mirovan de heye.

2542 **Fena**: Fanî, ew tiştê ku dawiya wî/ê heye,

2543 **Reha key**: Xilas bike, rizgar bike

2544 **Beqa**: Baqî, ew tiştê ku dawiya wî/ê tune ye, her heye

2545 **Ber**: Fêkî

22.

Dema ew ji wê ʿalemê vegerin

Ji wanan r*a* kar rehberîya d*î*n e

23.

Welê piştî şebrek dirêj pêkve tên

Ji wî mêr*î* ra dil tijih yeqîn[2547] e

24.

M*î*na vî meqamî nîne tu meqam

Ji mêrê rewî ra m*î*na hesp û zîn e

25.

Ṣebrê key, ṣebrê key, ṣebrê key bira

Gihîştî ṣebirkerê dil tev ev*î*n e[2548]

**108.**

feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl

Muteqarib + − −/+ − −/+ − −/+ −

1.

Ji pêçan*a* rîya[2549] dirêj a nenas

Setemê[2550] pêşîn rehberek em*î*n e

2.

Sebebê dudiyan ji pêçan*ê* ra

Yeqîn bizane ḥeq*î*qî ev*î*n e

3.

Evîn sirr e bo çêkirina Xudê

Hemî mexlûqê ku me dîne[2551] û nedîne[2552]

4.

Xudê kenzekî[2553] pak*î* veşart*î* bû

W*î* xastê were naskirin xez*î*ne

5.

---

2546 **Xwazîn**: Bextewarî, şadî, kamranî
2547 **Yeqîn**: Bawerî, îman
2548 Ew dilê ku sebrê dike û tev bi evîn û ʿişq e, digihîje miraza xwe.
2549 **Pêçana rê**: Di rê de çûyîn, xweş çûyîn, lez çûyîn
2550 **Setem**: Sedem
2551 **Me dîne**: Me dîtine
2552 **Nedîne**: Nedîtine
2553 **Kenz**: Gencîne, xezîne. Îşareta hedîsa qudsî dike. (bnr. 1/12)

Wî çêkirîye bo were naskirin

Ku her tişt ji ẕatê w*î* ra hêl*î*[2554] ne

6.

Hemî dar û belg û giha û delav

Çiya`w gaz û beḥr û semayê ş*î*n e

7.

Hemî ṭeyr û insan û kevzer[2555] û mar

Hemî mûr[2556] û zermas*î*[2557] û bal*î*ne[2558]

8.

Di hindûr*ê* wan da heye ʿişq*a* ḥeq

Ji boy wê bi xizmet*ê* ve qemt*î*ne[2559]

9.

Sitêr û h*î*v û roj û ʿewr û hewa

Bi ʿişqê yeka yek emrê pêk t*î*ne

10.

Di nav wan d*a* bendê evînê ku hey

Ḥeyat ḥett*a* hebe w*a*nan digerrîne

11.

Wuṣa bendekî zexm e ġeyrî Xudê

Tu tiştek nikare w*î* bibizd*î*ne[2560]

12.

Werîsê evînê ye wanan mudam[2561]

Bi ser hev ve tîne û dikiş*î*ne

13.

Di nava me û Xud*ê* da heye bend

Ji boy wî *her* roj rizq*ê* me diş*î*ne

14.

Şev û roj ku ʿarif dikin taʿetê

Bi wî bend*ê* ve lewr*a* ew lezq*î*ne[2562]

---

2554 **Hêlî**: Neynik, ʻeynik
2555 **Kevzer**: Cureyek ji dêlemar/qumqumok/maqîzeran e.
2556 **Mûr**: Morî, gêlî
2557 **Zermasî**: Cureyek ji masiyan e ku rengê wan zer in.
2558 **Balîne**: Hût, masiyê herî mezin
2559 **Qemtîne**: Zeliqîne, qemitandin, zeliqandin
2560 **Bibizdîne**: Bibizîne, bizdandin, leqandin
2561 **Mudam**: Her dem, her tim

15.

Bibêjî di nêv erḍ û ezman da tu

Evîn û keş û bend û meylek n*î*ne

16.

Eger bend hebûna dihata d*î*tin

Ku her tişt*î* hene neveşart*î*ne

17.

Dibêjim, di nêv ʿaşiq û meʿş*û*qê

Hezar bend*ê* ʿişq û evînê hene

18.

Welê yek ji wanan n*a*yête d*î*tin

Ku pêjnê[2563] dilan in, ne ber çav*î*ne

19.

Evîna Mem û Zîn*ê* ber çav n*î*ne

Welê ê w*ê* inkar bikin ma kî ne?

20.

Ji rengê zer û lor*î*n û gîr*î*nê

Hezar şahidê ev*î*na dil hene

21.

Ji kêm xarin û xew û vexarinê

Li ser ʿişq*a* dil ṣed n*î*şan dan*î*ne

22.

Eger ʿişq nebûna ma ezman*ê* kesk

Ji ʿewran li ser qad*ê* dibar*î*ne?

23.

Eger ʿişq nebûna ma ev gurr*î*nê

Birûsk û ç*î*kê tên ji ezman çi ne?

24.

Eger ʿişq nebana ma ev roj *her* roj

Çima derdikeve`w diçe`w naskine

25.

Bi bendê evînê ş*ê*ra dilkevir

---

[2562] **Lezqîne**: Leziqîne, zeliqîne

[2563] **Pêjn**: Hîs, deng, gal

Ji berê xu çêlikê[2564] xu dimjîne[2565]

26.

Bi bendê evînê hiloya[2566] kovî

Ji bo çêlikê xu, xu dimirîne[2567]

27.

Bi bendê evînê qirika belek

Çêlikê qijkê bi firrê dixîne

28.

Welew girtin û dayîna ʿalemê

Bi heş çêdibe lê sebeb evîn e

29.

Evîn ger nebe heş mîna kevir e

Hêla kar û baran ve ew wî dişîne

30.

Xudêyo! ji ʿişqa te dil bû kebab

Ji luṭfa xu ṣebrekê wî ra bîne

31.

Nexaze biqete ji wê ʿişqê lê

Agirê evîna te gelek b`ṭîn e

32.

Bikey xweşî û hûnikî[2568] evînê

Li wan dil kebabê wê da wer bûne

33.

Reha key[2569] vî jarê belengazê dûr

Ji ġeyrê te wî ra penahek[2570] nîne

34.

Bi dilek şewat ev **Ḥezînê** bi derd

Dirêjit belaġat[2571] j`qelb tev enîn[2572] e

---

[2564] **Çêlik**: Têjik
[2565] **Dimjîne**: Dimêjîne, şîr didê
[2566] **Hilo**: Eylo, teyr, qertel
[2567] **Xu dimirîne**: Xwe dikuje
[2568] **Hûnik**: Hênik, negerm
[2569] **Reha key**: Rizgar bike, xilas bike, bifilitîne
[2570] **Penah**: Cihê spartinê, cihê stirînê
[2571] **Belaġat**: Gotinên xweş û bi heqîqet
[2572] **Enîn**: Nalandin

**109.**

feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl

Muteqarib + − −/+ − −/+ − −/+ −

1.

Di ʿibadetê da divêtin xulûṣ[2573]

Ji şirk[2574] û ji rûmet*î*yê dûr x*î*ne

2.

Kesek av*ê* wan ra ẕelalî nebe

Bi pênç qur*û*şê kafiran nast*î*ne

3.

Di dêla[2575] j*î*nê da mirinê t*î*nin

Ew avê ne hêjay*ê* pur şêl*û* ne

4.

ʿIbadet*ê* atûn*a*[2576] evîn*ê* da

Ji bona zelalîy*ê* biḥell*î*ne

5.

Ji boy ew ji xûrdan were dûrketin

Di bêjing*a* şerʿê da dawêj*î*ne

6.

Zelalî ji her tişt*î* ra ye kemal

Bi zelal*î*yê reng û rû ron*î* ye

7.

Bi zelal*î*yê her xweş e dos(i)tî

Ku dostîy*a* şêlû dawî ax*î*n e

8.

Ġiramek[2577] ji cewher*ê* xaliṣ b*î*ne

Ji cewher*ê* xûrde r*a* qîmet n*î*ne

9.

Te ra avekî ṣade wek şîr divê

---

[2573] **Xulûṣ**: Îxlas, her tiştî tenê ji bo Xwedê kirin, di kirina ‘emelên xwe de tenê riza Xwedê xwestin

[2574] **Şirk**: Ji xêncî Yezdanê Jorîn, qebûlkirina xwedayekî din e. Ango di baweriyê de hevparî ye.

[2575] **Dêl**: Şûn, dews

[2576] **Atûn**: Firin, argûn, ocax

[2577] **Ġiram**: Gram, 1/1000 kg

Hemî av*ê* şêlû z*û* birrij*î*nê

10.

Ne jîn û ne le*z*z*et bi wan çê dibin

Belê, ew li ser te bargiran*î* ye

11.

Ḥeyatê dikin her merovê zelal

Mûmê şêl*û*yan tevda xar vebûne[2578]

12.

Dixazî ḥeyatek zelal û ş*î*rîn

Bi zelal*î* ʿumrê xu bibor*î*ne

13.

Dibêjin, kî çi bike wî dib*î*ne

Dibêjin, k*î* çi baj*o* wî hilt*î*ne

14.

Zelal her wekî luks*ê* ronî didin

Ji wan dûr diçin fitnetî tar*î* ne

15.

Ji boy vî Resûlê Xudayê mezin

Bi wanan ḥedîṯê d*a*xazyê t*î*ne

16.

Li ser lêv*a* beḥrek zelal biskine[2579]

W*ê* da xaliṣê cewheran bib*î*ne

17.

M*î*na ḥût[2580] xu noq key di wê beḥr*ê* da

Xu ra cewherê hêj*a* biciv*î*ne

18.

D*û* ra were kevîy*a*[2581] beḥrê bilez

Li ser ḥewceyan cewheran vewş*î*ne[2582]

19.

Li cem Rebb*ê* jorîn tu nîne tu kar

---

[2578] **Xar vebûn**: (Agirê) temirandin, tefandin, vemirandin

[2579] **Biskine**: Bisekine

[2580] **Ḥût**: Masiyê herî mezin, balîne

[2581] **Kevî**: Lêva (behrê), qerax, kenar

[2582] **Vewşîne**: Belav bike

Ku şûna v*î* karê h*ê*ja bist*î*ne

20.

Riya ḥeq d*a* daim bi nermî *her*re

Ji xelqê Xudê ra tu karê b*î*ne

21.

Digel rast û dostan hevalîy*ê* key

Ku hevalîya wan gelek şîr*î*n e

**110.**

feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl

Muteqarib + − −/+ − −/+ − −/+ −

1.

Bi rastî bibêje bi rastî bike

Bi rastî bixûne xu nefetl*î*ne[2583]

2.

Bi rastî bibihê, bi rastî b*ê*je

Bi rastî biponij, bi rastî b*î*ne

3.

Xudê gotîye “isteqim”[2584] bibe rast

Di her kar û barê tecel[2585] wan t*î*ne

4.

Xu ra rast*î*yê rûsipîtî bizan

Ji bil rast*î*yê tev d*a* derd û ş*î*n e

5.

Xarî mar e[2586] dostê xu ra xain e

Şerefa merovê c*a*mêr hilt*î*ne

6.

Çemenek*î* xweş û geş e rasitî

Ç*a*wa xar*î* çolek*î* girnûk*î* ne

---

[2583] **Nefetlîne**: Nezivirîne, pişta xwe nedê

[2584] **Isteqim**: Rast û durist be. Îşareta vê ayetê dike:

(فَاسْتَقِمْ كَمَا أُمِرْتَ وَمَنْ تَابَ مَعَكَ)

Nexwe tu û digel te ew ên ku tobe kirin jî wekî ku li we ferman hatiye kirin xwe rast û durist bikin û ji endazê neborin. (Hûd:11/112)

[2585] **Tecel**: Diyarbûn, zahirbûn

[2586] **Xarî mar e**: Nerastbûn, mirovên nerast wekî maran e û xeterdar e

7.

Di vê çol*ê* da kî bixaze *her*re

X*û*na xu bi destê xu dirij*î*ne

8.

Ku çolek wuṣa ye n*î*ne tê xweşî

Serapa[2587] cefa ye ṣefa tê n*î*n e

9.

Di wî çemenî da k*î* borîn bike

Temaşa û jînê w*î* da dib*î*ne

10.

Ku çemenekî tev gul û sosin e

Seraser ḥeyat e, ş*û*nek em*î*n e

11.

Xudêyo tu goti*nêm* key karîker[2588]

Divê ʿalema jîn*a* wê **Ḥezîn** e

12.

Eger vê birînê tu derman nekî

Ji saġîy*a* wî ra tu derman n*î*ne

13.

Birîn kûr e, jan pur e, xelq cahil e

H*ê*la xweş*î*yê ve r*ê* dernaxîne

14.

Qelîşe li dîwar*ê* dîn ket*î*ye

Hewarek*ê* hêla me ve biş*î*ne

15.

Neyarê x*û*yê qenc û dîn pur b*û*ne

Tu mala *wan* ser wan d*a* hev dax*î*ne

16.

H*ê*vîdar in em lew keremkar *î* tu

Ji vê jan*a* wey bav me biqet*î*ne

17.

Di vê çol*a* tev dirr*î* da mane mat

---

[2587] **Serapa**: Ji sêrî heya pê, sertapa, seranser

[2588] **Karîker**: Bisûd, bifeyde, bite'sîr, karê ji xelqê dike

Me ra rehberek dilmunîr[2589] bişîne

### 111.

feʿûlun / feʿûlun / feʿûlun / feʿûl

Muteqarib + − −/+ − −/+ − −/+ −

1.

“Men eḥsenu qewla mimmen deʿa

Île`llahi”[2590] bo rehberan mizgîn e

2.

Xudê ger bide pesnê insanekî

Ewî ra heval be ku tev zanîn e

3.

Kî Xaliq[2591] bi xelqê bide hez kirin

Wî rehber bizane li cem wî rûne

4.

Kesî tim ji Quranê qezî bike[2592]

Tu dersa dînê xu ji wî bistîne

5.

Hey û hey şîretker û irşadê key

Peyġember dibêje: Neṣîḥet dîn e![2593]

6.

Welatê nebe wan d*a* irşad*a* dîn

Ji wan dûr here lewr*a* ew tar*î* ne

7.

Dema roj nebe çer[2594] dunê ron*î* ye

Bê şîret*ê* pîran[2595] *çer* dil ron*î* ne

8.

---

[2589] **Dilmunîr**: Ew kesê ku dilan ronî dike

[2590] Îşareta vê ayetê dike:

(وَمَنْ اَحْسَنُ قَوْلاً مِمَّنْ دَعَا اِلَى اللّٰهِ وَعَمِلَ صَالِحاً وَقَالَ اِنَّنِي مِنَ الْمُسْلِمِينَ)

Erê ma gotina kê ji ya wî kesî lawtir û spehîtir e, ew ê ku xelkê gazî bal Xwedê ve dike, kar û kiryarên qenc dike û dibêje: Bêguman ez ji mislimanan im? (Fussîlet: 41/33)

[2591] **Xaliq**: Xwedê. Ewê ku her tişt çê kiriye, tîne holê û aferîner e.

[2592] **Qezî bike**: Biaxive, xeber bide, bişteqile, qise bike

[2593] Hedîs. (Buxarî, Muslîm, Nesaî)

[2594] **Çer**: Çawa

[2595] **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

Xu noq key m*î*na ḥût[2596] di Qûran*ê* da

Ji wê cewherê meʿneyan derx*î*ne

9.

Li baġê dilan mîn*a* ʿewrê sema[2597]

Bi nermî bi reḥmet *hey* bibarîne

10.

Ji boy şîn bibin wan d*a* ʿilm û huner

Behara zemanê *wan*, bê hav*î*n e

11.

Ji şiʿrê me danî gulek pur huner

Me aja w*ê* anî ji baġê d*î*n[2598] e

12.

Şukur ji Xudê ra ku da me feṣal[2599]

Me çêkir eva şiʿr*a* tev zan*î*n e

13.

P*a*yîz e nemaye gulan ra geşî

Welê vê gulê ra mirin tu n*î*ne

14.

Hey û hey behar e ji wê ra zeman

Tim û tim ji wê ra j*î*na şîr*î*n e

15.

Ji wîlwîl*ê* çûkan tu nayê qetan

Dilê wî d*a* ev gul ku heşîn b*û*ne

16.

Ne şiʿre welê ev çemenek xweş e

Li der û li dorê w*ê* av bilq*î*ne

17.

Heşan ra hesan[2600] e dilan ra n*û*r e

Kulan ra şifa ye ji can ra j*î*n e

18.

---

[2596] **Ḥût**: Masiyê herî mezin, balîne

[2597] **Sema**: Asîman, ezman

[2598] **Baxê dîn**: Mebest jê baxê dînê Îslamê ye

[2599] **Feṣal**: Fersend

[2600] **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û kêran tûj dikin, kevirê tûjkirinê

Werin lê binêrin û lê bigerin

Çemenek*î* pur xweş û ġemrev*î*n e

19.

Xudêyo bi ḥeqqê Ḥebîbê xu key

Me ra tilpekê[2601] ʿewr*ê* luṭfê b*î*ne

20.

Hey û hey[2602] bibarîne luṭfan[2603] ji wî

Ku gula v*ê* bostan*ê* geş bim*î*ne

21.

**Ḥezîn** şukr*ê* Rebbê xu key tim û tim

Li vê şiʿr*a* dilber d*a*wîyê b*î*ne

**112.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Binêre qenc li zozan û li mêrgan çaw*a* xemlîne

Bi daran û bi gihan û kulîlkan reng*a* rengî ne

2.

Hemî kewê g*o*zel û çîr digel şalûl û çûvreşkan

Bi wîllîn in bi govend in ji ḥusna ḥeq r*a* hêlî[2604] ne

3.

Hemî newwal û kendal û zinar û baġir[2605] û bustan

Xudê ra şan û nîşan in delîl in ḥeq ku danîne

4.

Ji sertapa[2606] hemî ʿalem bi xeml û xêz û govendê

Bi rindîya n*û*ra rûyê delalê tevd*a* bengî[2607] ne

5.

Ji dara qurm reşa pelşîn dibit sêva sipî û ṣor?

---

[2601] **Tilpek**: Dilopek, niqutek
[2602] **Hey û hey**: Her dem, her tim
[2603] **Luṭf**: Qencî, çêyî, axaftina xweş û nazîk, tevgera bi rindahî
[2604] **Hêlî**: Neynik, ʻeynik
[2605] **Baxir**: Kevirên li hev siwar bûne û bi rêz dirêj bûne, çiyayên biçûk ên bi rêz.
[2606] **Sertapa**: Ji serî heta pê, seranser, serdanpê
[2607] **Bengî**: Evîndar, dildar

Ji dara îsturîna zivr, gulên nazik Xudê tîne?

6.

Ji pîvazê dibit nêrgiz ji çilka menîyê insan?

Hemî sosin û dar û zerzewat eslê xu xalî ne

7.

Di avê da dijî masî, şeva reş da dibîne kund[2608]

Hemî kurm û k*ê*z û çûçik bi şev wan qîr û wîllîn e

8.

**Ḥezîn** ev tev delîl in kar*î*n û zanîn*a* muṭleq ra

Kesê ku heş hebit wî ra xu ra ʿibret*ê* distîne

**113.**[2609]

mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –

1.

Rabe ji xew rabe ji xew

ʿUmir buhûrî çû dilo

2.

Hîna heye helmek*î* germ

Derman *key* jana xu dilo

3.

Dûrîtîya ji ḥeq bizan

Êşek giran e hey dilo

4.

Di du cihanan da dibî

Bi dûrîyê rûreş dilo

5.

Wenda nebe ji rah*ê* ḥeq

Dû ra dibî pîşman dilo

6.

Dimîn*î* wek masî li req

---

[2608] **Kund**: Bûm

[2609] Seydayê Mela Husnî ev helbesta ji Mele Mustefa Agahî re gotiye. Rêzên 3, 4, 7 û 8’an ji aliyê Mele Mustefa Agahî ve hatiye gotin. (Yakup Aykaç, “Hevpeyvîn: Mela Mustefa Agahî”, 28.03.2014, Çewlîg.)

Bê av*a* îmanê dilo
7.
Qelbê n*î*ne tê da *î*man
Wek lanb*a* bê gaz e dilo
8.
Çawa bikey pê nakevit
Bi kibr*î*ta[2610] ʿeşqê dilo
9.
Bibe muṭîʿê[2611] emr*ê* ḥeq
Bo ku nebî cunbûz[2612] dilo
10.
Ḥeywan*a* cunbûz lê dixin
Li poz*ê* wê çoyan[2613] dilo
11.
Ew mer*o*vê lê ket ji ḥeq
Qamçîy*a* hêrsê hey dilo
12.
Xazî neba hebûn*ê* da
Wî ra n*a*v û dengek dilo
13.
Birîn*a* ġeddar hey li te
Te ra divêt luqman dilo
14.
Derman *key* canê xu hewar
Hîna *hey* xîsekî[2614] dilo
15.
Her dem **Ḥezîn** im ez ji te
Bes e mebe ġafil dilo
16.
Ḥetta çi çaġ weha diçî

[2610] **Kibrît**: Niftik, pêtîk
[2611] **Muṭîʿ**: Ew ê ku îtaet dike, kesê îtaetker
[2612] **Cunbûz**: Bêxû, bêcir, bêxulq, cirnexweş
[2613] **Ço**: Çov, çovik, darekî biçûk û hişk e ku ji bo ajotina heywanan tê bikaranîn
[2614] **Xîs**: Fersend, keys

Zarot*î*yê bes key dilo

17.

Biciv*î*ne ʿeqlê xu ca

Çawa dibit dawî dilo

18.

Çûyîn heye veger j*î* hey

Tewş[2615] bor*î* ʿumrê te dilo

**114.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –

1.

Hela hela![2616] çi xweş n*û*rek zelal î tu

Hela hela! qelbê *min* da şemal[2617] î tu

2.

Hela hela! qelbê me ṣade neynik e

Hela hela! hember*ê* roja rûy*ê* tu[2618]

3.

Hela hela! bi dil Ṭ*û*rê Sîna me

Hela hela! li koh*ê*[2619] dil xuyayî tu

4.

Hela hela! lewḥa dilêm telfîzy*o*n[2620] e

Nasût*a*[2621] dil xweş meẓherê[2622] lahût[2623] î tu

5.

Hela hela! ḥubba[2624] te ye qelbê me da

Hela hela! şev ta seḥer[2625] xuyayî tu

6.

---

[2615] **Tewş**: Vala, beredayî, beyhûde

[2616] **Hela hela**: Baneşana şaşmayîn û ʿecêbbûnê ye di kurdî de.

[2617] **Şemal**: Find, mûm

[2618] **Roja rûyê tu**: Rûyê te yê wek rojê rewnak û bi nûr

[2619] **Koh**: Çiya

[2620] **Telfîzyon**: Televîzyon, TV

[2621] **Nasût**: Însaniyet, her tiştê ku bi însanan re têkildar e

[2622] **Meẓher**: Cihê zuhûr/diyarbûnê, cihê xuyabûnê

[2623] **Lahût**: Îlahiyet, ʿalema îlahî, alema me’newî

[2624] **Ḥub**: Evîn, hezkirin

[2625] **Şev ta seḥer**: Ji şev heya serê sibê

Hela hela! pur pur *ber*ya qalû bela[2626]

Hela hela! dil bend*ê* dafa[2627] biskê tu[2628]

7.

Hela hela! hem qir dikey hem pur dikey

Lewra ku hem cebbar[2629] û hem wehhab[2630] î tu

8.

Carî were reḥmê nigara[2631] ser d*î*lan[2632]

Borîye reḥma te delal li hêrs*a* tu[2633]

9.

Hela hela! dunya digel deşt û çiyan

Nîşan didit, cemal[2634] û hem celal[2635] î tu

10.

Hela hela! ʿewr û giha û av û baġ

Hela hela! xweş dûrb*î*nê cemal î tu

11.

Hela hela! ʿalem seraser, qaf û qaf[2636]

Têk da dijîn bi sayeyê ʿeṭay*ê* tu[2637]

12.

Hela hela! xweş tête bayê rojhelat

Bal bengîyan va tîne xweş peyġamê[2638] tu

13.

Hela hela! tev serx*o*ş û hunavnema

Lew hate bêhna sosina gulîy*ê* tu

---

[2626] **Qalû bela**: Bi wateya "Gotin belê" ye. Di bezma elestê de behsa sozdayîna ruhan dike. Hingê Xwedê pirsiye: "Ma Ez rebbê we nîn im?" Ruh jî wiha gotine: "Belê, Tu rebbê me yî." (bnr. 68/16)

[2627] **Daf**: Dafik, kemîn, xepik, telik

[2628] **Tu**: Ji ber ku qafiye xiranebe carnan li dewsa "te"yê "tu" hatiye bikaranîn. Mînak; biskê tu = biskê te.

[2629] **Cebbar**: Ew ê ku xwediyê hêza bêtixûb e, ser her kes û her tiştî re ye, heyf û tola xwe hiltîne û dilê şikestî dicebirîne.

[2630] **Wehhab**: Ew ê ku dayîn û kerema wî digihîje mexlûqên wî û ji her kesî re Dayende ye.

[2631] **Nigara**: Ey yar, ey dilber! Li vir banglêkirin heye.

[2632] **Dîl**: Bende, hêsîr, esîr

[2633] Îşareta vê ayetê dike:

(وَرَحْمَتِي وَسِعَتْ كُلَّ شَيْءٍ)

Merhemeta min dor li her tiştî girtiye. (A'raf: 156)

[2634] **Cemal**: Rindî, bedewî, rindahiya Xwedê

[2635] **Celal**: Mezinahiya sermedî, xwedan ʿezamet

[2636] **Qaf û qaf**: Li gorî efsaneyê du çiyayê Qafê hene ku yek li rojhilatê ye, yê dî li rojavayê. Ji qaf û qafê mebest seranserê dinyayê ye. Ango, ji çiyayê Qafa rojhilatê heta Qafa rojavayê.

[2637] ʿ**Eṭayê tu**: Dayîna te

[2638] **Peyġam**: Peyam

14.

Hela hela! roj û heyîv çûne xusûf[2639]

Dema veda ser ʿalemê ṭîrêj*ê* tu

15.

Hela hela! dilber û rind, bûn muxtefî[2640]

Dema xuya bû qameta yektay*ê*[2641] tu

16.

Hela hela! rûyê dilan ket hêlekê[2642]

Dema r*ê*je ser ʿalemê iḥsan*ê* tu

17.

Hela hela! ehlê dilan çi jîn xweş in

Lewra dijîn nêz baġ û hem bustan*ê* tu

18.

Hela hela! lez hate feṣla[2643] nûbehar

Bulbul ji gul tim vedixût şebnem*ê*[2644] tu

19.

Carî temaşa key li qelbê bengîyan

Têk dil birîndar in bi tîrê burh*ê*[2645] tu

20.

Carî bi şefqet seyr bikey bal ʿaşiqan

Tevda kemendkêş[2646] in di nêv zindan*ê*, tu

21.

Çi qir bikey çi pur bikey bi kêf*a* xu`y

Kes ra n*î*ne çûn û çi ra der mulk*ê*[2647] tu

22.

Yara! **Ḥezîn** jar e, belengaz e neçar

Ser danîye ser şêm*û*ka[2648] seray*ê* tu

---

[2639] **Xusûf**: Dema di gerrîna heyv, roj û dinyayê de roj û heyv li gorî dinyayê bikevin piş hev, hingê heyv tarî dibe ku jê re dibêjin xusûf. Girtina hîvê.

[2640] **Muxtefî**: Wenda, veşartî

[2641] **Qameta yekta**: Bejn û bala dirêj

[2642] **Hêl**: Alî, teref, lay

[2643] **Feṣl**: Demsal, mewsîm

[2644] **Şebnem**: Xunav

[2645] **Burh**: Birh, birû

[2646] **Kemendkêş**: Ew kesê ku bi kemendê heywan an jî însanan digire.

**Kemend**: Darekî serê wî xelek e û bi destî ye.

[2647] **Der mulk tu**: Di mulkê te de

23.

ʿEṭfen binaya wahibel feyḍi`l-ʿemîm[2649]

Çav daye hev dilkul ji bil dergah*ê* tu

**115.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Ronîya qad û semayê ṭîr*ê*jek nûra te bû

Hatina her ʿalemê têk da bi fermana te bû

2.

Lerz*î*n û ta û ṭereb[2650] ku qelb û canan da heye

Ew ji ber ʿeşqa n*î*şan û tirs*a* ebrûyê[2651] te bû

3.

Hin ji ehlê dil ku wek goyîn*ê*[2652] nalînê dikin

Ew ji ber germa evîna rindîya rûyê te bû

4.

Bulbulê jar ku hey û hey ser gulan da nal*î*ne

Yê ku gul kir şehreyê[2653] afaq*ê*, xûrşîda[2654] te bû

5.

Her gulistankî ku tê da ṭeyr*ê* hay û hûy dikin

Lewr*a* gulzar[2655] û çemengeh hêlîyê ḥusna te[2656] bû

6.

Ġulġulê av û çeman û xuşxuşê dar û beran

Hin ji tirs û heybetan hin dî ji ber ḥubba[2657] te bû

7.

Der[2658] quling û ṣorevîlkan[2659] agirek dişwar heye

[2648] **Şêmûk**: Derçik, şêmûg, derezûng

[2649] Ey xwediyê feyza ʿumûmî, şefqetê bi me bike.

[2650] **Ṭereb**: Lerz, lerizîn, ricifîn

[2651] **Ebrû**: Birû, birh

[2652] **Goyîn**: Tivirg, tivîlk. Çivîkek wekî kevokê ye.

[2653] **Şehre**: Namdar, meşhûr

[2654] **Xûrşîd**: Roj, tav, nûr (Ew roja/nûra te ye ku gulê li hêla afaqan namdar kiriye.)

[2655] **Gulzar**: Baxê gulan, bostanê gulan

[2656] **Hêlîyê ḥusna te**: Neynika bedewiya te, eynika rindahiya te

[2657] **Hub**: Evîn, hezkirin

Yê ku qîrînê bi wan xist lamiʿa[2660] ʿeşqa te bû

8.

Lewr*a* zozan û çeman û lêv*ê* avan da ne ew

Lewr*a* her yek yek ji wanan meʿreża Şama[2661] te bû

9.

Yê ku cergê ʿaşiqan xinc xinc kir û kir tarûmar

Tîr*ê* ebrûyê te bû yan çangulê[2662] biskê te bû?

10.

Dil bi ṣed zencîr*ê* nayêt qeyd kirin carî welê

Yê ku ew qeyd kir girêda têlekî biskê te bû

11.

Pur ġerîb e pur ʿecêb e pehlewanê ʿalemê

Bend*ê* ta`y zulfê te bit yan ṣeyd*ê*[2663] awurê[2664] te bû?

12.

Pehlewan e vewdişîne[2665] şûr di cengan da li pêş

Lê ʿeceb ta girt*î* û tirsok ji ber ʿeşqa te bû

13.

Sîng û ʿenya xu dixist mertal li pêş Rustem*ê* Kurd

Lêbelê wek penb*o*yê jendî li ber bayê te bû

14.

Ma hezar Rustem û ʿEnter[2666] leq bi latê[2667] dil dixin

Yê ku jêr û jor d*a* kir ew movika tilya te bû

15.

Ma hezar şahîn û baz karin n*ê*çîra dil bikin

Yê ku ew ṣeyd kir ji xu ra rind*a*ya rûyê te bû

16.

---

2658 **Der**: Di, di (hundirê wan) de

2659 **Şorevîlk**: Sorewîlk, fîlamîngo

2660 **Lami**ʿ: Rewnak, ronak, sîqal

2661 **Meʿreża Şamê**: Fûara Şamê. Yek ji meşhûrtirîn fuaran e ku bazirgan malên xwe li wir didine nasîn û difiroşin. Li vir bi wateya "pêşangeh" e. Lewra hemî zozan, çîmen, deşt, çiya û hwd. her yekî wan cuda cuda wekî pêşangehek rindahiya Xwedê pêşanî mirovan dikin.

2662 **Çangul**: Çengal, mebest jê xelekên keziyê dîlberê ne

2663 **Şeyd**: Nêçîr

2664 **Awur**: Awir, nêrîn, nihêrîn

2665 **Vewdişîne**: Dihejîne

2666 ʿ**Enter**: Kole, şaʿir û pehlewanekî di zemanê cahiliyê de jiyaye. Yek ji xwediyê helbestekî ye ku ji wan heft helbestên ku di der û dîwarê Keʿbê de hatine dardakirin.

2667 **Lat**: Kevirên mezin, zinar, baxir

Bulbulê dil jar û mest û serx*o*ş û nalan e hey

Yê ku hilkir agirê dil kibr*î*ta ʿeşqa te bû

17.

Kunbeda ḥusn û cemalê ku bi dil vebû xuya

Ew ji wê rojê ḥeta hêj bende û dîlê[2668] te bû

18.

Ma gelo têtin zemanê bulbul û gul dibne cot?

Ah gelo tê roj*a* tê dil mat*ê*[2669] dîdara[2670] te bû

19.

Nay tebata can û dil lewra ku wenda kirne gul

Dilberê werda[2671] min a geş ah tecellaya[2672] te bû

20.

Mewsim û feṣla[2673] beharê ah*î*[2674] dûr bûne ji min

Dilberê feṣla behara min temaşeya te bû

21.

Dil wekî ferxa[2675] kevokê ketye nêv atûn*a*[2676] ʿeşq

Yê ku ew wer kir di wê da şah*î*nê ḥusna te bû

22.

Dil wekî kohê Ararat[2677] ma dibit rabit ji cih

Yê ku ew gêr kir[2678] bi ser hev dozera ʿeşqa te bû

23.

Çîkekî arê evînê[2679] cerg û mîlak[2680] kir kebab

Ma gelo ev dozex e yan germîya roja te bû?

24.

Kî ku rahê ʿeşq*ê* girtê çûye yabana[2681] helak

---

[2668] **Dîl**: Bende, kole, esîr
[2669] **Mat**: Şaşmayîn û mêzekirin
[2670] **Dîdar**: Rû, sîma; nêrîn, awir
[2671] **Werd**: Gul
[2672] **Tecella**: Xuyabûn, diyarbûn, zahirbûna Xwedê
[2673] **Feṣl**: Demsal, mewsim
[2674] **Ahî**: Ah, ax. Dengê keser kîşandinê ye
[2675] **Ferx**: Çêlî, çêlik, têjik
[2676] **Atûn**: Ocax, argûn, firin
[2677] **Kohê Ararat**: Çiyayê Agirî. Li Bakûrê Kurdistanê bilintirîn çiya ye ku nêzî 5.137 mîtro ye.
[2678] **Gêr kir**: Gêr kirin, qulibandin, qulabtin
[2679] **Arê evînê**: Agirê ʿişqê
[2680] **Mîlak**: Cerg, ceger, kezeb
[2681] **Yaban**: Çol, çolistan

Îḥtereqtu fî hewa kum[2682] ah ji ber zulma te bû

25.

ʿEşq dixazit ehl*ê* ʿeşqê navnig û merẕûl[2683] bitin

Qed heweytû min ẕure`l-mecdî[2684] ji ber ʿeşqa te bû

26.

Reḥm*ê* key xanim[2685] li bengî neynika dil da xuyab

Pur zeman e **Ḥusnî** nêva dozexa hecra[2686] te bû

27.

Rah*ê* ʿeşqê bê kenar e pur bi tirs û zehmet e

Nabitin tê da selamet bil ji teqdîra te bû

28.

Ma gelo têtin bi dest durra yetîm[2687] bê neqd*ê*[2688] can

Dilberê, ev nukteya sirrek ji esrarê[2689] te bû

29.

Bay*ê* payîz hate ser baġê gulan da kir xirab

Geş bikey baġê dilan ew zoz*a*n û warê te bû

30.

Leşkerê derdan *ê*riş kir koşk*ê* dil talan kirin

Ġeyretê key lewr*a* her dil kîlera sirra te bû

31.

Dil diṣojit ar*ê* hecrê[2690] ma gelo yara *min* kan?

Çer diṣojî dil bi hecrê dil emekdarê te bû!

32.

Şah*ê* ʿişqê derve hat û mulk*ê* kir têk da wucûd

Cism û can tev da b*û* agir hey hewar ʿeşqa te bû

33.

ʿAlema jîna **Ḥezîn** têk ar û pêtîy û ẓulam[2691]

---

[2682] Di hezkirina we de şewitime.
[2683] **Navnig û merẕûl**: Xax, rezîl
[2684] Ez ji tiltikê/serê/pozê şerefê ketime xwarê.
[2685] **Xanim**: Dilber, yar, evîn
[2686] **Dozexa hecrê**: Dojeha cudabûnê, korîma dûrketinê, şewata veqetînê
[2687] **Durra yetîm**: Ew mirarî û mercanên bijare û giranbiha
[2688] **Neqd**: Dirav, pere
[2689] **Esrar**: Sir, nepen, nehênî
[2690] **Arê hecrê**: Agirê fîrqetê, şewata cudabûnê
[2691] **Ẓulam**: Tarîtî

Reḥm*ê* key cana[2692] li **Ḥusnî** ev ji yaranê te bû

**116.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + − −/− + −

1.

Kan hevala min delala min gelo?

Nazik û şîrînmeş[2693] û dilber û rinda min gelo?

2.

Ah ji ber arê qetanê[2694] perritî tev da wucûd

Dilberê carî xuya key kan*ê* reḥma te gelo?

3.

Wek pepûka jar ji min ra ʿadet e ah û fiġan

Ma dibit carî ji min ra dîtina dostê gelo?

4.

Deng û ahê min h*î*şar kir ta di ezman da melek

Guh didit dost van enîn[2695] û nal*î*nê bê ḥed gelo?

5.

Bulbulê jar bi fiġanan gêj kirin deşt û çîya

Mêrg û baġan da gul û sosin h*î*şar nabin gelo?

6.

Tîn*a* atûna[2696] evînê dil*ê* tazî perritand

Xar venaket[2697] agirê mala xu ġeyretkeş gelo?

7.

Hirifîn baġir[2698] ji teʾsîra fiġanê bengîyan[2699]

Ser didit Ferhad*ê* Şîrîna nefesʿîsa[2700] gelo?

8.

---

[2692] **Cana**: Ey Can. Li vir banglêkirina dilberê heye.
[2693] **Şîrînmeş**: Rêveçûyîna (yarê ya) şîrîn, bi hejîn û xweşik
[2694] **Arê qetanê**: Agirê cudabûnê
[2695] **Enîn**: Nalîn, nalandin
[2696] **Atûn**: Ocax, argûn, firin
[2697] **Xar vekirin**: (Agir) temirandin, tefandin, vemirandin
[2698] **Baġir**: Zinar, lat, kevirên mezin
[2699] **Bengî**: Evîndar, aşiq
[2700] **Nefesʿîsa**: Ew kesê ku nefesa wê wekî Hz. ʿÎsa ye. Yek ji muʿcîzeyên Hz. ʿÎsa ew bû ku bi hêlm/bêhna xwe nexweşan baş dikir, miriyan sax dikir. Ji nefesê mebest peyvek û gotineke xweş a yarê ye.

Kar(i)wan rê girt û borî ez li cî mame tenê

Rênenas û ker û lal çawa ye çara min gelo?

9.

Bar giran e rê d*û*r e her çar awirê[2701] min d*û*man

Ey gelî dostan ku da ma nab*î*nin ḥalêm gelo?

10.

Dor û madorê[2702] di min têk deng û zûrînê guran

Çav li berxê dil dikin kan serşivanê min gelo?

11.

Ev çi war e çi dîyar e, ev çi rêkî zeḥmet e

Rêw*î*kî jar im nizanim rehberê min kan gelo?

12.

Ev çi gûmmîn û *zim*mîn e, ev çi mij û çi d*û*man

Ev çi beyhûde q*î*rîn e, ev çi dewran e gelo?

13.

Şîretê rehber*ê* zana kes xu ra naket heval

Ev çi pefçûn[2703] e li ser vê cîfeyê[2704] mirdar gelo?

14.

Pîr[2705] ji ṣade ʿeql*ê* ra got, ṣadedil be ey bira

Got, dunê da ma ṣefa kes ra heye bêġeş[2706] gelo?

15.

Pîr*ê* gotê, feyż[2707] dixazit dil wekî hêlî[2708] bibin

Got, wuṣa ye bêje min ra çi ye paqişker gelo?

16.

Pîr*ê* got jenga demirê pasgirtî bê miṣqel[2709] diçit?

Şûr*ê* pasgirtî r*a* miṣqel ma ne cihad e gelo?

17.

---

[2701] **Çar awir**: Çar alî, çar hêl

[2702] **Dor û mador**: Hawirdor, çarmedor, derûdor

[2703] **Pefçûn**: Pevçûn, rabezîn, pozberî

[2704] **Cîfe**: Mirar, mirdar, mirî. Mebest jê, dinya ye.

Îşareta hedîsê Pêxember (asw.) jî dike: “Dinya mirarekî ye, yê ku wê hez dike kuçik e.” (Me çavkaniya vê nedît.)

[2705] **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

[2706] **Bêġeş**: Bêtevlihevî, bêtêkilbûn. Mînak, di naz zêr de sifir heye, ku zêr jî sade zêr nîne. (H.)

[2707] **Feyż**: Ji qelb, dil, ruhê mirov re herikîna/hatina ʿilm, nûr, bereket, tiştên manewî û hwd. e

[2708] **Hêlî**: Neynik

[2709] **Mişqel**: Amûrê paqijkirinê wek zinpere, paqişker

Ah*î* ʿumrê xort*î*tîyê bor*î* bê dilber heba
Wî zemanê pur delal ra hey veger dîsa gelo?
18.
Hing*ê* roj bûn gîştina dilber*ê* pur xweş dest diket
Wek birûskê bor*î*n û çûn tête ew furṣet gelo?
19.
Di dunê da ev qetana rûreşa ʿekrût[2710] heye
Ma dihêlit kesk*î*[2711] ra hey jînekê şîrîn gelo?
20.
Pur bi êş û dilkul û mest û xerabê firqet[2712] im
Fir didit ḥuzna[2713] **Ḥezîn** rojek dibit şahî gelo?

**117.**

mefʿûlu / mefaʿîlu / mefaʿîlu / feʿûlun
Hezec – – +/+ – – +/+ – – +/+ – –
1.
Ahî![2714] ji delalê dil*ê* jar dûr b*û*ye îro
Ahî! dil*ê* jar maye d*î*sa bê qer*ar*[2715] îro
2.
Şahîn*ê* qetanê ç*û*k*a* min girt û helanî[2716]
Bê dost û heval mame ḥezîn û ġer*î*b îro
3.
Xazya *min* bi wê çaġ*a* delal tê d*a* liha bû
Derda[2717] ku ji min çaw*a* cuda bû ş*î*r*î*n îro
4.
Ahî ku qetan bû wekî deryaya mezin
Nêv pêl*ê* ġedar mam b*ê* hewar û kelek[2718] îro
5.

[2710] ʿ**Ekrût**: Rûpîs, rûreş, rûtehl
[2711] **Keskî**: Kesekî, mirovekî
[2712] **Firqet**: Cudabûn, cudayî, veqetîn
[2713] **Ḥuzn**: Derd, xem, keser, şayîş
[2714] **Ahî**: Ah, ax. Dengê keserkîşandinê.
[2715] **Qerar**: Sekn, tebat
[2716] **Helanî**: Bilind kir, rakir
[2717] **Derda**: Derdo, ey derd. Li vir banglêkirin heye.
[2718] **Kelek**: Lotke, geştiyê biçûk ê ji bo çem û rûbaran

Ey ṭeyr*ê* li ser beḥr*ê* peya pey digerî

Qebtan*ê* xeberdar k*î* ji ḥalê me tu îro

6.

Can hatîye ser lêv û cesed ġerqeyê[2719] av

Hêvya me tu mayî z*û* biçe bo Xuda îro

7.

Wek tay*ê* li ber bay*ê* çep û rast me dibin pêl

Pursîn*ê* li ḥalê me ġerîqan[2720] bikey îro

8.

Saḥil*ê*[2721] selamet ji te em h*ê*vî dikin

Mînay*a* wiṣalê[2722] ji me ra meqṣed e îro

9.

Ġemkeş*ê* qetanê me, cigerṣoj*ê*[2723] evîn im

Dil pare b*û* ya Reb û beden tirzil*î*[2724] îro

10.

Ew ʿişq*a* ku pêşyê weke dost dan*î*b*û* ser dil

Dil ra b*û*ye wek duşmenekî yaġmeker[2725] îro

11.

Ey desteg*î*rê jar û belengaz û esîran

Qertal*ê*[2726] qetanê dil*ê* jar pare kir îro

12.

Wek baz*ê* neyarê *guj*gujî[2727] ser *ber*xê dilêm

Wek çûk*a* pepûk çîkin*î* dil çû felek îro

13.

Canê me di nêv agir*ê* ʿişqê da ḥelî

Cana bi*key* reḥmê li v*î* jarê reben îro

14.

Bes bêje **Ḥezîn** şîn û g*î*rînê nekey êdî

---

[2719] **Ġerq**: Noq, noqbûn
[2720] **Ġerîq**: Ew kesê ku xeniqî ye, xeniqandin
[2721] **Saḥil**: Qerax, perav
[2722] **Mînaya wiṣalê**: Lengergeha gihîştinê
[2723] **Cigerṣoj**: Ewê ku cegera wî şewitiye
[2724] **Tirzilî**: Şewitî
[2725] **Yaġmeker**: Talanker, ewê ku tartale/talan dike
[2726] **Qertal**: Eylo, hilo
[2727] **Gujgujî**: Êrîş kir

Qelbê me te kir agir û can kir keb*a*b îro

**118.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel − + − −/− + − −/− + −

1.

Pay*î*z e bulbul ji gul dûr ket dilo

Bor*î* gihan hat qetan dîsa dilo

2.

Ah ji dest min çû gula geş bê mefa[2728]

Çeng şikestî, can birîn mame dilo

3.

Baz*ê* hicranê ciger day nav nigan

Wê bela ket tête dora te dilo

4.

Ġem mekey dîsa dibit şahî û kêf

Ma heye ġemgîn*ê* bê dawî dilo

5.

Av di rê da pur bi ah û zarîn e

Piştî çûn deryay dibin kerḥes[2729] dilo

6.

Êş û ahê rêwîyan bêḥed pur in

Tên birîn pişt gîştina bajêr dilo

7.

Bê hedan cehdê[2730] bikey da quṭ bikey[2731]

Vê riha[2732] dûra dirêja zor dilo

8.

Sist mebe yek bistekî[2733] bextê te da

Yek demek ʿumr e di vê rê da dilo

9.

---

[2728] **Mefa**: Menfa'et, sûd, havil, feyde
[2729] **Kerḥes**: Bêdeng
[2730] **Cehd**: Xebat, şixul
[2731] **Quṭ bikey**: Bibire, biqedîne
[2732] **Rih**: Rê
[2733] **Bistek**: Gavek, demekê kurt

Her wekî bulbul dimînî bê murad

Ger nezanî qedr*ê* weqtê xu dilo

10.

Pur hevalan sermeyan wenda kirin

Rûreş û pîşman vegeryane dilo

11.

Ah û wahê min ji tirsa ʿaqibet[2734]

Ku bibî ġafil dema yar bê dilo

12.

Kulle yewmîn hû fiyî şeʾnîn[2735] binêr

Hey t*ê* da her cilweyê yarê dilo

13.

Xiḍr*ê* waye hatîye ber çav*ê* te

Dest xu bermed her wekî Mûsa dilo

14.

Bir*a* bin wek hev li cem te kêf û ġem

Xweş bizan tiştê ji yarê tê dilo

15.

Ṣebr*ê* key wek Eyy*û*bê kurmînbeden[2736]

Da bigêjî bal meqaman ve dilo

16.

Her şevê tarî dibit avis bi roj

Pişt*î* evrazan heye berjêr dilo

17.

Kî dimînit dilkul û ġemgîn mudam

Kî dimînit munqebîḍ[2737] her dem dilo

---

[2734] **'Aqibet**: Dawî, encam

[2735] Her roj ew di halekî cuda de ye. (Qurana Pîroz, Rehman: 55/29) û (bnr. 79/3)

[2736] **Kurmînbeden**: Ew laşê ku kurmî bûye.

Li vir îşareta birînên Hz. Eyyûb dike. Hz. Eyyûb bi sebra xwe tê nasîn. Nebiyê Hz. Îshak e. Hz. Eyyûb kesekî zefh dewlemend bûye, li aliyê Şamê gelek 'erd û cihê wî hebûye, jina wî -Rahme- û gelek zarên wî hebûne. Xwedê xwestiye ku ew bi malê dinyayê were îmtihan kirin. Berê hemî malên wî diçe. Ew şukur dike. Zarên wî yek bi yek dimirin. Ew sebr dike. Nexweş dibe, di bedena wî de birînên kûr vedibin, birînên wî kurmî dibe, ew dîsa şukur dike. Dîsa jî ew û jina wî Rahme 'îbadetên xwe didomînin û şukra Xwedê qet kêm nakin. Dûre, bi îzna Xwedê, Hz. Eyyûb lingê xwe 'erdê dixe. Aveke zelal û xweş cihê ku lingê xwe 'erdê xistiye dizê. Hz. Eyyûb, bi wê avê serê xwe dilo û baş dibe. Îmtihana sebrê qazanç dike û dîsa Xwedê mal, mulk û zar dide wî. Wek pêxember ji herêma Hewran an jî Besaniyê re tê şandin. Navê Hz. Eyyûb di Quranê de li şeş cihan derbaz dibe. (Pala, *b.n.,* 143-144.)

18.

Şah*î* û şînê dunê nîne mudam

Tête dawîya hemî tiştê dilo

19.

Ek[2738] ji kaxa rindîyê[2739] yar bit xuya

Serbiloq[2740] dê bibne sosin hey dilo

20.

Lez digijî meqṣed û razê bilind

Ek li cem te xudb*î*nî[2741] nîne dilo

21.

Bê mefa ye ʿeql û zanîn û neseb[2742]

Koletî şert e di vê rê da dilo

22.

Ah*î* yara min çi çaġê derve tê

Cerg û mîlak[2743] perritîn bin da dilo

23.

Ya **Ḥezîn** îṣbir ʿela îcfaiha[2744]

Pişt*î* şînê tim dibit şahî dilo

**119.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Ji hecra Şah ʿElauddîn[2745] dilê min pare bû îro

Ji ferqê ser ḥetta pê[2746] da beden têk bû kebab îro

2.

Nema me ṣebr û aramek ji ber jana t*î*ra hecrê[2747]

---

[2737] **Munqebiḍ**: Matbûn, qufulîn, kesê bi stres
[2738] **Ek**: Eger, ger, heke
[2739] **Kaxa rindîyê**: Burca rindiyê, burca bedewiyê
[2740] **Serbiloq**: Cureyek ji stirîn e ku rengê wê zer e û zivr e
[2741] **Xudbînî**: Xwe dîtin, quretî, pozbilindî, enaniyet
[2742] **Neseb**: Nîjad, regez
[2743] **Mîlak**: Ceger, cerg
[2744] Ey ew kesê xemgîn (Hezîn) sebrê bikey li ser eziyetdana wî.
[2745] **Şah ʿElauddîn**: Şêx Elauddînê Xezna. (bnr. 71/6)
[2746] **Ji ferqê hetta pê**: Ji sêrî hetta pê, sertapa, seranser
[2747] **Tîra hecrê**: Tîra cudabûnê, tîra dûrketinê

Birîn kûr e elem dişwar û mame bê ṭebîb îro

3.

Wekî goyîn*ê*[2748] ser lat[2749] û zinaran hey me nalîn e

Ji destê me ç*a*wa durra yetîm[2750] derket û çû îro

4.

Felek hicran*a* cuzî[2751] ma nebes bo dil bikey wêran

Qetana kullîya[2752] wey bav te şandî ser w*ê* da îro

5.

Dema dem lehîya pêlê evîn û derd*ê* hicranê

Dilê jar dane nêv pencan wekî şahîn û baz îro

6.

Gelo çûka dilê bêḥal dibit jê ra xelaṣ dîsa

Ji ahê wî semayê da melek ra hev ketin îro

7.

Wekî bulbul şev û rojan w*ê* hey efġan[2753] û nalîn e

Wekî şalûl w*î* hey gîrîn û ahîn û ş*î*n e îro

8.

Ji dest çû sosina reʿna[2754] gelî yaran ç*a*wa bit ḥal

Di yabana qetanê[2755] da tenê mam bê hewar îro

9.

Ş*î*rîn û nazika ser xu delal û dilbera bê ta

Hunav û cerg*ê* me ker kir bi hicrana[2756] elîm îro

10.

Bes e dilber mekey xeşmê[2757] wucûd bû pareyê agir

Ji êş û ḥesret û derdan me ʿestî[2758] zerb*û*ne îro

11.

Wekî tayê li ber bayê me ra sekn û s̱ebat nîne

---

[2748] **Goyîn**: Tivîlk, tivirg. Çivîkek mîna kevokê ye
[2749] **Lat**: Kevirên mezin, zinar
[2750] **Durra yetîm**: Ew mirarî û mercanên bijare û giranbiha
[2751] **Cuzî**: Hinek
[2752] **Kullî**: Giştî, gelemperî, tevahî
[2753] **Efxan**: Fîxan, nalîn, zarezar, nalandin
[2754] **Reʿna**: Rind, bedew, xweşik, spehî, rewnak
[2755] **Yabanê qetanê**: Çola cudabûnê, çolistana fîrqetê
[2756] **Hicran**: Cudabûn, dûrketin, êş û derdê cudabûnê
[2757] **Xeşm**: Xezeb, xişim, hêrs
[2758] ʿ**Estî**: Hestî. Di devoka Kurdên Sûriyê de bi awayî tê bilêvkirin.

Wekî Mecnûn*ê* mame bê d*î*yar û war û yar îro

12.

Leqed ṭaḥe biye`l-hecru felem yubqi siwa resmî[2759]

Femin wecdi ḥebîbi`n-Necdi[2760] ṣirtu keṣṣ*a*ba îro[2761]

13.

**Ḥezîn** û dilkul û mest im bi daġa şîş*ê* hicranê

Elemkêş em xerabxan[2762] im ji feqda[2763] dilberê îro

14.

Îlahî! vê ç*î*ka wey bav nekarim ez teḥemmul kem

Ji luṭfa sermedî[2764] piçek hedanê bide me îro

15.

Yeʿqûb wenda kir û Yûsif şev û rojan w*î* nalîn bû

Welê ruḥê xu yê şîrîn **Ḥezîn** wenda kirî îro

16.

Bi can bû jan*a* Eyyûb û Zekeriya û bil wanan

Bi ruḥ e jan*a* me yara, werin reḥmê li me îro

17.

Fe ente ẕû`l-ʿeṭaya we`l-hibati cud bina ya Reb[2765]

Ji bil te nîne hêvî bo me yê jarê reben îro

18.

Me ra derd û zexê[2766] hecrê nemayed ṣebr û aramî

Birîndar im tu luqman î hewarxaz im ji te îro

19.

Der în deryay*ê* bî payan şudem nîstî xeber ez men[2767]

**Ḥezîn** jar e xerabḥal e mededxaz e ji te îro

---

2759 Cudabûn ez helak kirim, ji xêncî şiklê min tiştek nemaye.

2760 **Necd**: Bajarekî li navbera Iraq û Hîcazê ye. Welatê Leyla û Mecnûnê ye. Işqa Leyla û Mecnûnê li wir qewimiye. **Hebîbi'n-Necdî** jî Leyla ye. Lewra di bajarê Necdê de, li gorî Mecnûn dilberek tenê hebû ku ew jî Leyla bû.

2761 Ji bo ʿişqa dilbera Necdê, îro ez bûme wekî bayê seba. (Ango: ji ber ʿişqa Leylayê, wek bayê rojhelatê sekn û sebat ji min re nîne.)

2762 **Xerabxan**: Malxirab

2763 **Feqd**: Tunehî

2764 **Sermedî**: Bêdawî

2765 Ya Rebbî, tu yî xwediyê dayînan, ji me ra comerdiyê bike

2766 **Zex**: Dozex, dojeh, cehennem

2767 Di wê behra bêdawî de ez ketî me (wenda bûme), xeber jî ji min tune ye.

**120.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Tête qelbê me ji yarê pêl*ê* luṭfê nû bi nû

Dil diçîne ji baġê yar gulx*û*yanê[2768] rû bi rû

2.

Hat behara dil şukur xemlî bi wan geş ṣorgulan

Tê ji beḥra luṭf*a* yarê feyż û nisbet cû bi cû[2769]

3.

Gaz*ê* Mûsa ger bidîta ev tecella[2770] û şuûn[2771]

Dê li şûnê pêketa desta dibû xalî diçû

4.

Mest*ê* ḥaletê dil im ez bengîyê nûra Xuda

Wek s*î*perrik can didim lew bûm bi yarê rû bi rû

5.

Ma gelo ev qab*ê* qewseyn[2772] e weya xulda berîn[2773]

Tê dixuyê birh*ê* yarê ji dilan ra mû bi mû[2774]

6.

Nêz*î* nêrîna *ḥeq*q î, ey dil h*î*şar û jîr*î* be

Da ji yarê qamç*î*yê hêrsê nebînî zû bi zû

7.

Henberê sosin*a* ḥusnê, ne *î*ro dil cez̠be ye

Ta elest[2775] da bulbulê dil mest*ê* rindîya te bû

8.

Bengîyek wuṣay bi lorînan t*î*ne xar baġiran[2776]

---

[2768] **Gulxû**: Ew xûyê ku mîna gulan xweş, başexlaq, xweşsinc
[2769] **Cû:** Co, cûh, cew
[2770] **Tecella**: Diyarbûna Xwedê, xuyabûna Xwedê
[2771] **Suûn**: Tecelliyata Xwedê, li ser tiştan, kelmelan, karan diyarbûna Xwedê
[2772] **Qabê qewseyn**: Bi qasî navbera herdu birîyan. Li vir îşareta nêzîkbûna wî dike.
[2773] **Xulda berîn**: Bihişta ezelî.
**Xuld**: yek ji wan heşt tebeqeyên cennetê ye
[2774] **Mû bi mû**: Ta bi ta
[2775] **Elest**: Bezma elest, peymana elest. Xwedê Te'ala gava ku 'alema ruhan afirand ji wan re wiha got: "Elestû bî Rebbîkûm?" (Ma Ez rebbê we nîn im?) Hingê ruh jî wiha bersiv dan: "Kalû, bela." (Belê, Tu rebbê me yî.) Ew bûyer di Qurana Pîroz de derbaz dibe. Ew cihê ku ruh hemî berayî bal hev bûne re "bezma elest, meclîsa elest", wê rojê re "roja elest" û sozdayîna wê rojê re jî "peymana elest" tê gotin. (bnr. 68/16)

Hêstirê xûn in dibarîne ji çavan sû be sû[2777]

9.

Ahî́nê têtin ji wî hejîn bi gazê gir[2778] dixin

Wek dilê xûnbarî́n û pur nalî́nê me kes nebû

10.

Rindîya yarê temam e ʿişq*a* dil derket ji ḥed

Agirê ʿişqê ġedar e pepû́kê dil çûk*a* dû[2779]

11.

Çer[2780] dibit ḥalê **Ḥezîn** tim karế wî ra ev şewat

Reḥmế key yara, li dil wî çav bi luṭfa te vebû

**121.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Birîndar im bi wan burhê[2781] te yê şûrîn ji dil îro

Elemkeş im ji ber biskê[2782] te yê şîrîn bi can îro

2.

Cefa û êşế hicranê[2783] nikarin em teḥemmul kin

Bi vî ḥalê me tê yara, gî́rihê[2784] duşmenan îro

3.

Dibarînin mî́na xûnê ji çavan hêstiran dilber

Tếte der tev li ahînê letey[2785] cerg û dilêm îro

4.

Behara xortî́yê borî me yara xu nedît carek

Nî́vê ‘umrê delal borî bi gîrîn û şî́nê îro

5.

---

[2776] **Baġir**: Kevirên mezin ên li ser hev suwar bûne, lat, zinar
[2777] **Sû be sû**: Hêl bi hêl, her alî, het teref
[2778] **Gazê gir**: Çiyayê mezin
[2779] **Dû**: Duh, do
[2780] **Çer**: Çawa
[2781] **Burh**: Birî, birh
[2782] **Bisk**: Porê jinan a ku li ber guhê wan der tê û bi xelek e.
[2783] **Hicran**: Cudabûn, dûrketin, êş û derdê cudabûnê
[2784] **Gîrih**: Gîrîn
[2785] **Letey**: Parçe, kerî, teltê xwînê, teltê cigerê

Gelo bi gîştina dostê dibit şabe dilê pur ġem?
Weya her dem elemkêş em bi hicranê mína îro
6.
Me hêvî hey ji te cana, nevêjî dil ji dergahê
Di xêra ġeyrê[2786] da, bil te wî çav nîne tu car îro[2787]
7.
Bi ṣed zencîrê pola[2788] xu girêdaye bi te cana!
Hezaran vînç û motor bên ji te naqetínin îro
8.
Wuṣa dara evîna te ríçik berdaye nêv dil da
Hezaran çerx hebin dîsa ji dil dernaxínin îro
9.
Bi agirê evînê dil wuṣa kelay bi te dilber
Hemî ceyşê[2789] Çínê bêtin ji te dûr naxínin îro
10.
Ḥeyata min bi te`y dilber, şewata min ji te`y dilber
Xebata min te ra`y dilber, şírînruh î me ra îro
11.
Gula baġê dil î dermanê cerga xilxilî[2790] yara!
Nûra çavê kul î min ra tu Zîn û Şîrín î îro
12.
Ne rawestem demek bê te, níne qeṣdek me ra bê te
**Ḥezîn** mest e *her* roj bo te ji can ra tu jín î îro

**122.**

mustef`ilun / mustef`ilun
Recez – – + –/– – + –
1.
Behar*a* rengîn hatîye
Baranekî xweş barîye

[2786] **Ġeyr**: Ji bilî, xêncî
[2787] Ji bilî te ey Yar! çavê wî li tu kesî nîne, çavê wî tenê di xêra Te de ye.
[2788] **Zencîrê pola**: Zencîra çelîg
[2789] **Ceyş**: Leşker
[2790] **Cerga xilxilî**: cerga parçe parçe bûyî, cegera pirtî pirtî bûyî

Sosin û gul pê şîn b*û*ye

Rabe ji xew rabe dilo

2.

Wîlwîl*ê* ṭeyran û ṭuyan

Xuşxuşê daran û gîyan

Nêzê ku saġ kin mirîyan

Rabe ji xew rabe dilo

3.

Zozan û berrî û gelî

Behar kulîlkê xemilî

Ji her derê av dikelî

Rabe ji xew rabe dilo

4.

Qaz û quling çûn serḥedê

Feyż pel didit ji merqedê[2791]

Hîşyar bibe ji boy Xudê

Rabe ji xew rabe dilo

5.

Wer ṣuḥbeta Xeznewîyan[2792]

Dilan didin ber ṭavîyan[2793]

Bejan[2794] dikin wek avîyan[2795]

Rabe ji xew rabe dilo

6.

Nisbet*a* neqşî[2796] pir dihat

Ji bo w*ê* çêbûne civat

Roj hilb*û*ye ji rojhelat

Rabe ji xew rabe dilo

7.

Bi nûr û nuṣḥê[2797] Eḥmedî[2798]

---

[2791] **Merqed**: Gor, tirb

[2792] **Xeznewîyan**: Li vir qesda şêxên Xeznewiyan dike

[2793] **Tavî**: Rejne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demek kurt dibare

[2794] **Bej**: ‘Erd, reşahî, cihê bê av

[2795] **Avî**: Cihên bi av, avgîz, rifse

[2796] **Nîsbeta neqşî**: Bêr û bereketê şêxê neqşiyan

[2797] **Nusḥ**: Şîret, pend

Gelek*î* hov bûne kedî

Zadê dilan pê serridî[2799]

Rabe ji xew rabe dilo

8.

Boy çi *hês*tiran nak*î* xar

Wek şêwîyan may ist*û*xar

Tenê s*ê*va te ma li dar

Rabe ji xew rabe dilo

9.

Dûr may ji bustanê gulan

Bi fersexan[2800] û menzilan

Rabe bixûn wek bulbulan

Rabe ji xew rabe dilo

10.

Cerg û hunav têk perritîn

Can û cesed têk şewitîn

Mirî di goran lebiṭîn

Rabe ji xew rabe dilo

11.

Şîn û g*î*rînê pir bikey

Bi hêstiran çav kul bikey

Xalyê li serê xu bikey

Rabe ji xew rabe dilo

12.

Tevda heval çûn menzilan

Gîştin murad û şorgulan

Bes e b*o*rîn dewr û zeman

Rabe ji xew rabe dilo

13.

Bes e *dûr* be ji ġefletê

Ḥeq ra bikey ʿibadetê

---

[2798] **Ehmedî**: Şêx Ehmedê Xezna. (bnr. 9/27)
[2799] **Serridî**: Seridîn, silmgirêdan, sinbilgirtin, ûşîgirtin
[2800] **Fersex**: Yekeya dirêjahiyê ya kevn. Nêzîkî 5 km ye.

Îro ṣibê celba[2801] te tê
Rabe ji xew rabe dilo
14.
Gelek birîndar î ji dil
Hindûr li te tev bûye kul
Nayê b*î*ra te qeṭ mezel[2802]
Rabe ji xew rabe dilo
15.
Hîna heye firṣet te ra
Çarek*î* bibîne xu ra
Kan li ku ne bav û bira
Rabe ji xew rabe dilo
16.
Te`j bor*î*yan ʿibret negirt
Te`j mayîyan leẕẕet negirt
Te`j baqilan şîret negirt
Rabe ji xew ra be dilo
17.
Dunya ne ya dildan*ê* ye
Warê k*a*r û westan*ê* ye
Şûna *der*d û qetan*ê* ye
Rabe ji xew rabe dilo
18.
Rabe ji xew rabe ji xew
Her kes gihîşt jînek bedew
Me ra tenê ma nan û dew
Rabe ji xew rabe dilo
19.
Xande bikey zarok*ê* xu
Nezan nebe bi dînê xu
Girêde dil bi Rebb*ê* xu
Rabe ji xew rabe dilo

[2801] **Celb**: Kaxeza ku hakim/dadger ji mirovan ra dişîne
[2802] **Mezel**: Gor

20.

Ellah bibêje ew bes e

Ê dî hemî xar û xes[2803] e

Ḥeyat bizan yek nefes e

Rabe ji xew rabe dilo

21.

Tu ʿaciz î kara[2804] ew e

Tu cahil î zana ew e

Tu ġafil î haydar ew e

Rabe ji xew rabe dilo

22.

Were were pir pir bi lez

Bal xastina ḥeq ve bibez

Li cî bihêl peran û pez[2805]

Rabe ji xew rabe dilo

23.

Îro te hey keys û feṣal[2806]

Dest xu bixe nûra zelal

Lewra bi wê ye her kemal

Rabe ji xew rabe dilo

24.

**Ḥezîn** birije hêstiran

Li ser *a*p û bav û biran

Dîn dane zêrran û peran

Rabe ji xew rabe dilo

**123.**[2807]

faʿilatun / faʿilatun

Remel − + − −/− + − −

1.

---

[2803] **Xar û xes**: Li vir wateya vê ev e; yên din ne girîng in. Wek; Xwedê heye xem tune ye!
[2804] **Kara**: Qewî, bihêz, yê ku dikare
[2805] **Peran û pez**: Pere/dira û pez/heywan. Li vir mebest mal û mulkê dinyayê ye
[2806] **Keys û feşal**: Fersend
[2807] Hezîn di sala 1987’an de, beriya ku çûyîna Stenbolê, gava cudabûna ji welatê Kurdistanê nêz dibe, dinivîse. (Dîwana Hezîn, r. 379)

Çiq*as* bêjim tu ş*î*rîn î

Pir delal û ġemrevîn î

Wek *cen*neta derewîn î

Ax welato ax welato

2.

Çiq*as* bêjim tu h*ê*ja yî

Bi çem û çîm û geha yî

Tu d*a*yînekî Xuda yî

Ax welato ax welato

3.

Çiq*as* bêjim tu delal î

Bi ç*î*ya û bi newal î

Bi z*o*zan û deşt û pal î

Ax welato ax welato

4.

Ġulġulê avê delavan

Gerr û geşta noqziravan

Meskenê bapîr û bavan

Ax welato ax welato

5.

Şer*ev*dîn[2808] û Men*eş*kût[2809] î

Hez*ar*gol û Qer û Rût[2810] î

Sibl*û*s[2811] û Taroy*ê* qot[2812] î

Ax welato ax welato

6.

Bilq*î*nê avê k*a*nîyan

Bar*î*nê berxan û mihan

Kalk*a*lê kar û b*ê*rîyan

Ax welato ax welato

---

[2808] **Şerevdîn**: Navê çiyayekî li bakûrê Solaxanê ye.

[2809] **Meneşkût**: Navê herêmê ye ku ji Solaxanê heta çemê Bingolê dirêj dibe. Li wir birinc diajon û bizinê wê namdar in.

[2810] **Qer û Rût**: Li Çewlîgê navê du herêman in ku Qer bi darên xwe ve, Rût jî bêdarbûna xwe ve namdar in.

[2811] **Siblûs**: Çiyayekî di navbera Dêrsîm û Çewlîgê de ne.

[2812] **Taroyê Qot**: Taro çiyeyekî li ber Siblûsê ye. Serê wê çiyayê bêdar e, ji ber vê Taroyê Qot dibêjin. **Qot**: Keçel, rût

7.

Kur*dis*tan î navgiran î

Bi *A*rarat[2813] û S*î*pan[2814] î

Xudî nîşan xudî şan î

Ax welato ax welato

8.

Ah*î* çawa qeta **Ḥezîn**

Ji wî welatê kesk û şîn

Ji w*an* deşt û gaz*ê* şîrîn

Ax welato ax welato

9.

Me n*a*n û niʿmet*ê* te xar

Me p*ir* vexar ew *a*vê sar

Ah*î* ji dest me ç*ûy* biġar[2815]

Ax welato ax welato

10.

Tev mela û tev *za*nîn bûy

Tev *ex*laq û tevd*a* dîn bûy

Tevd*a* kesk û zer û şîn bûy

Ax welato ax welato

11.

Tevd*a* mêrê pozberan bûy

Cî û meskenê *dil*ber bûy

Xez*î*na xêr û b*ê*ran bûy

Ax welato ax welato

12.

Tev ç*î*ya û deşt û gaz bûy

Tev quling û kew û qaz bûy

Tev dewar û hesp û pez bûy

Ax welato ax welato

13.

---

2813 **Ararat**: Navê çiyayê Agiriyê ye. Li Bakûrê Kurdistanê bilintirîn çiya ye ku nêzî 5137 mîtro ye.

2814 **Sîpan**: Sîpanê Xelatê. Yek ji bilintirîn çiyayên Bakûrê Kurdistanê ye. Li berava bakûrê Behra Wanê ye. Nêzî 4058 mîtro ye. Herwiha çîroka Siyabend û Xecê li wir derbasbûye.

2815 **Biġar**: Bilez, zû bi zû

Dicle`w Ferat bask*ê* te ne

Ḥerr*a*n û Çat[2816] ber*ê* te ne

Agrî`w Xelaṭ mil*ê* te ne

Ax welato ax welato

14.

Şer*î*ʿeta Mu*ḥem*medî

Ten*ê* li erḍa te me dî

Wek te ew jî ma b*ê* xudî

Ax welato ax welato

15.

Meraq nekin rojekê tê

We r*a* dibe xêr*a* Xudê

Xell*a*ṣî we ra ç*ê* dibê

Ax welato ax welato

**124.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

Me ajot genimek dosto

Di nîrê[2817] wî d*a* ey dosto

2.

Behar lê hat hewa xweş çû

Heşîn bû çirp*o*zek[2818] dosto

3.

Dema ket ber serî danî

Me carek lê n*ê*rî dosto

4.

Dema xweş dî me rengê wî

Ji dil şa bûn xu ra dosto

---

[2816] **Ḥerran:** Navê herêmê ye ku li başûrê Rihayê cih digire. Ji aliyê dîrokê ve gelek dewlemend e.
**Çat**: Oxlê. Navçeyeke bajarê Erziromê ye.

[2817] **Nîr**: Darê ku du ga û gamêş pê tên zeftkirin, dema cot pê tê kirin yan jî ʿerebe pê tê kêşan.

[2818] **Çirpoz**: Debr, bizar, ziyan. Debra ku hîna nû zîl daye. Ew genimê ku hêj nû şîn dibe, hîna bejn lê çênebûye.

5.

Ji kêf û şahîyan wer bûn

Nigê me erḍ negirt dosto

6.

Dema qenc seridî[2819] dîsa

Me nêrîn kir li wî dosto

7.

Serî bûye wekî çûkan

Wekî qamîş e ṣap dosto

8.

Me got ev genima bes tê

Ji xarina me ra dosto

9.

Ji bayê teqd*î*rê ġafil

Bibûn wê dem*ê* em dosto

10.

Ji nişkiv tilpekî ʿewran

Gurîn pê ket li ser dosto

11.

Di ser da bar*î* zîpikek

Wekî gûz û deqan[2820] dosto

12.

Genim wer hûr kir û raxist

Li erḍê kir xesîr[2821] dosto

13.

Dû ra tavek bi tîn da ser

Şewitand kir z*û*rî[2822] dosto

14.

Qijilî bû kepek, dane

Nema aja tenek[2823] dosto

---

[2819] **Seridî**: Seridîn, silm girêdan, sinbil girtin, ûşî girtin, şonik girêdan
[2820] **Deq**: Wek fêkiya dara çamê. Bi tirkî kozalak, bi îngîlîzî cone tê gotin.
[2821] **Xesîr**: Xesîl, ew berika ku bi giha û kamûşan ve tê honandin
[2822] **Zûrî**: Wek komir reş, şewitî
[2823] **Tenek**: Lib, libek, heb

15.

Çawa çû ser*î* û dane

Wuṣa ka jî nema dosto

16.

Li êr man[2824] her wekê sêwyan

Me dest ket paşilê dosto

17.

Xebata me b*û* beyhûde

Şahîya me b*û* şîn dosto

18.

Ji xu man bê *î*dare em

Zeman jî çû ji dest dosto

19.

"Qul len yuṣîbena îlla"[2825]

Kete bîra me ey dosto

20.

Me zanî tê heye sirrek

Lewma rizq çû telef dosto

21.

Me ra muṭleq[2826] heye sûcek

Bela hat ser me da dosto

22.

Wegerne[2827] cam*ê*rê dayî

Şûva[2828] nagi*rit* tişt dosto

23.

Xudayê pur kerîm bê sûc

Kesî nadit ʿeẕab dosto

24.

Me hûra hûr li ḥalê xu

Pêşîyê da n*ê*rî dosto

---

[2824] **Li êr man**: Li şûna xwe man

[2825] Îşareta vê ayetê dike: Bibêje: Ji ya ku Xwedê Teala ji bo me nivîsî pê ve qet tiştek nagihîje me. Xwedê arîkar û piştevanî me ye, vêca bila bawermend xwe tenê bispêrîn Xwedê Teala. (Tewbe: 9/51)

[2826] **Muṭleq**: Teqez

[2827] **Wegerne**: An na, yan na

[2828] **Şûva**: Şûnde

25.

Li henber fikr*ê* xuya kir

Me ra van suc*a*na dosto

26.

Dema ajotinê natye[2829]

Gotin, navê Xuda dosto

27.

Dema çirpozb*û*nê natye

Gotin maşae`llah[2830] dosto

28.

Dema serdan*ê* natiye

Kirin şukrê Xuda dosto

29.

Wuşay yek leḥẓekî[2831] dosto

Mebe ġafil ji heq dosto

30.

Gihayê ġafilê bê ẕikr

Serî tê jê kirin dosto[2832]

31.

Me dîtiye ji peyġember

Weha ḥedîs*ê* da dosto

32.

Ġezalî[2833] rojekê dosto

Çû cem zatekî ey dosto

33.

Nêrî xelq cot dike lê ew

Zevîyê tov dikey dosto

34.

Hevalê xu r*a* got, rabe

Zevîyê tov bikey dosto

---

[2829] **Natye**: Nehatiye. (Dema ajotinê navê Xudê nehatiye gotin)
[2830] **Maşae`llah**: Xwedê wî/wê biparêze
[2831] **Yek leḥẓekî**: Demek kin, qasek
[2832] Îşareta hedîsê şerîf dike: Ew gihayê ku zikrê Xudê nake, hişk dibe.
[2833] **Ġezalî**: Îmamê Xezalî. (bnr. 8/23)

35.

Ji bo bîstek[2834] were ew zat

Li cem me rûbine[2835] dosto

36.

Ji feyża wî bibit geş qel-

bê me yê pirmilî[2836] dosto

37.

Bi hesanê[2837] şîretê wî

Ji bo tûj kin ʿeqil dosto

38.

Ji deryaya z*a*nîna wî

Vexûn em çilkekê dosto

39.

Dema dostê Ġezalî çû

Jê ra got tu biçe dosto

40.

Ġezalî ra bikey ṣuḥbet

Ji bo te hatîye dosto

41.

Tu here cem, dêla[2838] te ez

Zevîyê tov dikem dosto

42.

Got, ew kara tu car nabit

Bitirsim ez ji te dosto

43.

Bi ġeflet bav*ê*jî tuxûm[2839]

Ḥeram key rizq*ê* me dosto

44.

Dema em jî bixwin bin da

Wêran ket qelb*ê* me dosto

---

[2834] **Bîstek**: Gaveke kurt, demeke kin
[2835] **Rûbine**: Rûnê
[2836] **Pirmilî**: Çilmisî
[2837] **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û kêrê tûj dikin, kevirê tûjkirinê
[2838] **Dêl**: Şûn, dews
[2839] **Tuxûm**: Tov

45.

Xarin cîran*ê* qelb e, ger

Bi ġeflet biçe zik dosto

46.

Dibit ġafil wekî wê dil

Wuṣay hîşar be ey dosto

47.

Bi ġafilîy*ê* duşmen jê

Diket serê te her dosto

48.

Bi ġafilîy*ê* nigê renc-

beran vedide mar dosto

49.

Bi ġafilîy*ê* şofêr peʿn

Dikey meʿṣûm*ê* jar dosto

50.

Bi ġafilîy*ê* av û ba-

ġiran[2840] da wer dibî dosto

51.

Bi ġafilîy*ê* her talan

Dikey mala xu tu dosto

52.

Bi ġafilîy*ê* rûperût

Diçî gora t*a*rî dosto

53.

Hemî ṭofan*ê* tên ser te

Ji rû ġeflet*ê* ne dosto

54.

Bi bayê ġefletê Şeddad

Digel qewmê xu çû dosto

55.

Bi berqa[2841] ġefletê Qarûn

---

[2840] **Bağir**: Kevirên li hev siwar bûne û bi rêz dirêj bûne. Lat, zinar

[2841] **Berq**: Birûsk, birq, tirîşke

Digel malê xu çû dosto

56.

Bi pûka[2842] ġefletê Firʿewn

Di deryayê d*a* çû dosto

57.

Bi tîra ġefletê Nemrûd

Mir û bêşûn b*û* lo dosto

58.

Eger wan ra heba qelbek

Hîşar û zan*a* lo dosto

59.

Li henber qaṣidên jorîn[2843]

Xilaf nedikirin dosto

60.

Bi qurretîy*ê* pozê xu

Bilind nedikirin dosto

61.

Ji ṭofanê semawî[2844] ra

Hedef nedib*û*na dosto

**125.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

Xudayê pur kerîm[2845] daye

Te, dûrbîna ʿeqil qelbo

2.

Bi dûrbînê binêre qenc

Hîna nig bav*ê*je qelbo

---

[2842] **Pûk**: Bager, bahoz, bazor

[2843] **Qasidên jorîn**: Mebest jê ew pêxemberên mezin in ku li hemberî Nemrûd, Fir’ewn, Qarûn û Şeddadî, peyama Xwedê anîne. (H.)

[2844] **Ṭofanê semawî**: Nemrûd, Qarûn, Firʿewn û Şeddad li hember pêxemberên zemanê xwe sekinîn, ji wan bawer nekirin. Dawiyê de jî bi tofanên awarte, tofanên ne bi sirûştî ve helak bûn. Ango ew tofanan rasterast bi destê Xwedê ve hat rakirin. Ji ber vê yekê *tofanê semawî* hatiye gotin. (H.)

[2845] **Kerîm**: Ew ê ku camêrî, merdî û kerema wî pir e û bêpirsîn dide

3.

Bibîne dawîya karan[2846]

Hîna dest pê bikey qelbo

4.

Wegerne[2847] zû dibî pîşman

Ji karê xu hilo[2848] qelbo

5.

Wuṣay ġafil nebe ey dil

Ji karê xu tu car qelbo

6.

Di her karê di her ḥalê

Xuda bîr bîne lo qelbo

7.

Binêre ʿalema ṭeyran

Bi şev xew nakirin qelbo

8.

Li ser gulyan[2849] dixunin ew

Ḥetta ṣubḥa[2850] *ro*nî qelbo

9.

Eger hîşar*î* nîne wîl-

wîla wan beyh*û*de qelbo

10.

Digirî ger tu zana bî

Ji wanan ʿibretê qelbo

11.

Çima dîkê li ser taran[2851]

Bi şev qîrîn dike qelbo

12.

Çima kurkur*î*kê avan

Bi şev kurîn dike qelbo

---

[2846] **Kara**: ʻÎş, şixul
[2847] **Wegerne**: An na, yan na
[2848] **Hilo**: Hîşar be
[2849] **Gulî**: Çiqilî darê, şaxê darê
[2850] **Şubḥ**: Sibe
[2851] **Tar**: Rewtên ku mirîşk li ser dilûsin

13.

Çima pisîk*a* ber aran[2852]

Bi şev mirrîn dike qelbo

14.

Çima çirzêl*a* kêranan[2853]

Bi şev çîvçîv dike qelbo

15.

Neba zorek li paş wanan

Çima bê xew diman qelbo

16.

Neba emrek li ser wanan

Çima bê vês[2854] diman qelbo

17.

Neba tirsek di dil wan da

Çima şevxan[2855] dibûn qelbo

18.

"We lîllahi yusebbiḥu"[2856]

Xuda gotî me ra qelbo

19.

Ji emrê ḥeq r*a* her tiştek

Bûye amade ey qelbo

20.

Bi ẕikrê ḥeq seraser ka-

inat meşġûl e lo qelbo

21.

Evîna ḥeq heye ruḥê

Hemî tiştê d*a* ey qelbo

22.

Riżaya çêkerê ʿalem

---

[2852] **Ar**: Agir

[2853] **Kêran**: Ew dara ku davêjin ser bana. Mertek

[2854] **Vês**: Behn, nefes

[2855] **Şevxan**: Ewê ku (bilbil, şalûl û hwd.) bi şev dixwîne

[2856] Îşareta vê ayetê dike: (Ya Muhemmed!) Ma tu nizanî ku yên li erd û asîmanan hene û teyrên li hewayê basikvekirî, (ev tev) Xwedê Teala pak didêrin (û jê re nimêj dikin)? Her yek ji wan nimêj û tesbîhê xwe zanibûne. Xwedê Teala bi ya ku ew dikin dizane. (Nûr: 24/41)

Dixazit kaînat qelbo
23.
Seraser camidat[2857] û ca-
niwer[2858] ẕikrê d*a* ne qelbo
24.
Demek ġafil nikarin bin
Ji ẕikr û tesbihan qelbo
25.
Dema insan û cinan da
Hebû qurret*î* pur qelbo
26.
Xudanînî[2859] ji bo çêbit
Qurretî jê biçit qelbo
27.
Xuda ferż kir li ser wanan
Ji bo xu koletî qelbo
28.
Dema bê can sukût û ʿişkî-
tî[2860] wan ra x*û* bû qelbo
29.
Ji bo ḥemd û ṣenayê xu
Xuda ew çêkirin qelbo
30.
Ji bo bin da nebin mirî
Li wan ferż kir ẕikir qelbo
31.
Nebêje ew cemadin[2861] çer
Dinasin Xaliqê qelbo
32.
Weya ney ber dilê te ew

---

[2857] **Camidat**: Bêruh, bêgiyan, ne zindî
[2858] **Caniwer**: Biruh, bigiyan, zindî
[2859] **Xudanînî**: Dilnizmî, nefsbiçûkî
[2860] **ʿIşkîtî**: Bê ruh, bê giyan, camid
[2861] **Cemad**: Bêruh, bê giyan

Nikarin ẕikr*ê* kin qelbo

33.

Binêre van miṯalana[2862]

Te ra ew ders bes e qelbo

34.

Digel wanê me pêş da got

Bide guh van*ê* tên qelbo

35.

Di destê serwerê ʿalem

Ġîçikan[2863] ẕikr nekir qelbo

36.

Kevir û dar*ê* rast hatî

Selam lê nedikir qelbo

37.

Koka ʿişka d*a*ra xurmê

Nenalî bo Resûl qelbo

38.

Bi îşmara[2864] w*î* ya pîroz

Heyîv nebû du ker qelbo

39.

Ji bo teṣdîq*a* peyġember

Nema roj ber *a*van qelbo

40.

Ç*î*yay ḥeq lê tecellî kir

Hejîn ma pê neket qelbo

41.

Kevir kinca M*û*sayê ta-

zî negirt û nebir qelbo

42.

Wuṣay îdrak*a* lahûtî[2865]

Heye her tişt*î* da qelbo

---

2862 **Miṯal**: Mînak
2863 **Ġîçik**: Xîçên biçûk, kevirên biçûk
2864 **Îşmar**: Îşaret
2865 **Lahûtî**: Îlahîyet, tiştê îlahî, ‘alema îlahî

43.

Ṣenayê[2866] ḥeq didit her tişt

Bi wê îdrak*ê* her qelbo

44.

Dibin sernerm*ê* fermanê

Bi wê îdrak*ê* ew qelbo

45.

Eger pê ra neba îdrak

Dema ṭofana ʿAd[2867] qelbo

46.

Hemî ʿalem dida ber xu

Mebe cahil bes e qelbo

47.

Eger îdrak neba gerra

Sitêrê camid ey qelbo

48.

Feżayê da bi aheng û

Bi sîstem çêdibû qelbo

49.

Weya dewra zeman û ha-

tina van mewsiman qelbo

50.

Çawa çêbit nebit nûrek

û îdrak û hesîn[2868] qelbo

51.

Çima tim nabe zivistan

Weya havîn hilo qelbo

52.

Ji gera band*ê*[2869] û rojê

Evanan çêdibin qelbo

---

[2866] **Ṣena**: Pesnandin, wesfandin, pesn dan

[2867] **'Ad**: Navê wê qewmê ye ku Hz. Hûd ji wan re hatiye şandin, lê jê bawer nekirine û di dawiyî de wekî qewmên din helak bûne. Di Qurana Pîroz de behsa wan dike. bnr. Qûrana Pîroz, Fussilet: 41/15.

[2868] **Hesîn**: Hesandin, agahdar kirin

[2869] **Band**: Dinya

53.

Bibêjî her wekî maddî

Ji meʿnê rût *î* tu qelbo

54.

Kê ye ew ger bi wî awa-

yê qenc xelq kirîye[2870] qelbo

55.

Kî ew qanûn*a* danîye

Ji roj û band*ê* ra qelbo

56.

Çima derbaz n*a*bin ma ew

Ji ḥeddê xu tu car qelbo

57.

Xuyadê lemyezel[2871] danî-

ye wan ra qaʿide`l qelbo

58.

Dû ra daye piçek îdrak

Ji wanan ra hilo qelbo

59.

Bi wê îdrak*ê* nas dikin

Xudayê lemyezel qelbo

60.

Bi wê îdrak*ê* der nayên

Ji wê qanûn*a* qenc qelbo

61.

Bi wê îdrak*ê* tesbîh û

Ṣenayan her didin qelbo

62.

Eger îdrak nebit çawa

Dikin tesbih*ê* ḥeq qelbo

63.

Eger îdrak nebit çawa

---

[2870] **Xelq kirîye**: Afirandiye

[2871] **Xudayê lemyezel**: Ew Xwedayê ku tu car wenda nabe û her heye

Dinasin Xaliqê qelbo

64.

Çi ye meʿna “we lîllahi

yusebbihu”[2872] hilo qelbo

65.

Eger îdrak û tesbih û

Nûr û nasî nebin qelbo

**126.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

Meha temmûz*ê*[2873] lo xorto

Rojekê germ b*û* pur xorto

2.

T*î*na ṭavê li me zor kir

Beden bû wek pureng[2874] xorto

3.

Ji bo hûnik be canê me

Ketina av*ê* xast xorto

4.

Me da rê çûne ber çemkî

Li avê me n*ê*rî xorto

5.

Zemankî av*ê* fikra me

Da ber xu girt û çû xorto

6.

Xeyala me wulo noq bû

Di avê da hilo xorto

7.

Jixu germî ji bîr kir me

[2872] Bnr. Qurana Pîroz, Nûr: 24/41 (û bnr. 125/18)

[2873] **Meha temmûzê**: Tîrmeh

[2874] **Pureng**: Pereng, kozir, pol, pêta êgir,

Xu jî bîr kir me lo xorto

8.

Ji ġeyrê resmekî camîn[2875]

Ji avê çav nedît xorto

9.

Dema fikra me para hat

Kete kinca serî xorto

10.

Me dît çem tij*î* masî ye

Dileyzin ew mudam[2876] xorto

11.

Ji ġeyrê lîztikê[2877] nîne

Ji wan ra karek ey xorto

12.

Me got, qelbê xu da nîne

Ji masʿyan ra zîyan xorto

13.

Wuşay bo çi belay purê

Mezin ser wan d*a* tên xorto

14.

Li hêlek mar û leşşar[2878] in

Li hêlek hev dixûn xorto

15.

Li hêlek xişt û tor û tarp[2879]

Li hêlek dînemît xorto

16.

Bi lehîyek bi milyonan

Dixendiqin diçin xorto

17.

Komek mêrê n*é*çîrvanan

---

[2875] **Camîn**: Weke camê
[2876] **Mudam**: Her tim, her dem
[2877] **Lîztik**: Lîstik
[2878] **Leşşar**: Lehî, lêmişt
[2879] **Xişt û tor û tarp**: Her sê jî amûrên ji bo masîgirtinê ne.

Hezaran derdixe xorto

18.

Teqandina d*î*nemîtkî

Dikujit bêḥisab xorto

19.

Me bîst[2880] dengek dizî hat me

Go, guh de[2881] me demek xorto

20.

Ji bo masî bûne ġafil

Ji ẕikr û tesbiḥan xorto

21.

Ji bo hey hey dileyzin ew

B*î*ra kirne Xuda xorto

22.

Ji bo pêk nay*î*nin karê

Ji bo wî çêb*û*ne xorto

23.

Belay mezin li wan barîn

Vekey çavan binêr xorto

24.

Kevirê ding[2882] û dîwaran

Hesanê tûj ger ey xorto

25.

Ji boy kî ew weẓîfê da-

ne kes hûr nake van xorto

26.

Giha û ge*nim* ḥetta ku

Heşîn in pêş d*a* tên xorto

27.

Kesek nêzîk*î* wan nabit

Kesek wan naç*î*nit xorto

---

[2880] **Bîst**: Bihîst

[2881] **Guh de**: Guh bide

[2882] **Ding**: Kevirê aş

28.

Dara cana fikih[2883] girtî

Bivir nêzîk n*a*bit xorto

29.

Kera barbir, gayê cot kir

Namînin bê xudî xorto

30.

Bi dûrbûna ji karê xu

Dimînin bê xudî xorto

31.

Bi qelbê ʿişkê bê fayde

Dibînî afatan xorto

32.

Bi xewa ġefletê wenda

dikey sermaye lo xorto

33.

Wuşay ʿumrê xu yê hêja

Bizane qîmetê xorto

34.

Cuwanî û zemanê xu

Tu tewş nebor*î*ne xorto

35.

Cuwanî mîn*a* sosin e

Dema pirmil*î*[2884] çû xorto

36.

Hezar avê bi ser da key

Êdî geş nabitin xorto

37.

Hezar zublê bidey dorê

Daha qelew nabit xorto

38.

Dema çû cuwanîya tosin[2885]

---

[2883] **Fikih**: Fêkî
[2884] **Pirmilî**: Çilmisî

Daha venagirit xorto

39.

Hemî dunya biçit pêşyê

D*î*sa nasekine xorto

40.

Hemî Luqman[2886] û Sîna[2887] bin

Tune tu çarekî xorto

41.

Cuwanî pişt*î* çû êdî

Nîne jê ra bedel xorto

42.

Di lêva avk*î* da z̠ate-

k*î* pur zana hebû xorto

43.

Nivîsand namekî dilber

û pur şîrîneda[2888] xorto

44.

Hevalkî xu r*a* girt û şand

Ji avê dûr b*û* ey xorto

45.

Dema name vekir girt xand

Nêrî meʿna k*û*r e xorto

46.

Wekî xarîtekî[2889] dunya

Xu da girtîye wê xorto

47.

Mîna dil girtîye xu da

Dunê û axiret xorto

48.

---

[2885] **Tosin**: Ser‘işk, bêîta‘et

[2886] **Luqman**: Luqman Hekîm. Wek pîrê hekîman tê pejirandin û herwiha kesekî bihikmet e. Di Qurana Pîroz de li ser navê wî sûreyek heye. Di nav ereban de jî wisa riwayet dikin ku Luqman kesekî nebî û pêxember e. Herwiha di nav Mesîhî û Mûsewiyan de jî derbarê wî de gelek bawerî hene. (Pala, *b.n.,* r. 290.)

[2887] **Sîna**: Îbnî Sîna. (bnr. 16/8)

[2888] **Şîrîneda**: Xweşdeng, şîrînawaz

[2889] **Xarîte**: Nexşe

Bi meʿna xu wekî ʿeqlan

Gihaye ʿerş*ê* jor xorto

49.

Wekî mîx[2890] berhev û dî da

Çikaye meʿn*a* tê xorto

50.

Li şûnê mat m*a* got çawa

Dikarit mas*î*xur xorto

51.

Weha biniv*î*se reşbe-

leka kûr meʿn*a* hey xorto

52.

Çawa ba, nameya wî da

Nivîsand ʿeceban xorto

53.

Dema z̠atê di lêv avê

Cewab dît ʿeceban xorto

54.

Cewab da wî bi desta dest

Nivîsand ebedan xorto

55.

Dizanim masî ġafil e

Wî kar lîztike ey xorto

56.

Xarina goşt*ê* wî hey hey

Tînit ġeflet*ê* lew xorto

57.

Fena[2891] zaro*kan*, mezinan

Sivik dikey hilo xorto

58.

Ji zanînê dikey ezber-

kerê tiraş temam xorto

---

2890 **Mîx**: Bizmar

2891 **Fena**: Wekî, mîna, nola

59.

Ebeden goşt*ê* masîyan

Me şamî[2892] nekirî xorto

60.

Weha ye xarina bê bes-

mele ġefletker e xorto

61.

Dema rûnişt*î* ser sifrê

Xudê bîr bîne can xorto

62.

Dema xarin û vexari-

nê bêje "bismi`llah"[2893] xorto

63.

Berê navê Xudê bîr bîn

Dû ra karan bikey xorto

64.

Ji bo niʿmet bibit zêde

D*û* ra şukur bikey xorto

65.

Dibêjit Şah*ê* Dehlewî[2894]

Di zik da xarin ey xorto

66.

Dibit cîranê qelbê te

Bi hîşarî bixu xorto

67.

Wegerne qelb*ê* xu wek xa-

rinê ġafil bizan xorto

68.

Cîran çawa ji cîranan

Dibit munfeʿil[2895] ey xorto

---

[2892] **Şamî kirin**: Tam kirin, jê tehm kirin, çêj kirin

[2893] **Bismi`llah**: Bi navê Xwedê

[2894] **Şahê Dehlewî**: Evdillah Dehlewî. Alim û mutesewif. Di sala 1156'an de li Pencabê hate dinê. Di biçûktiya xwe de dest bi perwerdehiya ilmên dînî kirin. Piştî kuştina şêxê xwe, derbasî dewsa wî bû. Mewlana Xalidê Şehrezorî li Hindistanê întîsabê wî kir. (Süleyman Uludağ, "Abdullah ed-Dihlevî", *DİA*, c. 1, 1988, r. 94-95.)

69.

Heval çawa ji hevalan

X*û*yan radike ey xorto

70.

Wuṣa ji xarina ġafil

Digirit ġefletê xorto

71.

Ji xarina bi hîşarî

Digirit yeqẓetê[2896] xorto

72.

Dilê te ger bizanî ḥal

Dibî hîşar mudam xorto

73.

Ruḥê insan ji xûna qenc

Dibit paqiş hilo xorto

74.

Xûna insan bi xarinê

Dibit paqiş û qenc xorto

75.

Eger xarin bi ġeflet yan

Bi ḥeramî çêbit xorto

76.

Diḥerrimit x*û*n û tarî

Dibit ruḥê te ey xorto

77.

Merovek ron*î*dil, xûqenc

Nexweş ket bû weza[2897] xorto

78.

Ji bo derman*ê* derdê xu

Çû cem ḥekîmekî xorto

79.

---

[2895] **Munfe'il**: Ew ê ku bin bandora tevgera ku tê kirin de dibîne, muteessîr

[2896] **Yeqẓet**: Hîşarî

[2897] **Weza**: Jar, qels, ze'îf

Dema ḥekîm nérîn lê kir

Got, pur weza ketî xorto

80.

Şifaya te bi xûndanê

Tenê mumkîn e hey xorto

81.

Hinik xûn girt û berda ca-

nê xûn paqişî qenc xorto

82.

Şifaya cismí dît çendan

Nexweşîya ruḥê xorto

83.

Zêde bû lê bi awakî

Wêran kir ḥissê wî xorto

84.

Şuna sosinê xûyan[2898] da

Heşîn bû isturî[2899] xorto

85.

Cihê ronatîya qelb da

Tarîtî çêbû lê, xorto

86.

Dísa çû cem ḥekîmê xu

Jê ra got ḥalê xu xorto

87.

Berê min qeṭ nezanîbû

Dizî çi ye welê xorto

88.

Eger dizyê nekim rojek

Hedan[2900] nakeve min xorto

89.

Bibêje bo Xudê min ra

---

[2898] **Sosinê xûyan**: Ew xû/sincên wek sosinan rind

[2899] **Isturî**: Stirîn, dirî

[2900] **Hedan**: Aram, sebr, tebat

Çi ye raza[2901] v*î*yan xorto

90.

Hekîm rabû kete doza

Xudîyê wê x*û*nê xorto

91.

D*a*wîyê bû xuya wî ra

Xûna dizîk*î* ye xorto

92.

Ḥekîm got, her ez im mesûl[2902]

Ji vî karê nebaş xorto

93.

Ji bo da te me xûna diz

Dizî bû kar*ê* te xorto

94.

Cihê kilkirina birhan

Bi kilçêv[2903] çav rijand xorto

95.

Ji bo nexweş*î*ya cismî

Birîndar kir me ruḥ xorto

96.

Dema dermankirina te

Ji dil ġafil b*û*me xorto

97.

Piçek ġeflet*î* wêran kir

Hemî banda[2904] *min* hey xorto

98.

Birîndarîy*a* ruḥê te

Sebeb ez bûm t*ê* da xorto

99.

Ḥelal key bo Xudê yan ne

Di bin da çûm helak xorto

---

[2901] **Raz**: Sir, nepen, nehênî

[2902] **Mesûl**: Berpirs

[2903] **Kilçêv**: Darika zirav a kilê ye ku bi wê çavan kil dikin

[2904] **Band**: Dinya

100.

D*û* ra rabû ç*û* cem doxto-

rekî ruḥê nexweş xorto

101.

Beyan kir ḥal*ê* xu tev ṣed

Gîrîn û zar*î*nê xorto

102.

Ḥekîmê ruḥ*î* got, perhîz[2905]

divêt bo te hilo xorto

103.

Wezatî lazim e bo te

Wekî cara berê xorto

104.

Ji bo ew xûn*ê* çit xûne-

kî dî bi can*ê* te xorto

105.

Di bin siha[2906] ş*î*retê pîr[2907]

Kete ew sul*û*kê[2908] xorto

106.

Xew û xarin û vexarin

Pir û kêm kir ji xu xorto

107.

Weza bû her wekî hîva

Serê mehê b*û* ew xorto

108.

Xûna şêlû nema tê da

Paqiş bû can*ê* wî xorto

109.

Ronî da qelb*ê* wî dîsa

Çirûskê çav*ê* wî xorto

110.

---

2905 **Perhîz**: Xwe ji gunehan dûrxistin û parastin, teqwa

2906 **Sih**: Sî, parastin(a yekî)

2907 **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

2908 **Sulûk**: Ketina rêyekê, bilindbûna li hêla manewiyatê, li riya tesewifê de meşîna bi hal, hest û qelb

Giranî çû ji canê wî
Sivik bû wek*î* ba xorto
111.
Di gavek da dikarî bû
Biçe ʿerşê Xudê xorto
112.
Wekî sîper[2909] li dora nû-
rê dil bû wek felek xorto
113.
Şûrê ʿeqlê wî xweş tûj bû
Bû wek gûzan[2910] d*î*sa xorto
114.
Ji nefsê kar*î*bû mûyê
Xu yê xerab bibe xorto
115.
Li pêşya wî b*û* eqlê wî
Wekî eleqtirîq[2911] xorto
116.
Keremkarê xudan şefqet
Ji bo van raz*ê* hûr xorto
117.
Li ser me ferż kirê rojî
Di ṣalê da mehek xorto
118.
Hemî emrê Xudê da me
Ji bo kara me ye xorto
119.
Wegerne[2912] ẕat*ê* ḥeq ḥaşa
Ne muḥtacê me ye xorto
120.
Ne kar û ne z*î*yana me

[2909] **Sîper**: Pirpirok, minminîk, baperik
[2910] **Gûzan**: Kêrê birre ya ku mêr serê xwe kur dikin, dûzan, ustura
[2911] **Eleqtirîq**: Cêyran, kareba
[2912] **Wegerne**: An na, yan ne

Digêjit Xaliqê xorto

121.

Hemî weṣfê kemalê[2913] her

Ji wî ra ne, bizan xorto

122.

Ji weṣfê kêmîyê paqiş

e ẕatê ẕûlcelal[2914] xorto

123.

Ji deryaya kemala wî

Hemî xelq vedixwut xorto

124.

Dîsa kêm nabe tiştek jî

Li ser halê xu ye xorto

125.

Çawa derzî ji deryayê

Nekarit kem biket xorto

126.

Wuṣa ʿalem ji luṭfa wî

Piçekî kem naket xorto

127.

Ji weṣfa Xaliqê jorîn

**Ḩezîn** lal e ziman xorto

128.

Çawa peyda[2915] dikarit weṣ-

fê napeyda[2916] bidit xorto

129.

Çilo kurê reben karit

Bidit teʿrîf*a* reng xorto

130.

Çawa kerê nebîyayî[2917]

---

[2913] **Weṣfê kemalê**: Taybetiyên mezin û qenc
[2914] **Ẕatê ẕûlcelal**: Ew zatê ku xwedan heybet û ‘izzetê ye. Mebest jê Xweda ye.
[2915] **Peyda**: Ew ê ku dûre çêbûye yan jî peyda bûye. Mebest jê mirov e.
[2916] **Napeyda**: Ew ê ku peyda nebûye, çênebûye û her hebûye. Mebest jê Xwedê Te’ala ye.
[2917] **Kerê nebîyayî**: Ew kerê ku tu dengan nabihîze

Dinasit dengê xweş xorto

131.

Ji ku nas dikitin masse

Marangozê xu ey xorto

132.

Rojek bavê dî kurê xu`y

Bi tazî sermê da xorto

133.

Go lawê xu, ʿezîzê min

were malê dû ra, xorto

134.

Nexweş dikevî ber sermê

Çima serʿişk î wer xorto

135.

Bi ya bavê nekir lawik

Dewam kir liztik ey xorto

136.

Kurrê şand xanekî, da ber

Kitabek got, bixûn xorto

137.

Qetandina ji lîztik

Pêşyê zor hat li wî xorto

138.

Welê leẕẕeta xandinê

Dema ḥîs kir xu da xorto

139.

Şev û roj ji nêrîna

Kitaban têr nebû xorto

140.

Ji xûyê zarotîyê bû

Cuda, bin da delal xorto

141.

Bi xandinê xu da weqta

Kemalek dî kurik xorto

142.

Bi derva hat ji ḥucra xu

Bi dilşahî û kêf xorto

143.

Nezan in têk heval, lê ew

Bû zanîyê zemîn[2918] xorto

144.

Li jêr man têk hevalê, lê ew

Bilind bû gîşt meqam xorto

145.

Mezindêra û xar bû çû

Nigê bavê xu ew xorto

146.

Bi şukrê niʿmetê bavê

Ziman ṭer bû hemen xorto

147.

Weha ye kar*ê* dunyayê

Ṣefayê nab*î*nî xorto

148.

Cefayê neb*î*nî lewra

Digel şînê ye kêf xorto

149.

Kî bi istur*î*yan[2919] gulan

Dikarit biç*î*ne xorto

150.

Kî ye bi derzîyê mêşan

Kewarê[2920] ve dike xorto

151.

Kî ye bê xeşm*a* Hindûkan[2921]

Dibînit ṭaw*û*san[2922] xorto

---

[2918] **Zemîn**: Zeman, dem

[2919] **Isturî**: Stirîn, sinc, dirî

[2920] **Kewar**: Qutî ku mêş/moz tê de hingiv çêdikin

[2921] **Hindûkan**: Hindî, ehlê Hindistanê

[2922] **Tawûs**: Teyreke per û baskên wê reng rengî ye û welatê wan Hindîstan e.

152.

Kî ye bê zeḥmetê çûne

Digirit wargehan xorto

153.

Kî ye bê agirê ʿişqê

Digirit yar*a* xu xorto

154.

Behara bê zivistan kî

Dî ye bêje me ra xorto

155.

Weha ye tişt*ê* ḥeq daye

Ji vê mis̱al*ê* ye xorto

156.

Wuṣa ye bo çi emrê Xa-

liqê pêk nay*î*nî xorto

157.

Ji kara xu çima evqas

Direvî dûr diçî xorto

158.

Weẓîfa daye te Xaliq

Mudam kar e te ra xorto

159.

Çima sist û giranî tê

Bi jîrî nakitî xorto

160.

Ji dawîyê bitirsim ez

Eger weha biçî xorto

161.

Ji îmanê bibî tazî

Ji ʿirfanê nezan xorto

162.

Hîna zû ye biçe cem ḥe-

kîmê qelban xu ra xorto

163.

Ji bo derman bike jana

Dilê te ew ḥekîm xorto

164.

Ji qanṣêra qertbûye

Nîne tu çarekî xorto

165.

Bide dil rotkena[2923] pîran

Bi çend carek ṣ*a*lê xorto

166.

Bibêje êş*a* hindûr jê

ra, bo derman bikey xorto

167.

Li cem wî pozbilindayî

Tu car hewar nekey xorto

168.

Serî bid ser şêmûka wî

Ji bo pêlê bike xorto

169.

Ḥetta genim nekev qadê

Neyêt pêlêkirin xorto

170.

Heşîn nabit, bilind nabit

Zêde nabit tu car xorto

171.

Ḥeqq e baran ji ezmanan

Neyêt xarê ʿezîz xorto

172.

Heşîn naket gul û sosin

û nêrgizan delal xorto

173.

Bi dil guh de ş*î*retê pîr

Dû ra teṭbîq bikey xorto

[2923] **Rotken**: Amûra rotkenê. Li vir mebest jê nêrîn û awirên pîr/dostê Xwedê ne.

174.

Bizane mat û wenda ye

Kesê bê pîr hı̂şar xorto

175.

Eger husta nebit husta

Tê hînbûn çetı̂n e xorto

176.

Eger Seyda nebit çawa

Dixûnit suxte[2924] ey xorto

177.

Eger şofêr nebit çawa

Tironpêl[2925] rast diçit xorto

178.

Çiqas zana bı̂ la̱zim tê

Ji bo te pîrekî xorto

179.

Ḥetta dajo nebî tu car

Tu nabî serşivan xorto

180.

Mûsayê weqtı̂ bî dîsa

Divêt Xiḍrek te ra dosto

181.

Tu Romî bî di ʿirfanê

Divêt Tebrîzî her xorto

182.

“We fewqe kulle ẕî ʿilmin

ʿelîmun”[2926] gotîye xorto

183.

Xudayê lemyezel[2927] da ku

Nebêjî her ez im xorto

184.

---

[2924] **Suxte**: Feqî, şagird, xwendavanê medresê

[2925] **Tironpêl**: Tirimbêl

[2926] Di ser her zanayekî re yekî zanatir heye. (Yûsuf:12/76)

[2927] **Lemyezel**: Ewê ku her heye û wenda nabe, ango Xwedê

Ji her derdê r*a* hey derman

Welê çerxa felek xorto

185.

Ji derdê ezimê[2928] ra tu

ʿIlac dananîye xorto

186.

Xu dayne hem bibe xûnerm

Ji bo bê hezkirin xorto

187.

Ji bo ku isturû tîk e

Xû ʿîşk e, ey ʿezîz xorto

188.

Ziyankar e direve jê

Hemî caniwer[2929] hilo xorto

189.

Welê gul bo k*î* xûnerm e

Serê wê berj*ê*r e xorto

190.

Nêrîn û bêhn*a* wê xweş tê

Bi her tişt*î* delal xorto

191.

Dixazit her kesek nêzîk

Bibe bêhn key xu ra xorto

192.

Bibe ax, da ku heşîn bit

Tu da gulê x*û*yan[2930] xorto

193.

Ji bo ew dir*ê*j e berjêr

Jînê dipar*ê*ze xorto

194.

Ji bo ku rûy*ê* rojê tim

[2928] **Derdê ezim**: Nexweşiya qurretiyê. Her tim tenê gotina "ez, ez im!"

[2929] **Caniwer**: Bigiyan, rihber, zindî

[2930] **Gulê xûyan**: Xûyên wek gulan rind û xweş

Li hêla jêr e lo xorto

195.

Cihanê têk diket ronî

Bi nûra xu ş*î*rîn xorto

196.

Dixazî xweşîyê bo xu

Xu dayne[2931] hey û hey xorto

197.

Bi tu ḥalek nebîne xu

Dû ra pîşman dibî xorto

198.

Li ser silop*a* rêxê mê-

şa reş danî r*o*jek xorto

199.

Di kelêka çîyakî da

Dihejand çeng*ê* xu xorto

200.

Li rêxê carekî nêrî

Dî rengê wê ş*î*n e xorto

201.

Got, ev welat bi min xweş tê

Hemî çîmen e ew, xorto

202.

Dema dît birq*ê* mîzê lê

Got, ev derya ye ey xorto

203.

Li xu nêrî qure bû per-

çiqîbû wek*î* saz xorto

204.

Li ser rêxê dema bil xu

Nedît got, ez heme xorto

205.

[2931] **Xu dayne**: Dilnizm be, pozbilind nebe

Şah im, bin ḥukmê min daye
Welatê vê rêxê xorto
206.
Ji tirsa min tune insa-
nekî bi te vira xorto
207.
Bi bayê çengê xu karim
Çiyan biḥerînim xorto
208.
Sivik ba hat ji cih rakir
Sivik ġîçekî[2932] lo xorto
209.
Dema lê ket di rêxê da
Çû xar fetisî ew xorto
210.
Weqas berjor nefir eger
Tu ʿibretgîr î ey xorto
211.
Ji bayê teqdîrê ġîçek
Belan li te kevit xorto
212.
Dibî wenda di qadê da
Xu dayne hey û hey xorto
213.
Xudayê pur kerem gotî
Di Qurana kerîm xorto
214.
Tunebûn hey ji zorbazê
qure ra ey delal xorto
215.
Guhertin nabe qanûna
Xuda da qenc bizan xorto

[2932] **Ġîç**: Kevirê biçûk

216.

Quretîyê nekey tu car

Dibî helak d*û* ra xorto

217.

Helaka vê dunê hîç e

Helak ya ṣib*ê* ye xorto

218.

Helaka te di dunê da

Çûyina dun*ê* ye xorto

219.

Helaka band*ê* dûrbûna

Ji reḥma Xud*ê* ye xorto

220.

Bi gor bilind firîna te

Dibit hatin*a* xar xorto

221.

Bi gor hatin*a* xarê her

Dibit jan û keser xorto

222.

Bi gor janê dibit wicdan

û ruḥê te ş*ê*lû xorto

223.

Kesik wicdan wî şêlû bit

Bi toza af*a*tan xorto

224.

Ji jîna xweş bira destan

Bişo bin da xu ra xorto

225.

Li ser textê cihanê rû-

nê dîsa xu nebîn[2933] xorto

226.

Bi bakî[2934] têt*î* xar yek dî

[2933] **Xu nebîn**: Xwe nebîne, qurre nebe, pozbilind nebe
[2934] **Bakî**: Bayekî

Diçit şûna te can xorto
227.
Di henber v*a* merezdarî[2935]
Dibî ger nemirî xorto
228.
Weya dest*ê* ecel tê
Di kev qirrik*a* te xorto
229.
Ji her tiştî dikişînî
Tu bê ḥemd dest*ê* xu xorto
230.
Ji bo ṣefayê ra nîne
Beqa bê qîmet e xorto
231.
Ji bo dawî çû*û*yîne her
Cefa bizan ṣefay xorto
232.
Bi zengînî û karîn û
Berêdana dunê[2936] xorto
233.
Nexape daw*î*ya dunyay
Tunebûn e reben xorto
234.
Qure nebe ji dunyay ra
Nîne mayîn mudam xorto
235.
Nebe dilşad ji dunyay ra
Wefa nîne hilo xorto
236.
Wekî ʿewran anha heye
Gavek dî tune ye xorto
237.

[2935] **Merezdarî**: Nexweşî
[2936] **Berêdana dunê**: Berê xwe ber bi dunyayê ve dayîn, ango hezkirina dinyayê, xwe girêdana bi dinyayê

Wekî sihê anha hey ga-
vekî dî ra dibit xorto
238.
Çiqas wek gul te ra geş tê
Welê lez pirmile[2937] xorto
239.
Madam dunya digel mafî-
hayê[2938] xu fan*î* ye xorto
240.
Divêt rojek ji destê te
Biçit dunya ʿezîz xorto
241.
Girêde dil bi Baqî ve
Nebit cehda[2939] te tewş[2940] xorto
242.
Bixebit bo gihana ḥeq
Ew e mayî te ra xorto
243.
Cihan û mafîha yekser
Te destegîr be ey xorto
244.
Dîsa ẕerrek ji emrê ḥeq
Ji ser te ra n*a*ket xorto
245.
Nebêj wek wan keran, lê ez
Bûme xudan pere xorto
246.
Min jîna xu reha kirye[2941]
Ji hemî afetan xorto
247.

[2937] **Pirmile**: Biçilmise, çilmisîn
[2938] **Mafîha**: Ew tiştên ku di dinê de nin, di dinyayê de çi hebe ji wan giş mafîha tê gotin
[2939] **Cehd**: Xebat, şixul
[2940] **Tewş**: Bêfeyde, bêkêr
[2941] **Reha kirye**: Xilas kiriye, rizgar kiriye

Tu fanî cihan fanî
Çawa reha dibî xorto
248.
Tu xaxûdî bi xaxûdî[2942]
Çawa xu digirî xorto
249.
Merovek gay xu[2943] wenda kir
Ji bo dîtina gah xorto
250.
Bi çolê ket gerî wuşa
Tu ḥalek tê nema xorto
251.
Hemen şîrqîn bi ʿewran ket
Barî baranekê xorto
252.
Ji ber tavîyê[2944] baranê
Revî ket qulekê xorto
253.
Hemen ʿurin bi hirçê ket
Ji qulkê derve hat xorto
254.
Emana wî birî hirçê
Xu da ber darekî xorto
255.
Nêrî dar maye ser hence-
kê[2945] pur kêf kir ji dil xorto
256.
Xu da ber û sekinî got,
Eger hirç were min xorto
257.
Hemen kêlek didim darê

[2942] **Xaxûd**: Rizî, hilweşiyayî, wêran, xerabûyî
[2943] **Gay xu**: Gayê xwe
[2944] **Tavî**: Rejne, rêjne. Ew barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demeke kurt dibare
[2945] **Hencek**: Hindik, piçek, çendik

Dixim ser hirçê lo xorto

258.

Çiqas lê hat suʿûda min

Ji ḥeq min va bû ey xorto

259.

Ji nişkiv bagerînek[2946] hat

Gihîşt darê delal xorto

260.

Di ser da wer gerandî dar

Di bin da pan b*û* çû xorto

261.

Xu girtina bi xu xu dû

Bi fanîyan wehay xorto

262.

Rehaker[2947] herdu dunyan da

Divêt baqî be ey xorto

263.

Hêvî bona xelasî tek

Ji baqîyê dibit xorto

264.

Ji bo qayîlb*û*na baqî

Feda key can*ê* xu xorto

265.

Ji bo nêzîkîya baqî

Şev û roj yek bikey xorto

266.

Reha gîştin*a* baqî da

Nekev ber tiştekî xorto

267.

Dema dunya ji te dur ket

Ew e nêzîk ji te xorto

268.

[2946] **Bagerîn**: Bager, bahoz

[2947] **Rehaker**: Rizgarker, ewê ku mirovan xilas dike

Dema dunya ji dest te çû
Ew e mayî te ra xorto
269.
Dema dost dev ji te berda
Ew e heval û dost xorto
270.
Li esasê beqayê dayn
Dîwarê hêrs*a* xu xorto
271.
Li ser fanî ç*ê*key xanî
Tu pur pîşman dibî xorto
272.
Nivîsana li ser avê
Nîne jê ra dewam xorto
273.
Çawa sekna feżayê da
Dawî hatine hey xorto
274.
Di panîya dunê da ger-
çî gerranê dikey xorto
275.
Madam ku fanî ye dunya
Dibî jêrê zemîn[2948] xorto
276.
Rojek sêva li ser darê
Dikevit xarê hey xorto

**127.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun
Hezec + − − −/+ − − −
1.
Dibit babetekî[2949] nêva

[2948] **Zemîn**: ‘Erd
[2949] **Babet**: Têkilî, pêwendî, munasebet

Du tiştê hev divên[2950] apo

2.

Hemî mexlûq bi wî bendî

Dixazin hev û dî apo

3.

Wekî sîper[2951] dixazit ar[2952]

Çima foşfor e çeng apo

4.

Dajo foşfor*a* nûranî

Wê hêla nûr*ê* ve apo

5.

Wekî gamêş hezar derya

û av hebin d*î*sa apo

6.

Dixazit reşikî lewra

Wî çerm û goşt reş e apo

7.

Wekî mêş hingivîn xûy û

Kulîlkîn reng e ey apo

8.

Wê kar civandina şîra-

n*î* û kulîlk*a*n e apo

9.

Ji bo hingivx*û* ye dest ne-

d*î*yê deng naket ew apo

10.

Welê piştê te dest dayê

Te bernade reḥet apo

11.

Bi bendê ḥacetê zengîn

û neçar[2953] hev divên xorto

[2950] **Divên**: Dixwazin, viyan
[2951] **Sîper**: Pirpirok, minminîk, baperik
[2952] **Ar**: Agir

12.

Neçar wek çeper e, zengîn

Wekî dara fêkî apo

13.

Çepera[2954] dar*a* fêkî na-

de paraztin weya apo

14.

Dara nadit fêkî nayêt

Li wan mêze kirin apo

15.

Kesî reḥmê neket, naket

Li wî reḥmê kesek apo

16.

Xudayê pur kerîm gotî

Ḥedîsa qudsî da apo

17.

Bikin reḥmê li yê qadê

Bi alîkirinê apo

18.

Diket reḥmê li we pey hev

Xudayê asuman[2955] apo

19.

Ji hev hez dikitin insan

Çima ʿunsur yek in apo

20.

Divêtin mêr jinan lewra

Ji wê ra eṣle ew apo

21.

Divêtin jin mêran lewra

Ji wan ra meʿden e apo

22.

---

[2953] **Neçar**: Xizan
[2954] **Çeper**: Sênc, çîtên ber daran.
[2955] **Asuman**: Jorîn

Bi canê xu ji bo ku ta-

zî ye şevşev*o*k[2956] ey apo

23.

Dixazit tazîyê lewra

Wekî kinc e jê ra apo

24.

Dixazit xarin û vexa-

rinê zêde merov apo

25.

Heye babetîya wanan

Bi can û hem cesed apo

26.

Di eṣlê xu d*a* ev wek ruḥ

Leṭîf û nazik e apo

27.

Bi teqdîra Xudayê lem-

yezel têr bûye ew apo

28.

Ji bo nazikîya eṣlî

B*û*ye babet*ê* can apo

29.

Ji bo têrbûn*a* nû peyda

Bûye babet*ê* cism apo

30.

Hemî madeyê xarinê

Ji ax û av*ê* ne apo

31.

Wuṣay jê ra heye babe-

tî, can û ci*sim* ra apo

32.

Ji bo cism şêl*û* ye tarî

ye îstûr[2957] e hilo apo

[2956] **Şevşevok**: Baçermok, çilîçilî
[2957] **Îstûr**: Stur

33.

Dixazit maddîyan lewra

Ji cinsê wî ne ew apo

34.

Ji bo ruḥ sade ye ronî

ye nazik e j*o*rîn apo

35.

Dixazit meʿnîyan lew

Ji cinsê wî ne ew apo

36.

Ji bo têk madd*î* peyda ne

Hemî fanî ne ey apo

37.

Ji bo fanî ne nîne wan

ra bin da tu wefa apo

38.

Bi dostê bi wefa ve dil

girêdanî bizan apo

39.

Wekî deryay*ê* da dest a-

vêtina kef*ê* ye apo

40.

Ji bo meʿnewîyatan ra

Heye zatê Xuda apo

41.

Ji wanan ra heye qîmet

Ku nîne madd*î* ra apo

42.

Heye ṭeyreke yabanî

Dibên jê ra pepûk apo

43.

Weya qijik*a* heşîn hil-

didin navê w*ê* ey apo

44.

Ji bo wezawucûd[2958] e yan

Nezan e tu carî apo

45.

Nikarit hêl*û*nê çêket

Weya kurt bit[2959] reben apo

46.

Ji bo xudîkirina çû-

çikan pê çetin e apo

47.

Li ser hêlûn*a* qirika

belek hêkan diket apo

48.

Dibînî her beharê da

Li nêzî hêl*û*nê apo

49.

Şerr û cenga qijik û qi-

rikê her roj bi çav apo

50.

Qirika reşbelek hêkê

wê jî çelq diket[2960] ey apo

51.

Çûçikê wê digel yê xu

Xudî diket *hîş*yar apo

52.

Çûçikê wê digel yê xu

Bi firrê dix*î*nit apo

53.

Welê piştî çûçik gir bûn

Bi firdanê ketin apo

54.

Dixûnit dih*a*[2961] wan ser şax

---

[2958] **Wezawucûd**: Beden/laşê qels û jar

[2959] **Kurt bit**: Kurk ketin, ser hêka rûniştin

[2960] **Çelq diket**: (Hêkan) diçelqîne, hetanî çûçik ji hêkê derkevin ser hêkê rûniştin.

û lat û zin*a*ran apo

55.

Bi dengê dih*a* xu çûçik

Diçin cem dih*a* xu apo

56.

Digêjit jîn*a* şîrîn tev

Ref û heval*ê* xu apo

57.

Digirit le*z̠z̠*eta jînê

Ji gaz[2962] û zo*zan* qenc apo

58.

Wekî dîya xu ser şaxan

Dibin şevxan[2963] mudam apo

59.

Bi şukrê çêkerê jorîn[2964]

Dibin hey ter ziman apo

60.

Didin pesnê Xudayê xu

Li ser dar û beran apo

61.

Dikin ḥemd û ṣenayê ḥeq

Ji bo reha bûne apo

62.

Ji koletîy*a* qirrika

Neyara reşbelek apo

63.

Ku nîne tiştekî ṭaltir

Ji koletîy*ê* qenc apo

64.

Nîne ʿeqlek bigêjit ṣun-

ʿê[2965] Xaliqê hekîm apo

---

[2961] **Dih**: Dê, dayîk, mak

[2962] **Gaz**: Çiyayên bêdar û bêkevir.

[2963] **Şevxan**: Ew ê ku (bilbil, şalûl û hwd.) bi şev dixwînin

[2964] **Çêkerê jorîn**: Xwedê

65.

Bixazit duşminan bi duş-

minan xudî diket apo

66.

Bixazit kor diket çavan

Nenasit mar ji dar apo

67.

Bixazit dilê wek ṣal[2966] ʿişq

Diket nerm wek hevîr apo

68.

Wekî Firʿewn dikuşta ṭif-

lê[2967] mêrê bê guneh apo

69.

Bi ṣunʿê ḥeq welê kor bû

Ji xuykerê[2968] xu ew apo

70.

Mêrik girtîye dest xu dar

Ji bo kuştin*a* mar apo

71.

Welê wî qeṭ xeber nîne

Ji marê paşilê apo

72.

Bi çavê duşminan nêrîn

Diket li duşminan apo

73.

Ji nefsa duşmena xûnxar

Ji bin va ġafil e apo

74.

Li henber duşmenê derve

Heroj cengê diket apo

75.

---

[2965] **Ṣun'ê**: Kar, şixul, sen'et, huner

[2966] **Ṣal**: Kevirên li ber çeman

[2967] **Ṭifl**: Zarokê biçûk

[2968] **Xuyker**: Xwe çêker, ew ê ku wî afirandîye.

Welê duşmen*ê* hindûr ra

Tu tiştî nab*ê*jit apo

76.

Ji nefsê ra bikey cengê

Eger hîşar*î* tu apo

77.

Ji cenga piç*û*k em zivrîn

Hêla cenga mezin apo

78.

Bizan cenga mezin cenga

Ji nefsê ra ye ey apo

79.

Guhar key gotinê Eḥmed[2969]

Ji guhkê xu r*a* ey apo

80.

Xu ra şîret*ê* peyġember

Bikey mûm û şemal apo

81.

Ji bil reha[2970] w*î* ya ronî

Rehaker[2971] rah n*î*ne apo

82.

Ji bil seraya Îslamê

Gomê dî tarî ne apo

83.

Ji bil luksa *î*mana geş

Mûmê dî ţef*î*ne[2972] apo

84.

Gulê ne`d baġ*ê* Quranê

Hemî pirmil*î*ne[2973] apo

85.

---

[2969] **Eḥmed**: Hz. Muhammed (saw.)
[2970] **Reh**: Rê
[2971] **Rehaker**: Xilasker, ew ê ku rizgar dike
[2972] **Ţefîne**: Temirîne, vemirîne
[2973] **Pirmilî**: Çilmisî

Ne bêhna xweş, ne rengê geş

Heye wan ra delal apo

86.

Ne canan ra, ne cisman ra

Heye wan da mefa[2974] apo

87.

Ji xweşan û nexweşan ra

Nîne wan da şifa apo

88.

Bigir çavê seran carî

Vekey çavê dilan apo

89.

Bikev deryay*a* fikrê da

Tu durran[2975] derx*î*ne apo

90.

Ji bo babetîya çêlan[2976]

Heye qijik*ê* ra apo

91.

Ji qirikê cuda bûn çûn

Hêla diha xu da apo

92.

Wuṣay bo çi ji dafika[2977]

Dunê dernakevî apo

93.

Bi ʿişqa Xaliqê jorîn

Çima pey nakevî apo

94.

Hêla babet*ê* canê xu

Çima qeṭ nalivî apo

95.

Ji dora nefs*a* duşmin ma

---

[2974] **Mefa**: Menfaʻet, sûd, havil
[2975] **Dur**: Mircan
[2976] **Çêl**: Çûcik, ferxik, têjik
[2977] **Dafik**: Kemîn, xefik, telik

Çima dûr nakevî apo
96.
Ji bo gihan*a* yara kevn
Bi firrê nakevî apo
97.
Çima hêla hevala ruḥ
Ji dil tu narevî apo
98.
Bi ruḥê xu nebî nêzik
Ji Xaliqê j*o*rîn apo
99.
Ṣefayê her cefa, xweşyê
Nexweşî her bizan apo

**128.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun
Hezec + − − −/+ − − −
1.
Ji meʿnayê *mud*rikê[2978] ra
Heye zencîrekî cano
2.
Dibit pê girtîyan bal çi-
mena mayîn*ê* ve cano
3.
Bigire tu bi xelekê
Ji vê diçî felek cano
4.
Pêşyê têt nefsekî sernerm
Ji emrê ḥeq r*a* qenc cano
5.
Wuṣa nefsek ji emrê ḥeq
Nexazit derkevit cano

---
[2978] **Mudrik**: Ew kesê ku êdî tiştan têdigihije, îdrak dike

6.

Ji bil gihan*a* ḥeq nîne

Jê ra tu meqṣedek cano

7.

Ji bil dîtin*a* xaliq na-

bêje tu tiştekî cano

8.

Dizanit fan*î* çi ye hey

Dixazit baqîyê cano

9.

Di beḥra nasîya ḥeq da

Wuṣa noq bûye ew cano

10.

Ji bil durra[2979] hebûna ḥeq

Nabîne tiştekî cano

11.

Wekî masî di derya na-

sîyê pur şah*î* ye cano

12.

Wekî bulbul li henber gul

Bi govend û hejj e cano

13.

Kehêlek can e, meydana

Gihana ḥeq d*a* ew cano

14.

Ji lezçûnê dibêjî kan

Bi firrê ket*î*ye cano

15.

Wuṣa barbirekî[2980] baş e

Li xu şiv nax*î*ne cano

16.

Ji gunehan suwarê wê

2979 **Dur**: Mirarî, mirwarî

2980 **Barbir**: Barhilgir

Tu tozê nab*î*ne cano

17.

Ji şova may*î*nê tu car

Rûreşîy nakş*î*ne cano

18.

Ji ṭeralî û sistayî

Binî ve ber*î*ne cano

19.

Weha nefsek divêt bo te

Ji bo gihan*a* ḥeq cano

20.

Qewî ʿezmek[2981] divêt bo te

Çûyîna vê r*ê* da cano

21.

Dirêj ṣebrek divêt bo te

Ji bo vê meqṣedê cano

22.

Çiqas dûr e weqas nûr e

Eva meqṣed*a* pak cano

23.

Çiqas renc e weqas qenc e

Gihana ẕat*ê* ḥeq cano

24.

Di vê rê da divêt insan

Bi rê key mal û can cano

25.

Ji bo vê meqṣeda pakîn

Nekev ber tiştekî cano

26.

D*û* ra tê qelbekî qabil

Ji cilwa yar*ê* ra cano

27.

[2981] **ʿEzmek**: Xebatek, hewldan, lêxebitîn

Divêt wek hêlîyê[2982] rûpak

û şahîk be mudam cano

28.

Ji bo nûra Xuda tê da

Biçirûske *her* roj cano

29.

Divêt wek gul*ê* bêhn û nê-

rîna xu xweş be dil cano

30.

Ji bo bikşîne ser xu da

Nêrîna dilberan cano

31.

Nêrîngeha Xuda qelb e

Ne reng û rû ye, baş cano

32.

Wuşay her dem binêre lê

Ji bo qirrêj nebe cano

33.

Hêlîya rû qirêj nade

Nîşandin tiştekî cano

34.

Şeraba şah*ê* ra tasa

Qirêj babet[2983] n*î*ne cano

35.

Şûna têk sinc û dirrî ye

Ne war e yar*ê* ra cano

36.

Hewar rûreş nekey dil tu

Bi tenîya gunan[2984] cano

37.

Weya sincê x*û*yê naqenc

---

[2982] **Hêlî**: Neynik, eynik
[2983] **Babet**: Hêja, laîq
[2984] **Gunan**: Gunehan

Pixikîne di dil cano

38.

Dû ra mala xu wêran key

Bi destê xu reben cano

39.

Nekey xarê di çavê xu

Bi xu îstur*î*yan cano

40.

Şîretê mer*o*vê giştî

Xu ra bikey guhar cano

41.

Reha[2985] dostê Xuda da meş

Bizan bo xu huner cano

42.

Dû ra tê sirrekî paqiş

Ji meyla masiway[2986] xorto

43.

Li şûna şah*ê* lazim tê

Kesek dî rûnenê cano

44.

Kesek hezkirina dunyay

Çi girt sirra w*î* da cano

45.

Êdî yektî li ku mînit

Êdî dostî çi ye cano

46.

Ma yar dost ra dibit ṣadiq

Bizanit zeġel[2987] e cano

47.

Gelo xanîyê xaxûd[2988] da

Tu car şah rûdinê cano

[2985] **Reh**: Rê
[2986] **Masiwa**: Ji xêncî Xwedê her tişt
[2987] **Zeġel**: Xain, tevlihev
[2988] **Xaxûd**: Kavil, wêran, ber bi hilweşandinê

48.

Bi bendê xav*ê* nîv bizdî[2989]

Kî ye xu digire cano

49.

Xudayê qenc*î*kar navêt[2990]

Sera[2991] derd duny*a* ye cano

50.

Beza pê fanîyê hey hey

Dibit baqîy*ê* can cano

51.

Ji bo sera te da yara

Berîn[2992] seknê bike cano

52.

Ji bo bit sirra ne her

Kîlera sirr*a* ḥeq cano

53.

Divêt dostek te ra berxo

Divêt hêlek te ra cano

54.

Ji her doz û z*a*na bo te

Divêt her sosinek cano

55.

Divêt sirrek*î* zexm bo te

Taway[2993] bernede der cano

56.

Şûna nazexm d*a* kes zirav

Tu car danayînit cano

57.

Hemî ḥalê ji ḥeq tînin

Emanet wan bizan cano

---

[2989] **Nîv bizdî:** Nîv qetayî

[2990] **Navêt:** Naxwaze

[2991] **Sera**: Seray, qesr, koşk

[2992] **Yara berîn**: Dilbera pêşîn, xoşewîsta ‘ewil. Mebest jê Xwedê ye.

[2993] **Taway**: Tişt, tiştek

58.

Veşar ḥetta k*a*rî da ku

Kesek pê neḥesînit cano

59.

“Feisteʿînû bi`l-ketma-

ni” gotîye Resûl cano

60.

Musulmanî mede der sir-

r*a* veşartin divêt cano

61.

Bizan ḥeyża[2994] m*ê*r*a*n nîşan-

dana ḥalan e pak cano

62.

Nîşandana siran nîşa-

na çûyîna ser e cano

63.

Merovek zeng*î*n û maldar

Qurre bû perçifî[2995] cano

64.

Ji bo her kes binasit wî

Nizanit zeng*î*n e cano

65.

Xezîney xu bi her keskî

Nîşan dida *her* roj cano

66.

Hate şalek nebarî tê

da tu baranekê cano

67.

Ġelakî çêb*û* insan nêv

Hevûdin ve diçûn cano

68.

Ji birçîyan hemî malê

---

[2994] **Ḥeyż**: Ji bo jinan ketina kincikan, regl
[2995] **Perçifî**: Werimî, nepixî

Giyanê çû helak cano

69.

Berê da xez*î*nan bo ku

Ji wan meșref bike cano

70.

Heval girtin bi şahî çû

Nêrî çû bin*ê*re cano

71.

Xezîne mîn*a* qafê kun-

dirê bê hindur e cano

72.

Weya wek cendekek bêruḥ

Şûnê may bêq*î*met cano

73.

Weya wek se*rok* bê beyn[2996]

Bê tirs nêrîne ew cano

74.

Qirîn pê ket û got bavo

Li çokan xist û ket cano

75.

Hevalê birç*î* gotin ev

Te vala kir*î*ye cano

76.

Li ku veşartîye bêje

Yan ne bide serî cano

77.

Li cih mat ma, go van dostan

Çima weha dikin cano

78.

Jixu mal çû, ma vana çi

Ji canê me divên cano

79.

---

[2996] **Beyn**: Mêjî, eql

Ewanê bo me yar bûn ma

Çima neyar bûne cano

80.

Dileyzin sirbelaker bi

Serê xu rast e ew cano

81.

Ḥetta karî mebêj sirra

Xu xelqê ra hewar cano

82.

Nebaş bin ẕem dikin[2997] baş bin

Didin pesnê te baş cano

83.

Ewê ẕemker[2998] te dixin ḥe-

rîyê bo mirin cano

84.

Ewê dî datînin te ser

Çiqûlkê pur bilind cano

85.

Li te dit bay qurretîyê[2999]

Dikevî pare bî cano

86.

Weya ew bin siha darê

da xweş  xweş rûdinên cano

87.

Welê tu ser çiqûlkan bey-

hûde ʿişk dibî qenc cano

88.

Weya ew fikihan[3000] beref

dikin dibin diçin cano

89.

Welê tu ṭur vala vedi-

---

[2997] **Ẕem dikin**: Zem kirin, li piştî yekî/ê xeberdan, galgal, kurtûpist

[2998] **Ẕemker**: Ew kesê ku pişt mirovan xeber dide, qemsî

[2999] **Bay qurretîyê**: Bayê qurretiyê

[3000] **Fikih**: Fêkî

kirî ser mal*ê* da cano

90.

Ji herdu lê*van* ew sirra

Diborit bit bela cano

91.

Dibêjit kan*a* zanînê

ʿElîyyê Murteża[3001] cano

92.

Mijûlî dengike tev li-

hev e yê tête der cano

93.

Dema der hat hewa û deng

Êdî nay qeyd kirin cano

94.

Neparêzî tu malê xu

Kesek napar*ê*ze cano

95.

Bela key ger tu durrê xu

Kesek naciv*î*nit cano

96.

Sirra maddî û meʿnewî

Nede der beyh*û*de cano

97.

Bipêçe bixe şundoqê

Kilîtê lêx*î*ne cano

98.

Dibînî gul *ḥet*ta bûk e

Nayête jêkirîn cano

99.

Dibînî sêv *ḥet*ta şîn e

Nakevit xar*ê* ew cano

100.

[3001] **ʿElîyyê Murteża**: Hz. Elî. Xelîfeyê çaremîn.

D*û* ra tê ruḥekî bengî[3002]

Mîna sîperikê[3003] cano

101.

Li ku bînit n*î*şanek ḥeq

Dixazit can bide cano

102.

Çi çaġ bînit tecella[3004] ḥeq

Ji ʿişqê bikevit cano

103.

Li cih mêze bikey tê da

Dibînit ʿeks*a* ḥeq cano

104.

Kî ʿalem serteser bo rin-

dîya ḥeq hêl*î* ye cano

105.

Xuda ra remz û nîşan e

Hemî tiştê heyî cano

106.

Ji meʿna lah*û*tê[3005] ra ḥerf

û lefẓ[3006] e têk cihan cano

107.

Wuṣay pur neb*î*ne serxoş-

î û mestîy*a* ruḥ cano

108.

Ku meʿşûq[3007] ẕat*ê* napeyda[3008]

ye, ʿaşiq[3009] ruḥ e qenc cano

109.

Xuyayî yar*a* kevn e, dî-

t*î* bengî ye ji dil cano

---

[3002] **Bengî**: Evîndar, dildar
[3003] **Sîperik**: Pirpirok, baperik, minminîk
[3004] **Tecella**: Diyarbûn, zahirbûn, li tiştî xuyabûn
[3005] **Lahût**: Îlahiyet, ‘alema îlahî, tiştê ji ‘alema îlahî ye
[3006] **Lefz**: Gotin, bêje, peyv
[3007] **Me’şûq**: Ew kesê ku tê hezkirin, xoşewîst, yar
[3008] **Ẕatê napeyna**: Mebest jê Xweda ye.
[3009] **‘Aşiq**: Ew kesê ku hez dike, evîndar

110.

Çawa bulbul ji baġê gul

N*a*bit serxoş û mest cano

111.

Ez im bulbul cihan baġê

Gula mîna geş e cano

112.

Ez im sîper[3010] cihan nûra

Roja qelbê me ne cano

113.

Ez im masî cihan beḥr û

Çemê yara min e cano

114.

Ez im mêş û kulîlka hin-

giv e min ra cihan cano

115.

Ez im Mem û cihan Zîna

min a Cezîr*ê* ye cano

116.

Ji bo wî bê hedan[3011] her dem

Me şîn û lor*î*n e cano

117.

Ji bo wî yek demek bo me

Tu aramek nîne cano

118.

Ji ʿişqa wê gula nazik

Me çav bigîr*î*ne cano

119.

Mîna ʿewrê beharê hês-

tiran dibar*î*ne cano

120.

Evîna yar*a* napeyda

---

[3010] **Sîper**: Pirpirok, minminîk, baperik

[3011] **Hedan**: Aram, sebr, tebat

ye ruḥ dihej*î*ne cano

121.

Ji tirsa dûrb*û*na gulê

Bi ta û lerz*î*n e cano

122.

Ġidaya[3012] ruḥ bi bîr anî-

na yara ber*î*n e cano

123.

Şahîya dil bi nêzbûna

Ji şahê jor*î*n e cano

124.

Hey û hey tu h*îş*ardil be

Ji bo nexap*î*ne cano

125.

Te reng û rûy*ê* dunyayê

Ku ew rûreş*î* ne cano

126.

Bi reng û ruḥ digêrit ruḥ

Beharê da k*ê*fek cano

127.

Ji bo baqî n*î*ne ew kêf

Wekî bin da n*î*ne cano

128.

Bayê payîz*a* pîrîyê

Gulan dimir*î*ne cano

129.

Jîna ruḥperwerê madê[3013]

Dawîyê tim ş*î*n e cano

130.

Welê ruḥê bi meʿnê ha-

tiye xudî kirin cano

131.

[3012] **Ġida**: Xurek, xwarin, qut

[3013] **Madê**: Madde

Bi ẕikr û fikr û emrê ḥeq
ra hey wî hogîrî cano
132.
Di beḥra nasîya ḥeq da
Bûye wek balîna cano
133.
Ji yaqûtê xûyê qenc ra
Bedexşan[3014] sifet e cano
134.
Ji wî ra jîrî û pîrî
Mîna hev tên ʿezîz cano
135.
Ji wî ra şahî û şîna
Dunê yek tên şîrîn cano
136.
Ji sosina Ṭûwayê[3015] ra
Hemî mewsim yek in cano
137.
Ji ruḥê bulbulê wê ra
Hemî eṭwar[3016] yek in cano
138.
Çilo darekî ʿişk e ca-
nê bê ruḥê delal cano
139.
Wuṣa mirî bizane ru-
ḥê bê ʿişqa Xuda cano
140.
Li henber nûra dil ruḥ
Bi ceẕbê can nedit cano
141.
Bizan kor e ḥeyata wî

[3014] **Bedexşan**: Navê bajarekî li Efxenistanê ye. Ji aliyê me'denên xwe ve namdar in. Herwiha yaqûtên giranbiha jî ji wir tê derxistin. (bnr. https://fa.wikipedia.org/wiki/بدخشان_(ولایت_افغانستان) 15.04.2015.)
[3015] **Ṭûwa**: Li Tûrê Sînayê navê newalekî ye.
[3016] **Eṭwar**: Hal, rewş

Jibin beyhûde ye cano

142.

Heçî ruḥê şemala[3017] dil

Nagêjînit xefa[3018] cano

143.

Şewata ceẕb û ʿişqa wî

Naket exfa[3019] h*î*şar cano

144.

Negirtîye tu car ʿişqek

Ji baġê lah*û*tê cano

145.

Nezan e gaz*ê* nasût[3020] da

Kîjan yaqût e ey cano

146.

Ji kanîyê hezar gulê

Kîjan şifay binas cano

147.

Ji bo hatin*a* zozanan

Nebit bo te ʿebeṣ[3021] cano

148.

D*û* ra tê ʿeqlekî birre

Mîna şûrê ʿElî cano

149.

Li hêlkî dix*î*ne xarê

Ziyankarê neyar cano

150.

Li hêla dî ji nûra Eḥ-

medî jînê didit cano

151.

Wuṣa ʿeqle hezaran qey-

---

[3017] **Şemal**: Çira, mûm, find; rewnaq, ronak

[3018] **Xefa**: Meqamekî ji zikrê tesewufê ye.

[3019] **Exfa**: Meqamekî ji zikrê tesewufê ye.

[3020] **Nasût**: Însaniyet, her tiştê ku bi mirovan re têkildar e

[3021] **ʿEbeṣ**: Vale, beyhûde, bêkêr

dê dunyayê hebin cano

152.

Nikarit wî ji yara wî

Demek biqet*î*nin cano

153.

Di deryaya hebûnê da

Nîne wî meqṣedek cano

154.

Ji bil cewher*a* nasîya

Xudayê lemyezel cano

155.

Ji bil gihan*a* wî ẕatê

Xudayê bê heval cano

156.

Qayîl nabe bi ṭawakî[3022]

Çiqas dunya w*î* be cano

157.

Ziyan û karê ra meḥik[3023]

Bizan ʿeql e delal cano

158.

Wuṣay nig nev*ê*je bal ka-

rekî bê fikr*a* heş cano

159.

Merov bi fikr*a* heş karan

Biket pişman dibe cano

160.

Ku korê bê ç*o*[3024] û destkeş

Di bestan wer dibe cano

161.

Wuṣa ʿeql e dema qeṣd ke

Gihana xaliqê cano

---

3022 **Ṭawa**: Tişt, tiştek

3023 **Mehik**: Ew kevirê ku bi eyara zêran dipîvin û dizanin ku ew zêr çend eyar e û tê de çiqas sifr heye.

3024 **Ço**: Dar, darê desta, şivik

162.

Hezaran leşkerê di wan

Ji rê dernax*î*nin cano

163.

Gerana ʿalema jêrîn

Wî ra kar e mudam cano

164.

Cihê pê xweş dibe encaq

Feżaya weṣfan e cano

165.

Dike azad xudîyê xu

Ji ḥukmê nefs*a* dûn[3025] dosto

166.

Ji ḥerrîya fenayê wî

Dibit hêla Xuda cano

167.

Ji hezar gunehan tek

Ew e dûrker bizan cano

168.

Hêla qayîlb*û*na ḥeq ve

Ewî rehber binas cano

169.

Di bandê[3026] da nîne niʿme-

tekî meztir ji heş ra cano

170.

Di dunyay da n*î*ne rêza-

nekî çêtir ji heş cano

171.

Cihanê da nîne usta-

ẕî zanatir ji heş cano

172.

Bizane qîmeta wî cew-

---

[3025] **Dûn**: Kêm, nimz

[3026] **Band**: Dinya

herê ṣade hewar cano

173.

Tu carî xerc mekey tiştê

Nebaş da wî eman cano

174.

Dû ra şahê dirêjit feyż

Serê têk alemê cano

175.

Te tîne meclisa pursê

Çi da rêkir te heş cano

176.

Divêt îro hîşar bî qenc

Ṣubê şermî nebî cano

177.

Divêt îro xebatê key

Ṣubê pişman nebî cano

178.

Divêt îro bizanî xu

Nekevî xar ṣubê cano

179.

Qayîlbûna Xuda kar key

Nebî bê destegîr cano

180.

Ji meqûlatê maddîyan

Nînin vanê me got cano

181.

Nîne babetîya wanan

Ji madê ra tu car cano

182.

Ne rengê rûxweşan ne deng

û bangê gulgeşan cano

183.

Ne xarin û xew û raḥet

Ne zarok û zevî cano

184.
Dilê wanan reḥet nakin
Gulê wanan hêdî cano
185.
Ne derdê wan dikin derman
Ne çavê wa*nan* têr cano
186.
Çima ew beng*î*yê ḥeqq in
Dixazin ẕat*ê* ḥeq cano
187.
Ferraşê[3027] nûr*a* mutleq in
Dixazin ṣade bin cano
188.
Bigijin meqṣeda qudsî
Bibin dilşad û xweş cano
189.
Ji nig derxin z*û* qeyda her-
du dunyayan hilo cano
190.
Ji çengan vebikey benda
Hewesa masiway cano
191.
Bi firrîn qefesa hezki-
rina her fanîyê cano
192.
Bi firrê kev here hêla
Xudayê bêheval cano
193.
Digel wanê ji madê rût
Bikey gerran*a* xweş cano
194.
Ji nûve jîn dibit ṣade

[3027] **Ferraş**: Pirpirok, minminîk, baperik

Hedan tête dilan cano
195.
Êdî tê dawîya derdan
Dibînit ruḥ ḥużûr cano
196.
Behar e ġulġulê avan
û çîvçîvê çûkan cano
197.
Digel ḥukḥukê şivanan
Qewî xweş tê li me cano
198.
Bi wan dengê şîrîn û nê-
rîna şîn şen bû dil cano
199.
Bi wî bayê ṣebayê[3028] xweş
Dihat ser çimenan cano
200.
Dihata dil ji baġê rin-
dîya yarê çi bêhn cano
201.
Bi wê bêhnê çi xweş ḥalat[3029]
Li dil çêdibûna cano
202.
Dema bayê evîna la-
hûtê hêdî dihat cano
203.
Dilê bengî mîna derya
Hej û leq lê diket cano
204.
Ji cilwa yara napeyda
Mîna bulbul bû dil cano
205.

---

[3028] **Bayê ṣeba**: Bayê ku ji hêla rojhilatê tê. Bayekî hênik e û her tim tê.
[3029] **Ḥalat**: Pirjimariya hal e. Hal, rewş

Hedan lê hat birîn, bû wek

Kereng û ber ba ket cano

206.

Fežayê da bilind bû çû

Gihîşte lamekan[3030] cano

207.

Gulê bostan*ê* lahûtê

Civandin pêş bi pêş cano

208.

Ji ruḥê bend*a* nasûtê

Ra girt û an*î* wî cano

209.

Ji bo wan ḥaletê ronî

Bide ber çav*ê* xu cano

210.

Bi wê nûrê çit[3031] rê da

Bigêjit ẕat*ê* ḥeq cano

211.

Bi ʿişqa wan gulan bêsekn

Xebatê key mudam cano

212.

Bigêjit kerw*a*nê hêla

Xuda da hey diçin cano

213.

Bi hevalîy*a* wan ẕatan

Ji rê dernekevit cano

214.

Ji bo dîsa bigêjit dil-

dera xu ya berîn cano

215.

Ji bo dîsa bibînit wî

Welatê hate jê cano

---

[3030] **Lamekan**: Bêmekan, bêcih û bêwar

[3031] **Çit**: Biçit, biçe, here, bimeşe

216.

Ji bo dîsa bigêjit ra-

ḥetê ruḥê reben cano

217.

Ciwarê quds*ê* da çêket

Xu ra hêlûnekê cano

218.

Li baġê gul tê xuyaye

Binêre têr xu ra cano

219.

Ji bayê fîtne û derdan

Xuda bipar*ê*ze cano

220.

Te yê nazik*ê* wek belgê

Gula nû veb*û*ye cano

221.

Ji ʿewrê nasîya xu bi-

şîne baranekê cano

222.

Ji bo behar*a* ʿumrê te

Nebe payîz*ê* sar cano

223.

Ji xezna hezkirina xu

Bixe behr û heval cano

224.

Te ra piçek ji ʿişqa xu

Nebî sist û ṭeral cano

225.

Bibî xweş ruḥ û pîroz roj

Di herdu cih*a*nan cano

226.

Ji her dilkul*î* û janê

Bibî dûr û berî cano

227.

Ziyan û kar*ê* ra kan î[3032]

Tu wek şêr û ş*û*r î cano

228.

Muʿettel[3033] bit cihan bê te

Mîna roj û nûr î cano

229.

Mîna tîrêj ji kewnê[3034] ra

Tu nêzîk û dûr î cano

230.

Kesek nagije kunha[3035] te

Tu deryayek kûr î cano

231.

Kesek nabîne canê te

Tu ʿuqnûmek[3036] hûr î cano

232.

Nayêt birrînê beha te

Tu ṣade feġf*û*r î cano

233.

Bi qurbana te bit canim

Ji min ra tu j*î*n î cano

234.

Ji nêrîna te têr nabim

Bi min pur şîr*î*n î cano

235.

Hezaran Wan[3037] û Kurdistan

Fedayê te bibin cano

236.

Çi ye Elman û Emrîkan

Tu Çîn û Maç*î*n î cano

237.

---

[3032] **Kan**: Cihê ku ma'den derdikeve
[3033] **Mu'ettel**: Disekine, radiweste
[3034] **Kewn**: Gerdûn, 'alem
[3035] **Kunh**: Heqîqet, rastî, eslî
[3036] **'Uqnûm**: 'Esl, bixwe
[3037] **Wan**: Bajarekî li Bakûrê Kurdistanê ye. Bi behr û pisîka xwe ve namdar e.

Şûna tu lê nebî şax[3038] û
Kemax[3039] û tarî ye cano

238.
Behara kewnê[3040] ra meger
Tu rengê heşîn î cano

239.
Di piştî hatî meydanê
Fena[3041] nîne te ra cano

240.
Meger ṭeyrê seḥerxan î
Di xulda berîn[3042] î cano

241.
Bi milyonan hebin bo me
Dev û lêv û ziman cano

242.
Bidin her weqtê pesnê te
Dîsa pêk nayînin cano

243.
Reha Îslamê da çûyîn
Ji te hêvî dikin cano

244.
Diqetim ez ji te êdî
Xuda li ser te bû cano

**129.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun
Hezec + − − − / + − − −

1.
Merovatîyê ra berxo
Tu şîrîndendik î berxo

---

[3038] **Şax**: Baxir/zinarên ku ji hev naqetin û dirêj dibin diçin.
[3039] **Kemax**: Xirabe, wêran, kavil
[3040] **Kewn**: Alem, gerdûn
[3041] **Fena**: Wendabûn, tunebûn
[3042] **Xulda berîn**: Bihişta ezelî. **Xuld**; yek ji wan heşt tebeqeyên cennetê ye.

2.

Bibînî av û ax û xu-

dîyê xu ra dibî berxo

3.

Wuşa pêş da diçî ʿalem

Ji te karê dike berxo

4.

Bi reng û belg û siha xu

Ġeman direv*î*nî berxo

5.

Li ser insan*ê* dunyayê

Beran[3043] dibar*î*nî berxo

6.

Hezaran dendikê wek xu

Ṣalê derdix*î*nî berxo

7.

Ji jînê ra m*î*na avan

Dibî serek mezin berxo

8.

Wusay şûna nebit babet[3044]

Te ra meskîne[3045] lê berxo

9.

Di nêv sergo[3046] d*a* tu darek

Heşîn nabit piçûk berxo

10.

Eger heşîn bibe teʿma

Berê wê xweş nîne berxo

11.

Eger xweş bit welew ku ber

Li qadê dim*î*ne berxo

12.

---

3043 **Ber**: Fêkî, mêwî

3044 **Babet**: Laîq

3045 **Meskîne**: Nesekine, neraweste

3046 **Sergo**: Zibil, zibar, çop

Nexazit kes ji nav rêxê
Beran biciv*î*ne berxo
13.
Ji bil wan eḥmeqê kerxû[3047]
Tu kes wan nast*î*ne berxo
14.
H*î*şar be guh de apê xu
Va mis̱al ya te ye berxo
15.
Dixazî zêr*ê* xaliṣ bî
Ji ax derkeve berxo
16.
Dema zarok bi ava za-
nînê mezin nebit berxo
17.
Çilo sosin*ê* xûyê qenc
Di wî heşîn dibin berxo
18.
Tenê îstûr*î*yê keran
Di wî da şîn dibin berxo
19.
Ji bil wan reşkerê bêheş
Ji wî heznake kes berxo
20.
Ji nêv gurzê gihayê baş
Tînin der dav*ê*jin berxo
21.
Li dar ser hûr dikin yan ne
Li erḍê pan dikin berxo
22.
Cihan malê te bit bê za-
nînê bê qîmet e berxo

[3047] **Kerxû**: Ehmeq, sefik, xêvik

23.

Îrem warê te be, bê ʿilm

Di nêv sinc*a*n[3048] î her berxo

24.

Felek yarê te be dîsa

M*î*na hovan î ker berxo

25.

Dixazî meclisa şahan

û sosinê x*û*yan berxo

26.

Dixazî terpika keskî

Li serê te nekev berxo

27.

Bixûne tim û tim kar û

Bibe zanay zemîn berxo

28.

Di beḥra zan*î*na paqiş

Her roj ajnê[3049] bikey berxo

29.

Bi wê avê der û hindûr

Li xu wek berf bikey berxo

30.

Murad sernerm dibit te ra

Cihanê da şeh[3050] î berxo

31.

Felek alîker û yar e

Te ra, wek Yûsif î berxo

32.

Welê lazim tê bavê te

Mîna Kenʿanî[3051] be berxo

33.

---

[3048] **Sinc**: Stirîn, dirî

[3049] **Ajne**: Soberî, melevanî

[3050] **Şeh**: Şah

[3051] **Ken ʻanî**: Hz. Ye’qûb.

Divêtin her hevalê te
ʿEzîzê Mişr*ê* be berxo

**130.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun
Hezec + − − −/+ − − −
1.
Divêtin bavekî zana
Bi seyra ʿalemê bavo
2.
Bi gor ḥalê zemîn[3052] lavan
Mezin key pêş d*a* dey bavo
3.
Her roj ḥalek li dunyayê
Dibit peyda ş*î*rîn bavo
4.
Her roj tiştek piyasê da
Diçit pêş da meger bavo
5.
Bi gora wî zemanê tê
Mezin key zar*o*kan bavo
6.
Dibêjit der*ê* zanînê
ʿEliyyê pêş*û*wa[3053] bavo
7.
Di havînê gera tev las-
tikan nexweş*î* ye bavo
8.
Çawa pêkirina ṣolan
Zivistanê şerr e bavo
9.
Bi gor her mewsimê kincek

[3052] **Zemîn**: Zeman, dem
[3053] **'Eliyyê pêşûwa**: Hz. Elî. Xelîfeyê çaremîn. Bi ilmê xwe namdar bû, lewra jê re derê ilmê tê gotin.

Li xu tête kirin bavo

10.

Bi gor her çaġekê ʿilmek

û ḥalek lazim e bavo

11.

Ji çaġa dapîtina[3054] ke-

viran ra ʿilmekî bavo

12.

Heye çaġa cila wan ra

Heye ʿilmekî dî bavo

13.

Bi gor çaġa pêşîn zanîn

û ḥalek lazim e bavo

14.

Bi gor çaġa teze zanî-

nik û ḥalek divêt bavo

15.

Tu gotina ʿElîyyê şêr[3055]

Nekî luks û fener bavo

16.

Zemanê tê di tarîyê

Dihêlî zarokan bavo

17.

Divê qenc nas bikey baş û

nebaşan serheva bavo

18.

Nedey zanîn bi zarokan

Şûna xêrê, şerrê bavo

19.

Nevêj ṭovê nebaş ruḥ û

Dilê wan zarokan bavo

20.

---

[3054] **Dapîtin**: Rastkirina keviran, traşkirin, telaştin, nicirandin

[3055] **'Eliyyê şêr**: Hz. Elî.

Şûna nêrgizê xûyan da

Ji bo girnûk[3056] neyên bavo

21.

Bilind be ser hevalê xu

Di fend û zanînê bavo

22.

Nebit xûqenc zarok wek ro-

vîyek şekalxur[3057] e bavo

23.

Kesî dafik[3058] bike ʿilmê

Ji bo malê dunê bavo

24.

Bi zêran dikirre rêxê

Bi durran[3059] dirrehan[3060] bavo

25.

Dunê laşek mirar e yê

divên wê kûçik in, bavo

26.

Dibêjin serwerê ʿalem

Muḥemmed Muṣṭefa bavo

27.

Cihan dirrehekî hezki-

rana wê bixe dil bavo

28.

Bi destê xu dike xwar

Xencer û kêran di xu bavo

29.

Ji ber jana qetana[3061] wê

Bi ruḥ hey nexweş e bavo

30.

---

[3056] **Girnûg**: Gihayekî bi stirîn e ku di nav zeviyan de şîn dibe.

[3057] **Rovîyê şekalxur**: Ew roviyê ku şekal/solên kevn dixwe

[3058] **Dafik**: Kemîn, xefik, telik, daf

[3059] **Dur**: Mirarî, mirwarî

[3060] **Dirreh**: Dirî, stirîn, sinc

[3061] **Qetan**: Cudayî, veqetan, dûrketin, fîrqet

Ji bo kêfa gihana wê
Bêheş serxoş e tim bavo
31.
Kesî nexweş*î* û serxoş-
î her ḥalê wî be bavo
32.
Cihanê da ḥeyat û ra-
ḥetek nîne w*î* ra bavo
33.
Şîretê bav*ê* ava da-
ra zarokan bizan bavo
34.
Zelal û xweş be av xweş e
Berê[3062] xûyê ewan bavo
35.
Delavê zar*o*kan bavo
Delav paqiş be ger bavo
36.
Heçî ava ji wî zarok
Vexûn wek şerbet e bavo
37.
Ji ruḥ û canê wanan ra
Xweşî û quwwet e bavo
38.
Bixûne tim xew û vêsî[3063]
Li xu ḥeram bikey bavo
39.
Berê[3064] tu zar*o*kê xu ra
Ḥeqîqî hûker[3065] î bavo
40.
Ji ḥeram û gunehan dûr

---

[3062] **Ber**: Fêkî, mîwe
[3063] **Vês**: Bêhnvedan, betilandin
[3064] **Berê**: Pêşiyê
[3065] **Hûker**: Mamoste, fêrker

Ḥetta karî birev bavo

41.

Ku qirêja dil û canê

Merovan her ev in bavo

42.

Eger paqiş bî zarokê

Di te derbaz dibe bavo

43.

Paqiş tê duny*a*yê lewra

Tu cuwka[3066] zar*o*k î bavo

44.

Îmamê meztir sî rojan

Xetim kirye Quran bavo

45.

Bi ḥeramî eger sêvek

Nexara bavê wî bavo

46.

Xetim dikir di yek rojê

Kelamê sermedî bavo

47.

Çawa bit zar*o*kê wanê

Her roj ḥeram dixûn bavo

48.

Ẕeka û ẕihn û ḥissek qenc

Di wan da nam*î*ne bavo

49.

Wuṣay nebaşîya bavan

Digêjit zar*o*kan bavo

50.

Zarok xûy û x*a*lîyê da

Waris in bav*ê* ra bavo

51.

---

[3066] **Cuw**: Cû, cuh, co

Dibînî zar*o*kê aġan

Dixazin aġ*a* bin bavo

52.

Çawa zarok*ê* ʿaşiqan[3067]

Dikin pars û *ger*rê bavo

53.

Li ser koka bihî hirmî

Li ser hirmî qewax[3068] bavo

54.

Heşîn nabe ku her kokek

M*î*na xu radike bavo

55.

Li sêvê nar, li narê gûz

Kesî nedîtîye bavo

56.

Ku her darek bi gora xu

Dide fêkî û ber bavo

57.

Ḥetta karî reha doġrî[3069]

Xu ra bineq*î*ne bavo

58.

Her roj piçek hêla ḥeq da

Mesafe bist*î*ne bavo

59.

Bi nar û nûr*a* ʿişqa ḥeq

Tu dil biḥell*î*ne bavo

60.

Ji axa tevlihev cewhe-

rê zêr biqet*î*ne bavo

61.

Dema bûy ṣade zêr yê ku

---

[3067] **Aşiq**: Mitrib, çîngene, koçer
[3068] **Qewax**: Dara spîndarê
[3069] **Reha doġrî**: Riya rast

Ji te`y ṣade zêr e bavo
62.
Ji axa paqişa ṣade
Dizêt ava zelal bavo
63.
Ji sergoyê r*ê*xê derdi-
keve bêhn û qirêj bavo
64.
Dibêjit serwerê ʿalem
Muḥemmed Muṣṭefa bavo
65.
Ji dilopa xu ra bine-
qînin[3070] paqiş jinan bavo
66.
Zikê jinan feraq[3071] e ʿun-
ṣûrê insan*ê* ra bavo
67.
Wuṣay lazim t*ê* paqiş be
Mîna berfa sipî bavo
68.
Egerçî hingivê mêşan
Ji êşan ra şifay bavo
69.
Dema qaba *qir*rêj da
Ziyankar zeh*î*r[3072] e bavo
70.
Ji tuxûmê xu ra axa
Hêja neneq*î*ney bavo
71.
Şûna genim*ê* dilber da
Zîvanê[3073] hilt*î*nî bavo

---

[3070] **Bineqînin**: Hilbijêrin. Peyvek ji devoka kurdên rojavayê ye.
[3071] **Feraq**: Aman, fere,
[3072] **Zehîr**: Jehr, jehrî

72.

Jinê paqiş ji dê û ba-

vê paqiş çê dibin bavo

73.

Bi îman û bi zanînê

Xemilye eṣl*ê* wan bavo

74.

Xaniyyê tê mezin bûne

Mîna bihişt*ê* ye bavo

75.

Hevalê xu r*a* wer rast in

Mîna jina Şureḥ[3074] bavo

76.

Pêşyê qelbê keça xu da

Bajo tirsa Xuda bavo

77.

Ji bo heşîn bibe tê da

Xu namûsperwerî bavo

78.

Ji bo çêbit dilê wê da

Mezindêran*a*[3075] mêr bavo

79.

Iṭaʿetxû be lazim tê

Xuda ra hêj keç e bavo

80.

Jina Xudanenas bê xid-

met e mêrê xu ra bavo

81.

Mîna dêla[3076] diz e rojê

di mala yek*î* day bavo

82.

---

[3073] **Zîvan**: Genimê reş, xilor, bijûreş, kirikhewêdî

[3074] **Şureḥ**: Navê qadî/hakimekî mezin e ku di dewra Hz. Elî de jiyaye.

[3075] **Mezîndêran:** Ew ê ku mezinên xwe dizanê, ji wan re rêz digire.

[3076] **Dêl:** Kûçika mê

Mişala bêxudî pezzê

Rojê zevîkî day bavo

83.

Jina ev xû be jê ra qenc

Bizane pur ş*î*rîn bavo

84.

Ji mêr û zar*o*kê xu ra

Belakî mezin e bavo

85.

Wuşa derdek*î* duşwar e

Mêran ra mirin e bavo

86.

Z*a*rokan ra çiçîkê dê

K*a*nîya jîn*ê* ye bavo

87.

Eger paqiş be şîrê za-

r*o*kan paqiş in ew bavo

88.

Ber û helmêz*a* dê dersxa-

neya zarok*a*n e bavo

89.

X*û*yê baş û nebaş zarok

Ji wê hildigirin bavo

90.

Wuşay qîzan li ser xûyê

Delal mezin bikey bavo

91.

Dema bûn d*ê* ji wanan

Milletik paqiş çêbit bavo

92.

Ji berfa pak z*û*lal[3077] çêbit

Ji rêxê mêş*a* reş bavo

---

3077 **Zulal**: Navê kurmekî ye ku li berpalên çiyayên bilin, binê berfê de çêdibe. Kurmikên berfê jî dibêjin. Hindî tilîkî mirovan mezin dibin. Di hindurê wan kurmikan de av heye ku ew av gelek şîrîn û xweş e.

93.

Ji avê gul*a* geş çêbit

Ji mîzê gul*a* reş bavo

94.

Bi gor eṣlê xu her tiştek

Dibit baş û nebaş bavo

95.

Du zarokê heval cêwrî[3078]

Hebûn diha[3079] w*a*nan bavo

96.

Wezacan bû tenikḫal bû

Ne kar û xudî key bavo

97.

Du zarok van d*î*t û da wan

Heval cêwrîy*ê* xu bavo

98.

Ji wanan her yekî zaro-

kî girt û xudî kir bavo

99.

Bi şîrê wan meh û ṣalan

Zarok pêş da hatin bavo

100.

Li wan mêze kirin ḥetta

Bi firrê ketin ew bavo

101.

Dema gîştin zemanê xan-

dinê dan mekteban bavo

102.

Pir û ṭûj bû zekaya wan

Ketin  numrê p*ê*şîn bavo

103.

Bi wanan xandin pur xweş hat

---

[3078] **Cêwrî**: Cêwî, cotik

[3079] **Dih**: Dê, dayîk

Dewam kirin tê da bavo

104.

Ji xandina jorîn girtin

Şehadetname wan bavo

105.

Derê dewletê da ew bûn

Xudî karê mezin bavo

106.

Ji wanan yek melekxû bû

Kesek jê naêşî bavo

107.

Mîna Yûsif temîzrû bû

Diva[3080] wî her kesî bavo

108.

Di karê xu mîna şêr bû

Teralî nedikir bavo

109.

Gotina wî mîna şêr bû

Dilê kul ra şifa bavo

110.

Bi duşminan mîna dostan

Dikira qencî qenc bavo

111.

Alîkerê jêrê destan

Bû ew dara fêkî bavo

112.

Çima ew şîret û şîrê

Ji dê dît va diva bavo

113.

Dibêjin xûyê bi şîrî

Naçe bi pîrîyê bavo

114.

[3080] **Diva**: Divê

Yê dî wek agir û dû bû

Şûna lê meḥv dikir bavo

115.

Dikir wêran cihê lê bû

Mîna kundê *kor* ew bavo

116.

Neçaran ra xerabxû bû

Ew wey bavê wey bav bavo

117.

Ji ber ẓulma wî ahîn ta

diçûn ʿerşê Xuda bavo

118.

Çima şîrik*ê* xarê bû

Piçûkîya xu da bavo

119.

Ji dê ew terbîya dî bû[3081]

Ji wî eva diva[3082] bavo

120.

Mehêle za*rok* her şîrê

Vexû ger bav î, tu bavo

121.

Çima şutlê[3083] b`ava şêlû

Ev dî ʿişk dibû bavo

122.

Weya wek dirrehan[3084] bi gir-

nuk û îsturî ye bavo

123.

Didirre can û kincê wî

Kesî jê nêz dibe bavo

124.

Bizan terbîye wek şîr e

[3081] **Dî bû**: Dîtibû

[3082] **Diva**: Dixwest

[3083] **Şutil**: Şitil, dalye, sadir, qesîlk

[3084] **Dirreh**: Dirî, stirîn

Ji zarokê te ra bavo

**131.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

Hína şiva ṭer î lawo

Bibe doġrî[3085] eman lawo

2.

Dema kûz bûy[3086] mína bavo

Êdî rast bûn diçe lawo

3.

Hína can î bibe kanî

Ji ʿilm û ḥilmê[3087] ra lawo

4.

Dema pîr bûy wekê zanî

Feṣal[3088] ji dest diçe lawo

5.

Hína çare heye bo te

Li xu pirsê bikey lawo

6.

Şîna ser mirîyan taway[3089]

Para nazivríne lawo

7.

Bizane qîmeta wan çaġ

û rojê xortîyê lawo

8.

Hezaran ḥine key mûyê

Sipî dîsa pír î lawo

9.

---

[3085] **Doġrî**: Rast

[3086] **Kûz bûy**: Piştxwar bûyî, kov, xûz, bûl

[3087] **Ḥilm**: Xûnerm, nermxûy

[3088] **Fesal**: Fersend, keys

[3089] **Taway**: Tişt, tiştek

Ku masîyê di beḥrê da

Ji dest çû tim diçe lawo

10.

Birije av*a* tasê nay

Civandin car*î* dî lawo

11.

M*û*yan reş kî bi çi qurmû-

çekê îstû dibî lawo?

12.

Bibî qurmûçikan dîtin

û karîn çaw*a* tên lawo?

13.

Gula payîz*ê* pirmilî[3090]

Carî dî geş n*a*be lawo

14.

Zivistanê gul û sosin

Heşîn nabin ʿezîz lawo

15.

Di xortîya xu da ḥetta

Dikarî cehd[3091] bikey lawo

16.

Bi zanînê meqamê pur

Bilind dest xu xîne lawo

17.

Ji bo qedr û q*î*meta te

Bi pîrîyê neçit lawo

18.

Zana zêr e çiqas pîr be

Zeman naguh*ê*ze lawo

**132.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

---

[3090] **Pirmilî**: Çilmisî

[3091] **Cehd**: Xebat, şixul

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Pur pur bizane qedr*ê* xu tu ruḥ*ê* ʿalem î mela![3092]

Cihan ḥeyatê na*key* qeṭ bê te bi yek demê mela!

2.

Dema tu jîr û geş bibî ʿalem j*î*r û geş e hemî

Weqta weza[3093] û ne*xweş* bî ʿalem j*î* bêḥal e mela!

3.

Jîrîtîy û geşîy*a* te bi nasîy û îman*ê* ye

Dema nebin vanan te ra tu defterik ṭal î mela!

4.

Zanîn*a* te beyhûde ye hevalîya te tewş û hîç

Wek reqreqa pelan mijûlbûna te bê faydey mela!

5.

Kesî nebit tê da *î*man tê da n*î*ne ʿişq û evîn

Kesî nebit tê da evîn ji qism*ê* dara ne mela!

6.

Dar dim*î*ne li şûnekê kes ra neke ṣal û mehan

Rakin bibin seray*a* şeh[3094] li şûn*a* ṣolan e mela!

7.

Bi şaşik û bi kûlehan çendan ku xemlandîye jor

Wek bast*o*nan welê bi jêr nêv rêx û gû da ye mela!

8.

Divêt bi cewher qenc*î* bit, fena[3095] ṣ*a*de zîv û zeran[3096]

Ji ʿeyb*a* tevlihevb*û*nê te da nebit piçek mela!

9.

Hîna dibî bilindq*î*met hîna dibî sosinṣifet

Ji erḍ*ê* radibî diçî ber ṣûretê yaran mela!

10.

Hinik bi nêrînê hinik bi bêhn û destdanê dikin

---

3092 **Mela**: Di vê helbestê de mebest ji “mela”yê, hemû ehlê ilmê ye ku ev helbest, ji wan re wekî şîretname hatiye gotin. (H.)

3093 **Weza**: Jar, qels, ze‘îf, lawaz

3094 **Şeh**: Şah, padişah

3095 **Fena**: Wekî, mîna

3096 **Zer**: Zêr

Ji te xu ra karek*î* tu le*z̲z̲*et*a* canan î mela!

11.

Di meʿdena xu da welew ku zêr digel axê ye tim

Lêkin *zêr* ra qîmet*a* rast weqta qetanê ye mela!

12.

Zana ḥetta dev bernede ji xûy û hevalê nebaş

Bira xu ra hêvî neke qedr û bilindayî mela!

13.

Agir*ê* ʿişqê her divêt ji bo qetanê ey bira

Bê germ*î* û ḥelandinê ma zêr dibit ṣade mela!

14.

Ji nasîya ṣadetîya te ra divêt nêrîn*a* pîr[3097]

Çer nas*î*ya zêr ra meḥek[3098] divêt hebe dilber mela!

15.

Wuṣa ye ṣalê çend*î* car xu bide rotkena[3099] p*î*ran

Bo qenc bizanî ṣadeyîyan tevlehev î tu mela!

16.

Azatîy[3100] û pûçatîya heye di te yeqîn bizan

Cehan*ê* da heye meger tu qelb*ê* ʿalem î mela!

17.

Her wekî îstûn[3101] î bi xu pal daye ser te ʿalemê

Hebe çirûgîyek[3102] te da ʿalem dikev tirsê mela!

18.

Ger bişike qîmet*a* te bi xûy û karanê nebaş

Dikeve xarê ʿalema paldaye ser te da mela!

19.

Îmam*ê* Eʿẓem[3103] dîte zarokek li pey gogê bi lez

Wek dol*a*bê tê û diçe got, pur merev kurêm[3104] mela!

20.

---

[3097] **Pîr**: Dostê Xwedê, welî, ewliyaûllah, şêx

[3098] **Meḥek**: Ji bo naskirina eyara zêrê, kevirekî taybet e. Bi wê kevirê mirov dizane ku eyara zêrê çi ye.

[3099] **Rotken**: Rontgen, amûrê rontgenê

[3100] **Azatî**: Pûç nebûye, xiranebûye, saxlem

[3101] **Îstûn**: Stûn, girş

[3102] **Çirûgî**: Pûçatî, xirabî

[3103] **Îmamê Eʿẓem**: Ebû Henîfe. Damezirînerê mezheba Henîfiyê ye.

[3104] **Kurêm**: Kurê min

Dû ra dikevî xar*ê* dêşî yan *diş*kê ji te cihek

Canê te nazik e te ra hêdî ç*û*yîn qenc e mela!

21.

Got, ey Îmamê pur mezin ji xu bitirs tu nekevey

Bi ketina te ʿalemek dikeve xarê xweş mela!

22.

Dil bide rotkena p*î*ran tê da nehêl çirûgîyê[3105]

Bikev*î* xarê ʿalemek bi te dibe helak mela!

23.

Her dem bi şîretê p*î*ran derman bikey qelbê birîn

Birîn*a* qelbê xu bizan di qelb*ê* ʿalem da mela!

24.

Zanay*ê* bê işqa Xudê bira mireh[3106] bizane xu

Ne ew ji xu, ne kes ji wî dibîne feydeyek mela!

25.

Benzîn*a* ʿişqê lazim e motor*a* dil da pur hebit

Li rê nemînî îst*û*xar û per*î*şanḥal baş mela![3107]

26.

Ji kerw*a*nê Xudêrewan[3108] nemîn*î* para tu tenê

Tenêtîya vê rê bizan ji mirinê zortir mela!

27.

Çendan hebit dilê te da benzîn*a* ʿişqa sermedî

Dema nebit pîrek emîn li cî dimînî tu mela!

28.

Gelo tironpêl[3109] bê ş*o*fêr çawa diçit rê da birast

Weya firoker[3110] bê p*î*lot çawa diket firrê mela!

29.

Weya pezekî bê şivan çawa diçit zozan*ê* xu

Heye hezar gur û diz û şêr û piling rê da mela!

30.

---

[3105] **Çirûgî**: Rizîbûn, pûçî
[3106] **Mireh**: Mirî
[3107] **Baş mela**: (Ey) melayê baş
[3108] **Xudêrewan**: Ew ê ku di riya Xwedê de diçe. **Rewan**: Çûyîn
[3109] **Tironpêl**: Tirimbêl
[3110] **Firoker**: Balafir, firinde

Di zanînê wek Romî[3111] bî, di nasîyê Mûsa dîsa

Te ra divêt Tebrîzî[3112] û Xiḍrek[3113] vekey çavan mela!

31.

Zanîn di vê rê bes n*î*ne dest ba*vêj* pêşa pîrekî

Çîrok*a* Berşîşê[3114] bi çav te dît*î*ye herḥal[3115] mela!

32.

Kesî nebit jê ra p*î*rek pîrê w*î* şeyṭan e mela

Gotîye gîştina tu car tewş nîne qewlê wan mela!

33.

Kanîy*a* dil der bibe her birije ser ziman *her* roj

Ḥikmetekî ṣade bibî her weke deryayê mela!

34.

Yan bib*î* wek baranekê heşîn bikey gul û gihan

Rehberekî emîn û zana her divêt te ra mela!

35.

Çêker*ê* kewnê[3116] gotîye bibin digel rastan bizan[3117]

Meʿna w*ê* gotina mezin bikey xu ra guhar mela!

36.

Neba Ebû Medyen[3118] tu car Muḥyedd*î*n Îbnî`l-ʿErebî[3119]

Nav nedida kesî li wî bi Şeyx*ê* Ekber qenc mela!

37.

Neba Muḥasibî[3120] d*î*sa Muḥemmedê Ġezal*î*[3121] ra

Kesî nedigota *Î*mam vîyan*ê*[3122] qenc bizan mela!

38.

Nebûn*a* pîrê Dehlewî[3123] ji Şehrezorî[3124] ra kesî

---

[3111] **Romî**: Mewlana Celaleddînê Romî. (bnr. 8/23)
[3112] **Tebrîzî**: Şemsê Tebrîzî. (bnr. 9/6)
[3113] **Xiḍr**: Hezretî Xidir. (bnr. 9/5)
[3114] **Çiroka Berşîşê**: (Bnr. 53/8)
[3115] **Herhal**: Bivê nevê, teqez, behemehal
[3116] **Çêkerê kewnê**: Aferînerê gerdûnê, çêkerê ‘alemê
[3117] Bnr. Qurana Pîroz, Tewbe: 9/119.
[3118] **Ebû Medyen**: Ebû Medyenê Mexrîbî. (bnr. 77/133)
[3119] **Muḥyeddîn Îbnî`l-ʿErebî**: Şêxê Ekber Îbnî Erebî. (bnr. 50/4)
[3120] **Muḥasibî**: Harîs el Muhasibî (781- 857). Alimekî mezin bû ku bi berhemên xwe ve ji Îmamê Xezalî re bûye mînak.
[3121] **Muḥemmedê Ġezalî**: Îmamê Xezalî. (bnr. 8/23)
[3122] **Viyanê**: Wana, wan tiştana
[3123] **Dehlewî**: Evdillah Dehlewî. Şêxê Mewlana Xalidê Şehrezorî bû. (bnr. 126/65)

Digot*a* Mewlana gelo di Şam û Şîraz da mela!

39.

Xanî[3125] bi Xalid[3126] bû mela li her cihî nav bû bela

Yan ne, bi milyonan hebû wek wî di Kurdan da mela!

40.

Dixaz*î* şûn û navekî bilind û qenc te ra hebit

Divêt te ra dirêj hevalîya Xudênasan mela!

41.

Mahiyyeta[3127] zatê Xudê ew ne*dit* naskirin bi te

Çawa tu ṣade kevir û yaqût ji hev nas key mela!

42.

Dixaz*î* pur xaşik gehana ẕat*ê* lemyezel[3128] bira

Heval*î*ya Xudêrewan divêt te ra mahir mela!

43.

Reha[3129] hêla ḥeq da diçe nîşan nede rehber bi te

Vê deşta pur bi reh da çer dinasî rahê ḥeq[3130] mela!

44.

Derd û cuwanîya delal bê yar û rehber çû ji dest

Gîştin heval ser menzilan li rê tenê mame mela!

45.

Jîna me gîrîn û ş*î*n e karê me ah û zar*î*n e

Me ra hedanek[3131] tu n*î*ne jar û xerabḥal im mela!

46.

Eman mekey hewar mekey ʿumrê xu tewş bi rê mekey

Wek min dimînî bê murad li çok*ê* xu xînî mela!

47.

Yara! **Ḥezîn** va ye ji te dûr nebe demekî ji te

Lewra j*î*nê dike bi te ruḥê **Ḥezîn** yar e mela!

---

[3124] **Şehrezorî**: Mewlana Xalidê Şehrezorî el-Kurdî. (bnr. 17/19)

[3125] **Xanî**: Necmedînê Xanî. Xelîfê Mewlana Xalidê Şehrozî bû. (bnr. 17/19)

[3126] **Xalid**: Mewlana Xalidê Şehrezorî el-Kurdî. (bnr. 17/19)

[3127] **Mahiyyet**: Wesf, taybetî

[3128] **Ẕatê lemyezel**: Ew zatê ku wenda/tune nabe, ango Xwedê Te‘ala

[3129] **Reh**: Rê

[3130] **Rahê ḥeq**: Riya rast

[3131] **Hedan**: Aram, sebr, tebat

**133.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Îro perîşanḥal e dil herdem bi êş û jan e dil

Wek por*ê* zencîyan[3132] di her hêlê d*a* wî fikir bela

2.

Gelo tune dostek Xudê fikircivîn û ġemrevîn

Ev dil*ê* nû cuwan*ê* me her roj bi ṣed derd û bela

3.

Tenê dizanim ez çiqas giran e derdê dil*ê* jar

Nakeve ṣed Şerḥa ʿUbab[3133] naniv*î*sîne ṣed mela

4.

Hinek newal û rê hene li ʿalema ḥalê dilan

Li qad*ê* wê neketîye çavê Siyahpoş[3134] û Mela[3135]

5.

Bibe demek tev me heval dizan*î* dil ra çi ye ḥal

Hevalîya dostan dike ji zeng[3136] û ranê[3137] dil qela

6.

Hîna dinasî xu dizanî ḥal*ê* dil çi ye **Ḥezîn**

Hîna bi evîna Xudê bi can dibî dil mubtela

**134.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Şukur *î*ro heye te da ji yar*ê* ṣed nîşan dila[3138]

---

[3132] **Zencî**: Mirovên çermreş. Ji ber ku porê zenciyan piranî gangilok e, xelek xelekî ye, tevlihev û aloz e.

[3133] **Şerḥa ʿUbab**: Navê kitêbeke ferhengê ye ku Sexxanî piştî bîst cildî ew hê gihaye herfa "م : mîm" a ʿErebî.

[3134] **Siyahpoş**: Helbestvanekî kurd e ku navê wî Mihemed Cewad e. Navlêka wî Siyahpoş e. Ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Di dawiya sedsala 18. de jiyaye. Berhemên xwe yên Seyfu'l-Mulk û Melke Xatûn di sala 1820'an de nivîsine. (Adak, *b.n.,* r. 281-286)

[3135] **Mela**: Melayê Cizîrî. (bnr. 50/3)

[3136] **Zeng**: Jeng, zingar

[3137] **Ran**: Qirêjî, gemarî

[3138] **Dila**: Ey dil, dilo! Li vir banglêkirina dilê tê kirin.

Ji nasîya z̠atê Xudê tu mîn*a* derya yî dila

2.

Fikir m*î*na ḥûtan[3139] mezin hene di deryaya te da

Muşkil*ê*[3140] wek ḥûtan mezin da diq*û*lînî xweş dila

3.

Cewher û durrê[3141] pur h*ê*ja hene di deryaya te da

Tekek ji wan were ẕuhûr dunyay*ê* ra bes e dila

4.

ʿUmman[3142] û Qulzem[3143] û Ege[3144] cem te m*î*na golên biçûk

Derya bi te nabin qiyas muḥîṭ*ê* hadî[3145] yî dila

5.

ʿAlem*a* jorîn û j*ê*rîn digir*î* xweşikî xu da

Dunya bi te nabe qiyas ʿerşê Xuda yî tu dila

6.

Ṣed Mes̠newîy yû Meʿnewî[3146] ṭeng tên ji meʿnayê te ra

Lubab[3147] qiyas nabe bi te meger tu Quran î dila

7.

Mezin*î* û giranîya nig daye ser te bêḥed e

Sîpan[3148] di bin du ta dibin meger Ḥimalay[3149] î dila

8.

Zencîr*a* te ji êr[3150] *ḥet*ta ʿerşê Xudê dirêj b*û*ye

Munẕir[3151] qiyas nabe bi te Toros[3152] te ra viz tê dila

---

[3139] **Ḥût**: Masiyê herî mezin, balîna

[3140] **Muşkil**: Dijwar, zor, pirsgirêk

[3141] **Dur**: Mirarî, mirwarî

[3142] **'Umman**: Behra 'Ummanê. Kendava Farsê an jî behra Îranê jî dibêjin. Qismekî ji okyanûsa Hîndê ye ku di navbera Pakistan, Hindistan, Erebistan û 'Ummanê de dibîne.

[3143] **Qulzem**: Behra Qulzem. Gelî cihan bi navê "behra Şapê" an jî bi tirkî "Kızıldeniz" derbaz dibe.

[3144] **Ege**: Behra ku di navbera Tirkiya û Yewnenistanê de ye. Qismekî behra Spî ye.

[3145] **Muḥîṭê hadî**: Okyanûsa Pasîfîk.

[3146] **Mes̠newîy yû Me'newî**: Kitêbên mesnewî û me'newî ne. **Mes̠newî** kîtêba Mewlana Celaledînê Romî ye. Bi zimanê farisî hatiye nivîsandin. **Me'newî** jî kitêba Îbrahîmê Gulşenî ye ku bi zimanê farisî hatiye nivîsandin. (Ji bo herdu pirtûkan bnr. 8/22)

[3147] **Lubab**: Di dîroka Îslamê de gelek kitêbên meşhûr hene ku navê wan Lubab in. Lê me nezanî ku ev kitêb kîjan Lubab e.

[3148] **Sîpan**: Çiyayê Sîpanê an jî Sîpana Xelatê. Yek ji bilintirîn çiyayê Bakûrê Kurdistanê ye. Dikeve aliyê bakûrê Behra Wanê. Bilindahiya wî 4058 m. ye.

[3149] **Ḥimalay**: Çiyayê Hîmalaya. Di dinyayê de mezintirîn û bilintirîn çiya ye ku li Çînê ye.

[3150] **Êr**: Ji vir

[3151] **Munẕir**: Çiyayên Munzirê. Dikeve li rojavayê herêma Serhedê. Di navbera bajarên Dêrsîm û Erzîncanê de nin. Bilindahiya wan 3300 m. zêdetirin.

[3152] **Toros**: Çiyayên Torosê. Li başûrê Tirkiyeyê, di herêma Behra Spî de nin.

9.

Çiqas biçûk ḥecm[3153] î bi xu, wenda b*û*ye te da welê

ʿAlem seraser pêş û paş tu lewḥ[3154] û kursîyyî[3155] dila

10.

Ew sirr*a* bû xuya li te, li Cûd*î*[3156] û Ṭûrê nebû

Di huner û sirrê xu da tu Cebelu`n-Nûr[3157] î dila

11.

Agrî çiqas çiyay gir e lê kanîya ava ḥeyat

Te da heye, wuṣa ye tu ṣifet hezargul î dila

12.

Mîsisipî[3158] û Am*a*zon[3159] çiqas dirêj û av pir in

Te da ye her ava biheşt meger tu Ferat î dila

13.

Ji bil n*û*r û sirra Xudê nahêl*î* tiştikî xu da

Di ʿalema dunyay*ê* da tu mîn*a* Ḥicaz[3160] î dila

14.

Bi av û geha û gulan çendan tu xemlandî n*î*nî

Leṭîfeyê rebban*î*ye[3161] wek Keʿbe ye te da dila

15.

Lewra ji her hêlê dunê têtin ziyaret bir bi bir

Bo girtina feyżê ji te, ruḥanîyê yaran dila

16.

Tên ji Fas û ji Caw*a*yê[3162] tên ji *Bel*x[3163] û Buxar*a*yê

---

[3153] **Ḥecm**: Cism, şikl

[3154] **Lewḥ**: Ew lewha ye ku çi tişt qewimiye û dê biqewime li ser wê bi qelem hatiye nivîsandin. Xwedê cara yekem wan lewh û qelemê afirandiye. Qelem di wê lewhayê de dê çi biqewime, hemî nivîsandiye. Li gorî tesewufê lewh zanîna Xwedê û qelem jî îrada Wî ye. Ji lewhê Hz. Îsrafîl berpirsiyar e. Ew lewha li asîmanê di qata heftê de ne û hem dirêjahiya wê û hem jî firetahiya wê qasî ku navbera rojhilat û rojavayê ye. (Pala, *b.n.,* r. 287.)

[3155] **Kursî**: Li asîmanê di qata nehê de ne. Di nav wê qata nehê de heşt qatên din jî hene. Lewh û qelem jî li wir in.

[3156] **Cûdî**: Li Şîrnex û Sîlopiyê ye û bilindahiya wî 2.114 m. ye. Li gorî baweriya misilmanan piştî tofana mezin a Hz. Nûh, geştî li pozê çiyayê Cûdiyê daketiye.

[3157] **Cebelu`n-Nûr**: Çiyayê Nûr. 6 km li bakûrê bajarê Mekkeyê ye. Şkefta Hîrayê li wir e. Hz. Muhammed (saw.) wehya ‘ewil li wir hildaye.

[3158] **Mîsisipî**: Dirêjtirîn çêmê bakûrê Emerîkê ye. Di zimanê Çermsoran de bi mana “çemê mezin” e.

[3159] **Amazon**: Di dinê de yek ji wan çêmê dirêjtirîn û firehtirîn e.

[3160] **Ḥicaz**: Li ‘Erebîstanê herêmek e. Di wê herêmê de bajarên Mekke û Medîne jî cih digire. Ji ber vê yekê cihekî pîroz e.

[3161] **Leṭîfeyê rebbanîye**: Perçeyekî girêdayî Xwedê ye ku tenê di qelbê mirovan de heye

[3162] **Cawa**: Cezayîr. Li bakûrê parzemîna Afrîqayê ye.

Tên ji Ṣenʿa[3164] û Beġd*a*yê bêḥed meded bo te dila

17.

Sema û erḍ û îns û cin wenda ne têk nûra te da

Di ʿalema meʿnay*ê* da tu her wekî roj î dila

18.

Tekrîm*a*[3165] insanan bi te`y tefżîl*a*[3166] însanan bi te`y

Eger nebî heykelek û insan m*î*na hev tên dila

19.

ʿEql û xeyal û ḥafiẓe ji te digirin zan*î*nê

Leṭaîfê mudrike[3167] ra meger tu ustaẕ[3168] î dila

20.

Ḥeyat*a* ʿalema cesed bi ḥukm û tedbîra te ye

Ji ʿalema wucûd*ê* ra meger tu sulṭan î dila

21.

Dema tu baş bî yan nebaş, wucûd gora ḥalê te ye

Lewra bi gor paşê[3169] dibit baş û nebaş millet dila

22.

Çiqas ku bejn û reng û rû xweşik û dilgeş bin d*î*sa

Xudê li te nêrîn dikey nêrîngeh î ḥeq ra dila

23.

Mîna Hezargol[3170] û Meneşkûtê[3171] hezar zozan hebin

Ji cilweyê rebban*î* ra tenê tu wargeh î dila

24.

Bengîy*ê* ḥusna ḥeqq *î* tu, mestê n*û*ra muṭleq *î* tu

Wek sîperê[3172] bêdeng *î* lê di nêv*a* agir î dila

25.

---

[3163] **Belx**: Bajarekî kevn û dîrokî ye. Li bakûrê Efxanistanê ye.

[3164] **Sen'a**: Paytexta Yemenê ye.

[3165] **Tekrîm**: Rûmet, şeref

[3166] **Tefżîl**: Bilindahî, qencahî

[3167] **Leṭaîfê mudrike**: Ew tiştên ku bi çav nayê dîtin lê hene û an jî tên îdrak kirin. Ew jî; 'eql, xeyal, hafize, wahîme (wehîm kirin), musekkîre (tahlîl kirin) û hwd.

[3168] **Ûstaz**: Seyda, mamostê mezin

[3169] **Paşê**: Paşa, serê civakê, serek, serok

[3170] **Hezargol**: Bîngol, Çewlîg.

[3171] **Meneşkût**: Herêma ku berjorê çemê Feratê, Solaxan, çemê Bîngolê û deşta Mûşê di nav xwe de dihindûre.

[3172] **Sîper**: Pirpirok, minminîk

Şewat û êş ḥeqqê te ye lal û *ker*rî ḥeqqê te ye

Xaşik*î* û meziniya yarê weha divê dila

26.

Bo girtina durrê mezin noq bûy di deryaya b*ê*bin

Nêze werî cuda kirin ji xu`w ji her tiştî dila

27.

Ḥeqqê te ye werî qetan bavêj*î* paşguh fan*î*yan

Madam ku ḥeqnas î ji dil, ji ġeyr*î* wî biqet dila

28.

Nasîy*a* te îro n*î*ne evîn*a* te îro n*î*ne

Qalû bela[3173] da nas û bengîyê Xuda yî tu dila

29.

Huner û pur behaya te, ne ku bi cismê ax*î*n[3174] e

Dîbû[3175] kemala ḥedd*ê* xu dema tu rûtruḥ bûy dila

30.

Belkî di wî zeman*î* da purtir behaya te hebû

Ku nêz*î*kê ʿerşê Xudê hebû te ra hêlûn dila

31.

Cihan te ra war e, ne ku welat û bajarê te ye

Rojek*ê* bar dikî diçî dîsa welatê xu dila

32.

Dîsa digêjî gul*a* geş dîsa dibînî ḥal*ê* xweş

Derbaz dibin van roj*ê* reş pur ġem mekey qijik[3176] dila

33.

Bo gîştina nêrgiz*a* napeyda[3177] tu dilrencîde[3178] yî

Wek bulbulan bo ṣorgulê peyda tu ġem nakey dila

34.

Miraz*a* te gihan e her, lez̠z̠eta te ʿirfan e her

Qulingê zozanê *ḥeq*q î, feżay*a* weṣfan[3179] da dila

---

[3173] **Qalû bela**: (Bnr. 68/16)
[3174] **Cismê axîn**: Bedena mirovan ku ji axê/xweliyê hatiye çêkirin.
[3175] **Dîbû**: Dîtibû
[3176] **Qijik**: Teyrekî ji cureyê qirikê ye, çûkekî feqîr e, nikare hêlûna xwe çê bike. Li vir mebest ji "qijik dila" ev e: ey dilê ku feqîr û jar û bêmal!
[3177] **Nêrgiza napeyda**: Mebest jê Xweda ye
[3178] **Dilrencîde**: Dilêşyayî, dilşkestî

35.

Çendan hebin baġ û beheşt çendan hebin ḥûr[3180] û surişt[3181]

Weqta nebit yar lê xuya her weke zindan e dila

36.

Bustan*ê* gul tê da n*î*ne bulbul r*a* gomek tarî ye

Welat*ê* tê da yar n*î*ne bengî r*a* xopan e dila

37.

Ji bêş*î*gê[3182] ḥetta bi gor eger bizanî tim diçî

Di vê cihanê da meger tu rêw*î*kî dûr î dila

38.

Bo xastina qanûn*a* ḥeq hatî qûmistana dunê

Ṣibê were behar te ra dîsa diçî zozîn[3183] dila

39.

Ahî! gelo têtin behar ji cism*ê* axîn derkevim?

Wek şal*û*lan baġê muqeddes da bikem firrê dila

40.

Dirêj zeman e em bi dafa cism*ê* axîn mubtela

Şahê cehan bernade ma êdî me yê bêḥal dila?

41.

Xastin û hêvîya **Ḥezîn** cehan*ê* da ev e ji te

Ġafil û sist mebe demek ji ẕikr û xidmetê dila

**135.**

mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –

1.

Pirî musilmanan *î*ro

Îman*a* xu berdane ro[3184]

Nîne ji wan ra av*a* rû[3185]

---

[3179] **Feżaya weṣfan**: Asîmana sifatên Xwedê

[3180] **Ḥûr**: Horiyên cennetê

[3181] **Surişt**: Melek, melaîket, firişte

[3182] **Bêşîg**: Landik, dergûş

[3183] **Zozîn**: Zozan

[3184] **Ro**: Çem, rûbar

Ya Reb li me reḥmê bikey

2.

Îman çûye maye guman

Şer‘[3186] û ḥeqîqeṭ qeṭ neman

Werd[3187] û ṭerîqet bûn dûman

Ya Reb li me reḥmê bikey

3.

Axir zeman e lo bira

Lew bûn neyar bav û bira

Li hev dinêrin wek kora

Ya Reb li me reḥmê bikey

4.

Ḥedîs̱ û ayetê Quran

Kesek qezî nake[3188] ji wan

Berdane zêran û peran

Ya Reb li me reḥmê bikey

5.

Kan rojî û kanê nimêj

Kanê ẕikr û fikrê dirêj

Kan çavê hêstiran dirêj

Ya Reb li me reḥmê bikey

6.

Barê me barek pur giran

Rêzanê me bûne nezan

Serkarê me bûne xizan

Ya Reb li me reḥmê bikey

7.

Dil ‘işk e nerm nabe tu car

Çav hêstiran qeṭ nake xar

Rabûn ji bin soz û qerar

---

[3185] **Rû**: Rû û ro gava bi tîpên erebî tên nivîsîn wekî hev in û hemserwa ne. Le bi tîpên latînî de ev serwa xera dibin.

[3186] **Şer‘**: Şerî‘et

[3187] **Werd**: Wird, zikrê sofiyan

[3188] **Qezî nake**: Napeyîne, xebernade, naaxive

Ya Reb li me reḥmê bikey

8.

Rabû ji bin dînê mubîn[3189]

Dunya bûye derew û kîn

Ḥeqq e ku em şînê bikin

Ya Reb li me reḥmê bikey

9

Ḥukmê şerîʿetê hilat[3190]

Dîn ra kesek nake xebat

Bo fisq*ê*[3191] çê dibin civat

Ya Reb li me reḥmê bikey

10.

Dînê ʿezîzê Eḥmedî

Çawa *î*ro ma bêxudî

Ev dewr*a* tu keskî nedî

Ya Reb li me reḥmê bikey

11.

Ḥeqqê me ye şîn û g*î*rîn

Boy rab*û*na dînê mubîn

Derdek bizane pur mezin

Ya Reb li me reḥmê bikey

12.

Gelo dibînim rojekî

Pirsê dike xas mêrekî

Tîne ji me ra nûrekî

Ya Reb li me reḥmê bikey

13.

Şerʿa Resûl dîsa t*î*ne

Şûrê Xudê dihej*î*ne

Hukmê Quranê dat*î*ne

Ya Reb li me reḥmê bikey

---

3189 **Mubîn**: Eşkere, zelal

3190 **Hilat**: Rabû, rakir

3191 **Fisq**: Guneh, ji riya heq/rast derketin

14.

Gelo heye rojek were

Quran dibe ḥakim me re

Qurban dikim can bê pere

Ya Reb li me reḥmê bikey

15.

Pîqrût*ê*[3192] jinan pir b*û*ne

Serqot û sîng tazî ç*û*ne

Kes nab*ê*je ma hûn k*î* ne

Ya Reb li me reḥmê bikey

16.

Tê taz*î* jin çente di dest

Digre bi pîlê xort*ê* mest

Mêr nab*ê*je çi ye te qeṣt

Ya Reb li me reḥmê bikey

17.

Xêrxaz*î* û ḥeya`w ḥużûr

Gelek ji qelban bûne dûr

Çav ji ḥeqqê tev bûne kor

Ya Reb li me reḥmê bikey

18.

Ras(i)t*î* çûye xar*î* ma

Dos(i)t*î* çû neyar*î* ma

Fisq û fucûr[3193] tev bûn xuya

Ya Reb li me reḥmê bikey

19.

Xande bi dîn nezan b*û*ye

Kur ji b*a*vê xu qeṭîye

Xûyê k*o*vî kedî b*û*ye

Ya Reb li me reḥmê bikey

20.

Leylan[3194] b*û*ye ava zelal

---

[3192] **Pîqrût**: Çîprût

[3193] **Fisk û fucûr**: Ji riya Xwedê derketin, li dijî Xwedê serî hildan

Ḥeqq û ḥeqîqet bû xeyal

Ẓulm û derew bûne mis̱al

Ya Reb li me reḥmê bikey

21.

Axret ji bin ji bîr b*û*ye

Tirsa Xudê ji dil ç*û*ye

Nûr ji r*û*yan derketiye

Ya Reb li me reḥmê bikey

22.

Purrî me bûne bê nimêj

Bê reng û rû û dilqirêj

Mirov*ê* qenc bûn mat û gêj

Ya Reb li me reḥmê bikey

23.

Dernojîya[3195] di gundîyan

Xirawîya bajar*î*yan

Xudê nede gerê çiyan

Ya Reb li me reḥmê bikey

24.

Ey xaliqê[3196] kewn[3197] û mekan

Ey raziqê[3198] pîr û cuwan

Ey destegîrê bêkesan

Ya Reb li me reḥmê bikey

25.

Ey hêvîya bêhêv*î*yan

Dilan bide ber tavîyan[3199]

Kedî bike me kovîyan

Ya Reb li me reḥmê bikey

26.

Ey şahê ʿalem serteser[3200]

---

[3194] **Leylan**: Rewrewk, revrevik, serab
[3195] **Dernoj**: Ew kesê ku şerm û ʻeybên mirovan vedikolin û derdixin
[3196] **Xaliq**: Ewê ku her tiştî ji tunebûnê diafirîne
[3197] **Kewn**: Gerdûn, alem
[3198] **Raziq**: Ewê ku rizqê her kesî dide
[3199] **Tavî**: Rejne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demeke kurt dibare

Fežla[3201] te girtî beḥr û ber[3202]
Bê te nîne me ra mefer[3203]
Ya Reb li me reḥmê bikey
27.
Penahê[3204] me jaran tu yî
Hêvîya me xaran tu yî
Pişta gunehkaran tu yî
Ya Reb li me reḥmê bikey
28.
We`llahî[3205] em ʿebdê te ne
Li hêvîya luṭfa te ne
Bi can û dil em bende[3206] ne
Ya Reb li me reḥmê bikey
29.
Gelek perîşan e **Ḥezîn**
Hêstirê çavan bûne xwîn
Lewra di dîn da ye birîn
Ya Reb li me reḥmê bikey
30.
Ku da biçin tu ḥažir î
Em çi bikin tu nažir î
Em ʿaciz in tu qadir î
Ya Reb li me reḥmê bikey
31.
Gelî musulmanan bes e
Kan tekye û kan medrese
Tev bûn bê xudî`w bê kes e
Ya Reb li me reḥmê bikey
32.

---

[3200] **Serteser**: Seranser, ji serî heta binî
[3201] **Fežl**: Kerem, qencahî, huner, marîfet
[3202] **Ber**: ʻErd, reşahî
[3203] **Mefer**: Xilasbûn, felat, rizgarî
[3204] **Penah**: Spartin, cihê spartinê
[3205] **We`llahî**: Peyva sond xwarinê ye. Bi Xudê, bi navê Xwedê (sond dixwim)
[3206] **Bende**: ʻEbd, kole, xulam

Kan feq*î* û melay delal

Kanê *ew* şêxê pur kemal

Heywax dunê çer maye ṭal

Ya Reb li me reḥmê bikey

33.

Bûne hevalê kafiran

Emrê *wan* didin ser seran

Ji bon*a* zêran û peran

Ya Reb li me reḥmê bikey

34.

Pirrî me ber xu nakevin

Hêla Xudê ve nalivin

Lê boy dunê qeṭ nasenin

Ya Reb li me reḥmê bikey

35.

Hîşar nabe nefsa teres

Nayête wê dengê ceres[3207]

Ev çi ġeflet e çi hewes

Ya Reb li me reḥmê bikey

36.

Bes e ʿumur tewş rêkirin

Rojê`b hezaran dimirin

Li ser te ye şûrê mirin

Ya Reb li me reḥmê bikey

37.

Gelek birîndar im ji dil

Cerg û hunav tev bûne kul

Ji kar*ê* xu me pur xecil[3208]

Ya Reb li me reḥmê bikey

38.

**Ḥezîn** bes e ḥikmet merêj

Çav kor e dil girtî qirêj

---

[3207] **Ceres**: Zengil

[3208] **Xecil**: Şerm kirin, fedî kirin

Vê mebḥesê[3209] bes key dirêj

Ya Reb li me reḥmê bikey

39.

Tedbîrekî bigir xu re

Ji vî welatî zû *her*re

Ji vî kelamê bi*qer*re

Ya Reb li me reḥmê bikey

40.

Lewra tu kes nabe guhdar

Guhkê xu ra naxe guhar

Vê ḥikmeta wek av*a* sar

Ya Reb li me reḥmê bikey

**136.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + – –/– + –

1.

Neqşekî neqşî dixazî dil girêde`b Xeznewî

Nisbeta rengîn dixazî hey li mala Xeznewî

2.

Qern*ê* pazdan[3210] ra muceddîd[3211] e ʿezîzê Ehmedî[3212]

Sosina qelbê murîda ne, r*û*xalê Xeznewî [3213]

3.

Murşidek himmet bilind e mîn*a* wî îro nîne

Ḥelq*a* zêra neqşebend e ʿizz*a*[3214] şahê Xeznewî

4.

Ron*î*ya dil, raḥeta ruḥ, himmet[3215] û feyż[3216] û ḥużûr

Tev kulîlk in dil*ê* dildarê cemala[3217] Xeznewî

---

[3209] **Mebḥes**: Mijar, babet

[3210] **Qernê pazdan**: Sedsala 15. (Ev mêjû li gorî hicrî ye ku mîladî ev dibe sedsala 20.)

[3211] **Muceddîd**: Li gorî hedîsê Hz. Pêxember, ew alim in ku di her sedsalê carek tê û heqîqetên bawerîyê li gorî zemanê xwe ji mirovan re vedibêjin.

[3212] **‘Ezîzê Ehmedî**: Şêx ‘Îzzedînê Xezna. (bnr. 8/16)

[3213] **Rûxalê Xeznewî**: Xal/nîşanek mezin li rûyê Şêx ‘Îzzeddîn hebûye ku li vir îşareta wê dike.

[3214] **‘Izz**: Îzzet, şeref. Li vir mebest jê Şêx ‘Îzzeddîn e.

[3215] **Himmet**: Parastin, alîkarî, ber bi rewşeke çêtir ve birin

[3216] **Feyż**: Ji qelb, dil, ruhê mirov re herikîna/hatina ‘ilm, nûr, bereket, tiştên manewî û hwd. e

5.

Pêl dide deryay*a* feyżê tên mudam nûr û t*î*rêj

Ji beheşta ẕikr û ṣuhbeta w*î* şahê Xeznewî

6.

Ne guman e ev mija nûranîya ʿalema dil

Nisbet û feyż e dişîne bal dilan ve Xeznewî

7.

Tu xeyal û xew nezane, van t*î*rêjê kesk û ṣor

Ew hemî nûr in dibarîne semaya Xeznewî

8.

Şehperê[3218] ʿişqê digel sulṭan*ê* ẕikrê hey liha[3219]

Bo çi bê nûr dûr dimînî lez were ba Xeznewî

9.

Nûbehar e ġem mekey ev dem dema derdan n*î*ne

ʿAşiq û meʿşûq digêjin hev bi destê Xeznewî

10.

Ne serî mane ne şaşik ne dil û ʿeql û şuʿûr

Tevd*a* dîn û beng*î*[3220] û mecẕûb[3221] û mestê Xeznewî

11.

ʿEn*î* paş û serbilind û qenc û pîroz î dilo

Ger birastî bib*î* dostê şehsuwarê[3222] Xeznewî

12.

Ṣed hezaran dilh*î*şar û nûrs*î*ma[3223] ṣef girtine

Bo kemal û gîştina xu bendewarê Xeznewî

13.

Reng*a* reng insan ji dûr tên, ref bi ref bal wî ve hey

Lewr*a* feyż û nûr dibare li welatê Xeznewî

14.

Xweş t*ê* ṭeʿm û ġulġulê avê delavê serḥedan

---

[3217] **Cemal**: Rindî, bedewî
[3218] **Şehper**: Di baskê teyran de perê herî dirêj
[3219] **Liha**: Li vir
[3220] **Bengî**: Evîndar, dildar
[3221] **Meczûb**: Ew kesê ku ji ber ʿeşqa xwe dîn bûye
[3222] **Şehsuwar**: Şahê sîwaran
[3223] **Nûrsîma**: Rûyê bi nûr, rûye geş

Wek serab in ew li nik nûrîn şeraba Xeznewî

15.

Xweş *tê* canan ra hewaya sirr*a* Bîngola bi nav

Lê nehêja ne li nik îksîr*a* helma[3224] Xeznewî

16.

Zaf li bajar û li gundan em geran bo dilberan

Me nedît şîrînedayek[3225] wek r*û*xalê Xeznewî

17.

Mest*ê* ḥaletê dil e hem ġerq*ê* beḥra nisbet e

Ê bi ixlaṣ[3226] xu sipartîye emana Xeznewî

18.

Xuḍ f*î* nari`l-ʿişqi min ġeyrik tiraṣin biḥtiraq[3227]

Înne fi`l-mewti ḥeyaten ʿinde babi`l-Xeznewî[3228]

19.

La tequl îġberreti`l-afaq weş tedde eẓẓulam[3229]

ʿEbru kulli`s-seʿbi sehlun ʿinde weṣli`l-Xeznewî[3230]

20.

Kem mine`l-meyyîti ruḥen we mine`l-mu ẓlimi qelben[3231]

Îrteqe`l-ʿelyae min enfasi quṭbi`l-Xeznewî[3232]

21.

La tere`l-yewme f*î* Cawae we Ṣenʿae we Şam[3233]

Bel f*î* Şîrazin we Ḥicazin mesile`l-Xeznewî[3234]

22.

Leyse qewlî haẕa cehlen bi`r-ricali fi`d-diyar[3235]

Belbil istiqrai ḥukmi bimedîḥi`l-Xeznewî[3236]

---

[3224] **Helm**: Bêhn, hêlim

[3225] **Şîrîneda**: Xweşdeng, şîrînawaz

[3226] **Ixlaş**: Her tiştî tenê ji bo Xwedê kirin, di kirina ‘emelên xwe de tenê riza Xwedê xwestin

[3227] Bê guhdana bi şewata agirê cudabûnê, di agirê ‘işqê de xwe noq bike.

[3228] Li ber deriyê Xeznayê di mirinê de heyat heye. (Ango, li ber deriyê Xeznewî bimirî, hingê di wê mirinê de heyat heye.)

[3229] Nebêje etraf toz girtiye, pir tarîtî çêbûye,

[3230] Borîna ji her tiştê zehmet, rihet e li nig gihana Xeznewî. (Ango, gava ku mirov bigihije Xeznewî, hingê borandina her tiştê zor û zehmet, ji mirov re hêsan tê.)

[3231] Pir însanê ku ruhê wan mirî bû û qelbê wan jî tarî bû,

[3232] Ji nefesê Qutbê Xeznewî, ew bal bilindahîyê ve çûye (ango, di hêla payeyê de ew mirov bilind bûye.)

[3233] Tu îro li Cezayîr, Sen‘a û Şamê nabînî.

[3234] Belkî di Şîrazê û Hîcazê de jî mirovekî wekî Xeznewiyan nabînî.

[3235] Di welatên din de ez mirovên wek Xeznewiyan kamil nas nakim û nizanim.

23.

Kulle ewṣafi`r-ricali min kemalati`l-beşer[3237]

Ġeyre inbain fequl fî ḥeqqi ʿizzi`l-Xeznewî[3238]

24.

Zaf xerab û dil qirrêj im, rênezan im kerr û gêj im

Lê tenê daim dibêjim hey hewar ya Xeznewî

25.

Kun ʿetufen bi`l-**Ḥezîn**i mil bi luṭfi neḥwehu[3239]

Înnehu kane yetîmen ʿinde babi`l-Xeznewî[3240]

26.

Nisbeta Norşîn[3241] û Ṣibġ û himmeta Ġewṣ̱ê Hízan[3242]

Ḥikmeta Belx[3243] û Buxarî[3244] li welatê Xeznewî

27.

Têk sitêrê Neqşubendan çûne ava ṣed şukur

Exlefe`l-lahu ʿeleyna ʿIzze Ġewṣ̱i`l-Xeznewî[3245]

28.

Ṣare cismî fî`f tiraqîn we ḍemîrî fî`h-tiraq[3246]

Weccihû ṣewbe`l-fuyûḍati îleyna Xeznewî[3247]

**137.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Yeqîn ʿIzzuddínê îro dilan ra her tu sulṭan î

---

[3236] Ne ku ez di welatên din de merivên kamil nas nakim, belê, ev pesna min bi lêkolînê ye (ku ez dibêjim wekî Xeznewiyan tune ye)

[3237] Hemî pesn û salixên ji wesfên merivê mezinan,

[3238] Ji bilî pêxemberiyê, ji bo 'Îzzê Xeznewiyê bibêjî li cih e. (Ango, ji bo Şêx 'Izzeddînê Xeznayê, ji xêncî wesfa pêxembertiyê çi bibêjî, çiqas pesna wî bikî, ev rast e.)

[3239] Ji Hezîn re bi şefqet bibe û bi lutfa xwe jî ser wî de xwar bibe.

[3240] Çunkî ew li ber deriyê Xeznewî yetîm bû. (Lewra Seydayê Mela Husnî gava ku ji bo xwendinê çûye dergahê Xeznayê, hingê yetîmbûye.) [Hezîn 14.09.2014]

[3241] **Norşîn**: Îşareta Şêx 'Evdirrehmanê Taxî û kurê wî Hezret Şêx Muhemmed Diyaûddîn (qs.)'yê dike.

[3242] **Sibx û Ġewṣ̱ê Hîzan**: Îşareta bal Xewsê Xîzan Seyda Seyyîd Sibxetûllah Erwasî dike. (bnr. 11/38)

[3243] **Belx**: Bajarekî li bakûrê Efxanistanê ye. Ji ber ku Mewlana Celaledînê Romî ji wî bajarî ye, îşareta wî dike.

[3244] **Buxarî**: Buxara li Ozbekîstanê bajarekî kevn û dîrokî ye. Ji ber ku Şahê Neqşîbend Muhammed Bahauddîn ji wir e, îşareta wî dike.

[3245] Sed şukur ji Xwedê re be ku ji me re Şêx 'Izzeddîn hîşt.

[3246] Cismê min di qetanê de ye, qelbê min jî di şewatê de ye.

[3247] Berê wan 'ewrê feyz û berekatên Xeznewiyan bidin me.

Seraser ḥikmet û nûr î ji feyżê ra tu ʿumman î

2.

Dilopek feyż*a* te cana, eger bibit neṣîb kî ra

Dimînit saġ hey û hey ew, çi ḥacet av*a* ḥeywanî[3248]

3.

Tîrêjik wê n*û*ra mora gewez[3249] bavêje ser qelbek

Dixemle ew dila dest da, çu[3250] gulzar û gulistanî

4.

Ji wê ḥikmet*a* te şaho kesî girtî xu ra nuqṭek

Ḥekîmek mahir e ew kes, çi ye ḥikmet*a* Luqmanî[3251]

5.

Ji qelban ra tu her nûr î, ji ruḥan ra tu ḥużûr î

Ji ʿeqlan ra tu rêzan î, ji nefsan ra zerefşan[3252] î

6.

Werin ehlê dilan pur lez, h*î*na pê ketîye ev luks

Li dora şewq*a*[3253] wê can din ji ʿeşqê mîn*a* perwanî[3254]

7.

Ew e sirra kemala dil, ew e şewq û şemala dil

Ew e derman*ê* cerga kul, *î*ro nîne w*î* ra s̱anî[3255]

8.

Muceddîd[3256] qern*ê* pazdan[3257] ra, ʿIzzuddîn e cehanê da

Weha hatîye qelbê me, bi îlhamek*î* rebbanî

9.

Ew e serçeşmeyê ʿirfan[3258] ew e her derd*ê* ra derman

Ew e her êş*ê* ra luqman, ew e deryay*a* iḥsanî

10.

---

[3248] **Ava ḥeywanî**: Ava jiyanê, ava heyatê
[3249] **Mora gewez**: Ew rengê pembe ya ku nêzîkî rengê sora êgir ye
[3250] **Çu**: Mîna, wekî
[3251] **Luqmanî**: Luqman Hekîm. (bnr. 126/40)
[3252] **Zerefşan**: Kesê zêran belav dike û davêje, zêravêj, zêrbelaker
[3253] **Şewq**: Ronî, nûr
[3254] **Perwanî**: Perwane, pirpirok, minminîk
[3255] **S̱anî**: Duyemîn
[3256] **Muceddîd**: Li gorî hedîsê Hz. Pêxember, ew alim in ku di her sedsalê carek tê û heqîqetên bawerîyê li gorî zemanê xwe ji mirovan re vedibêjin.
[3257] **Qernê pazdan**: Sedsala 15. (Ev mêjû li gorî hicrî ye ku bi mîladî ev dibe sedsala 20.)
[3258] **Serçeşmeyê ʻirfan**: Serekaniya nasîna Xwedê, çavkaniya zanîna Xwedê

Bi ẕahir nas û nasût[3259] e, di baṭin nûr*a* lahût[3260] e

Gula baġê melekût[3261] e, emînê sirr*a* subḥanî[3262]

11.

**Ḥezîn** im dilbirîn im, çav tijî xûn im hewarxaz im

Bişeyne[3263] ser me da şaho ji ʿewrê feyżê baranî

12.

Bi ḥeqqê Ġewṣ*ê* Xezna[3264] key li me jaran temaşa key

Birîndar in ji dil îro, tu her derdî r*a* derman î

13.

ʿErebistan,[3265] ʿEcemistan[3266] xu da girtî fuyûḍatan[3267]

Ji feyżê me nekey meḥrûm, bi ḥeqqê Ḥeżretî Ṣanî[3268]

14.

Kerr û gêjṣem ji ʿişqa te, d*î*n û dûr im ji weṣla[3269] te

Hewarxaz im ji luṭfa te, xerabḥal im ç*a*wa zanî

15.

Zimanê yê m*î*na Seḥban,[3270] li henber pesn*ê* te kurt tên

Tu sosina melekût î, gula bustan*ê* qelban î

16.

Bes e çekka ṭerîqa neqşubendî hatîye birrîn[3271]

Bi gor bejna te ya nûrîn, tu îro şah*ê* merdan[3272] î

17.

Di nusḥê[3273] da tu ʿEṭṭar[3274] î, di feyżê da tu Eḥrar[3275] î

---

[3259] **Nasût**: Însaniyet, her tiştê ku bi însanan re têkildar e

[3260] **Lahût**: Îlahî, îlahiyet, ‘alema îlahî, alema me’newî

[3261] **Melekût**: ‘Alema mulkê Xwedê

[3262] **Emînê sirra subḥanî**: Ew kesê ku jê re sirra Xwedê hatiye emanet kirin. **Emîn**; yek ji wan sifatên pêxemberane ji emanetên xelqê diparêzin, ango kesên dilsoz û ewlemend in.

[3263] **Bişeyne**: Bişîne

[3264] **Ġewṣê Xezna**: Şêx Ehmedê Xezna. (bnr. 9/27)

[3265] **‘Erebistan**: Welatê ku ‘Ereb lê dijîn.

[3266] **‘Ecemistan**: Cihên ku li derveyî ‘Erebistanê dibînin.

[3267] **Fuyûḍat**: Feyz û bereket

[3268] **Ḥeżretî Ṣanî**: Hezret Şêx Muhemmed Diyaûddîn Norşînî (qs.)

[3269] **Weṣl**: Gihîştin, gihan

[3270] **Seḥban**: Sehabê Wail. Xatip û xweşaxêv. Bi fesîh û herîkbariya axaftina xwe ve namdar bûye. (bnr. 77/27)

[3271] Ew kincên Neqşîbendî li gor benj û bala te hatiye birrîn, zehf li te hatiye. Ango tu jî laîqê wê kincê yî. Êdî bes e ew pesn ji te re kirin.

[3272] **Şahê merdan**: Şahê mêran

[3273] **Nusḥ**: Şîret, pend

[3274] **‘Eṭṭar**: ‘Elauddînê ‘Ettar. (bnr. 13/8)

[3275] **Eḥrar**: ‘Ubeydullahê Ehrar. (bnr. 13/8)

Di nêrînê tu Necmuddîn,[3276] tu sirra Xaliqê banî[3277]

18.

Ez im ʿaşiq[3278] tu yî meʿşûq,[3279] ez im naṭiq[3280] tu yî menṭûq[3281]

Dilan ra tu gula rûken, ez im bulbul*ê* bustanî

19.

Were cana binêre ca, çi agir hilb*û*ye dil da

**Ḥezîn** pey ket ji ʿeşqa te, hewara bê hewaran î

20.

Xudê yarê te be cana, keremkarê te be dilber

Cihan tev da bibe bo te çemengah[3282] û gulistanî[3283]

**138.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / feʿûlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − −

1.

Ji xew rabe hevalê min delalo

Nehêja ye dunê ger tu bizanî

2.

Hezaran wek te insan hatin û çûn

Li cih hîştin hezaran koşk û xanî

3.

Neraweste m*î*na avan şev û roj

Biçe pêş da bilind be hîn*a* cuwan î

4.

---

[3276] **Necmuddîn**: Necmeddînê Kubra. (bnr. 13/8)

Necmeddînê Kubra rojekê li mizgeftê suhbet dida. Carekî got, ewlîyayên Xwedê Teala carekî heywanan mêze bikin, heywan jî digihîjin kemala xwe û mîsal anîn ser Qitmîr. Eshabûl Kêf, nêrîn li qitmîr kirin, destda qitmîr bû welî, bû ji ehlê cennetî. Nezerên ewlîyan tenê ji bo însanan nine, ji bo heywanan e jî. Yekî ji cema’etê di qelbê xwe de got, gelo di vî zemanê de jî însanên wer hene nezeran wan te’sîrê li heywanan dike. Necmeddînê Kubra, mirovekî qelbê wî hessas e. Piştî ku cema‘et belav dibe, derdikeve derve., nêrînê li kûçikekî dike, hingê kûçik tê serê xwe danîne ser lingê Necmeddînê Kubra û digîrî. Dibêje, gazî wî bikin. Ew mêr tê, vê rewşê dibîne… Dibêjin dema ku ew kûçik li kûçeyan diçû, çil pêncî kûçik pê wî diketin. Lakin, roja sisyan mir. Go, bibin mezela misilmanan de defn bikin.

[3277] **Xaliqê banî**: Xaliqê jorîn, Xwedayê jorîn

[3278] **‘Aşiq**: Ew kesê ku hez dike, evîndar

[3279] **Me’şûq**: Ew kesê ku tê hezkirin

[3280] **Naṭiq**: Ew kesê ku diaxive, dipeyîve

[3281] **Menṭûq**: Ew ê ku tê axaftin, tê peyîvandin

[3282] **Çemengah**: Cihên tev mêrg û çîmen

[3283] **Gulistan**: Cihê gulan, bax û bostanê gulan

Behara xortîyê eger bibore

Gul û sosin *ê*dî nayên civanî[3284]

5.

Bi dunyayê nexape gerçî şah bî

Kesî ra nam*î*ne ev duny*a* fanî

6.

Suleyman kan*ê* Dara[3285] kan*ê* Nemrûd

Kanê Îskenderê şahê cihanî

7.

Muḥemmed[3286] kan*ê* Ṣiddîq[3287] kan*ê* Farûq[3288]

Mela û ṣofîyê rûron*î* kanî

8.

Hemî mirin hemî borîn hemî çûn

Bi fermana Xudayî asimanî

9.

Çiqas zengîn b*î* lê çaġa mirinê

Neçar çawa be tu jî her wuṣa nî

10.

Du sê metre ji caw te ra dibe mal

Bi karê xu diçî cem Rebb*ê* banî[3289]

11.

Bi nûra dil dunê derbazkirin de

Bi qencîyê biborîne zemanî

12.

Bi Quranê bi îmanê tu bar key

Ji dunyayê eger tu musluman î

13.

Di wê rojê pere nake tu tiştik

Ji ġeyrî qencîy û nûra *î*manî

14.

---

[3284] **Civanî**: Civandin, berhevkirin

[3285] **Dera**: Dariyûs yan jî Dara. (bnr. 16/7)

[3286] **Muḥammed**: Hz. Muhemmed (asw.)

[3287] **Ṣiddîq**: Hz. Ebû Bekir. Xelifeyê yekem

[3288] **Farûq**: Hz. Umer. Xelîfeyê duyem.

[3289] **Rebbê banî**: Rebbê jorîn, Xwedayê jorîn

Bi dest xu xe ḥeyatê da riża ḥeq

Neke ʿibadetê da can giranî

15.

Hilo ey merivê saġê dunê da

W*a*qas[3290] nav da *mer*re[3291] lewra n*ê*van î

16.

Dunê war e diborin wê d*a* çend roj

Dê her kes bar bike çawa ku danî

17.

Şîrîn û heş*î*n e dunya welê ew

Ji bo namîne bo me nabe xanî

18.

Ḥeyata we çiqas zelal be dîsa

Ş*ê*lû ye lewr*a* tev derd û kulan î

19.

Mirin û pîr*î* û neçar*î* derd in

Ji wan derdan tu car nayê qetanî

20.

Welew Rustem*ê* Zal bî dîs*a* tu her

Ji her derdê ra tu her wek n*î*şanî

21.

ʿUmur pur cewherek hêja ye hewar

Bi tewşî rê neke wî ʿumr*ê* hanî

22.

Bigirre pê *dur*rê ʿirfan û ʿilim

Bi wî kar key riżaya Rebb*ê* banî

23.

Tenê meʿna diçe hêla Xudê da

Ku madde her dimîne`l vê cihanî

24.

Ji bustanê dunê xu ra biçîne

Gulê meʿnê ji bo xu her zemanî

---

[3290] **Waqas**: Ewqas, heqas, ewqas qeder

[3291] **Merre**: Meçe, neçe

25.

Gul û sosin e meʿna, zubl[3292] e made[3293]

Ji meʿnê ra bibe dilbend û kanî

26.

**Ḥezîn** ḥeqqê te ye şîn û gı̂rîn key

Te borandî bi tewşî nû cuwanî

27.

H*ê*vîdar be d*î*san ji luṭf*a* Reḥman[3294]

Keremkar e Xudayê ḥaldizanî

**139.**

musteفʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez − − + −/− − + −/− − + −/− − + −

1.

Behar e bêhna cennetê xweş xweş ji zozanê me tê

Ya Reb şukur bayê ṣeba[3295] tev mizg*î*na yara me tê

2.

Çiya û deşt têk ġemilîn bi sosin û gul û gehan

Dilo tu zarrînê mekey dilber ji burcê derve tê

3.

Reqṣ û semaya[3296] dêm*dur*ran wenda dikin derdê *pur*ran

Ah û fiġan êdî çi ne Yûsif ji Misrê waye tê

4.

Dilo dema yar bit xuya ḥeyat ji nû dê xweş bibit

ʿAlem ji nû dê geş bibit bihar û noroza[3297] te tê

5.

Noroz û serṣala gul e, şahî û ceşna bulbul e

Dema hedana bêdil e, nisbet bi pêlan ber te tê

6.

---

[3292] **Zubl**: Zibl, qirş, guhûr

[3293] **Made**: Madde, pêze, bûjen, daring

[3294] **Reḥman**: Navekî Xwedê ye ku wateya wî ev e; ew ê ku li cihanê rizqê her tiştî dide, rehma xwe li ser belav dike û dibarîne. Ew ê ku mihrîban e; li her tiştî dibane.

[3295] **Bayê seba**: Bayê ku ji hêla rojhilatê tê. Bayekî hênik û her tim tê. Ji ber ku bayê seba her tim diçe û tê, bê sekn û bê sebat e, lewra dilê bengî jî dişibe bayê sebayê.

[3296] **Sema**: Reqs, govend

[3297] **Noroz**: Newroz, roja nû. Li herêma Kixî/Çewlikê bi vî awayî bi lêv dikin.

Ya Reb tu ḥeq navê xu key weqta xweşa[3298] dil ranekey

Ocaġ*ê* kevn xar venekey[3299] hîna ku dû ji jor ve tê

7.

Canê weza[3300] pur vewneşîn pê weṣl*a*[3301] ‘enqa[3302] pur neşîn

Ber hêstiran dar bûne şîn ma reḥm*a* yarê dê netê?[3303]

8.

Dil pur evîn cerg bûn birîn hêstir*ê* çavan bûne xûn

Bes key sitem em perritîn ma êş hemî bona me tê?

9.

Dil pur zeman bona gulan bû mubtela wek bulbulan

Dawî li wî bû jar[3304] û jan, ne weṣl û ne jîn jê re tê

10.

Pur ṣal e bona hîvr*û*yan welat nema lê gerihan

Meqṣed ji nû ve bû xuya ox ox çi xweş bêhna me tê

11.

Bayê seḥer[3305] rakir keder dil da nema êş û keser

Pişta qetanê[3306] bû du ker dewran bi îqbala[3307] me tê

12.

Dila! li ser karê mezin ṣebrê bikey bo pêk werin

Ṣebir çiqas ṭal e welê şahî û xaşî dû ve tê

13.

Ṣebr û ṣebatê key mudam ser nerm te ra da bit meram

Çetinîyê xaşik bizan zeman bi xastina te tê

14.

Dema hebe te meqṣedek bê sist*ay*î xebat*ê* key

Insan r*a* hey xebat*a* wî di gotina Xuda d*a* tê[3308]

---

[3298] **Xweş**: Bi lezzet
[3299] **Xar venekey**: (Agirê) Netemirîne, venemirîne, netefîne
[3300] **Weza**: Jar, qels ze‘îf
[3301] **Weṣl**: Gihîştin, gihan
[3302] **‘Enqa**: Teyrekê efsanewî ye ku navê wê heye lê bi xwe tune ye. Dibêjin pişt çiyayê Qafê dijî, teyrekî zehf mezin e, tûkên wê reng rengî ne, mê ye, rûyê wê dişibe mirovan û her tim li esmanan difire.
[3303] **Netê**: Nayê
[3304] **Jar**: Jehr
[3305] **Bayê seḥer**: Bayê sibê
[3306] **Qetan**: Cudayî, dûrketin, fîrqet
[3307] **Îqbal**: Ber bi (me) ve, hêla (me); bext, bextvekirîbûn
[3308] Îşareta vê ayetê dike:

15.

Kulîlk*a* nûbehar*ê* da digel ku nerm û nazik e

Bi ṣebr*ê* ax[3309] û baġiran[3310] qul diketin ji der ve tê

16.

Çiqas ku av nerm e welê ji bo ʿezimkar e dila

Gazan[3311] diqelişe diçe qul dike latan[3312] tê r*a* tê

17.

Millet eger xebat neke leşker eger cengê neke

Serek eger ʿezmê neke ẓefer li ku dest wan ve tê

18.

Xebat*ê* key bi roj û şev cengê bikey bi can û dev

Bikoje qenc nefsa neyar hedan*a* dil ji nû ve tê

19.

Nefsê bizan xu ra neyar her dem li piştê dayne bar

Yan ne, fena[3313] qatirekî cinboz[3314] bi pînan[3315] ber te tê

20.

Çiqas bi wê karê bikey li xu zîyanê bar dikey

Gihan*a* meqṣedê bilind dû kuştina nefsê r*a* tê

21.

Kêm xarin û vexarin û kêm xew û kêm vêsî[3316] te ra

Ji kuştina nefsê r*a* her yek mîn*a* ẕû`lfiqar*ê*[3317] tê

22.

Ruḥê xu bi ẕikrê Xudê xudî bikey qelew bikey

Qelbê xu tije nûr bikey kuştin*a* nefsê pê re tê

23.

Kesê neket cengek mezin ji nefs*ê* ra nabe mezin

Ji dost*ê* nefsê ra mirin ji jîn*a* wî çêtir*î* tê

---

(وَاَنْ لَيْسَ لِلْاِنْسَانِ اِلَّا مَا سَعٰى)

Ji însên re, ji kar û kiryarên wî pê ve tiştekî din jê re nîne. (Necm: 53/39)

3309 **Ax**: Xwelî, xak

3310 **Baxir**: Kevirên li hev sîwar bûne û bi rêz dirêj bûne, lat, zinar

3311 **Gaz**: Çiya

3312 **Lat**: Zinar, baxir

3313 **Fena**: Mîna, wek, nola, nota, bînanî

3314 **Cinboz**: Bêxû, bêcir, bêxulq, cirnexweş

3315 **Pîn**: Pihîn, pehîn avêtin

3316 **Vês**: Bêhnvedan, vewestan, istirahet

3317 **Ẕû`lfiqar**: Şûrê Hz. ʻElî

24.

Lewra kesê dost e ji dil nefsê r*a* ġafil e ji ḥeq

Wenda b*û*ye ji rah*ê*[3318] rast nezane dawî çaw*a* tê

25.

Bila Xuda û rah*ê* wî li şûn*ê* bimînin hela

Ji mirina xu ġafil e her roj mirin ber çav*î* tê

26.

Bila mirin li wê bimîn mûyê sipî ketye rîyê

Dibêje ez cuwan *im* hêj zeman me ra tim wah*a* tê

27.

Nezan e nûbehar û havîn û p*a*yîza ʿumr*ê* çûn

Zivist*a*na pîrîy*ê* ra mûyê sipî wek berf*ê* tê

28.

Mûyê sipî li wê bihêl di kaş*ê*[3319] çaġan[3320] da *her* roj

Gilêr dibe serbin dibe dibêje ma bi min çi tê

29.

Nezan e bin kaş da heye newalekî tarî û kûr

Kesî bikevîyê hema ḥeyateke nû jê re tê

30.

Merov*ê* kar qenc e ş*a*d e bi niʿmet û luṭfa Xudê

Merov*ê* karnebaş r*a* tim dûrî û jan û tal*î* tê

31.

Gilêrb*û*nê li wê bihêl jan ketîye ʿestîy*ê*[3321] wî

Wek kûçikan dikoje tim nabêje ev jan ji çi tê

32.

Janê bihêl hela li wê, birrek*a* ecelê hezar

Newal û cû xistine rû, jê ra m*î*na ṭinaz*î* tê

33.

Ey rêwîyê deşta dunê serê xu rakey ca binêr

Roj çûye avan maye zerq hema mirin û gor*î* tê

34.

---

[3318] **Rah**: Rê

[3319] **Kaş**: Kortal, mişefil, hendef

[3320] **Çaġ**: Zeman, dem

[3321] **ʿEstî**: Hestî.

Çima ji xew hîşar n*a*bî ji ġefletê cuda n*a*bî
Ji kar*ê* xu pişman n*a*bî ʿumrê ç*û*yî ma par*a* tê
35.
Lewra ditirsim ez ji te weha biçe têk ʿumr*ê* te
Bibî kerê nefsê ḥeta dawî li ʿumrê baş*î* tê
36.
Dostîy*a* nefsa dûn[3322] weha ʿeqlan ji ser dipek*î*ne
Ava *reş* çavan dat*î*ne pişmanîya pur dû r*a* tê
37.
Mebe demek ġafil ji xu dû ra dibî cahil bi xu
Wenda dikey her tişt*ê* xu te ra ş*î*rînî tal*î* tê
38.
Ji xidmeta ḥeq sist dibî ji kar*ê* baş serbest dibî
Ji mer*o*vê dûrist dibî te ra nebaşî baş*î* tê
39.
Wenda dibî ji rah*ê* ḥeq dimîn*î* wek masî li req
Şûna *î*man û şukr*ê* da înkar*î* tê kufran*î* tê
40.
Wenda nekin wan diln*û*ran wan hîş*a*r û fikirk*û*ran
Wan zan*a* û zimanş*û*ran ḥużûr*a* dil bi wan r*a* tê
41.
Wenda nekin wan bulbulan wan dil bi ḥeqqê va kelan
Wan murşid û şêx û melan nasîy*a* dil bi wan r*a* tê
42.
Ew in di dunyaya me da her dem diçin hêla Xuda
Ji mal û mulk bûne cuda baran*a* feyżê wan r*a* tê
43.
Ew in dimîne nav*ê* wan her kes dikey tim şukr*ê* wan
Çima huner dibe ji wan bi nêr*î*na wan nûr*î* tê
44.
Bi nêr*î*na wan kamilan diçin ġem û derdê dilan
Merhem e bo jan û kulan ji lêv*ê* wan ʿirfan*î* tê

[3322] **Dûn**: Kêm, nimz

45.

ʿIrfan dirêjin ew mudam[3323] bi wan dibe naqiṣ[3324] temam

Bikey hewar wan ra meqam ser wan b*a*rana reḥm*ê* tê

46.

Reḥma Xudayê lemyezel[3325] tê ser te da hem bê bedel

Ji kanîya luṭfa[3326] ezel tev li ḥeyatê te r*a* tê

47.

Ḥeyatekê pur şîr*î*n e tê da ġem û keser n*î*ne

Ebed*î* ye lew dim*î*ne bi wê xweşî û şah*î* tê

48.

Şahîy*a* nêzbûna ḥeq e ʿeksa cemala muṭleq e

Li gaz*ê*[3327] dil dixe leq e, pê ceẕbe û ṣefay*î*[3328] tê

49.

Ceẕba meqamê jor*î*n e bêhna kulîlkê quds*î* ye

Dil kaş dike ber xu t*î*ne nig û bi nig ber wî ve tê

50.

Ber wî ve tê Xuda bi lez bi bost[3329] û qûlac[3330] û bi gaz[3331]

Xelaṣ*a* ji nefsa beraz piştî v*î* ḥalê quds*î* tê

51.

Ḥalek*î* pur xweş e eva bi dîn*ê*[3332] nas dibe eva

Beyan*a* gotina deva ji wê r*a* kinn û kêm*î* tê

52.

Kin tê ji wê ra her beyan belkî li ruḥ bibit ʿeyan[3333]

Bi wasiṭe surperîyan beyan û nasîya w*ê* tê

53.

Weya tecellayek Xudê ronî dide qelbê te da

---

[3323] **Mudam**: Her dem, her tim

[3324] **Naqiş**: Tiştên kêm, ne temam

[3325] **Xudayê lemyezel**: Ew Xudayê ku hîç wenda nabe û her heye

[3326] **Luṭf**: Qencî, çêyî, axaftina xweş û nazîk, tevgera bi rindahî

[3327] **Gaz**: Çiyayên sade bi ax û bêdar

[3328] **Şefa**: Xweşî, çêyî, dilfirehî

[3329] **Bost**: Bihost, tenê bi destkî pîvandin e ku kêm zêde 25 cm tê hesibandin.

[3330] **Qûlac**: Cûreyek amûrên pîvandinê ye wekî mîtroyê, qasî ku vekirina herdu destan e.

[3331] Evdê min eger bihostkî ber bi min ve were ez gavek davêjim, ew gavek bavêje ez deh gava davêjim. Eger ew ber bi min ve bimeşe ez bi rev ber bi wî/ê ve diçim. (Buxarî, Tewhîd, 50; Muslîm, Zikr, 2)

[3332] **Dîn**: Dîtin. (Wekî hingivê, mirov çiqas beyana wê bike, kesî ku hingiv nedîtibe nikare ji wan gotinan tişkî fêm bike, lazim e ku bi çavê xwe hingivê bibîne. (H.))

[3333] **Bibit ʻeyan**: Xuya bibe, diyar bibe

Dil ġerq bikey nûra xu da serab te ra şerab*î* tê

54.

Herçî bibînî ḥeqq e ew, herçî bibêjî rast e ew

Ḥeqîqeta tiştan te ra her wekî hêk û hêl*î*[3334] tê[3335]

55.

Hîna dinasî xu çi yî hîna dizanî li ku yî

Xelaṣ*a* ji derdê dunê dû vî meqamê ʿal*î*[3336] tê

56.

Meqamekî bilind e ew dûr û bi nûr û rind e ew

Zanîn û nasîya Xudê piştî ç*û*na wî cah*î*[3337] tê

57.

Çûna w*î* cahî pur xweş e dûrê w*î* cahî bextreş e

Yêkî nevê[3338] pur bê heş e, jê ra zehîr wek şîr*î* tê

58.

Lewra bi ẕewq nexweş e ew, ḥeywa*nek* dilik[3339] xweş e ew

Mîna kerekî reş e ew, jê ra t*a*lî[3340] şîrome[3341] tê

59.

Ḥeyat*a* wî beyhûde ye, xebat*a* wî bê feyd e ye

Neyar*ê* hevalê xu ye, wî ra nebaşî baş*î* tê

60.

Zengîn û zana be çiqas dîsa dibe Xudênenas

Naqet*î*ne xamê[3342] ji xaṣ[3343] ḥeram j*ê* ra ḥelal*î* tê

61.

Kesê j*ê* ra ḥeram wekî ḥelal*î* tê bizan seg[3344] e

Diçe li pey yek luqmekî digel x*a*rin çav wî r*a* tê

62.

---

3334 **Hêlî**: Neynik

3335 Li vir mane ev e; gava ku mirov li çiyayekî mêze dike, tenê li rûyekî wî dibîne. Lê gava ku hêkê dinêre, ji ber ku hêk biçûk e û ber bi çav e, her derê wê dixuye. Ango, tu mirovekî ewqas mezinî ku, heqîqet te re wek hêk û neynikê ber biçav tê, tu her derê heqîqetê dibînî û fêm dikî.

3336 **ʻAlî**: Bilind, berz, bala

3337 **Cah**: Paye, meqam

3338 **Nevê**: Nexwaze

3339 **Dilik**: Yêmê heywanan ku zivistanê didine wan, ʻalif

3340 **Talî**: Navê gihayekî ye ku pir tahl e. Lê ker zehf zêde hez wê gihayê dikin û dixwin.

3341 **Şîrome**: Navê gihayekî ye ku pir şîrîn e. Ker qet ji wê gihayê hez nakin û naxwin.

3342 **Xam**: Negihîştî, beredayî, nerind, nebaş

3343 **Xaş**: Qenc, spehî, rind, baş

3344 **Seg**: Kûçik

Kesê nebe têr çav*ê* wî nabîne ji kur bav*ê* wî

Xêrê, welew ber çav*ê* wî can de j*ê* ra ṭinaz*î* tê

63.

Ṭinaz*î* tê jê ra mirin derd e ji kûçik ra x*a*rin

Bibîne way şînê dikin ser xud*î*, jê ra şah*î* tê

64.

Derdê k*ûç*ik têrxarin e di dest*ê* kî nan dib*î*ne

Dibêje va meryê min[3345] e neyar j*ê* ra wek yar*î* tê

65.

Bextê te da nexap*î* tu bi ḥeq nenasî yar*ê* tu

Dû ra dibe Qarûnê tu her dem ji wê ziyan*î* tê

66.

Tenê dunê derdê w*î* ye, yar û heval çi yê w*î* ye

Yê xu bi wî girt mirî ye, masî di dest da mar*î* tê

67.

Dunya hemî malê w*î* be wek kûçikan luqmek*î* goşt

Li ku b*î*ne[3346] çav li d*û* ye her dem neçarî[3347] jê r*a* tê

68.

Yekî qenaʿet hey di dil zengîn e ser pozê xu ra

Nabêje malê tu kesî maldar*î* wek neçar*î* tê

69.

Lewra dizane raziqê muṭleq[3348] Xudayê jorîn e

Eger bixaze pur dike malê kesî neçar*î* tê

70.

Di dest Xuda da ye kilîda kan*a* her xêr û xweşî

Bixaze tengîyê dibe her kes*î* ra fereh*î* tê

71.

Gerçî hemî karê Xudê xêr in welê ber çav*ê* me

Ji bon*a* em kor in bi dil hinik ji wan wek şerr*ê* tê

72.

Lewra nexweşê talîyê hinguv jê ra wek aġû[3349] ye

---

[3345] **Meryê min**: Merivê min, dostê min
[3346] **Bîne**: Bibîne
[3347] **Neçarî**: Xizanî, feqîrtî
[3348] **Raziqê muṭleq**: Ew ê ku teqez rizqê aferîdeyan dide. Mebest jê Xweda ye.

Lewra xerab meẕaq[3350] e ew şîrîn jê ra wek talî tê

73.

Merov*ê* dûrbînê Xuda[3351] ji rah*ê* ḥeq nabin cuda

Xu ra dizanin xêr hemî karê ji destê yar*ê* tê

74.

Qenaʿ*et* mulkekî wuṣay tune*bûn* jê ra tu n*î*ne

Bi lefẓekî[3352] şîrîneda[3353] di ḥed*î*ṡa Resûl d*a* tê[3354]

75.

Qenaʿ*et* mulkê kî be ew şah e, bilind e, zeng*î*n e

Bêperw*a*[3355] ye ji her kesî, zengîn j*ê* ra neçar*î* tê

76.

Welê temeʿkarê g*û*xur bide *hey* nanek wek kevir

Dimire bibêjî bimir wek kûçikan li pey te tê

77.

Çavnebarek[3356] kûçikxûy e çi bibîne çav li dû ye

Merditî jê ra axû ye mal jê ra wek kolġanî[3357] tê

78.

Çawa k*û*çik dema li ser kolġanîyê har û *ġed*dar

Ew teresa[3358] li ser z*ê*r û malê dunê mîna w*î*[3359] tê

79.

Ya Reb bi ḥeq navê xu key çikotîyê[3360] nesîb nekey

Bi wê kesî rûreş nekey her ḥal bi teqdîra te tê

80.

Zanay*ê* ḥeqnenas m*î*na şeyṭanxûy e dostê xu ra

Ṣade şer e nêzbûn*a* wî insan r*a* wek agir*ê* tê

---

3349 **Aġû**: Jehr

3350 **Meẕaq**: Tamkirin, çêjkirin

3351 **Merovê dûrbînê Xuda**: Kesên dostê Xwedê, kesên di riya heq de diçin

3352 **Lefẓ**: Bêje, peyv, kelîme

3353 **Şîrîneda**: Xweşdeng, şîrînawaz

3354 Deylemî, Musned, 4699.

3355 **Bêperwa**: Bêtirs, wêrek

3356 **Çavnebar**: Dexes, hesûd

3357 **Kolġanî**: Ew cihê ku kûçik li wê derê şolik/xwarina xwe dixwe. Kûçik dema ku di kolxaniya xwe de nanê xwe dixwe, hingê nahêle ku ne kûçikên din ne jî mirovek nêzîkî kolxaniyê be. Li vir, ew mirovên çikot/tima şibandine kûçikên kolxaniyê. Lewra mirovên çikot nan û malê xwe bela nakin, bi kesî re par venakin.

3358 **Teres**: Mirovên jar û ze‘îf

3359 **Wî**: Mebest jê kûçik e

3360 **Çikotî**: Tima, çavteng, kinoş

81.

Lewra Xuda nîne di bîr wî ra yek e sosin û ş̱îr

Ji nefs*ê* ra bûye esîr gor xastina wê rê ve tê

82.

Ji dest were cihan*ê* têk wêran dike xopan dike

Pakî w*î* ra nepak*î* tê, başî w*î* ra nebaş*î* tê

83.

Ji bo civandina dunê ew zan*î*na wî ya heye

Bo girtina xûna dilan jê ra m*î*na nêştir*ê*[3361] tê

84.

Ya Reb ji zanîna bi xu nenas nekey tu car kesî

Tarî û ronî serteser bi emr û fermana te tê

85.

Tiştek n*î*ne destê me da bê cuz*ê* îxtiyar*î*[3362] yê

Ew jî bi te`y eger bivê wî jî digirî dest te tê

86.

Çawa bixazî wer dike çawa bi reh key wer diçe

Mexlûq û ḥalê wan hemî bi vîn[3363] û karîna te tê

87.

Ji baġiran deve dibit[3364] ji keviran zelal dizêt[3365]

Ji agiran nûr çêdibit ji şerr*ê* xêr dibilq*ê* tê

88.

Çawa bikey kêfa xu yî, kes ra n*î*ne gotin te ra

ʿAlem hemî mulkê te ye, gotin jixu beyhûde ye

---

[3361] **Nêştir**: Kêrê tûj û biçûk

[3362] **Cuzê îxtiyarî**: Bi îrada xwe hilbijartina tiştan. Mirov tiştek hildibijêre, dike lê dîsa ew tişt bi xwestina Xwedê pêk tê. Ji vê re cuzê îxtiyarî tê gotin.

[3363] **Vîn**: Viyan, îrade

[3364] Îşareta vê ayetê dike:

(وَاِلٰى ثَمُودَ اَخَاهُمْ صَالِحاًۢ قَالَ يَا قَوْمِ اعْبُدُوا اللّٰهَ مَا لَكُمْ مِنْ اِلٰهٍ غَيْرُهُۜ قَدْ جَاءَتْكُمْ بَيِّنَةٌ مِنْ رَبِّكُمْۜ هٰذِهٖ نَاقَةُ اللّٰهِ لَكُمْ اٰيَةً فَذَرُوهَا تَأْكُلْ فٖي اَرْضِ اللّٰهِ وَلَا تَمَسُّوهَا بِسُٓوءٍ فَيَأْخُذَكُمْ عَذَابٌ اَلٖيمٌ)

Me ji (qewmê) Semûd re, ji malbata wan –bi pêxemberî- Salih (şand). Salih got: Ey gelê min! Ellah Teala bihebînin, jê re îbadetê bikin. Ji Xwedê Teala pêştir tu Xweda ji bo we nînin. Ji cem Xwedayê we, ji we re nîşaneke (mucîzeyeke) aşkere hatiye ku ev deveya Xwedê ye, ji we re mucîzeyeke mezin e, dev jê berdin bila ji (çêra) erda Xwedê bixwe (û vexwe), zinhar azarê nedinê! Nexwe dê ezabekî bijan we bigire. (A‘raf: 7/73)

[3365] Îşareta vê ayetê dike:

(وَاِذِ اسْتَسْقٰى مُوسٰى لِقَوْمِهٖ فَقُلْنَا اضْرِبْ بِعَصَاكَ الْحَجَرَۜ فَانْفَجَرَتْ مِنْهُ اثْنَتَا عَشْرَةَ عَيْناًۜ)

Bîne bîra wan; wê dema Mûsa ji bo gelê xwe av xwest. Me jî jê re got: “Gopalê xwe li kevir bide!” (Piştî Mûsa gopalê xwe li kevir da) Di cih de ji wî kevirî dozdeh çaviyên avê derbûn. Her nifşî cihê avvexwarina (kaniya) xwe nas kir. (Me ji wan re got): “Ji rizqê ku Xwedê Teala (daye we) bixwin, vexwin û li erdê fesadiyê mekin.” (Beqere: 2/60)

89.

Ava bikey xopan bikey tarî bikey ronî bikey

Xu nas bikey nenas bikey mulkê te ye`l şeˀnê[3366] te tê

90.

Pirsîn ji karê te m*î*na deryak*î* pur kûr e kesê

Noq be di wê da destd*a*dest[3367] xewa mirinê ser d*a* tê

91.

Ġafil mebe demek dilo çendan hebe xweşî te ra

Tiştek di dest te da n*î*n e bi vê Xuda nexweş*î* tê

92.

Hîna te hey keys û feṣal[3368] xebat*ê* key bi roj û şev

Bigij*î* xweş ḥalê delal bela dilan ġafil d*a* tê

93.

Lez biçe bin hêşa şehan[3369] bigije konê rûmehan[3370]

Yan ne dimînî`l wargehan ḥetta zivistan ser te tê

94.

Cahil nebe dilo bi xu ji zan*î*nê derya b*î* ku

Eger Xudê bivê[3371] hema zanîn te ra wek jar*î* tê

95.

Zana b*o* şeytạnê leˁîn[3372] zana b*o* Belˁamê şeqî[3373]

Xudê bi vê şeqay*a*[3374] te zanîn te ra nezan*î* tê

96.

Bixaze kor dike bi çav, bixaze lal dike bi dev

Bixaze qir dike bi hev, yaran r*a* yar neyar*î* tê

97.

Paş perdeha ˁilmê Xudê heye hezar karê dizî

---

[3366] **Şeˀn**: Hal, rewş
[3367] **Destdadest**: Hema, tavilê
[3368] **Keys û feṣal**: Fersend
[3369] **Hêşa şehan**: Siha şahan, ango bikeve bin parastina şahan
[3370] **Rûmeh**: Rûyê wek hîv bi ronahî û rewnaq
[3371] **Bivê**: Bixwaze
[3372] **Şeyṭanê le'în**: Ew şeytanê ku hatiye lanetkirin
[3373] **Bel'amê şeqî**: Bal'amê dawîxirab. Bel'am, navê mirovekî mezin e ku di dewra Hz. Mûsa de jiyaye. Evqas 'alimekî mezin bû ku, dibêjin dema diaxivî 12000 mirov xeberdanê wî guhdarî dikirin û dinivîsandin. Lê, Bel'am li hember Hz. Mûsa derket. Hingê Xwedê Te'ala ew 'ilm jê girt. Di dinyayê de ew kesê yekem e ku derbarê înkarkirina Xwedê de kitêbek nivîsiye. Ji ber vê yekî, jê re Bel'amê şeqî, ango ew kesê ku dawiya wî xirab, tê gotin. (H.) û (bnr. Pala, *b.n.,* r. 65.)
[3374] **Şeqa**: Bê oxatî, ne şad, ne bextewar.

Tu kes nezane lew bibe zana ṣibê çi ser d*a* tê

98.

Dihirifî[3375] dinij*î*nî[3376] êvar*ê* datînî xu ra

Tedbîrekê welê sibê karê te tam bi ʿeks*ê* tê

99.

Dema Xudê nevê tu kar bi gor muradê nay ẓuhûr[3377]

Dema bivê Xuda felek bi emr û fermana te tê

100.

Çolê d*a* tazîyê peya diçe digije Keʿbeyê[3378]

Welê serekê tim suwar dûrê murad û yar*ê* tê

101.

Ji lawê Azer[3379] ra dibe gul û çimen agir welê

Ji lawê Nuḥê[3380] yarê ḥeq ra gûneh û zinnarî[3381] tê

102.

Yara! **Ḥezîn** wa ye serî danîye ser darê derî[3382]

Por lê b*û*ne mîna herî hêstir*ê* wî wek av*ê* tê

103.

Jê ra n*î*ne tu car hedan[3383] her dem w*î* ye ah û fiġan

Ji te dixazit her eman jîn û mirin bi dest te tê

104.

Yara! dizanî derd*ê* me, dizan*î* çi ye ḥal*ê* me

Xastin*a* peyda be ji me, cem ʿilm*ê* te beyhûde tê

105.

Xastin çi ye zana tu yî, gazî çi ye dîtî tu yî

Gîrî çi ye kara tu yî, qencîy*ê* ra kêfa te tê[3384]

---

[3375] **Dihirifî**: Bi hev dixî, didî berhev

[3376] **Dinijînî**: Datîne ser hev, nijinandin, hiljandin.

**Dihêrifî û dinijînî**: Mebest hetanî sibê diponijî, difikirî, hisab/planên xwe dikî.

[3377] **Ẓuhûr**: Pêk nayê, çênabe

[3378] **Ke'be**: Mebest ji vê "armanc" e

[3379] **Lawê Azer**: Hz. Îbrahîm (as.).

[3380] **Lawê Nuḥê**: Li vir qala kurê Hz. Nûh (as.) dike. Lewra kurê wî ji Xwedê re bawerî neanîbû.

[3381] **Zinnarî**: Ew kemberê ku keşîş li pişta xwe dialînin. Li serê wê jî xaç tê dardakirin/girêdan. Li vir bi mana kufr û guneh e.

[3382] **Darê derî**: Şêmûk, derçik

[3383] **Hedan**: Aram, sebat, tebat

[3384] Li vir wiha dibêje: Ne hewceye ku em bixwazin lewra Tu zana yî, jixwe tu xwestina me dizanî. Dîsa ne hewceye ku em di tengasiyê de gazî Te bikin, lewra Tu her daîm halê me dibînî. Ne hewceye ku em ji bo tiştan bigîrîn, lewra kara Tu yî, yê ku dikare her tiştî bike Tu yî. Ji bo xwestina pêdiviyan gîrîn ne hewce ye jixwe tu

106.

Eger bixazî mûrîyan[3385] dibî meqamê ḥorîyan[3386]

Mûriyê dil çendan nekare hêd*î* hêdî ber te tê

107.

Yek leḥẓekî[3387] weqtê bizan xu ra m*î*na durrek giran

Weqtê d*a* hey her ḥal û şan bîstek*î* da feyżek*ê* tê

108.

Feyża Xudayê jor*î*n e, her dem *dil* da dibar*î*ne

Nûrê li dil diweş*î*ne noq e, ḥeyatek xweş*î* tê

109.

Ḥeyatekî pur şîr*î*n e, cehan*ê* da jê ra n*î*ne

Hevalk*î* cilwa jor*î*n e, ji ḥal û şeʾnê yar*ê* tê

110.

Nefes*a* ḥeq bi te ẓuhûr direş*î*ne dilan d*a* nûr

Nêzik dike merov*ê* dûr, qelbê mirî ra ceẕbe tê

111.

Lêkin divê ġafil nebî demek*ê* xu hêçê[3388] nebî

Çavnêr*ê* ser qelbê xu bî belkî ji yarê nûr*î* tê

112.

Dema seḥer[3389] ji bîr mekey, ḥeqqê zemîn[3390] wenda mekey

Sir tê hene ji dest mekey, ma çaġ*a* borî par*a* tê?

113.

Qedir bizane wê demê tê da dibînî merhemê

Wenda dikey jan û ġemê luqman li gazîya te tê

114.

Tarît*î* û ḥeyret diçin çavê dilan dibişkuvin[3391]

ʿAlem tijî nûr dibitin çira gihanê ber te tê

---

dikarî bikî. Lewra ewê ku dibîne, dike, dizane her Tu yî. Kêfa te bi qenciyê re tê. Lazim e ku mirov her tim qenciyê bike.

3385 **Mûrî**: Gêle, gêrik, morî

3386 **Meqamê ḥorîyan**: Ango bihişt, cennet. Li vir îşareta mu'cîzeyên Hz. Sileyman a bi mûrî re diaxive, dike.

3387 **Leḥẓe**: Demeke zehf kin, çirkek

3388 **Hêç**: Vala, berhewa

3389 **Seher**: Serê sibê

3390 **Zemîn**: Zeman, dem

3391 **Dibişkuvin**: Bişkivîn

115.

Gihan*a* yara bext*ê* yar geşrûy*a* wek sêva li dar

Ger bête qelbê pur neçar zengîn*î* û bextê w*î* tê

116.

Her şev dibêjin avis in bi ṣubḥ*a*[3392] ronî ġem mekey

Piştî cefayê ra ṣefa piştî nîyazê[3393] naz*î* tê

117.

Derya gelo bê durr[3394] dibit şîlan[3395] gelo bê gul dibit?

Gîrîn ç*a*wa bê ken dibit piştî ş*î*nê tim şah*î* tê

118.

Bes key **Ḥezîn** van nalîyan wek goy*î*nan[3396] zarîn mekey

Mizgîn te ra dilşad bibe dilber bi serdana te tê

119.

Ya ʿendelîbe`l-ġabî yekfîke`l-ʿewîlu febkimen[3397]

Eḥreqtena ez̲ebtena em ḥeytena bi`n-neġme tê[3398]

**140.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Tu car ji feyż û nisbeta yara berîn[3399] dil têr dibî?

Derya û erḍ tu car ji baran û ji avan têr dibî?

2.

Çiqas were deryay*ê* av waqas[3400] ş*î*rîn û xweş dibî

Nisbet çiqas were dilan waqas j*î*r û kêfxweş dibî

3.

Masî ç*a*wa bi av*ê* dil wuṣa bi feyżê kêfxweş e

Dilê negirt ji feyż*ê* par, pir nexweş û bê heş dibî

---

[3392] **Ṣubḥ**: Sibe
[3393] **Nîyaz**: Dua, lava
[3394] **Durr**: Mirarî, mirwarî
[3395] **Şîlan**: Dara şîlanê
[3396] **Goyîn**: Çivîkek mîna kevokê ye ku hin hêram jê re dibêjin tivîlk, tivirg.
[3397] Ey bilbilê baxê, êdî qîrîn ji te re bes e, lal be.
[3398] Te bi lorîna xwe em şewitandin, helandin mehandin.
[3399] **Yara berîn**: Yara ezel, dilbera ʻewil. Mebest jî Xweda ye.
[3400] **Waqas**: Ewqas, heqas

4.

Çawa bi av û bar*a*nê diġemile erḍê zuha

Wuṣa bi feyża ẕat*ê* ḥeq dil bi x*û*yan ava dibî

5.

Dilê nebit ji feyż*a* qudsî ra t*ê* da hêwirgehek[3401]

Li cem merovê ḥeqdibîn wek aşekî xopan dibî

6.

Aşek w*ê*ran e ew dila, cihê d*î*wane ew dila

Derḍek giran e ew dila, wek kund*ê* kor bêyom dibî

7.

Xudîy*ê* wî dilê tu car bira nebêje ez heme

Mirov*ê* dil mirî hebûn jê ra m*î*na nebûn dibî

8.

Çi ye dilê ji tavîya[3402] feyżê dilopek nab*î*ne

Tihê li ser ava ḥeyat hebûn*a* wî çira dibî

9.

Dajo ji ʿewrê feyżê ra hêla dilan ve qenc bizan

Nasî û ʿişq û ẕikrekî dil her bi wan ava dibî

10.

Kesê ku nasîya Xuda ronî nede qelbê w*î* da

Kor e di vê yaban*ê* da çawa bi xu rênas dibî

11.

Merov*ê* rênenas*ê* kor, dûr e ji yar û menzilan

Dûrê d*î*dara[3403] dilberan li ser çi ew bengî[3404] dibî

12.

Madam ku korî lazim e di çol*a* bê nîşan û reh

Te ra r*ê*zanek dest(i)keş[3405] ji boy ji yarê nêz dibî

13.

Dema te dî[3406] sosin*a* dil dema te nas kir gul*a* dil

Ji bil Xuda û yê divê ji tişt*ê* dî cuda dibî

---

[3401] **Hêwirgeh**: Stargeh, hewing, wargeh

[3402] **Tavî**: Rêjne, rejne. Barana ku ji nişkê ve dest pê dike û demek kurt dibare.

[3403] **Dîdar**: Rû, sîma; nêrîn, awir

[3404] **Bengî**: Evîndar, ʻaşiq, dildar

[3405] **Dest(i)keş**: Destkeş, alîkar

[3406] **Dî**: Dîtin, dît

14.

Hîna dibî kêfxweş bi dil hîna dibî bi heş û dil

Reha dibî[3407] ji derḍ û kul tenê bi yarê heş dibî

15.

Hîna m*î*na Xudarewan[3408] dibî di meʿna da rewan

Digêj*î* yar û wargehan wek bulbulan şevxan[3409] dibî

16.

Şevxan dibî bi ẕikr*ê* ḥeq mestan[3410] dibî bi şukr*ê* ḥeq

Nêzik dibî ji ẕat*ê* ḥeq ji ʿalemê wenda dibî

17.

Wenda dibî ji ʿaleman da vey ji dil derḍ û ġeman

Ji bil ş*î*rîna sermedî[3411] her tişt*î* ra nenas dibî

18.

Kesê bigije kanîya ava ḥeyatê jê vexar

Avê d*î* çendan bin zelal ber çav*ê* wî şêlû dibî

19.

Kesê bigije nêrgizan ḥis bike bêhna wan*ê* xweş

Hezaran bêhnê dî hebin ma ew tu car çav lê dibî

20.

Kesê bigije cennetê tev ḥorîyan ke ṣuḥbetê

Hemî cihan ber çav*ê* wî wek gom û axûran dibî

21.

Cennet e eʿraf[3412] ji kesê dozex*ê* da ye nale nal

Dozex e eʿraf ji kesê bi cennetê kêfxweş dibî

22.

Merov*ê* Kurdistan digel zozan û avê wê nedî

Îran û Turan û ʿIraq ber çav*ê* wî cennet dibî

23.

Lez key dila[3413] zû key here bigêje wan meqam*ê* baş

---

[3407] **Reha dibî**: Rizgar dibî, xilas dibî
[3408] **Xudarewan**: Ew kesê ku di riya Xudê de diçe.
[3409] **Şevxan**: Ewê ku (bilbil, şalûl û hwd.) bi şev dixwîne
[3410] **Mestan**: Serxweş
[3411] **Şîrîna sermedî**: Ew şîrîna ku her û her heye, ango Xwedê.
[3412] **Eʿraf**: Cihekî di navbera bihişt û dojehê de ye. Ne wek cennetê xweş e ne jî wek cehenemê nexweş e.
[3413] **Dila**: Ey Dil

Beyhûde dûr hev negere dû ra tu pur pişman dibî

24.

Çend rojê xortîyê xu ra ji bo gihana dilberan

Ġenîmetek mezin bizan murad bi wan ḥaṣil dibî

25.

Rê key ewan rojê delal gor xastina nefsa neyar

Sêva te dimîne li dar dawîyê bê murad dibî

26.

Murad muradek mezin e dûr ketina jê mirin e

Bi ġefletê me bor*î*ne wan roj*ê* hêja dûr dibî

27.

Dûr bî eger ji dilberan nas nek*î* wan rîşê zeran

Nebîn*î* wan rûfenneran[3414] wek reşkeran[3415] bê ʿişq dibî

28.

ʿIşqa Xudayê layezal[3416] dil ra dibe mûm û şemal[3417]

Bi wê dibînî dil d*a* ḥal bi wê xudî meqam dibî

29.

Meqamekî jorîn e ew dil ra wuṣa şîrîn e ew

Xweşek û ġemrevîn e ew bi gîştina wî xweş dibî

30.

Pur xweş dibî bi wî cihî seyrê dikey l`serwa sehî[3418]

Bi çav dibînî rûmehî[3419] di lez̠z̠etê wenda dibî

31.

Wenda dibî di lez̠z̠etê davêjî barê hicretê

Tev gîştîyan key ṣuḥbetê ji nû ve dil hedan[3420] dibî

32.

Ṣuḥbet dikey tev qudsîyan nêrîn dikey li hîvr*û*yan

Beref dikey[3421] gulê x*û*yan[3422] wek bûk*a* yek şêvî dibî

---

[3414] **Rûfenner**: Rûgeş, ew dilbera ku rûyê wê wek hîvê, fenerê dibiriqe, ronak e.
[3415] **Reşker**: Kerê reş
[3416] **Xudayê layezal**: Ew Xwedayê ku qet wenda nabe û her heye
[3417] **Şemal**: Find, mûm
[3418] **Serwa sehî**: Dara serwi ya ripûrast
[3419] **Rûmeh**: Ew rûyê wek heyva çardeşevîn geş û rewnaq e
[3420] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[3421] **Beref dikey**: Bera dike, dicivîne
[3422] **Gulê xûyan**: Ew xûy/sincên ku mîna gulan xweş

33.

Dibî bi qedr û bi q*î*met nêv hev*a*l û hogir*ê* xu

Kesê ji yarê lê bidit tîrêj m*î*na rojê dibî

34.

Mîna r*o*j e bilindmeqam karê dikey ji xaş[3423] û ʿam[3424]

Bi wî *pey*da dibit meram bi dest*ê* wê şifa dibî

35.

Merhem e ew bona kulan bê tê *bir*rîn jana dilan

Gelo ji bona bulbulan însan li ser bengî dibî?

36.

Ji bo merovê ʿişq di dil her dem digirin nisbetê

Çiqas zeman sera biçe waqas bi navûdeng dibî

37.

Hinik ji wanê ʿişq di dil ḥetta xweş in nayn[3425] nas kirin

Piştî mirin cihan bi wan û gotinê wan saġ dibî

38.

Wuṣay mirovê beng*î* ra mirin û saġî wek hev e

Lewra mudam bi feyż*a* wî ʿalem xweş û ava dibî

39.

Serek*ê* ʿişq û ʿaşiqan her ʿişq û ʿaşiqê ḥeq e

Kesê di ʿişqê ṣadiq e mezin dibî serek dibî

40.

Ji bo ku hez dike ji ḥeq daîm Xuda bîr e bi dil

Ji bo Xuda bîr e mudam bi ẕikr*ê* terziman[3426] dibî

41.

Ez rûdinêm digel w*a*nê me bîr t*î*nin, gotî Xudê[3427]

Ḥedîs*a* qudsî da meger Xuda digel ẕakir[3428] dibî

42.

Bi şefqet û bi reḥmet û bi al*î*kirinê Xudê

---

[3423] **Xaş**: Yên bi taybet, yên baş û spehî

[3424] **ʿAm**: Piranî, giştî, gelemperî

[3425] **Nayn**: Nayên

[3426] **Terziman**: Ziman ter, ziman şil

[3427] Îşareta vê hedîsê dike: Hindî ku evdên min min bîr bînin û herdu lêvên wan biliwin, ez bi wan re me. (Buxarî, Tewhîd, 43)

[3428] **Ẕakir**: Ew ê ku Xwedê zikr dike, kesê ku Xwedê bibîr tîne

Bi pa*raz*tin û ber*ḍa*na reha d*û*rist tev lê dibî

43.

Yan ne, Xuda ḥaşa n*î*ne jê ra r*û*nişkandin û cih

Bi ẕikr*ê* ḥeq ʿeksa cemala wî di dil peyda dibî

44.

Merov*ê* dî di hêlîya dil[3429] da yeqîn ʿeksa cemal

Hem nêze hem ṣadedil e li ʿeks û nûr xuya dibî

45.

Merov*ê* dî ʿeksa cemal bi dil dibe ḥeq ra heval

Digîje luṭfa layezal daîm bi nav û deng dibî

46.

Merov*ê* can da rah*ê* ḥeq[3430] xweş e li cem Rebbê xu ye

Bi luṭf û feyż û niʿmetan kêfxweş û xudî rizq dibî

47.

Kîjan serek û mezinê cihan*ê* ra hey va meqam

Rast e merovê dil bi ʿişqa ḥeq kela[3431] serek dibî

48.

Nabin m*î*na wî tu serek, bin ḥukm*ê* wî da ye felek

Ji şahê napeyda[3432] *ra* tim bi dil *dos*t û heval dibî

49.

Kesê ç*ê*ke nûra Xudê hûlûnekê qelbê w*î* da

Hey hey ji ḥeq nebe cuda ji wî meztir çi kes dibî

50.

Nîne ji wî meztir kesek bin emr*ê* wî da ye cihan

Feyżan digire pêl bi pêl gula dilê wî geş dibî

51.

Guh bide min demek heval beyan didim ji ʿilm*ê* ḥal

Ji feyż*ê* ra dixim miṯal te ra m*û*m û şemal dibî

52.

Merov*ê* gul nedî bi çav, bêhn ne*kir* ew bi xu bi poz

Borîn bike nêzê gulê bi can û ruḥ ḥalxweş dibî

---

[3429] **Hêlîya dil**: Neynika dil

[3430] **Rahê ḥeq**: Riya rast, riya Xwedê

[3431] **Kela**: Keliya

[3432] **Şahê napeyda**: Mebest jê Xwedê ye.

53.

Bayê li baġê gul dixe bela dike bêhna gulan

Digîne wî kesî w*î* ra nêzê gulan borîn dibî

54.

Pêşyê bizane gul çi ye bigire bêhn bikey bi poz

Bibêje yan bîra b*î*ne`b dev û dilan kêfxweş dibî

55.

Xudênenasê korbidil bigije wî ʿinayetek[3433]

Di ʿalema meʿnay*ê* da dest da bi çav û nas dibî

56.

Tîne ziman bi tesbiḥan ġîçik[3434] ʿinayeta Xudê

Mîna gulistan û çimen agir ji can ra dost dibî

57.

Bixaze Xiḍrê şad dike bi gîştina ava ḥeyat

Serek û pêşûway*ê* wek Sikender nabîna dibî

58.

Bêhna gula Ḥicaz*ê* ta Selman li Fursê[3435] mest dike

Welê Ebû Cehl[3436] û Lebîd[3437] bêḥis dibî dilkor dibî

59.

Xudê bixaze xag[3438] û xam[3439] digij*î*ne giştî û xaṣ[3440]

Bi emr*ê* wî gîştî û xaṣ her weku xag û xam dibî

60.

Vîyan r*a* pur miṣal hene welê beyan kin tê bizan

Derê kemalatan hemî bi dest*ê* Yezdan vedibî

61.

Yara heval gîştin û çûn dost û nigaran[3441] ez tenê

Xag mame mewsim bor*î* çû ḥalê me xagan çer dibî

62.

---

[3433] **ʿInayet**: Alîkirin, arîkarî
[3434] **Ġîçik**: Xîçên biçûk, kevirên biçûk
[3435] **Furs**: Dewletê Farisan, Îran. Li vir qala Selmanê Farisî dike.
[3436] **Ebû Cehl**: Apê Hz. Muhemmed (asw.) e. (bnr. 63/9)
[3437] **Lebîd**: Me tespît nekir.
[3438] **Xag**: Negihîştî, kal
[3439] **Xam**: Negihîştî, beredayî, nebaş, nerind
[3440] **Xaş**: Rind, spehî, baş
[3441] **Nigar**: Dilber, yar, evîn

Hêvî me hey ji te nigar, berḍe neẓerkî serme da

Ji bo nemînin îst*û*xar bi muḥt*a*can îkram dibî

63.

Çendan me hey sûc û gune, li hêvîya luṭfa we ne

Muḥtac*ê* inʿama[3442] we ne, qencî bi yê wek me dibî

64.

Bêḥed neçar[3443] in em bi mal, tim îst*û*xar in em bi ḥal

Bil hezkirina te me ra cihan*ê* da ḥeram dibî

65.

Dil me girêdaye bi te tenê dixazin em ji te

Dest ve bikem ber ġeyr*ê* te mirin me ra wacib dibî

66.

Welê Xudanasê bi çav dema were ser bêhn ji baġ

Ji feyż û nûr û nisbetê ji ġeyr*ê* ḥeq cuda dibî

67.

Weya bi dil bîr bîne ḥeq, weya bi dev bibêje Reb

Wek ṭeyr*ê* nîv serjêkirî li cî *hil*pirtikî dibî

68.

Lewra bi dil dîye[3444] cemal[3445] bi ruḥ d*î*ye lez̠z̠et*a* ḥal

Ji feyż*ê* ra bûye delav tê da m*î*na çem rê dibî

69.

Kerwan*ê* ḥeqçûyan mudam ji ve dixin bi ṣubḥ[3446] û ṣam[3447]

Tije dikin ṣed tas û cam kêfa dilan pê xweş dibî

70.

Dide qimek ṣed lez̠z̠etê li ruḥ z*ê*de ket meḥbetê

Şukur *î*ro bêhna me tê ku dil bi feyżê coş dibî

71.

Lew fir didim û dat*î*nim, lew radibim û rûdinim

Bilind dibim û nimz dibim, bi dost*ê* dil rûgeş dibî

72.

---

3442 **Inʿam**: Nîmet

3443 **Neçar**: Xizan, jar, feqîr

3444 **Dîye**: Dîtiye

3445 **Cemal**: Rindahî, bedewî, spehîtî

3446 **Ṣubḥ**: Sibe

3447 **Ṣam**: Êvar

Yek demekê ser ḥalekê nikarim ez bikem sukûn[3448]

Lewra dilê cilwe l*ê* da wek mewsiman de geş dibî

73.

Geh nar û nûr e hav*î*n e, wek tenn*û*r e dil bi ṭ*î*n e

Geh wek zivistanê diçe dicemide û sar dibî

74.

Geh wek beharê rûken e, bi sosin û gul û gihan

Geh wek p*a*yîza malm*î*rat rûgirt*î* û ʿekrût[3449] dibî

75.

Zemîn yek e welê bi gor zeman guhertin çêdibî

Dil jî yek e welê bi gor tecellîyan xuy[3450] ḥal dibî

76.

Heza*ran* hene bêhn*ê* xweş jê ra xu ḥażir kin eman

Di gotina pîrê mezin meal in ev derbaz dibî

77.

Wuṣay fuyûḍatê[3451] Xuda her dem m*î*na baran*ê* tên

Lêkin hinik deman d*a* feyż wek tavîyê zêdetir dibî

78.

Meqṣed bilind î ey merov, bi mûm û find î ey merov

Nenitirînî[3452] wan deman ji pis*î*kê kêmter[3453] dibî

79.

Dibîn*î* dem bi dem pisîk di qul*a* mişk çav dike dîk[3454]

Piştî zemanekê dirêj l`nêçîr*a* xu suwar dibî

80.

Eger tu çavnêr bî mudam zeman*ê* xu tewş rê nekey

Rojek bi feyżê wek gula ber rûgeş û rûken dibî

81.

Ya Rebb*î* ḥal bi te xweş e bikey neṣîb ji bo me ra

Bi ḥal*ê* tu rażî bibî bi wî dilê me şad dibî

---

[3448] **Sukûn**: Sekn, tebat

[3449] **ʻEkrût**: Rûpîs, rûnexweş, rûtehl

[3450] **Xwey**: Xwedî

[3451] **Fuyûḍat**: Feyz û bereket

[3452] **Nenitirîn**: Neyînîya lêkera nitirandin e. Nitirandin, lê nihêrtin, çavnêrî kirin, raçav kirin

[3453] **Kêmter**: Kêmtir, nizimtir

[3454] **Dîk**: Rasterast

82.

Çirûsk*î* nûra dil d*î*sa ronî b*û* pêşber dil cihan

Di beḥr*a* feyż û nisbetê wek yehm*û*tan[3455] dil noq dibî

83.

**Ḥezîn** mekey êdî were ji kunc*ê* tarî bidere[3456]

ʿAlem seraser fener e ku da biçî dil ron*î* bî

**141.**

faʿilatun / faʿilatun / faʿilun

Remel – + – –/– + – –/– + –

1.

Eḥmeda![3457] sulṭan*ê* ”lewlake”[3458] tu yî

Eḥmeda! meqṣûd bi ”yuʿṭîke”[3459] tu yî

2.

Em gunehkar in umîdwar in ji te

Bo me jaran şafiʿ[3460] û hêvî tu yî

3.

Dûr*î* mane em ji yar û wargehan

Ji d*û*rê rêwend*a* ra çare tu yî

4.

Dil birîndar im fenaḥal im *î*ro

Derm*a*nê derdê dil û luqman tu yî

5.

Teyh*ê*[3461] da mat bûne mane bê hewar

Mat*ê*[3462] teyhê ra hewar muncî[3463] tu yî

6.

Ṣed hezar luqman werin beyhûde ye

---

[3455] **Yehmût**: Navê hut, mûrekkep baligi
[3456] **Bidere**: Derkeve, derê
[3457] **Eḥmeda**: Ey Ehmed (saw). Li vir nîda heye.
[3458] **Lewlake**: Ger tu nebûyayî. (Îşareta hedîsa qûdsî dike, bnr. 1/13)
[3459] **Yuʿtîke**: Dê bide te. Îşareta vê ayetê dike:

(وَلَسَوْفَ يُعْطِيكَ رَبُّكَ فَتَرْضٰى)

Xwedayê te (li axiretê) dê bide te û tu dê razî bibî. (Ed-Duha: 93/5)
[3460] **Şafiʿ**: Ew kesê ku şefaʻatê dike, şefaʻetker
[3461] **Teyh**: Çol, çolistan
[3462] **Mat**: Ewê ku mat maye, heyiriye, şaş maye û li cihê xwe sekiniye
[3463] **Muncî**: Xilasker, rizgarker

Ji birînê dil r*a* her duxtor tu yî

7.

Ṣed hezar rehber werin bê fayde ye

Mat*ê* teyhê ra tenê rêzan tu yî

8.

Dil di çola vê dinê da mat b*û*ye

Wend*a* kirye rah*ê* ḥeq[3464] zana tu yî

9.

Ger nekî pursê li me ey can*ê* can

Dê çi bit ḥalê me feryadres[3465] tu yî

10.

Dil di deryaya gunehan da *î*ro

Nêze ġerq be qebt*a*nê derya tu yî

11.

Ṭof*a*na axir zeman e rab*û*ye

Geşt*î* Îslam e, N*û*ḥê qebtan tu yî

12.

Van musilmanan bigire tev li xu

Vê ṭ*o*fanê ra rehaker[3466] her tu yî

13.

Dil ji pas û jeng*ê* nay paqiş kirin

Jeng*a* dil ra her tenê maḥî[3467] tu yî

14.

Dil ji ʿeşqê ra firaq[3468] e Emceda![3469]

ʿAşiq e dil meʿş*û*qê dilber tu yî

15.

Girt*î*ye nûr û huda[3470] te dil xu da

Çavn*ê*rê dil be şefîʿ[3471] hadî[3472] tu yî

---

[3464] **Rahê ḥeq**: Riya rast
[3465] **Feryadres**: Alîkar, destyar, destkeş
[3466] **Rehaker**: Xilasker, rizgarker
[3467] **Maḥî**: Ew ê ku jengê rêş dike, rêşker, paqijker
[3468] **Firaq**: Aman, tas
[3469] **Emceda**: Yek ji wan navên Hz. Pêxember e ku wateya wê; pak, paqij
[3470] **Huda**: Hidayet, di riya rast de çûyîn
[3471] **Şefî'**: Ewê ku şefa'etê dike
[3472] **Hadî**: Ew kesê ku riya hîdayetê

16.

Suw*a*rê bûraq hevalê Cebr*a*îl

Di bilindbûna semayê da tu yî

17.

Bîstekî da çûy*î* gîştî lamekan[3473]

Pehlewanê qab*ê* qewseynê tu yî

18.

Cebr*a*îl yek movikî pêş da neçû

Her kesî ra heye ḥed, bêḥed tu yî

19.

Pê diket wek mûm*ê* pêş da bata[3474] ew

Ji meqamê qurb*ê*[3475] ra babet[3476] tu yî

20.

Pê diket ji heybet û ʿeşq û n*û*rê

Her tecellî ra teḥemmulker tu yî

21.

Can*ê* te wek nav*ê* te bûye heval

Ji Xuda ra şah*ê* şehbazan[3477] tu yî

22.

Dil bi ʿeşqê tim dibilqê Eḥmeda!

Meʿş*û*qa dil herdu dunyan da tu yî

23.

Gîştina te gîştina ḥeq e bi xu

Pêşiwayê fan*î*yan ḥeq da tu yî

24.

Dest*ê* ḥeq ser dest*ê* wan e gotîye[3478]

Xaliqê jorîn mubayîʿ[3479] jî tu yî

25.

---

[3473] **Lamekan**: Bêmekan, bê cih û war

[3474] **Bata**: Bihata

[3475] **Qurb**: Nêzikahî, (li vir qala di şeva mîracê de nêzikbûna Xwedê dike. Bnr. Qabê Qewseyn)

[3476] **Babet**: Layiq, şayeste

[3477] **Şehbaz**: Şahê bazan

[3478] Îşareta vê ayetê dike:

(يَدُ اللّٰهِ فَوْقَ اَيْدٖيهِمْ)

Destê Xwedê li ser destên wan e. (Fetîh: 48/10)

[3479] **Mubayiʿ**: Ew kesê ku bey'atê dike, bawer dike

"Mare meyte iẕ remeyte"[3480] gotîye

Wî Xudayê pak û avêhtî tu yî

26.

Çi bixazî her Xuda pêk tîne wî

Bêguman lewra Ḥebîbu`llah[3481] tu yî

27.

Pur bilind e qedr*ê* te cem Rebb*ê* te

Yê ber avan da m*a* roj boy wî tu yî

28.

Pur ʿezîz û dilber î cem Rebb*ê* xu

Yê ku bo wî bû du ker hîv tek tu yî

29.

Wek te dûrbîn kes nehatîye dunê

Ji Ḥicazê, Furs û Rom dîyî tu yî

30.

ʿEskerê Mûsa ji kevir av vexar

Yê ji nav tilyan diza av tek tu yî

31.

Vedixar ʿesker*ê* Îslamê ji wê

Av*a* şîrîn çeşmeyê ḥeywan[3482] tu yî

32.

Lew hevalê te r*a* maye nav û deng

Serwerê kerwan*ê* ḥeqrewan[3483] tu yî

33.

Mirîyê goran bi ʿÎsa saġ dibûn

Yê k*o*ka xûrmê li ser nala[3484] tu yî

34.

Dest*ê* Dawud[3485] da m*î*na mûm bû hesin

---

[3480] Îşareta vê ayetê dike:

(وَمَا رَمَيْتَ اِذْ رَمَيْتَ وَلٰكِنَّ اللّٰهَ رَمٰى)

Te ne avêt, belê Xwedê ew avêt. (Enfal: 8/17)

[3481] **Ḥebîbu`llah**: Mebest jê Hz. Muhemmed (saw.) e.

[3482] **Çeşmeyê ḥeywan**: Kaniya jiyanê, ava heyatê

[3483] **Heqrewan**: Ewê ku di riya heq de diçe

[3484] **Nal**: Dinaliya, zarezar dikir

[3485] **Dawûd**: Hz. Dawûd (as.). Yek ji wan pêxemberên mezin e ku navê wî di Quranê de dibore. Hem pêxember hem jî padîşah bû. Ji nifşê Hz. Ye'qûb (as.) û bavê Hz. Silêman (as.) e. Li bajarê Qudsê bû, jiya û mir.

Yê ġ*î*çikan dest d*a* tesbîḥ kir tu yî

35.

Piç*û*kî da ʿÎsa mijûl bû welê

Yê bi secde hate dunyayê tu yî

36.

"Înn*î* la uḥibbu`l-afilîn"[3486] digot

Xel*î*lê Reḥman,[3487] jê ra mefxer[3488] tu yî

37.

Pişt*î* mezin bû *ê*dî bû berkemal

Yê bi tewḥîd hate dunyayê tu yî

38.

Ku tu peyġember *bûy* hêj Adem nebû

Yê hebû berya hemîkan da tu yî

39.

Ḥey(e)wanê bê ziman bûne te ra

Şa*hid* lewra reḥmeta ʿalem tu yî

40.

Ẓulm*a* Furs û Romê ʿalem dihejand

Yê ku ʿedl[3489] û xweşikî anî tu yî

41.

Mer*o*vê bê suc bi xweşî gor dibûn

Yê ku ew ʿadet*a* rakir her tu yî

42.

ʿAlemê şaş kir*î* bo rahê Xudê

Rehberê bal rah*ê* ḥeq cana tu yî

43.

Her seʿadet hat bi şandina te ra

Reḥmet û mehdî û şahid her tu yî

---

Yek ji wan mu'cîzeyên wî ew bû ku hesin di destê wî de wek hevîrê dikete her şiklî. Li vir qala wê mu'cîzeyên dike.

[3486] Ez ew ê ku diçe ava hez nakim. Îşareta vê ayetê dike:

(فَلَمَّا جَنَّ عَلَيْهِ الَّيْلُ رَاٰ كَوْكَباًۚ قَالَ هٰذَا رَبّ۪يۚ فَلَمَّٓا اَفَلَ قَالَ لَٓا اُحِبُّ الْاٰفِل۪ينَ)

Çi dema tarîtiya şevê ser Îbrahîm nixumand, wî stêrek dît û got: Rebê min ev e. Çi dema stêr çû ava, got: Ez ji yê diçe ava hez nakim. (En'am: 6/76)

[3487] **Xelîlê Reḥman**: Dostê Xwedê, ango Hz. Îbrahîm (as.)

[3488] **Mefxer**: Ew kesê ku bi wî tê îftîxarkirin, şanazî kirin

[3489] **'Edl**: Dad, dadmendî

44.

Tu beşîr[3490] î tu neẕîr[3491] î Eḥmeda!

Destegîrê herdu dunyayan tu yî

45.

Te kişand ji qewm*ê* xu bêḥed cefa

Lê ji wan ra dîs*a* xêrxaz her tu yî

46.

Feyż*a* te ava kirî ʿalem hemî

Dery*a*ya zanîn û nasîyê tu yî

47.

Bûne serwanek*î*[3492] devehan[3493] bi te

Serek û wan ra muʿellim[3494] her tu yî

48.

Kurd û Furs û Tirk û şerq[3495] û ġerb[3496] hemî

Nas kirin Xaliq bi wan nasker tu yî

49.

Serteser ʿalem b*û* ġerqê nûr û feyż

Roj û kanî, nûr û feyżê ra tu yî

50.

Baġ*ê* ʿalem bi te xweş bûye emîn

Lewr*a* ʿalem ra gul û bulbul tu yî

51.

Dil bi hatina te şaho! haş*î* bû[3497]

Zar*o*kê dil ra ş*î*r û şekir tu yî

52.

ʿAlema ruḥan bi te kêfxweş dibû

Lewr*a* ruḥan ra Z*î*n û Şîrîn tu yî

53.

ʿAlema nefsan bi te paqiş dibû

---

[3490] **Beşîr**: Ew ê ku ji mirovan re mizgîniya cennetê dide
[3491] **Neẕîr**: Ew ê ku ji mirovan re tirsa cehennemê dide
[3492] **Serwan**: Şivanê hêştiran
[3493] **Deveh**: Hêştir, deve
[3494] **Muʿellim**: Mamoste, fêrmend
[3495] **Şerq**: Rojhilat
[3496] **Ġerb**: Rojava
[3497] **Haşî bû**: Tebitî, ker bû, sukût bû

Lewr*a* nefsan ra qela û şeb tu yî

54.

ʿAlema ʿeqlan bi te birreh[3498] dibû

Lewr*a* ʿeqlan ra hesan[3499] û rûn tu yî

55.

Çilkekê weṣfê te nadim bi temam

Dery*a*ya weṣfê delal cana tu yî

56.

Tim hewes û hijmukarê[3500] te ye dil

Bulbulê dil ra gula rûken tu yî

57.

Canf*î*dayê rîç û rahê te ye ruḥ

Goy*î*na[3501] ruḥ ra ḥedan îro tu yî

58.

Beng*î* me sermest*ê*[3502] cama ʿeşq*ê*[3503] me

Meʿş*û*qa min dilbera min her tu yî

59.

ʿAşiq im ʿeşqa te da dil fan*î* me

Sîperik[3504] im nar[3505] û nûra min tu yî

60.

Li belengaz û neçaran purs bikey

Qencîya muḥtac*ê* ra laîq tu yî

61.

Çi bixazim ez ji te şahê delal

Yê ji min çêtir dizane min tu yî

62.

Beyh*û*de tê xastina tiştek ji te

Şah*ê* koşka dil d*a* rûniştî tu yî

63.

---

[3498] **Birreh**: Tûj
[3499] **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û kêran tûj dikin, kevirê tûjkirinê
[3500] **Hijmukar**: Evîndar, ʻaşiq
[3501] **Goyîn**: Çivîkek mîna kevokê ye ku hin herêman jê re dibêjin tivîlk an jî tivirg
[3502] **Sermest**: Serxweş
[3503] **Cama ʻeşqê**: Şeraba ʻeşqê. meya evînê
[3504] **Sîperik**: Pirpirok, minminîk, baperik
[3505] **Nar**: Agir, ar

Tewş e bêjim xastina ruḥê reben

Yê ku guh li nal*î*na ruḥ e tu yî

64.

Yek demê da li te bin ṣed ṣed selam

Tek di gorê da selam veger tu yî

65.

Ax*a* wê gora mubarek nûr e tev

Lew di wê axa p*î*roz raza tu yî

66.

Asiman û erḍ*ê* da nîne ji wê

Şûnekê çêtir di wê medfûn[3506] tu yî

67.

Herdu ḥereman r*a* hey pur qudsîyet

Ku di wan da sakin û gerra tu yî

68.

Ṣed şukur lewra p*î*roz e dil *î*ro

Sî ṣ*a*l e dil da muqîm[3507] daîm tu yî[3508]

69.

Yê ku ʿerş[3509] û kursîy[3510] û ʿalem nebû

Nûr*a* wî dîtî kemala xu tu yî

70.

Yê ku Adem ax û avê da b*û* hêj

Bib*û* peyġember ji ʿalem ra tu yî[3511]

71.

Gerçî Adem bav e insan ra welê

Adem û ʿalem r*a* ʿillet[3512] her tu yî

72.

---

3506 **Medfûn**: Ew kesê ku hatiye binaxkirin, çalkirin

3507 **Muqîm**: Ew ê ku îkamet dike, lê rûdinê, li wir bi cihbûye

3508 Dema ev malika hatibû nivîsîn Seydayê Mela Hezîn sî salî bû.

3509 **'Erş**: Cihê qudreta Xwedê ye ku heft qat li ser asîman û kursiyê ye. 'Alema maddeyê li wir diqede û 'alema lamaddeyê li wir dest pê dike.

3510 **Kursî**: Li asîmanê di qata nehê de ne. Di nav wê qata nehê de heşt qatên din jî hene. Lewh û qelem jî li wir in. (**Lewha**: Di gerdûnê de çi tişt qewimiye û dê biqewime li ser wê, bi qelemê hatiye nivîsandin. Xwedê cara yekem wan lewh û qelemê afirandiye. **Qelem**: Di wê lewhayê de dê çi biqewime, hemî nivîsandiye.)

3511 Îşareta vê hedîsê dike: Adem hêj di navbeyna ruh û cesedê de bû ku ez pêxember bûm. (Tirmizî, Menaqib, 1)

3512 **'Illet**: Sedem

Nerm *î* wek sosin*ê* bêhn xweş wek gul î

Ji x*û*yê baş ra mutemmim[3513] her tu yî

73.

Hatina te reḥmet e bo ʿaleman

Ḥeqrewan[3514] ra rehber û rêzan tu yî[3515]

74.

Tarîya kufrê bela bûye bi te

Ins û cinnan ra Xudênasker tu yî

75.

Ṣade nûr î sih nebû bo can*ê* te

Yê ku ʿewr şemsiyye jê ra her tu yî

76.

Der û hundûrê te paqiş wek z*ê*r e

Yê ku mêşan nedidanî ser tu yî

77.

Tu tijeh nûr î bilind nav û temîz

Bi "elem neşreḥ"[3516] muxaṭeb her tu yî

78.

Yê ku derzî hate dîtin bi n*û*ra

Ruy*ê* wî tarîy*ê* da canêm tu yî

79.

Nab*î*ne nûra r*û*yê te qenc çikot[3517]

Roj*a* meḥşerê digel dîtî tu yî

80.

Dikeve canan hezar lerzîn û ta

Yê ku ummet jê r*a* derd e her tu yî

81.

---

[3513] **Mutemmim**: Yê ku kêmasiyan temam dike, temamker

Îşareta vê hedîsê dike: Ez ji bo ku exlaqê baş temam bikim, hatim şandin. (Îmam Malîk, Muwatta, Husnu'l-Xulq, 8)

[3514] **Ḥeqrewan**: Ew kesê ku di riya heq de diçe

[3515] Îşareta vê ayetê dike:

**(وَمَا اَرْسَلْنَاكَ اِلَّا رَحْمَةً لِلْعَالَمِينَ)**

(Hey Muhemmed!) Me, tu ji temamê alemê re şand, bes da tu li ser wan bibî rehmet û dilovanî. (Enbiya: 21/107)

[3516] Îşareta vê ayetê dike: اَلَمْ نَشْرَحْ لَكَ صَدْرَكَ

Erê ma me sînga te (resûlê min, ji bo ahkamên dîn) fireh nekir? (Eş-Şerh: 94/1)

[3517] **Çikot**: Tima, çavteng, kinoş

Ṣed hezar ummet fidayê te bibin

Yê ku bo wê li ser erḍê ye tu yî

82.

Ran*a*key ḥetta şefaʿet nekî tu

Roj*a* tirsê hêv*î*meqbûl her tu yî

83.

Can*ê* min cehan*a* min fiday te bin

ʿAlemê da ji **Ḥezîn** ra bes tu yî

84.

Ya Resûlu`llah me yê dilkorê ra

Dest(i)keşê hêl*a* ḥeq da her tu yî

85.

Ya Resûlle`llah me yê nîvkuşt*î* ra

Ji neyarê nefs*ê* rehaker[3518] tu yî

86.

Ya Resûlle`llah h*ê*vî nîne me ra

Çareya bêçareyan îro tu yî

87.

Ya Resûlle`llah me wenda kirye rê

Ji ġerîbê wend*a* ra hêvî tu yî

**142.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Hilo ey xort*ê* Îslamê çima wuṣa perîşan î

Berê ḥukmê te carî bû ji Tuna[3519] ḥett*a* Turanî[3520]

2.

Berê wek şah*î*n û baz bûy neyarê te m*î*na çûk bûn

Îro bo çi wulo jar î di bin destê neyaran î

3.

[3518] **Rehaker**: Yê ku mirovan rizgar dike, xilasker, rizgarker

[3519] **Tuna**: Çemê Tunayê. Li Ewropayê duyemîn mezintirîn çem e.

[3520] **Turan**: Bi giştî di parzemîna Asyayê de cihên ku tirk lê dijîn. Mebest "ji Tuna hetta Turan" ev e: ji rojavayê heta rojhilatê, seranserî dinyayê.

Berê te bikira dengek li duşman nedima rengek

Ne didîta li henber xu te tu beṭlek[3521] li meydanî

4.

Çima îro nekarî yî m*î*na koran nebîna yî

Li henber duşmenê xu wek s*ê*wî ji îst*û*xaran î

5.

Te ne war e ne dîyar e, te ne ʿilm e ne ʿirfan e

Perîşanḥal *î* tu mîna s*ê*wîyê ber d*î*waran î

6.

Li destê duşmen e te çav, dibêjî mal û ḥalê wan

Eger xazyê bi wan bînî neyarê can û îman î

7.

Zemanek bê *a*v û bê zad[3522] diçûy şeḥray*ê* da ḥerbê

Te ra dihat q*û*ma germa m*î*na agir, gulistanî

8.

Şikestî şûr qetayî çek[3523] peya û xas*î*[3524] û birçî

Dixista ref li neyaran bi îman û bi ʿirfanî

9.

Ç*û*yîna mal û mulk û zar*o*k û can nedihat berçav

Tenê qeṣd bo te ra xorto riżaya Xaliqê banî[3525]

10.

Di hêrsê da m*î*na şîr bûy di fikrê da m*î*na kêr bûy

Di qezyê[3526] da m*î*na şêr bûy şifaya can û ruḥan î

11.

Di zanînê m*î*na derya di xûyê xu m*î*na gul bûy

Hevalê xu r*a* tim rûken bi kêr bûy mîn*a* baranî

12.

ʿEnînûr bûy d*î*tindûr bûy fikirkûr bûy m*î*na Camî[3527]

Zerînrû[3528] bûy v*a*la tûr[3529] bûy ji tirsan û ji iḥsanî

---

[3521] **Beṭlek**: Pehlewan
[3522] **Zad**: Xwarin
[3523] **Çek**: Kinc, libas, cil
[3524] **Xas**: Pêxas
[3525] **Xaliqê banî**: Xwedayê Jorîn
[3526] **Qezî**: Axaftin, peyîvandin, qisekirin
[3527] **Camî**: Mewlana Camî. (bnr. 9/6)

13.

Îro çi hat*î*ye ser te ji her karî ş*û*va mayî[3530]

Îro çi bû bi te berxo, bi derd û kul û êşan î

14.

Ji te derdiketin zana û pehlewan û feylesof

M*î*na Muḥyîdd*î*n[3531] û Se'dî[3532] m*î*na Xeldûn[3533] û Xelkan[3534] î

15.

Li ku ne Ḥeyder[3535] û Farûq,[3536] Ṣelaḥuddîn[3537] û Fatiḥ[3538] kan

Li ku ne Romî[3539] û Camî,[3540] li ku ne Xalid[3541] û Xanî[3542]

16.

Kanê Farab*î*[3543] û Sîna,[3544] k*a*nê Ġezzal*î*[3545] û Îqbal[3546]

Ebû Suûd[3547] û Şêx 'Ebduh,[3548] Cemaleddîn*ê* Efġan[3549] î

17.

Wuṣa ẕat bûn ji te hatin cihanşumûl[3550] bû navê wan

Bilind bû şûn û qedrê wan di 'eql û 'ilm û 'irfanî

18.

Çima xorto *î*ro jar î, te da tiştek nake karî?

---

3528 **Zerînrû**: Rû zer, rûyê (ku ji tirsan) zer bûyî

3529 **Tûr**: Tûrik, kîs, torbe

3530 **Şûva mayî**: Şûnde mayî, para mayî

3531 **Muḥyî`d-dîn**: Îbnî Erebî. (bnr. 50/4)

3532 **Se'dî**: Se'dîdûnê Kaşxerî (bnr. 9/6)

3533 **Xeldûn**: Îbnî Xeldûn.

3534 **Xelkan**: Îbnî Xelkan

3535 **Ḥeyder**: Hz. Elî. Xelîfeyê çaremîn.

3536 **Farûq**: Hz. Umer. Xelîfeyê duyemîn.

3537 **Şelaḥuddîn**: Selaheddînê Kurdî el- Eyyûbî.

3538 **Fatiḥ**: Fatih Sultan Mehmed

3539 **Romî**: Mewlana Celaleddîn Romî. (bnr. 8/23)

3540 **Camî**: Mewlana Camî. (bnr. 9/6)

3541 **Xalid**: Mewlana Xalidê Şehrezorî el-Kurdî. (bnr. 17/19)

3542 **Xanî**: Necmeddînê Xanî. Xelîfê Mewlana Xalidê Şehrezorî. (bnr. 17/19)

3543 **Farabî**: Ebû Nasr Muhemmed el- Farabî. (872-950 Şam) Alim, filozof, zanyar. Di dîroka Îslamê de mirovekî gelek girîng e. Kitêbên Aristo cardin wergerandine zimanê Erebî. Li ser mentiq û felsefeyê de gelek pirtûk nivîsîne.

3544 **Sîna**: Îbnî Sîna. (bnr. 16/8)

3545 **Ġezzalî**: Îmamê Xezalî. (bnr. 8/23)

3546 **Îqbal**: Muhemmed Îqbal. (1877-1938). Alim, helbestvan, siyasetmedar û filozof. Ji Pakistanê ye. Bandoreke mezin li ser misilmanên Hindistanê kiriye

3547 **Ebû Suûd**: Alim. Eslê xwe ji Hekkariyê ye. Tefsîreke wî heye ku navê wê Muftê Seqeleyn e.

3548 **Şêx 'Ebduh**: Şêx Muhemmed Abduh. Alim, miftî û hizirmend. Ji kurdên Misrê ye.

3549 **Cemale`ddînê Efġanî**: Siyasetmedar, rojnamevan û aktîvîst (1838- 1897 Stenbol). Di sedsala 19. de yek ji pêşeng û parêzvanê modernîzma Îslamê bû. Bi fikrên xwe ve bandoreke mezin li ser gelek ramangêran Îslamî kirine.

3550 **Cihanşumûl**: (Navê wan) dinyayê wergirti

Fedî nakey p*a*ra mayî ji her ḥal û ji her şanî

19.

Bi roj û şev bixûn xorto, ji zanînê bibe derya

Di ṣenʿet da here pêş da dunê da bi*key* gerranî

20.

Binêr xorto li Qurana kelamê Xaliqê jorîn

Bixûne tefs*î*ra wê cem melakî mîn*a* ʿummanî

21.

Bizan meʿna w*ê* ya nazik gerek meʿqûl[3551] gerek menqûl[3552]

Binas ḥukmê w*ê* yê qudsî bigir ji fey*ża* rebbanî

22.

Di bin wan ḥerf*ê* nûrîn da heye ruḥ ra hezar raḥet

Di nav wan rêz*ê* zerîn da heye dil ra hezar kanî

23.

Ji wê ava zelala lah*û*tî yek çilkekê dil ra

Eger bibe neṣîb dê ew bibit deryay*a* ʿirfanî

24.

Ji meʿnayê dibe beḥrek tije durr û *gew*her, çawa

Dibêje feylesofê ʿalemê Bismark*ê* Elmanî?[3553]

25.

Dilê lêdit ji meʿna wî kelamê lah*û*tî surrek[3554]

Dixemile m*î*na zozan bi sosinê zerefşanî[3555]

26.

Dû ra binêre gotin û ḥedîsê Qaṣidê ekber[3556]

Xudayê jor hemî ʿalem ji bo xaṭir*ê* wî anî

27.

Dibînit reng û rûyê xweş û geş pê sosinê qelban

Digîrin ḥal û şeʾnan[3557] jê digijin ḥids*ê*[3558] wicdanî

28.

---

[3551] **Me‘qûl**: Ew tiştên ku li gorî hişê mirovan e, bi mentiq, mirov bi ‘eqlê xwe dikare bibîne
[3552] **Menqûl**: Ew tiştên ku hatiye guhaztin/neqilkirin. Bi Quranê ji me re hatiye gotin.
[3553] **Bismarkê Elmanî**: Yekemîn serokwezîrê Împaratoriya Elmanî. (1815-1898)
[3554] **Sur**: Sir, raz, nepen
[3555] **Zerefşan**: Kesê/tiştê zêran belav dike û davêje, zêravêj, zêrbelaker
[3556] **Qaṣidê ekber**: Qasidê mezin Hz. Muhemmed (saw.)
[3557] **Şeʾn**: Hal, rewş
[3558] **Ḥids**: Pêjn

Muḥemmed lêvrêjê ḥikmet, Muḥemmed waṣilê[3559] weḥdet[3560]

Muḥemmed rehberê ummet, Muḥemmed ra nîne s̱anî[3561]

29.

Heçî zanîn*a* hate der ji kanîya dilê Eḥmed[3562]

Ḥeyata ruḥ bi wê çê bit çi ḥacet av*a* ḥeywanî[3563]

30.

Heye nefsa birîndar ra di wan gotin*ê* qudsî da

Hezaran merhem û derman çi ye şîret*ê* luqmanî

31.

Xelaṣa herdu dunyayan di wan gotin*ê* nûrîn e

P*ê*xe luks û fener bo xu li pey wan her *ḥet*ta kanî[3564]

32.

Binêre tar*î*xa bavan bi çi pêş da ç*û*ne ew qenc

Bigire ʿibretê bo xu ji wê tarîx*a* nûranî

33.

Ku wê tarîx*a* pîroz da hezaran deşt û zozan hey

Gerîna lê n*ê*rîna lê dide te ẕewq*a* ruḥanî

34.

Bi vanan tu dibî gêrnas[3565] bi vanan tu dibî mêrxas

Bi vanan tu dibî şah û cihanê da ḥukumranî

35.

Bixûne tim bixûne tim bixûne tim bixûne tim

Bibe zana bibe zana bibe zana m*î*na Xanî[3566]

36.

Dilo xazî dilo xazî, bi wan nûrîn dilê zana

Qewî qenc in qewî qenc in, li cem wî Xaliqê banî

37.

Bes e xorto mebe ġafil, biçûkê xu mehêl cahêl

Bi xandinê b*û*ne kamil, m*î*na Îmam*ê* Rebbanî[3567]

---

[3559] **Waṣil**: Ewê ku digihe, bi dest dixe
[3560] **Weḥdet**: Yekitî û tenêtiya Xwedê
[3561] **S̱anî**: Duyemîn, dudu
[3562] **Eḥmed**: Yek ji navên Hz. Muhammed (saw.) e
[3563] **Ava ḥeywanî**: Ava jiyanê, ava heyatê
[3564] **Kanî**: Dikanî, dikarî
[3565] **Gêrnas**: ‘Egît, mêrxas
[3566] **Xanî**: Şêx Ehmedê Xanî

38.

Hilo ey xor*tên* Îslamê vekin çavan binêrin kûr

Li hev xin fikr û karînê bibin yek can di cihanî

39.

Çêkin qelbê neyaran da hezaran tirs û lerzînê

Bi yekbûna xu ya pola ji qirşûnê m*î*na xanî[3568]

40.

Ilahî ente meqṣûdî we riḍauke meṭlûbî[3569]

Mede **Ḥusnî** bi dûrbûna ji zatê xu perîşanî

41.

Bikey ya Reb w*î* nûrîndil,[3570] bikey ya Reb w*î* şûrînʿeql[3571]

Bikey gotin*ê* wî nafiʿ[3572] m*î*na baran*a* nîsanî

42.

Me hêvî hey ji reḥma te nekey meḥrûm ji luṭfa xu

**Ḥezîn** û nas û dostê wî ku tu deryay*a* iḥsan î

43.

Ezel da tu`y ebed da tu`y, di dil da tuʿy bi ruḥ ra tu`y

Hêvîya bêh*ê*vîyan tu`y, di vê cihan*a* yabanî[3573]

**143.[3574]**

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

Hewar û ṣed hewar carî

Kevir û kuç li me barî

Li me roj bû şeva tarî

Te riḥlet kir[3575] ji dunyayê

---

[3567] **Îmamê Rebbanî**: Alim, muceddîd, mutesewif û şêxê Neqşîbendiyye. Li Hîndistanê di navbera salên 1564 û 1624'an de jiyaye.

[3568] **Xanî**: Mal, avahî

[3569] Ya Rebbî! Tu armanca min î, qayîlbûna te xwestina min e.

[3570] **Nûrîndil**: Dilê bi nûrê tijî bûye, dilê bi nûr

[3571] **Şûrînʿeql**: Ew 'eqlê ku mîna şûrê bireh û tûj, ango jîr û biheş

[3572] **Nafiʿ**: Bikêr, bifeyde, bisûd

[3573] **Yaban**: Çol, çolistan

[3574] Ev qesîde di wefata Şêx 'Izzedînê Xeznayê de hatiye gotin.

[3575] **Riḥlet kir**: Çûyîn, koçkirin, barkirin û çûyîn

2.

Ji dunyayê te riḥlet kir

Qiyamet te li me rakir

Li me cerg[3576] û hunav ker kir

Te riḥlet kir ji dunyayê

3.

Te hicret kir ji dunyayê

Bûyî mêhvan li ʿuqbayê[3577]

Bê te ṣebra me qeṭ nayê

Te riḥlet kir ji dunyayê

4.

Digerrim lê te nabînim

Şev û rojan bi nalîn im

Ji boy te serx*o*ş û dîn im

Te riḥlet kir ji dunyayê

5.

ʿIzzuddînê[3578] ş*î*rîn rabû

Ji ber çavê me wenda bû

Giran derdek*î* peyda bû

Te riḥlet kir ji dunyayê

6.

Şev û rojan bi lorîn in

Mîna baran dibarînin

Ji çavan hêstirê xwîn in

Te riḥlet kir ji dunyayê

7.

Çiqas çavan digerrînim

Li dîwanê te nabînim

Xerabḥal im cigerxwîn im

Te riḥlet kir ji dunyayê

8.

---

[3576] **Cerg**: Ceger, kezeb

[3577] **'Uqba**: Axiret

[3578] **'Izzuddîn**: Şêx Îzzedînê Xezna. (8/16)

Dîn û dûr bûm ji weṣla[3579] te
Birînkûr bûm ji hecra[3580] te
Şewat pir bûm ji ʿişqa te
Te riḥlet kir ji dunyayê
9.
Çima îro xuya nakî
Ġem û derdan bela nakî
Birînê dil dewa nakî
Te riḥlet kir ji dunyayê
10.
Were cana binêre ca
Çi agir hilbûye dil da
Dîtin maye di ḥeşrê da
Te riḥlet kir ji dunyayê
11.
Murîd tev dilkul û ġemgîn
Ji hecra şahê ʿIzzuddîn
Ji qetana rûyê nûrîn
Te riḥlet kir ji dunyayê
12.
Mela û feqîyê dilber
Mirîd û ṣofîyê rengzer
Hemî man bêxudî`w bêser
Te riḥlet kir ji dunyayê
13.
Di ʿilmê da gelek kûr bûy
Di fikrê da gelek dûr bûy
Seraser ḥikmet û nûr bûy
Te riḥlet kir ji dunyayê
14.
Mîna şêr bûy di karînê
Mîna şûr bûy di birrînê

---

[3579] **Weṣl**: Gihîştin, gihan
[3580] **Hecr**: Cudabûn, veqetan, dûrketin

Mî*n*a şîr bûy di xweşbûnê

Te riḥlet kir ji dunyayê

15.

Xudanê Medresa Ṣorîn[3581]

Xudanê gotinê şîrîn

Xudanê ṣuḥbeta narîn

Te riḥlet kir ji dunyayê

16.

Sitûna dîn*ê* Îslamê

Çira Cezîre û Şamê

Kemilîn[3582] pê gelek ʿamê[3583]

Te riḥlet kir ji dunyayê

17.

Ji Aşîtan[3584] *ḥet*ta Ṭorî[3585]

Gelek meṭran[3586] gelek xurî[3587]

Hatin teʿzîy*ê*[3588] tev gîrî

Te riḥlet kir ji dunyayê

18.

Gelek bajar*î* û gundî

ʿEreb, rom û ʿecem, kurdî

Bûne dilkul bi vî derdî

Te riḥlet kir ji dunyayê

19.

Ji Bîngol û Siṭenbolê

Gelek dîn bûn ketin çolê

Bûne wek Mecn*û*nê Leylê

Te riḥlet kir ji dunyayê

20.

---

3581 **Medresa Ṣorîn**: Dîwarên medresa Şêxê Xezneyan a li Tilme'rûfê bi kevirên sor ve hatine avakirin. Ji ber vê yekê, qesda şa'ir li vir ne Medrasa Sor a Melayê Cizîrî ye.

3582 **Kemilîn**: Gihîştin, kamîlbûn

3583 **ʿAm**: Piranî gel, giştî, gelemperî

3584 **Aşîtan**: Navê herêma ku ji derûdora bajarê Qamişloyê dest pê dike û hetanî li Amûdê diçe.

3585 **Ṭor**: Tûrabdîn. Navê herêmê ye ku Mêrdîn, Êlih, Botan û Mîdyad dikeve nav wê.

3586 **Meṭran**: Keşîşên mezin

3587 **Xur**: Keşîş

3588 **Teʿzîye**: Şîn

Xuda yarê te be rehber

Beheşt warê te be dilber

Beşîr[3589] carê[3590] te be serwer

Te riḥlet kir ji dunyayê

21.

**Ḥezîn** hoy hoy diket hey hey

Ji ber janê w*î* ye wey wey

ʿIzzuddîn nab*î*ne ew qey

Te riḥlet kir ji dunyayê

22.

Şukur îro Muḥemmed[3591] ma

Li dewsa şîr*î*nê Xezna

Ji piştî wesyeta wî ra

Te riḥlet kir ji dunyayê

23.

Qesem bi`llah[3592] xilaf[3593] nakin

Ji emrê te xira nakin

Welew ku can*ê* me qeṭ kin

Te riḥlet kir ji dunyayê

**144.**[3594]

mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −

1.

ʿIzzuddînê ş*î*rîn kanê

Delala ġemrevîn kanê

Hedana[3595] dilḥezîn[3596] kanê

Hewar e baz*ê* Xeznayê

2.

---

[3589] **Beşîr**: Ew kesê ku mizgîniya cennetê dide. Li vir mebest Hz. Pêxember (saw.) e.
[3590] **Car**: Cîran, cînar
[3591] **Muḥammed**: Şêx Muhemmed Me'sûmê Xezna. (bnr. 71/6)
[3592] **Qesem bi`l-lah**: Bi navê Xwedê sond dixwim
[3593] **Xilaf**: Dij, dijberî
[3594] Ev qesîde di wefata Şêx 'Izzedînê Xeznayê de hatiye gotin. (H.)
[3595] **Hedan**: Aram, sebr, tebat
[3596] **Dilḥezîn**: Dil bi xem

Dila ra ew çi luqman bû

Kulan ra ew çi derman bû

Cihanê ra çi sulṭan bû

Hewar e baz*ê* Xeznayê

3.

Bi wî şer‘[3597] û ṭerîq[3598] ḥey bûn

Bi wî menzil*ê* dûr ṭey bûn[3599]

Bi wî daġ û birîn key bûn[3600]

Hewar e baz*ê* Xeznayê

4.

Dilo rabe ku êvar e

Nexape pê dunê war e

Qetana dost*ê* dişwar e

Hewar e baz*ê* Xeznayê

5.

Gula Belx û Buḥarayê

Sirra Norşîn û Ġeydayê

Celisê[3601] text*a* Xeznayê

Hewar e baz*ê* Xeznayê

6.

Ji dunyayê te riḥlet kir[3602]

Li me can û cesed zer kir

Çi agir te di dil hilkir

Hewar e baz*ê* Xeznayê

7.

Gelek mest in gelek jar in

Mîna sêwî sitûxar in

Ji hicranê[3603] elemdar in

Hewar e baz*ê* Xeznayê

---

[3597] **Şer‘**: Şerî‘et, dîn
[3598] **Ṭerîq**: Terîqet, ew riya ku mirovan digihîne Xwedê
[3599] **Ṭey bûn**: Kurt bûn, zû rapêçiya, zû zû buhûrî
[3600] **Key bûn**: Kelîn, başbûn, qencbûn
[3601] **Celis**: Yê ku li ser textê rûdinê
[3602] **Rihlet kir**: Çûyîn, koçkirin, barkirin û çûyîn
[3603] **Hicran**: Cudabûn, fîrqet, êş û derdê cudabûnê

8.

Gelo tê rojekî dîsa

Dibînim tê d*a* Belqîsa[3604]

Dibit min ra nefesʿîsa[3605]

Hewar e baz*ê* Xeznayê

9.

Weya wuha dimînim hey

Bi ah û derd û daġ û key[3606]

Dilorînim bi mislê[3607] ney

Hewar e baz*ê* Xeznayê

10.

Gelo baġê dilan î tu?

Şîrînşahê cihan î tu?

Me ra ʿewn[3608] û eman bûy tu

Hewar e baz*ê* Xeznayê

11.

Çima îro tu deng nakî

Li mehcûran[3609] sûal nakî

Birînê kûr de ranakî

Hewar e baz*ê* Xeznayê

12.

Hewar û ṣed hewar îro

Keremkar û medar[3610] îro

Ji nîv me çû biġar[3611] îro

Hewar e baz*ê* Xeznayê

---

[3604] **Belqîs**: Li Yemenê melîkeyê Sebayê. Hz. Sileyman ew gazî riya rast kir û dawiyê de bi wê re zewicî. (bnr. Onay, *b.n.,* r. 90.)

[3605] **Nefes'îsa**: Nefes/bêhna wî wek ya Hz. 'Îsayê. Yek ji wan mu'cîzeyên Hz. 'Îsa ew bû ku bi nefesa xwe miriyan ji gorê radikir, sax dikir. Li vir qesda wê dike.

[3606] **Daġ û key**: Birîna ku bi hesinê sorkirî tê çêkirin

[3607] **Misl**: Wekî, mîna, fena, mîtanî

[3608] **'Ewn**: Arîkarî

[3609] **Mehcûr**: Ewê ku hatiye terikandin

[3610] **Medar**: Girêçk. Lê li vir wateya wê ev e, ew kesê ku bixwe li navêndê ye û mirovên din li dorê dizivire

[3611] **Biġar**: Bilez, zû bi zû

**145.**

mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –

1.

Roj bû ji rojhelat veda

Nûr bû di reş qelbê me da

Mirmêlî[3612] bû`d canê me da

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

2.

Ey pepûka gaz û çiyan

Hîşyar bikey xew da çûyan

Derman ji boy dil kulbûyan

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

3.

Îro birîndar im ji dil

Bi hêstir û bi çavê şil

Me ra ḥeyat nîne ji bil

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

4.

Ey bulbulê baġê irem

Ḥemdê Xuda key dem bi dem

Ê ku`j te ra kirye kerem

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

5.

Ey dilbikulê çavbixûn

Rebenê jarê tev birîn

Ḥetta dikarî dest xu xîn

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

6.

Nûr e ji qelbê tarî ra

Hesan[3613] e ʿeqlê kobû[3614] ra

---

[3612] **Mirmêlî**: Alev, sobadan çikan alev, ferheng

[3613] **Hesan**: Kevirê ku bi das, tirpan û kêran tûj dikin, kevirê tûjkirinê

[3614] **Ko**: Ne bire, ne tûj

ʿÎsa ye nefsa mir*î* ra

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

7.

Ey şal*û*lê baġê cemal[3615]

Xweş xweş bixûne pir delal

Ê ku`j te ra dibit heval

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

8.

Wer meclisa van dilberan

Van dil bi ʿişqê ve kelan

Zêde dibit bi van deran

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

9.

Gelek bedew û dilber in

Rebban*î* ne xweş rehber in

Ji wan dilo heş digirin

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

10.

Gelek bi ţîn[3616] û şîr*î*n e,

Gelek xweş û ġemrev*î*n e

Mizgîn*a* dosta rast*î*n e,

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

11.

Pir qenc dilan qela dike

Feyżê di wan da ro dike[3617]

Tijî kemal û nûr dike

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

12.

Xuşxuş*ê* daran û gihan

Barrîn*ê*[3618] berxan û mihan

Wîlwîl*ê* ţeyran û ţuyan

---

[3615] **Baġê cemal**: Baxê rindahiya Xwedê. Mebest jê bihişt e.
[3616] **Ţîn**: Germ, germahî
[3617] **Ro dike**: Tijî dike, dadigire
[3618] **Barrîn**: Dengê ku ji berxê der tê. Wek mînak; ker dizîre, hesp dihîre û hwd.

ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda
13.
Rindî û xemla ṣorgulan
Govend û reqṣa bulbulan
Derman û melhema dilan
ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda
14.
Neqş û nigarê[3619] ʿalemê
Hezkirina Zîn û Memê
Tiştê ku nayê reqemê
ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda
15.
Dilê ku lêdabe ṭ*î*rêj
Dimîne mest û kerr û gêj
Hey hey dilerze û dibêj
ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda
16.
Bes key **Ḥezîn** vê ṣuḥbetê
Êdî mebîne zeḥmetê
Te heş hebî besî te tê
ʿEşqa Xuda ʿeşqa Xuda

**146.**

mustefʿilun / mustefʿilun
Recez – – + –/– – + –
1.
Şerîʿeta Muḥemmedî
Li erḍ*ê* maye bêxudî
Rabû ji bin şerm û fedî
Hewar Xudê hewar Xudê
2.
Zanîn*a* dîn kes ra nema

[3619] **Nigar**: Nexş, çîn

Li nam*û*sê pirsîn nema

Tev xûy*ê* pîs bûne xuya

Hewar Xudê hewar Xudê

3.

Xort û keçik mîna dewar

Nav hev d*a* ne bê şerm û ʿar

Kesek n*a*bêj çi ye we kar

Hewar Xudê hewar Xudê

4.

Her roj dibînim zelzelan

Lehî û ṣed rengê belan

Herzen*gan*[3620] nagirin ji wan

Hewar Xudê hewar Xudê

5.

Ḥukmê Quranê rab*û*ye

Îman gelek weza[3621] b*û*ye

Karê piran şeyṭanî ye

Hewar Xudê hewar Xudê

6.

Ya Reb! Evanê ḥeqnenas

Wan ra yek e her xam û xaş[3622]

Ji xu kirin derpî`w kiras

Hewar Xudê hewar Xudê

7.

Fisq û fucûr[3623] ji ḥed derr e

Karê ewan qal û şerr e

Her kes ji dengê ḥeq kerr e

Hewar Xudê hewar Xudê

8.

Ḥeqq e ku şînê ket **Ḥezîn**

Lewra birîn vebû di dîn

---

[3620] **Herzeng**: Îbret
[3621] **Weza**: Qels, ze‘îf
[3622] **Xam û xaş**: Baş û nebaş, spehî û beredayî
[3623] **Fisq û fucûr**: Ji riya Xwedê derketin, li dijî Xwedê serî hildan

Karê tevan derew û kîn

Hewar Xudê hewar Xudê

9.

Nayê b*î*ra wanan mirin

Mîna h*o*vê dilkevir in

Tev rê*bir*r û ḥeramxuran

Hewar Xudê hewar Xudê

10.

Dînê Muḥemmed Muṣṭefa

Zelal*î* û nûr û ṣefa

Em wî r*a* bûne bêwefa

Hewar Xudê hewar Xudê

11.

Hidayet û îman û nûr

Gelek ji qelban mane dûr

Lewra nemay xweşî`w ḥużûr

Hewar Xudê hewar Xudê

12.

Li cî *hîş*tîn evan*ê* gêj

Exlaq û rojî û nimêj

Lew bûne dilġirç[3624] û qirêj

Hewar Xudê hewar Xudê

13.

Dunya ji wan ra ye heval

Derḍ e ji wan ra milk û mal

Hîştin li cî dînê delal

Hewar Xudê hewar Xudê

14.

Ma nab*î*nin dawî çi ye

Pîrît*î* û nexweşî ye

Mirin û ax û zarî ye

Hewar Xudê hewar Xudê

[3624] **Dilġirç**: Biwêjeke kurdî ye, ango ew kesê ku dil bikîn, dilqirêj

15.

Gelî delalan vegerin

Xebat*ê* kin tev bigerin

Hêla d*î*nê xu da herin

Hewar Xudê hewar Xudê

16.

Eger biçe dîn û *î*man

Ḥeyat dibe ṣade guman

Insan dibe wek ḥey(e)wan

Hewar Xudê hewar Xudê

17.

Ḥeyat*a* vê dunê bizan

Tarî û şêlû û d*û*man

Çiman mirin nade eman

Hewar Xudê hewar Xudê

**147.**

mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –/– – + –/– – + –

1.

Ya Reb ji luṭf û reḥm*a* xu me yê perîşan dûr nekî

Ji dîtina cemal*a* xu me hijmekaran[3625] kor nekî

2.

Her kar û barê merivan bi dest*ê* qudreta te ne

Çima ku qencîkar *î* tu, me`b kar*ê* me bê nûr nekî

3.

Jar û belengaz û feqîr, li hêvîya luṭfa we ne

Bişîne bal me yê reben ji beḥr*a* luṭfê çilkekî

4.

Ezman û erḍ, ê ku di wan asar*ê*[3626] reḥma te`y pirr e

Comerd*î* karê te`y mudam bidey me ḥewcan piçekî

5.

[3625] **Hijmekar**: Evîndar, dildar, dilketî
[3626] **Asar**: Pirjimariya eserê ye. Eser, berhem

Neqş û nigarê[3627] ʻalemê bilind*î* û nimzî bi te`y

Boy zan*î*n û nas kirinê ya Reb bidey me ʿeqlekî

6.

ʿAlem seraser ġerriqî di qenc*î* û luṭfa te da

Ji xezneya iḥsan*a* xu bi me n*î*şan dey hindikî

7.

Çendan ku em xar in bi kar, Reḥîm tenê te nas dikin

Ji vê delavê pir bi av, me ra neṣîb key qimmekî[3628]

8.

**Ḥezîn** x*a*r û aware[3629] ye, ji kar*ê* xu şermende ye

Wî ra h*ê*vî luṭfa we ye, ya Rebb*î* wî meḥrûm nekî

**148.**

mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun / mefaʿîlun

Hezec + − − −/+ − − −/+ − − −/+ − − −

1.

Dilo rabe ku êvar e behara ʿumr*ê* qenc borî

Dinê ne şên*î*[3630] ye war e bi wê kêfxweş nebe gorî[3631]

2.

M*a* nabînî ş*û*na konan c*î*yê kûz[3632] û kuçikê wan

Hemî mane x*î*p û xalî[3633] bi tirs û dirr*î* û qarî[3634]

3.

Weha nabe weha nabe ji xewa ġefletê rabe

Bilezîne`w biçe lewra ji kerwanan gelek dûrî

4.

Diyarbekr û Hezargol[3635] û M*û*şa dilber û Kurdistan

Hemî milkê te bin dîsa tu têr nabî tu nankor î

---

[3627] **Nigar**: Nexş, çîn
[3628] **Qimmek**: Qurtek, çengek, kulmek
[3629] **Aware**: Beredayî, sêwak
[3630] **Şênî**: Gund
[3631] **Gorî**: Qurbana te bim. Li vir bi wateya hîşarkirinê jî heye; qurbana te bim wisa neke!
[3632] **Kûz**: Dîzikên mezin, qûşxaneyên ji xwelî hatine çêkirin
[3633] **Xîp û xalî**: Vikûvala, tipûtal
[3634] **Qarî**: Navê gihayekê ye ku bejna wê 30-50 cm e, rengê pelên wê keskê vekirî ye û gihayeke bi kulîlk e. bBi tirkî dana ayağı dibêjin.
[3635] **Hezargol**: Bajarê Çewlik/Bîngol

5.

Dibînî wek xu sist û heqnenas û jar û aware

Li xu pirsê bikey zû zû fenaḥal î birînkûr î

6.

Li zozan û çiya`w deştan li bajaran û tev gundan

Bigerre qenc dibe bînî[3636] xu ra derman û dixtorî

7.

**Ḥezîn** dunya û ê wê da te ra milk bin nexape pê

Li ku ne Qeyṣer[3637] û Dara[3638] li ku ne Qarûn[3639] û Gûrî[3640]

**149.**

mustefʿilun / mustefʿilun

Recez – – + –/– – + –

1.

Bihar*a* rengîn hatîye

Bi ʿeşq*ê* ve dil kelîye

Ev kêf û dewran kî dîye[3641]

Ha`b dûr*î*tî ha`b nêz*î*kî

2.

Neclê[3642] ʿezîzê Eḥmedî[3643]

Çavan bi mis̱lê[3644] wî nedî

Bi wî dilan da serridî[3645]

Îman û dîn û bendekî[3646]

3.

Ey şah û salarê[3647] cihan

---

3636 **Dibe bînî**: Dibe ku bibînî

3637 **Qeyṣer**: Navê şahên Roma û Bîzansê

3638 **Dara**: Navê serwerê dewleta Farisan a kevn

3639 **Qarûn**: Di dewra Hz. Mûsa de navê şahekî zehf dewlemend.

3640 **Gûrî**: Kerê kovî, zebra. Lê li vir mebest Behram e. Behram şahekî Îranê ye. Behram nêçîra gûran (kerên çolê/zebra) gelek hezdikir û gelek caran li pey gûran diçû. Rojekê li pey gûrekî diçe êdî qet venagere. Li her derî digerin lê ne gûrî dibînin ne jî Behram. (Pala, *b.n.,* r. 63.)

3641 **Dîye**: Dîtiye

3642 **Necl**: Kur, lav

3643 **Eḥmed**: Şêx Ehmedê Xezna. (bnr. 9/27)

3644 **Mis̱lê**: Wekî, fena, notanî, mîna

3645 **Serridî**: Seridîn, sinbilgirtin, silmgirêdan, ûşî zer bûyîn; gihîştin, kemilîn

3646 **Bendekî**: Bendehî, koletî

3647 **Salar**: Serek, pêşeng

Ey murşidê axir zeman

Ey destegîrê bê kesan

Li me *pir*sê key carekî

4.

Ey hêvîya bê hêvîyan

Dilan bide ber tavîyan

Bejan[3648] bikey wek avîyan

Ji bo Xudê me bîr mekî

5.

Ya Reb çi derde ev dema

Ṣebr û hedana me nema

Ahîn û qîr karê min e

Îro mîna pepûkekî

6.

Li te birînê kûr hebin

Te ra meqṣedên dûr hebin

Karê giranê zor hebin

Bighîne wî hewarekî

7.

Li te dipirse ew mezin

Ji te diçe derd û ḥuzn

Ḥeyat dibit bi te ş*î*rîn

Dunê bit wek gulzarekî

8.

Kûlġanîya razan[3649] tu yî

Şehînş*a*hê[3650] bazan tu yî

Wendan r*a* xweş rêzan tu yî

Me`j nêr*î*nê meḥrûm nekî

9.

Her qel*ban* ra sulṭan *î* tu

Her êş*ê* ra luqman *î* tu

---

3648 **Bej**: Reşahî, erd, erdê zuha û hişk

3649 **Kûlġanîya razan**: Gencîneya sirran

3650 **Şehînşah**: Şahê şahan, serokê şahan

Her derd*ê* ra derman *î* tu

Birînd*a*r im dermanekî

10.

Mewsim hebin behar tu yî

Kulîlk hebin gulnar[3651] tu yî

Zozan hebin gulzar[3652] tu yî

Di nêv gulan reyhanekî

11.

Serkar*ê* alê Xeznewî

Kana kemala meʿnewî

Bişeyne[3653] bal me ê reben

Ji ʿewr*a* luṭfê tîlpekî

12.

Tilmeʿr*û*fa nûrîn*a* xweş

Wê da *ser*xoş dibin bi heş

Ronî dibe her qelb*ê* reş

Wê da bimînin bîstekî

13.

Sulṭan Muḥammed[3654] e *î*ro

Feyża wî bê ḥedd e *î*ro

Ji dest xu bermede *î*ro

Jê ra bibe xweş kolekî

**

[3651] **Gulnar**: Kulîlka hinarê
[3652] **Gulzar**: Gulistan, baxê gulan
[3653] **Bişeyne**: Bişîne
[3654] **Muḥemmed**: Şêx Muhemmed Me’sûmê Xezna. (bnr. 71/6)

# ÇAVKANÎ

**Pirtûk:**


Adak, Abdurrahman: *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, ç. 1., Stenbol 2013.

Aydemir, Yaşar & Çeltik, Halil: *Kafiyenin Şiiri Şiirin Kafiyesi –Divan Şiirinde Kafiye Hünerleri-*, weş. Kurgan Edebiyat, Ankara 2012.

Bateyî, Mela Huseynê: *Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, amd. M. Xalid Sadinî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

Bateyî, Melayê: *Mewlûd*, amd. Huseyn Şemrexî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

Bayezîdî, Mela Mehmûdê: *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, amd. Jan Dost, weş. Nûbihar, Stenbol 2010.

Bayrak, Mehmet: *Kürtlere Vurulan Kelepçe: Şark Islahat Planı*, Özge Yayınları, Ankara 2009.

Mehwî, (Mele Mihemedê Mele Osmanê Belxî): Dîwanî Mehwî, latînîze. Newzad Hirorî, weş. Nefel, Stocholm 2007.

Cizîrî, Melayê: *Dîwan*, amd. Emîn Narozî, weş. Avesta, Stenbol 2012.

___________: *Dîwan*, transkrîpsiyon Arîf Zêrevan, weş. Nefel, Stockholm 2004.

Çağlayan, Ercan: *Cumhuriyet'in Diyarbakır'da Kimlik İnşası (1923-1950),* weş İletişim, İstanbul 2014.

Çiçek, M. Halil: *Şark Medreselerinin Serencâmı*, weş. Beyan, İstanbul 2009.

Dilçin, Cem: *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. Türk Dil Kurumu, Ankara 2013.

Durre, Evdurrahman: *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, weş. Keskesor, Stenbol 2002.

Êsî, M. Huseyn & Girdarî, M. Se'îd & Bêrkevanî, M. Muhemmed: *Wergera Qurana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2008.

Geçer, El-Hazîn Hüsnü: *Külliyat-ı Suğra*, weş. Asitane Kitabevi, İstanbul 2012.

_________: *Külliyat-ı Vusta*, weşanxane nîne, İstanbul 2010.

_________: *Hanımlara Rehber*, weşanxane nîne, İstanbul 1995.

_________: *Mira'tu'l-Heqa'iq We'l-Esrar*, weş. nîne, Istanbul h. 1413/ m. 1993.

_________: *El-Mewahibu'r-Rehman Fî Tefsîrî Sûretu'l-Insan*, weş. Erkam, Istanbul 1998.

_________: *El-Mewahib*, weş. nine, Istanbul 2000.

Hasanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil [1918-1985],* wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, weş. Avesta, İstanbul 2005.

Hekkarî, Perto Begê: *Dîwan*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

Hezîn, Mela Husnî: *Dîwana Hezîn*, weşanxane û cih nîne.

___________: *Guldan*, weş. Nûbihar, Stenbol 2007.

___________: *Bîranînên Seydayê Mela Husnî*, p.ç. (Musweddeyên pirtûkê li ber deste me ye.)

___________: *Kûlxaniya Veşartî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2007.

___________: *Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edebê*, Stenbol 2007.

___________: *Reng û Rûyê Peyxember*, weş. Nûbihar, Stenbol 2009.

___________: *Fiqha Şafi'î*, weşanxane û cih nîne.

Kılıç, Mahmud Erol: *Sûfî ve Şiir Osmanlı Tasavvuf Şiirinin Poetikası*, weş. İnsan Yayınları, İstanbul 2014.

Malmîsanij, M.: *Kürtçede Ses Değişimi*, weş. Vate, İstanbul 2013.

Işık, İbrahim S.: *A'dan Z'ye Kürtler Kişiler-Kavramlar-Kurumlar*, weş. Nûbihar, İstanbul 2013.

İpekten, Haluk: *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, weş. Dergah, İstanbul 2013.

Pala, İskender: *Divan Edebiyatı*, weş. Kapı Yayınları, İstanbul 2008.

Qewmanî, Şêx Muhemmed Hadiyê: *Dîwan*, amd. Muhammed Seydaoğlu, weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

Qoxî, Mela Ehmedê: Dîwana Cami', weş. İhsan, Diyarbekir 2004.

Resûl, İzeddin Mustafa: *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf Olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, wer. Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2007.

Sağniç, Feqî Huseyn: Dîroka Wêjeya Kurdî, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.

Saraç, M. A. Yekta: *Klâsik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş. Gökkubbe, İstanbul 2014.

Kaya, Serdar: *Endoktrinasyon ve Türkiyede Toplum Toplum Mühendisliği*, weş. Nirengi, Ankara 2010.

Tarînî, Mela Birhanê: *Medrese Ji Her Aliyî ve Medreseyên Me*, weş. Şîn, Ankara 2011.

Turan, Abdulbaki: *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, weş. Nûbihar, İstanbul 2010.

Xanî, Ehmedê: *Nûbehara Biçûkan*, Analiz ve Şerh Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2008.

___________: *Mem û Zîn*, Lêkolîn û Şirove Perwîz Cîhanî, weş. Nûbihar, Stenbol 2010.

___________: *Mem û Zîn*, Çeviri ve Kavramsal Tahlil Kadri Yıldırım, weş. Avesta, İstanbul 2010.

Yıldırım, Ahmet: *Tasavvufun Temel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları*, weş. Türkiye Diyanet Vakfı, Ankara 2013.

Zivingî, Mele Ehmedê: *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Şêxê Cizîrî*, amd. û wer. Emîn Narozî, Stenbol 2013.

**Ferheng:**

Cebecioğlu, Ethem: *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, weş. Otto, Ankara 2014.

Devellioğlu, Ferit: *Osmanlıca–Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, weş. Aydın Kitapevi, Ankara 1997.

Farqînî, Zana: *Ferhenga Kurdî – Tirkî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2005.

___________: *Türkçe – Kürtçe Sözlük*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2000.

Gündüz, Şinasi: *Din ve İnanç Sözlüğü*, weş. Vadi, Ankara 1998.

Kanar, Mehmet: *Farsça Türkçe Büyük Sözlük*, weş. Birim, İstanbul 1998.

Îzolî, D.: *Ferheng Kurdî – Tirkî, Tirkî – Kurdî*, weş. Deng, Stenbol 2013.

Pala, İskender: *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı, İstanbul 2014.

Uludağ, Süleyman: *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, weş. Kabalcı, İstanbul 2012.

**Gotar û Hevpeyvîn:**

Agahdar, Emin: "Çîroka Helbesta Payîza Paşîn a Melayê Hezîn", *Nûpelda*, Wan 2013, j. 14., r. 39-41.

Algar, Hamid: "Bahâeddin Nakşibend", *DİA*, c. 4, 1991, r. 458-460.

___________: "Necmeddîn-i Kübra", *DİA*, c. 32, 2006, r. 498-506.

___________: "Alaeddîn Attar", *DİA*, c. 2, 1989, r. 319-320.

___________: "Halid El-Bagdadi", *DİA*, c. 15, 1997, r. 383-285.

Alper, Ömer Mahir: "Îbn Sîna", *DİA*, c. 20, 1999, r. 319-322.

A.R.T., Dilazad: "Di Nûbihara Biçûkan de Şîret", *Nûbihar*, j. 124, Stenbol 2013, r. 26-30.

Aykaç, Yakup: "Hevpeyvîn: Seydayê Mela Husnî Hezîn", mp3., 02.02. 2014, Stenbol.

___________: "Hevpeyvîn: Mela Mustefa Agahî", 28.03.2014, Çewlîg.

___________: "Kurtenêrînek li dor Dîwaneke Bêhempa: Dîwana Hezîn", *Nûpelda*, j. 15, Wan 2014, r. 49-55.

___________: "Hêmanên Edebiyata Kurdî ya Klasîk Di Dîwana Hezîn De", *Nûpelda*, j. 16, Wan 2014, r. 11-15.

___________: “Çar Çîrokên Cuda yên Bersîsê Abid”, *Nûpelda*, j. 19, Wan 2015, r. 58-63.

Azamat, Nihat: “İbrâhim Gülşenî”, *DİA*, c. 21, 2000, r. 301-304.

Bakırcı, Selami: “İbnü'l-Verdî’nin Nasîhatü’l-İhvan Adlı Kasidesi Ve Çevirisi”, *Turkish Studies*, Volume 8/13 Ankara 2013, p. 13-20.

Ceylan, Semih: “Mesnevî”, *DİA*, c. 29, 2004, r. 325-334.

____________: “Şems-i Tebrîzî”, *DİA*, c. 38, 2010, r. 511-516.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm: “Axayokê Bêdarî Şa‘irê Rexnegir”, (latînîzekirin M. Xalid Sadînî), *Nûpelda*, j. 14, Wan 2013, r. 44-47.

Ertekin, M. Zahir & Açar, Zafer: “Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, c.1, j.1, Ocak 2015, r. 82-92.

Ertekin, M. Zahir: “Seydayê Mela Husnî Hezîn û Berhemên Wî”, *Nûpelda*, j. 9., r. 52-56.

Mülayim, Selçuk: “Sinan”, *DİA*, c. 37, 2009, r. 224-227.

Okumuş, Ömer: “Abdurrahman Câmî”, *DİA*, c. 7, 1993, r. 94-99.

Öpengin, Ergin & Haig, Geoffrey, “Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects”, *Kurdish Studies*, j. 2, no: 2, Cotmeh 2014, r. 143-176.

Uludağ, Süleyman: “Abdulkadir-i Geylani”, *DİA*, c. 1, 1988, r. 234-239.

____________: “Abdullah ed-Dihlevî”, *DİA*, c. 1, 1988, r. 94-95.

Tosun, Necdet: “Ubeydullah Ahrar”, *DİA*, c. 42, 2012, r. 19-20.

____________: “Yusûf el- Hemedanî”, *DİA*, c. 44, 2013, r. 12-13.

Yazıcı, Tahsin: “Ebû Medyen”, *DİA*, c. 10, 1994, r. 186-187.

**Tez**:

Beyter, Önder: *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013.

İlhan, Ziver: *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013.


Yılmaz, Serdar: *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî Metn û Lêkolîn*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013.

Kırkan, Ahmet: *Mewlîdê Usman Esad Efendîyo Babijî “Bîyîşa Pêxemberî” Metn û Wekenitîş*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2014.


**Çavkaniyên Dîjîtal:**

m.nisanyansozluk.com (21.01.2015)

http://ku.wikipedia.org/wiki/Tûmik (20.03.2015)
http://ku.wikipedia.org/wiki/Gêxî (20.03.2015)
http://ku.wikipedia.org/wiki/Çewlîg (20.03.2015)
http://ku.wikipedia.org/wiki/Mişaxşîn (20.03.2015)
http://ku.wikipedia.org/wiki/Balekan,_Norşîn (25.03.2015)
http://ku.wikipedia.org/wiki/Karmuruna_Jor (25.03.2015)
http://ku.wikipedia.org/wiki/Tûrabdîn (01.04.2015)
http://tr.wikipedia.org/wiki/Abdulhâlık_Gucdevanî (17.03.2015)
https://tr.wikipedia.org/wiki/Yusuf_Hemedanî (02.01.2015)
https://fa.wikipedia.org/wiki/کریم%E2%80%8Cخان_زند (02.02.2015)



**Pêvek 1**: Destxetên Mela Mustefa Agahî



**Pêvek 2**: Destxetên Seydayê Mela Husnî Hezîn